# HEQÎQETA ŞER

*Hevalê Cemal*

**NAVEROK**


PÊŞGOTIN.......................................................................................5

DESTPÊK........................................................................................8

BEŞA YEKEMÎN ..............................................................................10

**DERKETINA ŞÎDETÊ Û DÎROKA PARASTINÊ**.................................10

**A) Di Civaka Xwezayî De Parastin û Derketina Şîdetê** ...............10

**B) Şîdet û Desthilatdarî**.................................................................12

**C) Şîdet û Zilam** .............................................................................14

**D) Şîdet, Dewlet û Hiqûq** ...............................................................15

**E) Şîdet û Artêş**................................................................................16

Beşa Duyemîn .......................................................................................17

**DÎROKA ŞER**........................................................................................17

**A) Ji Şîdetê Avabûna Şer**.................................................................17

1- Pêşveçûna Zanistê û Pêşketina Şer ...............................................17

2- Di Dîrokê De Pêşketina Amûrên Şer .............................................19

3- Di Hemû Şaristaniyan De Felsefeyeke Şer Heye ..........................20

4- Di Dîrokê De Normên Şer ..............................................................21

5- Di Şer de Îdeolojî û Exlaq................................................................22

6- Taktîk û Ziraviya Hunera Şer .........................................................23

7- Amûrên Şer û Pêşketina Çekan .....................................................26

**B) Şerê Di Serdema Moderniteya Kapîtalîst De**..............................27

1- Şerê Çînên Serdest û Bindestan .....................................................29

2- Şerê Mafdar û Şerê Bêmaf ..............................................................31

**C) Têgîna Şer**........................................................................................35

**D) Faktorên Li Ser Şer Bandor Dikin** ..............................................37

1- Li Ser Şer Bandora Demsalê ...........................................................37

2- Li Ser Şer Bandora Erdnîgariyê......................................................38

3- Li Ser Şer Bandora Lojîstîk û Teknîkê ...........................................39

4- Di Şer De Rola Îstixbarat û Muxaberê............................................41

5- Di Şer De Rola Hêzên Pispor û Profesyonel ..................................42

6- Faktora Gel.........................................................................................43

Beşa Sêyemîn .........................................................................................45

**DI HEBÛNA CIVAKAN DE ROL Û GIRÎNGIYA PARASTINÊ** ...........45

**A) Rewabûna Parastinê Nirxên Mirovatiyê Ava Dike**.................49

**B) Parastina Rewa Wijdanê Civakê ye**...........................................50

Beşa Çaremîn ........ 53
**DÎROKA ŞERÊ GELÊN BINDEST** ........ 53
**A) Stratejiya Raperînê û Ezmûna Sovyetê** ........ 54
**B) Stratejiya Gerîla û Ezmûna Mao** ........ 60
**C) Merheleyên Şerê Gel ê Demdirêj** ........ 62
**D) Artêşbûna Gerîla û Ezmûna Vîetnamê** ........ 63
**E) Şîroveyeke Demî Li Ser Sun Tzu û Hunera Şer** ........ 66
**F) Heya Roja Îro Cureyên Şer Ên Bi Pêş Ketine** ........ 73
1- Şerê Taybet û Şerê Psîkolojîk ........ 76
2-Di Serdema Nû De Meşandina Şerê Psîkolojîk ........ 79
3- Şerê Sanal û Şerê Sîber ........ 80
4- Şerê Asîmetrîk ........ 81
5- Şerê Sar ........ 82
6- Pêşketina Şerê Hewayî ........ 82
7- Di Şer De Faktora Bingehîn: Însan ........ 83
8- Şerê Deşt û Bajaran ........ 84
Beşa Pêncemîn ........ 89
**DÎROKA ŞERÊ LI KURDISTANÊ** ........ 89
**A) Di Şerê Kurdistanê De Bandora Ol** ........ 92
**B) Di Serdema Osmanî û Îranê De Di Şer De Rewşa Kurdan** ........ 95
**C) Di Serhildanên Sedsala 19. De Rewşa Şer** ........ 97
**D) Di Serhildanên Sedsala 20. De Rewşa Şer** ........ 102
**E) Di Serhildanên Kurdistanê De Rola Jinên Kurd** ........ 110
**F) Sedemên Binkeftina Serhildanên Kurdan** ........ 112
Beşa Şeşemîn ........ 115
**LI KURDISTANÊ DERKETINA PKK'Ê Û REWŞA ŞER** ........ 115
**A) Li Kurdistanê Hewldana Gerîlatiyê ya Destpêkê** ........ 117
**B) Di Kurdistanê De Ji 1980'yî Şûn De Rewşa Şer** ........ 120
**C) Li Kurdistanê Salên 1990'î û Şoreşa Vejînê** ........ 124
**D) Di Pêşveçûna Şer De Artêşbûna Jinê** ........ 131
**E) Di Pêvajoya Pêşketina Komploya Navnetewî De Rewşa Şer** 134
**F) Komploya Navnetewî û Pêngava 1'ê Hezîranê** ........ 139
Beşa Heftemîn ........ 147
**STRATEJIYA PARASTINA REWA** ........ 147
**Şerê Gel ê Şoreşgerî** ........ 157

**PÊŞGOTIN**

**Xwendekarên Hêja;**

Pirtûka bi navê **HEQÎQETA ŞER** a di destê we de, berhevkirina ders û semînerên ku hevalê Cemal (Murat Karayılan) li Akademiyên APOLLO yên leşkerî, ji bo fermandarên gerîlayên azadiya Kurdistanê dane, pêk tê.

Pirtûkxaneya dîroka şer a cîhanê bi gelek pirtûk û berhemên der barê mahiyeta şer û dîroka şer de dewlemend e. Her pirtûkek ji vana feydeyeke xwe ji bo têgihîştina hunera şer û pêşxistina rêbazên wê çêbûye. Lê divê em ji bîr nekin ku her pirtûkek ji vana, di bin bandora şert û mercên ku nivîskarê wê jiyayî de hatiye nivîsîn. Lewma hinek aliyên bi şer ve girêdayî girtibin dest, lêhûrbûn kiribin û gihîştibin hinek tespîtên bi nirx jî, hinek alî piştçav mane, yan jî ji nedîtî ve hatine û kêm mane. Pirtûka niha di destê we de, piştî lêkolîneke zanistî ya berfireh, lêhûrbûneke kûr û tecrûbeya şer a 34 salan ji bo hemû mijarên bi şer ve girêdayî ronak bike, bi awayekî giştî ji her alî ve hewldaneke nivîsandina rastiya şer e.

Destpêkê pênasekirina şer û di dîroka mirovahiyê de destpêka bikaranîna zorê û gihîştina pêvajoya şer digire dest. Yanî bi perspektîfeke felsefî û dîrokî şer tê pênasekirin. Di vê çarçoveyê de têkiliya şer û desthilatê, têkiliya şer a bi desthilata zilam re, têkiliya şer a bi hiqûq, kedxwarî û mijokdariyê re bi awayekî xurt radixe ber çavan. Ji aliyekî ve ku têkiliya şer a bi îdeolojî, siyaset û dîrokê re analîz dike, ji aliyê din ve jî di dîroka şaristaniyê de ji roja ku şer dest pê kirî û şûn de pêşketinên di rêbazên şer û hunera şer de çêbûne, stratejî û taktîkên şer bi mînakan tê vekirin û şîrovekirin. Bi taybetî di herikîna dîrokê de bi qasî rêbazên desthilatê bi pêş dikevin, dewlemend dibin, naskirina însan a ji teknolojiyê û pêşxistina wê ya teknolojiyê re bi pêş dikeve, ewqasî bandor li şer kiriye û hem şikil, hem jî di naveroka şer de guhertin çêkiriye. Ji dîroka kevin heya sedsala 20. teknolojiya herî pêşketî ya ketî mecala şer bi mînakan, bi berfirehî hatine vekirin. Her wiha di van 200 salên derbas bûyî de şerên mezin ên li cîhanê hatine meşandin û bandora wan a mayînde ya li ser dîroka mirovahiyê û parzemînan bûye, xistina wê ya bin mercekê heye. Kîjan stratejî, kîjan taktîk, kîjan teknolojî çawa hat bikaranîn? Kîjan îrade û zîhniyeta fermandariyê karî van şeran birêve bibe û bigihîne serkeftinê? Bi berfirehî li ser van xisûsan hatiye sekinandin.

Bêguman bi qasî şerên ku dewletan, desthilatan û hêzên hegemon li ser şaristaniyê meşandine, ewqasî jî li hemberî vê şerên heqî, edalet, azadî, civak û gelên bindest jî hatiye meşandin. Di vê pirtûkê de gelek tecrûbeyên şerên gelan û şoreşên wan ji aliyê stratejî, taktîk û rêbazan ve li ser lêhûrbûn çêbûye, encamên xurt ên derketîn hatine tespîtkirin.

Di sedsala 21. de şoreşa teknolojiyê di asta xwe ya herî bilind de ye. Mirov dikare bibêje, ne tenê her sal, her mehekê di teknolojiyê de gav tên avêtin. Ev yek bandora xwe li hemû mecalên jiyanê dike û herî zêde jî bandora xwe li ser rastiya şer dike. Hûn ê di vê pirtûkê de bandora teknolojiya modern li ser şiklê şer, li ser stratejî û taktîkên şer, li ser şêwazên şer bi şêwazekî balkêş, xurt û objektîf bibînin. Di vê sedsala nû de şer tenê ne bi çekan û bi kuştinê tê meşandin. Rêbaz û mecalên şer hîn berfireh bûne. Hûn ê vana jî wekî şerê psîkolojîk, şerê asîmetrîk, şerê sîber bi berfirehî di pirtûkê de bibînin.

Di dîroka gelê Kurdistanê de her demekê şer hebûye û însanê Kurd bi wêrekî, lehengî û şerkeriya xwe tê naskirin. Lê di dîroka Kurdan de her çendî li ser mijarên wekî teoriya

şerê Kurdan, rêbazê şerê Kurdan, stratejî û taktîkên wan sekinîn çêbûbe û hatibe lêkolîn jî, seresere û parçeyî hatiye kirin û nebûye mijara pirtûkên akademîk ên berfireh. Aliyekî vê pirtûkê yê hêja jî ew e ku, rastiya şer, mantiqê Kurdan ê şer û sedemên wan ên windakirina şer bi awayekî berfireh lêkolîn kiriye û riyên serkeftinê jî diyar kiriye. Hûn ê di vê pirtûkê de, di dibistana dîroka şer a Kurdan de analîzeke hêja û pir xurt bibînin.

Tê zanîn, şoreşa Kurdistanê ya bi pêşengiya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) û di ronakiya fikrê Rêber Apo de mohra xwe li 40 salên dawî yên dîroka Kurdistanê û herêma Rojhilata Navîn dayî, li hemberî hemû rêbazên şerê taybet ên qirêj û komkujiyên dagirkeran berxwedaneke lehengî û gav bi gav mezin bûyî raber kir. Di dîroka Kurdistanê de gelê Kurd cara ewil e 34 salan bênavber li ser bingeha xeta Parastina Rewa şerekî dijwar li hemberî dagirkerî û komkujiyan dimeşîne û kariye evqas salên dirêj li ber xwe bide. Cara yekê ye di dîroka Kurdan de şerekî wiha demdirêj ku dikare li hemberî hemû teknolojiya modern li ber xwe bide û nekeftina xwe îspat bike, tê meşandin. Bêguman sedemên vê yên felsefî, îdeolojîk, siyasî û civakî hene. Yek sedem jî, PKK'ê li ser bingeha ramanên Rêber Apo li Kurdistanê rêbazekî nû yê şer peyda kir û meşand. Cara ewil bû ku di dîroka Kurdan de rêbazê şerê klasîk ê bav û kalan hat derbaskirin, rêbazê şerekî modern hat destpêkirin û hat pêşxistin. Ev jî şerê gerîla û rastiya Şerê Gel ê Şoreşgerî ye. Gelek însan an jî lêkolîner dipirsin ku PKK'ê çawa kariye evqas salên dirêj li hemberî evqas teknolojiya modern û êrîşên dagirkeriya Tirk xwe ragire. Sira vê berxwedan û serkeftinê di hêla leşkerî de bi awayek berfireh di pirtûkê de hatiye vekirin. Tecrûbeya 34 salan tevî kêmasî û lewaziyên hatine jiyîn, bi aliyên xwe yên serkeftî û xurt jî radixe ber çavan.

Hem li Kurdistanê, hem jî li gelek herêmên ku nakokiyên civakî tê de hene tê gotin, "*Teknolojiya şer ewqas bi pêş ketiye û vana di destê dewletan de hene. Li hemberî vê teknolojiya şer a pêşketî êdî gelên bindest an jî beşên civakê yên bindest wekî sedsala 20'an nikarin şerekî berxwedanê bimeşînin. Ger şerekî berxwedanê bimeşînin jî, nikarin bi ser bikevin.*" Ferasetên wisa di sedsala bihurî de hatin nîqaşkirin, lê di heqîqeta şerê îro li Kurdistanê tê meşandin de, hûn ê di vê pirtûkê de jî bibînin ku ka gelên bindest û beşên civakê yên bindest li ser navê mirovahiyê, edalet û azadiyê dikarin li hemberî teknolojiya modern xwe li ser lingan ragirin, bi pêş bikevin, bigihin serkeftinê yan na? Sir û rêbaza vê, dîsa li ser bingeha paradîgmaya Neteweya Demokratîk nûbûna di xeta Şerê Gel ê Şoreşgerî de ye. Xeta Şerê Gel ê Şoreşgerî û rêbazên gerîlayê modern ên sedsala 21'an ji bo hemû gel û civakên bindest, ji bo hemû azadîxwazên cîhanê xizmeteke mezin a gerîlayên Kurdistanê ye. Tecrûbeya şerê gerîlayên Kurdistanê ku nekeftina xwe îspat kiriye, ji gelek tevgerên şoreşger, gel û civakên bindest re bûye hêvî û nimûne. Di vê hêlê de guhertin û nûbûna ku gerîlayên Kurdistanê di mahiyeta şerê gerîla de çêkirine û li hemberî teknolojiya modern bi îrade û afirîneriya însan çawa dikare li ber xwe bide û bigihe encamê hûn ê di vê pirtûkê de bi şiklekî balkêş û afirîner bibînin.

**Xwendevanên Hêja;**

Fermandarê giştî yê Hêzên Parastina Azadiya Kurdistanê hevalê Cemal (Murat Karayilan) ev pirtûk bi zimanekî xweş û bi uslûbek sade û rihet bilêv kiriye. Her gerîleyekî/e Kurdistanê û şervanekî/e azadiyê dikare têbigihe û encamên xurt jê derbixe. Ev berhem, di pêvajoya şerê berxwedana rûmetê ya ku gelê me li hemberî komkujiyan û şerê dagirkeriya Tirk dimeşîne de, dibe wekî perspektîf û klavûzeke esasî ku gerîlayên Kurdistanê xwe li ser vê bingehê nû bikin û binkeftina hemû planên dijminan misoger bikin. Her wiha ne tenê ji

bo gelê Kurdistanê, ji bo hemû tevgerên demokratîk, şoreşger û gelên bindest dibe çavkaniyeke hêja ku gelek ders jê bên derxistin. Ev pirtûka ku encama lêkolîneke akademîk, zanistî û lêhûrbûneke xurt a tecrûbeyên 34 salan ên gerîlayên Kurdistanê digire nav xwe, em bawer in hem wê feydeyeke xurt bide pêvajoya jinûve avakirina gerîlayên Kurdistanê, hem jî pirtûkxaneya dîroka şer a cîhanê bi berhemeke akademîk a hêja dewlemend bike.

Li ser vê bingehê, ji bo vê xebata wî ya bi nirx û watedar em hevalê Cemal sipas dikin. Em bawer in ev lêhûrbûna ji encama xwîna hezaran şehîdan pêk hatî, ev hişmendî û îradeya ku gerîlayên Kurdistanê raber dikin wê bibe bingeha serkeftina şoreşa Kurdistanê, azadiya gelê Kurdistanê û pêkhatina Şoreşa Rojhilata Navîn a Demokratîk.

**DR. BAHOZ ERDAL**

# DESTPÊK

Me berê, mijara parastina rewa li gorî nêzîkbûna me ya leşkerî ya paradîgmaya nû û bi taybetî jî li ser stratejiya parastina rewa digirt dest. Mijara şer çi ye? Em berê pir li ser vê nedisekinîn. Me hesab dikir ku, jixwe heval teoriya şer dizanin, ne hewce ye mirov ewqas fireh li ser şer raweste. Me bêhtir digot, parastina rewa di aliyê hevalan de tam nayê fêmkirin, a girîng mirov li ser wê kûr bibe û me bi vî şêwazî li ser parastina rewa kûrahî çêdikir û nîqaş dikir. Encex niha xuya dibe ku ev têrê nake. Ji ber vê yekê kêmasiyên eşkere çêdibin, em li ser vê mijarê nîqaş dikin. Em van nîqaş û tiştên tên gotin, li ser ruhê şehîdên qehreman, ji bo bîranîna wan pêşkêş dikin.

Pratîkê raber kir ku, der heqê şer û parastina rewa de kûrahî kêm e. Der barê mijarê de nîqaş çêbûn. Dema mirov li nîqaşan temaşe dike, hem hevalên ji qada HPG'ê, hem hevalên ji qada Ewropa, hem jî yên Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava hemû yek bi yek diaxivin. Di nîqaşan de diyar dibe ku, bi esasî xeta parastina rewa tetbîq nebûye. Encam wisa derdikeve. Di vir de jî diyar dibe ku, parastina rewa di aliyê hevalan de nehatiye fêmkirin.

Parastina rewa xetek e û divê ev xet wekî çandekê be. Ev pêk nehatiye. Der heqê şerê çekdarî de nêzîkbûna klasîk bêhtir li pêş e. Bi paradîgmayê ve girêdayî nêzîkbûna me ya leşkerî çi ye û em ê çawa şoreşê bikin? Derket holê ku der heqê vê yekê de kêmasî heye. Hem ji bo vê tespîtê, hem jî ji ber kêmahiyên di pratîkê de heyîn, raber dibe ku divê mirov vê mijarê bi şêwazekî din nîqaş bike. Lewre em dixwazin vê carê bi şêwazekî nû li ser mijara şer rawestin.

***Em mijara şer bi giştî wekî sê beşan digirin dest:***

**1-** Heqîqeta şer

**2-** Fermandarî

**3-** Taktîk

Mijara şer, bi esasî wisa sê beş in. Em ê van her sê mijaran li ser hev bigirin dest, lê divê em cuda cuda li ser van mijaran rawestin.

**Beşa yekemîn;** mijara şer e, ango em ê stratejiya şer çawa bigirin dest?

**Beşa duyemîn**; wekî kesê vî şerî bimeşîne fermandar, pêwîst e çawa be? Fermandar kî ye?

**Beşa sêyemîn**; ev stratejî wê çawa tetbîq bibe û taktîkên wê çi ne?

Esas ev ders sê mijar in û her sê mijar ji hev cuda ne. Em ê van her sê mijaran cuda cuda bigirin dest. Rêber Apo jî di parêznameya xwe ya dawî de ev mijar di bin sernavê "***Tevgera PKK'ê û Şerê Gel ê Şoreşgerî***" de vekiriye. Serokatî pir fireh li ser vê mijarê disekine. Esas, bêhtir li ser dîroka têkoşîna me disekine. Ji bo serdema nû jî, di beşa "***Sîstema Parastina Cewherî ya Neteweya Demokratîk***" de li ser disekine. Ya girîng, Serokatî jî ev mijar vekiriye û perspektîfên girîng bi pêş xistiye.

Hevalan parêznameyên Rêbertiyê yên berê xwendine. Wekî tê zanîn, Serokatî bingehê xeta parastina rewa û prensîbên Şaristaniya Demokratîk di parêznameya xwe ya ji bo Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa (DMME-AİHM), ya bi navê **"Ji Dewleta Rahîb a Sumer Ber bi Komara Gel ve"** de datîne. Prensîba parastinê ya şaristaniya demokratîk çi ye? Ev mijar di parêznameya Rêber Apo de heye.

Niha mijara girîng, em ê di vî şerî de çawa bi ser bikevin? Pirsgirêk ev e. Ne teorîk, bîzat di pratîkê de em ê çawa bi ser bikevin? Ji bo serkeftinê çi pêwîst e? Em li ser vê radiwestin.

Em vê mijarê ji bo vê digirin dest. Ev mijar zelal e, ango hedefa wê xuya ye ku em dixwazin bi ser kevin. Em dixwazin şêwazê gerîla yê serkeftî bigirin, şêwazê serkeftina serhildanê bigirin. Em ê vê yekê çawa bigirin? Pêwîst e kadro çawa be? Pêwîst e perspektîfa kadro, stratejiya kadro, taktîka kadro çawa be? Pêwîst e em plansaziya kadro çawa çêbikin û bixin pratîkê? Em li bersiva van pirsan digerin. Em vê mijarê ji bo vê nîqaş dikin. Ango ev ne wekî hinek mijarên din ên mucered (soyut) in. Ev ne wekî hinek mijarên ku, tenê agahiyê didin, ji bo mirov tê de serwext bibe, tê de kûr bibe. Rast e, ev mijar jî aliyê xwe yê ku agahiyê dide, aliyê xwe yê teorîk heye. Encex esas em ê sibe çi bikin? Ev mijar li ser vê ye. Meheke din em ê biçin pratîkê. Em ê di pratîkê de çawa bikin, çawa bigirin dest? Di vê der heqê de rewşa me çi ye? Mirov dikare li ser vê jî raweste.

Ya girîng, li gorî vê rewşê û li gorî atmosfera me, em ê vê pêvajoya şer çawa bigihînin encamê, çawa bi ser bixin? Hem di aliyê şerê parastina çekdarî de, hem jî di aliyê serhildanê de em ê çawa biçin encamê? Divê em bi awayekî zindî li ser van xalan nîqaş bikin. Bi awayek berfireh nîqaş û lêkolîn pêwîst e.

Ji bo dewletan, navendên wan ên thînk-tank, navendên fikir hene, zanîngehên wan hene; yê me jî, em neçar in bi vî awayî gişt bi hev re li ser van mijaran nîqaş bikin û fikir kûr bikin. Tabî tecrûbeyên me jî hene. Ne ku em ê hemû tiştî di hefteyekê de bikin. Lêhûrbûneke me ya diyar heye. Li ser vî esasî, divê em wana gişt li vê derê bifetilînin analîzên ku pirsgirêkên me zelal bike. Ji bo ku bi rastî em bikarin vê bikin perspektîf û vê çarçoveyê bixin pratîkê, em di aliyê pirsgirêkên xwe yên stratejiyê de, di pirsgirêkên xwe yên taktîk û fermande de, di aliyê pirsgirêkên xwe yên zîhniyetê de zelaliyê çêbikin.

Em hêvîdar in nîqaşên me wê ji vê yekê re xizmet bike û der heqê heqîqeta şer de bi hemû hevalan re zelaliyekê bi pêş bixe.

# Beşa Yekemîn:

# DERKETINA ŞÎDETÊ Û DÎROKA PARASTINÊ

## A) Di Civaka Xwezayî De Parastin û Derketina Şîdetê

Divê em destpêkê li ser mijara zor, şer û şîdetê bisekinin. Mirovatî kengî bi şîdetê re rû bi rû maye, yan jî kengî şîdet nas kiriye? Şîdet çawa girtiye dest? Şer çawa derketiye holê û şer çi ye? Şer ji bo çi tê kirin? Divê em destpêkê van mijaran zelal bikin.

Wekî hemû tiştî, di mijara şîdetê de jî divê mirov biçe civaka xwezayî. Ji ber heqîqeta mirovatiyê di wir de veşartî ye. Cardin tiştên di hundirê dîrokê de derketine holê, şekil girtine û heya roja îro hatine, esas bingehê wan di civaka xwezayî de ye. Ji bo mirov îro bikaribe bi danasîneke rast mijarekê pênase bike, divê mirov biçe civaka xwezayî. Di civaka xwezayî de mirov şîdet çawa girtiye dest? Ev pirs jî ji bo me girîng e. Esas hînbûn di wir de ye. Mirov dikare heqîqetê ji wir hîn bibe.

Di civaka xwezayî de li gorî zanista dîrokê, li gorî zanista arkeolojî, teolojî û mîtolojiyê di civaka xwezayî de şîdet, zor û şer nîn e. Şîdeta heyî ji bo parastinê ye. Mirov dikare bibêje xwe parastin heye. Ku mirov nav lê bike û jê re bibêje, "şîdet", ev şîdeta parastinê ye. Esas şîdet ji bo parastinê heye. Her wiha xwe parastin di cewherê hemû zindiyan de heye. Ev ne tenê ji bo mirov, di civaka xwezayî de bi şêwazekî xwezayî ji bo tevahî zindiyan parastin heye. Di wê demê de şîdet bi vî awayî hatiye bikaranîn.

Çawa? Di civaka xwezayî de sîstema dayiksalarî heye. Di sîstema dayiksalarî de parvekirin, parvekirina kar heye. Klan hene û di navbera klanan de parvekirina kar heye. Jin çi bike diyar e, zilam çi bike diyar e. Her qebîle tiştan kom dike, yan jî nêçîra ku dike têra wan dike. Ji ber wê demê nêçîr û komkirin heye. Ji bo jiyanê ev pêwîst in. Heman demê tiştê ji bo jiyanê pêwîst, parastin e. Her zindiyê ku parastina xwe tune, jixwe nikare hebûna xwe bidomîne.

Ji bo ku zindiyek hebûna xwe bidomîne hinek tiştên esasî hene. Ji vana yek; xwedî kirine, ango lazim e xwe xwedî bike (beslenme). Didu; ji bo cinsê xwe berdewam bibe zêdebûn (üreme) pêwîst e. Sisê; parastin pêwîst e. Çi însan dibe, çi heywan dibe, çi jî wekî xwezayî keskahî dibe, ji her cinseke zindî re ji bo ku nemire, tune nebe û bi hebûn be ev her sê tişt pêwîst in. Lewre vana wekî parçeyek ji jiyana xwezayî ne û ev mafekî xwezayî ye. Pêwîst e her cinsek xwe xwedî bike. Xwe xwedî kirin mafekî rewa ye. Jixwe ger xwe xwedî neke, nikare bi hebûn be. Lazim e zêde bibin. Ango divê têkiliya nêr û mê hebe, zêde bibin û xwe biparêzin. Ev ji bo hemû zindiyan pêwîst e. Ji bo heywan pêwîst e û ji bo hemû zindiyên di xwezayê de pêwîst e. Ji bo mirov jî wisa ye. Di encamê de ji bo her hebûna zindî ev pêwîst e.

Xala xwedîkirin û xwe zêdekirinê mijareke din e, lê di vir de rojeva me mijara parastinê ye. Nexwe parastin parçeyek ji hebûnên zindî ye. Ji ber ku zindiyek dema nikaribe xwe biparêze, nikare bi hebûn be jî. Mirovan xwe çawa parastiye? Mirovan xwe kiriye yek û bi vî awayî xwe parastine. Civakbûna mirov lewma di destpêka mirovatiyê de heye. Tenê yek na, klan bi kombûna mirovan pêk hatiye. Mirov dikare ji bo îro bibêje, rêxistin an jî civakîbûn e. Ev ji bo mirov pêwîst e.

Xala din, ji bo xwedîkirinê nêçîr û komkirin pêwîst e. Lê belê êrîşên heywanên hov hene. Ji bo heywanên di hundirê xwezayê de jî jiyan pêwîst e. Heywan nêçîrê dikin û dikarin mirov jî nêçîr bikin. Nimûne, şêr û piling. Li hemberî vana parastin pêwîst e. Li hemberî heywanên hov ên zirarê didin mirov, parastin pêwîst e.

Carina dibe ku klanek rastî klaneke din bê. Rast e, hevdû nakin kole, di kolekirinê de feydeya wan tune ye. Ev ne sîstematîk e, lê ji bo ku ji herêma xwe û cihê xwe derbixe, di klanê de li hemberî klaneke din xwe parastin heye. Encex şer pir bi pêş nakeve. Ji ber ku xwe diparêze, cihê xwe diparêze. Parastina klanê di vê çarçoveyê de ye. Her kes jixwe li cihê xwe ye, kes bi kesî re pir mijûl nabe û kes qesta kesî nake. Ji ber ku ger qestê bike, çi warîdateke (servet) wî tune ye. Rojane nêçîrê dike û li ser wê jiyana xwe didomîne. Tiştên nêçîr dike encex têra wî dike, ango zêde namîne. Lewre şerê mirov bi mirov re zêde nîn e. Nêzîkatiya ku hevdû bikujin, bi hevdû re şer bikin nîn e. Belkî li hev rast werin û zirar bidin hev. Ew jî zû diqede. Tê wê wateyê ku, ji bo klanek xwe li hemberî klana din biparêze, parastin jê re pêwîst e.

Li hemberî xwezayê ango li hemberî xeteriyên xwezayî yên wekî serma, germa, bahoz, zelzele, lehiyê, avê, agir û hwd. jî xwe parastin pêwîst e.

Di zanista mirov de şîdet cara yekemîn bi rêya xwe parastinê bi cih dibe. Wê çaxê mirov şîdetê tenê ji bo parastinê fêm dikin. Cuda wekî din fêm nakin. Yek jî, ji bo nêçîrê bike, hêdî hêdî amûrên wê bi pêş dixe. Berê kevirê tûj heye, dûvre gav bi gav maden tê dîtin. Ango madena sifir (bakır) dibînin û wê tûj dikin. Em ê paşê di beşa şer de vekin, lê amûrên nêçîrê, amûrên parastinê hêdî hêdî bi pêş dikevin. Encex tiştê misoger ev e ku, di jiyana civaka xwezayî de parastin heye; zor û şîdet tune ye. Şîdeta heyî, ji bo xwe parastinê bi kar tîne û wisa nas kiriye. Ev, refleksê xwe parastinê ye.

Ev tenê ne ji bo mirov, ji bo heywanan jî wisa ye. Mînak, heywan; her yek xwe bi rengekî diparêze. Heywan bi hêza xwe şer dikin û xwe diparêzin. Ji vî qismî re dibêjin, “heywanên dirende” (yırtıcı). Ev şêr e, piling e, gur e, keftar e û hwd. Heywanên bi vî awayî xwe bi hêza xwe ya şer diparêzin. Belkî hinek di warê bihêzbûnê de li ser hinekan re ne, lê xwe bi şer diparêzin. Tu dinêrî, hinek heywan hene ku hêza xwe ya şerkirinê nîn in, xwe bi rev û bezê diparêzin. Tenê dema xeteriyê dibînin, direvin. Ji bo wê jî heywanên wisa pir direvin, kes zû bi zû nagihe wana. Mirov ji bo bigihin wana xefkê datînin û bi wî rengî digihin wan. Mirov bi awayekî asayî nagihe wana. Nimûne, xezal wisa ne. Heywanên din zû bi zû nikarin bigihin wana. Heywan heye ku bi veşartinê xwe diparêze. Nimûne, mar xwe vedişêre.

Wekî din mirov dikare pir heywanan bihejmêre. Heywanên xwe vedişêrin, kunên wan di bin erdê de ne. Nimûne, sivorî xwe çawa diparêze? Diçe ser darê. Xwe parastina sivoriyê jî wisa ye. Xwe dike hundirê darê. Pisîk tê, li dorê difetile difetile, diçe ber deriyê wê rûdine, lê sivorî di cihê xwe de ye. Parastina sivorî jî wisa ye; ji kuna xwe dernakeve. Sivorî li hemberî pisîkê, li hemberî heywanên din, li hemberî mirov xwe dixe koka darê. Heman demê mişk jî wisa bi kunê xwe diparêze. Heywan heye ku rengê xwe bi ser erdê ve ye. Mesela, li ku jiyan bibe, rengê xwe li gorî wê derê ye. Mirov ku lê dinêre, ji ber rengê wê nabîne. Vana gişt bi xwezayî wisa ne. Nimûne, heywan heye ku kurkê wê heye, lewre dikare di berfê de, di sermayê de bijî.

Parastina xwezayê jî her wisa ye. Keskahî werga parastina xwe heye. Destpêkê ji bo jiyan bibe roj jê re lazim e. Tu dinêrî, dar heye ku li cihên wekî daristanên gur bilind dibe. Çima bilind dibe? Ji ber ku divê rojê bibîne. Bêyî rojê nikare bijî, ji bo wê bilind dibe. Ev wisa ye. Ya girîng, keskahî jî wisa ye. Tabî hinek keskahî temenê wan kin in, hinek keskahî demsalî ne. Encex di wana de jî zêdebûn (üreme) heye, tov heye. Keskahî werga xwe diparêze. Tenê ne keskahî, hemû zindiyên nebatî (bitki) xwe wisa diparêzin. Lê li hemberî sermayê heya derekê xwe diparêzin. Keskahiyên wisa demsalî ne, lê xwe diparêzin. Ev, hêza xwe ji rojê digirin. Av ku jê re lazim be, wê çaxê li ber avê çêdibe, li derek din çênabe. Keskahiyên ku jê re av lazim gişt li ber avê çêdibin, li derekî din çênabin. A girîng, ev gişt parastin in.

Bi kurtahî hevsengiya xwezayê werga hatiye sazkirin. Hevsengiya xwezayê li ser esasê parastinê hatiye çêkirin. Jiyan bi xwarin, zêdebûn û parastinê hatiye avakirin. Ev hevsengiyek e. Jixwe îro ku pirsgirêka ekolojiyê derketiye holê, sedema xwe ji xirakirina

hevsengiya di navbera xwezayê de digire. Nimûne, ji ber ev hevsengî xirab dibe, êdî jiyana mirov li vê cîhanê dikeve xeteriyê. Îro tê gotin ku, tebeqeya ozon kun dibe, dinya germ dibe, atmosfer tê guhertin. Çima? Ev hevsengî tê xirakirin lewma. Nexwe, di civaka xwezayî de çi heye? Di civaka xwezayî de her kes jiyan dibe û her kesekî/ê mafê xwe yê parastinê heye. Vî mafê xwe bi kar tîne û wisa jiyan dibe. Yê ku nikaribe vê pêk bîne, ew jiyan nabe. Mesela, yê nikaribe xwe xwedî bike jiyan nabe. Yê nikaribe zêde bibe jiyan nabe. Yê nikaribe xwe biparêze jiyan nabe.

Li gorî vê, tiştê em ji vir fêm bikin çi ye? Parastin ji bo jiyanê tiştekî pêwîst e. Ji bo her hebûneke zindî parastin pêwîst e. Di vê wateyê de parastin pîroz e. Wekî tê zanîn, fîlozofê Yûnanî Sokrates dibêje: "Parastina Xwe Bizane!" Ev ji vir derketiye. Eger mirov wekî kes, wekî netewe, wekî civak nikaribe xwe biparêze, mirov wê tune bibe.

Civaka xwezayî ku dûvre gav bi gav tê guhertin, tê de zordestî zêde dibe, şer bi pêş dikeve. Lewre yê nikaribe xwe biparêze, jixwe di bin lingan de diçe, diqede. Wekî tê zanîn, niha di dinyayê de hinek heywan hene ku, êdî cinsê wan diqede. Ji bo wê hinek saziyên cîhanî yên li wan xwedî derdikevin hene. Van saziyên cîhanî, ji bo cinsê heywanên wisa neqedin, dawiya wan neyê û wekî rengekî ji cîhanê jiyan bibin û hevsengiya ekolojîk xira nebe xebat dikin. Heta di asta navnetewî de, di nav Neteweyên Yekbûyî (BM) de fonên ji vê re cuda hatine veqetandin hene. Ev, bi taybetî li ser parastina van heywanan disekinin. Ji bo rengên xwezayê kêm nebin, an jî hevsengiya di nava zindiyan de xira nebe, xebat dikin.

Tabî însan ji nav van hemû zindiyan hebûnek cuda ye. Ya rastî însan heywanekî difikirê ye. Cudahiya xwe ji zindiyên din, fikirdariya xwe ye. Bi însan re axaftin, parvekirin, mejî, fikir û ziman bi pêş dikeve. Di însan de her ku ziman bi pêş dikeve, pê re mejî û raman jî bi pêş dikeve. Gav bi gav zanebûn bi pêş dikeve. Jixwe di jiyana mirov de Şoreşa Neolotîk wisa çêdibe. Şoreşa Neolotîk, Şoreşa Yekemîn a Mirov an jî Şoreşa Gund e. Pêşketina fikir mirov dibe wê qonaxê. Berhemên ku di hundirê jiyanê de afirandîn, pêşveçûna mirov di aliyê mejî, fikir, ziman û jiyanê de çêdike.

## B) Şîdet û Desthilatdarî

Pêşveçûna di aliyê jiyanê de destpêkê tenê nêçîr e. Dûvre komkirin çêdibe. Gelek caran tiştên kom dikin, li dûrî wan e. Neçar in dûr biçin, kom bikin û bînin cihê xwe. Mesela, hinek tişt hene, mirov ji bo wê dikeve rê û li cihên dûr kom dike. Belkî bi hezaran sal sere derbas dibin ku, bi mirov re fikir çêdibe ku ev tişt tovê xwe heye; dikarin vî tovî bibin û li cihekî din jî biçînin. Jin çandiniyê wisa dibîne.

Destpêkê jin çandiniyê dibîne. Her ku diçe kom dike, heman tiştê tîne û tê. Mesela, genim, ceh, giya û tiştên hwd. Fikrê ku, "Gelo mirov nikare vê li cem xwe jî bigihîne?" pêk tê. Ev aqil bi mirov re çêdibe û destpêkê di jin de bi pêş dikeve. Ev yek dibe bingehê pêkhatina şoreşa neolotîkê. Wê çaxê bi kombûna mirovan jîngeh çêdibin, li ber avan cih ango gund çêdibin. Her wisa li ser erdên ku tên avdan, cih û warê jiyanê çêdibin. Peyre mirov genim, giya û tiştên wisa tîne û li ber gundê xwe diçîne. Bi vê yekê dizane ku, ne hewce ye dûr here. Êdî fêr dibe ku ji bo çandinî baş bibe, divê dora wê paqij bike. Cot jî wisa bi pêş dikeve. Her yek ji vana bi sedsalan dem sere dibore, encex ev aqil bi mirov re bi pêş dikeve ku, lazim e cot bike, dora wê paqij bike ji bo ew şînatî lê peyda bibe û xurt bibe. Ango şoreşa neolotîkê li ser vê bi pêş dikeve.

Şoreşa Neolotîkê, di jiyana mirovatiyê de şoreşa yekemîn e. Wekî tê zanîn, Rêber Apo di cîhanê de du şoreşan wekî şoreşên esasî dibîne. Yek, wekî şoreşa yekemîn Şoreşa Neolotîk e; ya duyemîn, Şoreşa Sanayî ye. Şoreşa sanayî, sala 1850'yan li Ewropa pêk tê. Di sedsala 18. de bi şêwazê zenaetkarî bingeh bi pêş dikeve, kapîtalîzm wisa xwe ava dike û di sedsala

19. de makîneyên bûxarê çêdibin. Êdî ne bi hêza însan, bi aqilê însan û bi hêza makîneyan pêşveçûn çêdibe. Ev şoreşa sanayiyê temam dike.

Şoreşa yekemîn li Rojhilata Navîn Mezopotamya, li qûntarên çiyayê Zagros û Torosê pêk tê. Şoreşa duyemîn, bi berhemên vê şoreşa yekemîn ango bi berhema şoreşa neolotîkê pêk tê. Şoreşa Neolotîk bi demê re li Misir, Lubnan, Hindistan û Çînê belav dibe, Hîlala Zêrîn çêdibe. Dûvre derbasî milê Yûnan, piştî wê Roma û herî dawiyê derbasî Ewropa, Fransa û Almanya dibe. Heta pir dereng digihe Almanya. Ji bo wê Almanya heta demek dirêj hov dimîne. Ango di dema Roma de Cermen (Alman) hîn bi şêwazekî hovîtî jiyan dikin, gelek caran êrîşî ser berhemên Romayê dikin, nizanin bi kar bînin û tenê dişewitînin. Cermenî dereng fêrî berhemên Şoreşa Neolotîk an jî yên şaristaniyê dibin. Ev pêl hêdî hêdî belav dibe.

Çavkaniya berhemên mirovatiyê li Mezopotamya ango li Kurdistanê ye. Wekî tê zanîn, li gelek cihên Kurdistanê yên wekî Serêkaniyê, Ruha, Amed, Mêrdîn û hwd. çanda Til-Xelef bi pêş dikeve. Di Kurdistanê de ev dibe bingehê Şoreşa Neolotîkê. Hinek arkeologan li milê di navbera Ruha û Wêranşarê de, ango li Gobeklîtepe ev du-sê sal in hinek berhemên dîrokî dîtine. Berî vê çend hefteyan jî di çapemeniyê de li ser nîqaş çêbû. Berhemên şaristaniyê yên li wir derketîn, berî vê 12000 salan tiştên pir nû bûn. Berhemên ku Şoreşa Neolotîkê berî vê 12000 salan afirandîn, sîstema ava kirî, mîtolojiya wê çaxê bi pêş ketî wana gişt niha di wan lêkolînên arkeolojîk ên li Gobeklîtepe de derdikevin holê. Mirov ji wan eseran pir tiştên nû hîn dibe. Jixwe digotin ku, “Tiştên li Gobeklîtepe derdikevin, diyar dike ku pêwîst e dîrok ji nû ve were nivîsîn.” Di wê astê de tiştên balkêş hene.

Nexwe Mezopotamya, bi vî awayî ji bo Şoreşa Neolotîkê dayiktî kiriye û berhemên Şoreşa Neolotîkê îro jî her ku tên zanîn, mirov ji wana fêrî tiştên nû dibe. Mirov fêrî xwe, fêrî heqîqeta xwe dibe.

Piştî ku pêvajoya Şoreşa Neolotîkê werga bi pêş dikeve gund ava dibe, çandinî çêdibe, madena sifir (bakır) û krom tê dîtin. Berê kevir bi kar dianîn; paşê dibînin ku madena sifir heye, hîn baştir şekil digire, tûj dibe û ne wekî kevir e. Madena sifir baştir şekil digire û ji bo wan dibe wekî çek. Jixwe Şoreşa Neolotîk, di dîroka mirovatiyê de bingehê şoreşa çandiniyê û şoreşa gund e. Ev çi çêdike? Di zîhnê mirov de pêşveçûnê çêdike. Ji bo ku mirov çandiniyê bike, êdî halet (saban) îcad dikin, amûrên ku pê cot bikin bi pêş dixin. Dema giyayekî ji cihekî tînin û nêzî xwe diçînin, belkî bi sedsalan, bi hezar salan fêrî vê dibin ku, pêwîst e cihê wê paqij bikin. Werga cot bi pêş dikeve. Ev di aliyê pêşketina zîhnê mirov de dibe qonaxeke nû.

Piştre destar, tekerlekê ku difetile peyda dibe. Peydakirina destar û tekerlekê di jiyana mirov de dibe qonaxeke hîn li pêş. Bi wî awayî pir tişt tên afirandin û mantiqê tiştên difetile bi pêş dikeve.

Di dîroka mirovatiyê de pêşketineke din jî, kedîkirina hesp e. Berê hesp bi hev re kerî bi kerî digeriyan. Însanan li pêşiya wana xefk vedidan, hesp li zinaran diqelibandin û dikuştin, dixwarin û li ser wana jiyan dibûn. Dûvre mirov fêr dibin ku, dikarin hespan kedî bikin. Pir behremendiyên vê jî hene. Mesela, mirov dikare bi hesp bilez biçe cihên dûr. Ango dîtina hesp jî, di aliyê hizrê mirov de qonaxeke nû çêdike. Lewre heta niha li gorî hinek baweriyan, hesp wekî hebûneke pîroz tê zanîn. Ji ber ku bi heqîqî jî hesp di ber pêşveçûna mirov de xwedan ked e. Roleke wê heye. Piştî hesp tê kedîkirin, hem bi wê tişt tên kişandin, hem jî mirov bi hesp derfetên çûyîna mesafeyên dûr bi dest dixe. Tabî dûvre hesp di şer de tê bikaranîn. Em ê paşê cuda li ser vê jî bisekinin.

Di Şoreşa Neolotîkê de pêşketina van amûran bi xwe re berhema zêde çêdike. Ango warîdata zêde çêdibe. Mesela, li cihekî 10 kes dişixulin; vana têra 30 kesan warîdat çêdikin. Li aliyê din, di sîstema civaka xwezayî de wekhevî heye. Tê de her kes wekhev e, parvekirin wekhev e. Cudahiya jin û zilam nîn e. Çîn (sınıf) jixwe nîn e. Feqîr û dewlemend nîn e, di

navbera mirovan de cudakarî nîn e. Serdest û bindest nîn e. Di aliyê baweriyê de jî di mîtolojiyê de totemtî heye. Ev wekheviyê esas digire. Tê de serdestî û bindestî nîn e. Di warê baweriyê de jî wisa ye.

## C) Zilam û Şîdet

Sîstema civaka xwezayî bi xwe re hêdî hêdî parvekirina kar bi pêş dixe û li gorî vê zilam nêçîrê dike. Zilam di nêçîrê de fêrî qurnaziyê û taktîkan dibe. Çawa xefk çêbike, çawa bixîne? Zilam fêrî van taktîkan dibe. Ji ber ku nêçîr bi vana tê kirin. Yek jî, di zilam de hinek hêza lêxistinê bi pêş dikeve. Zilam, amûrên afirandî bi kar tîne. Dema ji nêçîrvaniyê derbasî çandiniyê dibe zilam hinek din bihêz e û haleta cotkirinê zêdetir zilam bi kar tîne. Zilam ji wir jî hêz digire. Ev yek bi demê re, di encama hewldana sedsalan de pêk tê. Ji bo wê bi zilam re bihêzbûn, qurnazî, hîlekarî bi pêş dikeve. Bi vî awayî zilam dixwaze hevsengiya di navbera civakê de heyî, di aliyê xwe de bifetilîne. Zilam dizane şîdetê bi kar bîne. Şîdeta ji bo jiyanê, ji bo parastinê û ji bo nêçîrê dizane. Zilam, şîdeta ku ji bo parastinê fêr bûyî, ji bo xwe dike mezinbûnek û vê mezinbûna xwe destpêkê li ser jinê bi kar tîne.

Di dema dayiksalariyê de mirov nebêje jin serdest e, lê nîzamek, hevsengiyek heye. Encex di dema dayiksalarî de jin pêşeng e. Di nav qebîleyê de kesê ku pê dişêwirin, jin e. Kesê ku rê nîşan dide jin e, yê parve dike jî dîsa jin e, ango dayik e. Paşê di navbera jin û zilam de têkoşîn bi pêş dikeve. Destpêkê wekî hevsengiyekê çêdikin. Di mîtolojiyê de şerê di navbera jin û zilam de di şexsê Enkî û Înana de tê ziman. Qanûnên civakê hene û ji wana re dibêjin “Me”yên me. Zilam vê nade ber çavan. Înana dibêje, “ez ‘Me’yên xwe dixwazim.” Ango dibêje, em qanûnên xwe dixwazin. Di têkoşîna navbera wan de çêbûyî, destpêkê hinekî lihevhatin (uzlaşma) çêdibe. Lê ev ji berhema zêde ne qut e. Warîdat zêde dibe. Gav bi gav bingehê rahîpbûnê tê danîn.

Ev pêşveçûn destpêkê li ku jiyan dibe? Ne li navenda Şoreşa Neolotîkê, li jêra wê jiyan dibe. Şoreşa Neolotîkê destpêkê li jora Mezopotamya ango li qûntarên Zagros û Torosê bi pêş dikeve û heya Basra, heya cihê ku her du çemên Dîcle û Firat digihin hev, diçe. Li jêra wê jî heye. Jixwe wê demê Mezopotamya Jêr û Mezopotamya Jor heye. Dibe ku ji ber ev der deşt in, hinek feydeya vê jî tê de heye. Em vê tam nizanin, lê dibe ku li cihê her du çem digihin hev dewlemendî heye. Ew der jî Iraqa roja îro ye. Çanda Sumer, sîstema Sumer, aqilê Sumer û rahîbên Sumer bêhtir li wir bi pêş dikevin. Li wê derê di çarçoveya van pêşveçûnan de bilindbûna zilamê Sumer pêk tê. Şerê Enkî û Înana yê di mîtolojiyê de werga diqewime.

Ya girîng, zilam bi qurnazî, bi fen û dolaban destpêkê dibêje, “Em li hev hatin.” Wê çaxê baweriya pir-xwedayî heye. Di totemîzmê de her qebîleyek baweriya xwe bi tiştekî tîne. Li gorî baweriya wê demê, hêdî hêdî rahîbên zilam di civakê de serdestiya xwe bi pêş dixin û dibêjin, “Li jor Xwedê heye, li jêr jî wekî nûnerê Xwedê rahîb heye.” Sîstema rahîb bi vî awayî tê pêşxistin. “EN” tê wateya jor , “KÎ” jî tê wateya jêr. Enkî dibêje: “Ez nûnerê jêr û jor im.” Xwe werga pênase dike. Wê çaxê dibêje, “Hem jin, hem jî zilam ez nûnerê hemûya me.” Ji ber ku Enkî jor û jêr e.

Enkî, bi van fen û dolaban destpêkê Xwedawend Înana hinekî mijûl dike, wekî ku li hev tên dike; dûvre jî zilam gav bi gav desthilata xwe îlan dike. Bi vî awayî di sîstema Sumeran de rahîb serdest dibe. Ev yek bi çi pêk tê? Bi şîdetê pêk tê. Ji ber zilamê ku werga hîn di dîrokê de bi nêçîrê, piştre bi cot hêz girtî û qurnazî ango zekaya analîtîk pê re bi pêş ketî, hewl dide xwe li ser civakê bike desthilat. Berê digotin ku mirovê zekî, kesê herî zana, kesê herî zêde difikire, kesê herî xurt di encamê de kesê herî xwe dike serdest e. Serdestiya zilam wisa bi pêş dikeve. Li gorî mîtolojiya wê demê Mardûk êdî xwe serdest dike û hevpeymana di navbera jin û zilam de radike. Her wiha xwedawend Tîamat werga dixîne.

Em niha çima vê îzah dikin? Esas ev ne mijara me ye. Encex girêdayî mijara parastina rewa, şîdeta ku tenê ji bo jiyan û parastina rewa dihat bikaranîn, çawa fetilî û li dijî mirov hat bikaranîn? Ji bo çi êdî şîdet ne ji bo parastinê, çima ji bo desthilatdariyê hat bikaranîn? Ji bo têgihîştina vê ev xal girîng in.

Zilam an jî rahîb destpêkê xurtbûna xwe li ser jinê zivirand şîdetê û şîdet kir bingehê desthilatdariya xwe. Zilamê serdest li gel desthilatdariyê, mijokdariyê jî dike. Ango zextê dimeşîne. Şîdet, di jiyana mirov de yekem car bi vî şeklî karakter diguhere. Heya wê çaxê karaktera şîdetê tenê ji bo parastina jiyanê ye, ji bo domandina hebûna xwe ye. Lê belê bi serdestiya zilam re ev dibe bingeh an jî dibe amûra desthilatê. Zilam ji bo hakim bibe şîdetê bi kar tîne û desthilatdariya xwe destpêkê li ser jinê ava dike. Lewre mirov dikare bibêje, şîdet destpêkê di aliyê zilam de li hemberî jinê hatiye bikaranîn.

Şîdet, wekî şîdeta zilam e. Heya roja îro jî ku tê gotin "şîdet", zilam tê bîra mirov. Ev, bingehê xwe ji vê rastiyê digire. Ne ku jinê şîdet qet bi kar neaniye, lê destpêk wisa ye. Heya wê çaxê şîdet ji bo xwe parastinê heye, di çarçoveya parastina rewa de heye, ji bo parastina hevsengiya jiyanê heye. Lê belê bi pêşketina desthilatdariya zilam re şîdet, ji bo cinsê jin bindest be û zilam serdest be heye. Şîdet, bi vî awayî êdî ji bo desthilatdarî û mijokdariyê tê bikaranîn. Karakter guhertin bi vî awayî pêk tê.

Rahîb, tenê bi wê namîne. Çawa ku cinsê jin dixe û hevsengî xira dibe, serdest û bindest çêdibe. Zilam serdest dibe, jin bindest dibe. Tabî ev bi hêsanî çênabe; bi gelek şerên mîtolojîk, îdeolojîk û civakî çêdibe. Li gel vê, desthilatdariya zilam a herî li pêş ji cinsê xwe jî pêwîstî bi xebatkaran dibîne. Zilamê serdest ê ku şîdetê bi kar tîne, bi rêya şîdetê ji qebîleyeke din însanan dîl digire, tîne û ji bo xwe dide şixulandin. Di vê rewşê de zilamê serdest dibe efendî, yê dîl girtî jî dibe kole. Wisa sîstema koledariyê dest pê dike. Jin tê kolekirin, li kêleka wê zilamê serdest zilam jî dike kole. Sîstem wisa dest pê dike.

## D) Şîdet, Dewlet û Hiqûq

Zilamê serdest, tenê ne jinê dike kole û li ser jinê desthilatdariyê dimeşîne. Destpêkê ji qebîleyên din hemû jin û zilaman bi hev re, bi hikmê şîdetê digire û dike kole. Şîdet, wê çaxê dibe amûra ku însanan bindest bike, însanan bike kole û keda însanan bimije. Wê demê însan bi qamçiyan têne şixulandin. Bi wan însanên hatine kolekirin cot tê kirin. Hê jî fêr nebûne ku heywanan bixin nav kar. Haleta cot bi însanan didan kişandin. Werga gav bi gav bingehê sîstema koledarî û çînayetiyê saz dibe. Çîna jin, çîna kole ava dibe. Jin kole ye; jixwe zilam jî werga dibe kole. Di bin vê yekê de şîdet heye. Ev yek dibe bingehê hilweşandina hevsengiya di navbera jin û zilam de.

Piştî wê, desthilatdariya xwedan kole saz dibe. Êdî zilamê serdest li gel koleyên di destê xwe de çek jî bi kar tîne. Li ser keda koleyan dewlemend dibe. Embar çêdibin û bi hezaran ton warîdat di destê hinek kesan de kom dibin. Serkêşiya vê destpêkê rahîb dikin. Ev dibe bingehê dewletê. Dewlet, di jiyana mirovatiyê de wisa dikeve rojevê.

Serokatî di parêznameyên xwe yên DMME'yê de, ango di pirtûka bi navê "Ji Dewleta Rahîb a Sumer Ber Bi Komara Gel Ve" de vê rastiyê berfireh îzah dike. Rahîbên Sumer, destpêkê xwe digihînin sîstema dewleta rahîb. Ji bo desthilatdariya zilam li ser jinê mayînde bibe, ji bo desthilatdariya xwedî kole mayînde bibe û bibe sîstem, destpêkê felsefeya wê ango mîtolojiya wê saz dikin. Ji bo gotinên wekî "Fermana jor e, fermana Xwedê ye; rahîb jî van fermanan li jêr pêk tînin" rahîb îzaha mîtolojîk datînin. Bingehê wê yê îdeolojîk wisa ava dikin. Dûvre hiqûqa wê çêdikin; ango her kesê kole lazim e koletiya xwe bike. Ji bo kole û kesê xwedan kole hinek maf tên destnîşankirin. Bi vî awayî hiqûq pêk tê. Ango hiqûqa serdestî û bindestiyê derdikeve holê.

Hiqûq, yasayên serdestî û bindestiyê ne; exlaq jî bingehê civaka xwezayî ye. Di vê wateyê de ya ku divê mirov esas bigire, exlaqê civaka xwezayî ye. Di exlaqê civaka xwezayî de polîtîkbûna heyî polîtîkbûna xwezayî ye, hevsengiya civaka xwezayî ye. Exlaqê polîtîk li ser wî esasî pêk tê. Lê belê zilamê serdest paşê polîtîkbûnê diguhere. Ew, polîtîkayê ji bo desthilatê dike. Ev desthilat diçe heta digihe asta dewletê û hiqûqê jî ji bo parastina dewletê û parastina sîstema serdestî û bindestiyê saz dike. Çîroka vê ya di hundirê dîrokê de bi vî şêwazî bi pêş dikeve.

Wê çaxê çi çêdibe? Zilamê serdest şîdetê ji bo talanê, mijokdariyê û hegemonyayê dimeşîne. Ev şîdet, bi xwe re desthilatbûnê tîne. Desthilatdar, ji bo mayînde bibe, dibe dewlet ango dewletê ava dike. Mirov dikare bibêje, dema şîdet di civaka xwezayî de karakter guhert û zilamê qurnaz û desthilatparêz bû serdest destpêkê jin xist, dûvre zilam kir kole û bi vî awayî şîdet bi kar anî, xwe kir desthilat û sîstema dewletê ava kir. Nexwe dewlet esasê xwe şîdet e.

Zilamê serdest zagona dewletê, hiqûqa dewletê saz kir, zext û şîdet rewa kir. Ango rewa kir ku dema kole bireve, divê kole were kuştin, were qamçîkirin. Ji bo ku kole qasî têrê dike bişixule, rewa kir ku xwediyê kole dikare lêdanê li kole bike. Ango ev kir hiqûq. Hiqûqa sîstema koletiyê ava kir. Dewlet wisa ava bû. Encex ji bo ku ev sîstem li derve jî were pêşxistin, her ku şîdet dibe amûra mijokdariyê, desthilatdarî jî xwe birêxistin dike. Ev birêxistinbûn gav bi gav dibe dewlet.

## E) Şîdet û Artêş

Dewlet çi ye? Dewlet artêş e. Bala xwe bidinê; niha jî dema tê gotin "dewlet", destpêkê artêş tê bîra mirov. Ya rastî heqîqet jî wisa ye. Dewlet esas artêş e. Ji ber ku destpêkê leşker dibe dewlet. Jixwe dewlet leşker ava dike û leşker hêza esasî ya dewletê ye û bingehê dewletê ye. Ji ber ku leşker birêxistinkirina şîdetê ye. Hêzên leşkerî hêza şîdetê bi kar tînin, dewlet jî li ser hîmê şîdetê ava dibe. Ji bo vê mirov dikare bibêje, dewlet li ser sîstema şîdetê saz dibe.

Şîdeta ku esas însan diparast, di parastina pîroz de dihat bikaranîn, bi vî awayî fetilî û bû amûra mijokdarî, qetlîam, kuştin û kolekirina însan. Ev yek dîsa di Sumeran de, bi taybetî ku xanedana Akad tê ser desthilatê jiyan dibe. Tê zanîn ku, di wir de yekem car Sargon împaratoriyê bi pêş dixe û Sargon dibe împarator. Sargon, vê sîstemê tenê ne di hundirê ehlê Sumeran de bi pêş dixe. Hinek qebîleyan dike bindest û kole. Cardin jinê bindest dike. Jixwe rêxistina şîdetê heye. Sîstem û rêxistina şîdetê artêş e. Ji ber vê artêş dibe esasê dewletê. Sargon wê artêşê mezin dike û bi wê artêşê jî seferên ji bo derve li dar dixe. Bi vî awayî yekem car dagirkerî û împaratoriya emperyal bi pêş dikeve. Ango împaratoriya emperyal û dagirkirina welatên dûr di dema Sargon de bi pêş dikeve. Lewre Împaratoriya Sumer di bin pêşengtiya xanedana Akad de mezin dibe. Bi vî awayî şîdet tenê di hundirê Sumer de namîne; pêl bi pêl belav dibe. Diçe ku derê, li wir civaka xwezayî radike, kole çêdike. Jin dike koleya zilam, zilam jî dike koleyê xwe. Împaratoriya koledar destpêkê wisa saz dibe. Dûvre împaratoriyên din ava dibin. Li heman cihî Împaratoriya Babîl ava dibe. Piştre Împaratoriya Asûr saz dibe. Sîstema koledariyê werga belav dibe.

Di vir de tiştê ku em fêm bikin; şîdet bi vî awayî karakter diguherîne û di destê desthilatdariya zilam de dibe amûra ku pê dewletê ava bike. Dûvre ev dibe amûra ku pê gelek civakan bike kole, koletiyê bi pêş bixe û sîstema xwe hakim bike. Şer wisa derdikeve holê. Ango ev şer e.

# Beşa Duyemîn:

# DÎROKA ŞER

## A) Ji Şîdetê Avabûna Şer

Dema şîdet bisîstem bû, birêxistin bû û artêş ava bû, ev êdî çû ser kesên derveyî xwe, ango êrîşî însanên derveyî xwe kir. Ji bo însanên derveyî xwe bike kole, yan jî axa wan bixe bin destê xwe şer çêdibin. Ango şer, di jiyana însan de wisa derketiye holê. Ji bo împaratoriyê, ji bo dagiriyê, ji bo mijokdariyê, ji bo talanê, ji bo bindestkirinê artêşên koledar êrîşî ser civakên hem di hundirê xwe de, hem jî yên derveyî xwe dikin. Bi vî awayî şer derdikeve holê û mirov fêrî şerên bi sîstem dibin. Şerê bi sîstem, destpêkê di navbera dewleta împarator û yên xwe li hemberî wê diparêzin de tê jiyîn. Wisa çîna serdest û çîna bindest, gelê serdest û gelê bindest ava bûn. Êdî li şûna civaka xwezayî, civaka çînayetî ava bû. Li şûna wekheviya çand û gelan, gelên serdest û bindest çêbûn. Êdî serdema şerê navbera çînayetî, împaratorî û gelan bi pêş ket.

Nexwe du babetên şer hene. Babetek, şerê desthilatdariyê, şerê dagiriyê ye û ji bo armancên emperyal e. Babeta din, li hemberî êrîşkarî û zordestiya desthilatdaran şerê xwe parastinê ye. Ew jî şer e. Şerê xwe parastinê ev e. Ango di yekê de destdirêjî heye, êrîş heye; di yekê de jî xwe parastin heye. Divê mirov derketina şer wisa fêm bike.

Tevahî şer ne wisa ne. Mesela, li cihekî împaratoriyek koledar ava bûye, li cihekî din yekî din heye. Jixwe împaratorî carina parçe dibin. Nimûne, Împaratoriya Misir ava dibe; dûvre li Atîna împaratorî pêş dikeve; dûvre Împaratoriya Pers; paşê jî Împaratoriya Med ava dibe. Welhasil ev împaratoriyên koledar jî bi hev re şer dikin. Ango şerê di navbera artêşan de heye. Ew jî şer e û her du jî şerên li ser desthilatê ne. Vana şerên di navbera artêşan de ne. Ji bo li ser hev bibin desthilat, ango ji bo desthilatdariya hev bişkînin û axa hevdû talan bikin şer dikin.

Li aliyê din, şerê van împaratoriyan bi gelên civaka xwezayî re heye. Civaka xwezayî elbet wekî xwe namîne. Dinêre ku împaratoriyên pir zordest ava bûne, di şer de pir pêşveçûn çêbûne û amûrên şer bi pêş ketine, ew jî xwe birêxistin dikin. Jixwe ne wekî dewlet; nimûne li Kurdistanê konfederasyona eşîran saz dibe. Konfederasyon ji vir derdikeve; ji bo li hemberî êrîşên împaratoriyên mezin xwe biparêzin, destpêkê di navbera klanan de, paşê bi pêşketina eşîran re di navbera eşîr û klanan de konfederasyon bi pêş dikeve. Konfederasyon wekî modeleke dewletê derdikeve holê. Ne dewlet e, lê ji bo li hemberî dewletê piştevaniya hev bikin, bi şêwazekî xwezayî wekî pêwîstiyekê bi pêş dikeve. Li hemberî wan împaratoriyên mezin ji bo piştevaniya hev bikin, li hemberî êrîşên artêşên mezin xwe biparêzin, eşîr û klan pêwîstî dibînin hevdû bigirin. Konfederasyon wisa derdikeve holê.

### 1- Pêşveçûna Zanistê û Pêşketina Şer

Di jiyana mirovan de hemû tişt wekî pêwîstî peyda dibin û tên afirandin. Her tiştê ku pêwîstiya mirov pê çêdibe, ew ketiye rojevê. Ji ber çêbûna zordestî û desthilatdariyê, pêwîstî bi hevgirtinê jî çêdibe. Împaratoriyên koledar tim pêwîstî dibînin xwe mezin bikin. A wan jî pêwîstiyek e. Encex pêwîstî bi civakîbûnê, bi pêşketina civaka xwezayî heye. Ango hemû tişt wekî pêwîstî derketine holê. Nimûne, em bêjin zanistî. Zanistî, destpêkê li Sumeran bi pêş ketiye, paşê Babîl hinek din bi pêş xistiye. Tabî Babîl berdewamiya Sumeran e.

Zanistî çawa bi pêş dikeve? Ne ku hinek kes rûdinin û dibêjin, em zanistê bi pêş bixin, ka ezman çawa ye, em vê fêm bikin, an jî ka hesabê bîrkariyê (matematik) çawa tê kirin? Destpêkê kes wisa nefikiriye. Zanistî wekî pêwîstiyekê bi pêş ketiye. Çawa? Mesela, zîgûrat hene. Di zîgûratan de bi tonan zexîre tê depokirin. Ji vê re hesab lazim e. Her depoyek dikare çiqas genim hilîne? Ji bo zîgûrat were avakirin destpêkê çiqas kevir lazim e? Ji ber di deştê de ew kevir nîn in, wan keviran hemû ji dûr tînin. Ji bo çêkirina zîgûratê çiqas kevir lazim in? Mirov mecbûr dimînin vê hesabê bikin. Ew kevir hinek çargoşe ne, hinek sêgoşe ne û hwd. Gişt werga peyda dibin.

Destpêkê li ser gotûbêja avakirina zîgûratê hesabê geometrî bi pêş dikeve. Ango zanebûna geometrî wisa çêdibe. Piştre hesabkirina avahiyan, hesabkirina zexîre û koleyan tê çêkirin. Hesabkirin wekî pêwîstiyekê pêk tê. Ji ber ku rahîbên di zîgûratê de vê yekê dizanin, ji wana re dibêjin rahîb hemû tiştî dizanin. Halbûkî rahîb hemû tiştan îdare dikin, lê ew bi xwe fêr dibin. Rahîb hesaban dizanin, fêrî zanista matematîkê dibin. Wisa zanista matematîkê li gel wan bi pêş dikeve.

Ji wê şûn de, çandiniyê wê kengî bikin, kengî nekin; kengî amadekariyên xwe ji bo zivistanê bikin? Ji bo fêrî vana bibe, mirov mecbûr dimîne bi astronomiyê re mijûl bibe. Mirov dixwazin ferqa di navbera zivistan, havîn, payîz û biharê de ji hev derxin ku, kengî çandiniyê bikin, kengî kom bikin û wê kengî baran were. Ev mecbûriyetek e. Ji bo vê, tevgera asîman, stêrk, roj, heyv hemû dibin rojeva mirovan. Li ser vê şopandin û zanebûn bi pêş dikeve. Nimûne, mirovan li deştê çandinî kiriye. Belkî bi hezaran donim û hektar çandine. Wê vê kengî kom bike? Eger vê nizanibe wê baran, berf were û tiştê çandî di bin de bimîne. Lewma mecbûr dimîne ku rewşa ba-hewayê hîn bibe. Divê fêr bibe ku ji jor de, ji asîman ba yan jî baran tê. Wê çaxê divê bielime ku kengî wê çi were. Astronomî werga derdikeve holê. Demsal û meh wisa dikeve zanebûna însanan.

Bingehê zanista roja îro ku dinya li ser ava bûye, ji qonaxa civaka Şoreşa Neolotîk ku derbasî sîstema koledariyê dibe, di civaka xwezayî de wekî pêwîstiyeke civakê pêk hatiye û bingehê wê hatiye danîn. Şer jî bi heman awayî derketiye holê. Tabî şer ji nişka ve dernakeve. Di dîroka şer de pêşketina amûr an jî bi navê îro em jê re dibêjin “teknîk” an jî “çek” pir girîng e. Îro jî wisa ye. Divê em bi kûrahî di ferqa vê heqîqetê de bin.

Di dema koledariyê de madena sifir û krom heye. Encex her çendî tam pêşketî nebe jî, wekî teknîka şer êdî şûr û piştî wê rim (mızrak) tê îcatkirin. Pêşketina rim di şer de ferqeke mezin çêdike. Heya wê çaxê ji ber şûr dihat bikaranîn, lazim bû mirov nêzî hev bibûna û singe sing şer bikirana. Lê mirovan rim ji dûr ve diavêjin hev. Destpêkê pêşketina rim di şer de ferqeke mezin çêdike. Dûvre mirov pê difikirin ku, mirov nikare dûr biavêje. Dema bi dest diavêje 50 an jî 100 metreyan diçe. Paşê însan li ser difikire ku mirov çawa dikare hîn dûrtir bavêje? Gav bi gav tîr û kevan tê îcatkirin. Pêşketina tîr û kevanê di şer de wekî qonaxekê ye. Ango ne ku însan bên nêzî hev û singe sing li hev bixin; ji dûr ve jî dikarin rim û tîr-kevan bavêjin hevdû.

Pêşketineke din peydakirina hesin e. Bi demê re mirov madeya hesin dibîne. Encex beriya wê kevirên tûj dikin çek. Piştre sifir û krom tê peydakirin. Ev maden hinekî nerm in. Mesela, şûrê ku her tiştî dibire hesin e. Hesin zû nayê dîtin. Dîtina hesin di şer de demeke nû vedike. Ji ber ku însan hesin dike pola û wisa şûrê saxlem û hemû tiştî dibire çêdike. Heta tiştekî wisa jî çêdibe; hesin dibînin, lê hesinê ji pola zû bi zû nabînin. Ango hesin kirina pola zû bi zû nayê zanîn. Ew jî çend sedsal sere derbas dibin. Artêşên ku destpêkê hesin dikin pola, jixwe wana zaferê îlan dikin. Ji ber bi pola şûrê hesin dibirin di şer de bi ser dikevin.

## 2- Di Dîrokê De Pêşketina Amûrên Şer

Bi heman awayî di dîroka mirovatiyê de dîtina şûrê pola, mirov dikare bibêje ku wekî dîtina tang û balafirên roja me ye. Şûrê ji pola lê dixe û dibire. Li hemberî vê rewşê leşker di şer de bê şûr dimîne, yan jî şûrê xwe nîvçe dibe. Lewre artêşên ku şûrê pola destpêkê peyda dikin, di hemû eniyan de zaferê digirin.

Meseleya çek, di hundirê dîrokê de her ku çûye bi pêş ketiye. Rim tê dîtin, tîr û kevan tê dîtin, piştî wê jî şûrê ji pola tê dîtin. Jixwe mirov beriya wê teker dibînin. Li ser vê erebeyên şer tên afirandin. Yek jî, di şer de hesp roleke mezin dileyîze. Ji bo artêş dûr biçin, manewra bikin, tiştên wekî erzaq û hwd. pê bikişînin hespan bi kar tînin. Dûvre ne tenê hesp, heywanên din jî dixin dewrê. Lê destpêkê hesp dixin dewrê. Peydakirina teker û hesin, kedîkirina hesp û pê ve girêdayî îcatkirina rim û tîr-kevanê di sîstema koledariyê de şeran digihîne asteke herî jor. Ev rê dide ku artêşên mezin ava bibin.

Artêş, heman demê di deryayê de jî bi pêş dikeve. Sîstema keştiyê (gemi) tê pêşxistin. Ji bo wê hem di deryayê de, hem jî di bejahiyê de artêşên pir mezin ava dibin. Heta wisa dibe ku artêşên koledaran di wê demê de bi milyonan çêdibin. Nimûne, artêşa Pers; tê zanîn ku hejmara nifûsa artêşa Împaratoriya Pers 5 milyon kes bûn. 2 milyon û nîv artêşa esasî bûn, 2 milyon û nîv jî koleyên wan bûn. Ev seyîs bûn, xizmetkar bûn, karwan bûn. Ango 2 milyon û nîv xîzmetkar bûn, ne şerker bûn; 2 milyon û nîv jî yên şerker bûn. Heta di dîroka Heredot de hatiye nivîsîn ku, Ksarkses împaratorê Pers e. Tabî împaratorên wê demê ji xwe re digotin ku, "Em Xwedê ne!" Ji vê re tê gotin "Qonaxa Qralên Xweda", vana împarator in. An jî ji wana re digotin, "Qralên Xweda". Hinek qralan xwe wekî Xwedê didîtin, hinekan jî xwe wekî nîv-Xwedê didîtin. Nêzîkatiyeke wisa hebû. Împaratorê Pers Ksarkses jî xwe wekî Xwedê dibîne.

Li gorî ku tê gotin, Ksarkses diçe Derya Spî, lê leşkerên wî ji deryayê bi keştiyan diçin. Sefer li ser Yûnan e. Leşkerên bejayî û deryayî li ber deryayê digihin hevdû. Ksarkses, artêşa xwe ya deryayî û bejayî dike yek. Li ber deryayê erd rast e, hemû artêşa xwe tîne cem hev. Li vir hejmara wan bi milyonan e. Di dîroka Heredot de tê gotin ku, Ksarkses wê çaxê derdikeve ser cihekî bilind. Li wir kendalek bilind heye; derdikeve ser wir û li leşkerê xwe dinêre. Dibîne ku leşkerên wî mîna deryayê dixuyin. Ango ewqas zêde ne. Jixwe tê gotin ku, hejmara wan bi tevahî 5 milyon bû.

Dema Ksarkses leşkerên xwe dibîne, rondik bi çavan dikeve û digirî. Wê demê kesek newêre pê re biaxive û sohbet bike. Lê mamekî wî hebû û tenê mamê wî dikarî pê re sohbet bike. Mamê wî pê re diaxive, jê dipirse û dibêje: "Qralê min! Berê tu rûken bûyî, kêfxweş bûyî, lê bes ku tu derketî ser gir, hêsir bi çavên te ketin. Ka ji mamê xwe re bibêje, ji bo çi bû? Tu çima giriyayî?"

Wê çaxê Ksarkses dibêje: "Mamo! Min nihêrî ku leşkerên min wekî deryayê dixuyin. Hat bîra min ku 100 salên din wê vana hemû mirî bin. Ez ji bo wê êşiyam û giriyam ku, ez nikarim pêşiya mirinê bigirim!" Ango Ksarkses difikire ku pêşiya mirinê jî bigire.

Bala xwe bidinê; Ksarkses wekî împaratorekî dibêje ku, ez dikarim hemû tiştî bikim; lazim e ez mirinê jî bisekinînim. Lê li wir tê bîra wî ku ew nikare mirinê bisekinîne, lewma digirî. Ango Qral-Xweda ewqas xwe mezin dibîne. Li Rojhilata Navîn, ra ji Îsfahan bi rê dikeve û dixwaze biçe Yûnan bigire. Jixwe wê çaxê diçe û digire jî.

Pêşketina amûrên şer bi vî awayî împaratoriyên mezin û artêşên mezin ava dike. Ew jî gişt şîdet e û şîdet ji bo desthilatdariyê, mijokdariyê û mezinbûna împaratoriyan tê meşandin. Di dîroka mirovatiyê de naskirina şer wisa çêdibe.

## 3- Di Hemû Şaristaniyan De Felsefeyeke Şer Heye

Pêşketina amûrên şer di serdema feodalîzmê û serdema kapîtalîzmê de jî heye. Hewce nake di warê dîrokî de em fireh fireh li ser van tevahî serdeman bisekinin. Encex şer bi vî rengî di jiyana mirov de cih girtiye. Êdî yên rêxistina şer bi pêş xistine, artêşa xwe heyî û di şer de bûyî hosta, di şer de bûyî xwediyê amûr û teknîkên şer dibe desthilat.

Bala xwe bidinê; şer destpêkê di zilam de wekî serweriya li ser jinê dest pê dike, dûvre di wir de kole çêdike, dûvre dibe dewlet û artêşê ava dike. Artêş û dewlet bi hev re bingehekê derdixin holê û mezin dibin, dibin împarator. Împaratorî jî dibin desthilatên ku dixwazin hemû dinyayê bigirin dest xwe. Bi wî şêwazî şîdet dibe bingehê her cure zordestî, komkujî, zilm û mijokdariyên mezin. Heta wisa dibe ku êdî çîna şer saz dibe.

Nimûne, hinek çîn hene ku tenê şer dizanin. Piştre ev dibe ciyawaziyek. Mesela, di çanda Rojhilatê Asya de, bi taybetî jî di çanda Japonya û Çînê de Samûray bi pêş dikeve. Samûray, di nav civakê de wekî çîna yekemîn e. Samûrayek mafê xwe heye ku, dema di sûkê de normal bimeşe, yekî ku rast were bikuje û hesab jê neyê pirsîn. Ango mafê xwe heye ku hema ji ber sedemekê yekî bikuje. Çima? Ji ber ku Samûray e. Samûray çi ye? Samûray, şerkerê pispor e.

Samûray, hîn di zarokatiyê de ango di 5 saliya xwe de li dibistana şer ku jê re dibêjin “Dojo” (Dojo, dibistanên ku şerker tê de tên gihandin) tê gihandin. Ji biçûkanî heya 25 salî perwerde dibîne. Di dibistana Dojo de ji ber serkeftina qezenc kirî dibe Samûray. Samûray wekî çîneke bijare ye. Hemû Samûray dibêjin: “Em Împarator diparêzin”, lê bi xwe jî çîna serdest in. Ji bo hebûna împarator Samûray çîneke cuda ne; cudahiyên wan û mafên wan ên cuda hene. Belkî di civakê de wekî din jî tebeqe hene. Em bêjin tebeqeya kole û koledar heye. Mesela, di dema koledariyê de tebeqeya dewlemend û feqîr heye. Ji derveyî vê, Samûray jî dibe çînek. Ango li wir tebeqebûn (kastlaşma) çêdibe. Tebeqeya jor, tebeqeya navîn û tebeqeya jêr bi vî awayî pêk tê.

Di naveroka vana de çi heye? Şîdet heye. Ev gişt ne şîdet in; ya rastî aborî ne. Lê belê yê şîdet bi dest xwe xistî mijokdariyê dike. Ango aboriyê bi dest xwe dixe. Nimûne, artêşa Ksarkses a 5 milyon kes çawa xwedî dibe? Ksarkses, ji ber şîdet di destê wî de ye, aboriyê jî dixe destê xwe. Jixwe ew dewlet e. Dewlet aboriyê, siyasetê, hemû nebza civakê dixe destê xwe. Ango dewlet hemû tiştên civakê dixe bin destê xwe. Hem dibêje, “Em nûnerên Xwedê ne”, hem jî dibêje, “Ew împarator e”. Dûvre împarator dibêje: “Ez heman demê Xwedê me!” Ango împarator her tişt e. Di vê rewşê de kesên ji derveyî împarator dimînin, gişt koleyên împarator in! Jixwe împarator dibêje: “Ew ên min in, xulamên min in, evdên min in.” Împarator nabêje ev jî însan in. Na. Dibêje: “Ev axa min e; yên li ser jiyan dibin jî însanên min in.” Împarator, xwe wekî avakerê di ser xwezayê re dibîne. Di bingehê vê de tabî şîdet heye. Şîdet difetile sîstema şer; ew şer dibe dewlet; dewlet jî aborî, îdeolojî û siyasetê dixe destê xwe û dibe xwediyê hemû tiştî.

Ya ku karakter û asta civakê diyar dike helbet aborî ye. Lê yê ku kilîta aboriyê bi dest xwe dixe, tabî sîstema koledar e. Sîstema koledar jî bi şîdetê xwe li ser lingan digire. Di dîroka mirovatiyê de şer û şîdet bi vî awayî hatiye meydanê.

Em li vir dubare bibêjin: Mirovatiya di civaka xwezayî de şîdetê ji bo hebûnê, ji bo domandina jiyanê, ji bo parastinê bi kar tîne, lê belê dema serdestî û bindestî çêdibe, çîna serdest şîdetê ji bo mijokdarî, talan û desthilatdariyê bi kar tîne. Di vê wateyê de du cureyên şîdetê hene. Wê çaxê du beşên şer hene. Yek, şerê desthilatdarî û talanê ye; didu, şerê xwe parastinê ye.

Mirov bi giştî dikare bibêje ku şer qirêj e, kuştin e, desthilatdarî ye, mijokdarî ye. Encex lazim e mirov şerê xwe parastinê ji derveyî vê bibîne. Rast e, şerê desthilatdariyê qirêj e. Bi

gelemperî di şerên împaratoran, şerên artêşên mezin de kuştin û qirêjî heye, lê li kêleka wê şerê parastina rewa yê pîroz jî heye. Lazim e mirov vê bizanibe.

### 4- Di Dîrokê De Normên Şer

Her çiqas şer li ser bingeha desthilatdarî, mijokdarî, bindestkirin û avakirina sîstema serdestî û bindestiyê derketibe holê jî, êdî şer jiyana civakê diyar dike. Şer digihe astekê ku, kî di şer de bi ser bikeve, ew hakim bibe û sîstema xwe hakim bike. Şer, bi vî awayî sîstema aborî, hiqûqî, siyasî û civakî diyar dike. Helbet tiştekî ku di vê astê de hemû tiştî diyar dike, ne hêsan e. Êdî kesên ji vî karî fêm dikin, tê de kûr dibin û zana dibin derdikevin.

Wekî me berî niha diyar kir, hemû zanistî çawa ku wekî pêwîstî derketine holê, bi vî şêwazî zanista şer jî derketiye holê. Şer jî zanistek e. Her çiqas hinek dibêjin "şer ne zanist e" lê bes zanistek e. Şer, di kesên ku di vê zanistê de kûr bûyîn, pratîka wê jiyan kirine de wekî huner bi pêş dikeve. Hunera şer bi vî awayî bi pêş dikeve. Ev hem ji bo şerê li ser desthilatdariyê, hem jî ji bo şerê parastinê derbas dibe.

Hinek normên şer ango hinek pîvanên şer hene. Hinek pîvanên şer hene ku, ji bo her kesî derbas dibin. Ango kî îcat kiribe bila kiribe, kî meşandibe bila meşandibe ji her alî ve dikare şer bixe bin xizmeta xwe.

Piştî serdema civaka xwezayî û serdema koledariyê, di serdema kapîtalîzmê de her kesî zanista şer li gorî xwe bi kar aniye. Ez ê dûvre bibêjim, encex teoriya şerê serdema kapîtalîzmê Carl Von Clausewîtz bi pêş dixe. Yê ku herî zêde ji teoriya şer a Clausewîtz îstifade dike Hîtler e. Ya girîng, di şer de hinek tiştên wekhev tên diyarkirin, pîvanên şer çêdibin û ev wekî zanistekê derdikeve holê. Di zanista şer de kesên bûne hosta hene. Ji wana re tê gotin, general. Heta berê, li Çînê ji kesên şer dizanîn û teoriya şer bi pêş dixistin re digotin, fîlozof. Bi vî awayî şer digihe astekê ku êdî bi temamî pîsporiyê û hêzên birêxistinkirî dixwaze. Lewre cur bi cur taktîkên şer peyda dibin.

Şer, destpêkê li Mezopotamya, bi destê rahîbên Sumer tê bipêşxistin. Dûvre împaratoriyên Asûr, Med û Pers ava dibin. Hîn beriya wan Hîtîtî hene, lê li Mezopotamyayê bi awayekî sîstematîk destpêkê împaratoriyên Asûr, Med û Pers nîzama şer bi pêş dixin. Heta tê gotin ku di şer de bask tên avakirin. Ev bask dişibin yekîneyan. Avakirina baskan bi esasî di dema Medan de tê pêşxistin. Mesela, hinek hêzên di şer de hîn pispor ên wekî hêzên taybet tên pêşxistin. Ev yek di dema Med û Persan de çêdibe. Hinek tiştên wisa têne zanîn. Belgeyên dîrokî nîşan didin ku, wê demê di sîstema Mezopotamyayê de artêş bi pêş ketiye û di şer de jî hinek hostabûn çêbûye. Eger ne wisa bûya, herhal Ksarkses an jî dûvre Darius nedikarî ji Îsfahan heya Yûnanîstan û Awusturyayê bi dest xwe bixe.

Di şer de 5 hezar kes meşandin, îdare kirin û birêvebirin hêsan nîn e. Nexwe di şer de bi qral-xwedayan re yan jî bi generalên wan re hostabûnek çêbûye. Lê belge niha di destê me de nîn in. Encex diyar dibe ku, li derdora Mezopotamyayê hinekî hunera şer, zanista şer bi pêş dikeve. Eger ne wisa bûya, ma artêşên bi milyonan çawa çêkirine, çawa meşandine, çawa şer kirine û çawa bi ser dikevin? Nexwe zanista şer heye. Hinek tişt bi pêş ketine, lê îro belgeyên wê tune ne. Ji bo wê em niha nikarin bibêjin ku Persan an jî Asûriyan ev taktîk bi pêş xistin, ev teorî bi pêş xistin. Mirov dikare şîrove bike.

Teqrîben di dema Persan de ango piştî Medan, BZ. (Berî Zayînê) nêzî salên 100'an li Çînê teoriya şer hîn zêde tê zelalkirin û tê nivîsandin. Ev niha wekî pirtûka bi navê "Hunera Şer" ku ji aliyê Sun Tzu ve hatiye nivîsîn, di destê me de heye. Pirtûka "Hunera Şer" wê çaxê hatiye nivîsandin. Ev pirtûk tam kîjan salê hatiye nivîsandin ne zelal e, lê ji du hezar salan zêdetir e ku hatiye nivîsandin. Li gorî di pirtûka "Hunera Şer" de hatiye nivîsîn, wê çaxê di taktîka şer de, di zanista şer de pir kûrahî çêbûye. Zanista Çînê ya li ser şer niha wekî belge di destê

me de heye. Wekî min berî niha jî diyar kir, li Çîn û Japonya ango li Asya Dûr kesên di şer de dibin pispor, êdî dibin wekî çîneke bijare û pê re cudahî çêdibe. Esas di wana de tiştekî wekî kifikîbûn û dejenerebûnê nîn e.

Mesela, samûray pir sade dijîn. Samûray şerker in. Ên wana wisa ye. Ango Samûray ji bo şerkirin û mirinê hene; ne ji bo bibin xwediyê mal û milk. Lê belê ew bijare ne, xwedî îmtiyaz in û taybet tên girtin. Di wê demê de felsefeya Konfîçyûs û Taoîzm heye. Samûray xwe li ser vê felsefeya Taoîzmê perwerde dikin. Ango wana exlaq bi perwerdeya li ser felsefeya Taoîzmê digirin. Her çiqas di dema koledariyê de dewlet ava dibin û dewlet ji bo serdestiya xwe hiqûqê saz dikin jî, di civakan de yê derbas dibe exlaq û felsefeya civakê ye. Wê demê li Asya Dûr Konfîçyûs fîlozofekî esasî ye û Taoîzm bingehê felsefeya wî ye. Bi rastî jî di mirov de şêwaz û nirxên exlaqî bi pêş dixin.

## 5- Di Şer De Îdeolojî û Exlaq

Şer, ji bo serkeftinê wekî armancekê, wekî hedefekê tê bipêşxistin. Mîsal, kes binkeftinê qebûl nake. Wekî tê zanîn, di çanda Japonyayê de “Harakîrî” heye. Harakîrî çi ye? Dema bin keft, li xwe bixe! Ango binkeftinê qebûl nake. Kesek ku bin bikeve, lazim e bimire. Yê hember ku wî nekuje, divê ew xwe bikuje. Ev felsefeyek e. Wî xwe bi serkeftinê ve girê daye. Dema mirov di hundirê dîrokê de li vê şerkeriyê dinêre, hemûyan mutleq li ser esasê felsefeyekê kûrahî û pisporî bi pêş xistine. Çi hostayê şer ji bo talanê, ji bo zilmê bike nebûye şerker. Yên wisa hene, ji wana re çete tê gotin û piraniya yên wisa ne xwedan terzê şerê hostahiyê ne. Ji ber her şerê ku hostayî tê de heyî, teqez xwe dide ser hîmê felsefeyekê û xwedan armanc e. Mutleq di bingeha her şerkeriyekê de bingeheke îdeolojîk heye. Tabî ev ji bo şerkeriya mezin derbas dibe. Nimûne, hinek sîstemên wekî Asûr hene; ji bo wan tê gotin ku pir zilm kirine. Jixwe di dema Asûr de împaratoriyek heye, mirov nikare bibêje ku Asûr pir zaferên leşkerî bi dest xistiye. An jî piştî zaferan kifikîbûn tê de bi pêş dikeve û ji bo desthilatdariya xwe zilmê dike. Di hundirê dîrokê de sîstemên zilmkar her çûne lawaz bûne, dûvre ji dîrokê re bûne mal. Ango sîstemên zilmkar na, lê fermandarên mezin her tim xwedî felsefe ne.

Samûray ku felsefeya wan a Taoîzmê nebe, nikarin werga bibin leşkerên serkeftî û pispor. Eger ji bo pereyan şer bikirana, wê perexur bûna û dejenerebûn jiyan bikiran. Ev xisûs ji bo roja îro jî girîng e. Leşker, esas bi pereyan nabe; bi felsefe û baweriyê dibe.

Di bingeha leşkeriya ku li Çînê bi pêş ketî de felsefeyek heye, baweriyek heye, exlaqek heye. Mesela, exlaqê şer heye. Em heman çandê di nivîsên Yûnan de jî dibînin. Girêdayî Mezopotamyayê Destana Gilgamêş, cardin li Misrê şêwazê fîrawûnan bi pêş xistî heye. Di bingehê van hemûyan de çandek û exlaqek heye. Ev tişt di dîroka Yûnan de jî pir berfireh heye. Di dîroka Yûnan de şerê Toronto, şerê Hektor û Aşîl heye. Di van şeran de exlaq û çandeke berbiçav heye. Hema wisa kî firsendê bibîne, na; prensîbên wan hene, terzekî wana heye.

Li kêleka vana, wê demê hinek rûmetên mirovatiyê hene. Nimûne, soz heye. Yekî ku soz da, soza xwe zû bi zû naxwe. Ango pîvanên wisa hene. Bi taybetî Hektor, dema jiyana xwe ji dest dide, Aşîl ji bo şîna wî çend rojan wext dide ku merasîma cenazeyê Hektor çêbibe. Piştî ku şîna Hektor diqede, hingê êrîş dikin. Ango nabêjin ew bê moral in, fermandarê wan miriye, firsende em lê bixin. Wisa nêzîk nabe. Aşîl cenazeyê Hektor dide bavê wî û wext dide ku şîna wî jî bikin. Piştî ku merasîma şînê temam dibe, dibêjin êdî wextê şer e û şer cardin dest pê dibe.

Niha ev têgihîştin (anlayış) di beşê burjûva yan jî di dewletê de, di hiqûqa dewletê de tune ye. Li gorî dewletên kapîtalîst, ku te firsend dît hema tune bike! Va ye em wekî PKK agirbestê jî dikin, dewlet şer nade sekinandin. Wekî tê zanîn, me agirbest kir, me got em ê

bi paş ve bikişin, lê dewleta Tirk got, firsend ev firsend e û êrîşî Tevgera me kir. Dewleta Tirk di sala 1999'an de wisa nêzîk bû. Dewleta Tirkiyê wekî din jî gelek caran di wextê agirbestê de wisa nêzîk bûye.

Esas em ê paşê li ser rawestin, lê modernîteya kapîtalîst pir taybetmendiyên mirovatiyê yên hêja tune kir, nehişt. Ev soz in, duristî ye, paqijî ye û hwd. Ev nirxên wisa bi esasî hemû aîdê civaka xwezayî ne. Di serdema koledarî û feodalîzmê de hê jî hinek bandorên civaka xwezayî hebûn. Mirov dikare bibêje, her ku çû bandora civaka xwezayî kêm bû. Di dema koledariyê de hinek hebû, di dema feodalîzmê de hinekî din lawaz dibe, lê mordernîteya kapîtalîst van hemû nirxan ji holê rakir. Bi esasî ev nirxên mirovatiyê ne. Ev soz e, exlaq e tiştên aîdê kerameta mirov e. Lê kapîtalîzmê vana hemûyan rakir, li dewsa wê hemû tişt kir leyîstok, xapandin û pere. Modernîteya kapîtalîst vana nehişt. Encex di demên kevin de rexmê koledarî jî heye -ku koletî bi serê xwe qirêjiyek e-, serdestî û bindestî heye, lê cardin gelek kevneşopiyên civaka xwezayî tên parastin. Ê ku civakê di gelek waran de birêve dibe, ne hiqûqa dewletê ya hatî diyarkirin û zagonên Hamûrabî ye; exlaq û zagonên civaka xwezayî ne. Di pir cihan de wisa ye.

## 6- Taktîk û Ziraviya Hunera Şer

Di mijara hunera şer de me got ku, nivîsên Çînê hene. Pirtûka Sun Tzu ya bi navê "Hunera Şer" a ku, taktîkên şer ên wê çaxê li Çînê hatine meşandin tê de hatine nivîsandin, îro jî di hemû akademiyên leşkerî yên cîhanê de pirtûka bingehîn e. Ango hê jî li cîhanê di akademiyên leşkerî de pirtûka Sun Tzu wekî pirtûkeke esasî ye û pirtûkeke bingehîn e. Di roja me ya îro de jî ev pirtûk derbasdar e. Çîn û Japonya li ser teoriya "Hunera Şer" ewqas kûr bûne, felsefe bi pêş xistine, tê de stratejî û taktîk bi pêş xistine ku, niha heman taktîkan di siyaset û aboriyê de jî dimeşînin. Heta tê gotin ku, di bingehê pêşveçûna aboriya Japon û Çînê de ew taktîkên şer hene. Ango wan stratejî û taktîkên şer di hemleyên aboriyê de jî bi kar tînin. Hinek pirtûkên din jî hene. Nimûne, pirtûka bi navê "Hêza Şûr" (Kılıcın Gücü) heye. Çîn û Japonya heman doktrîna ku di şer de bi ser xistine, di siyaset û aboriyê de jî tetbîq dikin, werga bi ser dikevin. Ango di wir de taktîkan bi pêş dixin.

Di naveroka taktîkên Çînê de çi heye? Bi esasî ne di jiyan û têkiliyên mirovatî de, lê di şer de dijmin bixapîne, bişemitîne, xafil bike û derbeyê lê bixe! Bi kurtasî naveroka xwe ev e; yê hemberî xwe xafil bike û ji nişka ve lê bide! Ev lîska hîlekariyê ye. Naveroka hunera şer wisa ye. Tabî ev bi çi dibe? Ji bo mirov yekî bixapîne, yekî bixe xefkê lazim e mirov bi sebir be, veşartî be, zana be, kûr be û aqil bi kar bîne. Ango ev meseleya mantiq e. Nexwe di bingehê hunera şer de bi esasî zeka heye.

Şer, tenê ne şûr kişandin, fizîka çors an jî cesaret e; di armancekê de kilîtbûn e. Di hunera şer de bi armancekê ve kilîtbûn, li ser wê armancê bikaranîna aqil heye. Ango di bingehê hunera şer de mantiq heye. Wekî din israr, sebir, cesaret, hêz pêwîst e. Lê di serî de mantiq pêwîst e.

Di naveroka têgihîştina şerê Çînê de aqil, mantiq, ê hemberî xwe xapandin û xistin heye. Ji ber wê dibêjin, di Çîniyan de fermandarê herî baş, ê ku hîn neçûyî saha cengê, zafer misoger kiriye. Fermandarê wisa fermandarê herî baş e. Ango fermandar, beriya biçe meydana cengê xwe amade dike, hêzên xwe bi her şêwazî amade dike, bi plan, aqil û amadekariyên xwe serkeftinê ji bo xwe misoger dike. Fermandarê herî baş ev kes e. Di vê yekê de pir tişt hene. Ev mijar berfireh e. Di hunera şer de hêza xwe amade kirin, perwerde kirin, gihandin, plan kirin, meşandin, bi zanebûn dijmin naskirin û xwe naskirin heye. Kesek ku ev pê re tune be, nikare vî şerî jî zû bi zû bi ser bixe. Lewre hunera şer, wekî hunereke zirav û kûr bi pêş dikeve.

Hunera şer tenê ne li Çînê bi pêş ketiye. Em hemû detayên şerê li Mezopotamya nizanin, lê di nivîsên Yûnan de diyar dibe ku, Yûnanî jî di hunera şer de pir pêşketî ne. Mesela, yê herî balkêş Îskenderê Mezin e. Heman salê ku li Çînê teoriya şer hîn tam nehatiye bipêşxistin, destpêkê hinekî li Yûnan bi pêş dikeve. Di aliyê destgirtina şer de taktîkên Îskender ên pir balkêş hene, ku îro jî ji bo me dibin nimûne. Ango di aliyê israr û taktîkê de, di aliyê yê hemberî xwe çawa bixîne û bişkîne de pir nimûneyên ku heya roja îro derbas dibin, bingehekî xwe heye û balkêş e.

Ji bo Îskender, ger felsefeya Arîstothales nebûya, teoriya “Ez ê bibim hakimê dinyayê û tevahî dinyayê bigirim.” û armanca ku Helenîzmê û çanda Helen belav bike nebûya, herhal Îskender nedibû Îskenderê Mezin. Îskender pir kêm jiyan kir. Bi tevahî 33 salan jiyan kir, lê mora xwe li dîrokê xist. Adeta serdemeke nû dest pê kir.

Tabî di bingehê şerê Îskender de felsefeyek heye. Dixwaze xwe bigihîne wê, Helenîzmê belav bike û bibe hakimê cîhanê. Ji bo wê Îskender dibêje: “Roj li kî derê dixe, lazim e ez hakimê wir bim.” Dixwaze heya dawiya rojê here. Heya Hindistanê diçe. Tabî bi salan dimeşe û her pêşde diçe. Kî tê pêşiyê, wana dixîne. Ango tim bi şer pêşde diçe. Êdî leşkerên wî pir diwestin, çend caran li dijî Îskender derdikevin. Îskender tim wana îqna dike û dibêje: “Ez ê bi tenê herim.”, leşker jî pê re diçin. Herî dawî êdî fermandarên wî yên hinek bi temen tên cem û ji Îskender re dibêjin: “Leşker pir westiyane, êdî naxwazin herin. Vê carê jî lazim e tu leşkeran guhdar bikî. Heya niha leşkeran tu guhdar kirin; pêwîst e êdî tu leşkeran guhdar bikî!” Îskender jî difikire.

Piştî vê axaftina fermandaran, Îskender derdikeve pêşiya leşkerên xwe û ji leşkerên xwe re dibêje: “Di dinyayê de kesekî nikarîbû ez bixistama, lê bes we ez xistim. Min li hemberî tu kesî serê xwe nedanî, gav bi paş de neavêt, lê ez li hemberî we, li hemberî daxwaziya we gav bi paş de diavêjim; em vedigerin.” Wê çaxê leşker lê temaşe dikin; ew jî rûdine û digirî. Îskender, wê gavê li rojê dinêre û dibêje: “Ey Roj, ez negihîştim te!” Ango Îskender dixwaze here û bigihe rojê. Wê çaxê nizanin ku roj li jor e, dinya li jêr e û dinya glover e. Ew difikirin ku dinya wekî tepsiyeke dûz e. Lê bes Îskender dixwaze here, xwe bigihîne dawiya rojê. Encex Îskender nagihe vê armanca xwe. Heta Hindistanê diçe û nagihe rojê. Ji ber wê digirî û ji rojê re dibêje: “Ez negihîştim te; min efû bike!” Îskender, wê çaxê vedigere, careke din tê Rojhilata Navîn, milê Iraq û Şamê. Li wan deran bi navê Îskenderiye bajaran ava dike.

Ya girîng, di vir de armanceke ku mirov pê ve kilît bûyî, heye. Ew armanc bi kes re îlhamê, cesaretê, ruh û israrê çêdike. Ango di bingehê her fermandarekî mezin de ku felsefe, baweriyek mezin û armanc tune be, werga fermandarên mezin jî çênabin.

Heman têgihîştin di derketina Îslamiyetê de jî heye. Di derketina Îslamiyetê de li Medînê artêş çêdibe. Mekkeyê digirin û dûvre li Rojhilata Navîn belav dibe û dibe hêza yekemîn. Di nimûneya Îslamiyetê de jî ger îlham û baweriya Îslamiyetê nebûya, Hz. Alî di şer de bi ser nediket, fermandarên wekî Xalid Bin Welîd ên mezin dernediketin. Encex baweriya olî bi wana re wê îdîayê çêdike ku divê hakim bin, ola xwe ango ola Îslamê belav bikin û desthilata Xelîfe li her derê temsîl bikin. Ev evîn bi wana re hêz û îlhama serkeftinê çêdike. Ew hêz, îdîa û bawerî ku bi wana re nebûya, hîn di destpêkê de li hemberî artêşa Ebû Sofyan zû bi zû werga serkeftin bi dest nedixistin. Rexmê ku destpêkê di şerê Uhûd û Bedir de quwetê Îslamê hîn hindiktir e jî, ew îlham, ew bawerî û evîn dihêle ku hêza Îslamî bi ser bikeve.

Di dema Îslamiyetê de tabî taktîkên şer hene. Ew jî berdewama taktîkên tecrûbeyên mirovatiyê ne. Nimûne, li Medîneyê bipêşxistina xendek tecrûbeyeke mezin e. Qet tu şerek bê pisporî, bê taktîk ne mumkûn e bi ser bikeve. Eger li wir serkeftinek heye, teqez di bin wê serkeftinê de hem îradeyek, baweriyek heye, hem jî zanisteke taktîkê heye. Belkî hinek caran hinek serkeftinên bi tesadûf çêbûne, encex em behsa serdemekê dikin.

Artêşên Îslamî ne carekê bi ser ketine; pir caran bi ser ketine. Nimûne, wexta dixwazin Ewropa bigirin û derbasî Îspanya bibin çi dikin? Têgîna "***şewitandina keştiyan***" wê çaxê tê bikaranîn. Hêza Îslamî keştiyên pê hatine Îspanya dişewitînin û dibêjin, êdî bi paş de veger nîn e. Ango hêzên Îslamî dibêjin, "Vegera me tune ye, îleh em ê Îspanya bigirin!" Di encamê de Îspanya digirin. Di bin vê rastiyê de jî bawerî û îman heye, girêdanek heye.

Nexwe di bingehê şer de rast e huner heye, lê bê bawerî huner jî bi pêş nakeve û kesek tê de kûr nabe. Di hunera şer de baweriyek heye. Di hunera şer de îdeolojiyek heye û ev îdeolojî îlhamê dide. Werga di felsefeya şer de kûrahî çêdibe.

Di serdema feodalîzmê de jî, wekî di serdema koledariyê de împaratoriyên mezin ava dibin. Her împaratoriyek muheqeq li ser esasê qenaet û baweriyekê ava dibe. Di Împaratoriya Osmanî de jî heman têgihîştin heye. Kîjan têgihîştin heye? "Lazim e em wekî şûrê Îslamiyetê her derê bigirin, heta Ewropa biçin, Xezza bigirin, ango xenîmetê bigirin. Di vê riyê de talan helal e. Em kî derê talan bikin, ew der helal e. Em bi vî awayî xwe bikin desthilat." Împaratoriya Osmanî bi vî awayî heya dema Qanûnî Sultan Suleyman digihe asteke bilind. Piştî wê, di armancê de xirabûn çêdibe. Yek jî, Osmanî demê fêm nake û ne li gorî demê ye. Li Rojava ango li Ewropa Ronesans çêbûye, reform çêbûye. Zanistî bi pêş dikeve, kapîtalîzm bi pêş dikeve û çîneke nû ya burjûva saz dibe. Osmanî ne li wî bayî ye; hê jî di feodaliyê de israr dike. Lewre êdî tê de dejenerebûn çêdibe û gav bi gav bi paş ve diçe. Jixwe di dîroka Osmanî de ji sala 1581'an û şûn de êdî dema paşveçûnê dest pê dibe.

Bi esasî her artêşa ku îradeyeke diyar raber kirî, an jî fermandarên mezin ên çêbûne; di bin heqîqeta wan de baweriyek heye. Ji bo leşkeran bixe şer û ji bo ew leşker bi îradeyeke mezin li ber xwe bidin divê baweriyeke wan hebe. Divê xwe tam tevlî kiribe. Leşker ku xwe tam tevlî neke, nikare wê israr û ezmê li gel xwe ava bike. Di hemû deman de wisa ye. Heta di dema koledariyê de, di êrîşeke Persan a li ser Yûnan de, li Termopylae 300 leşker hene û dibêjin: "Em teslîm nabin!" Dixwazin şer bikin û dizanin bi ser jî nakevin. Tenê ji bo serê xwe netewînin, nebin kole û rûmeta xwe biparêzin şer dikin. Ji ber ku artêşa li hemberî wana bi sed hezaran e. Lewre di keleha xwe de li ber xwe didin. Dûvre dinêrin ku nabe, ji bo bikarin baş şer bikin destpêkê yên nikarin şer bikin (wekî jin-zarokên xwe) hemûyan dikujin. Dûvre jî xwe li hev digerînin, xatir ji hev dixwazin, digirîn û bi qerîn û bi bang êrîşî ser dijmin dikin. Bi vî awayî dîrokekê ava dikin. Di bingehê vê de baweriya ku teslîm nabin, heye. Exlaqek heye. Di exlaqê kitêba wan de teslîmbûn nîn e û heya gişt dimirin şer dikin û bi şeref û rûmet dimirin.

Nexwe di şer de azweriyek (hırs) lazim e. Ez bawer nakim şer tenê ji bo madiyatê bibe. Rast e, niha leşkerên Amerîka bi pereyan leşkeriyê dikin. Encex felsefeyeke wana jî heye. Leşkerên Amerîka jî dibêjin, "Em ê dinyayê xilas bikin, azadî û demokrasiyê bibin her derê." Teoriyeke wan a bi vî awayî heye. Qenaet pê dikin ku wê biçin xelkên derên wekî Afganîstan, Iraq û hwd. xilas bikin. Her çiqas ne wisa be jî, ew wisa dibêjin û pê bawer dikin. Ango şer, îleh li ser tiştina çêdibe.

Nimûne, niha dewleta Tirkiyê pergala leşkerên bi pere daniye. Leşkerên Tirk, wekî heqdest çiqas pere digirin ez nizanim. Lê berê, di dema Tansû Çîler de Tîmên Taybet hatin sazkirin. Ew Tîmên Taybet dejenere bûn. Wana tu şer nekirin. Li derdora bajaran kemîn û tiştên wisa avêtin, dûvre xelkên Kurd êşkence kirin, şehîd kirin û ji vê pê ve tiştek nekirin. Li dijî me tu şerekî cidî nekirin. Di wan de rizîn çêbû. Ez dizanim çend caran heval ketin kemîna wan; tîmên taybet bi xwe reviyan. Hem bi xwe li pêşiya hevalan kemîn danîbûn, hem jî ew bi xwe reviyan. Hevalên wê demê dizanin ku carekê li Biryan a ser bi Şirnexê heval ketin kemîna tîmên taybet ên artêşa Tirk; tîmên taybet bi xwe reviyan. Heta çekeke xwe ya M-16 jî li şûn xwe hiştibûn. Ev bûyer li nêzî bajarê Şirnexê hat jiyîn. Tîmên taybet ên di dema Tansû Çîller de hatin birêxistinkirin, wisa bûn.

Dûvre di dema AKP'ê de dîtin ev rizîne, wan guhertin û navê wan kirin "Polîsên Tevgera Taybet". Leşkerên bi pere yên ku dewleta Tirkiyê niha birêxistin dike, wê çawa bigire negire nayê zanîn. Eger di bingehê vê birêxistinkirinê de tiştekî wekî felsefe deynin, belkî bibe. Lê ev jî zehmet e. Leşkerên berê qe nebe Kemalîzm ji xwe re esas digirtin; ev leşkerên nû wê çi esas bigirin! Ev nikarin tiştekî tam esas bigirin. Li hemberî hêzên biyanî bûna belkî ol ji xwe re esas bigirtan, lê li hemberî me pêkhatina vê zehmet e. Hinek propaganda berê hebûn, ew xilas kirine. Berê ji bo me gotin, "Ermenî ne", "Komunîst in", "Bê xwedê ne", " Terorîst in" û hwd. Dewleta Tirk ev hemû derewên xwe xilas kirin. Vê carê ji bo van leşkerên nû wê bingeheke îdeolojîk çawa danin? Ez tam ne bawer im ku bikaribin tiştekî wisa çêbikin. Encex lazim e pratîk raber bibe û divê mirov li pratîkê binêre. Ez dibêjim, ev sazbûna leşkerên bi pere yên di nava artêşa Tirk de wê têk biçe. Ji ber ku şer rastiyeke wisa ye ku mirov ne ji dil be, qenaet pê re nebe, ango hêz pê re çênebe mirov nikare wî şerî bi pêş bixe. Tenê ji bo madiyatê şerkirin zor zehmet e. Komên çete dikarin wisa şer bikin, lê di şertên zor û zehmet de afirînerî, pisporî bi pêş xistin hêsan nîn e.

## 7- Amûrên Şer û Pêşketina Çekan

Ya girîng, di serdema feodalîzmê de hunera şer hinekî din bi pêş dikeve. Heya wê çaxê barût nehatiye peydakirin û di şer de tenê çekên sar tên bikaranîn. Ango heya wê çaxê hesin tê bikaranîn. Erê tîr-kevan heye, serê wê jî hesin e. Lê belê di wê demê de li Çînê madeya barûtê tê îcadkirin. Berê ji bo dûmanê çêbikin, ên hember bitirsînin û ji bo deng derbixin bi awayên cur bi cur barût bi kar dianîn. Dûvre hêdî hêdî fêr dibin ku lûleyekê (namlu) çêbikin, barûtê û guleya biçûk dixinê, her diçe barûta hîn xurt bi pêş dixin û di hundirê wê lûleyê de gule wekî tîr-kevan bi tundî tê avêtin. Her ku diçe jixwe guleyê hîn dûrtir diavêjin. Li ser vê pêşketinê îro di dema me de fuzeyên ji parzemînekê heya parzemîneke din bi hezaran kîlometreyan dûr diçin hatine afirandin. Lê mirov destpêkê werga nafikire ku vê barûtê hema bike cihekî, hesinekî gilover wekî lûle çêbike û paşê di wir de bi hêz bike.

Teqîna barûtê bi xwe re pestê (basınç) çêdike. Pest, quwetê çêdike. Ew quwet wisa belav dibe. Lê ger mirov wê quwetê di tiştekî gilover de asê bike, ew dibe hêzeke ku pir bilez bi pêş de biçe. Mesela, ev çekên di destê me de wisa çêbûne. Lûle teng e, gule di wê tengahiyê de tam cih digire, milîmetrîk hewa bernade. Teqîna di piştê de pestê çêdike û ew pest guleyê dehf dide û guleyê bi awayekî bi hêz dûr dibe. Berê însan vê tam nizanin. Mirov barûtê peyda dikin, lê belê ev nayê aqilê wan. Hêdî hêdî fêr dibin. Barûtê ewil di topan de bi kar tînin. Gav bi gav barût dikeve qalibê ku şêwazê şer bi tevahî biguherîne. Ev yek bi awayekî tam di serdema burjûva ango modernîteya kapîtalîst de çêdibe. Berê ji çekên wisa re digotin, "qerebîne". Qerebîne çi ne? Wekî van çiftên nêçîrê yên klasîk in, cureyekî tivinga lûlekurt in. Ango ne gule ye, lê tenê barût tê de hebû. Mirov berê li ser guleya biçûk jî nefikiriye; tenê barût hebû. Ji bo wê, hem ew bi kar dianîn, hem jî şûr bi kar dianîn. Ji ber tenê barût bû. Herhal dûvre hîn dibin ku barûtê wekî guleyên biçûk têxin lûleyeke biçûk. Ew hîn zêdetir bandor dike. Ji bo vê, destpêkê mirovan çeka qerebîne wekî topan bi kar dianîn. Ango berê aze dixistinê, piştre barût bi şîşê tê de bi cih dikirin, dûvre guleyek ji devê lûleyê berdidan ser û wisa diteqandin. Ji bo vê jî her guleyek ji bo bê amadekirin wextek dixwest. Lewre însanan li kêleka vê çekê şûr jî bi kar dianîn.

Dûvre gav bi gav fîşek tê afirandin. Ev jî sal sere diçin. Encex çawa ku modernîteya kapîtalîst senaetkariyê di manîfaktoran de hêdî hêdî mezin dike, dike karxane (fabrika) û hêz ava dike, bi wî awayî bikaranîna barûtê jî hêdî hêdî bi pêş dikeve. Beriya ku makîneya bûxarê were îcatkirin, beriya Şoreşa Sanayî yan jî mirov ku dîrokê bibêje, beriya salên 1850'yan însan êdî hino hino fêr dibe ku barût di çekê de wekî tam tê xwestin bi kar bîne. Ya girîng, mirov destpêkê barûtê peyda dikin, paşê guleyên biçûk dixinê, yek bi yek diavêjin. Mesafeya vê ne dûr e; nêz e. Hêdî hêdî bi pêş dikeve. Heta di wextê Napolyon de top tam kamil dibin. Top û topxane beriya Napolyon jî hebûn, lê wê çaxê tam kamil dibin. Ji ber ku

top hîn di wextê Osmanî de pir dihat bikaranîn. Heta tê gotin ku di wextê standina Stenbolê de jî top hatiye bikaranîn. Ango dîroka pêşketina barûtê kevin e. Lê belê êdî çek tam bi pêş dixin. Ne tenê barût û gule, çekê hinek din bi pêş ve dibin û gule êdî dibe fîşeng. Belkî hîn tam tund çênekiribin, lê tiştên nêzî wê çêdikin. Lê bes nizanin nîşanê bigirin. Mesela, heya demeke dirêj çek di destê wana de ye, lê nizanin çekê bi nîşan bikin.

Çek bi nîşan kirin çawa ye? Tê zanîn ku qûndaxa çekê piçekê xwehr e, tu dikarî ji wir di gezgorê re lê binêrî û nîşan bigirî. Wê çaxê çek dûz e. Çeka dûz çawa dikin? Çeka dûz ku mirov bide pêşiya xwe nabe; ku bide kêleka xwe nikare lê binêre. Demeke dirêj wisa dom dike. Kengî tê dîtin ku qûndaxa çek hinekî li jêr be, li gorî ku însan lê binêre û bi çav bibîne tê çêkirin, hêza çeka bi barût jî bi vê yekê re xurt dibe. Ji ber ku mirov dikare pê nîşan bigire, biavêje û lê bixe. Ev jî mijarek girîng e. Di pêşketina çek de ev jî dibe wekî qonaxekê. Ango çêkirina niçika (arpacik) tivingê, gezgor û qûndax xwehr kirin bi xwe jî îcatek e. Dema ev tê dîtin êdî çekên bi agir ango çekên bi barût di şer de pir zêde dikevin pêş û dema şûr diqede. Dema şûr tam wê çaxê diqede. Berê her du bi hev re bi kar dianîn; hem şûr hebû, hem jî çek bi kar dianîn. Piştî ku mirov bi nîşana çekê dikarin li yekî 100-200 metreyan dûr bixin, wê çaxê êdî dema şûr diqede. Bi vî awayî rola çekê ji hesin lawaz dibe.

## B) Şerê Di Serdema Modernîteya Kapîtalîst De

Ji pêşketina Şoreşa Sanayî û şûn de ango piştî makîneya bûxarê û dûvre jî makîneyên petrolê tên dîtin, hêdî hêdî suwarî jî kêm dibin. Dewra suwariyan radibe û hêza motorîze bi pêş dikeve. Wekî tê zanîn, piştî quwetê hewayî, quwetê teyareyan jî çêdibe.

Di dema modernîteya kapîtalîst de çekên şer hîn zêde hatine pêşxistin û ji ber wê herî zêde şer di dema modernîteya kapîtalîst de hatiye jiyîn. Însan herî zêde di dema kapîtalîzmê de hatine kuştin. Şerên pir dijwar qewimîne. Şerên ku bi salan dewam kirîn, hatine jiyîn. Jixwe ez behsa Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn nakim. Ew jî hene, rast e. Mesela, di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de 50 milyon însan dimirin. Tenê ji Sovyetê 20 milyon însan dimirin. Lê hîn beriya wê, ji salên 1700'an şûn de wexta sermayedarî ango burjûva çêdibe, mijokdarî bi pêş dikeve. Çîna burjûva pir çavbirçî ye. Tenê ne li welatê xwe mijokdariyê dike; dixwaze tevahî dinyayê bi dest xwe bixe. Sermaye zêde, dibe kapîtalîzm bilind dibe û êdî di dawiya sedsala 19. de digihe asta emperyalîzmê.

Çîna burjûva, ji sedsala 15'an şûn de her diçe xwe xurt dike, sermayeyê zêde dike, êdî destê xwe diavêje derve. Jixwe di sala 1492'an de hêzên Îspanya Krîstof Kolomb Amerîka keşif kirin û heman demê dest avêtin Afrîka. Serdema kolekirin û sermaye komkirinê dest pê bû.

Burjûva li aliyekî di Amerîka de vedibe, li aliyê din di Afrîka de vedibe. Paşê ji Asya heya Hindistanê diçe. Bi cewherî burjûva, di dema berhevkirina sermayeyê de pir bê karakter e. Exlaqê civaka xwezayî, mîrateyê wê yê mayî jî lingê xwe lê dixe û diavêje. Heya wê çaxê jî hinekî exlaqê civaka xwezayî hebû. Rast e, koledarî û feodalîzmê pir aliyên exlaqê civaka xwezayî rakir û avêt, lê bes dîsa jî hebû. Encex dema kapîtalîzm tê, her tiştî dike pere. Exlaq jî, terbiye jî, hiqûq jî, mirovatî jî hemû dike pere. Ji ber wê jî Marks dibêje: "Kapîtalîzmê ne tenê malbat nehişt; rûmet nehişt, keramet nehişt, soz nehişt, tiştek nehişt. Hemû kir pere." Marks hîn wê çaxê tespîtek wisa dike. Ango di serdema kapîtalîzmê de rûmeta însan namîne. Tiştekî ku jê re bêjin "soz" namîne. Bêbextî çêdibe.

Şer bi xwe hîle ye; mirov li yê hemberî xwe hîle dike. Em bibêjin di dema kevin de kesek li dijî kesê hemberî xwe hîle dike, wî êsîr digire, lê dîsa wekî êsîrekî birûmet nêzîk dibe. Kes li êsîrê xwe zilmê nake. Wekî niha dewleta Tirk li Îmraliyê êşkenceya psîkolojîk dimeşîne tiştên wisa nakin. Tiştekî werga nîn e. Heta dema kesek êsîrekî digire, pir caran wekî xwe

digire dest û paşê jî azad dike. Ji ber ku wê çaxê hê jî rûmet û kerametek heye. Kapîtalîzmê ev jî nehişt. Ango kapîtalîzmê çi tiştê bi navê mirovatiyê heyî, çi tiştê mirovê xwezayî heyî bi giştî wekî paqij kiriye û avêtiye. Ji ber wê yekê niha li cihên ku kapîtalîzm tê de pir pêşketî ye, li wir mirovatî kêm e. Belkî di hinek waran de hest çêbûne. Mesela, hestê heywanhezî bi pêş ketiye. Dîsa hinek hestên hezkirina xwezayê û hwd. çêbûne. Lê li aliyê din, li kêleka heman şexsî/ê berde heywan, ewqas însan tên perçiqandin, tên qetilkirin; dikare li hemberî wana bêdeng bimîne. Ango ev hest wekî hobî bi pêş ketiye. Hinek tiştên erênî hene. Em hemûyan reş nakin. Ku mirov hemû tiştan wekî di bin bandora kapîtalîzmê de bihesibîne, belkî rast nebe.

Li hemberî vê, tabî lêgerîn hene. Lêgera herî mezin lêgera çîna karker bû; derketina Marks û Engels û derketina tevgera şoreşa proleterya bû. Ango lêgerîn hene, rast e. Hemû tişt ne xirab in, lê ev lêgerîn jî di encamê de hemû ketine bin xizmeta kapîtalîzmê. Ji bin nêrîn û felsefeya kapîtalîzmê tam derneketiye.

Modernîteya kapîtalîst, berhemên civaka exlaqî û polîtîk ên heyî bi temamî rakir, hemû tişt kir pere û kir mijara bihêzbûnê. Burjûvaziyê têgihîştina ku kî hêz be wê ew bi ser bikeve; kî bi hêz be, ew wê bazirganiyê bike; kî bi hêz be, wê ew qezenç bike; yê bê hêz be, wê kole û karker be, cuda mafê wî nîn e, bi pêş xist. Yek jî, burjûvaziyê netewe-dewletê bi pêş xist.

Berê împaratorî hebûn. Di bin kontrola wan împaratoriyan de bi dehan çandên cuda dikarîbûn bijîn, qirkirina çandan zêde tune bû. Ji çand û kevneşopiyên civakan re di astekê de hurmet hebû. Ango ji çandên cuda re, ji zimanên cuda re rûmet dihat raberkirin. Hemû yek kirin, têgihîştina bi awayê ku “hûnê hemû wekî min bin” xwe ferzkirin, nebû. Lê burjûva netewe-dewletê bi pêş dixe. Modela netewe-dewletê ya destpêkê bi Şoreşa Fransa ya sala 1789’an re çêbû û netewe-dewlet hat avakirin. Wê çaxê li Fransa Proton hebûn, Asalson hebûn, Parîsî hebûn. Bi avabûna netewe-dewletê re Fransa got, “Wê gişt yek bin, hemû Fransizî bin. Gişt yek zimanî bi kar bînin.” Zimanê Parîsê li ser hemû welat ferz kir. Yek ziman, yek welat, yek dewlet, yek hiqûq û hwd. Gişt yek yek. Ev çi ye? Xwezaya însan hemû bi zextê kirina nav qaliban e. Ev qirkirin e. Ango hemûyan qir bike û bi zorê bike yek! Halbûkî heqîqeteke însan heye; xwezayeke însan heye. Heta wê çaxê rast e kole hebûn, lê ji bo koleyan jî rûmetek dihat raberkirin.

Nimûne, dema Împaratoriya Pers diçe Yûnan, ji Yûnanan re nedigotin, hûn jî ferî Persî bibin an jî hûn werin îleh ola Zerdeştî qebûl bikin. Împaratoriya Pers digot: “Hûn bi çanda xwe û baweriya xwe bijîn, lê bes hûn ê desthilata min qebûl bikin, bacê bidin û bi min ve girêdayî bin.” Yê feodalîzmê jî hinekî din hûr bi pêş de diçû û digot, hûn ê baweriya min esas bigirin û nêzîkatiyên hwd. raber dikir. Lê belê dîsa jî di nav împaratoriyekê de her bawerî û her netewe jiyan dibû. Jixwe di Împaratoriya Osmanî de ne tenê Tirk û Kurdan jiyan dikir; gelek neteweyên wekî Ereb, Ermenî, Rûm, Çerkez, Abaz hebûn. Heta berê li Balkanan Yûnanî, Bulgarî, Yûgoslavî gişt hebûn.

Di serdema feodalîzmê de împaratoriyan mijokdarî û serdestî esas digirtin. Encex modernîteya kapîtalîst mijokdariya kûr esas digire. Ango dixwaze li ser netewebûnê bibe dewletek; ew dewlet esas her tişt be û ji bo wê jî hemû kesan di hundirê wê dewletê de bike yek. Bike yek ziman, yek çand, yek netewe. Modernîteya kapîtalîst ev têgihîştin bi pêş xist. Netewe-dewlet bû sedem ku di navbera neteweyan de dijminatî çêbibe, şovenîzm, neteweperestî yan jî nijadperestî bi pêş bikeve. Ev yek bû bingehê şerên mezin. Mesela, şerên herî mezin di salên 1800’an de li Ewropa hatine jiyîn. Qasî ku şer di navbera Îngilîz û Fransizan de çêbûye, di navbera tu kesî de çênebûye. Qasî ku şer di navbera Fransiz û Almanan de çêbûye, di navbera kesî de çênebûye. Şer, bi qasî ku di navbera Almanan û Îngilîzan de çêbûye, di navbera tu kesî de çênebûye. Ango şerên pir mezin bi vî awayî di dema modernîteya kapîtalîst de bi pêş ketine. Van şeran bi mehan, bi salan ajotine û tê de bi sed hezaran însan mirine. Ev gişt bi felsefeya burjûva ya avakirina netewe-dewletê çêbûn.

Derketina Napolyon bi wê felsefeyê bi pêş dikeve. Bes Napolyon, ferqeke xwe heye ku, Napolyon ne Fransiz e; ji Girava Korsîka ye. Destpêkê dixwaze Korsîka serbi xwe bike. Napolyon û birayên wî hinekî pê re mijûl dibin jî. Napolyon tevlî tevgera li Korsîka dibe. Heta tevlî yek-du pevçûnan jî dibe. Napolyon, dûvre dinêre ku nikare wisa mezin bibe. Ji ber ku Korsîka bi xwe cihekî biçûk e. Welhasil xwe wekî Fransiz dide naskirin. Diçe Fransa û bi felsefeya burjûva adeta dixwaze Ewropa gişt bike yek. Esas Yekîtiya Ewropa (BM) ku niha heye, Napolyon hîn wê çaxê bingeha wê datîne. Napolyon, dixwaze bi zora tivingê Ewropa bike yek. Hema hema digihe vê armanca xwe. Jixwe tenê li wî alî hinek Îngilîz dimînin û dixwaze Moskova jî bigire û wisa bigihe armanca yekîtiya tevahî Ewropa. Napolyon ji bo vê armancê Sefera Moskova bi pêş dixe.

Tabî di pêşxistina şer de Napolyon jî aktorek e. Rast e, di dema kevin de, di pêşketina hunera şer de rola Çîniyan û Persan heye. Dûvre Îskender hinekî bi pêş dixe. Piştî Îskender, fermandarên Romaya mezin mohra xwe li hunera şer dixin. Dûvre di serdema feodalîzmê de fermandarên Îslamiyetê û bi qismî Osmanî rol dilîzin. Di pêşketina hunera şer de rola Rûsyayê jî heye. Lê di serdema modernîteya kapîtalîst de Napolyan bi esasî di huner û taktîka şer de kûrahiyê çêdike. Ger di sefera xwe ya Moskovayê de bi bin nekeftana, wê bibûna fermandarên nekeftî; lê dîrok vê derfetê nade Napolyon. Sefera Moskova heman demê dibe binkeftina Napolyon.

## 1- Şerê Çînên Serdest û Bindestan

Ya girîng di aliyê hunera şer de pêşveçûnek heye, lê di serdema burjûva de Napolyon aktorekî cuda ye. Napolyon hem çeka bi barût bi kar tîne, hem jî taktîkên hîn firehtir bi pêş dixe. Esas stratejiya şer hîn dewlemend dike. Jixwe Clausewîtz generalekî Alman e, lê di serdema Napolyon de leşker e. Bi xwe li dijî Napolyon e, lê taktîkên şer ên wê demê û cardin ên Napolyon baş dişopîne û li gorî wê, vana hemû di pirtûka xwe de dike teorî. Û wisa teoriya şer bi pêş dixe. Rast e, hunera şer bi nivîsên Çînê ango ji pirtûka bi navê “Hunera şer” hatiye naskirin, lê teoriya şer jî Clausewîtz di serdema Napolyon de, bi pêşketina şerê modernîteya kapîtalîst re teorîze dike. Bi vî awayî şer êdî wekî zanistekê digihe kamiliya xwe.

Bi cewherî mirov dikare bibêje ku, pêvajoya şer ji Sumer dest pê kir, heya gihîşt modernîteya kapîtalîst û bi derketina Napolyon re çarçoveya şer wekî huner, wekî zanistî temam bû. Şer gihîşte wê astê. Hem aliyê derketina şer, hem aliyê pêşketina zanistî, stratejî û taktîkê şer, hem jî pêşveçûnên ku di aliyê teknîkên çek de hatine jiyîn mirov dikare bi vî awayî bîne ziman.

Cardin ku mirov dubare bibêje; her Dema di aliyê şer de vekirinek nû çêbûye, her fermandarekî nû û mezin derketiye, mutleqa di bingehê wan de îdeolojiyek heye. Bêyî îdeolojî gavên dîrokî yên nû nehatine avêtin. Nimûne, di Napolyon de îdeolojiya burjûva heye. Napolyon, bi felsefeya burjûva metafizîk şabûnê (şahlanma) jiyan dike, kelecan digire. Lewre di şer de ewqas serkeftinê digire û kûrahiya taktîkê çêdike.

Nexwe ji serî heya yê dawî di tevahî şeran de îleh bingehekî îdeolojîk, çandî û baweriyê heye. Tabî ev pêvajo bi xwe re deman vedikin, deman digirin. Li hemberî van hemû pêvajoyan li her derekê tim berxwedana gelên bindest û çînên bindest heye. Ango şerê parastinê wekî şerekî mafdar her tim hêza xwe nû kiriye. Belkî li cihekî mirov bibêje, ev şerê xwe parastinê pir xurt bû, mezin bû, zafer girt, lê mirov nikare bibêje ku, di dîrokê de wer bûye. Ji ber her şerê ji bo xwe parastinê hatî bipêşxistin, paşê bûye şerê dewletê; ew jî fetiliye bûye bingehê şerê hegemonîk.

Tabî zaferên çînên bindest û neteweyên bindest hene. Encex dema bi ser dikeve, ew jî dibe dewlet û desthilat. Ango şerê çînên bindest tenê şerê ku Spartakus, şerê ku koleyan li

hemberî Împaratoriya Roma serî hildayî nîn e. Wekî din jî pir şerên gelên bindest hene. Şerê di bin pêşengiya Spartakus de digihe ber serkeftinê, lê ji ber kêm teoriyê, kêm stratejiyê nikare biçe serkeftinê. Hêz çêdike, serî hildide, lê ji bo bi pêş de biçe jê re stratejî û xwe avakirin pêwîst e û ew nikare vê bike. Di encamê de li hemberî artêşa Roma bi bin dikeve. Tabî gelek têkoşînên wisa bi bin ketine û dûvre komkujî hatine jiyîn. Lê belê şerê parastinê tim xwe nû kiriye û di gelek pêvajoyan re derbas bûye. Bi taybetî piştî ku kapîtalîzm çêbû, çîna karker bi pêş ket û bû xwedî teorî êdî şerê parastinê karî bi ser bikeve. Ji ber ku beriya wê kole rabûne, pir serhildanên gundiyan hene, rabûne, lê piraniya wan bi ser nekeftine. Ji ber ku bê teorî ne, bê xet in, stratejî û taktîkên wan nîn e, yan jî pir lawaz in. Tenê li hemberî zextê radibin.

Ji bo serhildanên Kurdan, em ê dûvre li ser bisekinin. Encex piraniya serhildanên Kurdan jî wisa ne. Mirov tenê li hemberî zextê serî hilde, mirov bi ser nakeve. Stratejiyek pêwîst e. Divê mirov xwedan xetekê be. Ev xet, Marks û Engels bi pêş xistine. Beriya ku Marks û Engels derbikevin, karker radibin, lê nizanin çawa bikin. Ji karxaneyê aciz in, ji burjûva aciz in. Karker, ji ber mecbûr mane gundên xwe berdin û hatine bajaran, rojê 14 saetan dişixulin. Mehaneyekê (maaş) rast û durist nagirin. Ji ber vê aciz in. Çawa dikin? Zirarê didin karxaneyan. Tevgera Îngilîz Çartîst werga saz dibe. Ango her kes karxaneya xwe dişewitîne yan jî makîneyan xira dike. Nizane çi bike! Karker li şûna ku xwe li hemberî tevgera burjûva bi rêxistin bikin û serî hildin; li hemberî makîneyan şer dikin, bi makîneyan re mijûl dibin. Ango dibêjin, “Van makîneyan em kirin koleyê xwe. Em şev û roj li ser van makîneyan dişixulin.” Ji ber vê makîneyan xira dikin. Destpêkê nêzîkbûn wisa ye.

Dûvre Marks û Engels nîqaşan bi pêş dixin. Utopîk be jî li ser esasê sosyalîzma Fransa nîqaş bi pêş ketibû. Marks û Engels ji felsefeya Hegel (em bi giştî jê re bêjin felsefeya Alman) û ji aboriya Îngilîz (ku di aboriyê de zanebûn bi pêş ketibû) sentez çêkirin û ji bo çîna karker teoriyek bi pêş xistin. Ango formulasyona Marksîzmê werga çêkirin.

Piştî ku karker bûn xwedî ked, vana hîn cidî dikarîbûn şerê parastinê bikin. Li gelek welatên Ewropa pir şer çêbûn. Ewropa ku niha pir behsa demokrasiyê dike, ev bi hêsanî çênebûye. Mecbûr mane wisa bikin. Ji ber ku li Ewropa berxwedana çîna kedkar pir zêde çêbû. Helbet destpêkê Komuna Parîs 6 mehan desthilat bi dest xwe xist. Belkî ew ji bo çîna karker bû tecrûbeya yekemîn. Marks, dûvre piraniya teoriya xwe ji wir girt. Heta hinek şaşiyên ku Marksîzm ketiyê û hinek teoriyên wê yên pêşde bingehê xwe ji Komuna Parîs digirin.

Çawa? Mesela, di wir de tê fêmkirin ku karker dikare raperîn bike û desthilatê bi dest xwe bixe. Di karker de ew hêz û cewher heye. Li ser esasê têgihîştina ku karker ne bi tena xwe (li Parîsê ew tune bû, Lenîn dûvre bi pêş xist), divê bi gundî re îtifaq bike ango nêzîkatiya îtifaqê bi karker re bi pêş ket. Teoriya Marksîzmê bi vî awayî hinekî ji pratîka Komuna Parîs derket holê. Di wir de şekil girt. Lê belê di wir de esas hinek tiştên çewt jî hatin danîn. Mesela, Marks got: “Karker li Parîsê bi ser ket. Lê dûvre burjûva xwe kom kir û hat ser. Karker nikarîbû parastinê bike. Emrê xwe 6 mehan ajot. Sedema vê ew e ku diviya karkeran li ser xirbeyên dewleta burjûva, dewleta xwe ya proleter ava bikiran.” (İşçiler, burjuva devlet enkazı üzerinde kendi proleter devletini inşa etmeliydi.) Ango got, lazim bû karkeran dewleta xwe ya proleter ava bikiran. Marks, di wir de bi dewletê ve aliqî ma.

Esas beriya wê di Marksîzmê de zêde têgihîştina dewletê nîn e. Rast e, komun heye. Lê di wir de meseleya dewletê di teoriya Marksîzmê de bingehek şaş danî. Encex cardin jî Komuna Parîs di Marksîzmê de yan jî di têkoşîna tevgerên karker de zîrveyek e, demek nû ye.

Piştî wê êdî bi zanebûn têkoşîn tê kirin. Jixwe Şoreşa Bolşevîk a beriya niha min behsê kirî jî, li ser wî esasî pêk hatiye. Em ê careke din behsa Şoreşa Bolşevîk a Rûsya bikin. Ji ber ku di aliyê taktîk û stratejiya şer de tiştên nû tê de hene.

Bi kurtahî li kêleka şerê împaratoran, desthilatdar û mijokdaran şerê kedkaran, şerê gelên bindest jî heye. Dîroka mirovatiyê ji vana pêk hatiye. Zanista pozîtîvîst dîrokê wekî dîroka qraliyetan, împaratoran û wekî şerê di navbera dewletan de raber dike. Tabî rastî ne wisa ye. Ev veşartina heqîqetê ye. Dîrok, esas dîroka gelan e; berxwedana gelan e; li hemberî zilma dîktatoran sekinandina gelan e; şerê di navbera gelan û desthilatdaran de ye. Dîrok ji wê pêk tê. Wekî min berî niha anî ziman, nêrînên çîna serdest ango çîna burjûva dîroka însan bêhtir wekî ji wan dîktatoran pêk hatî, şîrove dike. Encex heqîqet ne wisa ye.

## 2- Şerê Mafdar û Şerê Bêmaf

Di Marksîzmê de ku dûvre Lenîn hîn zêde pênase kir, şerên pêşverû (ilerici savaşlar) û şerên paşverû (gerici savaşlar) hebûn. Lewre Marks, şerê Împaratoriya Îngiltere ne li hemû cihan, lê di hinek cihan de destek dike. Herêmên feodalîzm lê heyî, ji ber artêşa Îngilîz diçe li wir feodalîzmê dişkîne, lewre rola pêşverû didiyê. Ango şer wê civakê çiqas pêşde dibe yan nabe di wê çarçoveyê de lê nerîn hebû. Mirov dikare bibêje bêşansiya Marks ew bû ku, di dema wî de Şoreşa Neolotîk nedihat zanîn, zanistê hîn ew serdem keşif nekiribû. Zanebûna Şaristaniya Sumer nedihat zanîn. Vê hişt ku di Marksîzmê de di gelek waran de valahî û kêmahî hebin.

Nêrîna wê demê ya li ser dîrokê; destpêkê Serdema Komunal a Sereta, dûvre Serdema Koledarî, dûvre Serdema Feodalî, dûvre Serdema Kapîtalîzmê û dûvre jî wê Serdema Sosyalîzmê were. Ango bi awayekî otomatîk dem wê wisa here. Li gorî vê, li cihekî ku feodalîzm hebe, kapîtalîzm biçe wir û wir jî bike kapîtalîst, baştir e. Aqil ev bû. Lewre li hinek cihan bi taybetî jî li deverên Afrîka çûyîna leşkerên Îngilîz wekî tiştekî baştir dihat dîtin. Wisa nêzîkbûn hebû. Lê Marks bi xwe tespîta, “Kapîtalîzm mirovatiyê nahêle” bi pêş xistibû. Ev heqîqetek pir girîng bû. Diviya ev heqîqet di her kêliyê de li ber çavan bihata girtin. Ger wisa bibûya belkî wê çaxê rastî bidîtana. Encex wekî me got, di serî de hinek kêmahî heye. Marks, civaka xwezayî zêde tehlîl nekiriye. Hemû serdema civaka xwezayî wekî “civaka kevnar” ango “îlkel komunal” tê pênasekirin. Halbûkî pir tişt di civaka xwezayî de veşartî ne. Bi esasî destpêka mirovatiyê di wir de ye, lê vê yekê tam nabîne.

Li gorî nêrîna Marks, şerên ku pêşveçûnê çêdikin, şerên baş in; lazim e mirov piştgiriyê bide wan. Şer jî heye ku paşverû ye. Paşveçûnê çêdike, mijokdariyê, dîktatoriyê, zilmê û desthilatdariyê bi pêş dixe. Şerên wisa jî xirab in; lazim e mirov li dijî be. Di vê çarçoveyê de pênaseya ji hev cudakirina şer wiha bû; şerê pêşverû û şerê paşverû.

Ev pênasekirin, tabî ne pênaseyek temam e. Gelek aliyên wê ji nîqaşê re vekirîne. Bi esasî di zîhniyeta şîdetê de pirsgirêk heye. Em ê wê di xala nêzîkbûna şîdetê de bînin ziman. Ji bo wê hinek şîroveyên wisa tên kirin. Lê belê pênaseya rast şerê mafdar û şerê bêmaf e. Ango mirov dikare şer bi wî awayî bike du beş.

Şerê bêmaf kîjan e? Şerê mijokdariyê, şerê ji bo talanê, şerê li ser desthilatê, şerê ji bo firehkirina împaratoriyê û ji bo koletiyê şerê bêmaf e. Ango ji bo çînan û gelan bike kole ye. Ev şer di aliyê împarator, qral û dîktatoran de hatiye meşandin û bi van şeran bi milyonan însan hatine kuştin. Bi taybetî şerên ku burjûva ji bo sermaye, pere, berjewendî û talanê li Asya, Afrîka, Amerîka bi pêş xistî, di dîrokê de qet kesî nekiriye. Heta Amerîka li cihên şaristaniyê Çermesor (Kızılderili) giştî bi erdê re kirin yek. Her tişt kirin bin xizmeta sermayeyê û şer ji bo hegemonyaya xwe meşandin. Van şeran şerên qirêj in, şerên ku xwînê dirêjin û kuştinê çêdikine. Hemû ji bo talan û desthilatdariyê tên meşandin. Van şeran, şerên bêmaf in. Divê mirov di bin her şert û mercî de li dijî van şerên bêmaf be. Ev şerên destdirêjiyê, qirêjiyê û ji bo mijokdariyê ne. Van şeran tiştekê nadin mirovatiyê; berevajî ji mirovatiyê pir tiştan distînin. Li ser vî esasî pêwîst e şoreşger li dijî van şeran bin. Ji bo ev şer nebin, ji bo ev şer rawestin û bi paş bikevin helbet divê mirov xwedî helwest be.

Wekî tê zanîn, îro di heman çarçoveyê de ji bo berjewendiyên sermayeya navnetewî mudaxele û şer çêdibin. Vana jî di heman çarçoveyê de ne. Van şeran, şerên bêmaf in. Ra ji wî aliyê okyanûsê tên vê derê û dibêjin, “Em mudaxeleyê vir dikin.” Çi karê te pê heye! Çi mafê te heye? Jixwe burjûva wisa ye. Burjûva, çawa ku Îskender digot, “Ez ê bibim qralê dinyayê”, van hêzên desthilatdar ên roja me jî heman nêzîkatiyê raber dikin. Jixwe hinek hewes û şîroveyên Îskender ên ku digot, “Belkî ez ne însanek normal bim” jî hebûn. Bêhtir diya wî meseleyên wisa jê re digotin. Ango Îskender ne wekî kesekî ji rêzê ye; heçkû nîv-xweda ye. Ji bo şexsê xwe bi tiştên wisa fikiriye. Lewre difikirî ku li tevahî dinyayê roj li kî derê bixe, divê ew der a wî be ango ew bibe qralê wir. Jixwe Îskender nagihe dawiya rojê.

Dûvre dema burjûva derket, burjûva jî got: “Roj li kî derê dixe, ew der a min e.” Têgînên wekî “Brîtanyaya Roj Lê Naçe Ava” (Güneş Batmayan Britanya) wisa derketiye holê. Roj lê naçe ava! Li Brîtanya roj çawa naçe ava? Ji ber ku erdê xwe li wî aliyê dinyayê ye ango ji Amerîka heya Hindistanê roj qet naçe ava. Ji vî alî ve roj diçe ava, di aliyê din re hiltê. Lewma wisa gotine. Ango ji vî aliyê dinyayê heya wî aliyê dinyayê burjûva giştî kiriye erdê xwe û împaratoriya xwe ava kiriye.

Tabî dagirkeriya klasîk rabûye û niha bi heman neteweyên ku berê di destê wana de bûn, Civata Neteweyên Îngilîz (İngiliz Uluslar Topluluğu) ava kirine. Dîsa ji Hindistanê heya Amerîka û Awusturya (Awusturya heya niha jî heçkû bi Civata Neteweyên Îngilîz ve girêdayî ye) diçe. Ango burjûva werga ji bo berjewendiyên xwe sînor nas nekirine. Wekî min berî niha jî anî ziman, kapîtalîzmê bi xwe netewe-dewlet ava kiriye, sînorê xwe diyar kiriye, zimanê xwe, çanda xwe û hiqûqa xwe li gorî xwe di hundirê xwe de daniye. Lê ji bo dewlemendiya hundirê xwe jî xwestiye tevahî dinyayê talan bike û xwe bike hêzeke emperyal.

Bila şaş neyê fêmkirin, ne tenê Îngilîz, tevahî çîna burjûva wisa fikirîne. Hollanda dewletek biçûk e, bi qasî destekî ye, lê hema hema xwestiye tevahî Afrîka bigire û di wextê xwe de pir cih girtine. Ji ber ku êrîşên li ser neteweyên derve destpêkê di aliyê Hollanda, Îspanya û Portekîz de dest pê bûne. Burjûva, şerê mafdar û bêmaf ji hedê wê derxistiye. Wekî ku ew bi xwe netewe-dewleta serdest e, yên din jî lazim e gişt wekî mêtingeha (sömürge) wê bin. Burjûva bi nêrîn û hişmendiyeke wisa nêzîk dibe.

Hîtler, bi esasî ev formûle kir. Ango Adolf Hîtler jî û heman demê Benîto Mussolînî jî berhemên netewe-dewletê ne. Dema tu bi xwe netewe-dewletê çêbikî û piştre bixwazî çiqas neteweyên din bixî bin kontrola xwe û dagir bikî, tê wê wateyê ku tu wê çaxê nijada bilind î. Jixwe Hîtler ev pênase kir. Ango Hîtler di vê mijarê de zêde tiştek nû nekir; tenê formûle kir û got, ev wisa ye. Niha her kes dil xwe de li dijî nijadperestiya Hîtler e, lê Hîtler berhemê çi bû? Hîtler berhemê netewe-dewletê bû. Welhasil şerê bêmaf bi xwe re faşîzm bi pêş xist, nijadperestî, kuştin û desthilatdarî çêkir. Vî şerî pir tişt ji însan biriye; tiştek nedaye însan. Ev şerên bêmaf in û paşverû ne.

Li gorî têgihîştina berê ku mirov nêzîk bibe; Seddam dîktatorek bû, lewre mudaxeleya li hemberî Seddam û destdirêjiya li ser were kirin, di cih de ye. Lê mudaxele çêbû û niha Iraq di çi rewşê de ye? Mirov werga nikare vê di cih de bibîne. Ev şerekî bêmaf e. Modernîteya kapîtalîst ji bo berjewendiyên xwe û hegemonyaya xwe mudaxele kir.

Piştî ku burjûva digihe salên 1900’an di dinyayê de tu dera ku parve nekirî namîne. Osmanî heye. Jixwe burjûva hêzên sereke yên wekî Osmanî ku hinekî bi wana re di têkiliyê de bûn, bi şiklekî ew bi xwe ve girê dabûn. Wê çaxê êdî leşkerên burjûva digihin her derê. Yan bi riyên aştiyê, bi riyên sermayeyê, yan wekî bi Osmanî re kirî bi kapîtulasyon û peymanên dîtir an jî bi fermî çûye û ew der girtiye. Bi şerê hegemonya sîstema kapîtalîst êdî gihîşt asta emperyalîzmê û destdirêjiyê, bi vî awayî bi her kesî, bi neteweyên cîhanê zorî daye kişandin.

Li miqabilê van şerên bêmaf, şerê mafdar heye. Şerên mafdar kîjan in? Pîvanê wan çi ne? Çarçoveya wê mirov çawa diyar dike? Amerîka jî dibêje: "Min êrîşî Afganîstanê kiriye; ev parastina rewa ye. Ji ber ku li wir El-Qaîde heye. El-Qaîde dixwest li min bixe. Beriya ku ew li min bixe, ez çûm û min pêşî lê girt." Wê çaxê pîvana vê çi ye? Ev tê wê wateyê ku Amerîka xwe mafdar dibîne.

Pîvana şerê mafdar, ne ku mirov li gorî xwe şîrove bike û pênase bike; pîvana wê ew e ku, şerê di çarçoveya parastina rewa de mafdar e. Şerê parastina rewa tenê ne mafdar e, pêwîst e.

Şerê parastina rewa li ser çi ye? Welatê te ku êrîş were ser, welatê te were dagirkirin an jî wekî Kurdistanê hatibe dagirkirin, welatê te were talankirin û mijandin, zilm û zordestiya çînayetî hebe (ji ber ku şer li ser zexta çînayetiyê jî çêdibe), mijokdarî hebe, li ser kedkaran şîdet, faşîzm û zilm hebe, keramet û rûmet hatibe binpêkirin, hiqûq neyê naskirin (ez behsa hiqûqa li ser bingehê exlaq dikim) û bêexlaqî hatibe kirin, li hemberî kiryarên wisa mafê berxwedanê mafekî rewa ye û di cih de ye. Şerê ku di vê çarçoveyê de bibe jî, şerê mafdar e.

Esas ev di demên kevin ên dîrokê de heye. Mesela, ku te êrîşî yekî kir, mafê wî kesî jî heye bersiva te bide. Ango mafê wî kesî yê bersivdanê (misilleme) heye. Di dîrokê de ev wekî exlaq di nav civakan de bi cih bûye. Lê bes paşê ev ji aliyê burjûva ve pir hat binpêkirin. Modernîteya kapîtalîst xelk xapandin, çû mal û mulkên wan talan kir. Nimûne, însanên Afrîka ku zêde nedizanîn zêr û zîv çi ye, bi tûtin-mûtinê zêr û tiştên wan gişt talan kirin. Ango tûtin da Afrîkiyan, li miqabilê wê gişt warîdatên wan talan kir û ew xapandin. Ji ber wê pir bû gotûbêj û li hemberî van tiştên di hundirê dîrokê de hatîn jiyîn, di sala 1948'an de qanûneke navnetewî hat qebûlkirin. Niha li gorî qanûnên Neteweyên Yekbûyî, dema hêzek êrîşî hêzeke din bike, mafê wê hêzê heye ku xwe bi çek biparêze. Ev bend niha di nav qanûnên Neteweyên Yekbûyî de heye.

Eger hêzek hiqûqê bin pê bike û bi çek êrîş bike, bixwaze keramet, ziman, çand an jî siyaseta wê neteweyê bindest bike; li hemberî wê çek daxil, bi her şêwazî mafê wê neteweyê yê berxwedanê heye. Di vê mijarê de mafê berxwedanê pîroz tê dîtin û çek daxil, mafê xwe yê bersivdanê heye. Bi esasî ev di kevin de jî heye. Lê wekî me li jor nivîsandiye, di dema êrîşên burjûva yên bêpîvan de êdî ev maf pir zêde tê binpêkirin.

Ne ku di dema nû de modernîteya kapîtalîst pir însanî ye, maf daye ku êrîş li ser kesekî yan jî neteweyekê çêbû, mafê wan heye li ber xwe bidin. Ev maf di demên kevin de hebû. Encex ev maf ji ber ku di dema modernîteya kapîtalîst de pir hat binpêkirin, dema Neteweyên Yekbûyî hat damezrandin û zagon bi pêş xistin, ev jî kirin xalek. Niha ev xal di nav yasayên navnetewî de heye. Tabî di roja me de wekî ku mafê dewletê diparêze, heye.

Nimûne, niha em bêjin ku em mafdar in xwe li hemberî dewleta Tirk biparêzin û çek daxil, bersiv bidin. Ew dibêjin: "Na, li wir sînorê dewleta Tirk heye. Hûn di nav sînorên dewleta Tirk de vî karî dikin." Ango dewletê li ser vê zagonê re dibînin. Helbet ev li hemberî exlaq û hiqûqa gerdûnî nayê qebûlkirin. Ne rast e. Wekî pîvan ne dewlet, divê çand esas be. Eger çandek were qirkirin, li ser çandekê êrîş hebe, li ser kevneşopiyeke bi vî awayî êrîşên qirkirin û tunekirinê hebin, mafê kesên xwediyê wê çandê heye ku li ber xwe bidin. Di çarçoveya hiqûqî de pênasekirina vê wisa ye. Lê Neteweyên Yekbûyî niha hiqûqê li gorî dewlet û sînorên dewletan pênase dikin. Ango ev hinekî meseleya şîroveyê ye.

Di vir de tiştê ku ez dixwazim bînim ziman; şerê mafdar ango şerê parastinê di cîhanê de ji aliyê her kesî ve rewa hatiye dîtin. Eger dagirkerî were ser welatekî, helbet mafê wî welatî heye xwe bi her şêwazî biparêze. Ger xwe neparêze, li wir kerameta mirov bin pê dibe. Li wir hiqûq bin pê dibe. Li wir demokrasî û azadiya mirov bin pê dibe. Ku xwe neparêze, ew welat kêm e. Ew kêmahiyek e, teslîmiyet e. Kes di dîrokê de nikare methê vê bike û baş bibîne. Eger çanda te, welatê te xeterî hat ser, ku tu wekî mirov xwedan keramet bî, ji bo

xatirê hiqûqê însan, buhayê xwe çi dibe bila bibe, lazim e tu li hemberî vê xeteriyê bisekinî. Nêzîkatiya bi rûmet, nêzîkatiya bi keramet ev e.

Yê ku mafê parastina rewa bi kar neyne, divê mirov loma jê bike. Ji bikarneanîna mafê parastina rewa xirabtir tiştek nîn e. Ango tu ji mirovatiyê tawîz didî. Mirovekî/e ku xwedî keramet be, lazim e ji mirovatiyê tawîz nede. Ji mirovatiyê tawîz dayîn xirabtir tiştek nîn e. Ji kerameta xwe tawîz dayîn xirabtir tiştek nîn e.

Hiqûqa gerdûnî (ji ber hiqûqa dewletan ne li ser esasê exlaq e) çi ye? Eger mirov dixwaze modernîteya demokratîk û şaristaniya demokratîk esas bigire, divê mirov li gorî wê tevbigere. Welatê mirov ku bindest be, buhayê wê çi dibe bila bibe, divê mirov li hemberî her cure bindestiyê bisekine. Wekî çînekê ku mafê mirov hat xwarin, zilm lê hat kirin, bêhiqûqî hat kirin, buhayê vê çi dibe bila bibe, lazim e mirov li hemberî wê bisekine. Pêwîst e mirov nebêje, dema ez li hember bisekinim wê malê min, mulkê min, jiyana min biçe. Mumkûn e biçe. Ma tê jiyaneke bêşeref, bêrûmet çi bikî!? Ku rûmeta te hat pênc pereyan, hebûna te çi wateya xwe heye!?

Nexwe şerê parastina rewa tenê ne heq e, erkek e. Lazim e mirov vê bike. Eger kesek vê têkoşînê neke, di dîrokê de heqê wî/ê yê jiyanê jê hatiye girtin. Me di beşa dîrokê de got, hinek neteweyên ku şerê parastina rewa nekirin, heliyane û ji holê rabûne. Şexsê ku ev şer nekirî, bûye kole. Heywanên ku ev şer nekirin, tune bûn. Eger mirov xwe neparêze, nikare bi hebûn be. Ji bo hebûnê divê mirov parastinê esas bigire. Lewre mafê parastinê di nav zagonên Neteweyên Yekbûyî de wekî mafekî pîroz hatiye destnîşankirin.

Mafê jiyanê pîroz e. Mafê parastina jiyanê pîroz e. Bingehê şerê parastina rewa ev e. Nexwe tenê ne ji ber rewabûnê mafê xwe heye, bi kar bîne; lazim e mafê xwe yê parastinê bi kar bîne. Ji ber ku ger bi kar neyne, nikare bijî. Nimûne, îro gelê Kurd wekî neteweyekê di bin xeteriyê de ye. Çand û hebûna wê di bin xeteriyê de ye. Sedema vê ew e ku mafê xwe yê parastinê di wextê wê de wekî tê xwestin bi kar neaniye; lewma îro bi xeteriyê re rû bi rû ye. Cuda jî, însan dibe, heywan dibe, hêmanên (unsur) xwezayî dibin, her zindiyê ku xwe neparastî, hebûna wan an nemaye yan jî di xeteriyê de ye. Ev wisa ye. Nexwe parastin, tenê ne tiştekî maf e û rewa ye; heman demê pêwîst e. Parastin, ji bo jiyanê pêwîst e.

Bi giştî divê em şer di vê çarçoveyê de bikin du beş: Yek, şerê xwe parastinê ye; ya duyemîn jî, şerê êrîşkariyê ye. Şerê parastinê mafdar e; şerê li ser esasê êrîşê bêmaf e. Tabî dibe ku ev şerê di navbera dewletan de be jî. Mînak, dewletek êrîşî dewletekê dike. Ew dewlet an jî netewe dema êrîş li ser hebe, mafê wê yê ku şerê parastinê bike, heye. Encex em hebûna dewletan pir rewa nabînin. Ji ber ku li ser serê însanan hebûna dewletan belayek e. Me di beşa dîrokê de diyar kir ku, rahîbên Sumer dewlet anîne. Beriya wê civaka xwezayî heye. Lê dewletê civaka xwezayî xira kiriye, serdestî û bindestî çêkiriye. Dewlet bûye çavkaniya zilm, êşkence û şîdetê. Dewlet, piştre şer li ser tevahî rûyê erdê belav dike. Ev xirabî gişt ji dewletê pêk tên û mirovatî heya roja îro jî pir êşan ji destê dewletê dikişîne. Em ê dûvre vana vekin.

Di vê wateyê de em li dijî dewletê paradîgmayeke nû, sîstemeke nû ya alternatîfa dewletê bi pêş dixin. Dewlet, ji ber vê li gel me ne rewa ye. Lê ji bo netewe; ku yekî êrîşî yekî kir, mafê yê din heye ku ew jî bersiv bide. Ev tişt çawa ku ji bo neteweyan derbas dibe, werga ji bo wan avahiyên dewletan jî derbas dibe. Mirov dikare şerê mafdar werga îzah bike. Kî êrîş kiribe, kî ji bo desthilatdariyê, ji bo mijokdariyê şer dabe destpêkirin, ew neheq e. Lê yê ji bo mirovatiya xwe, ji bo kerameta xwe mecbûr maye xwe biparêze û şer bike, ew şer jî hêja ye û pîroz e. Mirov şeran bi vî awayî pênase bike wê hîn rast be.

## C) Têgîna Şer

Me li ser şer tiştên li jor gotin, ez bawer im bes e. Lê bes lazim e em hinek din li ser têgîna şer rawestin. Ango şer çi ye? Em hinekî li ser vê rawestin.

Me di hundirê dîrokê de anî ziman ku şer, bisîstemkirin û birêxistinkirina şîdetê ye. Carl Von Clausewîtz dibêje: "Şer, bi amûrên cuda meşandina polîtîkayê ye." Clausewîtz şer wisa pênase dike. Ji ber ku di naveroka şer de polîtîka heye. Ango di naveroka şer de desthilatî heye, hegemonya heye, mijandin heye. Tabî ev polîtîka ye. Li hemberî wê xwe parastin, berxwedan, avakirina îrade û sîstema xwe heye. Ev jî polîtîka ye. Di vê çarçoveyê de ev pênaseya Clausewîtz rast e û di cih de ye. Heta Clausewîtz ji aliyek din ve jî nêzîkî şer dibe û dibêje: "Şer, wekî bazirganiyê ye. Dema berjewendiyê aliyekî tê de hebe şer dike; ku nebe, nake." Di vê wateyê de dibêje, şer wekî bazirganiyê ye.

Bi vî şêwazî pênasekirina şer ji bo Engels pir balkêş tê. Engels wê çaxê rastî vê nivîsa Clausewîtz tê û ji Marks re name dinivîse. Engels, di nameya xwe de ji Marks re dibêje: "Min Clausewîtz xwend, pir balkêş e ku şer wekî bazirganiyê pênase dike." Ango dema aliyek dixwaze tiştekî bike û tiştekî bi dest xwe bixe, şer dike. Bi esasî ev polîtîka ye. Ev, ji bo şerê mafdar jî wisa ye. Mesela, em dixwazin xweseriyê, azadiyê bi dest xwe bixin. Ji bo vê em şerekî mafdar dikin. Lê dijmin dixwaze mijokdariyê bike, dagiriya xwe bi cih bike û ji bo vê şer dike. Nexwe di vir de polîtîka heye. Yek jî, şer wekî berjewendiyekê ye. Dema aliyek berjewendiyê xwe tê de hebe, şer dike; ku nebe, nake. Ango şer bi kêfî nayê kirin. Clausewîtz ji ber vê şer dişibîne bazirganiyê û wekî bazirganiyê dibîne. Ango pîvanên şer dişibîne bazirganiyê. Mesela, berjewendiya mirov di bazirganiyê de hebe bazirganiyê dike, ku berjewendî di şer de hebe şer dike. Clausewîtz, şer wisa pênase dike.

Esas şer, birêxistinkirin û bisîstemkirina şîdetê ye. Bi amûrên cuda bikaranîna polîtîkayê ye. Pênaseya şer mirov dikare wisa destnîşan bike; şer, bi amûrên cuda pêkanîna armancên polîtîk e. Mirov dikare şer tam werga pênase bike.

Armanca şer çi ye? Armanca şer a polîtîk heye û şer dixwaze îradeya hêza kesê li hemberî xwe bişkîne. Di vê wateyê de mirov dikare bibêje, aliyekî din ê şer ev e ku terefên şer dikin; şerê wan wekî şerê îradeyê ye. Ji bo îradeya yê terefê li hemberî xwe bişkîne pêwîst e derbeyê lê bixe, hêza wî ya lêdanê ango hêza wî ya leşkerî û aboriya wî tesfiye bike, sîstema wî ya siyasî felç bike. Divê bi her şêwazî wî bixe zehmetiyê ku heta bikaribe îradeya wî bişkîne.

Wekî tê zanîn berê keleh hebûn. Mirovan di kelehan de şer dikirin. Êrîşeke mezin ku bihata, xwediyê kelehê xwe dixist kelehê û di wê kelehê de li ber xwe dida. Çima? Wê çaxê top û tiştên wisa tune bûn. Piştre her ku top çêbûn rola kelehan zeîf bû. Niha jî rola kelehan heye, lê zeîf bûye. Beriya ku barût were peydakirin, keleh di şeran de tiştekî esas bû. Hema kî çûye ku derê, li wir kelehek ava kiriye. Hêza ku dixwest kelehê bigire, dora hêzên di kelehê de digirt, av li ser wan qut dikir. Kelehên biserûber diviya av û erzaqê ji bo salan tê de hebûya. Wekî din nedibû. Ji ber ku hêza hatî kelehê bigire, avê li ser kesên di kelehê de qut dike, nan li ser qut dike, dixwaze îradeya wan zeîf bike ku yên di kelehê de teslîm bibin. Bi zorê nikare têkeve kelehê yan jî ketina kelehê bi xeter e. Lê dixwaze avê, çavkaniyên aboriyê û derfetan li ser qut bike ku yên di kelehê de îradeya wan zeîf bibe û teslîm bibin an jî birevin. Ev jî babeteke şer e.

Heman tişt îro bi awayekî cuda tê pêkanîn. Mesela, îro wekî ambargo tê danîn. Dema hêzên modernîteya kapîtalîst dixwazin hêzekê teslîm bigirin, ambargoyê datînin ser. Ambargoya çi? Ambargoya aboriyê, ambargoya dîplomatîk, ambargoya enerjiyê li ser datînin û wî li wir zeîf dikin; ji bo îradeya xwe zeîf bibe, nikaribe li ber xwe bide, teslîm bibe û tawîz bide. Hedef û armanca şer ew e ku, îradeya yê terefê li hemberî xwe bişkîne, bêçare bike, pûç bike, felç bike û mecbûrî tiştekî bike.

Nexwe di şer de ev xisûs girîng e; nermbûn nabe. Madem te şer kir, tê li ser terefê li hemberî xwe tiştekî ferz bikî. Ango tu hem şer bikî, hem jî şiwe (teğet) derbas bikî, sivik lê bixî û derbas bikî, ev tiştekî nanivîse. Eger tê şer bikî, tê cidî şer bikî, yê hemberî xwe pûç bikî, sîstema wî felç bikî ku ew mecbûr bimîne daxwazên te qebûl bike. Ev wisa ye. Qanûna şer a esasî ev e. Şer, jixwe ji bo tu yê hemberî xwe mecbûrî hinek tiştan bikî, tê kirin. An ji bo tu terefê li hemberî xwe mecbûrî peymanekê bikî, tawîzan jê bixwazî yan jî tu dixwazî wî bişkînî û ji wir derbixî tu şer dikî. Di vê wateyê de heqîqeta şerê me yê li Kurdistanê; ger em di îradeya dewleta Tirkiyê de felçbûnê çênekin, mecbûr nekin, ev şer nagihe armanca xwe. Pênasekirina şer di hundirê dîrokê de jî wisa ye.

Şer, ne tiştekî erzan e, jiyana însan tê de ye. Şer karekî cidî ye, meseleyeke pir cidî ye. Ji bo hinek armancên erzan nayê kirin. Eger hinek kesên wekî talankar, eşqiya ji bo hinek karên sivik û erzan şer dikin, ev kesên wisa bi jiyanê dileyîzin an jî ji jiyanê fêm nakin. Lê şer, ji bo tiştên cidî tê kirin. Lewre şer mijarek cidî ye. Yek ku nikaribe şer bike, divê şer neke. Tu şer bikî û nîvçe bihêlî, nabe. Li cem me bi Kurdî dibêjin “marê nîv kuştî”. Ango tu dijmin wekî marê nîvkuştî bikî, nabe. Dema tu mar nekujî, har dibe û ji bo parastina xwe bi te ve dide. Ji ber ku di mar de jî xwe parastin heye. Berê, ji ber me nedizanî, me digot ku, mar pîs e û filan bêhvan. Halbûkî mar jî mafê xwe yê jiyanê heye. Tu li mar dixî, birîndar dikî; ew jî ji bo xwe biparêze bi te ve dide. Însan ji ber egoîst e, mar tim xirab raber dike. Ger tu li mar bixî, wê ew jî bi te ve bide. Bi esasî jehra mar hinekî ji wê tê. Ev mesele hevsengiya xwezayê ye. Tu bi mar re hevsengiyê xirab bikî, wê ew jî êrîşî te bike. Tabî êrîşa mar, bi esasî xwe parastin e. Dibe ku carina ew jî êrîş dike, ez vê tam nizanim, lê li gorî ez dizanim hê bêhtir ji bo parastina xwe vê yekê bi kar tîne. Mesela, tu ferq nekî û pêl mar bikî, ew bi te ve dide. Mar nizane te ferq nekiriye û te bê hemdê xwe pêlê kiriye. Tu pêl mar nekî, ew zû bi zû bi te ve nade. Ez nizanim, lê heya niha ez lê rast nehatime ku mar jixweber bi mirov ve dide. Lewre berê li cem me digotin, “marê nîvkuştî”. Ango marê nîvkuştî xirab e. Marê nîvkuştî har dibe. Şer jî ku tu nîvçe bikî, tu yê hemberî xwe har dikî û xirabtir dibe. Mirov ku şer kir, lazim e bi ser bixe. Ev pêwîst e.

Di vê xisûsê de Engels hinek tiştan dibêje, lê ji bo şerê giştî nabêje. Engels, ji bo raperînê dibêje: “Raperîn agir e; bi agir neleyîze! Eger tu pê bilîzî, agir dikare te bişewitîne.” Ango divê mirov bi şer nelîze. Esasê şer hemû wisa ye. Şer, meseleyeke wekî agir e. Divê mirov pê nelîze. Ku tu pê bilîzî, mumkûn e tu pê nizanibî û te bişewitîne. Wateya vê; ku tu bi agir lîstî, pêwîst e tu baş bilîzî. Ne ku bilîzî, divê tu vî agirî baş bi kar bînî ji bo te neşewitîne.

Şer mijareke wisa ye ku tu bi her şêwazî bi kar tînî. Ji bo tu yê hemberî xwe mecbûr bikî, tu bi şer zoriyê li ser çêdikî. Belkî hemû ne kuştine. Nimûne, aborî jî beşeke şer e. Aboriyê xira bike. Mirov bi şêwazên cur bi cur sîstema siyasî dixe qeyranê, sîstema civakî xira dike. Esas ev gişt şer in. Şer, vana gişt dixe hundirê xwe. Tu dixwazî bi her şêwazî karê terefê li hemberî xwe xira bikî, sîstema wî pûç bikî ji bo ew daxwaziyên te qebûl bike.

Her şerek di dawiyê de digihe peymanekê. Belkî di dîrokê de hinek şerên bê peyman mane hebin, lê yên wisa îstisna ne. Ji ber ku hinek caran tu dinêrî şer di navbera du hêzan de dibe û qet peymanek çênabe, lê piştî 50 salên din dîsa peyman çêdibe. Hinek caran tiştên wisa jî diqewimin. Ango di dawiya her şerekî de peymanek heye. Ji ber ku tu dixwazî yê hemberî xwe bînî ser xalekê. Ku te anî wê xalê, jixwe tu peymanê çêdikî. Ku te neanî û ew te qebûl neke, tu jî wî qebûl nekî; di vê rewşê de ev şer bi salan dirêj dike. Encex şerê pir dirêj bi taybetî di vê serdema me de ne mumkûn e. Ya girîng, heya demekê diajo. Ji ber ku tim guhertin û veguhertin heye. Di wan guhertinan de rewşên nû tên jiyîn. Herhal şer bi sedsalan neajo. Belkî şer demekê dirêj bike, lê di encamê de digihe astekê û disekine. Di şer de ev alî jî heye.

Di şerên berê de bêhtir hêzên leşkerî dihatin hemberî hev û bi hev re şer dikirin. Aboriya hev xira dikirin, propaganda bi devkî li dijî hev belav dikirin. Ango tevlîhevî di nav wan neteweyan de çêdikirin. Mîsal, te dinêrî Îran û Osmanî li dijî hev in; hinekan piştgirî didan

Îranê, hinekan jî piştgirî didan Osmaniyan. Berê wisa bû. Lê bes, piştî ku modernîteya kapîtalîst sîstema xwe ava kir û şûn de li hemberî desthilatdariya modernîteya kapîtalîst çînên bindest û gelên bindest şerên mafdar bi pêş xistin. Di van şerên mafdar de li gelek deveran çîn û gelên bindest bi ser ketin û berjewendiyên sîstema hegemonîk a navnetewî xistin tengasiyê. Ji bo wê, di navenda modernîteya kapîtalîst de çarçoveya şer fireh kirin.

Bi taybetî bi teknolojiya pêşketî re (tabî niha teknolojî pir bi pêş ketiye, lê em behsa salên beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn û vir ve dikin) hemtayê şer fireh bû. Hinekî medya derket, rojnamevanî bi pêş ket. Sîstema radyo, televîzyonê; piştî wê sîstema înternet û telefonê ango telekomînîkasyon bi pêş ket. Hîn beriya ku ewqas tişt bi pêş bikevin, piştî ku hinekî medya bi pêş ve çû û şûn de, derfeta ku şer fireh bibe çêbû. Lewre modernîteya kapîtalîst, piştî NATO hat damezrandin û şer hîn zêde sîstematîze kirin, şerê taybet bi pêş xistin. Bi taybetî ji bo şer û têkoşînên mafdar di raya giştî de wekî neheq raber bikin, terorîze bikin, di civaka wan de û di navbera wan de tevlîheviyê çêkin şerê taybet pir bi pêş xistin.

Şer, ji bo tenê ne çekdarî be, ji bo îdeolojîk be, di warê siyasî, dîplomatîk, aborî, çandî û civakî de bimeşînin cur bi cur rêbaz bi kar anîn. Moderînteya kapîtalîst ji bo desthilata xwe li ser çînên bindest, ên tên pelixandin, ên karker, gundî û gelên bindest ava bike, her îcateke teknolojiyê ya nû destpêkê ji bo wê civakê çawa bixe bin kontrola xwe, bi kar aniye. Ango sîstema teknolojiyê bi kar aniye. Bi taybetî hinek tiştên ku civak bixwaze pir zêde bi pêş xistiye û bi wana şerê taybet berfireh xistiye rojevê.

Nexwe moderniteya kapîtalîst, çi modern dibe çi jî klasîk dibe çarçoveya şerên bi çek û bi hêz tên meşandin berfireh kiriye. Di paralela pêşveçûna teknolojiyê de ji sala 1900'an û vir ve şerê hewayî çêbû. Berê şerê hêzên hewayî tune bû. Cardin şerê deryayî zêde kirin. Şerê bejayî cur bi cur kirin; topvan, tankvan saz kirin. Suwarî berê hebûn; her ku çû ew rakirin, lê komando, hêzên taybet saz kirin. Li kêleka van hemûyan, berfirehbûna şer bi teknîkê, bi îstixbaratê û bi keşfê bi pêş xistin. Di şeran de hinek tişt hene, ew qismên taktîk in. Em ê dûvre behsa wan bikin.

Di şeran de îstixbarat, keşif û naskirina dijmin pir girîng e. Çînî di vê wateyê de dibêjin: "Eger tu dijminê xwe baş nas bikî, ev nîvê zaferê ye; tu xwe û dijminê xwe jî nas bikî, ev zafer bi xwe ye." Bi rastî mirov dijminê xwe baş nas bike, asta hêza xwe bizanibe û bizanibe hêza dijmin çiqas e, ku mirov li gorî wê xwe plan bike wê ew zaferê ji mirov re bîne. Ev, girîngiya îstixbaratê, girîngiya fêmkirin û naskirina dijmin raber dike.

## D) Faktorên Li Ser Şer Bandor Dikin

Tiştên di şer de şer yekser bandor dikin hene. Em ê bi kurtî li ser wan bisekinin. Ji bo şer bi ser bikeve pêwîst e van taybetmendiyan bên zanîn. Ji ber ku vana xisûsên gerdûnî û giştî ne. Helbet ji bo fermandarek şer bi ser bixe divê hemû tiştî bizanibe. Divê faktorên şer diyar dike, bizanibe. Vana çi ne?

### 1- Li Ser Şer Bandora Demsalê

Rewşa demsalê ye. Ango tu ferqa payîz, bihar, havîn û zivistanê fêm nekî, tê şer winda bikî. Salên 1914-15'an Enwer Paşa hebû. Di Îttîhad Teraqî de rola fermandar lîstibû. Mesela şaşiya wî çi bû? Fermandarekî wisa çavreş bû, lê şaşiya herî mezin kiriye. Ya rastî Enwer Paşa hinek tişt bi ser xist. Lê şert û mercên demsalê zêde neda ber çavan. Li Erziromê li çiyayê Allahûekber di zivistanê de xwest êrîşî Rûsan bike û 90 hezar leşker xist êrîşê. Ew leşker hemû mirin û cephe ket. Van leşkeran çawa mirin? Hemû ji sar û sermayê û ji cemedê mirin. Leşkerên Enwer Paşa êrîşî mewziyên Rûsan kirin. Mewziyên Rûsan girtin, lê

cemidîbûn, nikarîbûn çek bişixulandana û li wir mirin. Ji ber şert û mercên demsalê mirin. Niha carina hinek neteweperest di zivistanê de bi meş diçin çiyayê Allahûekber. Ev çend sal in televîzyon raber dike. Ango dibêjin, "Em diçin cih û warê kal û bavê me lê miriye, bibînin." Temam ev heqê wan e, lê di halê hazir de Tirkiye îtiraf nake ku ew binkeftin û şaşiyeke mezin bû.

Ango di wir de şer bi hestan nabe, şer bi zanebûn dibe. Şer bi aqil dibe. Ango tu rabî di zivistanê de quwetê xwe werga têxî liv û tevgerê, helbet wê çawa be? Quwet wê bicemidin û nikarin şer bikin. Sefera Sarikamişê wisa çêbû. Me jî destpêkê nizanîbû. Me jî sala '85'an quwetê xwe di zivistanê de xist liv û tevgerê. Nimûne grûba Garzanê di zivistana '85'an de dil xwe de wê biçin Garzanê, lê zivistan e, mecbûr man li gundan bimînin. Piştî wê derbe xwarin û tesfiye bûn. Piştî tecrûbeyên wisa gelek bi me re çêbûn, baş fêm bû ku zivistanê nabe grûb ji bo deverên dûr bêne şandin. Niha em baş dizanin di zivistanê de çûyîna Garzanê mirin e, tesfiye ye û nabe. Kes nikare zivistanê bimeşe biçe Garzanê. Wê çaxê ev zanebûn bi me re nebû. Grûba hat şandin jixwe tesfiye bû. Hinek şehîd ketin, hinek jî êsîr ketin. Her wiha grûbên zivistanê hemû şerpeze bûn. Wê çaxê Serokatî rexne kir û got:*" We sefera Sarikamişê daye destpêkirin.*

Ango di şer de demsal pir girîng e. Mesela, havîna pir germ jî girîng e. Di havînê de quwet zehf nikare bimeşe, nikare zêde manewre bike, şev kûrt in, roj dirêj in. Ango demsal bandor dike. Bihar bi şeklekî din bandor dike. Çima? Di biharê de hemû çem radibin. Gelek çem hene tu nikarî jê derbas bibî. Mirov derbas bibe wê bi ber avê bikeve. Lê piştî wê du mehan, mirov bêje ji gulanê şûn de tiştekî wisa nîn e. Ango demsal li ser şer pir zêde bandor dike. Yek ji xisûsên şer bandor dikin, demsal e.

## 2- Li Ser Şer Bandora Erdnîgariyê

Faktoreke din ku şer zêde bandor dike, erdnîgarî ye. Erdnîgariya welatê ku tê lê şer bikî, girîng e. Ji ber ku şerê çiyayê asê cuda ye, şerê li erdnîgariya çal û xwar cuda ye û şerê li deştê cuda ye. Ango erdnîgarî di şer de pir zêde rola xwe heye. Li gorî hêzan e. Mesela hêzek teknîka xwe, tang û firokeyên xwe heye, dixwaze li deştê şer bike. Lê hêzeke tang û firokeyên xwe tune ye, dixwaze li çiyayan şer bike. Mesela ji bo gerîla li deştê şer pir zehmet e. Gerîla dixwaze li çiyê şer bike. Lê pirek ji artêşên din jî şerê çiyê tercîh dikin. Ango ne ku tenê gerîla dixwaze îleh li çiyê şer bike û hemû artêş jî dixwazin li deştê şer bikin. Na. Ne wisa ye. Ango li gorî derfetan e. Ji bo vê di şer de rola erdnîgariyê zêde heye. Heta di nava çiyê de jî, mesela arazî heye ku tu dikarî lê şer bikî. Arazî heye tu nikarî lê şer bikî, ji ber ku îmha ye. Arazî heye gava dijmin hat, pêwîst e tu mewzî bigirî û şer bikî. Arazî heye gava dijmin hat, divê tu ji wir birevî. Yekane çare rev e. Çima wisa ye? Ji ber ku arazî mehkûm e.

Araziyê mehkûm heye, araziyê hakim heye. Gerîla di araziyê mehkûm de şer bike, wê tesfiye bibe. Ji bo vê divê gerîla ji araziyê mehkûm dûr bisekine û di araziyê hakim de bizanibe şer bike. Serokatî pir hewl dida li Eyaleta Tolhildan ango bi navê din Başûrê Rojava quwetê me yê gerîla bicih bibe. Ji bo vê Serokatî bi xwe li ser disekinî. Lê tim quwetê li wir derbe dixwar. Min ev ji nêz ve dizanîbû; ji ber ku ez jî pê re mijûl dibûm. Li Eyaleta Tolhildan heval têketana şer, piranî caran windahî didan. Lê li cihekî wekî Botanê, Zagrosê bi dehan caran heval bi rojan diketin şer, pir zêde windahî nedidan. Carekê min ji Serokatiyê re pêşniyar kir ku, em quweteke ku li Botanê tecrûbeya şer girtî û dizane, di arazî de dikare şer bike, bişînin Eyaleta Tolhildan wê baş bibe. Serokatî jî ev pêşniyara min guncaw dît. Wê çaxê me grûbek heval ji Botanê, ji bo biçin Eyaleta Tolhildan rêkir saha Serokatiyê. Me 13 heval bijartin, hemû jî fermandarên taxim û mangeyan bûn. Wê çaxê jî fermandarên me yên taxim û mangeyan xurt bûn. Hemû hevalên bijare bûn, piraniya wan li Botanê şer kiribû. Serokatî wan hinekî perwerde kir û piştî wê şand Eyaleta Tolhildan. Hevalê Akîf berpirsyarê wana bû.

Mixabin wan hevalan sînor derbas kirin şûn de di rê de, li deşta Islahiyê dijmin bi wan hesiya. Li wê derê şerekî pir cidî kirin û şehîd ketin. Ez bawer im di wê grûba min şandî de yek tenê ne tê de, yên din hemû di grûbê de bûn. Heval negihîştin Eyaleta Tolhildan. Ev hevalên wisa dezavantajeke wan jî heye. Mesela, fêr bûne li çiyê bi dijmin re şer bikin; ku di pratîkê de me ev gelek caran dît. Ne ku cara yekemîn dibû. Li Mêrdînê û li deverên din me ev dît. Ew quwetê li çiyê fêr bûye xwe bi şer biparêze, diçe li deştê jî dixwaze bi heman şêwazê şer xwe biparêze, lê li deştê windahî dide. Wan hevalan li wir, tê bêjî qey Botan e, şer kirine. Ger şer nekirana û manewra bikiran belkî hinek ji wan xilas bibûna. Ji ber ku deşt e, hemûyan nedikarî bi hêsanî xilas bibin. Lê belkî hinek ji wan xilas bibûna. Hevalan li wir şer kirin, hem jî şerekî pir cidî kirin; bi giştî 21 heval bûn. Di sala '94'an de hemû şehîd ketin. Fêmkirina araziyê hakim û mehkûm û li gorî wê şer kirin, pir girîng e. Mesela li gorî min yekî leşker divê li cihê mehkûm nesekine. Belkî carina ji bo xwe veşartinê li cihê mehkûm dimîne, lê tenê bi quwetên pir hindik wisa dibe. Divê mirov tim xwe bide cihê hakim.

Di hemû şeran de rola arazî heye. Ango di şerê navbera artêşan de rola arazî zêde heye. Lê belê rola araziyê herî zêde ji bo gerîla heye. Ger gerîla, ji bo tevgerîna gerîla araziyê guncaw esas negire, wê derbe bi xwe. Ji ber ku gerîla pişta xwe dide erdnîgariyê û wisa li hemberî dijmin dibe xwedî avantaj. Dema araziyê şaş bibijêre, ew avantaja xwe winda dike. Lewre mijara araziyê ji bo gerîla girîngtir e. Lê di giştî şer de arazî, erdnîgarî pir girîng e. Heta niha jî gelek windahiyên me ji ber baş bikarneanîna erdnîgariyê ye. Ger erdnîgarî baş bê bikaranîn, windahiyên gerîla ewqas zêde nabin. Nexwe xisûsên girîng: Yek, demsal e; ya din jî, erdnîgarî ye.

### 3- Li Ser Şer Bandora Lojîstîk û Teknîkê

Di şer de rola lojîstîkê jî girîng e. Lojîstîk, têgîneke pir fireh e. Ango çek jî dikeve nav vê beşê, xwarin jî dikeve nav vê beşê, cil jî dikeve nav vê beşê. Çek, bi serê xwe girîng e. Jixwe teknîk-çek di şer de pir girîng e û rola xwe ya mezin heye. Ev tê zanîn. Lê di artêşê de, ji bo quwet lojîstîkên din ên wekî xwarin, cil û pêwîstiyên hwd. jî girîng in. Di leşkeriyê de ji bo ku tu bikaribî şer bikî, pêwîst e tu girîngiyê bidî meseleyên lojîstîkê. Gelek fermandarên me girîngiyê nadin lojîstîkê. Lewre quwet bê lojîstîk dimîne, bê taqet dibe û dûvre jî nikare çalakiyê bi ser bixe. Wisa nabe. Tê girîngiyê bidî lojîstîkê. Lojîstîk tenê ne erzaq û tiştên din nîn in. Hemû pêwîstiyên şer lojîstîk in. Ji çek û cebilxanê bigire, heya cil û xwarinê hemû dikevin nav bergeha lojîstîkê.

Di şerekî de, ji bo serkeftina şer lojîstîk zehf girîng e. Fermandarek pêwîst e vê bigire dîqatê. Fermandarek ku girîngiya lojîstîkê negire dîqatê û wisa bi awayê gelemperî nêzîk bibe, ew nikare tam encam bigire. Mesela, cebilxane nebe, tu nikarî şer bikî. Çeka te ne temam be, tu nikarî encama dixwazî, bigirî. Wekî din, pêwîstiyên leşker ne temam bin, tu nikarî tam rol pê bidî lîstin. Ev xal girîng in. Ango lojîstîk jî di şer de roleke xwe ya girîng heye. Şer bi însan û lojîstîkê tê meşandin. Tiştê ku esas diyar dike însan e, ne lojîstîk e. Lê lojîstîk jî nebe şer bi ser nakeve. Heta lojîstîk nebe şer nabe. Ji ber ku şer encex bi lojîstîkê tê kirin.

Mesela tu taktîkê li gorî cebilxane û çekên xwe diyar dikî. Ger cebilxaneya te û teknîka te xurt be, tu li gorî wê taktîk bi pêş dixî. Lê cebilxane û teknîka te zeîf be û kêm be, tê li gorî wê taktîka xwe diyar bikî. Ev xisûs jî encama şer û taktîkê diyar dike. Nimûne; şerê 2000'î li Qendîlê ger me cebilxane û çek nedana ber çavan û me plana xwe çêbikira me yê şer winda bikira. Çima? Ji ber ku em dorpêç kirin. Quwetê wan hemû dora me girt. Îran jî pişt me girt û pêşiya me jî quwetê pêşmerge girt û cebilxaneya me ya yêdek tune bû. Wê çaxê ji ber encama hinek fikrên rastgir tu amadekarî tune bû. Çekên BKC qet tune bû, pir hindik bû. Tenê qlêşa di destê hevalan de hebû. Jixwe piranî heval ji Bakur hatibûn û tenê qlêş di destê wana de hebû.

Ji ber ku di şerê Qendîlê de cebilxaneya me tune bû, li gorî wê me taktîk diyar kir. Me taktîka sizmê esas girt. Ji nişka ve bi bombeyan çalakiyên sizmê hatin kirin. Wekî din tu biçî ser dijmin, dijmin dikare birêkûpêkî bi paş ve bikişe û tiştekî li dûv xwe nehêle. Lê bi sizme û ji nişka ve tu bombeyê lê bixî, wê şoke bibin. Dema şok dibin tiştên xwe yên wekî cebilxaneyên giran, BKC û hwd. li şûna xwe dihêlin. Gava cebilxane dihiştin hevalan şeva din bi wê cebilxaneyê şer dikirin. Û wisa encam hat girtin. Ger ne wisa bûya, jixwe cebilxane û çekên mirov pê şer bikira tune bû. Em mecbûr bûn taktîk wisa diyar bikin, ji bo em çek û cebilxane bi dest xwe bixin. Jixwe wisa jî pêk hat. Ango di şeran de çek û cebilxane pir girîng in. Cebilxane di şeran de sir in. Divê mirov kêm e yan jî zêde ye, der heqê wê de agahî nede.

Bi kurtahî cebilxane û çek di diyarkirina taktîka şer de girîng in. Berê şûr hebû, niha çekên pir pêşketî çêbûne. Çekên niha tên bikaranîn ên teknolojiya herî bilind in. Vana hemû li ser şer bandorê çêdikin. Pêwîst e mirov vê zanibe. Bi taybetî di serdema me de teknolojî pir bi pêş ketiye û çekên pir encamgir hatine afirandin. Îro pêşketina zanista fezayî (uzay bilimi) û pêşketina kompîtur di çekên şer de guhertinên bingehîn çêkirin. Bi taybet bi balafirên bêmirov tespîtkirina koordînatan û bi kompîturê rêveberina roketên diçin koordînatan di çekên şer de guhertineke bingehîn bi pêş xist. Ev rewşeke nû ye. Bi taybetî di şer de bikaranîna kompîturê, teknolojiya elektro-teknîk guhertineke mezin çêkir. Di vê serdemê de rola çekên konvansiyonel ên klasîk êdî lawaz bû. Sîstema fuzeyên hewayî û bejayî roja îro di çekên şer de nûbûnek çêkiriye. Di vê serDema fuzeyên di navbera parzemînan de (kıtalar arası) hatine pêşxistin de, eşkere dike ku di şer de û di taktîka şer de rola çekan derdikeve pêş. Lê cardin jî yê ku encamê diyar dike, însan e. Ji ber ku teknolojî çiqasî bi pêş ketibe jî, teknolojiya herî mezin îrade û qabiliyeta însan bi xwe ye.

Li kêleka van tiştan çekên ne asayî jî hene. Wekî nukleer, kîmyewî û hîdrojen. Jixwe vana di aliyê qanûnên navnetewî de hatine qedexekirin. Lê cardin jî hêzên ku van çekan di destê wana de hene, tên zanîn. Jixwe vana bi serê xwe li ser şer û stratejiya şer bandorên pir mezin çêkirine. Îro çekên di şer de hatine bipêşxistin ên qirkirin û derveyî mirovatiyê ne. Modernîteya kapîtalîst bi pêşxistina van çekan xwezayîbûna mirovatiyê jî xistiye bin xeteriyê.

Ji bo vê yekê di şerê li hemberî me de dewleta Tirk di bingeha statejiya xwe de hem çekên bi teknolojiya bilind bi kar tîne, hem jî li ser me qutkirina lojîstîkê esas girtiye. Dewleta Tirk ji bo çekên herî di pêş de bi dest xwe bixe hemû derfetên xwe bi kar tîne. Jixwe îro bi van çekan dewleta Tirkiyê encex dikare xwe li hemberî gerîla biparêze. Heman demê ji bo lojîstîka gerîla çênebe bi hezaran gundên Kurdistanê vala kirin. Gelek rê û dever girtin ji bo ku lojîstîka gerîla nemîne, tî û birçî bimîne û wisa di herêmê de bişkê. Dijmin ji bo vê pir plan û taktîk bi pêş xistine. Dewleta Tirk vê mijarê di asteke stratejîk de digire dest. Armanca wî ev e ku li ser gerîla lojîstîkê qut bike û wisa biçe encamê. Ji ber ku lojîstîk nebe jixwe şer jî nabe. Lê ev heye ku, her dewlet an jî hêz li hemberî dijminê xwe dema taktîk dimeşîne, pêwîst e hinek pîvanên exlaqî û wijdanî esas bigire û rewşa gel bide ber çavan. Feqet dewleta Tirk di şerê li dijî me de pîvanê exlaq û hiqûq tu caran esas negirtiye. Bi şêwazekî herî hov bi hezaran gund vala kirin û bi milyonan însanên me koçber kirin, tenê ji bo ku gerîla nikaribe lojîstîkê bibîne. Ev hovîtiya dewleta Tirk kiriye hemû ji bo lojîstîkmê ye. Rast e, mirov ji bo li hemberî dijminê xwe bi ser bikeve gelek taktîk û stratejiyan dimeşîne, lê divê di her tiştî de exlaq û mirovatî hebe. Yên mirovatiyê esas nagirin û newêrek bêhtir giraniyê didin rêbazên wisa hov û ne mirovatî, ji bo lojîstîkê qut bikin û wisa biçin encamê.

Bi kurtahî di şeran de lojîstîk cihekî xwe yê stratejîk heye. Ji bo vê fermandarek dema taktîk û stratejiya xwe bi pêş dixe, divê di asta yekem de rewşa lojîstîka xwe bide berçavan û wisa şer bi pêş bixe.

### 4- Di Şer De Rola Îstixbarat û Muxaberê

Di her merheleya dîrokê de di şeran de îstixbarat ango agahî roleke xwe ya girîng û esasî çêbûye. Lê di serdema me de ev rol hîn pir zêde bûye. Ji ber ku ji sedema me re tê gotin “serdema zanistê”. Roja îro zanistî ne tenê ji bo şer, ji bo siyaset û aboriyê jî girîngiya xwe heye. Mirov dinêre, her saziyek beşek xwe ya îstixbaratê ango ya agahî girtinê heye. Kesekî bê îstixbarat, dişibe însanekî di tarîtiyê de dimeşe. Hêza ku îstixbarata xwe xurt be, ji bo xwe tarîtiyê dike ronahî. Ango wê bizanibe dijmin di çi rewşê de ye. Hêza xwe çiqas heye, çekê xwe çiqas heye? Kengî dixwaze hemle bike, kî der vala ye, kî der tijî ye? Moralê hêza dijmin çawa ye, taqeta xwe çiqas heye? Mirov dikare van hemû agahiyan bi rêya îstixbarateke xurt bi dest xwe bixe.

Çavderî, şopandin û agahiyên di nav dijmin de tên, dema hevdû temam bikin, mirov der heqê dijmin de dikare bigihe agahiya rast. Ev tişt ji bo dewlet an jî holdîngên aboriyê jî derbasdar e. Ji bo bizanibin hevrikê (rakip) wan dixwazin çi têxin bazarê û çi tiştî îcad bikin û taybetmendiyên din ji bo fêr bibin li ser hevrikên xwe îstixbaratê bi pêş dixin. Ji ber ku yên hevrikê xwe nas bikin, ew jî dikarin li gorî wê hemleyên aboriyê bikin û bi ser bikevin. Ango roja îro agahî girtin tenê ne ji bo şer, ji bo her karî girîngiya xwe ketiye pêş. Helbet di şer de hîn zêde roleke xwe ya jiyanî heye. Ji bo vê yekê, ger îstixbarata kîjan alî xurt be, ew alî hîn zêdetir xwedî avantaj e. Jixwe roja îro mecala îstixbaratê jî pir xurt bûye. Veşartina agahî û tevgerê pir zehmet bûye. Guhdarkirina sîstema muxaberê, pêşketina amûrên keşfê, pêşketina zanebûna fezayî yên wekî peyk (uydu) vana hemû mecalên îstixbaratê pir xurt kirine. Hêzekî şer ê profesyonel divê ew jî pir zêde girîngiyê bide îstixbaratê.

Heman demê di şer de rola muxaberê pir zêde heye. Ger hêzek sîstema xwe ya muxaberê lawaz be û di wextê de nikaribe rapor bigire û talîmat bide, ev rewş ji bo wê hêzê lawaziyek e. Ji bo tu di şer de bi ser bikevî îstixbarat girîng e. Lê divê sîstema muxaberê bi rêk û pêk be. Di vir de ya girîng, sîstema muxaberê agahî nede dijmin. Ji bo vê, divê rêbazên şîfreyê pir zêde bên bikaranîn. Muxabereya herî baş a ku bê navber dixebite û agahî nade dijmin e. Ji bo vê muxabere li kêleka sîstema şîfreyê, divê zêde û fizûlî neyê kirin; her wiha kêm û li gorî pêwîstiyan bê kirin. Li gel wê tu di muxaberê de tiştê ne pêwîst be jî biaxivî, wê dijmin teqez jê sûd bigire. Lê di bin navê dijmin agahî negire û dizîbûn çêbibe de ger tu qet muxabere nekî, hêza te wê nikaribe bi koordîne tevbigere û agahiya wan ji hev tune be. Di rewşên wisa de şerê bi koordîne nameşe. Di vir de rêya herî rast, ger tiştekî pir û pir lezgîn tune be, divê muxabere bi rêya nivîsandina dest be. Ango bikaranîna kurye ye. Ya herî saxlem ev e. Ger hêzek dixwaze dijmin li ser wê qet agahî negire û dizîbûneke kûr esas bigire, divê muxabereyê bi cîhaza teknîkî neke, bi rêya kuryeyan bike. Ev tiştekî misoger e. Ger tu bi rêya cîhaza teknîkî muxabere bikî, dizîbûna te namîne. Ji bo vê, bi taybetî yekîneyên gerîla yên di erdnîgariyê de veşartî bin, divê muxabereyê bi amûrên teknîkî nekin. Di vê der heqê de divê dîsiplîneke pir hişk hebe.

Ji bo hêzeke leşkerî muxabereya bi rêya telefon û înternetê întixar e. Pêwîst e ev qedexe be. Ger wê muxabereya te bi rêya cîhaz û teknîkê hebe jî, divê ev cîhaza bêtêl be. Divê ev ne bi telefon û înternetê bê kirin. Lê divê cardin tu bizanibî ji muxaberaya bêtêl jî dijmin sûd digire, dikare tevgera te nas bike û bi teqrîbî cih û warê te hinekî bizanibe. Ji bo vê ger tu dixwazî tevgereke veşartî bi pêş bixî û derketineke surprîz ji bo dijmin pêk bînî, divê tu qet û qet di muxaberê de teknîkê bi kar neynî û xwe nîşa însanên sivîl nekî. Wekî tevgereke bin erd bimeşîne ku heta tu bikaribî xwe ji îstixbarata dijmin biparêzî.

Bi kurtahî di şer de rola muxabere û îstixbaratê pir zêde heye. Ger hêzek dixwaze di şer de bi ser bikeve, divê îstixabarata xwe xurt bike û muxaberaya xwe saxlem bike.

## 5- Di Şer De Rola Hêzên Pispor û Profesyonel

Xisûsa din ku li ser şer bandora xwe çêdike, şerkerî ye. Ango wesfê (nîtelik) şervan e. Çiqas dikare şer bike, çiqas nikare şer bike? Ev jî bi çi tê diyarkirin? Bi sekneke bi biryar, cesaret, di şer de xwestek, di taktîkên şer de kûrahî û bi hakimiyeta li ser teknîka şer tê diyarkirin. Ango zelaliya îdeolojîk, taktîk û hakimiyeta li ser teknîkê bingeha pisporiyê ye. Leşkerekî pispor an jî profesyonel li ser van hîman dikare bi pêş bikeve. Mijareke girîng e. Bi taybet di pêşxistina pisporiyê de perwerde pir zêde rola xwe heye. Di şer de wesf (nîtelîk) pir zêde rola xwe heye. Di dîrokê de jî wisa bûye, niha jî wisa ye. Mesela di hundirê dîrokê de kesên pir şerker hebûn. Kurd ji wana re dibêjin, "egîd û lok". Kes nikare lok û egîdan derbas bike. Vana di hemû welatan de hene. Mesela li Çînê pir zêde hene. Niha Çîniyan li ser wan fîlm çêkirine. Yek şerker bi tena xwe dikare sed şervanî. Japon û Çînê ev tişt pir zêde bi pêş xistine; bi taybetî jî Japonya.

Li Japonya leşkerên Samûray hene. Samûray leşkerên tam profesyonel in. Nêzî 20 salan perwerde dibînin. Di warê exlaq, çand û leşkeriyê de tên gihandin. Heman demê li Kurdistanê jî egîd hene. Ji wana re egîd an jî lok tê gotin. Her yek ji wan bi tena xwe dikare qedera sed şervanên ji rêzê bi bin bixe. Ango şervanên pispor û profesyonel in. Di çanda Ewropa de jî şovalye heye. Şovalye jî wekî samûray û egîdan in. Dibe ku asta xwe ne wekî samûray û egîdan be, lê ew jî wekî wan leşkerên profesyonel in.

Dîrok raber dike ku însanê di şer de profesyonel, fizîkî xurt, di şûr, rim û tîr-kevanê de xurt, dikare çend kesên ji xwe zêdetir bi bin bixe. Belkî dikare 10 kesan, belkî dikare 20 kesan, an jî dikare 100 kesan. Ango perwerde di mirovan de asta şer pir xurt dike. Yên wisa di biçûkatî de pir zêde perwerde dîtine. Çawa dizanin werga şûr bi kar bînin? Ev hemû bi perwerdeyê dibe, bi xurtbûna fizîkî dibe. Lê niha quweta fizîkî ne lazim e. Di leşkeriya çiyê de heya astekê hêza fizîk pêwîst e, lê îleh ne lazim e pir bi quwet be. Di şerên berê de însanên şerker ji bo bi quwet bin, pir zêde dixwarin. Berê Şêrgo yê mamê Selahaddînê Eyyûbî pir dixwar. Yek pê re hebû, xîzmetkarê malbata wan bû û extiyar bû, tenê erkeke wî hebû; gava Şêrgo xwarin bixwara, wê biçûya jê re bigota, "bes e". Tenê erka wî ev bû. Ji ber ku pir dixwar, nizanîbû xwarinê biterikîne. Şêrgo egîdekî Kurd e. Kesê ku Selahaddînê Eyyûbî kiriye Selahaddînê Eyyûbî Şêrgo ye. Esas Şêrgoyê mamê Selahadîn wî fêrî şer dike. Lê ew xizmetkarê Şêrgo, her ku Şêrgo li ser xwarinê be, tê di guhê wî de dibêje, "bes e". Ew bi xwe nikare pîvanê bigire. Piştre ew xizmetkarê wî dimire, kes nikare xwarina Şêrgo kontrol bike. Carekê diçe seferekê, ji şer vedigere, ser xwarinê rûdine, dixwe û dixwe heta zikê wî diteqe. Wisa dimire. Li gorî dîrokê jî ji zêde xwarinê miriye. Nexwe kesekî wekî dêw e.

Wê çaxê aqil û fizîk lazim bû, lê di her kesî de nebû. Fizîk û aqil bi hev re pêwîst e. Ji ber ku di hinekan de aqil heye, fizîk nîn e; di hinekan de fizîk heye, lê aqil nîn e. Vana nikarin bibin şerkerên mezin. Ji bo vê yên wisa li herêmekê yek-du kes dihatin dîtin. Kesê wisa hem bi aqil, hem jî fizîka xwe xurt kêm dihat dîtin. Niha fizîk ewqas ne lazim e. Tenê bikaribe li çiyê bimeşe, ne seqet be, bes e. Niha aqil, bawerî û usûl zanîn lazim e. Aqil ji bo çi pêwîst e? Ji bo zanyariya taktîka şer û bikaranîna teknîkê pêwîst e. Mesela taktîka şer wê çawa bi pêş bixe; di vê de bi aqil tevbigere. Niha dîsa aqil lazim e, belkî fizîk tam na, lê aqil pêwîst e. Niha jî kesê pispor ango profesyonel pêwîst e. Yek leşkerê ku pispor be, bîr û baweriya xwe hebe, cesareta xwe hebe, fedaî be û bi rastî di leşkeriyê de pispor be, di teknîkê de hakim be, bi qinyeta min de dikare 50 kesan. Wisa ye. Ango 5 kes tam pispor bin, di şer û taktîk de hakim bin, ew 5 kes dikarin 250 kesan. Ango ev wesf ji bo niha jî derbasdar e. Pêwîst e em jî wesfê hêza xurt bikin. Niha ev di rojeva me de ye. Lê van nimûneyan ji bîr nekin.

Hêzeke di şer de xurt û hosta dikare bi hêzeke bedelê 10 qatê xwe. Îsraîl Cihû (Yahudi) ye. Îsraîl bi hemû nifûsa xwe ji 9 milyonan zêdetir e. Di sala 1967'an de Îsraîl hemû nifûsa xwe milyon û nîvek bû. Wekî niha ne zêde bû. Piştî Îsraîl bi ser ket, Cihûyê derve hatin Îsraîlê. Wê çaxê nifûsa leşkerên Ereban milyon û nîvek bû. Misir, Sûrî, Urdûn, Erebîstana Suûdî vana hemû êrîşî wan dikir. Îsraîl bi hemûyan re şer kir. Lê leşkerên Îsraîlê profesyonel bûn. Artêşa

Ereban a nêzî milyon û nîvekê nikarîbûn artêşa Îsraîlê bi bin bixîne. Îsraîlê, ew di hemû cepheyan de bi bin xistin. Ketin çola Sîna û çola Sîna girtin. Dûvre hevpeyman çêbû, Sîna dan Misrê. Îsraîl Colan girt. Colan 25 kîlometre nêzî Şamê ye. Hê jî di destê Îsraîlê de ye. Îsraîl, Urdûn û hemû erdê Filistînê girt. Xezaya ku niha dane Filistîniyan, wê çaxê girtibûn. Ango Îsraîlê zafer girt. Hejmara miletê xwe, bi qasî artêşa hatibû ser wan bû. Ango leşkerên xwe hindik bû, belkî 100 hezar bûn. Lê milyon û nîvek leşker xistin, ji ber ku artêşa Îsraîlê xwedî wesf bû, profesyonel bû, dîsiplîna xwe xurt bû. Ango di vir de tiştê em binê wê xet bikin ev e; wesf, asta şer xurt dike.

Çawa ku di dîrokê de wisa rola leşkerên profesyonel di şer de zêde ye, îro hîn zêdetir wisa ye. Ji ber ku îro teknîka şer hîn zêde bi pêş ketiye. Jixwe di sîstema dewletan de însanên 15 salan perwerde dîtibin, wekî fermandarên taximê dibin fermandarên destpêkê. Lê cardin jî ew ne profesyonel in. Li gorî pêşketina di teknîkê de, di taktîk û kûrahiya şer de çêbûyî, kesekî/e di akademiya şer de perwerde bibîne, nikare fêrî hemû tiştan bibe. Hîn zêde kûrahî û ked pêwîst e. Çawa ku di hundirê dîrokê de yên pispor bi perwerde û tecrûbeyê digihîştin, îro ev hîn zêdetir wisa ye, hîn zêde perwerde û pratîk pêwîst e. Helbet ku bawerî ango îdeolojî nebe, leşkerê profesyonel çênabe. Ji ber ku di leşkeriyê de bawerî mijareke girîng e. Di sîstema dewletan de bi salan perwerde didin, lê leşkerên xwe nabin profesyonel. Pisporek dema ne bawermend be, ku bikeve tengasiyê wê bitirse, xwe şaş bike û çi feydeya pisporiya xwe nabe, wê bireve. Ji bo pispor, di bin her şert û mercî de bibe leşkerekî jêhatî, divê bawermend be. Divê bi doz û daweya xwe bawer bike. Ji bo wê daweyê divê amade be ku xwe feda bike. Ger ev ruh pê re tune be, çiqas perwerde bibîne jî nikare bibe pispor. Di dîrokê de hin însan ji egîdî yan jî ji samûraytiyê ketine. Yên baweriya xwe dişkin, dikevin. Ango baweriya xwe ku ji bo merdiya xwe û soza dayî xwe feda bike, dişke. Wê çaxê rola xwe ya samûraytî dikeve. Samûrayek an jî egîdek divê her tim ji fedaîbûnê re amade be. Ango netirs be.

Roja îro ev di nava me de tiştekî pir zêde derbasdar e. Gerîlayekî/e bawermend bi perwerdeyeke kurt û bi tecrûbeyeke dem kurt dikare bibe leşkerekî/e profesyonel. Çima? Ji ber ku yek; baweriya xwe ya îdeolojîk heye. Didu, perwerdeya dibîne li ser esasê tecrûbeya tevgerê ya 32 salan e. Lewre perwerde hîn zêde encamgir e. Ji ber vê yekê di nava refên me de di hundirê salekê de yek dikare bibe leşkerekî/e profesyonel. Lê kengî baweriya xwe bişke, bêbiryar bibe, ew nikare heman rolê bilîze. Ji ber ku profesyonelbûn, lingekî xwe bawerî ye. Nimûne, hêzên ne bawermend nikarin bi xurtî şer bikin, an jî nikarin li hemberî gerîla bisekinin. Ji bo vê, yek gerîlayekî/e profesyonel dikare bedelê 50 kesan şer bike.

### 6- Faktora Gel

Dema di navbera 2 artêşan de şer dibe, artêşa ku gelê xwe li pişt e, derfeta xwe ya serkeftinê hîn zêde ye. Bi taybetî erdnîgariya şer lê dibe, gelê li wir alîgirê kê ye; ev jî pir girîng e. Ango di şerê navbera du artêşan de diqewime, ev her du mijar bandora xwe pir zêde li encamê dikin. Artêşa ku gelê xwe li piştê be, derfetên xwe yên serkeftinê zêde ne. Ji ber ku hem jê re leşker tê, hem jî wê moralê xwe di cih de be. Bi giştî di şerê navbera artêşan de mirov dikare bandora gel a li ser şer wisa bîne ziman. Ji bo şerek bi ser bikeve, helwesta gel jî faktorek e ku encamê diyar dike.

Ger şer, şerê şoreşê be, mesele cuda ye. Ji ber ku şoreş jixwe berhema gelan e. Ji bo ku şerê şoreşê bi ser bikeve, divê piştevaniya gel jê re hebe. Ger piştevaniya gel tune be, ne mumkûn e gerîla mezin bibe û heta bikaribe şer jî bi ser bixe. Bandora gel a li ser şerê di navbera du artêşan de di encamê de heye. Lê belê di şerê şoreşê de helwesta gel encamê diyar dike. Ji bo şoreşek bi ser bikeve, teqez divê gelê xwe pê re beşdar bibe û bi her awayî piştevanî bike. Artêşa gel bi vî awayî dikare mezin bibe û bi ser bikeve.

Ev tiştên em dibêjin prensîbên giştî ne. Roja îro li Kurdistanê şerê tê meşandin jixwe lingekî xwe gel e, lingekî xwe gerîla ye. Lewma şerê îro li Kurdistanê dibe, bi temamî li ser milê gel dimeşe û helwesta gel li ser encamê ji sedî sed diyarker e.

Di şeran de faktorên ku encamê diyar dikin, ev in. Divê mirov faktorên şer bigire dîqatê. Ev çi ne? Erdnîgarî, demsal, lojîstîk, çek, cebilxane, piştevaniya gel û wesfê leşker e. Her şervan û fermandarekî/e xwediyê armanca serkeftinê pêwîst e van faktoran li ber çavan bigire û wisa şer bike.

# Beşa Sêyemîn:

# DI HEBÛNA CIVAKAN DE ROL Û GIRÎNGIYA PARASTINÊ

Berî niha em li ser teoriya şer, wateya şer û şer çawa derketiye holê, sekinîn. Dîsa bi esasî me mijara şerê mafdar, an jî şerê parastina rewa vegot. Li hemberî êrîşên zordestiyê, dagirkirinê û kolekirinê; berxwedan, rawestîn û şerê di vê çarçoveyê de pêş dikeve, em jê re dibêjin, "şerê mafdar." Me berî niha jî got, şerê mafdar tenê ne mafdar e, heman demê pêwîst e. Eger li cihekî destdirêjî hebe, li ser nirxên civakekê êrîş hebe, ew civak mafê xwe heye xwe biparêze. Ev êrîş çi li ser axa wî dibe, çi li ser zimanê wî dibe, çi jî li ser bawerî û kesayetiya wî dibe, li hemberî êrîşên wisa erka wê civakê ew e ku, bêdeng nemîne, rûmeta xwe, hebûna xwe û nirxên xwe biparêze. Ev çawa ji bo civakê wisa ye, ji bo her şexsekî/ê jî wisa ye. Şexsekî/e ku êrîş were ser rûmet û kerameta wî/wê, mafê wî/wê şexsî/ê heye li hemberî wê êrîşê xwe biparêze. Ev mafekî rewa ye.

Heman tişt ji bo zindiyên din jî derbasdar e. Ango tu êrîşê bibî ser heywanekî, mafê wî heye xwe biparêze. Jixwe heywan jî bi wê refleksê çêbûne. Dema pê dihese êrîş li ser heye, ew jî sîstema xwe ya parastinê dixe dewrê. Li hemberî êrîşan şeklê xwe parastina hinek heywanan reve, yê hinekan xwe veşartine, yê hinekan jî êrîşkirin e. Her heywanek sîstema xwe ya parastinê cuda ye. Heta heywan heye ku, dema mirov dide pey şopa wî, destpêkê direve, lê ku ket cihekî teng, mecbûr dimîne vê carê êrîş dike. Di vê mijarê de heywanê herî biçûk pisîk jî wisa ye. Mirov ku li pey here û wê bixe quncikekê, pisîk mecbûr dimîne vê carê vegere û êrîş bike. Heywanên din jî wisa ne. Nimûne beraz; dema tu bidî pey şopa berazan, pêşiya wan bê girtin, rêya revê nemîne, vê carê êrîşî mirov dikin. Beraz jî wisa ne. Jixwe heywanên din ên bihêz û hov êrîş dikin. Dema bibînin ku mirov wê zirarê bide wan, ew êrîşî mirov dikin. Heywan jî li gorî xwe taktîkên xwe hene. Êrîşa heywanan ne tenê ji bo parastinê ye, heman demê ji bo jiyanê ye.

Der barê nêçîrê de gelek belgefîlm li ser heywanan tên çêkirin. Şêr ji bo nêçîra xwe xewle bike, reng bi reng taktîkên xwe hene. Jixwe parastin û jiyan wekhev e, di heman wateyê de ye. Şêr ji bo xwe bijî, wê nêçîrê dike. Ev mafek e, qanûneke xwezayî ye. Her zindiyek ji bo bijî nêçîrê dike.

Cardin nimûneya gur heye. Ji bo wê dibêjin "xefka gur". Destpêkê gur mirov dikişînin nav xwe, paşê dixin navbera xwe, dixin kemînê û wekî qefle komek gur bi hev re êrîş dikin. Werga derbeyê li yê hemberî xwe didin. Nexwe di parastinê de yan jî ji bo jiyanê di nêçîrê de heta heywan jî taktîk û refleksên xwe hene. Her zindiyek li hemberî êrîşê sîstem û şêwazekî xwe yê parastinê heye.

Bi heman awayî civakan jî sîstema xwe ya parastinê bi pêş xistine. Civak, destpêkê bûne qebîle, dûvre bûne eşîr. Dûvre komên ku zimanê wan, çanda wan, refleks û psîkolojiya wan nêzî hev ên li ser heman erdê jiyan dibûn, hêdî hêdî dibin gel. Wekî gel konfederasyon çêdibin. Dûvre jî netewebûn bi pêş dikeve. Ango yekbûneke wan heye. Em ji vê re dibêjin, netewe yan jî gel. Netewe yan jî gel, nirxên wan ên hevbeş çêdibin. Ev welat e, ziman e, dîrok e, çand e. Di aliyê baweriyê de belkî giştî nabin yek, lê nirxên wan ên hevbeş hene. Ji wê şûn de, berjewendî heye ango jiyana azad e. Yê heywanan jî wisa ye, lê bêhtir însan ji bo xwe biparêze pêwîstiyê bi civakbûnê dibîne. Civakbûna însan, berî her tiştî sîstemeke parastinê ye.

Civakbûn, bi hev re jiyîn e. Gund, li ser vî esasî ava dibin. Piştî Şoreşa Neolotîkê jî gav bi gav bajar ava dibin. Ew bajar giştî bi hev re sîstemeke xwe ya parastinê saz dikin. Dûv wê re

hîn firehtir netewe saz dibin. Wekî netewe berjewendiyên xwe ango nirxên xwe yên hevbeş pêk tên. Dema li ser wan nirxan êrîş çêbû, ew civak an jî netewe mafê xwe heye ku, wan nirxên xwe yên hevbeş biparêze. Eger neparêze jixwe ew netewe nikare hebûna xwe bidomîne. Em dizanin ku berê di hundirê dîrokê de pir gel hebûn. Lê roja îro pirek ji wan tune ne, heliyane yan jî wekî hindikahî mane. Çima? Ji ber ku sîstema parastinê xurt bi pêş nexistine. Di wir de lawazî çêbûye. Ji bo wê jî yan hebûna wan rabûye, nemaye û ji dîrokê re bûne mal, an jî bûne hindikahî. Gelek netewe werga navên wan di dîrokê de hene, lê îro ew bi xwe tune ne.

Divê mirov parastinê, bi taybetî ji bo civakan giştî îleh bi çek, bi şer fêm neke. Mesela, parastina çand, ziman û kevneşopiyên xwe heye. Ango parastin, giştî îleh ne bi çek e. Encex ger mirov li cihekî rê bide desthilata hêz an jî dewleteke biyanî, ew were axa mirov zeft bike û li ser wê axê kontrolê çêbike, ji wê şûn de sîstema xwe ya çand, ziman û kevneşopiyan hino hino li ser civakê ferz bike, ev tê çi wateyê? Nexwe Dema mirov di warê leşkerî de derî vekirî hişt, hemû tiştên mirov dikevin bin êrîşê. Ango wekî ku mirov derfeteke herî mezin ji destê xwe berdide. Lewre parastina bi leşkerî li pêş e. Dema mirov welatê xwe bi leşkerî biparêze, wê çaxê mirov kevneşopiyên xwe, kerameta civakê, zimanê civakê û wêjeya civakê diparêze. Mirov bi vî awayî dewlemendiyên civakê yên ser erdê û bin erdê diparêze.

Helbet parastina herî girîng, parastina bi leşkerî ye. Lê belê dema mirov nikaribe bi leşkerî biparêze û mirov bişke, ev nayê wê wateyê ku hemû tişt ji dest diçe. Gelek caran gel nirxên xwe li hemberî dagirkeriyê, di bin destê dagirkeriyê de jî diparêze. Ev jî berxwedaniyek e. Ya rastî ger gelê Kurd heya niha hebûna xwe domandiye, hinekî ji ber berxwedana meşandiye. Bi vî awayî çanda xwe, kevneşopî, keramet û nirxên xwe parastiye. Ji bo vê gelê Kurd bi tevahî neheliya ye.

Bi leşkerî ku qet neparêze û tenê bêje "ez ê çand, ziman û kevneşopiyên xwe biparêzim", ev hinekî zehmet e. Parastina bi leşkerî çi ye? Parastina bi leşkerî, biryardariyek e. Ango mirov raber dike ku ji bo nirxên xwe ger pêwîst bike, dikare dev ji jiyana xwe berde û di oxira wê de bimire. Tabî ev tiştekî di asta herî jor de ye. Yek ku vê biryardariyê raber bike, nexwe ew wê çaxê di hemû milan de xwedan biryarekê ye, xwedan îradeyekê ye. Sekna berxwedana leşkerî heman demê temsîla îrade û biryardariyekê ye. Lewre berxwedana bi leşkerî pir girîng e. Eger mirov bi berxwedana leşkerî li ber xwe bide û ew berxwedan bi ser nekeve jî, ew ji bo wî gelî dibe çîrok, dibe destan, dibe roman, dibe helbest, dibe çanda civakî, dibe klam û ew berxwedanî û çanda wê civakê dide jiyîn.

Wekî tê zanîn, îro welatê me Kurdistan bindest e. Eger di dîroka Kurdistanê de berxwedana gelê Kurd tune bûya, gelê Kurd nedikarî xwe biparasta. Berxwedana di hundirê dîrokê de dihêle Kurd jî xwe bispêre klamên xwe, destanên xwe, qehremaniyên xwe yên di dîrokê de û xwe pê li ser lingan bigire.

Nexwe berxwedan, bi esasî berxwedana bi çek vala naçe. Ger bi ser nekeve jî, dîrokekê çêdike û çandekê çêdike. Berxwedaneke ji bo hebûna çand û neteweyan qet vala naçe. Bi ser nekeve jî, dîrokekê çêdike, bingehekê datîne, ruh, felsefe û wêjeyekê çêdike û ew civak li ser wê jiyan dibe. Lê belê hîç tiştekî neke, tenê destê xwe rake jor û teslîm bibe, ew civak herî zêde dikare 100 salekê xwe bide jiyîn, lê her biçe wê ber bi helandinê ve here. Di hundirê dîroka neteweyan de berxwedanên civakî û berxwedanên ji bo hebûna civakê ku bi ser bikeve, helbet serkeftin hebûna wê civakê bi xurtî temsîl dike, lê bi ser nekeve jî ruhê civakê berdide nav hev. Ango berxwedan, ji bo jiyana civakê dibe wekî reh. Ruh dide, can dide. Çawa ku rehê darekê wê darê dide jiyîn, berxwedan jî wekî rehê darê dibe baskên ku wê civakê bide jiyîn. Wê çaxê mirov dikare wisa bibêje: Berxwedanên ji bo hebûnê, berxwedanên ji bo maf vala naçin. Yê bi ser ketî jixwe bi ser ketiye; yê bi ser neketî jî cardin bingehekê bi xwe re ava dike. Ev wisa ye.

Wekî min li jor jî anî ziman, di wateya serhildana koleyan a li hemberî Împaratoriya Romayê de, destpêkê Serhildana Spartakus di dîrokê de cihê xwe girtiye. Ev heya roja îro jî ji bo kedkaran, ji bo çînên bindest tim wekî çavkaniya îlhamê ye. Dibe ku ne berxwedaneke serkeftî ye, lê di encamê de berxwedanek e. Ji bo mirov pê li ber xwe bide çavkaniya îlhamê ye.

Di berxwedana karkeran a li Parîsê de Komuna Parîsê 6 mehan jiyan bû, dûvre şikest. Cardin burjûva desthilata xwe li Parîs û Fransa hakim kir, lê ew berxwedana karkeran a li Parîsê ji bo karkeran bû ronahiyek. Karker fêm kir ku bi esasî dikare bi ser bikeve. Ev bû çavkaniya îlhamê û karkeran jê cesaret girt. Me berî niha jî got, Marksîzmê teoriya xwe bêhtir ji pratîka Komuna Parîsê derxist. Ango jê re bû bingehek.

Nexwe berxwedana çînên bindest û gelên bindest di dîrokê de cihekî xwe heye. Mirov dikare bibêje ku, dîrok an jî mirovatî hinekî li ser wê bi pêş ketine. Heta exlaqê mirov jî hinekî bi wê berxwedanê jiyan kiriye. Ji ber ku zordest ji bo berjewendiyên xwe pîvanên exlaq nadin ber çavan, hiqûqê li gorî xwe saz dikin û li gorî xwe dimeşînin. Lê belê berxwedana çîn û gelên bindest li pêş wan dibe astengî, wana bi frên dike. Dibe sedem ku hevsengiyekê ava bikin. Mesela em bêjin, di cîhana modernîteya kapîtalîst de mafê karkeran, mafê gelan heye. Ango hinek maf hene. Van mafan burjûva bi kar nedianî. Ji bo van mafan bi sedan caran berxwedanên mezin, serhildanên mezin û şerên giran çêbûne. Bi vî awayî ew maf hatine bidestxistin. Belkî berxwedana çîna bindest desthilat bi dest xwe nexistiye, lê hevsengiyek çêkiriye.

Îro wekî navenda modernîteya kapîtalîst li Ewropa yan jî Amerîka mafên heyî, bi berxwedana çîna kedkar hatine standin. Ma 1’ê Gulanê çawa bi pêş ketiye? Mafê jinê çawa bi pêş ketiye? Ma 1’ê Gulanê û 8’ê Adarê çawa bûn cejin? Vana giştî bi berxwedana karkeran, bi berxwedana jinan çêbûne. Tê de şehîd dan, serokên karkeran hatin darvekirin. Jinan li ber xwe dan, hatin şewitandin. Ango jin û karkeran bi xwîna rijandin û berxwedana kirin, ev maf bi dest xistin. Bi vî awayî demokrasî hinekî bi pêş ketiye. Mirov dikare bibêje, demokrasiya îro di sîstema burjûva de heyî, berhema berxwedana karker û jinan e. Netewe jî wisa ne.

Ya girîng, dîroka mirovatiyê bi berxwedana rewa bi wate bûye. Nirxên exlaqî tê de hatine danîn. Ne wisa bûya, tebeqeyên serdest jixwe hiqûqê li gorî xwe saz dikin. Hemû tiştî li gorî xwe ava dikin û jê re dibêjin “hiqûq”. Binêrin, niha zindî ye; li Tirkiyê Cuntaya Darbeya Faşîst a Leşkerî ya 12’ê Îlonê di bin pêşengiya Kenan Evren de hat ser desthilatdariyê, destûra bingehîn çêkir, hiqûq saz kir, lê li gorî xwe saz kir. Di destûra bingehîn de xalek hebû, niha nû rakirin. Ango xala “**yên darbe kirine nayin dadgehkirin**”. Ev jî hiqûqek e! Ev, 30 salan li Tirkiyê bû hiqûq. Ango desthilatdar tê, ew bi xwe hiqûqa xwe çêdike. Ji bo wê hiqûq bê wate ye. Hiqûq, tenê ji bo yê serdest li wir sîstema xwe ferz bike û her kesê li dijî sîstemê jî dadgeh bike, tê sererastkirin. Di vê wateyê de hiqûqa ku ne li ser bingehê exlaq be, wateya xwe nîn e. Ya rast exlaq e, nirxên exlaqî ne. Ya rast hiqûqa civaka exlaqî ye. Di wir de mafê mirov heye, naskirina îradeyê heye, mafê gelan heye, tiştên ku mirovatiyê bi berxwedan û xwînê nivîsandîn, saxlem kirîn hene. Tiştên nayên guhertin di wir de hene. Ew nayên guhertin. Ji bo wê, hiqûqa ku ne li gorî exlaqê civakê be, bê wate ye.

Berxwedana çîn û gelên bindest bûye sedem ku exlaqê bingehê xwe ji civaka xwezayî digire tim zîndî bimîne û hiştiye ew exlaq ji bo hebûna civakê, kerameta civakê û pêşveçûna civakê wekî haveynekê be, wekî bingehekî be. Eger berxwedana koleyan û gundiyan nebûya, bi sedan serhildanên gundiyan û koleyan çênebûya, dûvre serhildanên karkeran û gelên bindest çênebûya, wê çaxê jiyana mirov wê bêwate bûya. Çima? Ji ber her ku biçûya wê exlaq ji dewreyê derbiketa, hiqûqa ku serdestan ava kirî hakim bibûya.

Mesela, burjûva ku nû hat, karker rojê 14 saetan dişixulîn. Hiqûq ev bû. Karkerê ku 13 saet û nîv bişixuliya, ji kar dihat avêtin. Ji ber ku ji bo karker digot, “ferz e tu rojê 14 saetan

bişixulî, tu mafekî te yê din nîn e." Hiqûqa burjûva ev bû. Li gor hiqûqa kole jî, lazim e tu kole bî, tu aîdê yekî bî. Ma ne ev hiqûq di dema burjûvayê de jî, heya berî çend sed salekê jî hîn mijara nîqaş û têkoşînê bû. Ango desthilatdaran hiqûq wisa danîne. Li gorî xwe ava kirine, li gorî xwe danîne.

Esas hiqûqa ku mirovatî girê dayî û exlaq bi pêş xistî, berxwedana di hundirê însanan de ye. Berxwedana li hemberî bêedaletî û bêmafiyê ji bo azadiyê hatiye kirin, berxwedana ji bo parvekirina adil nirxên mirovatiyê parastiye, exlaqê mirovatiyê her tim zindî kiriye, hiştiye exlaq bingehê civakê be û nirxên civakê biparêze. Bifikirin, civakeke ku di vê xisûsê de ne xwedan berhem be, ango di dîroka wê de berxwedana wê qet tune be, çi rûmet û kerameta wê tune be, di dîrokê de tiştekî ku xwe bispêre wê tune be, ew civak wê çawa bijî? Zehmet e. Wê çawa wêjeyê çêbike? Wê çawa bingehê çanda xwe ava bike? Nexwe di bingehê her hebûneke çandî de berxwedan heye.

Me di serî de jî got, hebûna (dema ez dibêjim hebûn, hem civak, hem însan, hem qebîle, hem jî netewe gişt bihesibînin) ku li ber xwe nede, jixwe nikare bijî. Wê çaxê ev hebûnên niha heyîn, ev çandên li ser rûyê erdê heyîn di bingehê wan hemûyan de berxwedanek heye. Ji bo wê jî berxwedan pîroz e. Lewre her zimanê heyî, her çanda heyî dîrokeke wê heye û pîroz e. Lazim e em jê re rêz raber bikin. Em nebêjin ku ji ber em hene, çanda me li ser her tiştî re ye. Burjûva, neteweperestiyê li ser vî hîmî bi pêş dixe. Lê em li dijî vê têgihîştinê ne. Hemû çandên îro heyîn, di bin wan de berxwedanek heye ango xwîn heye. Li gorî ku heta niha xwe daye jiyîn, tê wê wateyê ku rûmeteke wê heye û pêwîst e mirov jê re rêz raber bike. Di vê wateyê de divê çand, ziman wekhev bin, yek bin. Divê yek ne li ser yekî re be. Ji ber ku her hebûneke çandî, her zimanek, her wêjeyek di bin wê de berxwedanek heye, kedek heye, xwîn heye. Lewre lazim e mirov yekî li ser yekî re negire. Ev ne di hundirê deh salan de çêbûye, ev bi hezar salan çêbûye. Ango em li vir behsa berxwedana hezar salan dikin. Ji bo wê rûmetek xwe heye û divê mirov ji her çandekê re rêz raber bike.

Pêwîst e rêza mirov ji her ziman û wêjeyekê re hebe, mirov ferq û cudahiyê nexe navbera wan. Eger burjûva îro vê dike, nijadperestiyê dike, dixwaze hinek çandan di qetlîamê re derbas bike, yan jî îro ku qirkirin heye, ev wehşet e. Ji qirkirinê hîn wehşîtir, hîn girantir tiştek nîn e. Çima? Ji ber ku her çand (bala xwe bidinê em nabêjin nijad, nijad nabe), her ziman, her kevneşopî mafê xwe heye xwe biparêze. Ev maf, mafekî pîroz e. Lê dema zordarek rabe, wî mafî ji dest bigire, hele hele wekî ku dawî li jiyana wî bîne qirkirinê bi pêş bixe, ev wehşet e. Li hemberî vê divê bi her şêwazî sekina mirov hebe. Îro di cîhanê de ku qirkirin ango jenosîd wekî tiştekî pir xirab tê dîtin û tê lanetkirin, sedema xwe ev; ji ber ku qirkirin çandekê ji holê radike, nirxekê ji holê radike. Jixwe her çandek nirxek e. Lewre qirkirin sûcekî mirovatiyê ye.

Zordest û dagirker li gorî xwe qilifan çêdikin, qirkirinê ne di hundirê çend salan de, di hundirê pir salan de belav dikin û dimeşînin. Der barê sîstema ku îro li ser Kurdistanê heyî de Serokatî di parêznameyên xwe yên dawî de dibêje: *"Têgîna mêtingerî wê tam pênase nake, têrê nake. Tiştê li ser Kurdistanê ne mêtingerî, qirkirin e."* Rast e, tiştê li ser Kurdistanê qirkirin e. Wekî tê zanîn, me heya niha ji vê re digot "mêtingerî". Ji bo pênasekirina vê sîstema li ser Kurdistanê heyî, tenê peyva "mêtingerî" têrê nake. Li Kurdistanê qirkirin heye. Çawa? Qirkirineke ku di hundirê zeman de belav dibe û qirkirineke bi şêwazê çandî li Kurdistanê heye. Dijmin dem bi dem bi fizîkî jî dike, lê ne sîstematîk e; parçe parçe ye. Her ku Kurdan li ber xwe daye, li hemberî vê parçe parçe qirkirina fizîkî jî pêk aniye, lê esas niha qirkirina spî di rojevê de ye. Siyaseta niha ku mêtingeriya li ser Kurdistanê dimeşîne qirkirina spî ye. Tabî ev sûcekî mirovatiyê ye. Li hemberî vê sekinandin elbet erkeke mirovatiyê ye. Şexsek ku li hemberî vê nesekine, mirovatiya wî/wê dikeve nîqaşê. Ango wê çaxê mirovatiya wî/wê di bin siyê de dimîne, mirovatiya wî/wê namîne. Leke lê dikeve. Eger tu însan î, tê li hemberî qirkirina însan derkevî. Tu Kurd dibî, Ereb dibî, Tirk dibî, Fars dibî, ger li ser Kurdan qirkirin heye, ku tu însanî divê tu li hember derbikevî. Bingehê enternasyonalîzmê jixwe wisa bi pêş ketiye.

Îro ger qirkirin li ser Kurdistanê yan jî li ser Ermeniyan, li ser Asûriyan hatiye bi pêşxistin, erka her mirovê ku ji xwe re dibêje “ez mirov im” ew e ku, li dijî vê qirkirinê derbikeve. Encex destpêkê ew gelê ku bîzat bi qirkirinê re rû bi rû dimîne lazim e hemû ferdên wî/wê li dijî qirkirinê derbikevin û li ber xwe bidin. Divê her kesê ji wî gelî li dijî qirkirinê derbikeve. Yê li dijî qirkirinê dernekeve, ji însanetiyê derdikeve. Ango qirkirin, eger li ser neteweyekê ye; berî her tiştî pêwîst e ew netewe bi her şêwazî li hemberî wê li ber xwe bide. Encex her kesê ji xwe re dibêje “ez mirov im” madem her çandek nirxek e, rûmetek e, yê kîjan miletî dibe bila bibe wê çaxê her mirovê ronakbîr, her mirovê şoreşger, her mirovê ji xwe re dibêje “ez demokrat im” pêwîst e li dijî qirkirinê derbikeve. Tenê ne bi sloganekê li hember derbikeve; heta ku pêwîst bike divê bi her şêwazî li dijî derbikeve. Ya girîng, parastina mirovatiyê wisa pêk tê. Wekî din mirovatî nayê parastin.

Tê nirxên mirovatiyê çawa biparêzî? Tê wê çaxê çawa ji xwe re bibêjî ez mirov im? Ku tu mirovî, ger li cihekî li ser hebûneke ku ji bo wê bi hezar salan ked hatî dayîn, xwîn hatî rijandin û nirx hatî meydanê qirkirin hebe, tu ji qirkirina wê re nikarî bêdeng bimînî. Li hemberî wê divê tu bi berpirsyariyên xwe rabî. Divê tu ji bo berpirsyariya xwe ya mirovatiyê li dijî wê derbikevî. Ev erka her mirovekî/ê ye. Ji ber ku di bingehê her çanda ku heta roja îro jiyan dibe de dîrokek heye, dîroka berxwedanê heye, dîroka parastinê heye.

Çand, bi pereyan nayê avakirin. Çand, wisa tenê bi çend şeran jî nayê afirandin. Çand, di hundirê sed salan, hezar salan de bi ked û berxwedanê tê afirandin. Dîrok wisa tê nivîsandin, wisa tê çêkirin. Lewre vana tiştên girîng in. Berhemên wisa yên îro ji bo neteweyan heyî, pîroz in. Di vê wateyê de mirov here kîjan derê, ku çandek li wir hebe, ew çand dibe bi ser jî hatibe girtin, lê ew çandek pîroz e. Parastina çandê tiştekî pîroz e. Divê mirov çandê biparêze. Lê destpêkê ew kesên ku wê çandê bîzat dijîn, divê wê biparêzin. Ev erka wana ye.

## A) Rewabûna Parastinê Nirxên Mirovatiyê Ava Dike

Di dîroka şer de şerê parastinê bi xwe re nirx afirandiye. Lewre şerê parastinê şerê mafdar e û di cih de ye. Di vê çarçoveyê de şerê parastinê xwe di bingehê çand û şaristaniya mirovatiyê de afirandiye. Eger îro şaristaniya mirovatiyê heye, di bingehê wê de ev berxwedanî heye. Wekî din şaristaniya serdest bi şerê serdestî û desthilatdariyê hatiye parastin, lê ev şaristanî çi feydeya xwe ji mirovatiyê re nîn e. Ne wekî berhemeke mirovatiyê ye. Şaristaniya serdestiyê û ya hegemonya çi feydeya xwe ji mirovatiyê re nîn e. Encex şaristaniya esasî li ser esasê civaka exlaqî û polîtîk jiyan bûye, bi ked û berxwedanê hatiye jiyandin û civak heya roja îro aniye. Di bin vê de çi heye? Wekî me berî niha destnîşan kir, di bin vê de ked heye, berxwedan heye. Berxwedana li hemberî zordestiyê, li hemberî tunekirinê, li hemberî qirkirinê, li hemberî bindestkirinê wisa watedar e. Dîrok afirandiye, çand afirandiye û parastiye. Wêje afirandiye. Ango nirxên mirovatiyê parastiye. Li ser vî esasî, îro jî yê ku hebûna mirov diparêze esas berxwedana mirovatiyê ya li hemberî zordestiyê ye.

Modernîteya kapîtalîst îro dixwaze her tiştekî li derveyî mirovatiyê di civakan de hakim bike. Va ye di bin her tiştî de pere heye, berjewendî heye, ezezî heye, egoîzm heye, serdestî û bindestî heye, mijokdarî heye. Burjûva, bi hebûna xwe ya madî bi milyonan kesan ji bo xwe dixe kar û li ser keda wan berjewendiyên xwe bi pêş dixe. Ango ewqas parvekirineke ne adil heye. Halbûkî ev cîhan a hemû kesan e. Beriya her tiştî yên ked didin mafê wan ji her kesî zêdetir heye. Sîstema cîhanê ya îro li ser keda karker û gundiyan hatiye avakirin. Pêwîst e parvekirineke adil û wekhev hebe. Lê yên serdest ew edalet ji holê rakirine.

Li hemberî vê heqîqeta modernîteya kapîtalîst ger em îro cardin behsa mirovatiyê dikin, di bin vê de berxwedana kedkaran heye. Ji hundirê dîrokê heya roja îro berxwedan û keda kedkaran heye. Ev hevsengiyê çêdike. Îro li welatekî navenda modernîteyê, hêzên

modernîteyê êrîşî derekê dikin; xelkên wir li hemberî wê êrîşê li ber xwe didin. Mesela, di êrîşên Fransa yên li ser Cezayîrê de, herî zêde Fransizan li nirxên mirovatiyê xwedî derketin, kedkarên Fransa li dijî êrîşên Fransa yên li ser Cezayîrê derketin û li dijî hegemonyaya Fransa têkoşîn kirin. Dagirkeriya Fransa ya li ser Cezayîrê ger bi dawî bû, rast e di bingehê wê de berxwedana xelkên Cezayîrê hebû. Bi vî awayî tam milyonek şehîd dan û mêtingeriya Fransa ya li Cezayîrê şikandin. Lê yek jî, xelkê Fransa ji bo kerameta xwe, ji bo rûmeta xwe û ji bo mirovatiya xwe li hemberî dewleta xwe sekinîn. Li hemberî wehşeta ku Fransa li Cezayîrê meşandî, xelkê Fransiz li kolanan tenê ne mitîng kirin, ji bo parastina Cezayîrê têkoşîneke cidî bi pêş xistin. Heman demê li hemberî Vîetnamê xelkên Amerîka jî werga li dijî têkoşîna emperyal derketin. Ev parastina mirovatiyê ye.

Wekî nimûne; îro li Kurdistanê zilmek heye, dagirkirin heye. Me berê di nîqaşekê de jî anî ziman; ger hê jî têkiliyeke Kurd û Tirk heye, ev ne ji ber bingehekî bi hev re heye, yan jî ji ber zîhniyeta AKP'ê ya mijokdar û faşîst e. Na. Niha însanên Tirkiyê yên çepgir, şoreşger, demokrat û sosyalîst belkî civaka xwe ne zêde bin û ne pir bi hêz bin, lê ew jî li gorî hêza xwe li hemberî mêtingeriya faşîzma dewleta Tirk disekinin. Mil didin milê gelê Kurd, jê re piştevaniyê dikin, beşdar dibin, heta ji bo vê dikevin girtîgehê. Ji bo vê şehîd dikevin an jî herî hindik dostaniyê dikin. Ango ev pira di navbera gelan de ye. Yê ku îro têkiliya gelê Kurd û gelê Tirk dimeşîne yan jî dihêle hê jî têkilî hebe, ev e. Esas rûyê Tirkiyê yê dostane, yê spî ew in. Ev nirxekî mirovatiyê ye.

Berê jî di dîrokê de ev hebû; di civakekê de her çiqas xirabî hebe, kiryarên ji bo berjewendiyên ne mirovatî û hov tê de bên meşandin jî, di wir de yên ku li mirovatiyê xwedî derdikevin hebûn. Mesela, niha wekî di nav civakên ku herî zêde dewleta xwe diparêzin, beşdarî dibin, ku şer diqewime malbat bi giştî ji dewletê re dibin leşker, Îsraîlî ne. Çima? Ji ber ku berê qirkirin li ser wan çêbûye. Berê cih û warên wan tune bûne. Ew ji welatekî qewitandine welatekî din; welatê din jî qewitandiye welatekî din û dûvre gotine "axa ji me re soza wê hatî dayîn Filistîn e; em ê herin Filistînê." Wê çaxê hinekî Îngilîzan û polîtîkaya modernîteyê jî berê Cihûyan daye wir. Welhasil li Filistînê xelkê Filistînî jiyan dibe, hatine li wir bi cih bûne û ew der ji xwe re kirine welat. Cihûyan berê jî digotin: "Xwedê soza vê derê (erdên Filistînê) ji me re daye". Di bingehê wê de ev bawerî heye û Yahudî hatine ew der ji xwe re kirine welat û Filistînî jê derxistine. Niha Îsraîlî dibêjin: "Eger em ji vir bên avêtin an jî li vir bên tengavkirin, cihekî em pê ve herin tune ye." Ji bo wê dema şer diqewime, li Îsraîlê hemû kes dibe şerker. Li Îsraîlê helwesteke civakî ya wisa heye. Rexmê vê jî, cardin li wê derê Îsraîliyên ku piştevaniya Filistîniyan dikin, ji bo aştiyê derdikevin kolanan û bi her awayî rîskan didin ber çavên xwe hene. Belkî ne zêde bin, lê hene. Ew li wir dengê mirovatiyê ne. Ew exlaqê mirovatiyê ne.

## B) Parastina Rewa Wijdanê Civakê ye

Exlaqê mirovatiyê çi ye? Ne egoîzm û zilm kirine. Na. Divê mirov ji bo xwe jî, ji bo kesên din jî adil be. Di civaka xwezayî de jî ev yek wisa ye. Wekhevî li ser vî esasî heye; zilm li ser vî esasî nîn e. Kes li kesî zilmê nake. Wekhevî heye. Edalet heye. Exlaq bi xwe ev e. Exlaqê mirovatiyê bingehê xwe ji vir digire. Di vê wateyê de her çiqas nijadperestî hebe, dijîtiya azadî û wekheviyê hebe, encex a girîng kesên ku azadî, wekhevî û edaletê diparêzin jî hene. Ev, temsîlkirina exlaqê mirov e. Wekî temsîla kevneşopiya civaka xwezayî ye. Ev, wijdana mirov e. Ango mirov wijdana xwe qebûl nake ku dewlet an jî neteweya wî here li ser neteweyeke din zilmê bimeşîne. Wijdana mirov vê qebûl nake. Ev nêzîkbûneke şoreşgerî ye. Şoreşger, li ser vî esasî bûne şoreşger. Jixwe şoreşger ji bo parvekirineke adil, ji bo edaletê, ji bo sosyalîzma demokratîk ava bibe dibe şoreşger.

Şoreşgerên ku ji bo parvekirineke adil, ji bo azadî û van nirxan bûne şoreşger, piraniya wan gelek caran belkî wekî şexs ew bi xwe ne muhtacê wê ne. Wekî şexs ku bixwaze belkî

dikare bijî. Derfeta xwe ya madî jî heye. Di dîroka me de pir hevalên wisa hene. Nimûne, hevalê herî dawî şehîd ketî hevalê Alîşêr e. Bi xwe ji malbatek dewlemend bû, zanîngeh qedandibû û dikarî cuda bijî. Pirsgirêkeke wî ya şexsî tune bû. Lê ji 20 salan zêdetir di şert û mercên herî giran, herî zehmet de rexmê ku pirsgirêkên wî yên fizîkî hebûn, pirsgirêka wî ya çav hebû ku bi şev nedidît, tim tercîha xwe li ser cihên asê, cihên zehmet dikir. Mîsal, tim qadên wekî Dêrsim, Karadenîz pêşniyar dikir, inyat dikir (dayatma) û dixwest li ser van çiyayan bijî. Lê bi şexsî û bi malbatî qet pêwîstiyeke xwe nebû. Bavê wî hat û çû Xakûrkê, goristana şehîdan ziyaret kir. Li wir ji hevalan re got: "Min nû fêm kir ku pere qîmeta xwe tune ye. Alîşêr ne ji bo nirxên madî, ji bo nirxên manewî ewqas li ber xwe daye." Tabî bavê wî bi wî awayî bandor bû. Ango pir kesên wisa hene. Cardin mînaka hevala Zîlan heye.

Ya girîng, bi şexsî na, lê tu di nav civakekê de yî. Eger di wê civakê de neheqiyek jiyan dibe, tê bi xwe jî bijî. Ha, ev wijdan e. Gundiyekî te, karkerekî te ku li cihekî dipelixe, tê vê yekê wekî pelixandina xwe bibînî. Ev, wijdana mirov e. Ev, kerameta mirov e. Ev, rûmeta mirov e. Mirovê ku hestê mirovatiyê pê re tune be, ango wekî mirov jiyan neke, tenê bi zikê xwe, bi şexsê xwe bifikire, jiyanê wekî tijîkirin û valakirina zik dizane, ew kes dikare erzan bijî, lê ev ne mirov e. Mirovatiya wî kêm e, wijdana wî kêm e, hestê mirovatî pê re pir nîn e. Belkî mirov e, du lingên xwe hene, lê esas ne wisa ye, hov e. Heta ji heywan jî hinek wêdetir e. Kesên wisa jî hene. Lê yê ku wijdan û exlaqê mirov pê re hebe, nikare li hemberî zilmê bêdeng bimîne. Zilm li kî dibe bila bibe li hemberî wê nikare bêdeng bisekine. Hele hele ku ev zilm bîzat li wî bi xwe dibe, li gelê wî dibe rewşa şexs çi dibe bila bibe, ew nikare li hemberî wê bêdeng bimîne.

Derketina Serokatiyê jî li ser vî esasî ye; ango ji bo wijdanê ye. Serokatî serpêhatiyên xwe di gelek dahûrandinan de tîne ziman. Serokatî, piştî ku di lêgerînên xwe de digihe heqîqetê, di dahûrandinên xwe de dibêje: *"Êdî wateya ku mirov biçe bibe qeymeqam an jî bibe walî namîne."* Ji ber ku Serokatî dibistan dixwend û di encamê de wê bibûya rayedarekî dewletê yan bibûya qeymeqam an jî walî. Lê di qenaeta Serokatî de êdî wateya bûyîna karmendekî dewletê namîne. Ango êdî ne mumkûn e wijdan qebûl bike ku li hemberî qirkirina gelê Kurd bêdeng bimîne. Qirkirinek heye. Buhayê wê çi dibe bila bibe, ev bi madî nayê pîvandin. Wijdana mirovatiyê ha wisa mirov dike şoreşger, dike têkoşerê azadiyê. Ew mirovan dibe wê encamê. Di vê çarçoveyê de mirov her tiştî dide ber çavên xwe, dikare her tiştê xwe ji bo wê feda bike. Jixwe Serokatî jî wisa kir û got: *"buhayê xwe çi dibe bila bibe, divê mirov li hemberî qirkirina di Kurdistanê de bêdeng nemîne. Bêdengî ne mirovatî ye."* Dûvre hevalên din jî wisa nêz bûne û rêxistina me PKK wisa ava bûye.

Li hemberî bêedaletî, zilm, hovîtî û qirkirinê pêşxistina berxwedan û şerê rewa tenê ne tiştekî rewa ye; heman demê erkeke mirovatiyê ye. Her çiqas modernîteya kapîtalîst mirovatî kiribe xeteriyê jî, cardin ku îro mirovatî heye, wijdana mirov heye û exlaqê mirovatiyê jiyan dibe, sedema vê berxwedana mirovatiyê ye. Li hemberî zordestiyê bipêşxistina şerê rewa û şerê mafdar e. Eger ji bo rêya heq şer nebûya, maf jî wê tune bûya. Eger ji bo edaletê şer nebûya, di dîrokê de mirovan xwîn nerijanda, îro wê kesekî/ê behsa peyva edaletê jî nekira. Van nirxan gişt bi berxwedanê, bi xwînê, bi kedê hatine afirandin û li ser vî esasî pîroz in. Mirovan ji bo wê xwe feda kirine. Tiştên ku mirov bikaribe xwe di rêya wê de feda bike jixwe ev in; wekî din ne tiştek e.

Şerê rewa yan jî bi zimanekî din şerê mafdar parastina mirovatiyê, parastina edaletê kiriye. Wekî temsîla wijdana mirov bi pêş ketiye. Ango mirovan neheqî qebûl nekiriye. Ev layiqî exlaqê xwe, mirovatiya xwe, wijdana xwe nedîtiye û li hemberî wê li ber xwe daye. Bi vî awayî şerên rewa çêbûne, wana mirovatî dane jiyîn û heya roja îro anîne. Di hundirê dîroka mirovatiyê de cihekî şerê rewa yê ku parastina mirov dike, heye. Jixwe ger mirov rê bide neheqiyê, bêedaletî û hovîtiyê, wê çaxê li wir mirovatî namîne, wijdana mirovatiyê namîne, tiştek namîne. Em bêjin, li Tirkiyê Cuntaya faşîst a 12'ê Îlona sala 1980'an hat. Cuntayê hemû tişt da ber xwe. Zilm meşand. Bi hemû kerametên mirov dilîstin. Mesela, mirov şilfî tazî dikirin û jin-zilam berdidan nav hev. Li Kurdistanê wisa kirin. Belkî niha li

pir zîndanan tê behskirin. Dibe ku li hemûyan werga nebûbe, wisa wekî jin-zilam bi kerametê mirov nehatibe lîstin. Lê li gundê Hîlwanê di sala '80'î de tê zanîn ku werga kirin. Ango bi her cureyî bi xurûra mirov leyîstin. Pîsî bi mirovan dan xwarin. Ma hîn di sala 1991'an de, li Cizîrê pîsî bi mirovan nedan xwarin? Ev çi ye? Ev, hovîtî ye.

Li hemberî hovîtiya 12'ê Îlonê çi bû? Di zîndana Amedê de hovîtî rabibû erşan, li kêleka wê, îradeya mirov, wijdana mirov di şexsê rêheval Mazlûm Dogan, Hayrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Ferhat Kûrtay, Akîf Yilmaz, Alî Çîçek û tevahî hevalên din ên li ber xwe dayîn de berxwedana mirov bilind bû. Wana bi berxwedana xwe wijdana mirovatiyê temsîl kirin. Ew berxwedanî nebûya mirov nedima. Ne ew berxwedanî bûya belkî em jî îro nebûna. Ji ber ku di encamê de em berhema wê berxwedanê ne. Tabî ew faktorek esas e. Lê em beriya wê û piştî wê bihesibînin û herî dawî wekî asta herî jor li zîndana Amedê, li hemberî hovîtiya 12'ê Îlonê berxwedana wijdana mirov, kerameta mirov rê vekir ku, em 15'ê Tebaxê bi pêş bixin. Vê berxwedanê rê vekir em berxwedaneke dûvdirêj û dîrokî li dar bixin.

Nexwe li hemberî zilma hovîtiyê keramet û wijdana mirovatiyê her tim bêdeng nemaye, li ber xwe daye. Belkî wê çaxê hema zilm neşikandiye, lê bingehê şikandina zilmê daniye. Ji ber wê yekê, berxwedanên çêbûne qet yek jî vala neçûne. Wana dîroka mirov, kerameta mirov, exlaqê mirov, wijdana mirov dane jiyîn. Îro ger li hemberî hovîtiya moderniteya kapîtalîst mirovatî sekneke xwe heye, di bingehê wê de ev berxwedana di hundirê dîrokê de heye. Şerê rewa, şerê mafdar ev e. Vî şerê rewa û mafdar mirovatî parastiye, kerameta mirovatiyê parastiye. Belkî li cihekî ji bo parçeyek ax şer kiribe, lê di şexsê wê parçeya axa wî welatî de mirovatiyê xwe daye axaftin. Ev wisa ye. Kerameta mirovatiyê xwe di wir de bi cih kiriye. Îro ku em behs dikin û dibêjin li filan dîrokê, filan derê evqas kesan berxwedaneke pîroz kirine; ev berhemek e, bingehek e.

Ya girîng, berxwedanên li hemberî zilmê yên mafdar bi xwe re mirovatî dane jiyîn. Ev bûye parastina îrade, wijdan û exlaqê mirovatiyê. Lewre berxwedan tenê ne rewa ye, heman demê mafekî mirovatiyê ye. Eger tu vê berxwedanê nemeşînî, mirovatiya te dikeve xeteriyê. Tu bêdeng bimînî, teslîm bibî mirovatî bi te re namîne. Wê çaxê tê wekî heywanekî tenê ji bo pariyek nan bijî. Dibêjin ya "ji bo tasek şorbe", wê çaxê tu xwe ji bo tasek şorbe difroşî. Li vir mirov namîne. Wê çaxê mirovatî diçe ango keramet diçe, hebûna mirov bêwate dibe. Gelek kesên wisa hene ku dema dikevin wî qalibî û şûn de wekî heywan dijîn û yek jî jixwe nikarin ji jiyan û mirovatiyê tu tamê bigirin. Yên wisa tu caran îstikrar di wana de çênabe. Jixwe kêfxweşî û serfirazî qet çênabe. Wana êdî wê ne serfiraz bijîn, êdî wê tenê ji bo mîde û kurtêlan bijîn. Jiyana wan ji jiyanê derdikeve. Jiyan ku jiyan be, bila rojek be, lê bila bi wate be. Ev girîng e.

# Beşa Çaremîn:

# DÎROKA ŞERÊ GELÊN BINDEST

Li hemberî zilmê, berxwedana gelên bindest di pratîkê de çawa çêbûye? Heta derketina îdeolojiya çîna bindest rabûnên gelên bindest û çînên bindest bê bername ye, bê stratejî ye. Ango yê mafdar divê li hemberî neheqiyê serî hilde. Rewş wisa ye. Lê belê bi pêşketina modernîteya kapîtalîst re Dema êdî burjûva saz dibe, proleterya bi pêş dikeve, zemînê ku proleterên gel bi hev re germahiyê çêkin, pêk tê. Beriya wê, mesela gundî, her 100 kes li cihekî ne. Ew derfeta ku gundî bikaribin bi hevdû re germahiyekê, têkiliyekê çêbikin û bi sîstem rabin zêde nîn e. Serhildan dibe, xeberê digihînin hev û werga serhildanê bi pêş dixin. Ango ev nabe xetek. Lê dema karker derdikeve, di karxaneyan de bi sedan, hezaran kes tên gel hev û jiyaneke kolektîf ava dibe, gav bi gav lêgerîn bi pêş dikevin. Wekî me berê jî diyar kir, destpêkê karker nizanin çawa têkoşîn bikin. Ji ber vê makîneyan dişewitînin. Ew jî wekî yên beriya xwe bi awayek rasthatî, bê bername şer dikin. Lê dûvre di bin pêşengiya Marks û Engels de îdeolojiya çîna karker tê bipêşxistin. Êdî karker dibe xwedan îdeolojî û bername.

Çîna karker pêwîst e li hemberî burjûva çawa tevbigere? Divê bernameya xwe çi be û çawa têkoşîn bike? Divê stratejiya xwe û taktîka xwe çi be? Êdî ev mijar derdikevin holê. Beriya Marks û Engels neteweyên bindest, çînên bindest bê bername ne, bê stratejî ne. Li hemberî bêmafiyê, li hemberî zilmê tehemûl nakin û li ber xwe didin. Ji bo rûmeta xwe, ji bo kerameta xwe têkoşîn dikin. Ku pêwîst bike jiyana xwe jî ji dest didin. Bi vî awayî mirov digihînin. Ango xeteke diyar ji bo zaferê nîn e. Diçe digihe cihekî, êdî nikare hîn bi pêş de biçe. Digihe astekê û disekine.

Wekî tê zanîn, di dîrokê de nimûneya Medan heye. Medan, 300 salan li hemberî zilma Împaratoriya Asûr şer dikin. Ev şer di nav 300 salan de di gelek qonaxan re derbas dibe. Li hemberî Împaratoriya Asûr êdî wekî îtifaqekê çêdibe. Ev şerê ku 300 salan werga hatî meşandin, dûmahîkê Beriya Mîladê di sala 612'an de bi ser dikeve. Newroz çêdibe. Ango nimûneyên wisa hene. Lê belê em detayên wê pir nizanin. Ên wisa nebûne wekî bername. Em dizanin ku neteweyan li dijî koletiyê şer kirine. Encex hemû berxwedanên li hemberî koledariyê bi pêş ketine giştî nehatine qeydkirin.

Nimûne; Roma. Di dema Roma de nivîsandin hebû. Lewma em dizanin ku Spartakus li hemberî Împaratoriya Roma şer kiriye, li ber xwe daye. Lê li Misrê gelo çiqas berxwedan çêbûne? Li Misrê jî kole hebûn; sîstema koledariyê hebû; sîstema împaratoriyê hebû; Fîrewûn hebûn. Li hemberî Fîrewûnan ma berxwedan çênebûye? Belê heye.

Cardin Serokatî pir behsa Nemrût dike. Li hemberî Nemrût derketina Hz. Îbrahîm bi esasî berxwedanek e. Ango Hz. Îbrahîm zilma Nemrût qebûl nake, tevî malbat û qebîleya xwe wê çaxê Ruhayê terk dike. Ev çi ye? Li hemberî zilma Nemrût (ew jî wekî yek ji Fîrewna ye) berxwedanek e. Hz. Îbrahîm li hemberî zilma Nemrût derdikeve, li ber xwe dide û ji bo vê cihê xwe terk dike. Hz. Îbrahîm dikeve nav lêgerîneke.

Berxwedanên neteweyan ên wisa hene. Serokatî, derketinên li ser bingehê ol ango hem derketina Hz. Îbrahîm a li dijî Nemrût, hem derketina Hz. Mûsa ya li dijî Fîrewn, hem jî derketina Hz. Îsa ya li dijî Împaratoriya Roma wekî derketina çîna kedkar dibîne. Heta derketina ola Mesîhî ango Xiristiyanî, ji destpêka xwe heya 300 salan jî hestên kedkaran, mafê kedkaran diparast.

Xiristiyanî destpêkê wekheviyê diparêze. Niha ku em jê re dibêjin "komun"; beriya ku ola Xiristiyanî li Roma bibe desthilat komunên Xiristiyan hebûn. Em bêjin li gund e; gundî bi hev

re dixebitîn. Bi vî awayî parvekirinek hebû. Li hemberî zilma Roma ev wekî berxwedana bindestan bû. Tam ne bi vî navî ye, lê belê fikrê ku meşandî, li hemberî koletiyê derketine. Jixwe tê de guhertin çêdibe, ne wekî destpêkê ye. Pir tiştan di vê têkoşînê de diguherînin. Ango revîzyone dikin. Em behsa cewherê têkoşîna li ser bingehê ola Xiristiyanî dikin. Mirov dikare vê wekî wijdana mirov pênase bike. Jixwe Serokatî di vê çarçoveyê de tîne ziman.

Cardin derketina Hz. Muhemed werga ye. Hz. Muhemed, li dijî desthilata hakim derdikeve. Wê demê zarokên keç bi saxî dixistin bin erdê. Li ser jinê şîdetek hebû, li ser tevahî tebeqeyên jêr jî şîdet hebû. Li hemberî vê derketina Hz. Muhemed a bi ola Îslamê wekî şoreşekê ye. Vana giştî hene. Ev derketin, derketinên rewa ne. Berxwedana mirovatiyê temsîl dikin.

Derketina Hz. Îbrahîm û dûvre ku li ser wî esasî sê olên Semawî bi pêş ketin, vana bingehê xwe esas ji vir digirin. Cardin ê herî balkêş beriya wan, derketina Zerdeşt heye. Derketina Zerdeşt jî di heman wateyê de ye. Mesela, ji bo Zerdeşt exlaqê mirov pir girîng e. Zerdeşt, li hemberî bêedaletiyê, li hemberî xirabiyê ango başiyê Ahûra Mazda temsîl dike. Li hemberî xirabiyan xeta erênî temsîl dike û felsefeya exlaq bi pêş dixe.

Ev derketinên li ser bingeha olî li hemberî zilma serdestiyê lêgerîneke mirovatiyê ne, wijdana mirovatiyê ne. Jixwe ew tim bi desthilatdaran re di nav têkoşînê de ne. Ya girîng vana gişt derketinên li hemberî împaratoriyên koledar, li hemberî zilmê derketina wijdana mirovatiyê ne. Ev wisa bûye felsefe û bûye xet. Aliyê wê yê ruhanî, aliyê wê yê baweriyê, aliyê wê yê fiîlî yê di jiyanê de ku mirov bi giştî li ser hev bigire dest, esasê xwe wekî derketina wijdana mirovatiyê ne.

Vana di hundirê dîrokê de hatine jiyîn. Li hemberî şerên neheq şerên mafdar, berxwedanên mafdar di vê riyê de çêbûne. Jixwe wana çanda mirov, exlaqê mirov, şaristaniya mirov temsîl kirine. Ev heya dema burjûva wisa tê.

Lê bes di dema burjûva de ku karker di kargehan de hîn zêde tên cem hev, wekî tevgerineke nû çêdibe. Ji bo mafên azadî û wekheviyê yekser pirsgirêka karkeran a têkoşînê dikeve rojevê. Li ser vî esasî, derketina Marks û Engels ji bo çîna bindest û karker -ku dûvre gundî jî dikevin vê îtifaqê- xetekê çêdike û têkoşîna wan dixe bername.

## A) Stratejiya Raperînê û Ezmûna Sovyetê

Wekî me berî niha anî ziman, çîn û neteweyên bindest di têkoşînên li hemberî mijokdarî û dagirkeriyê meşandine de, piştî gihîştin bername û stratejiya xwe têkoşîn hîn bi sîstem meşandin. Ango têkoşîn hîn bi zanebûn hat bipêşxistin. Bi taybetî di qadên Ewropa de gelek caran serhildanên tevgerên karker li hemberî burjûva hene. Pêvajoya ji salên 1850'yan heya 1905'an di serî de li Almanya, Fransa, Îngiltere û li welatên din ên Ewropa tevgerên karker gelek caran bi rojan, bi mehan şer kirine. Wê çaxê taktîkê barîkatê hebû. Barîkat çi ye? Ango cadeyan qut dikin, amûran, hesinan datînin ser cadeyan. Hemû tiştên ku dibînin, datînin ser cadeyan, bi wana cadeyan qut dikin û li ber xwe didin. Ev rabûn e. Ji ber ku em bi kurdî ji hemû tevgeran re dibêjin "serhildan" em ji vê re bêjin "raperîn". Destpêkê şêwazê raperînê hebû. Dikin hedef ku li bajarên wî welatî barîkatan çêbikin, li ber xwe bidin û wisa biçin encamê. Gelek caran di bajaran de bi hefteyan, bi mehan barîkat hebû, şer hebû. Bi vî awayî yan lihev dihatin, an jî dihatin pelixandin. Pir tiştên wisa çêdibûn.

Dûvre navenda vê tevgera karker hinekî bi aliyê Rûsya de diqulibe. Bi esasî navend Ewropa bû. Rûsya, li gorî navenda Ewropa di paş de dişopîne. Encex di şoreşa Rûsya de ango di tevgera karkeran de pêvajoya partîbûnê bi derengî be jî bi pêş dikeve. Sala 1898'an Partiya Sosyal Demokrat a Rûs saz dibe. Berî wê yên heyî grûp bûn, lê wê çaxê partî ava dibe.

Piştî partî ava dibe û şûn de partî dikeve qrîzê. Tê de pirsgirêkên pêşengiyê derdikevin. Wê çaxê li ser xala “çare çi ye?” nîqaş bi pêş dikevin. Kengî? Sala 1901’an. Ango piştî partî ava dibe, hema du-sê sal şûn de pirsgirêkên navxweyî û qrîz tê jiyîn. Pirsgirêkên pêşengtiyê hene. Pirtûka Lenîn a bi navê “Divê Çi Bikin” (Ne yapmalı) wê çaxê tê nivîsîn. Wekî bibêje, em çi bikin? Pirtûka bi navê “Gavek Bi Pêş Ve, Du Gav Bi Paş De” (Bir Adım İleri, İki Adım Geri) dîsa wê çaxê tê nivîsîn.

Li ser esasê şopdariya Marks û Engels, wê çaxê otorîte Karl Kaûtsky ye. Kaûtsky, wekî şagirtê wana ye. Jixwe Kaûtsky, di jiyanê de bi Marks re tevgeriyabû, tevî Lenîn şixulîbû, xebat kiribû û wekî şopdarê wan ê herî zana dihat hesibandin. Piştî Marks û Engels, Kaûtsky wekî otorîte tê zanîn. Lenîn, destpêkê ji ber Kaûtsky otorîte ye nikare li dijî pir tiştên Kaûtsky derbikeve, lê wî naecibîne. Destpêkê hinek tiştan rexne dike.

Dûvre di Partiya Sosyal Demokrat a Rûs de dubendî çêdibe. Julius Martov (serokê Menşevîk ê Rûs) heye. Ew zêdetir şopa Kaûtsky dimeşîne. Nîqaş destpêkê li ser “endamê partiyê pêwîst e çawa be” ye. Wê çaxê partîbûn hîn nîn e. Li hemberî pirsa “divê endamê partiyê çawa be”; Martov dibêje: “Her kesê bernameya partiyê qebûl kirî û mehaneya (aidat) xwe dayî, dikare bibe endamê partiyê.” Lenîn dibêje: “Wisa nabe. Ku wisa bibe, ev partî nabe partiyeke têkoşer û pêşeng. Profesorek jî dikare bernameyê qebûl bike, bibe endam, mehaneyê bide û li dibistana xwe mamostetiyê bike. Ev nabe. Her kesê bibe endam divê bernameyê qebûl bike, mehaneyê bide û beşdarî xebata rêxistinî bibe. Ango divê endamê komîteyekê be.” Lenîn jî vê nêrînê dide pêş. Li ser vê mijarê nîqaş pir çêdibe. Ji ber ku li ser vê mijarê li hev nakin, Partiya Sosyal Demokrat a Rûs dibe du parçe.

Çima ev mijar girîng e? Ji bo mirov girîngiya partîbûn û pêşengiyê fêm bike û bikeve ferqê, em vê mijarê vedikin.

Lenîn dibêje: “Endamê partiyê lazim e pêşeng be, milîtan be. Ji bo wê, yê ku hema bername qebûl kirî nabe endamê partiyê. Lazim e bîzat di nava xebatê de be. Profesor dikare bibe endam, lê wê çaxê divê di komîteyekê de jî bixebite. Kesê di xebata komîteyê de cih negire, nabe endamê partiyê.” Martov dibêje: “Na, dikare bibe endam.” Li ser vê yekê Lenîn dibêje: “Wê çaxê ev partî, wê partiyeke rastgir be, oportûnîst be. Ango dibêje û dizane, lê nake. Yekî bibe endam; bernameya partiyê qebûl bike, mehaneyê bide, lê xebat neke partiya pêşeng wisa nabe.” Ev têgihîştin wan dike du parçe. Beşek ji Partiya Sosyal Demokrat a Rûsya dibe Bolşevîk, beşeke wê jî dibe Menşevîk. Ango Martov Menşevîk, Lenîn jî Bolşevîk e. Bi vî awayî dibe du beş. Lê bes tam belav nabe. Tenê dibe wekî partiyeke ku du beşên xwe heye.

Baskê Lenîn Bolşevîk xwe bi rêxistin dike û yê Menşevîk jî xwe bi rêxistin dike. Wekî dibin du bask. Encex îdîaya her du aliyan jî sosyalîzm e. Hinek tiştên wan ên wisa hevbeş jî hene, lê di şêwazê xebatê de û di endambûna partiyê de bi vî awayî cudahiyên wan derdikevin.

Tabî ji derveyî wana jî pir partiyên çep hebûn. Narodnîk jî heye û yên wekî din jî çêdibin. Narodnîkî yên suîqestvan in, radîkal in. Birayê Lenîn jî Narodnîkî ye. Wekî din cur bi cur tevger saz dibin. Bi vî awayî di sala 1905’an de raperînê li dar dixin, lê ev ne raperîneke wekî ya berê ye ku, li Ewropa bajarek, du bajar digirtin. Na. Bi giştî di sala 1905’an de raperînê li dar dixin. Ev pêvajoya raperînê du salan diajo. Encama wê diyar nabe. Têkoşîn dibe, pir pevçûn tên jiyîn Li gelek cihan grev çêdibin. Li gelek cihan lokawt çêdibin ango karker ji kar tên derxistin. Li gelek cihan barîkat tên danîn, bajaran digirin.

Welhasil di sala 1907’an de raperîn dişke. Desthilatdariya Çar bi ser dikeve û li her derê kontrolê çêdike. Pir kesan dikuje. Tiştekî ku navê xwe raperîn, şoreş namîne. Yên ku difilitin bi paş ve dikşin, derdikevin derve. Lenîn wê çaxê derdikeve Siwîsre ango Îswîçre. Welhasil ên din jî xwe vedişêrin û pir kesên berê çepgir ên bi nav û deng vê carê hinek dibin sîxur,

hinek dibin oldar, hinek dibin sûtal (lûmpen). Tê de pir xirabûn çêdibe. Parçe dibin, grûb grûb çêdibin. Bi kurtahî di nav refên çepgiriyê de gelek xirabî çêdibin. Lê Bolşevîkî bi hewldana Lenîn (ku Lenîn li Siwîsre tim bi meqaleyan, bi nivîsan xwe digihand wana) hêdî hêdî xwe komî serhev dikin. Pênc salan kom dibin. Heya sala 1912'an pir lawaz in, lê xwe kom dikin û cardin dest bi xebatê dikin. Ev xebatê wan wisa diajo. Jixwe êdî Bolşevîk û Menşevîk tam ji hev qut dibin.

Di meha Sibata 1917'an de Bolşevîk cardin li hemberî Çarîtiya Rûsya derketin. Tabî wê çaxê Şerê Cîhanê yê Yekemîn heye. Rûsya jî tevî Îngiltere, Fransa û Îtalya li dijî Almanya ket nav îtifaqê. Wekî tê zanîn wê demê Almanya, Awusturya û Osmanî bi hev re bûn; Îngilîz, Fransiz, Îtalya û Rûsya bi hev re bûn. Şerê Cîhanê yê Yekemîn wisa dest pê bû. Çarîtiya Rûsya li kêleka Îngilîz, Fransiz û Îtalya cih girt.

Wê demê rewşeke din a cidî çêdibe. Heya wê çaxê proleter ango enternasyonal li dijî şeran e. Van şerên ku dibin, şerên ji bo dagirkerî û mêtingeriyê ne, şerên ji bo emperyalîzmê ne. Jixwe Lenîn pirtûka "emperyalîzm" wê çaxê ango piştî sala 1917'an dinivîse. Lenîn wê çaxê têgîna "emperyalîzm"ê pênase dike. Lenîn, bêhtir nêrîna ku "Karkerên cîhanê hemû bibin yek. Hemû karkerên cîhanê bira ne. Di eniya cîhanê de karker giştî yek in. Li hemberî karker burjûva heye. Karker, lazim e bi gundî re jî îtifaqê çêbike" bi pêş dixe. Bi îtifaqa karker û gundî, di bin pêşengiya karker de şoreş hedef e. Ev tê armanckirin. Encex ku şer çêdibe, dewletên burjûva Almanya û Îngiltere li dijî hev dikevin şer.

Di vê rewşê de Kaûtsky çi dike? Di wir de pêwîst bû wekî Almanekî proleter li dijî şer bisekiniya. Encex Kaûtsky yekser negot, lê wisa kir ku her kes piştgirî bide dewleta xwe. Dema wisa bû, wê çaxê enternasyonalîzma karker li ber gurmîniyê çû. Kaûtsky destpêkê bi awayekî pasîf li dijî şer sekinî. Dewletên her welatekî karker dixistin şer, lê Kaûtsky li dijî vê nesekinî û jê re bû piştevan. Yekser negot her kes piştgirî bide dewleta xwe, lê bi vî awayî jê re bû piştevan. Lenîn, li dijî vê derket. Ango cesareta herî mezin a Lenîn raber kirî esas ev bû; rexmê ku Kaûtsky wê demê otorîte jî bû, li dijî Kaûtsky derket û got: "Ev helwest şaş e. Karker, lazim e li dijî şer bin. Ev şer şerê neheq e, paşverû ye, şerê burjûva ye, ji bo armancên emperyalîst pêk tê (wê çaxê Lenîn got, "şerê pêşverû" û "şerê paşverû"). Lazim e karkerên Alman li dijî dewleta Almanya bin; karkerên Rûs li dijî dewleta Rûsya bin; karkerên Îngilîz jî li dijî dewleta Îngiltere bin. Ne ku li dijî neteweyên din dewletê destek bikin." Lenîn ev nêrîn parast. Qaşo "enternasyonalî" hebû. Ango karkerên cîhanê giştî yek bûn. Dema wisa bû, karker li dijî hev ketin pozîsyona şer. Ji ber vê Enternasyonala Duyemîn bê fonksiyon ma.

Ha di wir de karkerên Rûs li dijî dewleta Rûsya têkoşîna xwe di nav Şerê Cîhanê yê Yekemîn de dewam kirin. Tabî di sala 1917'an de artêşa Rûsya li her derê di nav şer de bû. Mesela, hatibû Kurdistanê, Erzirom, Qers wan deran girtibû û heya Erzîncanê dihat. Eger ne şoreşa Rûsya bûya, mumkûn e Rûsya bihata û ew der giştî bigirta. Herhal wê Stenbol bigirta. Wê çaxê ne Îngilîz, wê Rûsya bihata wir. Ji ber ku wê çaxê Rûsya tim di Tengava Stenbolê de bû. Wisa tê Kurdistanê.

Wê demê Şoreşa Sibatê dest pê kir. Şoreşa Sibatê bi raperîna ku bi pêş xistin, bi ser keft. Di bin pêşengiya Menşevîkan de hikûmet ava bû. Serokê Hikûmetê Kerenskiy Menşevîkî bû. Kerenskiy, di Sibatê de bû serokwezîr. Wisa wekî koalîsyonê saz bû. Encex Bolşevîk neketin hikûmetê. Lê Bolşevîkan ku berê veşartî bûn, êdî eşkere xebat kirin. Zêdetir xebatên rêxistinî bi pêş xistin. Jixwe Menşevîkan jî nexwestin wana têxin hikûmetê û zêde ne lihev bûn.

Dûvre hilbijartina giştî çêdibe, Bolşevîkî jî tevlî dibin û ji sedî sêzdehê (%13) dengan digirin. Dema Bolşevîk ji sedî sêzdehê rayan digirin, Lenîn dibêje: "Dema şoreşê hatiye." Ango şoreş destpêkê wekî şoreşa burjûva bû. Werga dihesibînin. Şoreşa ku çêbû "Şoreşa Demokratîk a Burjûva" bû. Lenîn dibêje: "Lazim e êdî Şoreşa Proleterya pêk were." Lenîn, li

ser vê yekê di meha Nîsanê de pirtûka bi navê “Tezên Nîsanê û Şoreşa Cotmehê” nivîsand. Tê de îzah dike ku lazim e proleterya şoreşê bike. Jixwe Lenîn Menşevîkan hîn di destpêkê de wekî burjûvayên biçûk pênase dike. Hîn di sala 1902’an de dema nû Bolşevîkî û Menşevîkî ji hev qut bûn, Lenîn ji bo Menşevîkan got: “Ev ne proleterya ne; ev burjûvayên biçûk in. Lewre di têkoşînê de rastgir in û di heqîqetê de oportûnîst in. Heqîqetan dibînin, lê nakin, nabêjin, xwe nadin kar. Lewma ev çîna navîn temsîl dikin.” Nirxandina Lenîn a li ser Menşevîkan hîn di destpêkê de ev bû. Ji bo wê, dema şoreş di bin pêşengiya Menşevîkan de bi pêş ket, Lenîn got: “Ev şoreşa burjûva ye.” Bolşevîkan jî xwe amade kirin û heman salê, di meha Cotmehê de li Moskova raperîn kirin û li Moskova Petersbûrg bi dest xwe xistin. Bi wî awayî desthilat jî bi dest xwe xistin. Kerenskiy wana jixwe cilê jinan li xwe kirin û reviyan.

Wê çaxê dewletên herî sereke yên emperyal Îngiltere û Fransa ye. Wana dest diavêjin Artêşa Çar. Di Artêşa Çar de fermandariya artêşê belav dibe, lê bes fermandarên mezin, heta yên di cîhanê de bi nav û deng, ên di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de pir rol lîstîn û berî wê jî di gelek şeran de navê xwe derketîn, hene. Îngiltere û Fransa piştevaniya van fermandaran dikin. Mînak, general Denikîn, general Kornîlov heye. Di bin kontrola her yek ji vana de bi sed hezaran leşker hene. Nimûne, general Anton Îvanovîç Denikîn bi sed hezaran leşkerên xwe hene. Cardin leşkerên General Lavr Georgiyevîç Kornîlov jê hindiktir in, lê ew jî bi sed hezaran tê ziman. Şoreşa Cotmehê ya di pêşengtiya Bolşevîkan de bi pêş ketî, wekî şoreşa prolaterya bi raperînê Petersbûrg û Moskova digirin dest xwe. Lê çîna burjûva, hemû kesên li dijî şoreşê û leşkerên Çar bi piştevaniya Îngiltere û Fransa diçin ser şoreşê. Şerên dijwar çêdibin, hemû hêzên li dijî şoreşê dibin yek û êrîşan bi pêş dixin.

Bolşevîkî li hemberî vana li ber xwe didin. Bolşevîkî di hundirê berxwedanê de, di parastinê de Artêşa Sor ava dikin. Li hêlekê serokên şoreşê bang li gel dikin û dibêjin werin bibin artêş û artêşê bi rêxistin dikin, li hêla din jî şer dikin. Ev şerê navxweyî ji sala 1917’an heya 1920’an sê salan diajo. Bolşevîkî, bi esasî hindik in. Artêşa wana zêde nîn e. Hinek di nava artêşa Çar de yên çepgir ên ku hatine birêxistinkirin hene; ew beşdarî şoreşê dibin. Lê li gorî artêşa li dijî şoreşê hejmara wan ne zêde ye. Gundî û karker jî beşdarî şoreşê dibin û li şoreşê xwedî derdikevin. Kadroyên Bolşevîkan wekî tê xwestin pêşengtiyê dikin. Li hêlekê xwe bi rêxistin dikin, li hêla din jî şer dikin. Ango her kes lê kom dibe. Burjûva lê kom dibe, sanayîger lê kom dibin, burjûvayên xwediyê axê lê kom dibin û êrîş dikin.

Hinek hêzên çepgir, burjûvayên biçûk û oportunîst ên wekî Menşevîk, Sosyalîstên Çep ango gelek rêxistinên çep li dijî Bolşevîkan derdikevin. Ji ber ku Bolşevîk ji nav 9-10 rêxistinan rêxistineke çep e û ew serî hildide. Rêxistinên din jî di bin serkêşiya Menşevîkan de ji heyva Sibatê heya Cotmehê bi hevbeşî dibin desthilat. Bolşevîk ne di desthilatê de ye, lê dikare hinekî rihet kar bike. 6 mehan werga firsendê dibîne. Lenîn vê derfetê baş bi kar tîne û bi tezê Nîsanê, rêya şoreşê zelal dike. Û dibêje, “Pêwîst e şoreşa proleterya bi pêş bikeve. Wexta raperînê hatiye.” Şoreş jixwe wisa dest pê dike. Ji ber ku şoreş heman demê desthilatdariya Menşevîkan û hevalbendên wan dixîne, hemû li dijî Bolşevîkan tevî burjûva û leşkerên Çar dikevin êrîşê. Li hemberî van hemû êrîşan Bolşevîk bi tena xwe ne, lê ji bo parastina şoreşê bang li gel dikin. Di wê dema krîtîk de yên wekî Stalîn û Troçkî derdikevin pêş. Vana di wî şerî de rol dilîzin. Troçkî, karê xwe bêhtir ajîte ye. Ango gel bandor dike û di birêxistinkirina Artêşa Sor de rol dilîze.

Artêşa Sor, di sala 1920’an de bi ser dikeve û zaferê qezenc dike. Hemû êrîşkaran tesfiye dikin, vala derdixin û digihin zaferê. Bingehê Sovyetê wisa tê danîn. Êdî di Rûsya de ji sala 1920’an şûn de Yekîtiya Sovyetê bi pêş dikeve. Ev ji bo çînên bindest zaferek e.

Heta wê çaxê meseleyek wisa heye; Lenîn herhal civîneke çapemeniyê li dar dixe. Hemû rojnamevanên Ewropa û cîhanê giştî tên. Meraq dikin û ji Lenîn dipirsin û dibêjin: “Sira we ya serkeftinê çi bû? Hûn çawa bi ser ketin? Rexmê ewqas kes li dijî we derketin, artêşa nîzamî û generalên bi nav û deng hebûn; sira we ya serkeftinê çi bû?” Ji ber Lenîn analîzkar bû rojnamevan dibêjin qey wê xalan bihejmêre û dirêj şîrove bike. Lê Lenîn dibêje: “Di vî

şerî de sirên me ev bûn; yek, dîsiplîn; didu, cardin dîsiplîn; sisê dîsa dîsiplîn." Ango dibêje, sira me dîsiplîn e. Sê xalan dibêje, her sê xal jî dîsiplîn in. Ango Lenîn dibêje, dîsiplîna Bolşevîkan a ji hesin bû bingeh ku ew bi ser bikevin. Her endamekî Bolşevîk li ku derê be, erk û talîmata girtî, pêk aniye. Wisa pêşengtî kiriye, gel birêxistin kiriye, artêş ava kiriye, li ber xwe daye û bi ser ketiye.

Niha baş fêm dibe ku 15 sal beriya şoreşê çima Lenîn di pîvanên endametiya partiyê de israr kiriye? Ji ber ku Lenîn dixwest partî partiyek milîtan be, her endamekî/e wê xebatkar be. Ji bo wê wisa israr kir, pêşniyara Martov qebûl nekir û red kir. Partiyeke wisa bingehê wê saxlem hatî danîn nebûya, jixwe ev şer jî nedibû. Di pratîka Rûsya de baş eşkere dibe ku ger pêşeng xurt be, dikare gelek tiştan bi ser bixe.

Şoreşa Cotmehê, şoreşeke mezin bû. Di çapê cîhanê de hemû tişt bi xwe re guhert. Yekem car partiyeke li dijî kapîtalîzmê, bi alternatîfa sosyalîzmê bi ser ket. Hem jî li welatekî pir mezin wekî Rûsya (tê zanîn ku Rûsya welatek pir mezin bû) bû desthilat. Rexmê hat dorpêçkirin, li hemû deran êrîş li ser çêbû, dîsa jî li hemberî wan hemû êrîşan li ber xwe da û xwe parast.

Li vir di aliyê şer de stratejiya serkeftinê çi ye? Raperîn e. Raperîn bi vî awayî bi ser ket. Tiştê li Komuna Parîsê bi ser ket, şeş mehan ajot. Vê carê li Moskova proleterya cardin dest danî ser desthilatê. Dîsa wekî Komuna Parîsê, hatin ji bo cardin ji dest bigirin, lê vê carê nikarîbûn. Bi vî awayî vê bi xwe re serdemeke nû vekir. Di aliyê têkoşînên çînên bindest de, paşê ev ji neteweyên bindest ên wekî Çînê re jî bû nimûne. Ev bû perspektîfek. Hat fêmkirin ku mirov li hemberî desthilatê bi şêwazê raperînê dikare bi ser bikeve. Destpêkê raperîn bû. Ji derve jî pir êrîş bi ser wan de hatin, lê cardin jî raperîn bi ser ket. Rûsya, bi vî awayî êdî ket xeta sosyalîzmê. Lê dîsa jî nebû sosyalîst. Ez di vê xisûsê de jî çend tiştan bibêjim, ji ber ku dûvre di wî milî de pir şaşîtî hatin jiyîn.

Wexta ku nû şoreş çêdibe, bi taybetî di sala 1920'an de ku êdî şerê navxweyî diqede, divê sîstema nû bê avakirin. Sîstema sosyalîzmê bê pêşxistin. Lê Lenîn bi şêwazekî pir aqilane rasterast pîvanên sosyalîzmê tetbîq nekirin. Dibêje, tiştên beriya wê bên kirin hene û projeya NEP (Polîtîkaya Aboriya Nû) pêşniyar dike. "Polîtîkaya NEP" çi ye? Ango ji bo aboriya welat û ji bo civak ji sosyalîzmê re bê amadekirin wekî qonaxeke destpêkê ye. Hê jî tiştên wekî mulkiyeta taybet hebûn, lê ji bo hêdî hêdî ber bi sosyalîzmê ve biçin ango ji bo gav bi gav mulkiyeta taybet rabe û her tişt bibe komun hedefan datîne. Encex ev piştî wefata Lenîn pêk nayê.

Esas Lenîn ku sax bima, mumkûn e rewş cuda bibûya. Ji ber ku Lenîn hîn biaqil bû û serokê şoreşê bû. Dikaribû hîn baş ruh bida xeta xwe, can bida xeta xwe. Lê belê beriya sala 1924'an ji aliyê partiyên çep ên sosyalîst ve suîqest li Lenîn tê kirin. Wê çaxê hema namire, lê derbeyê jê dixwe. Piştî wê di sala 1924'an de wefat dike.

Lenîn wexta wefat dike, di pişt Lenîn de du kesên li pêş hebûn. Yek Troçkî bû, yek jî Stalîn bû. Lenîn herhal ferq dike ku wê wefat bike, wê çaxê nameyekê dinivîse. Lenîn, di nameya xwe de wekî ku Troçkî îşaret bike dibêje: "Stalîn, li hemberî rêhevalan uslûbê xwe hinekî hişk e." Bi vî awayî Stalîn rexne dike. Hinek tiştên Troçkî jî rexne dike, lê bes tam zelal nake. Encex şik û gumanên xwe yên ji bo Stalîn tîne ziman. Stalîn jî wê demê wekî milîtanekî Lenîn, bi taybetî di şerê navxweyî de û beriya wê pir tişt kiribûn. Bingehê Stalîn ê xwendewariyê ne xurt bû. Heya dibistana navîn xwendibû, lê xwe pir gihandibû. Jixwe dema tê girtin, şev û roj her tim dixwîne. Yekî wisa bû ku xwe bi şoreşê ve tam kilît kiribû. Di hundirê şoreşê de şekil digire ango dibe milîtan. Di destpêkê de ne ewqas pêşketî bû. Ya girîng, di hundirê şoreşê de şekil digire û xwe bi pêş dixe. Bi taybetî di meşandina şoreşê de dibe kadroyekî pêşeng ê herî xurt. Lê Lenîn uslûbê wî hinekî hişk dibîne. Bi taybetî wexta ku Lenîn suîqest dikin, ji ber vê Stalîn pir kesan dikuje. Tevgera paqijkirinê dest pê dikin. Ango pir kesên li dijî şoreşê tesfiye dikin. Herhal Lenîn ji wir jî dişopîne ku Stalîn yekî pir hişk e.

Xalek din jî heye ku Troçkî, esas ne Bolşevîk bû. Troçkî paşê beşdarî Bolşevîkan dibe. Berê grûbeke wî bi xwe heye. Dûvre beşdarî Bolşevîkan dibe. Yek jî, Troçkî yekî zêde entelektûel û ajîtator bû. Di wî şerê navxweyî de pir ajîte dike, pir civîn û mitîngên gel çêdike. Bi wê derdikeve pêş. Artêşê kom dike. Esas demeke kurt artêşê jî dimeşîne, lê ew jî di artêşê de pir kesan tesfiye dike, tiştên wekî darvekirinê bi pêş dixe. Encex yek ji taybetmendiya wî ya balkêş jî, tam ne ji kokê Bolşevîkan hatiye, dûvre beşdar bûye. Yek jî, her tişt dixist mijara nîqaşê. Troçkî yekî wisa bû. Nimûne, pir tê gotin ku, di civînan de carina du alî hebûna, raya xwe dida herduyan jî ango hem dida vî, hem dida wî. Ji bo her duyan jî destê xwe radikir. Esas kesekî polîtîk bû. Asta Troçkî ya entelektûelî bilind bû û polîtîk bû. Avahiya Bolşevîk herhal Troçkî qebûl nake. Yekî ku aliyê xwe yê pir teqlîdkar jî hebûne.

Dema Lenîn dimire, Stalîn bi xwe nameya Lenîn di meclîsê de dixwîne. Hêsir bi çavan dikeve û di dawiyê de dibêje: “Yê ku destê xwe dirêjî Partiya Lenîn bike, ez ê li hemberî wan hişk bim!” Ango dibêje, hişkiya min li hemberî yên li dijî partiyê ne. Welhasil Bolşevîkî Stalîn hildibijêrin. Stalîn wisa tê ser partiyê.

Stalîn, dema tê ser partiyê û şûn de, tabî dixwaze xeta Lenîn bimeşîne. Wekî leşkerekî Lenîn e, lê dûz e. Mesela, Stalîn sala 1927’an Bernameya NEP radike. Bernameya NEP, wekî gav bi gav biçe sosyalîzmê ye. Stalîn wê radike û dibêje: “Divê mirov rasterast biçe sosyalîzmê. Ev welat êdî sosyalîst e.” Bi giştî mulkiyeta taybet qedexe dike, dest dide ser. Ango dixwaze sosyalîzmê tam pêk bîne, ji bo vê jî yên ku li dijî derdikevin hemûyan tesfiye dike.

Tabî Troçkî li dijî Stalîn derdikeve. Stalîn jî Troçkî surgûn dike. Destpêkê surgûnî Azerbaycan wan deran dike, paşê jî surgûnî Stenbolê dike. Herhal Troçkî salekê li Stenbolê dimîne. Piştî wê Troçkî diçe Meksîka. Troçkî, bi tena xwe naçe Meksîka. Li Meksîka kar dike. Ji ber li dijî Stalîn e, Meksîka hinekî derfet jê re çêdike. Amerîka û Ewropa giştî ji Stalîn ditirsiyan. Lewma ji bo Troçkî derfetan çêdikin. Troçkî li wir dibistanê vedike. Di dibistana xwe de kadroyan perwerde dike. Ew jî dibe wekî tevgereke li dijî Stalîn.

Wekî tê zanîn Rûsyayê Sovyet ava kir û welatên din ên wekî Ermenîstan, Azerbaycan, Gurcîstan, Ûkrayna beşdarî Yekîtiya Sovyetê kirin. Stalîn ew der zeft kir. Troçkî jî ji bo desthilatê bi dest xwe bixe, dixebitî. Tevgera wî wê çaxê ne hindik bû. Pir kadro amade kiribûn. Ji ber ku Rojava piştgirî dida Troçkî.

Destpêkê bi alîkariya Partiya Komunîst a Meksîka û bi îstixbarata Sovyetê NKWD (dûvre navê xwe bû KGB) bi ser mala Troçkî de digirin. Li wir koşka wî ya ku tê de jiyan dikir hebû, li pêşiyê nobedar û ewlekarî hebûn. Dibistana wî jî li wir bû. Ango wekî saheyekê aîdê wî bû. Wê demê bi çekan bi ser wir de digirin. Kesê li ber derî disekine bi rêxistin dikin ku derî ji wana re vedike. Dikevin hundir û heya ber deriyê odeya ku Troçkî tê de razayî jî rihet diçin. Derî vedikin û lê direşînin. Troçkî û jina xwe, xwe dixin bin textê razanê. Werga pir lê direşînin, lê ji ber yekser li Troçkî naxin, tiştek pê nayê. Werga ji wê biserdegirtinê saxlem difilite. Heta Meksîka ji Troçkî dikeve gumanê, dibêje: “Dibe ku wî bi xwe kiribe. Zilamên wî yên çekdar hene, belkî ji bo em jê re derfetan çêbikin, wisa kiribe.” Dûvre tespît dikin (herhal yek ji êrîşkaran li çiyê kuştî dibînin) ku rast e û ew biserdegirtin bi ser nakeve.

Ew milîtanê berê li Îspanya şer kirî, Ramon Mercader hebû; jixwe ji Îspanyayê bû, yekî Stalînîst bû. Wekî ku rojnameger e bi Troçkî re têkiliyê çêdike. Troçkî, wê çaxê her tim dibêje: “Lazim e şoreş nesekine. Bênavber şoreş, li her derê şoreş, li tevahî cîhanê şoreş!” Teoriya wî wisa bû. Jixwe niha Troçkîzm heye, ew jî xetek e. Û teoriya wan bênavber şoreş e.

Ew milîtanê ji Îspanya Ramon Mercader wê çaxê li ser rojevê meqaleyekê dinivîse, ji Troçkî re dişîne û jê re dibêje, “fikrek nû ye, em hinekî li ser nîqaş bikin.” Troçkî jî dibêje, “Temam. Tu ji min re bişîne, ez berê bixwînim.” Ji bo vê Troçkî randevû dide wî û dibêje,

“filan saetê were, em nîqaş bikin”. Ew milîtan berê ji Troçkî re meqale dişîne, dûvre ew bi xwe diçe. Welhasil di nîqaşê de herhal bi hesinekî li Troçkî dixe. Xuya ye milîtanekî bi biryar e. Ji bo tesfiyekirina Troçkî xwe feda dike. Dema ewlekariya Troçkî pê dihese, dikeve hundir û ew kes jî li ber xwe dide. Ango li hev dixin û kesên parastina Troçkî dikirin li wî milîtanî dixin. Troçkî bi wî awayî paşê di nexweşxanê de dimire. Kuştina Troçkî jî wisa ye. Ji ber mijara me ne ev e, ez vê kin dibirim.

Di wir de Stalîn bi kurtebir çû û hema got: “Welat êdî sosyalîzm e; em êdî derbasî sosyalîzmê dibin”. Bi vî awayî sîstemeke hişk danî û hem di hundirê partiyê de, hem jî di derve de şîdet meşand. Her tişt kir “dewleta sosyalîst”. Belkî mirov paşê li ser bisekine. Encex “dewletbûna proleterya” yan jî “dîktatoriya proleterya”, jixwe nav li ser e “dîktatoriya proleterya”. Di esasê wê de şaşîtî hene. Ji ber ku li cihekî dîktatorî hebe, li wir demokrasî nabe. Stalîn jî hîn şaş kir. Lenîn ku hebûya belkî pê bida xwarin û sosyalîzm hêdî hêdî tetbîq bikira. Lê Stalîn yekser bi hikmê dewletê xwest sosyalîzmê tam tetbîq bike. Hele hele ku Hîtler jî li Almanyayê hat ser desthilatê û yekser sîstema Sovyetê kir hedef; ji wê şûn de Stalîn êdî nîzama zextê ji bo xwe tam esas girt û tetbîq kir.

Di wir de dogmatîzm û kurtebirî (kestirmecilik) tam serwer bû. Stalîn aliyê îradebûna gel û aliyê demokrasiyê zêde neda ber çavan. Di bin navê “Em li dijî faşîzmê ne” de digotin: “Sosyalîzm di dorpêçkirinê de ye, lazim e em Sovyetê biparêzin.” Heta partiyên komunîst ên li welatên derve jî giştî xistin bin xizmetê ku adeta her kes Sovyetê biparêze. Troçkî, di hinek aliyan de tiştên xwe yên rast jî hebûn. Troçkî li dijî wê bû ku bêjin, “li her welatî şoreş”. Stalîn got: “Her kes Keleha Şoreşê biparêze”. Ango her kes divê destpêkê Sovyetê, dûvre şoreşê biparêze. Bi kurtahî ji rê derketin werga hat jiyîn.

Di vir de tiştê derketî holê; stratejiya raperînê li Rûsya şoreş bi ser xist. Dema hat dîtin ku stratejiya raperînê li Rûsya bi ser ket, wê çaxê her kesê dixwest şoreşê bike, êdî xwest xwe di stratejiya raperînê de tam kûr bike û bi wî şêwazî ew jî bigihin encamê. Ji bo wê li Çînê, di sala 1921’an de gundiyan raperîn kirin, lê bi ser neket.

## B) Stratejiya Gerîla û Ezmûna Mao

Li Çînê destpêkê dema dibînin ku li kêleka wan Rûsya bi şêwazê raperînê bi ser ket, ew jî dixwazin werga bi ser bikevin. Ji bo vê radibin, lê bi ser nakevin. Cardin di sala 1927’an de radibin; dîsa bi ser nakevin. Sala 1931’an li Vîetnamê raperîn çêdibe, radibin. Wê çaxê li Vîetnamê Partiya Karker ava bibû, lê cardin bi ser nakevin. Dinêrin ku erê Rûsya bi ser ket, lê ew bi xwe ser nakevin.

Di hundirê pratîka şoreşa Çînê de Mao Zedûng (Çetûng) jixwe hîn sala 1920’an di raperîna gundiyan a nû de wekî milîtanekî ji rêzê cih digire. Dûvre sala 1927’an cardin di raperîna mezin de cih digire. Wê çaxê wekî endamê navendî yê Partiya Komunîst tê hilbijartin û dibe endamê navenda Partiya Kamunîst. Ango ne serok bû, encex lêhûrbûna wî hebû. Dema raperîna gundiyan nikare xwe biparêze û bi bin dikeve, Mao pêşniyar dike û dibêje: “Em herin Bakurê welat. Ew der çiya ye, asê ye. Ew der hîn musaîd e. Li wir kontrola dewletê hîn kêm e. Em herin wir.” Welsahil werga ew “Meşa Dirêj” dest pê dibe. Ew meş dirêj dajo. Tabî di rê de jî desthilatdarî her dixwaze pêşiya wan qut bike. Ji ber vê gelek caran dikevin şer. Ya girîng, digihin serî û bi ser dikevin, lê di rê de ji wana pir kes jî dimirin. Li wir çiyê digirin û di çiyê de dimînin. Mao hinek lêhûrbûn dike, gelek tiştan nîqaş dike, dinivîse û digihe encamê.

Encam çi ye? Mao dibêje: “Rast e, li Rûsya bi stratejiya raperînê şoreş bi ser ket, encex li Rûsya kapîtalîzm bi pêş de bû, bajarên wê mezin bûn. Karkerên wê zêde bûn, gundiyên wê hindik bûn. Lewma li wir proleterya bi ser ket. Lê Çîn, bajarên wê biçûk in, karkerên wê

hindik in. Ji ber ku li Çînê kapîtalîzm nîvçe ye, tam bi pêş neketiye. Sîstema civakî ya welatê Çînê nîv kapîtalîst, nîv feodal e. Gundiyên wê pir in. Tu bajaran zeft dikî, xelk piranî ne li bajaran e. Dewlet li dora bajaran digire, barîkatan radike û raperîn bi ser nakeve û bi bin dikeve. Wê çaxê tê wê wateyê ku li vir raperîn nabe." Li hemberî vê nêrîna Mao pir kes dibêjin: "Na! Ev kî ye? Ev çima wisa dibêje? Em jî şopdarên Sovyetê ne; em ê wekî Sovyetê bikin." Mao dibêje: "Wisa nabe. Şert û mercên Ewropa û Rûsya cuda ne, yên Çînê cuda ne. Li Çînê raperîn bi ser nakeve." Lê çi bi ser dikeve? Mao, ha di wir de dibêje: "Li Çînê şerekî demdirêj pêwîst e; ango şerê gel ê demdirêj pêwîst e. Lazim e destpêkê ne di bajaran de, divê di çiya de xwe biparêze." Di modela Rûsya de navenda rabûnê bajar bûn. Mao dibêje: "Navend ne bajar, divê çiya be." Wê çaxê Mao di çiyê de gerîla bi pêş dixe û 10 prensîbên gerîla yên bingehîn datîne. Ev prensîb niha ji bo me hêsan in û tiştên ji rêzê ne, lê wê çaxê zehf balkêş bûn.

Ev 10 prensîbên bingehîn dûvre digihin Kuba. Li Kuba Fîdel Kastro û Che Guawera pir jê îstifade dikin. Lê niha ji bo me çi qîmeta xwe nîn e. Ev prensîb çi ne? Mesela dibêje: Prensîba yekemîn; Li dijmin bixe û bireve. Di Bakur de bang bike, di Başûr de lê bixe. Li tu deran sabît nemîne, hereket bike û hwd. Jixwe em vana di jiyanê de pêk tînin. Prensîbên wî bi vî awayî bûn. Ango di aliyekî de deng derbixe, bila dijmin bizane tu li wî alî yî; tu di aliyê din de lê bixe û tim bi tevger be. Li cihekî sabît nemîne. Bila dijmin cihê te nizanibe, lê tu cihê dijmin bizanibe. Ku dijmin êrîş kir, tu xwe bi paş de bikişîne. Ku dijmin ket parastinê, tu êrîş bike. Prensîbên Mao tiştên wisa ne. Lê belê van prensîban wê çaxê wekî xeteke nû bû. Mao digot: "Stratejiya şoreşê ne raperîn, lazim e şerê gel ê demdirêj û gerîla be. Pêwîst e wisa be." Mao vî bingehî datîne.

Li ser vê yekê wê çaxê çiyê digirin. Mao, vê dike wekî teorî, dinivîse û pêşkêşî komîteya navendî ya partiyê dike. Ji komîteya navendî hinek kes qebûl dikin, hinek qebûl nakin. Lê bi piranî xeta ku ne li bajar be, li çiyê be qebûl dikin. Di heman çarçoveyê de Mao li wan araziyên ku wana girtî dibêje: "Dijmin xwe amade dike were çiyê. Dijmin ku niha were, lazim e em ji ber bikişin, dijmin bixin hundirê xwe û qet qetî bikin. Dijmin ku westiya, em lê bixin. Bila dijmin were û bikeve nav me. Dijmin ku ket nav me, wê li arazî belav bibe. Dema li arazî belav bû, em ê parçe parçe li dijmin bixin. Niha ger em di eniyê de lê bixin, em ê derbeyê bixwin."

Yên din heçku pir şerker in dibêjin: "Na, ev ne şerkerî ye. Çawa em dijmin berdin, were her tiştê me talan bike, çandiniyên me xira bike, dest dane ser mal û mulkên me, bikeve gundê me, bajarê me (ji ber hinek bajarên biçûk jî di destê wana de bûn)? Em vê qet qebûl nakin. Em ê di deriyan de şer bikin, dijmin bernadin herêma xwe. Em ê şerê beranan bikin. Em ê di deriyan de û di xetên destpêkê de nehêlin dijmin bikeve nav axa me."

Li hemberî vê yekê Mao dibêje: "Ev şaş e. Derfetên dijmin ji yên me pirtir in. Hêza wan ji ya me mezintir e. Teknîka wan (wê çaxê Amerîka teknîk dida dewleta Çînê. Serokê dewleta Çînê Çay Kay Şek bû. Amerîka ew destek dikirin) heye, topên wan hene. Alavên wan ên zirxî (wê çaxê teyare li cem Çînê ne zêde bû, kêm bû, lê alavên xwe yên zirxî û topên xwe pir hebûn) hene. Di şerê eniyê de wê me bişkînin."

Welhasil pêşniyara Mao qebûl nakin û wekî bêjin nêrînên wî şaş in Mao didin erkeke pasîf. Werga nêzîkî Mao dibin. Lê dema şer dikin, dişkin û gotinên Mao rast derdikevin. Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst li ser vê yekê kom dibe, ji bo erkê bang li Mao dike û jê re dibêjin, were erkê; were ser artêşê. Ji ber ku heya wê çaxê jî Mao di artêşê de baskek îdare dikir. Welhasil Mao, werga di rêveberiya artêşê de tê cihekî girîng û êdî perspektîfên Mao esas digirin.

Dema dibînin ku enî şikest û wê tesfiye bibin, êdî Mao dixin dewrê. Mao ku tê ser rêveberiya artêşê, wê çaxê van taktîkên gerîla tetbîq dike. Mao, li ser taktîkên gerîla hema parçe parçe dinivîse û belav dike. Mao, şêwazê meşandina taktîkê gerîla û şerê gerîla yê bi

tevger dide pêş. Qad wê çawa bên parastin; teoriya vê çêdike û pratîka wê tetbîq dike. Mao, werga dijmin bi paş dixe û her diçe arazî hîn fireh dike. Gav bi gav wisa dike ku çiya dikevin destê wana, bajar jî di destê dijmin de ne. Wekî tê zanîn, dûvre 1'ê Cotmeha sala 1949'an di bin pêşengiya Mao Zedûng de Artêşa Sor li Çînê şoreş kir û bi wî awayî bi ser ket.

Di vir de zelal bû ku li kêleka stratejiya raperînê, stratejiyeke nû derket holê. Stratejiya nû çi ye? Stratejiya Şerê Gel ê Demdirêj e. Teoriya vê tabî Mao bi pêş xistiye. Di pratîkê de pijiyaye. Mao, ji sala 1920'an heya 1949'an ango 29 salan di nav vê têkoşînê de dimîne. Tabî destpêkê ne gerîla bû, lê di şoreşê de ma bû. Mesela, destpêkê gund e. Hemû gund digihin hev, li ber xwe didin. Artêş tê û dikeve nav wan; ew jî xwe diparêzin. Artêş wana dişkîne û belav dike. Bi vî awayî tesfiye dibin. Encex bi stratejiya nû ya Mao bi pêş xistî, bi vî awayî şerê gel ê demdirêj li Çînê bi ser dikeve.

## C) Merheleyên Şerê Gel ê Demdirêj

Ji bo şerê gel ê demdirêj ez kurt bibêjim. Şerê gel ê demdirêj di sê merheleyan re derbas dibe:

Merheleya yekemîn; gerîla ye. Pêşî bi komên gerîla yên biçûk dest pê dike. Ew koma gerîla hêdî hêdî xwe mezin dike, propaganda dike, gel qezenç dike û bingehê xwe ava dike. Cardin bi tevger e, sabît nîn e. Cihê xwe veşartî ye. Dijmin li ser operasyonê çêdike; ew xwe vedişêre. Ango terzê tevgerîna gerîla bi vî awayî ye; lê bixe û bireve. Ji vê re dibêjin, "Dema Parastina Stratejîk".

Esas gerîla di vê demê de ye. Ango tevgera gerîla ya esasî di vê merheleyê de bi pêş dikeve. Gel tê hişyarkirin û qezenckirin. Tevgera gerîla ya bi şêwazê lê bide û bireve di dijmin de lawaziyê bi pêş dixe. Her diçe gerîla mezin dibe û çalakiyên hîn xurtir bi pêş dikevin. Lê ji qonaxekê şûn de divê derbasî hevsengiyê bibe. Li hinek welatan gerîla nikarîbû derbasî merheleya hevsengiyê bibe, lewre li wan deran şoreşê pir demdirêj ajotiye. Li Kurdistanê jî me di demeke dirêj de têkoşîn meşandiye. Me jî di vê qonaxê de şer kiriye, ne hewce ye em pir dirêj bikin. Şoreşa gerîlayên Kurdistanê ji '93'an vir ve hewldana xwe ya pratîkî ya ku derbasî merheleya duyemîn bibe her heye. Ya rastî mirov dikare bibêje, şerê di navbera gerîlayê azadiya Kurdistanê û dewleta Tirkiyê de 23 sal in li ser vê mijarê ye. Gerîla her dixwaze derbasî dema hevsengiyê bibe, lê dewleta Tirk pêşî lê digire û naxwaze gerîla derbasî merheleya hevsengiyê bibe. Şer li ser vî esasî dimeşe. Lê a niha gav bi gav mirov dikare bibêje gerîla derbasî qonaxa duyemîn bûye. Wekî tê zanîn hem li Başûr, hem li Bakur qadên parastî hene. Ev jî tê wateya ku qonaxa duyemîn di astekê de pêk hatiye.

Merheleya duyemîn; gerîlayê ku di nav liv û tevgerê de xwe mezin kirî, hêdî hêdî digihe astekê ku bikaribe herêmên gerîla, qadên gerîla ava bike. Van qadan, divê dijmin zû bi zû nikaribe têkeviyê. Dûvre gav bi gav wan qadan rizgar dike. Dema rizgar dike –ku li Vîetnamê wisa bûye, li Çînê jî wisa bûye- jê re dibêjin, "Dema Hevsengiya Stratejîk".

Dema hevsengiya stratejîk çawa ye? Gerîla di çiyê de ye, çiyê diparêze; dijmin jî di deşt û bajaran de ye. Gerîla nikare here deşt û bajaran, hema wan deran ji destê dijmin bigire, lê dijmin jî nikare were û çiyê ji destê gerîla bigire. Belkî dijmin tê, dikeve çiyê, lê nikare ji destê gerîla bigire. Wexta dijmin tê, gerîla şerê eniyê nake. Wekî Mao gotî, dijmin dixe hundirê xwe. Lê dijmin nikare tê de bimîne, nikare çiyê ji destê gerîla bigire û gerîla jê derbixe. Gerîla cardin di çiyê de dimîne. Dijmin belkî dikeve çiyê, encex nikare gerîla jê derbixe û dijmin tê de zirar dibîne. Hevsengî ev e. Ji bo wê jê re dibêjin "Dema Hevsengiya Stratejîk". Ango di navbera artêş û gerîla de hevsengiyek çêdibe.

Dema wisa dibe tabî gerîla di çiyê de hêza xwe mezin dike. Wekî me û niha, cihên wan ên perwerdeyê çêdibin. Êdî dikare bi sedan, hezaran kes perwerde bike û hêza xwe mezin bike. Li gorî stratejiyê, di hevsengiyê de lazim e gerîla ji derve piştevaniyê ango alîkariyê bigire. Ji ber ku gerîla hêza xwe mezin dike. Ew hêza mezin ne gerîla, divê artêşa nîv nîzamî be. Êdî teknîk jê re lazim dibe. Mesela, top jê re pêwîst in, çekên din, teyare jê re pêwîst in. Ji bo xwe biparêze, qadan biparêze û ya girîng ji bo êdî bikaribe bajaran bigire teknîk jê re lazim e.

Wê çaxê dinya du qutûb e. Li aliyekî Sovyet e, li aliyekî jî NATO ye. Van tevgerên gel ango tevgerên çep tabî pişta xwe didin Sovyetê. Divê Sovyet piştevaniya wan bike, teknîkê bide wan ji bo bikarin derbasî êrîşa stratejîk bibin.

Merheleya sêyemîn jî "Dema Êrîşa Stratejîk" e. Di Dema Hevsengiya Stratejîk de gerîla xwe xurt dike, hejmara xwe mezin dike, ji derve alîkariya teknîkê digire û bi vî awayî dikare artêşeke nîzamî bişkîne. Li deşt û bajaran jî komîteyên xwe yên gel bi rêxistin dike. Lazim e bajar dest bi raperînê bike, gerîla jî di çiyê de êrîş bike. Ango divê gel û gerîla bibin yek. Di vir de rola gel ew e ku di bajaran de raperîn bike, gerîla jî di derve de êrîş bike û bi vî awayî bajar rizgar bibin. Dema Hevsengiya Stratejîk demek wisa ye.

Li ser vî esasî, ji bo merheleya dawî jî dibêjin "Dema Êrîşa Stratejîk". Wekî nimûne, Çîn wisa bûye, Vîetnam wisa bûye. Ango gerîla di çiyê de piştevaniya xwe hebû, çek girtibû û xwe xurt kiribû. Bi vî awayî dûvre di bajaran de raperîna gel çêdibe û di çiyê de jî hêza gerîla (gerîla êdî artêş e, artêşa nîv nîzamî ye, esas ji gerîlatiyê derketiye) wekî Artêşa Sor êrîş dike û bajaran digire. Serkeftina stratejîk wisa pêk tê.

Di gerîla de şerê gel ê demdirêj bi vî awayî sê merhele ne: Yek, parastina stratejîk; didu, hevsengiya stratejîk; sisê, êrîşa stratejîk. Bi piranî di van merheleyan re derbas bûne. Li cihên şerê gel ê demdirêj pêk hatî, wisa bûye.

## D) Artêşbûna Gerîla û Ezmûna Vîetnamê

Heman demê ev rewşa şerê gel ê demdirêj li Vîetnamê jî hat jiyîn. Vîetnamî sala 1931'an radibin, lê bi bin dikevin. Paşê Şerê Cîhanê yê Duyemîn dest pê dibe. Tabî her binkeftinek zirarek e û hêza binkeftî heya çend salan jî nikare serî rake. Hoşîmîn, wê çaxê sekreterê Partiya Karker a Vîetnamê bû. Hoşîmîn teoriya Mao pir ji nêz ve dişopîne, pir di cih de dibîne û diecibîne. Hoşîmîn jî li ser vî esasî dixwaze li Vîetnamê (berê wana jî raperîn kiribû, lê bi bin ketibûn) bi şêwazê gerîla dest pê bike. Encex di destê wî de zêde derfet tune bû. Hoşîmîn, ji bo vê bang li Gîap dike. Gîap, wê çaxê li Vîetnamê mamoste bû, lê şoreşger bû. Ango kadro bû, lê mamostehî dikir. Talîmat jê re dişîne û dibêje: "Dev ji karê xwe berde û were." Gîap wê çaxê tê Çînê. Jixwe Çîn û Vîetnam sînorê wan bi hev re heye û nêzî hev in. Dema Gîap tê Çînê, li wê derê Hoşîmîn dibîne. Welhasil ji bo gerîla amadekariyê dikin. Hemû hêza wan 34 kes bûn. Gîap bi 34 kesan vedigere Vîetnamê û çekên hemûyan jî tune bûn. Çekên hinekan bi barût bûn, yê hinekan tam çek bû, hinekan das û tiştên wisa di destê wana de bû. Gişt jî ne bi çek bûn. 34 kes li Vîetnamê bi şêwazê gerîla dest pê dikin, lê dûvre mecala raperînê çêdibe.

Mecala raperînê çawa çêdibe? Wê demê Fransa di Vîetnamê de bû; ango Vîetnam di bin destê Fransa de bû. Wekî tê zanîn, di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de Fransa ket û Hîtler paytexta wê Parîs bi dest xwe xist. Dema Fransa ket, rêveberiya hikûmeta Fransa çû Londra û li wir welatên mêtinger ê girêdayî Fransa îdare kir. Fransa, jixwe bi dest Hîtler ket, lê leşkerên wê yên li derveyî Fransa hebûn. Ew îdare dikirin. Japonya jî ji vê îstifade kir û hema hat ket Vîetnamê. Leşkerên Fransa li hemberî vê rewşê nekarîn li ber xwe bidin. Jixwe welatê wan çûbû. Lewre şer nekirin û Fransa ji Vîetnamê derket. Sala 1944'an Japonya ket Vîetnamê. Ku bû 1945, wekî tê zanîn dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn ber bi dawiyê ve çû, Hîtler ket. Japonya

jî li aliyê Hîtler bû. Dema Japonya dît ku wê ew jî bikeve, êdî xwe kom kir. Tam di wê demê de Hoşîmîn û Gîap biryar dan ku şert û mercê raperînê pêk hatiye. Li ser vê di 15'ê Tebaxa sala 1945'an de raperîn kirin. Dema raperîn kirin, bi ser ket. Ji ber ku Japonya jî jixwe bi paş ve dikişiya. Di vê rewşê de Şoreşa Vîetnamê bi hêsanî bi ser ket û Vîetnam rizgar kirin. Welatê xwe wisa rizgar dikin, hikûmetê saz dikin û dest bi avakirina artêşê dikin. Gerîlayên wan vê carê dibe artêş. Jixwe gerîlayên wan wê çaxê hindik bûn.

Di encamê de Şerê Cîhanê yê Duyemîn diqede, hikûmeta Fransa tê, dîsa xwe li Parîsê bi cih dike. Fransa biryar digire û dibêje: "Welatên berê di bin destê min de bûn, ez ê dîsa bigirim." Di vê çarçoveyê de leşkerên Fransa cardin tên Vîetnamê. Wexta leşkerên Fransa di deryayê re tên û dikevin Vîetnamê, hikûmeta Vîetnamê ya di bin pêşengiya Hoşîmîn de li hev kom dibe û dibêjin: "Eger em niha wekî dewlet û wekî artêşeke nîzamî eniyê bigirin û şer bikin, em ê bi bin bikevin. Ji ber ku teknîka me nîn e, top nîn e, tang nîn e, teyare nîn e. Teknîka artêşa me heye, lê kêm e; artêşa Fransa jî hemû tiştên wê hene. Lewre em wekî artêş bi artêş nikarin Fransa. Em çawa bikin?" Li ser vê dibêjin: "Em yekser artêşa nîzamî belav bikin û bikin gerîla."

Tabî ev biryar cesaretê dixwaze. Kesek ku bi cesaret û bi xwe bawer nebe, nikare vê biyarê bide. Li ser vê biryar digirin û dibêjin: "Temam. Em bajaran berdin, artêşê belav bikin, bikin taxim, derxin çiyê û em li hemberî Fransa şerê gerîla bikin." Bêyî ku şer bikin bajaran berdidin. Wezîrên hikûmeta Vîetnamê çanteyên xwe radikin û derdikevin çiyê. Diçin, vê ji artêşê re jî îzah dikin û artêşê dikin taxim taxim. Ên bikêr nayin an jî hinek kesên naçin, wana ji gerîla derdixin, lê taximan derdixin çiyê. Piştî vê re Fransa tê û welat gişt digire. Jixwe Fransa bi tangan û konvoyan dikeve Vîetnamê. Hinek li pêşiya wan çalakî dikin, lê Fransa cardin jî dikeve welat.

Nexwe baweriya Hoşîmîn û Gîap pir zêde bi şerê gerîla hebû. Dizanîn ku wê şerê gerîla bi ser bikeve, lewma vê biryarê didin. Dizanîn ku bi artêşa nîzamî nikarin werga li ber xwe bidin û artêşa Fransa bisekinînin. Li ser vê bingehê şerê gerîla dimeşînin. Şerê gerîla li Vîetnamê ji dawiya sala 1945'an heya 1954'an ango 9 salan dajo. Sala 1954'an **Zafera Dîen Bîen Phû** heye. Hê jî her kesê dîroka şer dişopîne vê yekê dizane. Tabî Zafera Dîen Bîen Phû, zaferek pir girîng e. Leşkerên Fransa ji aliyê gerîlayên Vîetnamê Vîetkong ve tên tesfiyekirin. Ji leşkerên Fransa yên canê xwe xilas dikin xwe digihînin keştiyan û difilitin; ên din jî gişt di deryayê de dixeniqin, nikarin xilas bibin. Bi vî awayî gerîlayên Vîetnamê Vîetkong li hemberî Fransa bi Zafera Dîen Bîen Phû sala 1954'an serkeftina xwe îlan dikin. Ev cardin dibe zafera gerîla.

Gerîla çawa dikare li hemberî artêşên herî nîzamî, herî hatî arastin (donanımlı) û bi çek bigihe zaferê? Di vê wateyê de pratîka gerîlayên Vîetnamê ji tevahî cîhanê re dibe îlham. Heman demê wê çaxê li piraniya welatên bindest şerê gerîla esas tê girtin. Li Kuba (di navbera salên 1956-'57'an de), Laos, Kamboçya, Angola, Afrîka, Asya Dûr û li her derekê neteweyên bindest êdî fêm kirin ku rêya rizgariyê gerîla ye. Ango bi stratejiya gerîla mirov dikare li hemberî dewletên zordest, dewletên xwedan derfet, firsend û teknîk şer bike. Gerîla, ji bo gelekî bê çek, xizan û bê derfet çekek e ku pê bikaribe li hemberî artêşeke xwedan teknolojî, xwedan çek û derfet li ber xwe bide. Fêm bû ku gerîla ji bo xelkên bindest, xelkên xizan, xelkên bê derfet çeka azadiyê ye. Ango dikarin xwe pê bigihînin azadiyê. Girîngiya gerîla piştî Şoreşa Çînê, bi Zafera Dîen Bîen Phû ya sala 1954'an gerîlayên Vîetnamê Vîetkong li dijî Fransa bi dest xistin re hîn zêdetir fêm bû û bû îspatek mezin.

Dema wisa bû, ev zafera gerîlayên Vîetnamê pir li zora modernîteya kapîtalîst çû. Tabî pêwîst e mirov rola Çînê ya di gerîlatiyê de bîne ziman. Ango Çînê jê re piştevanî kir. Ev, ji bo modernîteya kapîtalîst bû wekî meseleyeke xurûrê. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn wekî parêzger û pêşengê cîhana modernîteya kapîtalîst Amerîka derket pêş. Amerîka, ji ber di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de li derveyî şer bû, welatê xwe pir zirar nedît. Aboriya xwe û hemû tiştên xwe li ser lingan bû. Lê Rûsya bi erdê re bû yek. Almanya tiştekî xwe nema. Fransa

cardin wisa bû. Londra di bin bombardimana Hîtler de tevlîhev bû, gişt xira bû. Ango sanayî li Ewropa, Rûsya li her derê xira bû, lê sanayiya Amerîka li ser lingan ma. Ji ber wê avantajê, heya niha jî derfetên Amerîka pir in.

Wekî tê zanîn di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de Sovyet bi ser ket û rojhilatê Ewropa gişt bû sosyalîst. Êdî burjûva ji cîhana komunîst pir tirsiya. Amerîkayê jî li hemberî Sovyetê xwe mezin kir û xwe kir wekî serkêşê hemû hêzên burjûva. Peyre NATO saz kirin. Ev pêvajo tê zanîn. Ji ber ku Amerîka berdana Vîetnamê hezim nekir, vê carê ew bi xwe hat. Ango Fransa hat avêtin, vê carê Amerîka hat Vîetnamê.

Amerîka ku hat Vîetnamê, tabî hinek hevkar jî çêkirin. Esas wekî ji bo parastina îxanetkarên li Vîetnamê hat Vîetnamê. Çawa ku Amerîka niha tê welatan dagir dike, bi wî awayî ket Vîetnamê. Nimûne, çawa ku Amerîka ket Iraqê, werga ket Vîetnamê jî. Ya girîng, ev bû pirsgirêkeke navnetewî. Di asta navnetewî de bû gotûbêj, bû rojev. Anîn hatin Vîetnam kirin du parçe; Vîetnama Bakur, Vîetnama Başûr. Vîetnama Bakur ji Vîetnamiyan re hiştin û yên di bin pêşengiya Hoşîmîn de bibûn desthilat, xwe li wir parastin. Vîetnama Başûr jî dan hevkarên Vîetnamî yên di bin kontrola Amerîka de. Wan Vîetnamiyên hevkar jî hikûmetek saz kirin û Amerîka ji wana re artêş çêkir. Çawa ku niha li Iraqê artêş çêkir, wekî wê artêşeke 600 hezar kes li Saygonê ava kirin û bajarê Saygonê jê re kirin navend. Amerîka bi xwe jî li wir bû. Hem ji Vîetnamiyan bi xwe artêş çêkir, hem jî Amerîka bi xwe li wir bû. Yê Başûr jî hikûmeta Vîetnamî bû, lê bindest bû, hevkar bû. Ji ber vê yên ku li Vîetnama Bakur îxanet kirin gişt hatin Vîetnama Başûr; li Başûr jî yên çepgir malên xwe bar kirin û çûn Vîetnama Bakur. Destpêkê tiştekî wisa hat jiyîn. Ango Vîetnam bû du parçe. Wekî tê zanîn niha Kore jî wisa du parçe ye. Jixwe meseleya Koreyê jî hema piştî Vîetnamê, sala 1959'an hat jiyîn. Amerîka wê çaxê ji bo kontrolê ji dest xwe winda neke, welatên wisa nîvî da aliyê xwe, nîvê din jî mecbûr ma ji yên wî welatî re bihêle.

Li Vîetnama Başûr Vîetnamiyan di sala 1961'an de dest bi propagandaya çekdarî kirin. Komikên biçûk ên 9-10 kes, ji bo propagandaya çekdarî çûn kî derê îxanetkar û sîxurên heyî girtin û di nîva gund de kuştin. Ji bo gel bibîne, cesaret bigire û bibêje, “Va ye propagandaya çekdarî heye, xayînan ceza dikin.” Werga dest pê kir. Propagandaya çekdarî werga bû gerîla. Gerîla jî her çû xwe mezin kir, xwe fireh kir.

Amerîka ji Vîetnama Bakur re got: “Vî karî hûn dikin.” Lê wana got: “Na, ev ne karê me ye; xelkên wir bi xwe dikin.” Sînor di nîvê de çêkirin. Amerîka got: “Na, hûn dikin; hûn destek dikin.” Ji ber wê, her ku gerîla li aliyê Başûr li hêzên Amerîka yan jî hevkaran dixist, Amerîka jî bi teyareyan li Vîetnama Bakur dixist. Ev balafirên bombardimanê yên B-2 yên niha heyî, vana gişt wê çaxê bi pêş xistin. Jixwe ji sala 1960'an û şûn de teknolojî pir bi pêş ket. Bombardiman ewqas zêde çêdibe ku tê gotin, li her metre kareya Vîetnamê teyareyan çiqas top lê xistine. Hem li Bakur, hem li Başûr bi tonan bombardiman çêdibe. Li Başûr saheyên gerîla ango li kî derê gerîla hebû, balafirên Amerîka lê dixist. Jixwe Bakur jî gişt dan ber xwe. Sanayiya Bakur bi temamî tune kirin ji bo ku Bakur zextê bide ser Başûr ku, Başûr şerê gerîla bisekinîne.

Wekî encam, Bakurê Vîetnamê li hemberî êrîşên hewayî li ber xwe da. Li ser Bakur êrîşên hewayî hebûn û li ser Başûr jî operasyon hebûn. Tevî leşkerên Vîetnamê milyonek û 200 hezar leşker di bin kontrola Amerîka de hebûn. 600 hezar leşker Vîetnamiyên hevkar bûn, 600 hezar jî leşkerên Amerîka bûn. Gerîlayên Vîetnamê li hemberî van hemû hêzan di Başûrê Vîetnamê de şer meşandin. Bi cewherî, sala 1954'an çawa ku Zafera Dîen Bîen Phû leşkerên Fransa bi zor û zehmet ji Vîetnamê derxist, derketina Amerîka jî wisa çêbû. Hêzên Amerîka jî gişt avêtin deryayê û bi wî awayî sala 1974'an Vîetnam azad kirin. Ev dîsa zafera gerîla bû.

Di dema derketina Serokatiyê de ev zafera Vîetnamê hîn zindî bû, di nûçeyan de tim dihat gotin. Tabî em ji vê bandor bûn. Hem Çepîtiya Tirkiyê û derketina ciwanan a 1968'an ji

Vîetnamê pir bandor bû. Ji ber ku zindî bû, her roj di nûçeyan de dihat gotin ku gerîla çawa li ber xwe dide. Hem jî Serokatî bi heman şêwazî jê bandor bû. Wê çaxê şerê gel ê demdirêj li Tirkiyê bû wekî hêviyekê ku, em jî û gelê Tirkiyê jî xwe pê rizgar bikin. Hewce nake ez pir behsê bikim, lê wê demê gelek welat bi wî rengî gihîştin serkeftinê. Nimûne, Kuba bi gerîla bi ser ket. Kuba, hîn bi lez û kurt gihîşt serkeftinê. Kubayê destpêkê bi 13 kesan dest pê kir û welat rizgar kir.

Bi wî awayî di Tirkiyê de Mahîr Çayan xwest şerê gel ê demdirêj bide destpêkirin. Ya rastî Denîz Gezmîş ji bo vê ket rê û çû Filistînê, li wir perwerde dît û vegeriya Tirkiyê. Wana jî wê şerê gel ê demdirêj bikira. Jixwe Îbrahîm Kaypakkaya li ser şerê gel ê demdirêj hem nivîsand, hem jî ji bo gerîla bimeşîne çû Dêrsimê û derket çiyê. Jixwe li wir hat girtin. Bi kurtahî Çepîtiya Tirkiyê xwest şerê gel ê demdirêj ango şerê gerîla di salên 1970'yan de li Tirkiyê tetbîq bike. Tabî em gişt jî ji vê bandor bûn. Ez ê wê dûvre bêjim. Di vir de em bên ser encamê.

Wekî encam du stratejî derketin holê: Yek, raperîn, modela Rûsya; didu, gerîla, şerê gel ê demdirêj. Ango modela Çîn û Vîetnamê. Ev her du stratejî ji bo gelên bindest û çînên bindest bûn stratejiya serkeftinê. Şoreşa Çînê şoreşa çînayetiyê ango şoreşa karker bû. Şoreşa Vîetnamê jî, ji ber gelê Vîetnamê bindest bû, ew jî şoreşa tevgera rizgariya netewî bû. Ev tê wê wateyê ku hem şoreşên tevgerên çînên tên pelixandin û bindest, hem jî şoreşên gelên bindest ên bi navê tevgera rizgariya netewî bi şêwazê gerîla dikarin bi ser bikevin. Di vê wateyê de ev wekî du şerên rewa yên li hemberî zordestî, dîktatorî, mijokdarî û dagirkeriyê derketin holê. Bi vî awayî stratejiya têkoşîna netewe û çînên bindest wekî du xetan zelal bû. Piştî gihîşt salên 1970'yan, şerê rewa ango şerê mafdar bû xwedan stratejî û taktîk. Stratejî û taktîkên wê bi vî awayî zelal bûn.

Di vê çarçoveyê de, di serdema em tê de teknîk çiqas bilind be, neteweyek çiqas zeîf be jî dikare bi derfetên xwe bi xwe wekî guloka berfê ji biçûk dest pê bike, her biçe xwe mezin bike û welat azad bike, rizgar bike. Ev rastî bi van nimûneyan berçav bû, ku yê xwe di vê xetê de kûr bike û xwe bi rêxistin bike, dikare xwe bi hêz û îrade bike. Bi vî awayî hem stratejiya raperînê, hem jî stratejiya şerê gel ê demdirêj derdikeve holê.

Der heqê şerê li hemberî desthilatdar û mijokdaran de, der heqê şerê gelên bindest û çînên bindest de jî tiştên em bêjin ev in. Stratejiyeke wisa di hundirê pratîkên têkoşîna gelan de derdikeve holê. Ev stratejî li ser du lingan e: Yek, raperîn; didu, şerê gel ê demdirêj e.

## E) Şîroveyeke Demî Li Ser Sun Tzu û Hunera Şer

Yê ku şer û hunera şer bi şêwazekî herî zelal tîne ziman, Sun Tzu ye. Sun Tzu tam ne diyar e pirtûka xwe ya bi navê "**Hunera Şer**" kengî nivîsandiye, lê tê gotin ku derdora 2200 sal berê hatiye nivîsandin. Pirtûka bi navê "Hunera Şer" roja îro li hemû dinyayê di hemû akademiyên leşkerî de pirtûka bingehîn e. Her kes dixwîne û encam jê derdixe. Di çarçoveya nêrînên Sun Tzu de ez ê bi çend xalan hunera şer, fermandarî û şer bi xwe çi ye, rave (izah) bikim.

Her şerek ji bo bi ser bikeve teqez îdeolojiyeke xwe û xeteke xwe ya baweriyê heye. Sun Tzu jî vê wisa destnîşan dike. Di dema wî de li Çînê Taozîm û felsefeya Konfîçyûs heye. Ev felsefeyeke li ser exlaqê însan e. Bi vê felsefeyê li Çînê şer bi pêş dikeve. Heta feylesofên şer çêdibin û dinivîsin.

Sun Tzu dibêje, "Ji bo mirov şerekî bi ser bixe, 5 faktor pêwîst in."

**Faktora Yekemîn:** Rê ye. Ango îdeolojî û bawerî ye. Ger xeta te li gorî gel e û gel piştevanî dike, tu dikarî şer bi ser bixî. Ev xala yekemîn e. Divê îdeolojî û baweriya te hebe, gel jî piştevanî bike.

**Faktora Duyemîn:** Fermandarî ye. Divê fermandariya te xurt be. Sun Tzu ji vê re dibêje, "lîderê şer". Fermandarê kê xurt be, ew ê bi ser bikeve. Ango di encamgirtinê de rola asta fermandariyê zêde ye. Fermandar çiqas kûrahiya xwe heye, çiqas zekî ye, ew û avahiya xwe çiqasî li hev in? Fermandar çiqasî avahiya xwe nas dike, çiqasî dijmin nas dike? Li gor vê rastiyê asta fermandar di serkeftinê de girîng e.

Nexwe yek bawerî û piştevaniya gel e. Ya duyemîn, asta fermandar e. Sun Tzu vana wekî du xalên girîng dijmêre. Ev her du xal ji bo encamê girîng in.

**Faktora Sêyemîn:** Dîsiplîn e. Divê hemû kesên leşker vê bizanin; dîsiplîn nebe, ev her du xalên me li jor jimartine nikarin tiştekê bikin. Dîsiplîn di şer de rola xwe girîng e. Hêzên dîsiplîna xwe heyî dikarin bi ser bikevin. Çi quwetê bê dîsiplîn bi ser keftî di dîrokê de nimûneya xwe nîn e. Ger hebe jî, îstisna ye.

Beriya her tiştî divê em xwe dîsiplîne bikin û quwetê xwe dîsiplîne bikin. Ger di we û quwetê we de dîsiplîn tam be, hûn ê bi ser bikevin. Dîsiplîn nebe nabe. Rêber Apo gotiye: " Cihê kêfiyet lê dest pê dike, li wir leşkerbûn diqede." Ev wisa ye. Di leşkeriyê de dîsiplîn nebe nabe. Ji bo vê divê dîsîplina me cewherî be. Dîsiplîna cewherî ne ku kes ji te re dibêje tu dikî. Na. Tu xweber bi dîsiplîn e. Zanebûnek wisa hebe ev dîsiplîna cewherî ye. 2200 sal berê Sun Tzu ev nivîsandiye. Ji bo zaferê wekî faktoreke girîng tîne ziman.

**Faktora Çaremîn:** Şertê araziyê ye. Sun Tzu dibêje: "Arazî çawa ye û çiqasî di lehê me de ye, çiqasî dest dide û musaîd e." Sun Tzu vê girîng dibîne. Ji ber ku şerê di arazî de girîng e. Pêwîst e mirov araziyê û detayên wê nas bike. Tê li araziyê binêrî, di vê araziyê de çi dibe? Kemîn dibe yan êrîş dibe? Hinek arazî hene mehkûm in, tu rastî dijmin hatî divê tu birevî. Hinek arazî hene tu birevî tê îmha bibî; divê tu nerevî. Lewre fermandarek divê arazî nas bike. Divê bizanibe li kîjan arazî wê çawa nêzî şer bibe û taktîk bi pêş bixe.

**Faktora Pêncemîn:** Rewşa avhewayê (iklim) ye. Ango demsal çiqas guncaw e ku tu şer bikî? Mesela di berfê de tu nikarî şer bikî, yan jî di germahiya zêde de tu nikarî bimeşî, biçî ser hedefê. Tê hesab bikî hewa çiqasî guncaw e. Ger tu li gorî xwe hewaya guncaw tespît bikî, wê avantaja te hebe. Ango divê wer tespît bike ku şert û mercê hewayê ji bo te pir nebe asteng, lê ji bo dijmin bibe asteng. Nimûne, niha di destê dijmin de teknolojî heye, termal hene, dema berf û baran hebe ev teknîka dijmin bêçare ye. Di vir de tê wateya ku şert û mercê wisa ji bo te erênî ye, lê ji bo dijmin neyînî ye. Wê çaxê ev rewşa hewayî ji bo çalakiyên surprîz guncaw e. Fermandar divê van hemûyan bizane.

Ger ev pênc xal guncaw bin, tê bi ser bikevî. Sun Tzu ji bo serkeftinê van faktoran girîng dibîne. Ji bo serkeftinê baweriya te hebe û gel li gel te be, asta fermandar hebe, dîsiplîn di quwetê de hebe, arazî û rewşa hewayê guncaw be tê bi ser bikevî. Faktorên serkeftinê yên Sun Tzu ev in. Em prensîbên Sun Tzu yên din jî rave bikin.

**Faktora Şeşemîn:** Wekî prensîba ji bo serkeftinê girîng, taktîk e. Mijara me niha ne taktîk e, lê ji bo prensîbên şer ên Sun Tzu bên vekirin, bi kurtî be jî em rave bikin. Sun Tzu ji xala taktîkê re dibêje, "**hîle**". Ango dek û dolab e. Divê tu bikaribî dijmin bixapînî û hîle lê bikî. Naveroka şer ev e; divê tu dijmin xafil bikî û lê bidî. Ji bo vê divê tu dijmin bixapînî. Heta Çîniyan navê pirtûka ku der heqê hunera şer de nivîsandine, kirine "Rêya Hîleyê" e. Fermandarek bi zekaya xwe çiqasî dikare dijmin bixapîne, bişemitîne û bişewitîne? Çiqas bikaribe vê bike, ewqasî bi ser dikeve. Ango taktîk, xapandina dijmin e. Bi kurtahî wisa ye.

**Faktora Heftemîn:** Tu bi dijmin re singe sing neyê hemberî hev, ku ev terzê şerê Kurd e. Sun Tzu 2200 sal berê dibêje, "divê mirov bi dijmin re neyê hemberî hev; destpêkê mirov

dijmin ji hêz bixe (yıpratma) û paşê li cihê ku dijmin hêvî nake mirov ji nişka ve lê bide." Lê şerê Kurdan çawa ye? Berê me digot, wekî beranan şer dikin. Şerê Kurd piranî wisa ye. Ev jî di prensîba şer de tune ye. Sun Tzu dibêj: "Tê singe sing bi dijmin re şer nekî. Tê dijmin xafil bikî û ji nişka ve êrîş bikî. Cih û dema dijmin hêvî nake tê êrîş bikî." Ger tu wisa bikî, tê encam bigirî; ger tu wisa nekî û tu lê bidî, wê ew jî li te bide.

**Faktora Heştemîn:** Sun Tzu dibêje: "Divê tu derfetên xwe bi îdare bi kar bînî." Ango madiyat û nirxên xwe bi îdare bi kar bîne û heta tu bikarî xwe li ser dijmin xwedî bike. Di vê xisûsê de tiştekî pir balkêş heye. Shakespeara yekî Ewropî ye, li ser wêjeyê dinivîse, lê wê çaxê şer pir zêde di rojeva însanan de ye. Lewre wî jî li ser şer çend şîrove nivîsandine. Shakespeara dibêje: "Li cihekî ger derfet zêde bin û tirsa dijmin tune be, li wir wê dejenerebûn hebe." Pir balkêş e. Binêrin, li cihekî di nava quwetê me de derfet zêde bin, li wir sistahî çêdibe û ruh diçe. Nexwe di dîrokê de jî wisa ye. Ji bo vê Sun Tzu dibêje, divê quwet bi îdare be, di mijara bikaranîna nirxan de destgirtî be, derfetên xwe bi îdare bişixulîne. Ev girîng e. Hûn li cihekî bin, divê derfetên we bi îdare bên şixulandin. Der barê Eyaleta Garzanê de sala par rapor hatin ku, derfetên jiyanê pir zêde bûne û heval pir bêserûber bi kar tînin. Me rexne kir. Ji ber ku derfetên zêde dejenerebûnê çêdike. Bêguman, divê her tiştê baş hevalên me bişixulînin, lê divê bi pîvan be. Pîvan her tim girîng e.

**Faktora Nehemîn:** Sun Tzu dibêje: "Kî bikaribe dorpêçê rast bi kar bîne û kaniya ser dijmin qut bike, wê ew bi ser bikeve." Sun Tzu wê çaxê girîngiya taktîka dorpêçê wisa aniye ziman. Taktîka dorpêçê berê jî me zanîbû, lê me herî zêde di şerê Rojava de girîngiya wê baş dît. Li Bakur, em ji berê ve li hemberî cihên derfetên xwe heyîn dorpêçê dikin û em dikarin bikin jî. Niha li Bakur gelek qereqol, rê û cih di bin dorpêça me de ne. Em dorpêça teng nakin, em dorpêça fireh dikin û encam digirin. Berê rola dorpêçê ewqasî nedihat zanîn. Hevalan li Rojava ji bo gundekî ji çeteyan rizgar bikin êrîş dikirin, çeteyan jî li wir li ber xwe didan. Çete zû bi zû nedireviyan, dibûn sedema windahiyan. Taktîka dorpêçê hat ceribandin. Me dît ku feydeya dorpêçê heye; dema çete dikevin dorpêçe zêde li ber xwe nadin û direvin. Ji ber ku alîkarî li ser wan qut dibe û ew xîret nakin zêde li ber xwe bidin. Bi yek dorpêçê 9-10 gund bi hev re tên rizgarkirin. Li şûna gund bi gund şer bikî, wisa dorpêç baştir e. Çi tişt feyde tê de hebe, ew rast e. Lewre li wir taktîka rast, dorpêç e. Tu 2-3 rojan taktîka dorpêçê dimeşînî, tu bi ser dikevî.

Di şerê Kobanê de ji bo taktîka dorpêçê bê bikaranîn pir israra me çêbû. Me got, di bajêr de hûn her şev êrîşî kolanan dikin, hûn di her êrîşekê de bi zorê kolanekê digirin. Bi vî awayî wê rizgarkirina bajêr dirêj bajo. Miştenûr bigirin, rêya Heleb û Girê Spî qut bikin, çeteyên bajêr dorpêç bikin. Hinek hevalan di bajêr de şer dikirin, hinek hevalan jî li derve şerê gerîla dikirin. Hevalan digot, quwet pêwîst e. Quwet dihat rêkirin, her quweta diçû heya wê çaxê windahiyên wan çêdibûn û quwetê digihişt cih encex diket dewsa wan. Me di vê mijarê de nîqaş kir, fermandariya Kobanê bi temkîn bû, pir zêde xeter nedidan ber çavan. Her digotin, "quwetê me kêm e. Dema em quwet ji bo dorpêçê ji mewziyan derxin wê valatî çêbibe." Herî dawî fermandariya nû çû; erka wan ew bû ku, taktîka dorpêçê teqez bi kar bînin. Heval çûn, cardin dereng ma, lê piştre dema taktîka dorpêçê ket meriyetê bajêr di çend rojan de rizgar kirin. Cardin Til-Hemîs û Sirîn bi dorpêçê hatin girtin. Ger Girê Spî nehata dorpêçkirin wisa zû nediket. Ji ber ku tunel û amadekariyên hêzên çete hebûn, sîstema wan a bin erd hebû. Bi taybetî di aliyê Kobanê de ewqasî amadekarî kiribûn ku bikaribin bi mehan şer bikin. Lê hevalan bi du baskan çûn ser, di nava 2-3 rojan de ket. Ger mirov taktîka dorpêç bişixulîne, encam digire. Lê Bakur û Rojava ne wekî hev in. Derfetên xwe cuda ne. Li kî derê kîjan taktîk encam bigire, divê mirov wê taktîkê bi kar bîne. Sun Tzu dibêje: "Kîjan teref bikaribe dorpêçê rast bi kar bîne, wê ew bi ser bikeve." Her tim dorpêç nabe. Dibêje kî rast bi kar bîne, wê ew bi ser bikeve. Rastiya Sun Tzu ev e. Tiştê di şer de nayê guhertin ev e.

**Faktora Dehemîn:** Prensîbeke Sun Tzu ya din jî heye, dibêje: "Pêwîst e fermandarê şer 5 tiştan rast bi kar bîne. Ev çi ne? Sun Tzu dibêje: "Yek, pêwîst e fermandarek bizanibe wê kengî şer bike, kengî şer neke. Ya duyemîn, pêwîst e bizanibe kengî bi paş ve bikişe, kengî

êrîş bike û çiqasî hêz pêwîst e. Ya sêyemîn, divê fermandar di nava xwe û avahiyê de hevgirtî be." Ango li hev bin. Ne li hev bin wê bi bin bikevin. Niha jî em behsa mijûlbûna avahiyê û kolektîvîzmê dikin; Sun Tzu hîn wê çaxê behsa vê dike. Sun Tzu dibêje: "Ya çaremîn, divê fermandar bizanibe kengî êrîş bike. Dema dijmin amade be, divê êrîş neke. Dijmin kengî ne amade be, wê çaxê êrîş bike." Ger tu êrîşî dijminê amade bikî, wê ew jî şer bike. Lê dema tu bibînî ku dijmin amade nîn e û xafil e, di vê rewşê de tu êrîş bikî, tê bi ser bikevî. Li Rojava heval dixwazin bi pêş de herin, dinêrin kî der biçûk e û dikarin lez bigirin, diçin wir rizgar dikin. Ev tiştek rast e. Kî der zikê nerm be tê êrîşî wir bikî, tu bi ser cihê dijwar de naçî. Divê fermandar vê bizanibe. Sun Tzu dibêje: "Ya pêncemîn, fermandar divê bi însiyatîf be." Ango divê fermandar bêçare nebe, xwedî însiyatîf be. Fermandarê zaferê divê vana bizanibe û di vana de hakim be.

**Faktora Yazdehemîn:** Pêwîst e fermandar stratejiyê û taktîkê ji hev derîne. Divê ji stratejiyê fêm bike, li gorî taktîkê quwetê xwe bi mewzî bike. Pêwîst e fermandar mewzîbûna hêz rast bike. Tê li kî derê taximê deynî, li kî derê yekîneyê deynî. Li cihê pêwîst e yekîne hebe tu taximê têxî wir, tê bi bin bikevî. Hinek eyalet hene encex taxim rabike, lê heval tabûrê bixin wir wê windahî bidin.

**Faktora Dozdehemîn:** Sun Tzu dibêje: "Pêwîst e quwet bi rêxistinî be, çalak be û perwerde kirîbe." Em jê re dibêjin, "profesyonelbûn". Ango profesyonelbûn pêwîst e. Fermandar pêwîst e quwetê xwe profesyonel bike. Ger tu dixwazî bi ser bikevî, tê quwetê xwe perwerde bikî, moral bidî û bînî asta profesyoneliyê. Bila hêza te wisa çalak be û ruhê êrîşê pê re hebe.

**Faktora Sêzdehemîn:** Tijîbûn û valabûn e. Serokatî jî di dahûrandinên xwe de pir behsa vê dike. Di mijara taktîk de mijara herî dewlemend ev e. Ger dijmin xwe amade kiriye û tijî ye, êrîş neke. Ger wî êrîş kir, tu wî li valahiyê bixe. Ger te dît dijmin ne amade ye, vala ye, êrîş bike. Vê taktîkê di aboriyê de jî dişixulînin. Çînî û Japonî van taktîkên Sun Tzu roja îro di siyaset, bazirganî û aboriyê de bi kar tînin. Heta stratejî nivîsandine û navê "hêza şûr" lê kirine. Îro di siyaset û aboriyê de ev taktîk tê bikaranîn. Taktîkên şer ên Sun Tzu formûle kirine di siyaset û aboriyê de tên bikaranîn. Sun Tzu taktîka tijîbûn û valabûnê wekî bingeha taktîkan dibîne. Ger ev nebe nabe.

**Faktora Çardehemîn:** Qabiliyeta manewrayê ye. Ne ku tenê quwet manewre bike. Sun Tzu wê çaxê dibêje, "divê fermandarek li araziyekê binêre û bizanibe çiqas dûr e." Niha teknîk bi pêş ketiye, mesafe tê pîvandin. Lê wê çaxê mesafe ango dûrahiya araziyê bi çav dihat pîvandin. Heta sedema binkeftina Napolyon ji ber vê ye. Dema Napolyon di şerê Rûsya de keşfê dike, araziyê bi çav şaş dipîve yan jî şaş texmîn dike. Ji bo vê baskê ku dixe tevgerê, saetek wext dide wan ji bo bigihin cihê xwe. Hinek bask digihin cihê xwe, hinek bask jî nagihin. Baskê destpêkê digihe û dikeve şer; heta baskê din tê û digihe wan, baskê destpêkê derbe xwariye. Yên dawiyê hatine dikevin şer, ew jî derb dixwin, wisa ev êrîş bi giştî bi ser nakeve. Ango Sun Tzu dibêje, divê fermandar bikaribe bi çav mesafeyê bipîve.

**Faktora Panzdehemîn:** Sewq-îdare ye. Li gorî şert û mercên heyî hêz sewq-îdarekirin e. Behsa sewq û îdarekirina rojane dike. Li gorî araziyê, li gorî rewş û mudaxeleya dijmin qabiliyeta kê ya sewq-îdareyê hebe, ew bi ser dikeve. Dibêje, "fermandarek pêwîst e bi nehatina dijmin bawer neke, bi tedbîrên xwe bawer bike." Ev xaleke balkêş e. Ew teoriya dibêje, "tiştek nabe, dijmin nayê" nabe. Divê tu bi tedbîrên xwe bawer bikî. Çiqas tedbîrên me hene? Fermandarê/a bibêje, "dijmin nayê", mumkûn e bi bin bikeve. Ango tu baweriya xwe bi nehatina dijmin naynî, tu bi tedbîrên xwe bawer dikî. Bi cewherî, li gorî arazî û dijmin rêvebirina hêza xwe û rewşa heyî ye.

**Faktora Şazdehemîn:** Bikaranîna araziyê ye. Ango tê araziyê çawa bi kar bînî? Araziyê hakim heye, araziyê mehkûm heye. Di araziyê hakim de tu dijmin dibînî, dizanî wê ji ku were û dikarî bi xurtî bi ser dijmin de biçî û lê bidî. Araziyê hakim vê derfetê dide te. Ji ber ku

bilind e. Araziyê mehkûm dol û deşt e. Nikare derdora xwe pir bibîne, nikare bi hêz şer bike û li ser qada şer hakimiyetê çêbike. Divê tu quwetê xwe di araziyê mehkûm de bi cih nekî. Ger tu quwet di dolê de bi cih bikî, mumkûn e ew quwet dorpêç bibe. Di vê wateyê de Sun Tzu ji hev derxistina araziyê mehkûm û hakim wekî prensîbeke girîng dibîne. Ev ji bo me jî derbasdar e. Dema heval diçin Bakur, tembîha min a dawî ji wan re ev e. Her tim ez dibêjim, di araziyê mehkûm de nemînin. 2-3 kes têkeve dolekê, tiştek bibe, dikare xwe xilas bike. Lê taximek an jî yekîneyek têkeve dolê û tiştek bibe, nikarin xwe xilas bikin. Ango divê heval xwe nexin araziyên mehkûm. Tu têkevî araziyê mehkûm, quwetê te zêde be û fedaî be jî, tê windahî bidî.

Di dîroka me ya partiyê de windahiya me ya herî giran, di sala 1994'an de li Çiyayê Reşkê hatiye jiyîn. Wê çaxê li Botanê tabûrên me yên bi liv û tevger hebûn. Quweteke taybet û yê lêdanê bû. Li kî derê pêwîstî bi lêdana dijmin hebûya, ew tabûr diçû wir. Hevalê şehîd Serdar çû Colemêrgê, tabûra Colemêrgê jî li gel wan bû. Ew tabûr jî tabûreke xurt bû, fermandarê wê hevalê şehîd Êrîş Derîk bû. Bûyera wan pir dirêj e, lê ez ê mînaka wê bi kurtasî bidim. Rojek berî bûyerê, çalakî li ser tabûra Kotranûs kirin. Roja din dijmin derket operasyonê, hevalan li pişta Colemêrgê, li çiyayê Karnasê senger girtin û şer kirin. Dibe êvar, plan dikin ku biçin Çiyayê Reşkê. Destpêkê ji quwetê Fereşînê re dibêjin, "Çiyayê Reşkê bigirin, em ê herin wir". Lê hevalên li Fereşînê dibêjin, "em nikarin Çiyayê Reşkê bigirin." Hevalê şehîd Serdar di nav şer de taximekê eyar dike ku rêbike Çiyayê Reşkê. Taximekê wekî pêşeng di pêş de dişîne, heta fermandarê taximê jî di şer de ye. Alîkarê fermandarê taximê bi ser taximê de rêdike, ji ber ku ew arazî nas dike. Wana dişîne û dibêje, "biçin Çiyayê Reşkê bigirin." Di rê de ew rezîlê dayî ser taximê direve û tenê yê rê dizane jî ew e. Hevalên din rê nizanin, nikarin biçin. Lewma tabûr ji neçarî tê araziyê mehkûm, di binya Çiyayê Reşkê de dimîne. Dijmin jî tê Çiyayê Reşkê û girên derdora hevalan digire. Heval wekî şêrên di qefesê de her carê 7-8 kes êrîşî dijmin dikin, çend heval şehîd dikevin, ên mayî vedigerin û grûbeke din diçe, li dijmin dide. Ango dibêjin, "em çiqas ji dijmin bikujin em ê bikujin", ji bo vê şer dikin. Bi vî awayî herî dawî hevalê Serdar dimîne ku fermandarê hevalê Reşît bû. Hevalê Reşît, ji ber çûbû erkekê ne li wir bû, dema fermandarê wî şehîd dikeve paşnavê xwe dike Serdar. Hevalê Serdar herî dawî bi hinek hevalên derveyî şer ên li ser girekî re bi bêtêlê diaxive û dibêje: " Hevalên me hemû bûn egîd. Me biryar daye em ê jî bibin egîd. Em nayên, em ê êrîşî dijmin bikin." Deh heval bi hev re bang dikin, sloganan davêjin û êrîşî dijmin dikin û wisa şehîd dikevin. Şehadeta wan bi vî awayî ye. 49 hevalên li Çiyayê Reşkê şehîd ketin hemû neqane bûn. Wekî gurê di qefesê de xwe lê dan, şerekî mezin kirin. Araziyê mehkûm wisa li wan kir. Ne wisa bûya, ew quwetê me yê Botanê yê herî bijare bûn. Çend heval tenê ji Çiyayê Reşkê sax man.

Min ji wan pirs kir û min got: "Çima hûn neçûn cihê hakim?"

Wan hevalan gotin: "Em 2 roj pê de di şer de bûn. Êdî hile li me nemabû."

Min destpêkê fêm nekir "hile" çi ye. "Hile", gotineke kurdî ya kevin e. Ango dibêje, taqet li me nemabû. Lewre ji çiyayê Karnasê digihin binya Çiyayê Reşkê. Di fermandariyê de hakimiyeta araziyê heye. Quwet rêdike Çiyayê Reşkê, lê yê araziyê dizane direve. Ji bo wê taximek din rê dike, ew jî nagihin wir. Jixwe yên sax mabûn, ew bûn. Fermandarê wan hevalan Mervan Sûrûç bû; wî got, "hila me nemabû." Ger ev hêz li araziyeke hakim bûya, dikarî bi rojan şer bike û windahî nede. Lê ew araziyê mehkûm bû sedem ku wan hevalan hemû şehîd bikevin. Araziyê hakim û mehkûm wisa ferqa xwe heye û ferqa xwe zehf e. Divê mirov ferqa wê bizanibe.

**Faktora Hevdehemîn:** Sun Tzu behsa îstixbaratê û girîngiya îstixbaratê dike. Her wiha rola agahiyê û îstixbaratê vedibêje. Ev rol îro pir zêde bi pêş ketiye. Di şer de rola îstixbaratê heye. Fermandarek girîngî nede îstixbaratê, nikare plansaziya baş çêbike, nikare dijmin fêm bike û nas bike. Mirov çawa dijmin dişopîne? Mirov bi îstixbaratê dijmin dişopîne. Îstixbarat çi ye? Îstixbarat bi rêya casûsan dibe. Bi rêya hinek kes an jî dostên ku di nav dijmin de dibe.

Bi rêya çavderiyê dibe, bi rêya guhdarkirinê dibe, bi rêya agahiya ji gel û rêxistinan tê girtin, dibe. Û bi rêya şopandin û keşfê dibe. Fermandarek, pêwîst e ji bo wan hemû tiştan hişyar be, bikaribe tim îstixbaratê zelal bike ku, bikaribe plansaziyên rast û temam çêbike. Ev jî xaleke girîng e.

**Faktora Hejdehemîn:** Li ser hêz e. Di hêz de xwestek çiqas heye, cesaret çiqas heye, cidiyet, hevgirtin çiqas heye? Coş, moral û psîkolojî çiqas xurt e? Asta qabiliyetê çi ye? Ev jî di berfirehiya pisporbûnê de tê destgirtin, lê ne wekhev e. Di wê derê de meqsed ast e, di vir de meqsed cesaret e, xwestek e. Xwestek ji bo mirov girîng e. Mirov heqîqeteke sosyolojîk a kûr e ku, tiştê tu bi xwestek bikî, tu dikarî afirîner bibî, lê tiştên ku tu ne bi xwestek bikî tu bixwazî jî, tu nikarî afirîner bibî. Niha yek yekî mecbûr bike û bibêje, tu ji vir here ser vî girî û rêya wê saetek be; ger ew kes bi xwestek be, bawer bike ku ew ne talîmateke bê wate ye, lazim e here wî girî, ger neçe wê rewş xirab bibe; ne saetekê, weleh wê di 40 deqeyan de here. Bi mirov re wisa çêdibe. Tu li cihekî bi xwestek bî, bi te re hêz çêdibe, lê bê xwestek bî, hêz çênabe. Ev mijareke psîkolojîk e. Psîkolojî ev e. Ango divê fermandarek psîkolojiya mirov fêm bike. Lê tu bi avahiyê xwe re xwestekê çênekî û bêjî, "talîmat e, hûn ê herin", fermandarî wisa nabe. Fermandar, bi talîmat kar bike, nabe. Tê xwestekê çêbikî.

Wekî mînak, ger di çalakiyekê de xwestek tune be, mirov nikare di wê çalakiyê de bi ser bikeve. Min bi xwe wisa kiriye. Hevalên berê bi min re mane pir dîtine. Ez bi vê bawer dikim; di şer de ez êrîşê girîng dibînim. Pêwîst e mirov êrîş bike. Kesê ku êrîş bike avantajên xwe zêde ne. Di parastinê de encex tu xwe biparêzî, lê yê êrîş bike pê re heyecanek heye. Dijmin li ber wê/wî biçûk dibe, dikare bi ser bikeve. Êrîş avantaja xwe heye. Lê êrîş bi xwestek be dibe. Min bi xwe ew dîtiye, min kiriye. Wekî mînak, gelek caran di koordînekirina şer de min didît ku baskeke êrîşê bê xwestek e. Min digot, vegerin, werin. Wana digot, na, em herin heval. Ya, tu bêxwestekî, vegere heval, tu nikarî bi ser bikevî. Tabî yêdekên me hebûn, me yêdek dixistin şûnê, yan jî me çalakî betal dikir. Quweteke bêxwestek nikare êrîşê bi ser bixe. Min bi xwe tu caran wisa nekiriye. Ger quwet nexwestiye here, min çûyîn ferz nekiriye û negotiye, "na, here heval", min nedîtiye. Cem min wisa çênebûye. Hinek caran min dîtiye hinek hevalan gotine, "me talîmat da û got, êrîş bike; êrîş nekiriye." Ji bo vê lêpirsîn çêkirine, platform çêkirine û nêzîkatiyên hwd. raber kirine. Min bi xwe tiştê wer nedîtiye. Min nedîtiye ku min gotiye "here", ew jî neçûye. Berevajî dema min dîtiye bêdil e, min gotiye vegerin, werin . Wisa bûye.

Quwetê bêxwestek nikare bi ser bikeve. Ji bo serkeftinê xwestek pêwîst e. Di vê tu ji dil bî. Ger tu bêdilê xwe bî, weleh tê hincetekê bibînî, tê rêya xwe jî şaş bikî, bi her awayî sistî wê bi te re çêbibe û bi ser nakevî. Meseleyek hebû, me heya niha zêde nekir mijara nîqaşê, ji ber ku tiştekî veşartî bû. Di dilê me de lidarxistina çalakiya Oremarê hebû. Ev jî hedefek bû. Ez bi xwe yekser ne tê de bûm, lê berpirsyar bûm, ji kêmaniyên tê de çêbûn berpirsyara min jî heye. Mesela, însanê ku 3 mehan li heman cihî di gir de ye, tu jê re dibêjî "xwe berde, pêşde here"; hedef li pêşber e, rexmê wê, rê şaş dike. Min bi xwe jê pirsî, wî jî got, "3 meh in ez li gir im, ez dibînim, dişopînim, ez ê bi ser bixim." Baş e wê çaxê. Lê çûye xwe şaş kiriye, yê din nizanim çi çawa kiriye! Çima? Xwestek nîn e. Ruh nîn e. Ew amadekariyek pir mezin bû. Ger ew çalakî pêk bihata dibe ku niha rewş cuda bûya. Pêk nehat, betal bû. Dema betal bû, jixwe dawiya payîzê bû, ket zivistanê, berf e, baran e û hwd. me jî plana wê betal kir. Hemû amadekarî vala çûn. Wê çaxê ev di dilê me de ma. Me got em vê biharê vê çalakiyê bikin. Min rêveberiya teng kom kir û got: "Bila her kes çekên xwe li wir binerd bike, quwet jî belav nebe, yên Cîlo li wir bisekinin, ên Avaşînê li vir bisekinin, 10'ê meha Adarê em ê herin vê çalakiyê misoger pêk bînin." Alay e, alayekî leşkeran e. Yan em ê hemûyan îmha bikin an jî sax bigirin. Tiştekî wisa bû. Lê dûvre Serokatiyê pêvajoya agirbestê da destpêkirin. Welhasil em bi temamî vala derketin. Bu bihar, berf êdî ber helandinê bû, me ji hevalan re got "zû herin, wan cebilxaneyan bînin." Çek zehf bûn, hema hema li derdora 20 doçkayan bûn, çekên giran bûn. Hemû li wir kirin nav naylonan, li wir veşartin, di bin berfê de man. Îcar hevalan çûn derxistin anîn, ew amadekariyên me hemû vala çûn. Ev mijareke

rexnedanê ye. Divê mirov bi ser bixe. Hinceta xwe nîn e. Pir heval li wir hebûn, hemû jî bûn şahid. Bêdilî bû sedem.

Fermandar naskirin girîng e. Yanî hev naskirin, avahiya xwe naskirin. Mesela min wê çaxê got ku, "li vê derê fermandarê tabûrê ku hûn herî zêde pê bawer dikin, kî ye? Em wî bidin filan derê." Ji min re çi gotin? Gotin, "Filan kes e". Ê baş e, tamam e. Cihê wî jixwe cihekî girîng bû, nehat guhertin. Lê ew fermandarê herî sexte derket. Yên çalakî sabote kirin 2-3 kes bûn. Ê herî sextekar ew fermandar derket. Me got, bila kesê herî zêde hûn pê bawer dikin be. Ji ber ku ez dizanim ew der noqteya herî girîng e, tecrûbeyên me hinekî hene. Min bi xwe nikarîbû tam bikevim nav. Jixwe ji ber ez tam neketim nav ez poşman bûm; wê çaxê çima min bi xwe hemû kar nekirin? Ez dihatim, hevalan digotin "em herin wê çaxê". Werga bû. Yek jî, wê çaxê ez hîn di KCK'ê de erkdar bûm. Lê ez êdî hatibûm vir. Ji ber ku min dît rewş cidî ye, min karê KCK'ê berda. Gerîla tune be, KCK nikare hebe. Ji bo vê em hatin vir (HPG). Ez di KCK'ê de bi awayek fermî erkdar bûm, min vî karî dabû hinek hevalan. Me got, hûn daxuyaniyê binivisîn, em ê biçin Herêmên Parastina Medya. Welhasil wê çaxê em vala derketin. Çima? Di wir de fermandarê asta jor fermandarê qedemeya navîn nas nake, vesazkirin nerast e, vesazkirin şaş e. Yek jî bêxwestekî heye. Bêxwestekbûn nebûya wisa nedibû. Çalakiyek ewqas mezin vala derket, çû. Bû zivistan, em vala derketin. Ev quralek e.

Binêrin; 2200 sal berê jî hatiye gotin; ji bo çalakiyek bi ser bikeve xwestek pêwîst e, cesaret pêwîst e. Di wir de cesaret tune bû, fermandar newêre here û dibêje, min rêya xwe şaş kiriye. Em dibêjin "vegere", nizane vegere jî. Em dibêjin zû vegere, were; ew dibêje em nikarin, heya em nizanim çi bikin, filan û bêhvan. Dibêje, "em nizanin em li ku derê ne!" Ango di quwet de xwestek girîng e. Berê jî min got; cesaret hinekî ji baweriyê jî tê. Lê tu fermandarek bî û bixwazî bi ser bikevî, divê quweta te moralê xwe hebe, divê tu cesaretê tê de çêbikî, bi wê re dîsiplînê çêbikî, bi wê re xwestekê pêş bixî. Bi wan re van tiştan çêbike ku tu bikaribî bi ser bikevî. Wana nebin, tu bi ser nakevî û nikarî bi ser bikevî. Rêya serkeftinê wisa ye.

**Faktora Nozdehemîn:** Dizîbûn e, ango sir e. Sira te tune be, dizîbûna te tune be weleh tu nikarî tiştekê bikî. Mirov lazim e du tiştan dayne herî jor; dîsiplîn û dizîbûn. Ji bo gerîla ev her du ango dizîbûn û dîsiplîn ruhê zaferê ne. Bêguman tu bi dîsiplîn nebî, dizîbûna te jî çênabe. Dîsiplîn dîsa ya sereke ye. Min dîsiplîn bi awayekî dirêj rave kir. Mirov dikare bibêje dizîbûn pir girîng e. Sira te hebe ango dizîbûna te hebe, tu veşartî dibî. Niha em li vir ne dizî bin, ev balafira keşfê ya digere wê me tespît bike, bêguman wê balafirên şer werin, li me bixin. Ev wisa ye. Ha tu xwe ji ber wê veşêrî, tu bi saetan li vir bimînî, ev ne tirs e, ev tedbîr e, pisporbûn e. Tê bi tedbîr bî, xwe raber nekî. Wisa pêwîst e. Qurala nozdehemîn jî wisa ye. Hinek tiştên din jî hene.

Dizîbûn ji bo hemû artêşan derbas dibe. Hevalekî di fermandariya YPG'ê de carekê got, "em êdî tevgerîna paqijkirinê (süpürme hareketi) dikin, dizîbûn nabe". Min wê demê jî got dizîbûn ne tenê ji bo komikên biçûk e, ne tenê ji bo gerîla derbas dibe, dizîbûn ji bo artêşên mezin ên bi sed hezaran jî derbas dibe. Wê çaxê quwetê YPG bibû 2-3 hezar kes, hinekî teknîk jî di destê wan de hebû. Dibêje "dizîbûn êdî ji bo me nabe, em neçar in tevgera paqijkirinê bikin. Ya, tu diçî, dijmin dizane tê werî! Ew jî xwe amade dike. Ji ber ku dijmin te dibîne. Tu konvoyê bi rê dixî. 100-150 erebe ji Qamişlo bi rê dikevin, diçin. Dibêje, ez ê herim Til-Berakê. Di rê de dibe ku 10 zilamên dijmin hebin, hema yek telefon bike û bibêje, ber bi we ve operasyon tê, amadekarî bikin! Tê çawa herî li wir encamek xurt bigirî? Tê herî li wir windahiyan bidî. Dizîbûn lazim e. Dijmin bixapîne. Konvoy di rê de diçe, dûvre konvoyek din jî di aliyê din re bişîne. Ango di aliyê berevajî de bi şev veşartî here, ger pêwîst kir bi meşê here. Ku tu zaferê dixwazî, tu aşiqê zaferê yî, tê bi meş herî. Tê xwe biwestînî. Ji bo dizîbûnê ger pêwîst bike tu qet naçî avê jî. Ger pêwîst kir tu dikî herî ser kaniyê, eşkere neçe. Ku tu dixwazî dizî bimînî, biçî zaferê divê tu dijmin xafil bigirî. Tu dijmin xafil negirî, tu nikarî zaferê pêk bînî. Tu û dijmin wisa werin hemberî hev û li hev bixin! Ma ev dibe zafer? Tu dikî herî ser dijmin li dijmin bixî, 10 kesên ji dijmin bikujî, tu jî 5 şehîdan bidî, ev ne zafer e. Ev

zafera Pirus e. Zafer ew e ku, tu herî ser dijmin, 20 dijmin bikujî, lê tu bi xwe qet windahiyan nedî, yan jî pir kêm windahî bidî. Wisa dibe. Ji bo vê dizîbûn lazim e. Dizîbûn nebe, nabe. Ger dijmin neyê şaşkirin, dijmin xafil neyê girtin zafer çênabe. Ji bo vê xala dizîbûnê dibe ku di rêza nozdehemîn de be, lê esas e. Yek ji nav quralên sereke jî, dizîbûn e.

**Faktora Bîstemîn:** Sun Tzu dibêje, "Di şer de bikaranîna şewatê girîng e." Lê niha ne tenê şewat bi pêş ketiye; êdî em jê re dibêjin "sabotaj" û saheya xwe pir fireh bûye. Sabotaj, suîqest riyên ango rêbazên me îzah kirine. Ango wisa teknîk bi kar anîn, sabotaj bi kar anîn di şer de faktorek bingehîn e. Wê çaxê jî hebû, lê wê çaxê tenê şewat bû. Niha ev xal berfireh bûye. Sabotaj saheyeke fireh e. Heta çeteyên DAÎŞ'ê piranî çalakiyên xwe bi sabotajê dikin. Tu jî neçarî vê bikî, ji ber ku tu li dijî wan î. Divê tu li hemberî sabotajê tedbîr bigirî, tu jî sabotajê bi kar bînî. Sabotaj di roja îro de taktîkek pir girîng e.

**Faktora Dawî ya Bîst û Yekemîn:** Psîkolojiya civakê ye. Şert û mercê siyasî divê ji bo serkeftinê musaîd be. Sun Tzu di destpêkê de got, desteka civakê pêwîst e, a niha jî dibêje divê psîkolojiya civakê jî guncaw be. Divê tu şert û mercên fizîkî yên heyî yên civakê ji bo zaferê musaîd bikî. Nexwe civak cardin rola xwe heye. Psîkolojiya civakê divê ji zaferê re musaîd bibe. Tenê bi piştevaniyê nabe. Mirov dikare vê xalê fireh bike, îro di rojeva me de ye. Tenê ne çepik, divê tevlîbûn jî hebe. Ango pêwîst e tevlîbûna civakê hebe, bi awayek çalak beşdarbûn hebe û ji zaferê re musaîd be. Xala bîst û yekemîn ev e ku psîkolojiya civakê, rewşa civakê û sekina civakê ji zaferê re vekirî be. Ango niha em şoreşa gel dikin. Şoreşa gel bi temamî li ser milê gel pêk tê. Lê Sun Tzu behsa şoreşa gel nake; behsa du artêşên nîzamî yên li hemberî hev şer dikin dibêje. Lewma ev xalên gel eleqedar dikin ji bo me esas in. Ger nebe nabe. Divê gel beşdar bibe, piştevaniyê bike û bi rastî psîkolojiya xwe, xwesteka xwe hebe ku heta şoreş bi ser bikeve. Ev nebe jixwe şoreş bi ser nakeve. Roja îro di gelê Kurdistanê de ev xwestek û psîkolojî heye. Lê divê pêşeng erka xwe pêk bîne. Vê daxwaza gel bifetilîne şoreşa gel.

Esas Sun Tzu di pirtûka xwe de wisa xal bi xal ne hejmartiye. Ev şîroveya me ye. Lê van têgînan Sun Tzu hîn wê çaxê aniye ziman. Em wan têgînan ji bo roja îro jî pir girîng dibînin. Me hinekî wisa rêz kir. Sun Tzu li cihekî 5 xalan dihejmêre, li cihekî din dîsa 5 xalan dihejmêre. Bi giştî pirtûka wî ji 13 beşan pêk tê. Di orjînala xwe de wisa ye. Lê em wisa giştî ku komî hev bikin; yê ku şer, hunera şer, taktîk û fermandariyê di hundirê hev de bi awayek herî baş îzah dike, ev çarçove ye. Ji bo vê me şîroveyeke wisa girîng dît. Em ji bo vê şîroveya Sun Tzu wisa komkirî pêşkêşî we dikin. Di vir de huner çi ye? Fermandar çi ye? Taktîk divê çawa bê destgirtin? Hemû tê de hene. Li ser vê heval kûr bibin wê baş bibe. Yanî em tecrûbeyên 2200 sal berê û yên îro bi vî awayî dikin yek.

Ya rastî me vana hinekî din fireh kirine, ev ji bo me girîng in. Girîngiya xwe ev e; ev tişt ne tenê me gotine, vana heqîqet in. Binêrin, heqîqetên ku 2200 sal berê hatine gotin îro jî em li ser wan heqîqetan dimeşin û pratîka me piştrast dike. Yek jî, dinya hemû li ser heman prensîban radiweste, xwe perwerde dike. Nexwe ev mijareke girîng e. Divê em roja îro jî jê sûd bigirin, em bikaribin di şer de hosta bin û şer bi şêwazekî profesyonel bimeşînin.

## F) Heya Roja Îro Cureyên Şer ên Bi Pêş Ketine

Şêwazê meşandina şer di dîrokê de ji aliyekî ve jî li gorî amûran bi pêş ketiye. Amûrên şer an jî teknîk pir zêde li ser şêwazê şer bandor dikin. Her ku amûrên nû bi pêş dikevin, şer jî li gorî wê xwe diguhere. Yanî stratejî û taktîka xwe li gorî wê diyar dike. Li gel wê, hinek prensîbên şer ên berî 2000 salan hebûn, niha jî derbasdar in. Hinek prensîbên şer hene mayînde ne, lê li gorî civak û amûrên şer jî diguhere.

Şer, ji bo armancên polîtîk tê kirin. Teref li hemberî hev şer dimeşînin, ji bo îradeya terefê din bişkînin. Dema îradeyê dişkîne, yan teslîm digire yan jî dide revandin. Şer armanca xwe ev e ku, îradeya yê hemberî xwe bişkîne. Nimûne, di 24'ê Tîrmehê de rejîma AKP'ê li hemberî me şer îlan kir, êrîşa hewayî da destpêkirin. Heman demê di qada civakî de jî li ser taxan girtina sivîlan dan destpêkirin. Ev êrîşek e û şerek e. Dijmin ev sê meh in bi Serokatiyê re hevdîtinê dike, ji bo bi Serokatiyê gav bi paş de bide avêtin; ji ber Serokatî xwediyê îradeyek mezin e nekarî vê bi ser bixe. Lewre ji bo navenda partiyê belav bikin, ciwanan bigirin, îradeya me lawaz bikin û bi vî awayî li ser Serokatiyê encam bigirin di dîroka komara Tirkiyê de êrîşa herî mezin a hewayî bi ser me de anîn. Ev şerê îradeyê ye. Ji bo em bêjin em dest ji xweseriyê û azadiya Serokatiyê berdidin vî şerî dikin. Dixwazin em gav bi paş de bavêjin. Ev şerê îradeyê ye. Dixwazin me teslîm bigirin. Dixwazin em beton berdin ser çekan. Vî şerî ji bo îradeya me bişkînin, dimeşînin.

Şer, di dîroka xwe de her xwestiye îradeya yê hemberî xwe bişkîne. Em jî dixwazin îradeya wan a desthilatê bişkînin. Em dixwazin îradeya faşîst û înkarker bişkînin. Wê çaxê şer şerê îradeyê ye. Şer ev e. Di hundirê dîrokê de jî wisa bûye. Welatek diçe ji bo welatek din bi xwe ve girê bide, bac bigire û leşkerên wan ji bo xwe bigire, şer dike. Milê din jî li ber xwe dide ku têk neçe. Dîroka şer vê tîne ziman. Nexwe şer, şerê îradeyê ye.

Şer ji amûran pir bandor dibe. Wexta şûr şer tiştek e, wexta çekê bi barût derdikeve şer tiştekî din e. Wexta barût hat dîtin û şerê çekên konvansiyonel bi pêş ketin, şer cuda ye. Şerê niha li ser bingehê pêşveçûna telekomunîkasyonê tê meşandin tiştekî din e. Di vê wateyê de pêşveçûna teknolojiyê pir zêde şer bandor dike, ango taktîkê şer diguhere. Şer hinek prensîbên xwe yên mayînde hene, nayên guhertin -em ê dûvre li ser wan bisekinin-, lê pir tiştê xwe tê guhertin. Di şer de di warê taktîk de tiştê tê guhertin heye, tiştê nayê guhertin heye. Niha şer cuda bûye ango hinek tişt derketine pêş. Di serdema em tê de pir nav lê dikin û dibêjin, dinya global bûye. Bûyer çêdibe, bi rêya înternetê di heman rojê de li her derê dinyayê belav dibe. Vana hemûyan adeta dinya biçûk kirine û globalîzm bi pêş xistine, îrtibat û ragihandin xurt bûye. 15-20 sal berê ev tune bûn an jî hebûn, lê hîn di jiyana civakan de bandor çênekiribûn. Vana hemû berhemên niha ne. Van tiştan jiyana civakê guhert. Di warê çand û têkiliyên civakî, siyasî û aborî de gelek guhertin çêkir. Heman demê di şer de jî guhertin çêkir.

Di şer de di hundirê dîrokê de rola teknîkê her tim girîng bûye. Ango amûrên di şer de tên bikaranîn tim giringiya xwe hene. Dema ji tîr-kevan û şûr derbasî çekê bi barût bûn wekî ku di şer de serdem hat guhertin. Ew welatên Ewropa yên di şer de barût bi kar anîn, pê çûn Latîn Amerîka û Afrîka kirin kole. Ew welat li hemberî çekên bi barût şaş bûn, însanên Afrîka kirin kole. 40 kes diçin, bi 100'an însanan êsîr digirin, dikin kole. Diçin Latîn Amerîka xwe bi cih dikin, Çermesoran dikujin û diqewitînin. Însanên serdest ên ku hêrsa wan a karê kapîtalîzmê bi pêş ketîn, adeta piştî barûtê dinya xistin destê xwe. Vê yekê di qedera şer de guhertineke mezin çêkir. Çekên hewayî û yên giran jî guhertineke mezin di şer de çêkirin, ku ji vana re dibêjin çekên konvansiyonel. Vana tang, top û balafirên şer in. Vana ji 1940'î şûn de pir hatin bipêşxistin. Di şerê cîhanê yê yekemîn de kêm e, di şerê cîhanê yê duyemîn de balafir û tang li pêş e.

Dema elektro-teknîk bi pêş dikeve zanista kompîturê jî bi pêş dikeve. Ev di şer de guhertineke bingehîn çêdike. Niha balafira keşfê digere, koordînatekê keşif dike, hema pê re balafirên şer tên li heman koordînatê didin. Ev pêşveçûneke pir mezin e. Ev tiştekî nû ye. Ev berê tune bû. Berê balafiran li hemberî me pir şer dikirin. Di salên 1994'an de her roj 4-5 saetan balafir li ser me dişixulîn, lê kêm caran îsabet dikir. Îsabeta xwe ne xurt bû. Sîstema kompîtur û koordînatê asta îsabetê anî ji sedî 80-90. Ev di şer de pir guhertinê çêdike. Di sedsala 21'an de teknolojî di şer de pir ket pêş. Nirxê însan nakeve, lê di însan de jî hinek guhertin çêbûn. Ez ê li ser vê jî bisekinim. Di sedsala 21'an de teknîk ket pêş. Di şerê dema nû de teknîk li pêş e, ne wekî 30-40 sal berê ye. Her çûye teknîk ketiye pêş. Telekomunîkasyonê çawa ku di jiyana însanan de guhertin çêkir, di şer de jî guhertin çêkir.

Amerîka niha tevlî şerê Iraq û Sûriyê dibe, lê çi leşkerê xwe neşandiye. Bi balafiran tevlî şer dibe. Ew bi xwe li Pentagon e, li wî aliyê dinyayê ye, lê li ser kompîturê balafirên xwe yên şer ên li ser Iraq û Sûriyê îdare dike. Yê şer îdare dike li Amerîka ye. Teknîk bi wî awayî di şer de rol dilîze. Yek ev e; teknîk di şer de ketiye pêş. Di dîrokên kevin de jî bandora teknîkê heye; dema hesin tê dîtin, dikin pola û di şer de bi kar tînin. Hêzên ev çekên ji pola di destê wana de, di şer de xwedî avantaj in. Di dîrokê de jî wisa ye, niha jî wisa ye. Sîstema termal û balafirên keşfê niha di şer de rola xwe zêde ye. **Yek** ev e; ango di şer de rola teknîkê heye.

**Ya duyemîn;** îstixbarat girîng e. Sun Tzu jî di pirtûka xwe de behsa îstixbaratê dike. Nexwe îstixbarat her tim girîng e. Lê niha mecala îstixbaratê pir berfireh bûye. Berê ji bo îstixbaratê diviya te sîxur bixista nav dijmin, an jî kesekî te di nav dijmin de bûya. Berê bi rêya kevokan ji hevdû re têbinî (not) rêkirine, an jî bi meşê agahî birine. Berê derfetên îstixbaratê kêm bûn, lê niha derfeta wê zêde ye. Bi telefonekê tu dikarî xwe bigihînî her derê dinyayê. Îstixbarata herî mezin çi ye? Balafirên keşfê ye. Îstixbaratê kom dike. Li kî derê tevgerîn hebe, dibîne. Ango mecala îstixbaratê pir heye. Berê yek ji bo bibe sîxur diviyabû biçûya qereqolê, niha ne pêwîst e. Dikare telefon bike.

Ango derfeta îstixbaratê zêde ye. Guhdarkirina bi rêya telefon û înternetê heye. Vana kaniya îstixbaratê ya herî mezin in. Îstixbarata niha ji sedî heftê (%70) guhdarkirine. Niha di şer de du tişt derketine pêş: **Yek,** teknîk e; **ya duyemîn jî**, îstixbarat e. Berê rola wan ewqasî mezin nebû.

**Ya sêyemîn;** xisûseke din a di şer de rola xwe derketiye pêş çi ye? Berê hejmara însan di şer de girîng bû. Berê hejmara artêşekê çiqas mezin bûya, pir zêde rola vê hebû. Wê demê jî rola pisporiyê hebû, lê îro pir zêde bûye û ev rol heta roja me jî didome. Ev 4-5 salên dawî hîn bêhtir diyar bû ku di şer de ne hejmar, profesyonelbûn girîng e. Leşkerê/a pispor û profesyonel rola xwe mezin bûye. Di dîrokê de jî ev heye. Mînak, samûray in. Samuray leşkerên pispor, profesyonel in û hejmara xwe kêm in. Ji ber ku tên perwerdekirin. Li Ewropa jî şovalye hene. Ew jî şerker in û hatine perwerdekirin. Li Kurdistanê jî egîd hene. Yek kes bi tena xwe dikare çend kesan. Vana bi bingeh û bi perwerdeyê çêdibin. Di destana Derwêşê Evdî de 12 kes diçin li hemberî 1700 suwariyan şer bikin. Nexwe bawer kirine ku dikarin 1700 suwariyan bi bin bixin. Ew bawer dikin ku 12 kesên di şer de pispor dikarin bi hezaran kesan. Heta ew suwariyên ji 1700 kesan pêk tên ditirsin ku Derwêşê Evdî wan bi bin bixe, lewre komplo dikin, Derwêş dikşînin araziyeke ku hesp nikare tê de bimeşe. Ger vana ne perwerdekirîbûna nikarîbûn li hemberî hezaran bisekinin. Di vê serdemê de însanên pispor ji egîdan wêdetir rola xwe hene. Leşkeriya vê serdemê divê tam profesyonel be.

Di vê demê de me ji nû ve avakirin xistiye rojeva xwe. Ev tenê ne rojeva me ye. Di rojeva hemû artêşên cîhanê de ji nû ve avakirin heye. Ji ber ku hemû dixwazin leşkerên xwe bigihînin asta profesyoneliyê. Ji ber ku her diçe teknîka nû derdikeve. Heya xwe nû dikin tiştekî nû derdikeve. Ji bo hemû artêşan şopandina teknolojiyê û pirsgirêka jinûve avakirinê her di rojevê de ye. Her diçe rola însanê dikare bi awayek profesyonel şer bike zêde dibe. Mesela 38 hezar leşkerên bi çek nikarîbûn li hemberî 800 DAÎŞ'iyan bisekinin û Mûsil teslîm kirin. Rexmê teknîka dewletê hebû û leşkerên xwe xwedî derfet bû, nikarîbûn. Ji ber ku DAÎŞ li gorî wan profesyoneltir bû. Profesyonelbûn çi ye? Hêjabûn e, li ser hemû tiştî hakimbûn e.

Di şer de ji bo profesyonelbûnê du tişt hene: Yek; bawerî ango îdeolojî ye. Ya duyemîn; hakimiyeta li ser taktîk û teknîkê ye. Profesyonelbûn tenê fêrbûna teknîkê nîn e. Lingekî xwe jî îdeolojî û bawerî ye. Li hemberî DAÎŞ'ê dewleta Iraqê, Sûriyê, Artêşa Azad û pêşmergeyan nikarîbûn şer bikin. Vana amator in, DAÎŞ jî profesyonel e. Tenê PKK'ê dikarîbû DAÎŞ'ê bisekinîne. Di vê serdemê de leşkerê profesyonel pêwîst e. Wekî HPG hewldan û legerînên me yên profesyonelbûnê hene, hinek jî hewldanên me yên pêşxistina teknîkê heye. Tê zanîn ku hîmê baweriya me ji felsefeya Rêber Apo tê û îdeolojiya me xurt e. Rola taximeke gerîla berdêla 200-300 kesan e. Çima? Ji ber ku lingê îdeolojiyê heye, heval bi perwerdeya leşkerî

û tecrûbeya me ya heyî xwe amade dikin. Em nebêjin di teknîkê û taktîkê de çar bi çar in, lê bi van hewldanan cihê ku artêşa bi hezaran kes reviyayî, çend taximên gerîla diçe, wir rizgar dike. Her kes dizane ku ev meseleya performansê ye. Ev heqîqet li Kerkukê, li Mexmûrê û li Şengalê di qada şer de eşkere bû.

Amerîka biryar daye hejmara leşkerên xwe kêm bike. Ji bo profesyonel be wê mesref lê bike û perwerde bike. Tirkiye nû ket ferqa vê. Ew jî behsa ji nû ve avakirinê dikin, lê nikarin. Çima? Bi vê zîhniyeta xwe nikarin. Heta ew bi 27000 leşkeran ve parastina Çelê bikin, ew nikarin nûbûnê di leşkeriya xwe de çêbikin û profesyonelbûnê bi pêş bixin. Ji ber ku nifûsa Çelê 9000 kes e. Heta ku zîhniyeta Çelê bi artêşa Tirk re hebe nikare profesyonel bibe. Newêrin Çelê vala bikin. Lewre biryar dane ku vê hejmara leşkeran bihêlin, cuda jî leşkerên bi pere yên kiregirtî û demdirêj saz bikin. Leşkerên bi pere yên demdirêj wê çi qasî bi ser bikeve nexuya ye. Di sala 2012’an de nikarîbûn tiştekê bikin, ez bawer nakim dûvre jî bikaribin tiştekî bikin. Em naxwazin dijminê xwe biçûk bibînin. Lê bi mûçeyan leşkerên xwe zêde bikin jî, ez bawer nakim bi ser bikevin. Ji ber her ku lingê bawerî û îdeolojiyê teng û lawaz dibe, vana jî her mûçe zêde dikin. Kesê ji bo maliyetê were ji bo nemire her tiştî dike. Lewre em bawer nakin rol bilîzin. Jixwe di sala 2012’an de jî me dît, nikarin rol bilîzin.

Di vê serdemê de tiştên di şer de derketine pêş ev in; teknîk, îstixbarat û profesyonelbûn. Tirkiye jî dixwaze vana bide pêş. Her artêş ji bo nûjeniyê vana dide pêş. Divê em jî vê yekê bizanin û li gorî derfetên xwe hakimiyeta xwe ya li ser teknîkê bi pêş bixin, di profesyonelbûnê de xwe xurt bikin û derfetên xwe yên îstixbaratê nedin dest dijmin. Ji bo me însan girîng e. Em ji cewherê însan bawer dikin. Însan dikare afirîner be û rola xwe bilîze. Ji bo me ya esas însan e. Teknîka heyî jî berhema afirîneriya însan e. Em teknîkê nakin pêşiya însan. Baweriya me wisa ye.

Divê em li ser însan bisekinin, perwerdeya leşkerî û îdeolojîk mezin bikin. Em çeka destê xwe baş bi kar bînin. Teknîk hemû ne balafir e. Em teknîka di destê xwe de baş bişixulînin, îstixbarata dijmin vala derbixin û li hemberî wî îstixbarata xwe bi pêş bixin. Li hemberî amûrên ku dijmin dişixulîne em tedbîr bigirin û amûrên di destê xwe de baş bişixulînin. Kîjan hêz teknîka dijmin vala derbixe û ya xwe rast bi kar bîne, îstixbarata dijmin vala derbixe, ew bi xwe îstixbarat bigire û xwe bike profesyonel wê ew hêz bi ser bikeve. Wekî HPG û YJA-Star divê em li ser vê bisekinin, di hêza xwe de dîsiplînê û dizîbûna kûr bidin rûniştandin. Her hevalek divê îstixbaratê nede dijmin û teknîka di destê xwe de baş bi kar bîne. Ger nêzîkatiyek wisa bê raberkirin tu tişt nikare li hemberî me bibe asteng û kelem.

## 1- Şerê Taybet û Şerê Psîkolojîk

Şer tenê bi çekan nayê kirin. Dema hêzek dixwaze îradeya hêzên li hemberî xwe bişkîne, divê di hemû waran de biçe ser û sîstema yên hemberî xwe xira bike. Ji bo wê jî teref hewl didin ku sîstema dijminê xwe ji hemû milan ve xira bikin. Wekî sîstema aborî, ya perwerdehî, ya tenduristî, ya civakî dixwazin xira bikin. Bi taybetî dixwazin psîkolojiya civakê xira bikin û tirsê çêbikin. Ji bo lojîstîka artêşê bê xerakirin û tunekirin van nêzîkatiyan li ser artêşê jî pir bi kar tînin. Ji bo cebilxaneya artêşê bê tunekirin û ya herî girîng ji bo psîkolojiya artêşê bê xerakirin şer bi cur bi cur şêwazan tê meşandin û di nava wan de şerê psîkolojîk cihekî xwe yê girîng heye.

Di serdema burjûva de artêş tenê bi şerê asayî re rû bi rû neman, vana gişt pir zêde hatin bipêşxistin. Li dijî şerê neteweyan, şerê bindestan ê mafdar, wekî şerekî cuda şerê taybet bi pêş xistin. Tabî em ê paşê behsê bikin, lê şerên mafdar jî wekî gerîla, serhildan û cur bi cur taktîk bi pêş xistin. Bi taybetî hegemonyaya sermayedar, di roja me de ji bo armancên xwe yên emperyal hewce nabîne hêzên xwe yên fermî bişîne hemû deveran. Lewre şerê taybet didin pêş. Dîroka şerê taybet kevn e, tenê ne ya niha ye. Encex modernîteya kapîtalîst şerê

taybet sîstematîze kir, piştî sala 1900'an hîn zêde xist rojevê û bi damezrandina NATO'yê re jixwe hêza Gladîo ya NATO'yê saz kir. Li şûna ku bi hêzên xwe yên fermî biçe her derekê, ji bo bi Gladîo bikaribe li wir tevlîheviyê çêbike, derbeyê lê bide, mudaxeleya siyasî, aborî û civakî bike şerê taybet meşand. Ango bêy ku hêzên xwe yên leşkerî bişîne, armancên xwe li wir pêk tîne. Vê yekê bi sermayeyê dike, bi çalakiyên Gladîo yên kontr-gerîla dike.

Nimûne, li cihên gerîla lê heyî tevgerên paramîlîter ên kontr-gerîla bi pêş dixe. Hat dîtin ku li Latîn Amerîka li dijî tevgera gerîla çiqas tevgerên kontr-gerîla bi pêş xist; li Laos, Kamboçya çiqas kontr-gerîla bi pêş xist; li Afrîka Unîta çawa çêbû û çi rol pê hat lîstandin tê zanîn. Vana gişt wisa bûn. Ango li dijî şoreşan, li dijî şerên mafdar şerê taybet bi şêwazên cur bi cur hat firehkirin û hat tetbîqkirin. Bi taybetî Gladîoyê tesfiyekirina tevgeran, berevajîkirin û reşkirina wan pir bi pêş xist. Hele hele ku medya bi pêş ket, di şerê taybet de şerê psîkolojîk bû wekî beşeke bingehîn.

Şerê psîkolojîk çi ye? Şerê psîkolojîk, li hemberî hêza hatî hedefkirin bi her awayî propaganda kirine. Ango mijareke biçûk mezin dikin û berevajî dikin, reklamê wê dikin. Şerê psîkolojîk bi esasî li ser derewan tê meşandin. Di şerê ku Amerîka li dijî tevgerên Latîn Amerîka bi pêş xistî de, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn Amerîka formûlasyonekê çêdike û dibêje: "20 derew bikevin ser hev, dibe rastiyek." 20 derew = 1 rastî. Ango tu 20 derewan bikî, bi qasî rastiyekê bandor dike. Wê çaxê makîneya derewan hilberîne! Bêje û her bêje! Her 20 derew, bi qasî rastiyekê bike, wê çaxê bi milyonan derewan bêje ku ewqas rastî çêbibin. Felsefeya şerê psîkolojîk ev e; tiştekî biçûk bigire û mezin bike. Bi vî awayî hêzên modernîteya kapîtalîst bi rastî li gelek welatan şoreş tesfiye kirin. Heta şoreşên pêk hatin ji binî ve hilweşandin.

Mirov dikare bibêje, modernîteya kapîtalîst ji bo hegemonyaya xwe ya cîhanî niha giraniya xwe pir zêde daye ser şerê taybet. Di şerê taybet de, bi taybetî van 20 salên dawiyê ku înternet di jiyana mirov de bi pêş ket û telekomînîkasyon pir zêde belav bû û şûn de, şerê psîkolojîk pir zêde dan pêş. Dagirkeriya li ser Kurdistanê ji vê yekê pir îstifade dike. Bi taybetî van salên dawiyê li dijî tevgera me, li dijî Şoreşa Azadiya Kurdistanê şerê psîkolojîk di çi astê de dimeşîne, tê zanîn. Hewce nîn e ez bikevim van xalan û mînakên rojane bidim. Ev mijar pir berfireh e. Hele hele di van demên dawiyê de AKP'ê pir zêde giraniya xwe daye medyayê. Çiqas kanalên wan ên televîzyonê, rojname û malperên wan ê înternetê hene gişt ji bo me bikin hedef, dişixulînin. Ev bi rêya fîlman e, rêzefîlman e, panelan e, civînan e, nûçeyan e, bi her rê û rêbazî em hedef in. Dagirkerî werga li ser me şerekî psîkolojîk dimeşîne.

Wekî min berî niha jî anî ziman, tiştekî neyî wekî heyî raber dike yan jî tiştek heye û biçûk e, wê mezin dike. Dibêjin ya, ji nîskekê gîskekê çêdikin! Eynî wisa dikin. Tiştekî biçûk mezin dikin, deh qat dikin, bîst qat zêde dikin û dixwazin werga wê bikin malê civakê.

Esas pêşketina kapîtalîzmê çanda kapîtalîzmê bi pêş dixe, ezeziyê û egoîzmê bi pêş dixe. Jixwe ev bi xwe şerekî taybet e. Serokatî ji bo vê dibêje: *"**3 S**"*. Ev çi ne? Yek, bi rêya sanatê ango bi rêya hunerê dixwaze civakan razîne, civakan bêbandor bike. Didu, bi rêya sporê civakan serxweş dike, wisa dike ku însan dev ji karê xwe berde û li pey sporê, li pey taximan bikeve. Sisê, bi rêya seksê dixwaze însan dejenere bibe, birize û di nav bêexlaqiyê de biherike, ji heqîqeta xwe û hebûna xwe dûr bikeve, dûv meseleyên esasî nekeve, nikaribe li meseleyên esasî bifikire. Bi vî awayî şerê taybet armanc dike ku civakê bixe. Xistina civakê ango jirêderxistina civakê armanca bingehîn a şerê taybet e. Ji ber ku civaka ji rê derketî nikare li doza xwe xwedî derkeve û têkoşîna mafê xwe bide, nikare li dûv heqîqetan bigere. Ew encex rojana dûv xerîzeyên xwe û hobiyên xwe bikeve. Ev şerê taybet e. Der barê hunerê de; mesela zehf kes hene, tu hew dibînî radibe kêrê li xwe dixe. Çi bi çandê dibe, çi bi sporê dibe, çi jî bi seksê dibe sîstem dixwaze însanan bêhiş bike.

Ya girîng, sîstem şerê taybet bi her şêwazî li dijî civakan, li hemberî tevgeran bi kar tîne. Nimûne, ji bo dejenerekirina mirovan eroîn û esrarê pir zêde bi kar tîne. Hele hele li Kurdistanê, niha ev pir zêde tê bikaranîn. Nimûne, li Rojavayê Kurdistanê berê qet tiştekî welê tune bû. Qasî ez dizanim berî vê 20 salan li Kurdistanê gişt tune bû, lê li Rojava qet tiştekî wekî eroîn û esrarê tune bû. Heta mirov şaş dima ku çima li gişt deran heye, lê li wir tune ye. Niha tê gotin ku mirov ji eroînê nikare gav bavêje, di wê astê de belav kirine. Wexta li hemberî me îtifaq hebû MÎT, Mûxaberat û Îtlaetê ango îstixbaratên Îran, Tirkiyê û Sûriyê bi hev re ji bo ciwanên Kurd ji şoreşê dûr bixin û tevlî PKK'ê nebin, ev karên qirêj belav kirine. Ji bo van karên qirêj bi hev re plan çêkirine û di nava ciwanên Kurd de taybet belav kirine. Ne ku ji bo yên tevlî PKK'ê bûyîn pir cefa raber bikin, pir mesref bikin û tesfiye bikin; hîn beriya tevlî PKK'ê bibe dixwazin wana tesfiye bikin. Vê yekê bi çi dikin? An tîner e, yan eroîn e, yan esrar e, yan jî dejenerekirin û seks e. Ango dixwazin ciwanên Kurd bi tiştên wisa ve girê bidin, werga wana ji heqîqeta wan dûr bixin ku ciwanên Kurd nikaribin bibin îradeyek an jî bibin gerîlayek û şoreşgerek.

Di vê çarçoveyê de, bi taybetî van her sê dewletan li Kurdistanê hemû karên qirêj bi pêş xistine. Ev tişt berê li Rojava tune bû, lê di van 10-15 salên dawî de pir zêde hatiye bipêşxistin. Heval dibêjin, "li Kobanê malek heye yê ku fuhûş anî Kobanê ev malbat e. Yên eroînê tînin ev in. Her cure dejenerekirinê ev dikin. Ji ber ku ev ne malek e, derdorek e. Gişt van karan dikin. Ji ber dev ji van karên xwe bernadin, divê em wana ji wir derbixin." Hevalan werga çare dîtin. Ev, bi zanebûn ji aliyê îstixbaratên dewletan ve hatine erkdarkirin. Li Bakur jî rewş wisa ye.

Li Rojhilatê Kurdistanê ev pir zêde ye. Li Rojhilat ji bo ku ciwan tevlî PJAK û YRK'ê nebin niha her şêwaz tê bikaranîn. Esas di sîstema Îranê de yek bi eroînê re mijûl bibe îdam dikin, lê li Kurdistanê bi taybet dest nadin însanên ku eroînê bi kar tînin ango yên eroînê vedixwin û belav dikin. Rexmê ew bi xwe wek bawerî pir li dijî eroînê ne, li Kurdistanê ewqas madeyên bêhişkirinê belav kirine. Ev wisa ye.

Vana gişt babetên şerê taybet in. Îro modernîteya kapîtalîst ji bo desthilatdariya xwe bidomîne, ji bo dagirkeriya xwe bide jiyîn pir zêde li ser şerê taybet kûr bûye. Modernîteya kapîtalîst destpêkê şerê taybet li hemberî gelên bindest û tevgerên azadîxwaz meşand, ji bo têkbirina wan bi pêş xist. Wekî min berî niha diyar kir, hem li ser esasê pir zêde pêşveçûna medya û teknolojiyê, hem jî ji ber modernîte di qrîzê de ye, ji bo her qrîza xwe bide jibîrkirin -ku her qrîzekê bi civakan dide kişandin, zirarê dide civakan- û civak li dijî sîstemê nerabe, berê xwe bide tiştên din şerê taybet pir zêde bi pêş xistine. Ev di çapê cîhanê de wisa ye.

Modernîteya kapîtalîst hîn bêhtir li ser welatên wekî me bindest ên hewl didin bi zindî têkoşînê bimeşînin û tevgerên wan heyîn, disekine. Bi taybetî dewleta Tirkiyê, ji ber ku bi NATO'yê re dixebite ji tevahî tecrûbeyên Gladîo yên li hemû aliyên cîhanê îstifade dike, ji wana sûd digire, di gelek cihan de bi hev re dixebitin ango tevî Gladîoya NATO'yê xebatên wana hene. Ji ber wê, şerê taybet niha li hemberî me herî zêde li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bi berfirehî tê bikaranîn.

Belkî em vana hîs nekin, lê ji bo ku li ber bayê ji hev bikeve, ji bo yekîtî çênebe, civak ranebe, civak li dijî dewleta Tirkiyê ranebe her şêwazê şerê taybet bi kar tîne. Bi xebatên îstixbaratê, bi xebatên çapemeniyê, bi xebatên di bin navên cur bi cur tiştan de hewl dide xwe bigihîne civakê û şerê taybet bi pêş bixe.

Berê li hemû welatên NATO'yê baskê Gladîo hatin sazkirin, lê ji ber karên ne rewa meşandin piştre li hinek welatên Ewropa Gladîoyên navxwe belav kirin. Lê li Tirkiyê karên xwe berdewam dikin. Gladîo girêdayî daîreya şerê taybet kar dike. Bi taybetî li hemberî muxalîfan, niha jî li hemberî tevgera me bi şêwazên cur bi cur operasyonên leşkerî jî bi pêş dixin. Operasyonên wan ên leşkerî bi du cureyan in: Ya yekemîn; dixwaze derbeyê li tevgerê bixe, li derveyî welat û di hundirê welat de suîqestan bike. Hîn di destpêkê de hevalê Hakî

Karer ji aliyê Gladîoyê ve bi komployê hat şehîdkirin. Piştre li hemberî Serokatiyê di 6'ê Gulana '96'an de bi maşîneyeke bombebarkirî xwestin suîqest bikin. Heta niha gelek caran li dijî me çalakî kirine. Herî dawiyê Komkujiya Parîsê ya li hemberî hevala Sara, Rojbîn û Ronahî jî beşek ji xebata Gladîoyê bû. Ango ji destpêkê heta niha Gladîoyê girêdayî daîreya şerê taybet li dijî me cur bi cur operasyon û suîqest li dar xistine. Dema di tevgera me de civakbûn bi pêş ket, ji sala 1990'î şûn de Daîreya Şerê Taybet hem JÎTEM birêxistin kir, hem jî Hizbûlah birêxistin kir û bi rêya wan bi hezaran cînayetên kujerê wan nediyar li hemberî me û gelê me pêk anîn. Li gorî belgeyên saziyên mafê mirovan, dewleta Tirk 17528 bûyerên kujer nediyar çêkirine. Ya rastî di bingeh de yê vana bi rê ve dibe Daîreya Şerê Taybet e.

Ya duyemîn jî, çalakiyên provokasyonê ne. Ango ne bi navê xwe, bi navê rêxistinên din çalakiyên leşkerî dikin. Ji bo berteka civakê ava bikin, an ji bo wêneyê dixwazin çêbibe, yan jî ji bo mudaxeleyî cihekî bikin çalakiyên wisa dikin. Ev tişt di Tirkiyê de pir navdar e. Heta niha pir bûyer û suîqestên kesên navdar dûvre diyar bûye ku yan Gladîo kiriye, yan jî pêçiya Gladîoyê tê de heye. Jixwe hinek zelal bûne û eşkere bûne.

Bi kurtahî pir bûyer, şewat û kuştin bi destê vê daîreyê dibe, lê xwedî dernakevin, wekî bûyerên kiryar nediyar dimînin. Ên vê xebatê dimeşînin tîmên dewleta kûr in. Jixwe saziya wekî dewleta kûr tê binavkirin Daîreya Şerê Taybet û artêşê bi rê ve dibe. Dewleta ku bi rêya Daîreya Şerê Taybet operasyonên veşartî dike, bi rêya artêşê mudaxeleyên eşkere dike.

Bi kurtahî şerê taybet li kêleka hêzên dewletê yên fermî, hemû derfetên dewletê li hemberî şoreşê xistiye dewrê. Ji bo tevgerê lawaz bike hem xebatên îdeolojîk, siyasî û propagandayî dimeşîne, hem jî xebatên provokatîf û leşkerî dimeşîne.

Bi taybetî li Kurdistanê dewletên dagirker destpêkê polîtîkaya laîk dimeşandin, ango laîsîzm esas digirtin. Mesela, li Tirkiyê Kemalîzm hebû, li Sûriyê Baas hebû, li Iraqê Baas hebû û vana laîk bûn. Heta beriya şoreşa Îslamî li Îranê jî Şah Riza Pehlewî hebû. Wî jî sîstemek laîk dimeşand. Ango destpêkê wexta Kurdistan hat bindestkirin, dagirkeriyê zêdetir bi felsefeya netewe-dewletê dixwest neteweya me ji netewebûnê derbixe û siyaseta qirkirina fizîkî û çandî bi pêş bixe.

Dema ev siyaset bi ser nekeft, gelê Kurd nehat helandin û tunekirin, niha dagirkerî hinekî wekî reng biguhere, bêhtir ol dide pêş. Bala xwe bidinê, niha li Rojhilat dagirkerî ol bi kar tîne. Ango tê ji Kurdan re dibêje, "Em Îslam in; PKK filan bêhvan e." Ev bi salane li Tirkiyê jî wisa ye. Bi taybet ji Cuntaya 12'ê Îlonê û vir ve Tirkiye ji bo pêşî li tevgera azadiya Kurdistanê bigire vî şêwazî dimeşîne. Tenê ne netewe-dewlet vê dimeşîne. Felsefeya netewe-dewletê heye, li kêleka wê ol jî bi kar tîne, felsefeya ol jî dimeşîne. Va ye niha desthilata Iraqê jî êdî yên Îslamî ne. Yê Sûriyê jî dixwazin heman desthilata olî bi pêş bixin.

Yek jî, tiştekî wisa bi pêş dikeve: Eger rejîma wan Îslamê bi kar bîne, ev çi bandorê li me dike? Em ne li dijî Îslamê ne, lê belê biratiya Îslamê bi şêwazekî li hemberî me bi kar tînin û Îslamê jî dikin amûrekî şerê taybet. Va ye em li dijî vê ne. Pêwîst e em bizanin ku şerê taybet niha li dijî me di asta herî jor de bi berfirehî û bi her şêwazî tê meşandin. Çi derfetên dagirkeriyê hene, van hemû derfetan bi kar tînin. Ji hemû tecrûbeyên NATO'yê îstifade dikin û îro li hemberî me, li kêleka şerê qirkirina fizîkî û çandî, şerê taybet wisa kûr dikin û bi pêş dixin.

## 2- Di Serdema Nû De Meşandina Şerê Psîkolojîk

Di şerê nû de gelek rêbazên cuda derketine holê. Ji ber ku çapemenî û ragihandin pir bi pêş ket şer guherî. Berê jî şerê taybet hebû, lê niha berfireh bû. Hêz niha li hemberî hev bi awayekî çors şer nakin, bi riyên din şer dikin. Rûsya û Amerîka êdî bi awayekî çors li hemberî hev şer nakin, bi rêbazên zirav û riyên cuda şer dikin. Şerê taybet niha hîn zêde li

pêş e. Rêbazên cur bi cur bi kar tînin. Şerê çapemeniyê heye. Tu zaferê jî bigirî çapemenî nade. Divê tu çapemenî û ragihandinê bizanî. Lewre hêzeke şer divê bizanibe propaganda jî bike. Niha her kes bûye makîneya derewan. Tirkiye di nav dewletan de bûye şampiyonê derewan. Derewkarî li Tirkiyê di pêş de ye. Ma ne Kurdistana ku welatekî ewqas mezin û qedîm e, înkar dikin û dibêjin, “tune ye”. Hemû tiştên xwe li ser derewan ava kirine. Dijminekî wisa li hemberî me ye ger em çapemeniyê baş bi kar neynin, nabe. Divê em alternatîfa xwe çêbikin. Her yekîneyek divê kameraya xwe hebe, çalakiya xwe piştrast bike. Hêza pispor divê çapemeniyê rast bi kar bîne. Ger tu bi nivîskî yan jî bi devkî bibêjî, dikarin berevajî bikin. Lê di dîtbarî (görsel) de tu bi belge bikî nayê înkarkirin, ev dibe îspat. Divê mirov vana bide pêş. Di şerê nû de ragihandin û çapemenî li pêş e.

Bi giştî şerê taybet li pêş e, lê di hundirê şerê taybet de şerê psîkolojîk, şerê Daîreya Şer a Taybet heye. Şerê psîkolojîk çi ye? Şerê psîkolojîk propaganda ye. Şerê psîkolojîk ê dewleta Tirk makîneya derewan e. Li ser însanên li hemberî xwe bandor dike. Yê dijberê xwe biçûk dike û propaganda li ser dimeşîne. Raber dike ku tu nafilitî, tê tune bibî, tu nikarî bi hebûn bî. Bi vî şerê psîkolojîk dixwazin bandora xwe serdest bikin. Dixwazin li ser civakê jî, li ser kadro jî şerê psîkolojîk bimeşînin. Ma ne dixwazin îradeyê bişkînin. Ji bo yek bi yek îradeya însanan bişkînin şerê psîkolojîk dimeşînin. Ji bo îradeya me bişkînin dixwazin me yek bi yek bikujin, bêbiryar bikin û têxin teredûtê. Pêşxistina teredûtê beşek ji şerê psîkolojîk e. Şerê psîkolojîk wisa tê meşandin.

Nexwe şer hemû tenê şerê çors nîn e. Şerê taybet, şerê ragihandinê, şerê psîkolojîk vana hemû hene. Wekî gerîla tê li hemberî vana çawa bikî? Ji bo fermandar jî ev derbasdar e. Pir fermandar yekîneya xwe ji şerê psîkolojîk re vekirî dihêlin. Yekîne diçe gundan, li ser bandor çêdibe, çapemeniyê guhdar dike bandor çêdibe. Lê fermandar bi xwe tiştekî nake. Ma ne dijmin bi psîkolojîk êrîş dike; tu çi dikî? Tedbîra fermandaran li hemberî şerê psîkolojîk nîn e. Tedbîra giştî heye, îdeolojiya Rêber Apo heye, bawermendiya hevalan heye. Her fermandarek ji bo şerê psîkolojîk vala derbixe, heqîqeta şoreşê û rojane pêşveçûnên çêdibin di radyoyê de dişopîne. Pêşveçûn şopandin heman demê ji bo taktîk jî girîng e. Jixwe bêtêlên me hene, radyoyê me hene û derfetên me jî hene. Divê fermandar bi van derfetan tim di nav quwetê xwe de civîn û nîqaşan bi pêş bixe ku, heqîqeta şoreşê bi avahiya xwe bide fêmkirin. Lê gelek fermandar vê yekê nakin û avahiya xwe ji êrîşên psîkolojîk ên dijmin re vekirî dihêlin. Ev, wekî avahiya xwe li girekî bêmewzî bihêle, heman tişt e. Pêwîst e fermandarek di avahiya xwe de beriya her tiştî îdeolojîkbûnê bi pêş bixe. Divê her tim avahiya xwe perwerde bike, sekna siyasî pê bide qezençkirin, perspektîf bide avahiya xwe ku ji êrîşên dijmin bandor nebe. Li hemberî êrîşa dijmin a kûr ku di warê psîkolojîk pêk tîne divê têkoşînê bimeşîne.

Nexwe şerê psîkolojîk heye; li hemberî şerê psîkolojîk têkoşîna heqîqeta şoreşê heye. Ev jî bi perwerdeya îdeolojîk û agahiyên pêşveçûn û heqîqeta şoreşê re tê dayîn. Nexwe şer di hundir de jî pêwîst e.

### 3- Şerê Sanal û Şerê Sîber

Yek cureyê şer ku bi teknolojiya pêşketî re ketiye rojeva me, şerê sanal (şerê xeyalî) e. Şerê sîber an jî sanal cureyekî şer ê nû ye. Şerê sîber jî beşek ji şerê sanal e. Vana şerên nû ne. Yên min li jor rêz kirin jî nû ne, lê berê bingehê xwe hebûn. Şerê sanal bi temamî nû derketiye. Em jî dixwazin di şerê salan de bi pêş bikevin. Ev şer bi giştî hevalan nayê kirin. Encex bi kesên zane û di vê mijarê de pispor ango yên ji teknîka kompîturê fêm dikin ve dibe. Cîhan niha diçe ser kompîtur û înternetê. Tu şerê sanal hem di şerê sîber de bi kar tînî, hem jî di propaganda û ragihandinê de bi kar tînî. Mesela giştî înternet û telekomunîkasyon bi kar anîn, agahî belav kirin û weşandin vana hemû şerê sanal in. Şerê salan; bikaranîna hemû amûrên telekomunîkasyon e, bikaranîna malperên civakî û medyaya civakî ne. Di nav

şerê sanal de şerê sîber heye. Şerê sîber çi ye? Sîstema dewletan niha diçe ser kompîturê. Banka li ser sîstema kompîturê ye. Trenên lez diçin li ser kompîturê ne. Balafir li ser sîstema kompîturê ye. Her tişt diçe ser kompîtur. Heçku jiyan diçe ser kompîturê.

Şerê sîber çawa ye? Tu li ser sîstema kompîturê hakimiyeta xwe çêdikî. Kesên ji wana re "Hacker" tê gotin dikevin bernameya wan, tren û balafiran şaş dikin, tevlîhev dikin. Sîstema dewletê tevlîhev dikin. Ev şerê sîber e. Ya din sîstema banka ye. Tu dikarî têkevî sîstema bankayê, bi rihetî pereyên kesekî bidî ser navê kesekî din. Ger tu vê zehf bikî tu dikarî sîstema wan a aboriyê tevlîhev bikî û rawestînî. Ev şerê sîber e û sîstemê felç dike.

Xisûsa din, em bi rêya malperên înternetan xebat û propagandayê dimeşînin. Cur bi cur malperên me hene. Malpera me ya HPG jî heye. Em rojane bi awayekî fermî agahiyê didin malpera xwe. Carina dijmin li ser malpera me êrîş dike, dixwaze malpera me bi bin bixe. Em jî parastina wê çêdikin. Ger em xurt bin em jî dikarin êrîşî malperên wan bikin. Ev şerê sîber e. Ew li hemberî me dikin, em jî li hemberî wan bikin. Ger em hoste bin em dikarin malperên xwe biparêzin. Ev şerê cîhana nû ye. Gelek hevalên me jê fêm nakin û wate nadinê. Ev jî şerek e. Ger li hemberî te cureyekî şer tê kirin, divê tu valatiyê nedî, tu jî têkoşîn bikî. Ev şer îro li hemberî me tê meşandin, divê em jî bikaribin bersiv bidin. Ev şer bi temamî pisporiyê dixwaze. 14 sal in em hewl didin di vê mijarê de kûrahiyekê çêbikin. Di vê çarçoveyê de karê me yê teknîkî di gelek waran de encamên xwe hene, berhem ava kirine. Lê di vê mijarê de em hîn negihîştine asta ku me hedef kiriye. Ango hevalên me hîn nikarin şerê sîber wekî tê xwestin tam bimeşînin. Şerkerên me yên şerê sîber dimeşînin hîn negihîştine asta ku tê xwestin. Heval şev û roj dixebitin, zane ne jî. Lê ev ne karê zanebûnê ye. Ev meraq û eleqedariyê dixwaze. Divê xweber eleqe nîşan bidin. Ciwanên wisa hene. Em hewl didin ciwanên wisa bigihînin, lê dijmin jî li ser radiweste. Heta dijmin ji wan hinek girtin. Ji ber ku wana dikarin têkevin sîstema dijmin. Dikevin sîstema artêşê û di wir de çi heye tune ye dikarin agahiyan derbixin. Dikarin şîfreyên agahiyên wan ên veşartî bişkînin û agahî bigirin. Divê mirov vî şerî bizanibe. Lê ev kar ji aliyê kesên pispor û meraqa xwe heyî ve dikare bê meşandin. Kesê wisa divê bingeha xwe hebe. Yên ji vî karî fêm dikin dikarin vî karî bimeşînin. Lê Hacker zû dernakeve, bi temamî meseleyeke meraqê ye û mijûlbûneke pir kûr dixwaze. Mînak, formulek heye; divê tu bi saetan pê re mijûl bibî heta tu jê re çareyekê bibînî. Ev şerê sîber e. Wekî beşê şerê sanal şerê sîber jî wisa ye.

### 4- Şerê Asîmetrîk

Cureyekî şer ê ku wekî têgîn tê behskirin û bi taybetî ji bo me tê şixulandin, şerê asîmetrîk e. Sîmetrî wateya xwe sîstem e, sererastî ye û nîzam e. Asîmetrîk tê wateya bê nîzamiyê. Şerê asîmetrîk bê nîzamiyê çêdike. Hinekî dikeve beşa şerê psîkolojîk. Ango ne di cephê de ye, dikeve nav û bê nîzam şer dimeşîne. Di rastiyê de dijmin ji gerîla re dibêje şerê asîmetrîk. Şerê gerîla şerê bênîzam e. Lewre gerîla jî dixin vê kategoriyê. Di nava civakê de yan jî di nav dewletekê de bênîzamiyê çêdike, sîstema wan tevlîhev dike. Asîmetrîk, pêşxistina vî şerî ye. Lingekî wê leşkeriya pratîkî ye, lingê din di hundir de propaganda ye. Ji şêwazê şerê ku di hundir de propagandayê bi pêş dixe û sîstema yê hember tevlîhev dike, xera dike re şerê asîmetrîk tê gotin. Dijmin gerîla jî dixe wê kategoriyê; ji ber ku gerîla şerê bênîzam e, ne artêşeke nîzamî ye. Di rastiyê de hinekî wekî gotina dijmin e. Di hundirê xwe de sîstema xwe û nîzama xwe heye, lê şer bi nîzamî nameşîne. Li gorî wan divê şer di du cepheyan de be, ew li cepheyekê bin, em li cepheyekê bin. Lê belê gerîla xwe dixe nav û dikare di her derekê re derbikeve. Ev têgîna asîmetrîk têgîna hêzên hegomon e, ne têgîna me ye. Ango dibêjin me nîzam çêkiriye, ew nîzama me xera dikin. Tê gotin ku şerê asîmetrîk serê însanan tevlîhev dike, propaganda dike, bi 2-3 kesan şer dike û sîstema şer xira dike. Bi gotina "asîmetrîk" behsa xerakirina sîstemê dikin. Ji vê re dibêjin şerê asîmetrîk.

## 5- Şerê Sar

Şerê sar (soğuk savaş), bêyî ku teref li hemberî hev çek bi kar bînin, li hemberî hev meşandina reşkirin û propagandaya her cureyî ye. Berê şerê sar hebû, niha dewsa şerê sar şêwazên şerê me li jor gotine hemû çêbûne. Sovyet û NATO'yê li hemberî hev şer nedikirin, li dijî hev propaganda dikirin, hevdû teşhîr dikirin, her wiha piştevaniya hêzên li dijî hev dikirin û ji vê re digotin "şerê sar". Serokekî Başûr hebû, ez naxwazim navê wî bibêjim; rojnamegerek şerê sar jê dipirse, ew jî dibêje "erê di şerê sar de berf dihat heta singa me." Ew fêm dike ku şerê sar şerê zivistanê ye. Lê şerê sar ne ji sermayê ye; şerê sar li dijî hev propaganda û teşhîr e. Lê bi pratîkî li hemberî hev şer nakin. Bi rêya ragihandin, sîxur û piştevanî dayîna hêzên li dijî hev şerê sar tê kirin.

Ya rastî şerê sar ne ku qediyaye. Roja îro şerê sar hîn zêde bi rêbazên zirav, berfireh û dewlemend tê meşandin. Jixwe mirov dikare bibêje ku roja îro şerê sar fetiliye şerê cîhanê yê sêyemîn. Li Rojhilata Navîn niha şerek heye. Her çendî li ser Rojhilata Navîn be jî, esas şerekî cîhanî ye. Mînak, niha li Sûriyê hemû hêzên navnetewî li ser dikê ne û her kes bi şêwazekî beşdarî şerê li ser axa Sûriyê dibe. Di eşkereyî de kes ne li dijî kesî ye, lê di heqîqetê de hemû li dijî hev di şer de ne. Ev şer jî ne wekî berê teref li hemberî hev cephe digirin û bi awayek eşkere bi çekan li hev didin. Ne wisa ye. Her kes dixwaze Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên wan bê dîzaynkirin. Ji bo vê her kes di nava hewldaneke cidî de ye û her aliyek ji bo berjewendiyên xwe pêk bîne bi hinek hêzan re yan piştevanî dike, yan jî îtifaqê çêdike. Niha li Sûrî bi vî şêwazî şerekî cîhanî heye û ev terefên şer, ger pêwîst bike bi hev re diaxivin. Ango şer berfireh bûye, şêwazê xwe pir dewlemend bûye. Şerekî îdeolojîk e, siyasî ye, dîplomatîk e, çandî ye û bi berjewendî ye. Ji bo hêzên navnetewî wisa ye. Hêzên herêmî jî heman demê aliyê xwe yê mezhebî heye, aliyê xwe yê nijadperestî heye. Bi kurtahî roja îro şerê sar heye. Dibe ku jê re şerê sar nayê gotin û dibêjin qonaxa şerê sar bihurî ye, lê şerê sar şûna xwe ji şerekî hîn berfireh re hiştiye. Şerê cîhanê yê sêyemîn bi şêwazên cur bi cur îro berdewam dike.

Mirov dikare bibêje heman demê ev berdewama şerê sar an jî reng guhertina şerê sar e. Di vî şerî de bi taybet aliyên dîplomatîk, teknîk û aboriyê li pêş in. Hêzên aboriya xwe xurt, teknîka xwe heyî û dîplomasiya xwe xurt hîn zêdetir dikare giraniya xwe têxe û li ser dikê bi însiyatîf tevbigere. Şerê niha dibe şerekî wisa. Bi giştî wekî şerekî psîkolojîk û taybet tê meşandin. Bi kurtahî di serdema nû de pêşveçûna teknolojiyê û pêşketina zanebûnê di hemû waran de guhertin çêkirine. Vê yekê di şer de jî guhertin çêkiriye. Şerê nû û modern di van tiştan de li pêş e.

## 6- Pêşketina Şerê Hewayî

Wekî tê zanîn roja îro şerê di navbera hêzan de li ser sê zemînên bingehîn tê bipêşxistin. Vana, şerê bejayî, şerê deryayî û şerê hewayî ne. Li gorî her zemînekê çek jî hatine bipêşxistin. Bi pêşveçûna zanista ezmanî re û bi pêşketina peykê (uydu) re di sedsala me de girîngiya şerê hewayî hîn derket pêş. Bi taybetî di şerê hewayî de bikaranîna kompîtur û pêşketina sîstema koordînatê di vê zemînê de pêşketineke girîng bi xwe re afirand. Hele hele bi awayê hewayî pêşxistina sîstema keşfê û ji bo keşfê dîtina balafirên bêmirov bi serê xwe pêşveçûnek e.

Bi taybetî bi rêya vê teknîka keşfê tespîtkirina koordînata hedefan û li gorî sîstema kompîturê bikaranîna fuzeyan ango koordînata kompîturê destnîşan kiriye, di aliyê fuzeyan de teknolojiya ku dikare bike hedef û îsabet bike bi pêş xistin. Di şerê hewayî de wekî serdemeke nû ye. Bi kurtahî ev pêşveçûna teknolojîk rola şerê hewayî pir zêde bi pêş xist. Hevsengiya di navbera şerê bejayî, deryayî û hewayî de bi vê pêşveçûnê guherî. Cardin wekî berê ya ku misoger encamê bigire, şerê bejahî ye. Şerê bejahî nebe encama misoger jî

çênabe. Ango di bejahiyê de ji aliyê însan bi xwe ve şer neyê meşandin, encama misoger jî dernakeve holê. Ev heqîqet îro jî derbas dibe. Lê roja îro ji encama van pêşveçûnên me diyar kirîn şerê hewayî jî pir zêde ketiye pêş.

Wekî din di şer de pêşxistina şewqa lazerê, bikaranîna termalê jî di hemû zemînên şer de qedemeyek bi pêş xist. Ango ferqa şev û rojê ji holê rabû. Bi vî awayî pêşketina teknolojîk gelek tişt bi xwe re guhertin, lê çiqasî teknolojî hatibe guhertin jî, hinek heqîqetên xwezayî hene ku nayên guhertin. Vana çi ne? Şert û mercên erdnîgarî, daristanî û rewşa demsalê ne ku, teknolojiya îro hîn nikare li ser wana guhertinê çêbike û bandorê lê bike. Ango çiqas teknolojî bi pêş ketibe jî, xweza her tim hêza herî mezin e û îradeya însan hêza herî bilind e.

Dûmahîkê tiştê mirov bibêje ev e ku, di şerê serdema me de şerê hewayî derket pêş. Ji ber ku zanebûna fezayê bi pêş ket û girêdayî wê şerê hewayî bi rastî ket pêş. Amerîka, hêzên hevpeymaniya navnetewî û Rûsya li dijî DAÎŞ'ê şerê hewayî dimeşînin. Bejahî nebe nabe. Jixwe bejahî nebe encamên misoger jî dernakevin holê. Şerê hewayî bi hikmê teknolojiyê asteke xwe heye. Lê belê mirov nikare vê pir mezin bike û bêje bi rêya hewayî dikarin her tiştî bikin. Wisa nabe. Şerê hewayî dibe, şerê konvansiyonel (bi çekê giran) dibe, şerê psîkolojîk, şerê sar, şerê asîmetrîk dibe her kîjan dibe bila bibe, hemû tên û li ser însan disekinin.

## 7- Di Şer De Faktora Bingehîn: Însan

Şer bi însan dibe. Temam em qebûl dikin teknîk ketiye pêş, îstixbarat ketiye pêş. Di encama van hemûyan de jî însanê xwedî cewher li pêş e. Însanê qabiliyeta xwe heyî û jêhatî dikare teknîkê biafirîne. Zekaya herikbar bi te re hebe, tu dikarî hemû teknîka dijmin vala derbixî û ya xwe derbixî pêş. Tu dikarî balafirên li ser kompîturê, fuzeyên bi aqil û barkirî (güdümlü) bi teknîka destê xwe vala derbixî û encameke mezin bigirî.

Di şer de faktora însan û qabiliyeta însan esas e. Ger em dixwazin di serdema nû de gerîlayê azadiya Kurdistanê bikin gerîlayê zaferê, divê em vê heqîqetê li ber çavan bigirin û pir zêde li ser faktora însan rawestin. Jixwe Rêber Apo tevgera xwe û felsefeya xwe li ser însan ava kiriye. Ji bo vê faktora însan herî zêde em dikarin bidin pêş. Çima? Ji ber ku felsefeya me li ser vê bingehê rabûye. Felsefeya Rêber Apo wisa ye. Tê însanê zeîf çawa xurt bikî? Di civakê de yê herî zeîf kî bû? Beriya PKK'ê di civakê de yê herî lawaz jin bû. Bi felsefeya Rêber Apo re niha di civaka Kurdistanê de beşa herî bi hêz jin in. Di jiyanê, siyasetê û şer de niha li Kurdistanê ya herî bi hêz jin e. Em bawer in di şer de wê hîn zêdetir jî bi pêş bikevin. Berê di nava civakê de ya herî lawaz jin bû. Di dîrokê de nimûneya pêşengiya jinê ya di şer de heye, lê îstisna ye. Ji ber ku berê jinê nedikarî di sîstema heyî de nefesê bistîne, nikarîbû di sîstema desthilatdariya zilam de nefesê bigire. Hinek kesên îstisna yên keybanû (kraliçe) û hwd. derketine, lê ev ne pîvan e. Sîstema desthilatdariya zilam artêş û şer xistiye bin bandora xwe, dibê qey şer a zilam e.

Di pêvajoyên destpêkê de dema pêşmergeyan hevalên jin di şer de dîtin, gotin “ma em hemû mirin e ku jin tên şer!” Aqilê civaka Kurd a kevin e. Aqilê wan difikire ku heta zilam hemû nemirin jin nikarin şer bikin. Berê wisa bû. Li Kurdistanê bi îdeolojiya Serokatiyê re jin bi pêş ket. Di sîstema pêşmerge de niha jî jin nîn e. Nû nû bi bandora me jin ketin siyaseta Başûrê Kurdistanê. Lê destpêkê qet fêm nedikirin, paşdemayî bûn. Berê nêzîkatiya li hemberî jinê wisa bû, lê niha jin hêza sereke ye. Îdeolojiya Serokatiyê yê lawaz û zeîf xurt dike, cewher xurt dike. Cewher û ruhê di jinê de heyî eşkere kiriye. Lewre jin bû nasname, bû îrade û bû hêzeke fedaî. Di rastiya berxwedana Kobanê de hat dît ku, jinê bi navê YPJ'ê bala hemû cîhanê kişand ser xwe. Ev bi çi dibe? Bi îdeolojiya Rêber Apo dibe. Îdeolojiya me însan ava dike, însan xurt dike.

Di nav civakê de piştî jinan, ê herî zeîf gundî ne. Di Kurdistanê de gundî bi axayan ve girêdayî ne. Axa bêje çi ew e. Lê PKK'ê çawa kir? Îro gundî quwet e û esas e. PKK'ê ji jinan fermandarên weke Azîme, Zelal û Bêrîvan derxist. PKK'ê ji gundiyên qet xwendin û nivîsandin nedizanîn fermandarên wekî Rojhat Bilûzeriyan û Adilan derxist. Însanê bi hêz, bi îrade û li hemberî dijmin bikaribe bibe quwet derxist. Di îdeolojiya me de însan esas e. Em jî dixwazin şerê serdemê û şerê profesyonel bi pêş bixin. Di vî şerî de jî faktora însan li pêş e. Wê çaxê em ê bi ser bikevin. Ji ber felsefeya me ya Apocî însan esas digire. Ger em li ser vê rawestin û kûr bibin, em ê teqez di hunera şer de bi ser bikevin. Hunera şer, îro çarçoveya xwe li ser faktora însan sekinî. Berê her kesê bikariya şûr bişixulîne dibû leşker, her kesê dikarî qlêşê bişixulîne dibû leşker. Lê îro tenê qlêş şixulandin têrê nake. Şervanek divê her tiştî bizanibe, bikaribe aqilê xwe bişixulîne, bê xwestin bibe sekvan, bê xwestin bibe sabotajvan, bê xwestin divê bibe fermandar û taktîsyen, bê xwestin divê bikaribe şer bi rê ve bibe. Ango bi vî awayî ji her alî ve profesyonel be. Ev tişt herî zêde dikare di PKK'ê de bi pêş bikeve. Ji ber ku felsefeya PKK'ê li ser însan e.

Di serdema nû de ji bo vê tiştê ku mirov bikaribe bibêje ev e; şerê serdema nû herî zêde teknîkê, îstixbaratê, cur bi cur rêbazên şer û girîngiya însan derdixe pêş. Di vir de însan navend e. Tevgera ku însan bingeh digire tevgera me ye. Ger em bikarin îdeolojiya Rêber Apo û heqîqeta şer baş li hev bînin, herî zêde em dikarin di hunera şer de kûr bibin.

### 8- Şerê Deşt û Bajaran

Bi şerê cîhanê yê duyemîn re şerê bajaran hinekî ket rojevê. Şerê deşt û bajaran jî şerê nû ye, lê berê jî şerê bajaran hebû. Di vê asta tevgera me gihîştiyê de şerê deşt û bajaran jî wê bibe. Di Rojhilata Navîn de pratîkek heye. Li Iraqê pratîkek heye. Erê ne pratîkeke şoreşger e, lê li hemberî dewleteke hakim grûbek rabû, fikrê xwe cuda bû, gundên deştê rizgar kirin. Hem jî li hemberî teknolojiya herî bilind rizgar kirin. Teknolojiya herî bilind teknolojiya Amerîka ye. Rexmê wê jî hinek grûbên sivîl û biçûk gund û deşt ji destê Amerîka girtin, dûvre Felûce girtin. Felûce xira bû, lê di destê wan de ma. Dûvre jî li Sûriyê cur bi cur grûb derketin, şerê bajaran meşandin. Li Helebê niha şerê bajaran heye. Bajarekî qedîm û dîrokî bû, lê şerê bajaran tê de çêbû. Her grûbekê taxek girtiye, dewlet diçe ser, lê nikare ji destê wan grûban bigire. Her cure teknîkê bi kar tînin, nabe; balafiran bi kar tînin, nabe; tang û topan bi kar tînin, nabe. Sûriye ji gelek dewletên cîhanê teknîkên şer digire, lê nikare di şerê bajaran de bi ser bikeve. Ev şerê bajaran tiştekî nû ye. Teoriya şerê bajaran û deştê divê mirov ji nû ve bigire dest. Mijarek wisa di rojeva me de heye.

Taybetmendiya şerê bajaran çi ye? Her bîna û avahiyeke bilind wekî girekî ye. Ango wekî çiyayekî ye. Li Botanê çawa gir hebe, li bajaran jî avahiyên bilind wekî giran e. Di şerê bajaran de ev derket pêş. Avahiyên bilind xwedî hakimiyet in. Dîsa di şerê bajaran de tiştê ku derketiye pêş ev e; ne ku tenê hêzên mezin dikarin şer bikin, hêzên biçûk jî dikarin şer bikin. Eynî wekî çiya ye. Li çiyê jî hêzên biçûk ango hejmara xwe kêm dikarin şer bikin. Di çiyê de 2 taximên gerîla dikarin li hemberî tûgayekê şer bikin. Ev ji derfetên çiyê sûd digire. Li bajaran jî ji avahî û bînayan, her wiha ji detayên bajêr sûd digirin. Helbet di şerê bajaran de texrîbat zehf çêdibe. Jiyana sivîlan lê kêm dibe û gelek bîna xira dibin. Lê di encamê de şer digihe wir jî.

Di şerê bajêr de tiştê derdikeve pêş wekî taktîka suîqest, sabotaj û sizma-êrîş e. Di şerê bajaran de suîqest taktîka herî li pêş e. Di şerê bajaran de suîqest roleke xwe ya girîng heye. Ta şerê Berlîn û Petersbûrgê rola suîqestê li pêş bû. Bi suîqestê nahêle însan bi pêş ve were. Di şerê bajaran de divê tu di suîqestê de pispor bî. Xisûsa din jî, sabotaj e. Divê tu di sabotajê de pispor bî. Ji ber ku di zemînê şerê bajaran de rola sabotajê zêde ye. Tu li hemberî dijmin û dijmin jî li hemberî te pir zêde dikare sabotajê bi kar bîne. Bi taybetî DAÎŞ'ê xwe di vê xisûsê de bi pêş xistiye. Tu diçî malekê digirî, wana teqemenî xistine hundirê malê; dema tu

dikevî hundir malê diteqînin. Ango ev rêbazek e. Wekî vana rêbazên cur bi cur hene. Mecala sabotajê di şerê bajaran de pir zêde heye. Heta ji ber ku di destê dewletê de wesayîtên zirxî zêde ne, li hemberî wesayîtên zirxî mirov dikare bi 2 şêwazan şer bike. Yek, sabotaj e; ya din jî, bi roketan lêdana wesayîtên zirxî ne. Bi taybetî ji bo di cadeyê de pêşveçûna wesayîtên zirxî bê astengkirin taktîkên sabotajê hîn zêde guncaw in. Ev tenê ne li hemberî pêşveçûna wesayîtên zirxî, sabotaj li hemberî pêşveçûnên peyayî (leşkerên piyade) jî pir zêde tê bikaranîn. Mirov bi rêya sabotajê dikare di kolanan de xefkên pir balkêş vede. Ger yek di vê der heqê de rêbazên dewlemend bi kar bîne û taktîka xefkan û kemînê li ser vê bingehê bi pêş bixe, li kêleka wê taktîka suîqestê jî baş bi kar bîne, hêza hember ne mumkûn e bikaribe bi pêş bikeve. Lewre ji bo parastinê taktîka suîqest û sabotajê di bajaran de pir girîng e.

Di şerê bajaran de tiştekî din ê rola xwe heyî, sizma ye. Ango bi zimanekî din mirov bibêje êrîşa bêdeng e, bi dizî ketina nav dijmin e. Sizma ev e; tu bêdeng û bi dizî dikevî nav hêza hember û bi bombeyan êrîş dikî. Tu dikevî nav dijmin û bêdeng digihî dijmin û lê didî. Di bajaran de êrîşa bi dizî xwe berdana nav dijmin ango sizma ger baş bê bikaranîn, ne tenê pêşveçûna dijmin tê sekinandin, heman demê şikestina dijmin tê pêşxistin. Taktîka suîqest û sabotajê parastinê dike û pêşveçûna dijmin radiwestîne. Taktîka sizma jî pêşveçûnê hedef dike û bi vî şêwazî şikestina dijmin bi pêş dixe.

Tê gotin parastina herî baş êrîş e. Ev tespîtek rast e. Ji bo tu bikaribî li hemberî êrîşên dijmin xwe biparêzî, divê tu plana dijmin xira bikî û biçî ser dijmin. Ango êrîş bikî. Her êrîşek dibe sedema xirakirina plana dijmin, ango dibe sedema astengkirina êrîşa dijmin. Heman demê her êrîşek bi xwe re pêşveçûnê çêdike. Mewziya dijmin ji destê dijmin digire. Li kêleka wê çek û cebilxaneya dijmin dikare ji dest bigire. Jixwe di bajaran de piranî hêz hevdû dorpêç dikin. Hêza di dorpêçê de ger cebilxaneya xwe ji dijmin bigire, dorpêç bi salan jî dom bike dîsa dikare şer bike. Lê hêzeke ku nikaribe cebilxaneya xwe ji dijmin bigire, wê demê nikare dirêj şer bike. Di dorpêçê de pêwîstiya mirov a erzaq jî girîng e. Dibe ku mirov bikaribe erzaq bi riyên cur bi cur temîn bike, lê ji bo hêzeke şer erzaq girîng e, rast e. Ya herî girîng, cebilxane ye. Ger cebilxane hebe dikare riyekê bibîne û erzaq jî bi dest bixe. Ji bo ku hêzek bikaribe di şert û mercên dorpêçê de têra xwe bike û rol bilîze, misoger divê bikaribe li hemberî dijmin êrîşên pêşveçûnê û hemleya biserdegirtinê bike. Ev jî destpêkê bi sizma dest pê dike. Ango quwetek bikaribe êrîşa bi dizî bi şêwazekî hunerî bi pêş bixe, dikare li ser dijmin bi her şêwazekî operasyonan li dar bixe. Ji bo vê divê bikaribe sizmayê bi şêwazekî serkeftî pêk bîne.

Ya herî girîng ew e, dema tu di hundirê parastinê de bi ser dijmin de biçî, tu cih û warê dijmin ji destê wî bigirî, çek û cebilxaneya dijmin ji dest bigirî. Ev ji bo hêz û ji bo gel dibe moral û motîvasyoneke mezin. Ev tiştekî ji sedî sed e. Ji bo berxwedan bi ser bikeve divê taktîka êrîşa bi dizî mirov teqez bi ser bixe. Ji ber ku ev taktîk ruh dide hêz, di hêz de moralê çêdike; ji bo dijmin jî dibe sedem ku sîstema wî xira bibe, planên wan li bin guhê hev bikevin, amadekariya wan têk biçe û morala hêza wan bişkê. Dema vana pêk werin, wê çaxê di dijmin de tirs û xof zêde dibe û hêza dijmin nikare şer bike. Hêzeke moralê xwe lawaz be û bitirse qet û qet nikare pêşveçûnê çêbike. Mirov di şerê bajaran de li kêleka suîqest û sabotajê êrîşên bi vî awayî bi pêş bixe û hemleyên taktîkî birêxistin bike, zafer wê misoger be.

Bêguman di bajaran de ne tenê taktîkên suîqest, sabotaj û sizma-êrîşê tê bikaranîn. Di şeran de taktîkên tên bikaranîn hema hema hemû li bajaran jî tên bikaranîn. Di warê taktîk de her tiştê bê bîra mirov bi şêwazekî di bajaran de jî dikeve dewrê. Em li gorî şerê bejahî li vê derê taktîkên ketine pêş tînin ziman.

Di vê çarçoveyê de dema mirov bigire dest, taktîka di rêza çaremîn de tê, mirov dikare bibêje dorpêçkirin e. Hêz dema dixwazin hevdû bişkînin û tengav bikin divê bi taktîka dorpêçê çûyîn û hatina alîkariyê ji ser hev qut bikin. Kî bikaribe kê dorpêç bike, wê ew bikaribe bi ser bikeve. Taktîka dorpêçê li hemû deveran roleke xwe heye. Li çiyan jî, li deşt û bajaran jî rola xwe heye. Lê di bajaran de dorpêç hîn hêsanî tê bipêşxistin. Mesela

dorpêçkirin li her araziyekê nayê kirin. Lê tu dikarî li her taxekê dorpêçê bi pêş bixî. Dema te dît dijmin li cihekî sengerek girtiye, tu dikarî çend kolanan an jî cadeyan dûrî dijmin biçî û dûvre lê bifetilî, wisa dijmin têxî dorpêçê û her biçe dorpêçê teng bikî. Heta wisa teng dibe ku tu dikarî di mesafeya çend metreyan de dijmin dorpêç bikî. Ji bo vê di şerê bajaran de zemîna taktîka dorpêçê zêde heye. Rast e, di bajaran de ji bo dorpêç bê valaderxistin jî derfet zêde hene. Lê yekî ku dorpêçê baş bi pêş bixe, dikare li ser wan derfetan jî bisekine û dorpêçê bi şêwazekî encamgir bi pêş bixe. Jixwe her tiştê ku zemînê xwe heye teqez bi xwe re zemînê dijberiya xwe jî bi pêş dixe. Di taktîka dorpêçê de jî ev wisa ye. Piştî ku dorpêç gihîşt astekê, divê tu êdî bi taktîka sizma û biserdegirtinê biçî encamê. Ango dorpêçeke baş bi sizma bê temakirin, misoger wê encam bigire. Sizma û biserdegirtin (baskin) dema bi pêş bikeve, dikare encama misoger bi dest xwe bixe.

Bêguman biserdegirtin, bikaranîna çekên giran, xefk, kemîn û hemû taktîkên din di şerê bajaran de dibin. Lê yên herî zêde derketine pêş suîqest, sabotaj, sizma û dorpêç in. Ji ber suîqest û sabotaj li pêş e, êrîşên rasterast kêm dibin. Lewre di bajaran de perde tê bikaranîn. Ji bo pêşî li suîqestvanan bê girtin û tu kolanê derbas bikî perde tê bikaranîn. Ango divê mirov sengera xwe baş çêbike. Tu nikarî di şerê bajaran de di cihê vekirî de tevbigerî. Ger tu tevbigerî wê suîqestvan li te bide. Ji bo tu biçî erê tu dikarî di koşeyan de biçî, lê zehmet e. Divê tu malan kun bikî û herî. Divê tu di bin xaniyan de û di nav xaniyan re tunelan vekî û herî. Ji bo vê divê di şerê bajaran de balyoz û çakûça te hebe. Me di tecrûbeya şerê Kobanê de ev dît. Carina heval dixwazin bi pêş de herin, xaniyan kun dikin û bi pêş de diçin. Heman demê dijmin jî xaniyan kun dike û dixwaze bi pêş de were. Di vê rewşê de carina hêz rastî hev tên. Kî berê kê kun bike bombeyê davêje û ew bi ser dikeve. Ji ber ku dengê balyozan tê. Heval carina guhdar dikin, dibihîsin ku dijmin ew derbas kirine, li wan vedigerin û bi bombeyê li wan didin. Şerê bajaran wisa ye. Cihên şer dijwar ne mumkûn e mirov kolan bi kolan biçe, ji ber ku suîqestvanên dijmin hene û wê li tê bidin. Heta li gelek cihan ne guncaw e ku mirov serê xwe derbixe û li kolanê jî binêre. Ji bo vê divê tu tertîba eyneyê bi kar bînî. Ango sê eyne di hundirê hev de tên tertîbkirin, bêyî ku tu serê xwe derbixî, tu li kolanê dinêrî. Ango ji bo tu ji dijmin re nebî hedef gelek rêbaz hene, divê hemû rêbaz baş bên bikaranîn.

Di tecrûbeya şerê Kurdan de pratîka şerê bajêr a destpêkê, Serêkaniyê ye, dûvre taxa Şêxmeqsût a Helebê ye û piştre jî Kobanê ye. Niha bi qismî Şengal heye, ew tam ne şerê bajaran e. Li Bakurê Kurdistanê jî niha şerê bajaran dibe. Va ye ciwanên Kurd xendekan dikolin û bi xendekan dikarin xwe li hemberî êrîşên polîsan biparêzin. Ev jî şêwazek nû ye. Îhtimal heye ku mirov di pêş de bikaribe hîn zêde vî şêwazî kûr bike.

Di nav hêzên leşkerî de di hemû şeran de dîsiplîn nebe nabe. Dîsiplîn ji bo bajaran hîn zêde deqîq e û mijara mirin û mayînê ye. Ji bo vê ziravî pêwîst e, kûrahî pêwîst e. Di şerê bajaran de hîn zêde pîvan pêwîst e. Ger tu li pişt mewziyê yî, divê tu ji serê xwe zêdetir xwe ji mewziyê dernexî. Ger tu derxî tu dibî hedefa suîqestvanan. Di şerê bajaran de ev pir girîng e. Di şerê bajaran de hîn zêde dîsiplîn, hîn zêde kûrahî û hîn zêde pîvan pêwîst e. Yên wisa bikin, wê şerê bajaran bi ser bixin. Ger suîqestvanên xwe xurt bin û di sabotajê de xurt bin, wê encam bigirin. Divê li hemberî suîqest û sabotajê jî bi tedbîr be. Ji ber ku di şerê bajaran de derbe bi suîqest û sabotajê tê xwarin. Sengera xwe saxlem be, derfet hebe bi pîvan bi pêş de biçe. Ger derfet tune be, xaniyan kun bike û bi pêş de here.

Gel di şerê bajaran de bi te re be, ev ji bo te avantajek mezin e. Gel di şerê bajaran de ne li gel te be, encam girtin zehmet e. Dema di şerê bajaran de şer tê asteke mezin, bajar hinekî vala dibin. Me di pratîka şerê Rojhilata Navîn de dît ku, gelê Ereb di şerê bajaran de jî zû bi zû malên xwe bernadin. Lê mixabin Kurd ne wisa ne, zû diçin. Di van salên dawiyê de gelê Kurd ji şerê psîkolojîk bandor bûye. Me di Rojavayê Kurdistanê de dît ku, gelê Kurd ji şerê psîkolojîk bandor bûye. Li Helebê gel ji birçîna mirin, dîsa jî zû bi zû malên xwe bernedan, hinek neçar man çûn, lê hê jî Heleb vala nebûye. Helbet dijminê wan ne wekî yê Kurdan e. Dijminê Kurdan xedar e, xwînxwar û qatil e. Dibe ku ferqa wê jî hebe. Bi kurtahî di şerê

bajaran de rola gel pir e. Dibe ku gel kêm dimîne, lê rola xwe zêde ye. Gel aliyê kî bigire, ew hîn bêhtir dikare bi ser bikeve; gel aliyê kî negire, ew hêz bêhtir ji binkeftinê re vekiriye. Ji bo şerê bajaran mirov dikare vana bibêje.

Şerê deştê jî ji pir aliyan ve dişibe şerê bajaran. Ango dîsiplîn, pîvan û ziravî wekî şerê bajaran tê xwestin. Divê mirov di şerê deştê de deqîq be. Li her derekê van quralan ji bo şer pêwîst in, lê ji bo deştê ev bêhtir girîng in. Mesela tu li çiyê şaşiyê bikî, çiya te diparêze, dar te diparêze. Lê di deştê de tiştekî te biparêze nîn e. Tu têkevî valatiyê tu dibî hedef. Suîqest di deştê de girîng e. Çekên me yên suîqestê ji 3 km'yan dûr dikin, hene. Heta niha me digot tenê di destê me de heye. Ji ber ku me bi xwe çeka Zagros û Şiyar çêkiriye. Me dît ku hinek dewletan jî çêkiriye. Tu di deştê de bi awayekî vekirî tevbigerî, dikarin di 2 km'yan de te suîqest bikin. Li deştê taybetmendiyek heye, bajar çawa ji destê dewletan hat girtin? Bi piştevaniya gel û bi rêbazên me jor jimartî. Lê deşt çawa li hemberî teknîka bilind ji destê dewletê hat girtin? Di deştê de divê tu xwe bidî ser gel, yanî civakê. Li welatên deşt berê gerîla çêbûye. Mînak; Polîsaryo sehra ye, lê gerîlayê xwe hene. Elsalvador û Nîkaragua jî nimûne ne. Îrlanda jî deşt e, hêzên IRA li wir têkoşîn dan. IRA jî hêzeke bi nav û deng e. Împarotariya Îngiltere anîn ser masê. Îngiltere 150 salan Îrlandaya Bakur red kir, di encamê de ew anîn ser maseyê. Ev yek li deştê kirin. Bi awayekî kûr û zirav kar meşandin. Ji bo şerê deştê ev pêwîst e. Nimûneya din jî, Elsalvador e.

Ji şoreşgerê El Salvador pirsîn û gotin: "Çiyayên we hene?"

Şoreşgerê El Salvador got: "Çiyayên me nîn in. Çiyayê me gelê me ye."

Ango çiyayên wan nîn in, xwe di nav gel de vedişêrin. Gerîlayên deştê xwe bidin ser gel dikarin bi ser bikevin.

Min pir meraq dikir ku ev Amerîka bi vê teknîka xwe çawa nikarin gundên li deştên Iraqê bigirin. Em li çiyan in, dijmin tê heta çiyê; vana çawa nikarin biçin ser gundên deştê. Me li ser lêkolîn kir. Mînak; leşkerên Amerîka diçin gund, hêzên leşkerî dora gund digirin, bi helîkopteran dadikevin û bi erebeyan diçin. Bi vî şêwazî gund dorpêç dikin û li gund her kesî derdixin derve û dixin rêzê. Hemû nasnameyên xwe derdixin, hemû jî hemwelatiyên gund in. Dema ji gund derdikevin, hîn di rê de ne li kêleka gund ew kesên di rêzê de bûn çekên xwe digirin û li kêleka gund wan dixin kemînê. Bi vî awayî her carê leşker dikuştin. Her cara diçin windahî didin, lewre leşkerên Amerîka jî nema diçin gundên deştê. Dema naçe gund, gund dikeve bin kontrola kesên çekdar û wisa rizgar dibe. Ev bi quweta gel kirin. Me fêm kir ku çekdarên Iraqê bi hêza gel teknolojiya herî bilind bêwate kirine.

Taktîkên ji bo bajaran me rêz kirîn ji bo şerê deştan jî girîng in. Dîsa di deştan de kanal û xendek girîng in. Heta ji bo paşvekişîn û alîkariyê ji gundekî heta gundekî kanal pêwîst in. Di şerê deşt û bajaran de dîsiplîn û gel girîng in. Ger vana bi te re hebin, dîsiplîna te hebe, gel bi te re be û tu xwe bi gel re bikî yek, cilê te ji yê gel be, ger pêwîst be nasnameya te hebe, wê çaxê wekî Polîsaryo tu dikarî li deştê herêmên rizgarkirî çêbikî. Li Polîsaryo tiştek li ser erdê nîn e, hemû der cok û qûm e, her tiştê wan binerd e û sîstema kanalê pir zêde bi kar tînin. Li gorî derfetên herêmê tu kanal û xendekan bi kar bînî û piştevaniya gel bigirî, tu dikarî şerê deştan bikî. Lê me heta niha nekiriye. Em yekîneyek heval rêdikin deştê, 3-4 heval bi cilên gerîla, bi liv û tevgera xwe ya fermî û bi çek diçin deştê, gel jî hinek pê re ye, hinek ne pê re ye. Nav dide ku heval hatine filan deştê, heta dijmin jî pê dihese. Bi vê rêbazê di deştan de mayîn û şerkirin zehmet e. Ji bo vê em di pratîkên deştê de derbe dixwin. Di salên 1994-95'an hingî me di deştê de derbe xwar me hemû yekîneyên li deştê kişandin. Dema me kişand têkiliya me ya bi gel re kêm bû. Dema em naşînin têkiliya me ya bi gel re kêm dibe, dema em dişînin jî em windahiyê didin. Ji ber ku fermî ye, ne ji gel e, ne veşartî ye. Divê ji gel be û di nav gel de be. Gelê me welatparêz e, lê yên xirab jî di nav de hene, dijmin ji wan agahî digire. Me rêbazê wê tam negirt. Me ji bo şer deşt nedişixuland. Me ji bo xebata

cepheyê yekîne dişandin deştê, lê cardin ew jî tune dibûn. Lewma xebata me ya di vî warî de bi ser nekeft. Me windahî dida û me jî kişand. Ji ber ku di rêbaz de şaşîtî û kêmanî hebûn.

Di şerê deştê de taktîkên li pêş suîqest, sizma, sabotaj û kemîn in. Lê bi esasî piştevaniya gel pêwîst e. Ji bo vê, yekîneyên herêmî rojeva me ya sereke ye. Ango parastina cewherî divê wekî artêşa duyemîn bê birêxistinkirin. Ev pir girîng e. Ger heta niha Şerê Gel ê Şoreşgerî pêk nehatibe, ji ber vê sedemê ye. Yekîneyên herêmî di navbera gel û gerîla de wekî xelekekê ye. Lewre divê em vê xelekê saxlem bikin. Ev 2 sal in em li ser vê xebatê disekinin, niha em dixwazin têxin pratîkê. Ger yekîneyên herêmî hebin, tu dikarî şerê deştê jî bikî. Ji ber ku yekîneyên herêmî jixwe ji wî gundî ne, ehlê wir in. Nexwe rêbaza şerê deştê ne ku gerîlayê ji derve hatî biçe wê deştê; divê hêza te ji wir be, ji wir bê birêxistinkirin. Divê mirov yekîneyên herêmî di vê xisûsê de bide pêş. Û pêwîst e hemû kes fêm bikin ku di têkoşîna azadiya Kurdistanê de, bi taybetî di vê qonaxê de hêza herî zêde rola stratejîk bilîze yekîneyên herêmî ne. Li ser vê bingehê divê em yekîneyên herêmî wekî artêşa duyemîn birêxistin bikin, bi hemû cidiyet û hêza xwe li ser xebata yekîneyên herêmî rawestin. Em bikaribin yekîneyên herêmî li gundan û bajaran birêxistin bikin, wê çaxê em ê bikaribin şer tenê ne li çiyê bikin, şer daxin deştan û bajaran. Dema şer dakeve deşt û bajaran, wê çaxê wê şer bibe Şerê Gel ê Şoreşgerî û wê çaxê wê pêngavên rizgariyê û meşa zaferê jî guncaw bibe.

# Beşa Pêncemîn:

# DÎROKA ŞERÊ LI KURDISTANÊ

Şer bi zanist û teknolojiyê re bi pêş de çûye. Şer bi vî awayî bûye zanistek û hunerek. Dinya hemû di vê çarçoveyê de nêzî zanist û teknolojiyê bûye. Mirovatiyê zanista heyî destpêkê di şer de bi kar aniye. Di şer de pêşveçûn çêbûye, dûvre ew teknolojî û îcad di nava civakê de hatiye bikaranîn. Ango teknolojiya îcad bûyî destpêkê di şer de hatiye bikaranîn. Niha jî ev wisa ye. Mesela ji yên îcadan dikin yek jê Amerîka ye; li wir saziya NASA heye. NASA, lêkolîna li ser ezman, feza û îstixabaratê dike. Wana heman demê bi elektronîk û teknîkê re mijûl dibin. Her tiştê ku îcad dibe destpêkê li gel wan îcad dibe û 20 salan ji bo xwe bi kar tînin. Piştre wê teknîkê didin derve û dostên xwe. Piştî wê jî teknîkê dixin jiyana sivîl a normal. Lê destpêkê ji bo leşkeriyê bi kar tînin.

Madem şer di giştî de wisa ye, di Kurdistanê de şer çawa ye? Di civaka Kurd de nêzîkatiya ji şer re çawa ye? Kurdistan di nava axa ku em jê re dibêjin Mezopotamya de cih digire. Mezopotomya tenê ne Kurdistan e; ji vir bigire heta Bexda û Şat'ûl Ereb hemû Mezopotamya ye. Şaristaniya mirovatiyê bêhtirê xwe di vê navendê de bi pêş ketiye. Zanebûna însan li vir bi pêş ketiye, şer jî destpêkê li van deran bi pêş ketiye. Destpêkê rahîbên Sumer şîdeta xwezayî ya ji bo parastinê tê bikaranîn, ji bo îrad, qezencê, ji bo însanan bindest bike û îradeya wan bişkîne bi kar aniye. Em vana bi gelemperî dizanin. Wekî pêşiyên Kurdan navên Gutî, Cutî, Kurtî di hundirê dîrokê de derbas dibin. Dûvre Mîtanî, Medên li ser axa Mezopotamya jiyan kirine, mirov dikare wana di warê dîrokî de, wekî kevnareyên bav û kalên Kurdan pênase bike. Şîroveya herî rast wisa ye.

Di nav Gutî û Kurtiyan de, di Mîtaniyan de şer çawa bûye? Di vê der barê de niha zanyariyek tam di destê me de nîn e. Ya rastî hemû berhemên li Gobeklîtepeya girêdayî Ruhayê hatine dîtin, hîna nehatine nivîsandin. Ger hemû bi berfirehî bên nivîsîn belkî gelek tişt derkevin holê. Ango Kurtiyên berê li wir jiyan kirine, terzê wan ê jiyanê û yê şer çawa ye, em nizanin. Ji ber ku behsa beriya 12 hezar salan dikin. Beriya mîladê 10 hezar salan li Gobeklîtepe jiyan hebû. Tiştên niha ji wir derdikevin berhemên wê demê ne. Şaristaniya wê çaxê çawa ye, belgeyên wê hene. Li ser wan keviran îşaret û nivîs hene. Vana belgeyên wê demê ne. Zanista arkeolojiyê niha li ser wê radiweste. Encex arkeologên pispor dikarin ji wana fêm bikin. Ango pêş me bikin em fêm nakin. Hunera arkeolojiyê encex encaman jê derbixe, ew dikarin bifetilînin zimanê roja îro.

Dîroka ji Medan û vir ve tê zanîn. Dîroknasê destpêkê û yê dîrok nivîsandiye Heredot e. Wekî din jî em tenê bi nivîsandina Heredot nikarin dîrokê şîrove bikin. Heredot Yûnanî ye û zanyar e. Heredot wê demê geriyaye. Jixwe wê çaxê kesên zanyar pir digerin. Ango diçin xelkê û deran dibînin, li gorî wê zane dibin. Heredot ew gera xwe nivîsandiyen û ew nivîsandin heta niha maye. Berê li ser tabletan dinivîsandin. Ev niha wekî belgeyeke dîrokî heye. Lê Heredot Yûnanî ye, dibe ku gelek tişt li gorî xwe şîrove kiribe. Ev gengaz e. Ji ber ku gelek dîroknas dibêjin, "dîroka Heredot alîgir e." Dibe ku alîgir be, lê hin tiştên dîrokî tîne ziman. Mesela, dibe ku gava şerekî tîne ziman bi nêrîna Yûnan nivîsandibe. Ev dibe. Di rastiyê de ew bi xwe dixwaze bêyî ku bibe alîgir binivîse, lê dîsa jî dibe ku wisa bûbe. Di encamê de ev jî belgeyek dîrokî ye. Pirtûka destpêkê li ser dîrokê hatî nivîsandin, pirtûka Heredot e. Di wir de hinek tişt hene, jê pê ve di hinek berhemên derketîn de agahiyên der barê dîrokê de hene. Ango dîroka Med hinekî tê zanîn.

Ya girîng, tiştê ku niha herî zêde der heqê şer de tê zanîn û wekî pêşiyên Kurdan tên hesibandin, Med (BZ. 678-549) in. Tê gotin ku Medan, li hemberî zordestiya Asûr 300 salan şer kirine. Piştî serkeftina şerê Medan pîrozbahiya Newrozê ango Roja Nû û dûvre jî

damezrandina Împaratoriya Med heye. Jê pê ve Med dibe wekî dewleteke di nava sînorê Kurdistana îro heyî de hikûm dike. Di wexta wan de artêşbûn heye. Mesela tê gotin sîstema yekîneyê wekî bask hatiye sazkirin, sîstema artêşê heye. Herhal zanebûna xwe ya taktîkî jî hebû. Em vana ji ku dizanin? Em dikarin li ser vê çend nimûneyan bidin. Med zû tê hilweşîn, hakimiyeta wê 70 salan didome û dûvre dikeve. Çawa dikeve? Med ji hundir ve dikeve, ne ku ji derve tê hilweşandin. Med û Pers pir nêzî hev in, wekî xizmên hev in. Med dewleteke Împarator e, Pers jî di bin destê wan de ye. Şêwazekî wekî derbeyê li wan dibe, îcar Pers tê ser wan û dibe desthilat.

Çîroka xwe wisa ye; qralê Medan Astiyag çend caran xewnekê dibîne. Qîza Astiyag a bi navê "Mandane" heye. Di xewna xwe de dibîne qiza wî Mandane diçe destavê, ji wê destavê çemek derdikeve. Wê demê pir şîrovekarên xewnan hebûn, alim û remildar hebûn. Li gel her qralekî jî kesên wisa hebûn. Di roja me ya îro de jî şêwirmend hene, şêwirmendên wê çaxê jî wisa bûn. Qralê Med gazî wan dike û dibêje, "ev xewna min tê çi wateyê? Ji wî re dibêjin, "ev qiza te demê pêş wê bizewice û wê zarokek jê çêbibe. Ev zarok wê hemû dinyayê zeft bike." Xewna qral wisa şîrove dikin. Çend şîrovekarên din jî xewna qral wisa şîrove dikin. Qral ditirse. Ji ber ku qraliyeta wî jî dikeve xeteriyê. Ew jî ji xwe ditirse. Di dil xwe de dibêje, "ez qiza xwe bidim kesekî feqir û kesekî ne ji Medan." Qiza xwe dide kesekî xizan û ji Persan ku ger zaroka wê ji wan çêbibe nikare bibe qral.

Bi rastî jî kurekî qiza wî çêdibe. Qral dîsa ditirse. Zaroka nû çêdibe dixe hundirê sepetekê û ji generalê xwe re dibêje, "'biçe bikuje." Ew jî wî zarokî dibe bikuje, lê di rê de tê ber çavê wî, dilê wî qebûl nake bikuje. Diçe dibîne li ser rê azap ango şivanê qraliyetê heye. Li wir pezê qral xwedî dikin. Wê çaxê xizmetkarên qral ên wisa pir bûn. Gava ji wir derbas dibe, dibîne ku malek ji wan digirîn. Dipirse û dibêje, "çi bûye?" Ew jî dibêjin, "zarokek wan nû çêbibû, ew jî mirî ye." Diçe wê malê û dibêje, "ka ew zarokê mirî bidin min." Ew zaroka mirî digire û neviyê qral dide destê wan û dibêje, "bila ev zarok ji we re be." Ev malbat jî kêfxweş dibe û wî zarokî digirin. General jî diçe ew zarokê mirî dispêre axê û tê. Ev general kî ye? Ew general Harpagos e. Ango Harpagos wî zarokî nakuje, dilê wî ranake û nikare bikuje.

Di qesra qral de zarokên general, şivan û xîzmetkaran her tim bi hev re dilîstin. Qral Astiyag dem bi dem zarokan dişopîne. Tim dinêre yek ji wan di rola qral de ye, hevalên xwe îdare dike. Zarokên 10–11 salî tim dilîzin, lê ew kurik wan dixe rêzê û tim wana îdare dike. Qral pirs dike û dibêje, "ev kurê kî ye wisa ye?" Jê şûn de, generalê wî û gelek xîzmetkarên wî gazincan dikin û dibêjin, "ev kurê şivanê te ye, zarokên me jê ditirsin." Qral dibêje, "ev çima wisa dike?" Qral bi xwe jî dişopîne kesekî wisa ye, tim pêşengtiyê dike. Gazî wê malbata azapê xwe ango şivanê xwe dike, ji bavê kurik dipirse û dibêje, "te ev kur ji ku aniye?" Ew şîvan jî kesekî ji rêzê ye. Ji wî weye qral pê hesiyaye, lewma dibêje, "Harpagos ew zarok daye min." Jixwe ne di bîra qral de bû û ew jî bi awayekî normal dibêje, "te ev kur ji ku aniye?" Ango kurekî jîr e, di lîstikê de pêşeng e, li her kesî dide û hwd. Gava dipirse ku ev zarok ji ku aniye, gundî hema dibêje, "di filan demê de zaroka me mir, Harpagos ev zarok da me." Gava navê "Harpagos" tîne ziman, yekser ew wexta ku qral zarok ji bo bikuje dayî Harpagos hat bîra wî û qral fêm dike ku Harpagos zarok nekuştiye.

Gazî qîza xwe dike, ji qîza xwe re dibêje, "Va ye kurê te ev e; kurê xwe bigirin û ji vî welatî derkevin." Ango zarokê wan dide wan û wan surgûn dike. Di wê navberê de zarokên paşayan hemû tên sarayê, li wir kar dikin. Ango wekî perwerde li ber destê qral dişixulin, li wir kar dikin û xizmet dikin. Jiyana qral dişopînin. Ango perwerdeya wê çaxê wisa ye. Zarokên paşayan û yên li pêş ku dixwazin bibin berpirsyar wisa perwerde dibînin. Ji bo vê jî zarokên paşayan di sarayê de ne. Kurekî Harpagos jî di sarayê de ye. Astiyag, Harpagos vedixwîne cem xwe. Ev tiştekî normal e. Qral generalê xwe dawet dike. General tê, dibîne ku ew her du tenê ne. Xwarin çêkirine, xwarin jî goşt e. Xwarina xwe dixwin. Piştî nanê xwe dixwe û gava wê derkeve, qral sepetekê wekî diyarî dide destê Harpagos û dibêje, "ev jî diyariya te ye." Harpagos sepetê digire û paç radike; dibîne ku serê kurê wî tê de ye. Fêm dike ku goştê xwarî jî goştê kurê wî ye. Harpagos nikare tiştekî bibêje, ji ber ger bêje qral wê serî wî jî jê

bike. Ji qral re dibêje: “Ser serê min, qralê min!” Qral jê re dibêje: “Te dersa xwe girt, here. Cezayê te ev bû.” Ev di dilê Harpagos de dimîne.

Ew kurê biçûk ê Harpagos ne kuştî, Kyros e. Kyros mezin dibe, dibe 20 salî, hemû derdora xwe birêxistin dike û bi demê re xelk pê dihise ku ew nêviyê qral e. Ji bo vê hemû Pers li dora wî dicivin û dibêjin, “tu mezinê me yî.” Ew jî yekî jîr e, şerker û zane ye. Di encamê de dibe mezinê Persan. Persên li wir jî xwe amade dikin biçin ser Medan. Qral jî bi vê yekê dihese û ji bo xwe wekî xeteriyê dibîne. Qral emir û talîmat dide artêşê, wana dişîne ser Kyros û dibêje, “Kyros li dijî me dike derbeyê bike; biçin bipelixînin.” Ango qral kesekî zalim e. Generalê wî dîsa Harpagos e. Qral radibe Harpagos dişîne ser Kyros. Lê Harpagos navbeynkar dişîne cem Kyros û dibêje, “min te xilas kir, ka were em li hev bikin.” Ew artêşa ku çûye Kyros tesfiye bike, pê re dibe yek. Qaşo ew jî çûbûn Kyros îdam bikin. Gava qral, Harpagos rêdike ser Kyros wekî jê re dibêje, “karê wê çaxê te temam nekiriye, niha bike. Şaşiya xwe telafî bike.” Lê Harpagos diçe pê re îtifaq dike. Qraltiya Kyros wî qebûl dike, artêşa Med û Persan dibin yek û tên saraya qral Astiyag digirin û wî dixin zîndanê. Ji ber ku qral kalikê wî ye îdam nake. Heya sax be di zîndanê de dihêle û werga dibe qralê Persan, Harpagos jî dike serfermandarê giştî yê Persan.

Di dîroka Heredot de heye û tê gotin, “Wexta Astiyag digirin, Astiyag Harpagos dibîne û jê re dibêje, madem te ev îxanet li min kir, qet nebe tu bi xwe bibûya qral, bila yekî Med bibûya qral; çima te da Persan?” Elbet qralê Persan nêviyê wî ye, lê ne Medî ye. Bavê Kyros Persî ye. Ango dibêje, bila desthilat di destê Medan de bûya. Ev îxaneta Harpagos ji şîroveyê re vekiriye. Tiştê li wî bûyî jî nayê rakirin, lê ev di Kurdan de gelek caran wisa dibe. Ev dibe şêwazek. Gelek Kurd wisa îxanet dikin. Mesela îxanet li Bedirxan Beg jî tê kirin û biraziyê wî jî bi heman şêwazî îxanetê li wî dike. Bedirxan Beg, Yezdanşêr dike fermandarê milê Mêrdînê û ew bi xwe jî diçe Wanê. Heya vedigere, dibîne ku Yezdanşêr bi dijmin re bûye yek, hatiye ser wî û Cizîrê bigire. Ango dûvre îxaneta Harpagos di nava Kurdan de riyek vekir. Mirov dikare wisa bibêje.

Mijara me niha ne dîrok e. Mijar ev e ku Med di hundirê artêşa Persan de her tim asteke xwe hebû. Mesela, di nava Persan de piraniya fermandaran Med in. Ango di vir de fêm dibe ku di nava Medan de asteke şer heye. Artêşa Pers di dinyayê de artêşa herî mezin û biheybet e. Ji gelek deveran jî quwetê leşkerî girtine nav artêşa xwe. Dîsa di pirtûka Heredot de heye: Di artêşa Persan de 20 hezar leşkerên pispor ên wekî hêzên taybet hene. Binêrin, wê çaxê jî hêzên wisa yên taybet hebûn. Ango quweteke taybet a di şerê xwe de xurt heye. Di şer de kesên pispor faktorekî şer in. 20 hezar leşkerên wisa pispor hene. Ji wana 10 hezar Pers in, 10 hezar jî Med in. Carekê artêşa Persan diçe Yûnan, herhal qral ne bi wana re ye. Qral fermandarekî xwe erkdar dike û dişîne sefera Yûnan, ji bo Yûnanistanê zeft bikin. Lê serkêşê Yûnan dinêre ku wekî qral bi xwe nehatiye û artêş jî ne mezin e, teslîm nabe, dixwazin li hemberî wan şer bikin. Feqet di Yûnan de 2 hêzên di şerkeriyê de xurt hene. Yek Atînayî ne, yek jî Makedonî ne. Lê her kesî otoriteya Atîna qebûl kiriye. Atîna dibêje, “em ê şer îdare bikin” û ji Makedoniyan re dibêje, “ger hûn Medan bigirin ser xwe -ango baskê Medan hûn bigirin-, yên din em ê hal bikin.” Wekî din jî qebîle li Yûnanistanê hene, lê yê herî xurt Makedonî ne. Makedonya qebûl dike û Medan digire ser xwe.

Fermandarê Persan vê îstixbaratê digire, lewre dibêje, “Ez Medan nadim hemberî Makedonan.” Wê demê di şer de quwet dihatin hemberî hev, li pêşber hev disekinîn. Em bêjin bi hezaran vî alî disekinin, bi hezaran jî li aliyê din disekinîn. Wê demê ji cilê wan diyar dibû kî, kî ye. Cilê her kesî bi şêwazekî bû. Şêwazê cilê Medan diyar e. Fermandarê Yûnaniyan dinêre ku Med li vî alî ne, Makedonan dide wir. Vê carê fermadarê Pers Medan ji wir derdixe tîne vî alî. Fermandarê Yûnaniyan jî Makedonan tîne pêşberî wan. 3 rojan şer nabe û wisa cih diguherin. Çima? Yûnanan plan kirine ku Med û Makedonan li hemberî hev bin. Di Yûnan de yê herî şerker Makedon in. Jixwe Îskenderê mezin jî Makedon e. Makedon quwetê herî şerker in. Em di wir de fêm dikin ku Med şerkerên xurt in. Ango di Medan de asteke şer heye, lewma xwestine Medan bidin pêşberî Makedonan û yên din jî jê bawer in

ku wê bi ser bikevin. Ji ber ku ji Makedonan re dibêjin, “Hûn Medan bigirin ser xwe em ê bi ser bikevin.”

Ev rewş û bûyerên ku Heredot nivîsandine, ne riwayet in. Di wir de fêm dibe ku wê çaxê di Medan de asteke şer hebû. Em wisa fêm dikin û wê çaxê asteke çand û cilan hebû. Ango asteke şaristaniya Medan hebû. Ji ber ku destpêkê Med împaratoriyê ava dikin, dûvre jî derbasî Persan dibe. Kyros sîstemekê datîne û dûvre jî zarokên wî vê sîstemê berdewam dikin. Ango Med tim di sîstema Persan de wekî neteweya duyemîn in. Taybetiya xwe hene, di artêşê de bihêz in, di sîstema dewletê de hene. Carekê-diduyan hinek ji wan dixwazin derbe bikin û împaratoriyê bi dest xwe bixin, lê bi ser nakevin. Piranî bi hev re dijîn. Heya carekê tiştekî wisa dibe: Serdemekê navbera qralê Yûnan û qralê Persan xweş dibe. Qralê Pers dibêje, “em ji wana re diyariyekê rêbikin.” Li ser vê difikirin ku çi diyarî bidin, li hev dişêwirin, li meclîsa xwe dişêwirin, bi kesên derdora xwe re dişêwirin. Nîqaş dikin û wekî encam derdikeve, dibêjin, “em destek cilê Medan ji wana re bişînin.” Destek cilê Medan ê ji herîr dikin sindoqê û ji bo wê sindoqê navbeynkarekî û yekîneyeke leşker ji Îsfahanê (paytexta Persan) rêdikin Atînayê. Tiştê di sindoqê de û hemû yekîne diparêze, destek cilê Medan e. Cilê Medan ê wê çaxê çawa ye em nizanin, feqet diyariya wan destek cilê Medan e. Nexwe di wir de fêm dibe ku asteke çanda Medan heye. Bi vî awayî asteke Medan a civakî û şer heye. Em ji van nivîsandinan vê rastiyê fêm dikin.

## A) Di Şerê Kurdistanê De Bandora Ol

Dema Îskender tê Mezopotamya û şûn de sîstema Împaratoriya Pers dişehite. Serokatî dibêje: *“Kurd wê çaxê wekî dikevin qeyrana fikrî.”* Ango di Zerdeştiyê de zeîfbûn tê jiyîn. Hinekî bandora çanda Helenîzmê çêdibe. Manîgerî (Manîzm) heye. Manîgerî hinekî bi pêş dikeve, lê tam ne li pêş e. Dîsa Xiristiyanî heye. Ango li hêlekê Manîgerî, li hêlekê bandora Helenîzmê, li hêlekê Zerdeştî û piştî wê bandora Xiristiyaniyê çêdibe. Xiristiyanî ku bi pêş dikeve, Kurd wê jî tam qebûl nakin. Lewre bi qismî bandora Xiristiyaniyê ango Mesîhîtiyê çêdibe. Kurd di nav wan çend sedsalan de wekî hejandinekê dijîn, lê dudiliyek jî heye. Îskender ku BZ. 330’an tê Kurdistanê; ger em piştî wê bihesibînin, heya salên PZ. 200-300’an ango wan 500 salan rewşeke wekî valahiyê jiyan dibe. Wan çaxan di herêmê de hinekî Ermenî bi pêş dikevin. Di wir de dema valatiyê heye. Di wê rewşê de wexta Îslamiyet bi pêş dikeve, erê Kurd destpêkê hinekî li ber xwe didin, lê zû jî qebûl dikin.

Kurdistan, tim dibe saha şer. Wekî herêma tampon e. Împaratoriya Bîzans hebû. Paytexta wê Stenbol bû. Yek jî, li Îranê Dewleta Sasanî tê damezrandin. Van împaratoriyan ku tim bi hev re şer dikirin, dihatin li Kurdistanê şer dikirin. Wê demê adeta Kurdistan di bin lingê hespan de dimîne. Artêşên wê çaxê jî ne wekî yên niha bûn. Niha jî artêş diçin ku derê, wir talan dikin, lê wê çaxê bi tevahî paqij dikirin. Çawa? Bi sedhezaran leşker hebûn. Wekî niha tren, teyare yan jî kamyon tune bûn ku ji wana re erzaq bibin. Lewre diçûn kî derê wir talan dikirin û bi wî awayî xwe didan jiyîn. Ji ber vê sedemê jixwe artêş pir caran di yek riyê de nediçûn; di gelek rêyan re diçûn, ji bo her kes çi rastê hat, wir talan bike. Nimûne, artêşek ku bihata bajarekî, di wî bajarî de ne embar, ne xwarin tiştek nedima, gişt dibirin. Li wir kî li ber xwe bida, dihat kuştin. Jixwe her der dişewitandin. Artêşên berê wisa bûn. Gelek ji wan leşkerê wan diçûn kî derê, ew der talan dikirin û dişewitandin. Ango leşkeran xwarinên xwe digirtin û tiştên diman jî dişewitandin. Mirov piranî di şûran re derbas dikirin.

Em bifikirin; artêşa Îranê û artêşa Roma ku her du wê çaxê xurt bûn, tim dihatin li Kurdistanê şer dikirin. Jixwe Îskender, şerê xwe yê bi Persan re li Kurdistanê dike. Artêşa Pers, destpêkê li Çûkûrova derdikeve pêşiya Îskender. Îskender, li wir artêşa Pers dişkîne, dûvre li Kurdistanê şer dibe. Dibe ku piştî çemê Dîcle derbas dikin, li derdora Duhokê şerê mezin diqewime. Paşê ev şer li Kurdistanê belav dibe û piştî wê jî Kurdistan bi vî awayî tim dibe herêma tampon.

Ev heqîqet dihêle ku Kurdistan tim bibe saha cengê. Kurdistan rêya Asya û Ewropa bi hev ve girê dide. Rêya ku ji Asya diçe Afrîka di wir re derbas dibe. Rêya Hevrîşim (Îpek Yolu), rêya baharatê di Kurdistanê re derbas dibe. Di vê wateyê de Kurdistan li cihekî jeo-stratejîk cih digire. Dewletên di herêmê de xurt dibin, dema dixwazin xwe mezin bikin, tên li Kurdistanê disekinin. Nimûne, hêzek dixwaze ber bi Stenbolê ve pêşde were, Kurdistan li ser rê ye. Pers (Îran) ku dixwaze mezin bibe û here Ewropa, Kurdistan li ser rê ye. Artêşa Îslamî ku li Mekke mezin dibe, dema dixwaze fireh bibe û here Anatolyayê, Kurdistan li ser rê ye. Kurdistan, bi wî awayî di neqebeke girîng de ye, lewre tim dibe saha şer. Ji ber wê yekê dema artêşên Îslamî tên Kurdistanê, Kurd hinekî li ber xwe didin.

Niha tê nîqaşkirin ku Kurdan Îslamiyet çawa qebûl kirine? Hinek şer dikin. Li aliyekî bi Kurdan re teredût heye, li aliyê din jî Kurd Îslamiyetê ji bo xwe wekî rêya ji zilmê xilas bibin, dibînin. Ango di Îslamiyetê de rizgariyê dibînin. Li hemberî Roma, li hemberî dewleta Sasanî ya Îranê Îslamiyet wekî hêzeke sêyemîn e. Ji bo wê Kurd zûtir Îslamiyetê qebûl dikin. Tabî ne hemû Kurd, Kurdên li çiyê Îslamiyetê zû qebûl nakin û dixwazin xwe biparêzin. Vana di ola Zerdeştî de israr dikin. Serokatî jî di parêznameyên xwe yên dawî de vê tîne ziman. Piştî ku Îslamiyet bi cih dibe û şûn de hinek ji wana difetilin, dibin Elewî. Elewîtiya li Kurdistanê, esas kokê xwe ji wir digire. Hinek kesên di xwe de israr dikin û naxwazin sîstema dagirkeriyê qebûl bikin, wekî helwesteke qebûlnekirinê yan di Zerdeştiyê de israr dikin, an jî dibin Elewî. Bingehê vê esas ji wir tê. Ango Îslamiyetê qebûl dikin, lê ne beşa navendî ya Sûnî, beşa Elewî ya Îslamiyetê qebûl dikin. Esas werga dibe.

Hatina Îslamiyetê li Kurdistanê qirneke nû vedike. Li ser vê mijarê di pirtûka bi navê "Bir Savaşın Anatomisi" de me hinek tişt nivîsandine. Fetulahiyan, AKP'ê û Erdogan ev meseleya ola Zerdeştî pir kirin mijara nîqaşê. Ji wê pirtûkê jî hinek hevok girtin û bi kar anîn. Heta dûvre hinek hevalan ji min re pêşniyar kirin û gotin ku em vî qismî ji pirtûkê derbixin. Min rast nedît. Ji ber ku tiştên di wir de heqîqet in. Lê dijmin vê bi kar tîne. Di tespîtên me yên wir de çi heye? Tê gotin, "Heya ola Zerdeştî li Kurdistanê hebû, Zerdeştî wekî îdeolojiyeke milî ango netewî bû. Neteweya Kurd xwe pê diparast. Wekî bingehê îdeolojiya berxwedanê bû. Her çiqas Zerdeştî ne oleke şer, oleke aştî û exlaqê ye, lê Zerdeştî bi esasî zêdetir oleke ekolojîk e. Pir girîngiyê dide ax, zindî, heywan, paqijî û duristiyê. Zerdeştî, oleke wisa ye. Kurd wekî îdeolojiyeke netewî xwe pê diparêzin. Lê Demard Îslamiyetê qebûl dikin, desthilat Împaratoriya Ereb bû û îdeolojiya wê jî Îslamiyet bû. Bi vî awayî wekî çeka îdeolojîk ji destê neteweya Kurd diçe. Fetwaya '**ji jor de were**', mecbûr e wê qebûl bike. Qebûlkirin, heman demê dibe wekî qebûlkirina dagirkeriyê. Ango sekna Kurdan a neteweyî zeîf dibe." Di pirtûkê de me ev aniye ziman. Esas rastî wisa ye. Ev tiştekî zanistî ye. Erdogan wana vê berevajî dikin.

Wekî tê zanîn, hinek meleyên Kurd bersiv dan Erdogan û gotin: "Beriya Îslamiyetê ola Tirkan jî Şamanîzm bû. Wê çaxê ma hûn jî Şamanîst in ku hûn ji me re dibêjin hûn Zerdeştî ne?" Temam, ola neteweya Kurd berê Zerdeştî bû. Wê çaxê Zerdeştî hebû û Zerdeştî wekî îdeolojiya netewî bû û civak di nav helwesteke netewî de digirt. Lê belê piştî Kurd bûn Îslam, di nav Kurdan de parçebûn hat jiyîn û mezheb çêbûn. Hinek Kurd bûn Elewî û Sûnî, hinek jî wekî Êzîdî û Zerdeştî man.

Cuda, Demard Zerdeştî bûn, Kurd û Asûrî-Suryanan tim di nav hev de jiyan dikirin. Esas Asûrî-Suryan jî wekî gelê Kurd beşek ji gelên li Mezopotamyayê jiyan kirine yên herî xwedan kok in. Bi Kurdan re jî girêdaneke wan a wisa heye. Yek jî, Îslamiyet ferqa di navbera Kurdan û Asûriyan de vedike. Di dema Zerdeştî de pir zêde cudahî nebû. Lewma di hundirê hev de jiyan kirine. Mesela, sînorê Asûriyan ne diyar e. Lê bes ku Kurd dibin Misilman, tabî Asûrî-Suryan berê bûne Xiristiyan, ew di ola xwe de israr dikin. Ji bo wê di wê derê de cudabûnek çêdibe.

Demard dibin Misilman ji gelek aliyan ve di helwesta Kurdistanî ya netewî de zeîfî çêdibe û di tebeqeya serdest de êdî hevkarî rewa dibe. Divê em vê heqîqetê jî destnîşan bikin ku,

piştî hatina Îskender û şûn de êdî bandora Zerdeştî jî lawaz bibû, hem gelê Kurd hem jî xelkê herêmê wekî ku di valatiyekê de jiyan dibûn. Bi hatina Îslamiyetê re ger Kurdan baş pêşwazî bikiran û li gorî derfetên xwe îçtihadek baş çêbikiran dikarîbûn derketineke nû çêbikin. Lê wisa nebû. Di wê lawaziya heyî de bi hatina Îslamiyetê re cardin feodal, axa û şêx derdikevin pêş.

Bi kurtahî hatina Îslamiyetê ya Kurdistanê di Kurdan de helwesta netewî zeîf kir. Tiştê ku me gotî, ev e. Yan na me negotiye, em Zerdeştî ne û filan bêhvan. Erdogan wana li ser nirxandinên di vê pirtûkê de dibêjin: "Ev methê Zerdeştiyê dikin, perwerdeya Zerdeştî didin û ne Misilman in!" Erdogan bi xwe bi taybetî di dema hilbijartinan de li ser dikan ev pir bi kar anî û wekî îşaret bi me bike got: "Ev Zerdeştî ne." Halbûkî me negotiye, "em Zerdeştî ne." Me gotiye ku ola Kurdan berê Zerdeştî bû. Di wexta Zerdeşt de, ola Zerdeştî ji bo Kurdan wekî îdeolojiyeke netewî bû. Lê dema Îslamiyet hat Kurdistanê, Kurdan nikarîbû Îslamiyetê bifetilînin helwesteke netewî. Halbûkî di civaka Kurd de bi şêwazekî samîmî oldarî bi pêş ket. Diviya oldarên Kurd Îslamiyet ne wekî tiştekî ku ji derve hatî, ji cewher ve bigirin dest û îçtihadê li gorî taybetmendiya Kurdistanê bi pêş bixin, hîn zêde ji fikir û ramana Îslamiyetê sûd bigirin û civaka xwe bi pêş bixin.

Mesela, Farisan ev wisa kir. Farisan çawa kirin? Farisan îçtihada Şîa bi pêş xist û Şîatî kirin wekî îdeolojiyeke netewî ku heta niha jî Komara Îslamî ya Îranê bi vê îdeolojiyê li ser lingan e. Farisan, bi wî awayî ji Îslamiyetê hêz girtin. Ereban ji Îslamiyetê hêz girtin. Îslamiyetê gelê Ereb di her alî de bilind kir. Piştî wê ji salên 900'an şûn de Tirk hatin. Piştî her kesî herî dawî Tirk bûn Îslam û jê îstifade kirin. Dûvre Îslamiyet qebûl kirin û vê carê gotin: "Em parêzgerên Îslamiyetê ne." Tirkan jî bi vî awayî destpêkê Împaratoriya Selçûqî, dûvre Împaratoriya Osmanî ava kirin. Tirkan xwe bi Îslamiyetê re xurt kirin. Lê Kurdan nikarîbûn bi ola Îslamiyetê xwe xurt bikiran. Ev rexneyeke li ser oldarên Kurd ên wê demê. Ev ne ji bo em pê Îslamiyetê rexne bikin, dibêjin, na. Di eslê xwe de Kurd û oldarên Kurd jî dikarîbûn wekî gelê Kurd îçtihadekê li gorî şert û mercên Kurdistanê bikin, bi wî şêwazî Îslamiyet mîna neteweyên din ji bo pêşveçûna civaka Kurd bi şêwazek rast pêşwazî bikiran.

Di vir de kêmahiyek heye. Yên Kurd, her yekî xwe xist bin baskê terîqetekê. Hinek bûn Elewî, hinek bûn Sûnî. Di nav ên Sûnî de jî wekî Henîfî, Şafiî, Malikî hinek cudabûnên din çêbûn. Ji wê şûn de, li gorî taybetmendiyên Kurdistanê îçtihadeke olî bi pêş nexistin. Vê yekê çi kir? Di sekna netewebûnê de lawazî çêkir. Tiştê me gotî ev e. Yan na me negotiye ku Îslamiyet di cewherê xwe de xirab bû; em dibêjin Kurdan wekî her kesî jê îstifade nekir û Kurd lawaz man. Neteweyên din ji Îslamiyetê îstifade kirin, xwe pê hîn xurt kirin; Kurdan jî dikarîbûn wisa bikin.

Îslamiyet, di dema derketina xwe de wekî şoreşeke mezin e. Hem di aliyê ruhî û baweriyê de, hem jî di çanda civakî de bi gelan re pêşveçûnekê çêdike. Ev rastiya Îslamiyetê heye. Lê Kurd nikarin werga jê sûd bigirin. Dibe ku hinek sûd werdigirin, lê ne tam e. Kurd li şûna wê, bi şêwazê terîqetan nêzîk dibin. Tesewûfiyê bi pêş dixin. Ev xaleke cuda ye. Mirov dikare dûvre hinekî li ser wê bisekine. Di vê çarçoveyê de em dikarin hinekî li ser Neqişbendîtiyê jî bisekinin. Ji ber ku bi rastî di heqîqeta Kurdistanê de cihê şêx û terîqetan heye. Di serhildanên Kurdan de jî cihê wan heye. Lazim e mirov li ser wê bisekine.

Cardin ku mirov di aliyê şer de li Kurdistanê bimeyzîne; di van salan de ji ber van sedemên me gotî çi guhertineke li pêş çênabe. Encex ji salên 900'an heya 1100'an, di wê neqebê de demekê serbestbûn çêdibe. Di sala 750'yan de desthilat ji Emewiyan derbasî Abbasiyan dibe. Di dema Abbasiyan de ku paytexta wê Bexdat bû, ne desthilateke pir zextkar û bi kontrol bû, hinekî nermî pêk tê. Kurd wê demê ji vê îstifade dikin û çanda xwe bi pêş dixin. Dewleta Kurd a Merwanî wê çaxê tê damezrandin. Ango ji wê atmosferê sûd digire. Heman demê li herêmê sîstema Selçûqî bi pêş dikeve.

Esas di wê demê de pir derfetên ku Kurd xwe xurt bikin, hene. Encex pir balkêş e ku, Merwanî pir zêde li ser baskê leşkerî nasekinin. Têkiliyên Kurd û Tirkan bi hev re çêdibin. Wekî tê zanîn, sala 1071'an li Malazgîrtê şerê Tirk û Rûm (Roma ango Bîzans e) tê jiyîn. Kurd di vir de destekê didin Tirkan. Di navbera wan de îtifaqek hebû. Di vê wateyê de nêzîkbûn û dostaniyek di navbera Selçûqî û Kurdan de hebû. Bi vî awayî baskên Tirk derbasî Anatolyayê dibin. Cardin Kurd vî şansê derbasbûna Anatolyayê didin wan. Ango werga asteke Kurdan a leşkerî hebû.

Mirov ji fermandarên ku di hundirê dîrokê de mohra xwe li demê xistîn çendekan bihejmêre; ji wana yek Selahaddînê Eyyûbî ye. Di wan şert û mercan de derketina Selahadîn Eyûbî, di aliyê leşkerî de bi rastî derketinek pir watedar e. Aliyê wî yê manewî û hwd. cuda ne. Encex di aliyê leşkerî de, wê çaxê êrîşên Xaçperestan (Haçlılar) hebû. Êrîşek pir berfireh bû. Pêşiyên (boy) Tirkan dixwazin li hemberî êrîşên Xaçperestan bisekinin, lê li Anatolyayê nekarîn pir zêde li hember bisekinin.

Selahaddînê Eyyûbî wekî fermandarekî, di derketina xwe de bi aqil tevgeriyaye. Ew jî fermandarekî biaqil, zekî û jîr bû. Em ê di qismê fermandariyê de hinekî behsê bikin. Selahaddînê Eyyûbî bi xwe fermandarekî Kurd bû, lê ne li ser eslê Kurdîniyê bû fermandar. Ew fermandarê Îslamiyetê bû. Selahaddînê Eyyûbî wekî Kurdekî, ji bo li hemberî êrîşên Xiristiyanan Îslamiyetê biparêze, Qudsê (Kudüs) rizgar dike. Di vê çarçoveyê de performanseke leşkerî raber dike. Rexmê ku van tiştan dibin jî, di civaka Kurd de ji derveyî Selahadîn Eyûbî, mirov nikare pêşveçûneke leşkerî ya berbiçav bibîne. Ev, di wê demê de pir dernakeve pêş.

## B) Di Serdema Osmanî û Îranê De Di Şer De Rewşa Kurdan

Piştî serdema Selahedîn Eyûbî şûn de êdî dewleta Osmaniyan (1290) li Anatolyayê bi pêş dikevin û bi Kurdan re dibin cîran. Lê Osmanî bêhtir di aliyê Balkan û Ewropa de şer dike û bi pêş dikeve. Dûvre Padîşahê Osmanî Yavûz Sultan Selîm dixwaze împaratoriya xwe ber bi rojhilat ve jî mezin bike. Dizane ku hêzeke Kurdan a şer heye. Naxwaze bi wan re şer bike, dixwaze bi wan re îtifaqê çêbike. Yavûz Sultan Selîm bi Şêx Idrîsê Bidlîsî re dikeve têkiliyê. Ji ber ku mîrên Kurdan nikarin li hev bikin Yavûz Sultan Selîm tenê bi Şêx Idrîsê Bidlîsî re peymanekê çêdike. Li gorî wê peymanê wê Kurd bac (vergi) nedin, leşkeriyê nekin û Kurd xweser bin. Lê lazim e her mîrek ji aliyê padîşahê Osmanî ve bê erêkirin. Ji bo yek bibe mîr divê padîşah erê bike. Yek jî dema şer çêbû, seferberî çêbû wê her mîrek bi hêza xwe beşdarî şer bibe. Dema wisa dibe Kurdistan dibe wekî pir herêm. Her herêmek di destê mîrekî de ye. Ew mîr dibe wekî nîv dewletê. Ji ber ku hêza xwe heye, cihê xwe heye. Feqet ne quweteke bi serê xwe şer bike.

Kurd dibin wekî quweteke alîkarên şer. Tiştekî wisa bi pêş dikeve. Mesela, şerek heye. Artêşa Osmanî vî şerî plan dike, taktîka wê datîne û ew dimeşîne; Kurd jî jê re dibin alîkar. Kurd di pêşiyê de diçin, wekî pêşeng in. Jixwe Kurd nediçûn şerê li ser Ewropa û Balkanan, Kurd tenê diçûn şerê li ser Îran, Rûsya û Misrê. Di wana de jî wekî quwetê yêdek in.

Li gorî dixuye ev yêdekbûn di Kurdan de asta şerkeriyê winda dike. Em dinêrin bi demê re di şerê Kurdan de pir lawazî çêdibe. Ango di şerê Kurdan de taktîk nîn e. Mesela dîrok diyar dike ku, Med ewqasî xurt bûn, lê niha çima ewqas lawaz in? Ev nakokî ye. Mirov salên 1800'î binêre; serhildanên salên 1800'an hene. Li wan serhildanan hemûyan binêrin, bi rastî jî tê de tu taktîk nîn e. Mesela asê dibe, diçe xwe dixe kelehê, vê carê di kelehê de asê dibe. Şer çi ye? Şer hinekî xapandin e, hinekî hîle ye. Şer ew e ku tu dijminê herî mezin jî bişemitînî, têxî xefkê ye. Di şerê bêtaktîk de zafer nîn e. Ango tên pêşber hev û li hev dixin. Her du hevdû tune dikin. Li aliyekî windahiyên wê zêde ne û ev ne serkeftin e. Kîjan serkeftin e? Terefê ku bi aqil şer dike, dijminê xwe dixe xefkê û şaş dike, bi leyîstok û bi quwetekî biçûk derbeyek

mezin li dijminê xwe dixe bi ser dikeve. Wekî din her du alî bi hev re şer bikin û zirar bidin hev, di wê de serkeftin nîn e. Şerê Kurdan jî wisa bûye. Di şerê Kurdan de bi rastî terzê şerê singe sing bi pêş dikeve. Şerê singe sing, şerê di mewziya sabît de ye. Dibe ku sedemên vê yên din jî hene. Me li jor got, li kêleka Osmanî Kurd her wekî quweta yêdek mane.

Hinek Kurd jî li aliyê Îranê dibin yêdek. Hinek Kurd şîatiyê qebûl dikin, derbasî aliyê Îranê dibin û bi Îranê re dimînin. Di dema Şah Îsmaîl de fikir û ramana Bektaşî tê Anatolya û dixwaze Kurdistanê bike terefê xwe. Lê Kurd piranî bi Osmaniyan re bûn, qismek Kurd jî bi Îranê re bûn. Jixwe Kurdistan bi Peymana Qesrî Şîrîn re (1839) yekemîn car dibe du parçe. Dîroka duparçebûna Kurdistanê di sala 1839'an de bi Peymana Qesrî Şîrîn re dest pê dike. Ew sînor heta niha heye. Sînorê niha di milê Rojhilatê Kurdistanê de heyî wê çaxê hatiye xêzkirin. Lê Îran niha dibêje: "Me di Peymana Cezayîrê de sînorê xwe sererast kiriye. Qendîl dikeve hundirê sînorê me." Ji bo vê 5–6 sal in em her bi Îranê re di meseleya sînor de di nava nakokiyan de ne. Halbûkî sînor sînorê Qesrî Şîrîn e, lê dibêje, me di Peymana Cezayîrê ya sala 1975'an de sînor guhertiye û dixwaze Qendîlê têxe hindurê sînorê xwe. Vê jî heya niha pir zêde serê me êşandiye.

Taybetmendiya din a ku mirov bibeje bûye sedem Kurd bibin quweta yêdek ev e; Kurdistan tim bûye saha şer û cengê. Ango Kurdistan tim di bin nalên hespan de hatiye cûtin. Kî li kî derê şer dike, ew der wêran dibe, li wê derê jiyan namîne, jiyan û nîzam tê de namîne. Xelkê Kurdistanê ev jiyan kiriye û jê pir zirar dîtiye, ji bo xwe biparêzin derketine çiyan. Di Kurdan de wisa koçerî pir zêde bi pêş ketiye. Mal û malbatî di nava bajaran de pir nemaye. Yên li bajaran mane teslîm bûne. Ji bo vê Kurd ji bajariyan re dibêjin "bajarî." Ango ji bajariyan pir zêde hez nakin. Kurdên bajarî wekî Kurdên teslîm bûne. Ji ber ku yê teslîmî wan artêşan nabin derdikevin çiyê. Di dema artêşên Roma, Osmanî û Îran-Safewî de her wisa bûye. Kurdistan, erdnîgariya ku lê cih digire, Asya û Ewropa bi hev ve girê dide, Asya û Afrîka bi hev ve girê dide. Rêya Îpekê û Baharatê di Kurdistanê re derbas dibe. Ango Rêya Îpekê ji Ewropa tê û diçe Asya; rêya Baharatê ji Kafkasya tê û diçe heta Afrîka. Welhasil riyên stratejîk di Kurdistanê re derbas dibin. Di vê wateyê de rewşeke Kurdistanê ya jeo-stratejîk heye.

Ji bo vê jî kîjan dewletê xwestiye di Rojhilata Navîn de hakim bibe, çav berdaye Kurdistanê. Ev îro jî wisa ye û di dîrok de jî wisa ye. Ji bo vê gelek caran Kurdistan bûye erdnîgariya şer, bûye saha şer. Însanê Kurd di şer de pijiyaye. Lewre du aliyên xwe çêdibin. Di aliyekî de şerkerî bi pêş dikeve, di aliyê din de jî ji ber şer rev, xwe veşartin, derketina çiyê bi pêş dikeve. Kurdan ji ber şerekî bi sîstem nemeşandine yan wê têkevin şer û xwe biparêzin, an jî wê bibin quweta yêdek.

Di Kurdan de ji ber vê erê şerkerî bi pêş dikeve, lê stratejî û taktîka şer bi pêş nakeve. Sedema wê ya herî mezin, meseleya şer meseleyeke aqil e, dewlemendiya zekaya mirov e. Lê Kurd, ji hilweşîna Pers û vir ve êdî nabin serokên şer, li kêleka fermandarên şeran dibin yêdek. Dema ev rewş bi sedsalan dom dike, Kurd ji aqilê şer dûr dikevin, tenê bi pratîka wê re mijûl dibûn. Ango Kurd êdî nabin serê şer, dibin bedena şer. Ji ber ku her tim li kêleka artêşeke cuda dibin yêdek. Fermandarê wê artêşê strarejiya şer datîne, planê diyar dike, taktîkan çêdike û Kurd jî li kêleka vê planê dibin quweta êrîşê yan jî pêşengtiyê. Lê di beşa aqilê vî karî de Kurd cih nagirin. Dema ev bi sedsalan wisa dom dike, xuya dibe ku Kurd êdî şer wekî karekî aqil nabînin; wekî tiştekî beden û fizîkê dibînin. Li ser şer aqilê xwe zêde naêşînin.

Di hundirê dîrokê de em dibînin di însan de li gorî pêwîstiyan qabiliyet bi pêş dikeve. Der heqê şer de Kurd ne beşdarbûna bi aqil, beşdarbûna bi cesaret wekî pêwîstiyekê dibînin. Ji bo vê di Kurdan de cesareta şer heye, lê aqilê şer nîn e. Aqilê şer bi pêş neketiye, lê cesaret bi pêş ketiye. Ji ber ku Kurd stratejiya şer çênakin, li gorî stratejiya amade beşdarî şeran dibin. Ew jî şerkeriya Kurd dike şerkeriyeke ne temam û nîvçe. Çima? Ji bo şerkeriyeke tam aqil û cesaret pêwîst e, lê di şerkeriya Kurd de aqil kêm e, cesaret zêde ye. Ji bo vê jî di stratejî

û taktîka şer de Kurdan tim winda kiriye. Bi esasî stratejî û taktîka şer zêde bi kar neanîne. Lewre şerkeriya Kurd yek alî ye, wekî mirovê bi yek lingî ye. Dixuye ku di hundirê demê de wisa pêşketin çêbûye; rexmê Kurd bi cesaret in, li kêleka artêşên mezin serkeftî ne, gelek xelat girtine, lê dema bi tena xwe û bi serê xwe li hemberî dewletekê yan jî kesekî şer kirine bi heman şêwazî ne serkeftî ne, piranî binkeftî ne. Analîza vê yekê mirov encex dikare wisa bike.

Di şerê Kurdan de cesaret û şerkerî heye, lê stratejî nîn e, taktîk nîn e, bername nîn e. Ango wî şerî bibe kî derê, çawa bigihîne encamê; ev nîn e. Di vî milî de bi hindik qenaetkirin heye. Mesela, her mîrê li ser herêma xwe mîrîtî di destan de heyî vê bes û têr dibîne. Mezinbûnê zêde nakin hedefa xwe. Ji ber vê sedemê hemû serhildanên di sedsala 19. de têk diçin. Ji ber ku leşkerbûna Kurd, wekî leşkerbûna yêdek e. Rolek wisa leyîstine, wisa şekil girtine. Di taktîkê de kûr nabin. Lewre serhildanên Kurdan pir bi paş de ne. Şêwazên xwe sengerên sabît in, kelehên sabît in, şerê meydanê ye. Dijmin bixe valatiyê, bixapîne, xwe xurt bike, xwe mezin bike; ev tişt tune ne. Nêzîkbûneke rasterast heye.

Ji bo vê yekê di Kurdistanê de egîd pir in, zehf egîd hene, lê fermandarên muzafer tune ne. Fermandarên mezin di nava Kurdan de çênebûne, lê egîdên mezin çêbûne. Fermandarekî mezin ê wekî Selahadîn Eyûbî îstisna ye, ew cuda ye. Ji ber ku Kurdan stratejî winda kiriye. Ji bo vê jî taktîsyen bi pêş neketiye. Egîd herêmî ne. Piranî egîd xwedî taybetmendî ne. Egîd tenê ne şerker in, heman demê li hemberî neheqiyê derketine, xelk parastine. Mesela, egîdê kîjan eşîrê hebe, wî egîdî hemû eşîr parastiye. Egîdên Kurdan qefleyên heciyan ta birine Hecê (Mekeyê) û anîne. Wilo kesên qehreman in, di ber xelkê de jî bi awayek ferdî şer kirine. Egîd bi tena xwe ne. Dibe ku çend hevalên xwe hebin, lê ne fermandar in. Ji bo vê jî di egîdiyê de zafer nîn e. Egîd şer dike heta rojekê di şerekî de, yan jî li cihekî bimire. Lê bes bi qehremanî şer dikin. Destanên Derwêşê Evdî û Teyar nimûneyên egîdan in. Egîdên wisa hebûn û gelek egîd ji nava Kurdan derketine. Lê bi şiklekî jiyana xwe di şer de ji dest didin. Ango bi qehremanî şer dikin, bi soza xwe ve girêdayî ne, şerker in, lê ne fermandarên mezin in. Di Kurdistanê de ev bi pêş nakeve.

## C) Di Serhildanên Sedsala 19. De Rewşa Şer

Di destpêka sedsala 19. de li Kurdistanê dema serhildanan dest pê dike. Di wan serhildanan de li ser navê taktîkê tiştek nîn e. Mesela yê herî jîr û serkeftî, Bedirxan Beg e. Di taktîk de zêde ne hakim e, di polîtîkayê de xurt e, lê cardin hinek şaşiyan dike. Yek jê jî, biraziyê wî Yezdanşêr îxanetê li wî dike. Pir balkêş e, wekî dubarebûna Harpagos e. Hûn dizanin Yezdanşêr çima îxanetê li Bedirxan Beg dike? Xalê Yazdenşêr heye, li Cûdî Girê Çolî dimîne. Bedirxan Beg jî jixwe li Şaxê rûdine. Navenda Mîr û keleha wî li wir e. Xalê Yezdanşêr tim bi derên din re têkilî çêdike. Bedirxan Beg diçe ser xalê Yezdanşêr û wî ceza dike. Yezdanşêr, dûvre dibe fermandarê eniyê û li Mêrdînê şer dike. Osmanî ji Yezdanşêr re navbeynkar dişînin û dibêjin, "binêre, mamê te Bedirxan Beg xalê te kuşt. Ma tu ji bo çi jê re bûyî fermandar? Were bi me re bibe yek. Em ê li şûna Bedirxan Beg te bikin mîr." Wê çaxê pêwîst bû Osmaniyan mîrîtiya kesekî erê bikira. Li gorî peymana Idrîsê Bidlîsî Osmanî mîrîtiya kesekî erê dikin û dibêjin, "em ê mamê te Bedirxan Beg daxin, li şûna wî te bikin mîr." Yezdanşêr jî wisa îxanet dike. Tenê ew bi xwe îxanet nake, tevî leşkerên xwe diçe aliyê dijmin.

Bedirxan Beg wê çaxê li eniya Wanê ye. Ji ber ku di du eniyan de şer heye. Li eniya Wanê dibihîse ku biraziyê wî Yezdanşêr îxanet kiriye. Lê dixe heya tê Cizîrê, xeber jê re tê ku eniya wî ya Wanê jî şikestiye. Moralê wî dikeve, mecbûr dimîne li Cizîrê li ber xwe bide. Bedirxan Beg ji ber dorpêç dikin nikare xwe biparêze. Tên heya Ewrexê. Ewrex jî havîngeha Bedirxan Beg e, ango gundê wî yê din jî Ewrex e. Herî dawî li Ewrex di Korqendîl de li ber xwe dide, dûvre bi Osmaniyan re peymanê çêdike. Ango neçar dimîne teslîm bibe û peymanê çêdike.

Osmanî li gorî wê peymanê Bedirxan Beg û 200 kesan jî wekî ewlekariya wî dişînin girava Malta. Mîrê herî jîr Bedirxan Bêg e. Xuya ye Bedirxan Beg di taktîk de hinekî bi pêş ketiye. Ji ber ku keleh çêkirine, leşker çêkirine. Cardin li gorî qisetên ku me li Botanê bihîstî ne û yên me ji pirtûkan xwendiye dibêjin, herî dawî li Ewrexê di Korqendîl de li ber xwe dide. Osmanî wê çaxê topan tîne. Topan li Ewrexê datînin û ji wir davêjin Korqendîlê. Gava topê davêjin, Bedirxan Beg fermandarên xwe kom dike û dibêje, "em çawa bikin? Top jî anîne hemberî me."

Topa wê çaxê jî ne wisa pêşketî ye, ango wekî niha bi bandor nîn e. Cardin jî dema top tê avêtin, ev jî dibe sedemek ku biyar bidin daxwaza dewletê pêk bînin. Di heqîqetê de êdî hatibûn dawiyê, ji ber ku di eniyên girîng de şikestibûn. Ji wê qonaxê şûn de tiştekî ku bikin pir zêde nemabû. Ji bo vê lihevhatin qebûl kirin û teslîm bûn. Hemû serhildanên din jî wisa ne. Ango di kelehekê de asê bûne, ne taktîk tê de heye, ne terz tê de heye. Dijmin jî hatiye pê re şer kiriye heya cebilxaneyê xwe nemaye û teslîm bûye, yan jî dijmin hemû qetil kirine. Ango di şer de zêde taktîk û stratejî nîn e. Şerê Kurdan şerê eniyê ye. Heta li Botanê di şerê navbera eşîran de jî wisa şerê eniyê û şerê mewziyan hatiye kirin.

Di şerê Kurd de şêwazekî singe sing şerkirinê heye. Ango ew leyîstokên şer e ku tê wateya hunera şer pir zêde nîn e. Çîniyan nivîsandiye ku, lazim e tu dijminê xwe têxî xefkê, bixapînî û wisa wî bixî. Tu dijminê xwe xafil bikî û derbeyê lê bixî. Di nava Kurdan de ev nîn e. Şerê Kurd şerekî feodalî ye. Di şerê Kurdan de huner nîn e, sebir û xapandina dijmin nîn e; şerekî rasterast heye. Bi vî şêwazî mirov nikare dijminek mezin bi bin bixe. Kurdan wisa şer kiriye. Lewre ev ne taktîk e.

Çima em wisa dibêjin? Ji ber ku dûvre em ê bînin ziman ku bandora vî şêwazî heya niha jî li ser civaka Kurd heye û li ser me jî heye. A niha jî heye, hîn didome. Ev şerê sabît, şerê singe sing, şerê mewziyê bandora xwe hê jî li ser me heye. Ev tiştekî psîkolojîk a civakî ye û tiştekî ruhî ye. Halbûkî di şer de hîle û xapandin pêwîst e. Taktîk ev e. Jixwe taktîk dek û dolap e, hîle û xapandin e. Di şerê Kurdan de ev tune ye. Serhildêriya gundîtî heye. Kurd şerê xwe di serhildanan de raber kiriye. Di serhildanê de jî şerê Kurdan di vê çarçoveyê de bi pêş ketiye.

Der heqê şerê Kurd û Kurdistanê de, bi taybet jî şerê di salên 1800'an de ketiye pratîkê me vegot. Di wê demê de di şer de paşketinek heye. Di şêwazê şer û taktîkê de tengasiyek heye. Kurd bêhtir şerê singe sing û şerê eniyê dimeşînin. Serhildanên xwe di kelehan de dikin û di wir de asê dibin. Terzeke wisa li Kurdistanê dimeşe. Yek ji sedema şikestina serhildanên Kurdan ev e. Taktîkê şer tune ye, wekî quweta yêdek tên bikaranîn. Kurd bi xwe ji pozîsyona bûyîna stratejîst û taktîsyen derketin. Li kêleka artêşan çûne şer, çi pêwîst be, kirine. Di şer de di warê aqil de bi demê re jibîr kirine, ango bi sedsalan şer ji rojeva wan derketiye. Kurd bi xwe taktîk diyar nake. Artêşên taktîk diyar dikin hene, Kurd jî tevî wê artêşê şer dike. Di wir de çi rol ji Kurdan re bê dayîn, wê rolê dileyîzin.

Lewre di şerê Kurdan de terzekî li gorî xwe nîn e. Rast e êrîş heye, lê ev şerekî singe sing e. Ji bo vê pir zêde fermandarên xurt û serkeftî ji nav Kurdan derneketine. Fermandar bi artêşa xwe dibe fermandar. Di nava Kurdan de artêş ava kirin zêde nîn e. Ger serhildanên salên 1800'î şikestibin, yek sedema vê ya bingehîn avanekirina artêşê ye. Helbet ne ev tenê ye, lê yek ji sedema esasî ev e. Heman demê serhildanên piştî parçebûna Kurdistanê bi pêş ketine, mirov dikare ji bo wan jî heman tiştê bibêje. Di wê navberê de hinek pêşveçûn jî di nava civaka Kurd de tên jiyîn. Ango wisa dûz naçe, guhertin çêdibe. Berî her tiştî pêwîst e mirov vê bibêje: Rast e. Di sîstema Osmanî de Kurdistan wekî xweser e. Ev xweseriya em niha li ser dewleta Tirk ferz dikin di wextê Osmaniyan de ne tam be jî, wekî nîv xweserî hebû. Feqet mîrên Kurdan ji aliyê padîşahê Osmanî ve dihatin erêkirin. Em bêjin mîrê Amediyê ji aliyê padîşah ve tê erêkirin, lê ew mîr bi xwe bacê kom dike, leşkerên xwe saz dike, bi xwe herêmê bi rê ve dibe. Dewlet cuda pê re mijûl nabe. Wexta ku şer di aliyê Rojhilata Navîn de be, ew mîr jî tevî leşkerên xwe beşdarî şer dibe. Wisa ye. Feqet Osmanî

çawa dike? Gelek caran bav dimire, wê kîjan kurî bike mîr? Li gorî kevneşopiyan lazim e yê mezin bibe mîr. Osmanî wisa nake. Carina wana berdide hev, an jî zarokên mîr nakin mîr. Kur mamê wan dikin mîr. Wisa hemûyan berdide hev û li hemberî hev dike dijmin. Ev sîstema diyarkirina mîr, di nava sîstema mîrîtiyê de zêde cudakarî û hîlekariyê bi pêş dixe û dilekî noker bi pêş dixe. Em bêjin ji malbatê hinek diçin bi padîşah re têkilî çêdikin, ji bo terfiya mîr jê re were. Ev jî civakê xira dike. Ji ber ku vana kesên di civakê de li pêş in. Kesên di civakê de wisa li pêş, gava cudakarî û hîlekarî di nava wan de bi pêş dikeve bandora xwe li ser civakê jî dike. Lewma Kurd gelek caran komployê li hev dikin. Komlogeriya feodal ev e. Di Kurdistanê de komplogeriya feodal bi nav û deng e. Ev hemû ji ber sîstema Osmanî derdikeve pêş. Li milekî texrîbateke wisa çêdibe.

Di civaka Kurd de mîr li pêş in. Sîstema mîr wekî pêşengê civakê ye, şêx jî wekî pêşengê ruhanî ye. Lê yê xwedî biryar û rêberiyê dike, mîr e. Piştî ku mîrên sereke yên wekî Babanzade, Bedirxan Beg û hwd. serkêşiya serhildanê dimeşînin û bi bin dikevin, hem mîr ji çavê civakê dikevin, hem jî Osmanî ji bo wan bêrûmet bike, bi ser wan de diçe. Bi taybetî di dema Sultan Ebdulhemîd de mîrên ku di pêşxistina Alayên Hemîdiye de cih girtine û wekî artêşa Hemîdiye tevgeriyane, di Kurdistanê de rol û mîsyona mîran zeîf kirin. Ji bo vê jî hêza mîran di nava civakê de pir lawaz dibe. Di vê rewşê de şêx hîn zêde dikevin pêş.

Berê Osmaniyan pêwîstiya xwe ya leşker ji Ewropa dabîn dikir, leşkerên xwe ji Balkanan dianîn. Yûnan, Yugoslav û hwd. hemû di destê Osmaniyan de bû. Zarokên 5-6 salî hîn dê û bavê xwe nas nakin dianîn, bi xwe mezin dikirin. Leşkerên Yenîçerî wisa ava dikirin. Osmanî leşker û bac ji wir digirt, wir talan dikir. Xezîneya wan ji wir dihat. Lê di salên 1800'an de xelkê Balkanan li ser esasê kapîtalîzma li Ewropa bi pêş ketî, ruhê millî –ez ji bo netewî gotina millî jî bi kar tînim- bi pêş ve çû. Mesela kapîtalîzmê burjuwabûn, netewebûn û millîbûn bi pêş xist. Vê bandora xwe li ser Balkanan çêkir. Balkanan li hemberî Osmaniyan di hundir de serî hildan, neçûn leşkeriyê, reviyan, zarokên xwe veşartin û li ber xwe dan. Xelkê Balkan bi bandora Ewropaya Rojava li hemberî Osmaniyan ketin şer.

Gava sal gihîşt 1840'an aboriya Osmanî jî xira bû, li aliyê din nema dikarîbûn leşker jî bigirtana. Osmaniyan nikarîbûn ji Balkanan leşker bigirin. Osmanî neçar ma ji bo aboriyê bi Îngiltere û Fransa re ket têkiliyê û ketin bin deynan. Jixwe wan jî di bin re piştgirî didan tevgera millî ya Balkanan. Di warê malî de Osmanî tengav bû, li hêlekê jî leşkerên Yenîçerî li serê wan bû bela. Yenîçerî jî car caran li hemberî rejîmê serî hilda. Yenîçerî di dil xwe de leşkerê taybet ê Osmanî bû. Ji bo vê hinekî guhertin çêkirin, Fermana Tanzîmatê derxistin. Di artêşê de guhertin çêkirin, Yenîçerî rakirin, Nîzamî Cedît ava kirin. Ango hinek guhertin di Osmaniyan de çêbû, heman demê sîstema xweseriya Kurdistanê jî guhertin. Çawa? Gotin, “êdî em ê ji Kurdistanê jî leşker bigirin û bacê kom bikin.” Vê carê mîran qebûl nekir. Ji ber ku raya mîran ji destê wan dihat girtin. Ji bo vê di navbera Osmanî û mîran de pirsgirêk derket. Lê berê dostên hev bûn. Mîran serî hilda û serhildanên wan şikestin. Ji ber ku taktîk û terzê wan tune bû, yekîtiya xwe çênekiribûn serhildanên mîrên Kurd şikest.

Îcarê Şêx derxistin pêş. Şêx çawa derket pêş? Di nava Yenîçerî de Bektaşî hebûn, di nava Ereban de jî mezheba Wahabî hebû. Hem mezheba Wahabî li dijî Osmanî bû, hem jî Bektaşî dem bi dem li dijî Osmaniyan derdiket. Mesela padîşahek derdiket ser textê, Yenîçeriyan qebûl nedikir û digot, “em naxwazin”. Ango tê de komplogerî çêdibû. Welhasil Yenîçerî bû bela serê wan. Mezheba wan jî Bektaşîtî bû. Mesela, di destpêka salên 1800'yan de kesekî Kurd bi navê Xalid Bexdadî, ku carina jê re dibêjin “Mewlana Xalid”, yekî ji Koysancak e, ji eşîra Caf heye. Bi Xalid Bexdadî re hestên Kurdewarî hene. Di yekemîn serhildana Kurd a sala 1806'an de, ku Abdulah Babanzade li Koysancakê dest pê kir; wê çaxê ew li wir e, temaşe dike û emrê xwe dor 17–18 salî ye. Çawa artêş tê Kurdistanê, serhildanê dipelixîne û Kurd çawa nikarin ji bin derkevin, dibîne. Ji vê re şahidiyê dike. Xuya ye Mewlana Xalid dixwaze bibe yekî mezin û li pêş. Lê rêya netewî tercîh nake, riya ol esas digire.

Diçe Hindistanê, li wir dixwîne û diçe gelek deveran, xwe di ol de pir bi pêş dixe. Gava ji Hindistanê vedigere û tê, li Kurdistanê terîqeta Neqişbendî bi pêş dixe. Lê li Koysancaqê terîqeta Qadirî heye. Terîqeta Qadirî nahêle terîqeta Neqişbendî li Kurdistanê bi pêş bikeve, Mewlana Xalid diqewitînin. Dema ji herêmê tê derxistin, ji ber eşîra Caf jî Qadirî ye lê xwedî dernakeve. Ew jî diçe xwe davêje bin baskê paşayê Bexdayê. Paşayê Bexdayê ji bo însanan perwerde bike jê re medreseyekê vedike. Ji bo vê navê Xalidê Bexdadî lê dikin. Dûvre ew mezin dibe ango di wê medreseyê de pir kesan perwerde dike. Dûvre li Şamê jî medreseyê vedike. Osmanî dinêre ew terîqeta Neqişbendî heye, li aliyê din terîqeta Bektaşî heye, ew jî li dijî wî ye. Lewma Osmanî dibêje, eem pêşiya terîqeta Neqişbendî vekin, ji ber ku Neqişbendî li dijî Bektaşî ye." Lewma Osmanî piştevaniyê dide terîqeta Neqişbendî.

Neqişbendîtî fireh dibe, dikeve nava artêş û dewleta Osmanî. Bi vî awayî Neqişbendî li Kurdistanê belav dibe, dûvre jî dikeve Tirkiyê. Niha jî wisa ye. Terîqeta Neqişbendî di bingeh de ji aliyê Kurdekî ve bi pêş ketiye, lê pir kesên ji nav AKP'ê û hwd. girêdayî terîqeta Neqişbendî ne. Welhasil piraniya şêxên li Kurdistanê Neqişbendî ne. Neqişbendîtiyê divê mirov rast deyne, ji ber ku hinek hevalan şaş fêm kiriye. Beriya demekê vê mijarê serê me pir êşand. Yanî vê mijarê şaş şîrove dikin. Rast e, Osmanî ji bo berjewendiyên xwe rê ji terîqeta Neqişbendî re vedike. Neqişbendîtî hem di nava Kurdan de heye, hem jî di nava sîstema Tirkiyê de heye. Feqet ev nayê wê wateyê ku Neqişbendî Kurdan dike Tirk, an jî Kurdîtiyê jibîr dike. Na. Di serhildanên li Kurdistanê de çêbûye. Mesela serhildana Şêx Seîd Neqişbendî ye, Barzanî Neqişbendî ye û di serhildanan de Nexşîbendiyan cih girtiye. Ji ber ku şêxên Neqişbendiyan tenê bi ol re mijûl nabin. Xwe dikin desthilat, xwe xurt dikin. Taybetmendiya vê terîqetê wisa ye. Şêxên wê xwe xurt dikin. Ji bo vê ev terîqet li Kurdistanê xurt bû.

Li Kurdistanê terîqeta Qadirî jî heye, lê Neqişbendî hîn xurtir bi pêş dikeve. Di sedsala 19. de dema serhildanên di pêşengtiya mîran de bi ser nekeftin, şêx derketin pêş. Di rastiyê de Osmanî jî girîngiyê dide şêxan. Ji ber ku di her eşîrê de mîr heye û şêx heye. Berê mîr pêşengên sereke yên siyasî ne û şêx jî pêşengên îdeolojîk in. Wisa dibe ku ev pêşengê îdeolojîk dibe pêşengê siyasî jî. Ango şêx dibe hemû tişt.

Hem di wexta Osmaniyan de, hem jî piştî parçebûna Kurdistanê gava di civakê de pirsgirêk çêdibin, şêx pêşengtiyê dikin. Dibe ku hinek bêhemdî dikevin nav pirsgirêkên civakê, hinek jî bi hemdê xwe dikevin nav pirsgirêkên civakê. Ev ji pirsgirêkên civakî re pêşengtiyê dikin. Ji bo vê em bêjin, "terîqeta Neqişbendî bi temamî ne welatparêz e", ev dibe tespîteke şaş. Rast e, yên hevkariyê ji dijmin re dikin tê de hene. Lê hîn di destpêkê de Mewlana Xalid xwediyê hin taybetmendiyên Kurdewarî ye. Xuya dibe ku dinêre tenê bi Kurdayetî çênabe. Ji bo vê terîqetê esas digire û xwe xurt dike. Rexmê ku Osmanî ji bo li hemberî terîqetên din bi kar bîne pêşiya Neqişbendîtiyê vedike jî, li hemberî Mewlana Xalid tirsa xwe heye. Ji ber ku ew yekî Kurd e. Wexta Mewlana Xalid dimire şûn de Osmanî alîkarê wî dawetî Stenbolê dike û wî wekî qralekî pêşwazî dikin. Gava alîkarê wî diçe, jê re merasimekê çêdikin. Jixwe wê çaxê Mewlana Xalid miriye. Ya girîng, Neqişbendî dibe terîqeteke herî li pêş. Hîn jî di jiyana Tirkiyê de û di Rojhilata Navîn de bandora xwe heye.

Di serhildanên sedsala 19. de serhildana herî dawî serhildana Şêx Ubeydûlah (1891) e. Ev serhildan yekemîn serhildana di pêşengtiya şêxan de hatî birêxistinkirin e. Şêx Ubeydûlah li Şemzînanê ye. Li wir tevgerê saz dike. Şêx Ubeydûlah cudatiya xwe ev e; dixwaze wekî tevgereke millî be û xwe li her du parçeyan -wê çaxê Kurdistan du parçe ye- birêxistin bike. Bi vî awayî li aliyê Rojhilatê Kurdistanê jî xwe birêxistin dike, li aliyê Bakur û Başûrê Kurdistanê jî xwe birêxistin dike. Feqet dûvre Osmanî û Îran li hev tên û tevgera Şêx Ubeydûlah dişkînin. Ango nahêlin tevgera wî pir mezin bibe û tevgera wî dişkînin. Ev wekî serhildana Şêx Ubeydûlah a destpêkê ye. Piştî wê êdî di Kurdistanê de Şêx zêdetir di dewrê de ne.

Bûyera din ku esas em dixwazin vekin ev e: Dewleta Osmanî sîstemeke nû dide ber Kurdan. Ango xweseriyê radikin. Kurd jî vê qebûl nakin û dem bi dem serî hildidin. Lewma Osmanî dixwaze sîstemeke nû ya wekî cerdevanan bi pêş bixe. Bi taybetî wê çaxê Sultan Ebdulhemîd li ser desthilatê ye. Sultan Ebdulhemîd di nava sultanên Osmanî de Sultanê herî qurnaz e. Ebdulhemîd pir xasûk û qurnaz e; di dîrokê de bi qurnaziya xwe tê nasîn. Di dîroka Tirkiyê de jî wisa tê nîşandan. Rexmê Osmanî di dema xwe ya serberjêrçûnê de bû û her diçû di eniyan de der dida û xelkê li hemberî wan serî hildida, ango di rewşeke xirab de bûn, Sultan Ebdulhemîd bi qurnaziya xwe, bi fen û siyaseta xwe Osmanî dida jiyîn. Di navbera Îngiltere û Fransayê de diçe û tê. Dûvre bi Almanan re têkiliyê çêdike. Hem siyaseta derve, hem jî ya hundir bi fen û dolaban dimeşîne. Sultan Ebdulhemîd şexsiyeteke wisa ye, lewma desthilata wî 32 salan ajotiye.

Sultan Ebdulhemîd dibîne ku Kurd ne razî ne û car caran serî hil didin, lewma bi hinek mîrên Kurdan re rûdine. Sedema mîr di Kurdistanê de bandora xwe winda dike yek jê ev e. Ji ber ku berê di Kurdistanê de mîr pir bibandor bûn. Erê di serhildanan de şikestin, lê bi Ebdulhemîd re lihevkirina hinek mîr û reîsên eşîran bandora wan bi temamî dişkîne. Ebdulhemîd gazî hinek mîran dike, hemû qebûl nakin û hemû mîrên Kurdan bi Sultan Ebdulhemîd re narûnin. Hinekî bi navê mîran ev tişt hatiye qebûlkirin. Ebdulhemîd dibêje: "Bi min re bin, ez selahiyetê bidim we, çek bidim we, lê bi navê min bin." Sultan Ebdulhemîd li Kurdistanê artêşa Hemîdiye ava dike û Alayên Hemîdiye li Kurdistanê ava dibin. Hinek Kurdan dike mîralay, hinekan dike qeymeqam. Ev dîsa sîstemeke xweser e, lê bi vî şêwazî xweseriya Kurdan tê bihurandin û lawaz dibe. Ji ber ku bi rêya sîstema leşkerî bi hikûmeta navendî ve tê girêdan. Ya din jî ev sîstem nokeriyê bi pêş dixe. Mesela qeymeqam Kurd e, mîralay Kurd e, lê hemû bi navê Ebdulhemîd in. Heman demê ev sîstem di nava eşîrên Kurdan de şer bi pêş dixe û civaka Kurd ji hal dixe. Her kesî li hemberî hev dike dijmin û plana Ebdulhemîd bi vî awayî di Kurdistanê de ruhê netewebûn û yekbûnê ji binî ve xira dike. Di nava civakê de dijminatî û nokeriyê bi pêş dixe.

Ebdulhemîd dûvre bi Alayên Hemîdiye tiştekî din jî dike. Sultan Ebdulhemîd berê Alayên Hemîdiye dide Ermeniyan. Mirov dikare bibêje ku mîr û reîsên eşîrên Kurdan yanî giregirên Kurdan du caran şaşiyên girîng dikin. **Şaşiya yekê;** di wexta Bedirxan Beg de, ji encama leyîstoka Konsolosa Îngilîzan hinek Nastûrî-Asûriyan êrîşî Kurdan kirin. Bedirxan Beg jî muqabilî wê çû ser Geliyê Tiyarê. Wê çaxê li herêma Oremarê Asûrî û Suryan hene. Jixwe Oremar têgîneke bi Asûrî ye. Wê wextê Bedirxan Beg diçe ser navenda Asûrî û Suryaniyan û kuştinan dike. Ev şaşiyek bû û li wir hat leyîstokê.

**Şaşiya diduyê jî;** mîr û reîsên eşîrên ku ketibûn nav sîstema Alayên Hemîdiye, dema dewleta Tirk biryara qirkirina Ermeniyan da, ew jî bi qismî tevlî bûn. Ne hemû, lê cih cihan ev Kurdên di Alayên Hemîdiye de hatin bikaranîn. Ev Alayên Hemîdiye jî beşdarî talankirin û pelixandina gundên Ermeniyan kirin. Niha divê mirov neheqiyê neke. Ev tişt bi însiyatîfa Kurdan pêk nehatiye; bi biryara Osmaniyên Îttîhad Teraqî hatiye kirin. Osmanî ferman daye wan, ew jî di bin destê Osmaniyan de bûn. Rast e Kurd jî li wir hatine bikaranîn û yên xirabî kirine, hene. Lê li hinek cihan jî Kurdan Ermenî parastine. Mesela hemû Ermeniyên çûne Dêrsimê hatine parastin. Heta xelkê Dêrsimê ji bo Ermeniyan nedin Tirkan, şer jî dane ber çavên xwe û li gelek cihên din jî malbatên Ermeniyan ji aliyê Kurdan ve hatine parastin. Xelkê Kurd û Ermen her tim bi hev re jiyan kirine. Tu pirsgirêk di nava Kurd û Ermenan de nîn e.

Feqet Alayên Hemîdiye wekî cerdevanan ji aliyê Osmaniyan ve hatine bikaranîn û hinek cihan li dijî Ermenan hatine şixulandin. Ev jî heqîqeteke dîrokî ye. Lê ev ne helwesta giştî civaka Kurd e. Ev nêzîkbûna hinek kesên bûne cerdevan û hatine bikaranîne. Şaşiya hinek mîr û serokeşîrên Kurdan a duyemîn jî ev e.

## D) Di Serhildanên Sedsala 20. De Rewşa Şer

Dema împaratoriya Osmanî hilweşiya û Fransa û Îngiltere hatin herêmê, nexwestin Kurdistan bibe welatekî serbi xwe. Bêguman bandora Selahadîn Eyûbî, piştre bandora kuştina însanên mesîhî hebû. Hem li Colemêrgê di kuştina Nastûrî-Asûriyan de, hem jî di bûyera Ermeniyan de derbasbûna navê hinek Kurdan wêneyeke ku Kurd li dijî mesîhiyan e, çêkiriye. Ango Kurd wisa hatin naskirin ku heçku li dijî mesîhiyan in. Hinek nêzîkbûnên wisa şaş bûn sedem ku li Ewropa li dijî Kurdan gelek propaganda bên kirin. Wê çaxê rojnamevanî li Ewropa nû bû û hemû kesî dişopand. Gelek rojnameyan manşet avêtin ku Kurd Xirîstiyanan dikujin. Kurd wekî însanên hov û qatil dihatin raberkirin. Van hemû tiştan ji bo Kurdan di raya giştî ya Ewropa de dijberiyek ava kir. Dewletên Ewropa jî ji bo armancên xwe yên emperyal ev nêzîkbûna raya giştî bi kar anîn, Kurdistan parçe kirin û parve kirin. Ev wekî tolhildan û cezakirinê ye. Di nîqaşên Lozanê de heta rojên dawiyê jî wezîrê Îngilîz Lord Curzon (Kurzon) avakirina Kurdistanê diparêze. Piştre Îngiltere û Fransa helwesta xwe guhertin, li ser çar beşan parçekirina Kurdistanê qebûl kirin.

Heya beriya vê biryara Lozanê Ataturk û rayedarên Tirkan hem soz didan, hem jî difikirîn ku gelê Kurd di hundirê Tirkiyê de xweser bin. Piştî vê biryara Lozanê Tirkan jî sozên dabûn Kurdan pêk neanîn û siyaseta înkarê ya heta roja îro berdewam dike, di sala 1924'an de bi destûra bingehîn xistin bin biryarê. Ji ber vê mirov dikare bibêje, înkar û mêtingeriya li ser Kurdistanê bi esasî ne biryara dewletên îro mêtingeriyê li ser Kurdistanê dimeşînine. Xwediyên vê biryarê Îngilîz û Fransiz in ango Ewropa ye. Vana Kurdistan înkar kirin, rê li jenosîda li ser Kurdistanê vekirin. Ji ber vê yekê di trajediyên li Kurdistanê jiyan bûne de berpirsyariya Ewropa pir zêde heye.

Dema Îngiltere û Fransa hatin Stenbolê (1918), piranî rewşenbîrên Kurdan jî li derdora Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê civiyabûn. Wê çaxê rewşenbîrên Kurd pir zêde di bin bandora sîstema aqilê Osmanî de bûn. Piraniya wan di dibistanên Bab-i Alî de perwerde dîtibûn û bi çavê Osmaniyan li dinyê dinêrîn. Ji bo vê jî nêzîkbûnên serbi xwe pir zêde bi pêş nakeve, zêdetir nêzîkatiya hevkariyê li pêş e. Ango hewl didin Îngilîz û Fransiz mafê wan bide û serxwebûna Kurdistanê ava bikin. Îngilîz û Fransa her vê sozê didin wan, hêviyê bi wan are çêdikin, wana mijûl dikin û piştre jî li keştiyên xwe suwar dibin û diçin. Di nîqaşa Lozanê de jî durûtiyeke mezin dikin û li van sozên xwe xwedî dernakevin. Lewma ew Kurdên di dibistana Osmaniyan de xwendîn -ku mirov nikare ji wana re bibêje "rewşenbîr"- xwe dixapandin û vala hatin derxistin. Siyaseta Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê û siyaseta mijûlkirina Îngilîzan rê neda ku Kurd di salên 1920'an de ji valatiya heyî sûd bigirin û ew jî serxwebûna xwe bi dest xwe bixin.

Kurdên guh dan banga Ataturk, di kongreyên Erzirom, Sêwas, Amasya de amade bûn û bi Ataturk re tevgeriyan, ew jî hatin mijûlkirin û xapandin. Wekî me li jor anî ziman, Ataturk piştî ku dît di Lozanê de Îngilîz û Fransa siyaseta înkarê qebûl kirin, wana jî siyaseta înkar û qirkirinê ji bo xwe bijartin. Kurd bi vî awayî di wê demê debi xiyaneteke dîrokî re rû bi rû man. Hem ji aliyê dewleta Tirk ve, hem jî ji aliyê dewletên Îngilîz û Fransiz ve bi şiklekî eşkere hatin xapadin, bi leyîstok, xapandin û rezîliyeke mezin Kurdistan kirin çar parçe û gelê Kurd mafê xwe yê herî xwezayî jî winda kir.

Gava wisa bû Kurdên durist û bi gotinên Ataturk hatin xapandin, kesên wekî Xalidê Cibranî û hevalên wî çi kirin? Hatin Komîteya Îstiqlal a Kurdistanê saz kirin, yanî komîteya serxwebûna Kurdistanê ava kirin. Wekî bêjin, madem xwesertî nedan me, wê çaxê divê em serbi xwe bin, komîte saz kirin, lê hîn tu kar nekiribûn, hatin girtin. Jixwe Xalid Cibranî di Alayên Hemîdiye de wekî mîralay bû û kesekî xwende bû. Esas wî amadekarî dikir ku li hemberî siyaseta înkara Ataturk, Îsmet Înonu û Fevzî Çakmak dimeşand, di Kurdistanê de ji bo têkoşîna azadiya Kurd gavekê bavêje. Di sala 1924'an de amadekariya vê dikir. Xalid Cibranî subayên Kurd ên di nava artêşa Osmaniyan de nas dikir. Herhal nameyekê bi şîfre ji van hevalên xwe yên subayên Botanê re dinivîse. Dibe ku telgraf be, welhasil ew subay

nameyê şaş fêm dikin, dibêjin qey komîte talîmata serî rakin daye wan. Ew jî wê çaxê li Bêşebabê di nava leşkeran de serî hildidin. Tabûrek leşker li wir in, ew jî subay in. Ev subay kî ne? Yek ji wan Îhsan Nûrî Paşa ye. Wê çaxê yûzbaşî ye. Yek jî Xurşîd Begê Ertûşî ye. Yek ji wan Mûlazim Alî Riza ye. Her wiha Rasimê Wanî, Tewfîq Cemîlê Mêrdînê jî li wir in. Ev serleşker Kurd in. Di şeva 3-4 Îlona sala 1924'an de îsyan dikin. Nêzî zivistanê ye, ango di payîzê de îsyan dikin û ji wan weye her kes wê li her derê îsyan bike. Dûvre fêm dikin ku şaş fêm kirine û ew tenê ne. Ji ber ku tenê li Bêşebabê îsyan dikin leşkerên Tirk ji hemû deverên derdorê tên ser wan û ew bi bin dikevin. Derdikevin tên Heftenîn wan deran û ji wir derbasî Rojavayê Kurdistanê dibin.

Çîroka Îhsan Nûrî Paşa wisa dest pê dike. Wê çaxê dewlet fêm dike ku ev talîmata Komîteya Îstiklalê ye. Ji bo vê Xalid Cibranî û hevalên wî yên endamên komîteyê bi giştî 9–10 kesan digirin, dixin zîndanê. Ji ber ku li Bêşebabê îsyan derxistine wana digirin, lê yên îsyan kirine wekî me got jixwe derketin derve. Dema wan digirin Kurd dixwazin rabin, lê serekê wan çûye. Serekê wan Xalid Beg e û di zîndanê de ye. Ew hemû tiştî nas dike, subayên Kurd ên di nava artêşê de nas dike, eşîran nas dike. Xalid Cibranî berê di wexta xwe de li hemberî Rûsan şer kiriye, tecrûbeya xwe heye, lê tê girtin. Kurd dibêjin, "em Xalid Beg ji destê dijmin birevînin", lê belê nikarin birevînin. Xalid Cibranî di zîndana Mûşê de girtî dimîne.

Di meha Sibatê ya sala 1925'ê de Şêx Seîd li Pîranê civînekê çêdike, derdora 300 kesan tevlî wê civînê dibin. Wekî kongreyekê saz dikin. Ango em çi bikin, çi nekin? Ev kesên civiyane hemû serekên Kurdan e. Piranî şêx in, mîr in, hinek kesên xwende ango pêşeng in. Nîqaş dikin, hewl didin Xalid Beg xilas bikin. Wekî dişibe hewldanên me yên niha. Dixwazin Xalid Beg xilas bikin û ger pêwîst bike ji bo vê wê serhildanekê bi pêş bixin. Di wir de şaşiyê dikin. Xalid Beg hebûya dibe ku wisa neke, lê ew wisa dikin. Dibêjin, "bila wekî temsîla îslamiyetê cardin sîstema xelîfe li Tirkiyê hebe û li Kurdistanê jî xweserî hebe." Yanî xwestin Ataturk û Îsmet Înonû dest ji ya xwe berdin û mafê gelê Kurd bê qebûl kirin.

Xwestina sîstema xelîfetiyê tiştekî paşde ye û bihurî ye, ango ne di cih de ye. Jixwe piştî îlana Komara Tirkiyê bi salekê, xelîfetiyê tam radikin û dewsa wê diyanetê ava dikin. Daxwaza Şêx Seîd û hevalên wî yek jê hatina xelîfetiyê ye. Ya duyemîn; mafê gelê Kurd e. Şertê xwe wisa diyar dikin û civîn bi dawî dibe. Wexta belav dibin, dewleta Tirkiyê jî biryara komkirina çekan daye. Li kî derê çek hebe, bi taybetî li Kurdistanê divê çek bên komkirin. Çend cendirme biryarê dixin destê xwe û li gundan digerin ku biryarê îlan bikin. Carê dibînin ku çend kes bi hespan tên û hemû bi çek in. Jixwe ew suwariyên tên jî ji civîna Şêx Seîd tên. Cendirme dibêjin, "bisekinin, çek li ser we heye." Wana dibêjin, "bavo berde here!" Lê herhal leşker bi înad bûne û pêşiya wan bernadin. Welhasil provokasyon di wir de ye.

Serokatî carina dibêje *"provokasyon e"* ango serhildana Şêx Seîd hîn ne amade ye. Nû biryar girtine ku xwe amade bikin. Lê ev çend leşker derdikevin pêşiya wan. Ew grûba suwarî wan cendirmeyan dikujin. Dema li wan cendirmeyan dixin xeber diçe Erxanî. Erxanî telgrafê ji Amedê re rêdike, Amed telgrafê ji Enqerê re rêdike û dibêjin, "Kurdan du cendirme kuştin." Destpêkê 40 leşkeran dişînin ser Şêx Seîd, dixwazin biserdegirtinê bikin, lê êdî dest pê dibe. Bi wan 40 leşkeran re jî şer dikin, wan leşkeran jî dikujin. Ji ber ku êrîş tê ser wan û Serhildana Şêx Seîd dest pê dibe. Ango Serhildanê hîn xwe birêxistin nekiriye û ne amade ye. Bi hemû deveran re hîn têkilî û tenzîm çênebûye. Wisa du cendirme li wan rast tên, ew jî dikujin û serhildan dest pê dibe.

Serhildana 1925'an bi şêwazê şer nîn e. Destpêkê qezaya Amedê Pîranê û Çewlikê bi dest dixin. Dikevin Elezîzê û talan dikin. Wê çaxê ruhê talankeriyê heye. Xelkê Elezîzê derdikevin ser banan û wan protesto dikin. Ango serhildanake bê nîzam û bê kontrol e. Dûvre li Lîcê kom dibin. Şêx serkêşiyê dike û hinek mîr di nava wan de ne. Dibêjin, "em Amedê bigirin, bila dinya alem bibihîse me Amed girtiye. Em Kurd in" û hwd. Wê çaxê di nava wan de çend subayên berê di artêşa Osmaniyan de subaytî kirîn, hene. Ew subay qebûl nakin, dibêjin,

“Em niha Amedê bigirin ne rast e. Quweta me ewqas amade nîn e. Ger em Amedê bigirin em nikarin biparêzin. Amed bajarekî di deştê de ye. Em Amedê negirin, em destpêkê xwe di deverên derdorê de fireh bikin, dûvre Amedê bigirin.” Ango dixwazin destpêkê arazî bigirin, qezayan bigirin, dûvre jî Amedê bigirin. Ji ber ku li Amedê artêş heye. Wê çaxê biryargehên mezin ên leşkerî li Amedê ne. Lê ew şêx û axa qaneh nabin. Ev helwest wekî xurûrek feodal e. Şêx Seîd ne li wir e. Lê ew subay 5 kes in, kom dibin, nameyekê ji Şêx Seîd re dinivîsin û tê de dibêjin: “Ev dixwazin biçin Amedê bigirin. Bi raya me, ji ber van sedeman şaş e. Divê destpêkê em Amedê negirin.” Şêx Seîd wekî bersiv dibêje: “Gotina we rast e û di cih de ye, lê lazim e em bi ya wan bikin. Ji ber ku quwet di destê wana de ye.” Hewl didin Amedê bigirin, lê wekî tê zanîn di Amedê de şikestin.

Bi vî awayî serhildan jî şikest. Di derên din de jî şikestin. Çûn Elezîzê girtin, li wir talan kirin. Xaniyê xelkê, ji kula heya firaqên wan hemû kom kirin û ji xwe re anîn. Ango bû talankarî. Mesela, wekî eşîr tevlî bûne. Diçin her şaxeke eşîrê talan dikin, dibin malên xwe. Bi vî awayî şikestin. Serhildana Şêx Seîd demkurt e, tenê du mehan dajo. Dewletê bi trênê leşker heta Qoserê anîn. Bi hezaran, bi deh hezaran leşker anîn. Ew leşkerên hatîn xwe gihandin Amedê, xwe xurt kirin û êrîş kirin. Bi vî awayî tevgera serhildanê şikest. Aliyê wê yê dîrokî ne mijara me ye. Ji ber ku dirêj e ne hewce ye mirov hemûyan bîne ser ziman. Bala xwe bidinê; di serhildanê de mantiqê leşkerî nîn e. Ew subay hinekî ji leşkeriyê fêm dikin, lê li wan guhdar nakin. Temam bê amadekarî dest pê kiriye, wekî provoke bûye, zû dest pê bûye, lê dîsa jî dest pê bû û ewqas kes tevlî serhildanê bûn. Eger sîstemeke xwe ya leşkerî hebûya, taktîkeke xwe ya leşkerî hebûya mumkûn e serhildan neşikesta. Ji ber ku wê çaxê dewlet jî zeîf bû û zehf ne xurt bû. Hîn nû dewleta Tirk ava bibû. Erê leşkerên dewletê hebûn, lê zehf ne xurt bûn. Ewqas teknîka xwe ya mezin tune bûn. Serhildan jî werga dest pê dibe û dişkê.

Grûba ku Şêx Seîd tê de, ew jî nêzî 70 kesan e. Ez bi xwe li hemberî vê rewşê şaş dimînim: Herhal tecrûbeya leşkerî ya Şêx Seîd pir nîn e. Xeber ji Şêx Seîd re tê û dibêjin, “filan pir girtine.” Ango ew pir dûr e, ta pişt Çewlikê ye. Dûvre dibêjin, “pira filan derê jî girtine.” Ew jî dûr e. Dikevin teredûtê û dibêjin, “em ê bi ku de herin? Hemû riyên me girtine!” Di nava wan de zavayê Şêx Seîd ê navê xwe Qasim li wir e, ew jî berê subayekî Osmanî bû. Qasim dibêje, “Qereqolek li wir e. Ez herim bi wan re hevdîtinê bikim. Em hinek şertan pêşkêşî wan bikin. Em bêjin, “em tiştekî naxwazin, lê ji bo vê kiryara me hûn jî kesî negirin, mehkûm nekin û zilmê li gel nekin. Em herin bi dewletê re hevpeymanê çêbikin û teslîm bibin. Ji ber ku tu riyek din nîn e. Pir girtine, hemû dever girtine.” Wekî gerîla dema dijmin em dorpêç dikirin, hem jî dorpêçên mezin û bi teknîka herî bilind hemû hawirdora me digirtin. Em di mesafeya 50 metreyan de dîsa ji dorpêçê derdiketin. Vana çima wisa kirine em nizanin. Bi ser de jî vana Kurdên çiyayî ne. Ji Şêx Seîd re dibêjin, “pira pêş Çewlikê girtine.” Bila girtî be! Ew pir bi kîlometreyan dûrî te ye. Lê panîkek çêdibe. Herhal Şêx Seîd jî însanekî dilnizm e, însanê zane digire dîqatê, li derdora xwe guhdar dike. Tê gotin ku bi rastî jî Şêx Seîd însanekî wisa dilnizm e. Însanekî pir pîr e, lê di her tiştî de serwextbûna wî nîn e. Welhasil rojekê du rojan nîqaş dikin. Zavayê Şêx Seîd diçe qereqolê. Tê ji Şêx Seîd re dibêje, “şertê me qebûl kirin. Ger em herin teslîm bibin, wê zilmê li gel nekin. Lê ger em neçin, em şer bikin hem riyên me girtîne, hem jî wê hemû gundan talan bikin, komkujiyan bikin, kuştinan bikin. Soz dane me, xeber jî ji Enqerê re rêkirine. Fermandarek hatiye wir. Ew fermandar soz daye ku ger em bi rastî teslîm bibin, û bêjin em poşman bûne, wê dewlet me efû bike. Wê çaxê li kesî zilmê nakin. Wê her kesî berdin û her tişt wekî berê be. Li ser vê bingehê diçin teslîm dibin.

Gava Şêx Seîd teslîm dibe dewlet ditirse ku di dadgehê de Kurdistanê biparêze. Ew fermandarê li wir bi Şêx Seîd re diaxive, ji Şêx Seîd re dibêje, “ger hûn bêjin me ji bo Kurdistanê şer kir, dewlet nikare we efû bike. Li ser peymana me ya berê lazim e tu li wir bibêjî, em şaş bûn, bila dewlet me efû bike, dewlet dewleteke mezin e. Me şaşî kir, rêya me şaş bû. Em ji dewletê efûya xwe dixwazin.” Her kes îfadeya xwe di vê çarçoveyê de dide. Dûvre cardin cezayê îdamê didin wan. Ew fermandarê Şêx Seîd pê re li hev hatî, heta beriya

darizandinê jî ji Şêx Seîd re dibêje, “ku tu wisa biaxivî dadgeh wê te berde. Em ê bi hev re biçin Pîranê, tê ji me re berx serjê bikî.” Gava Şêx Seîd dibin ber sêdara darvekirinê li wî fermandarî rast tê. Şêx Seîd jê re dibêje, “ka em ê biçûna gund, me yê bi hev re berx bixwara.” Ev fermandar pişta xwe dide Şêx Seîd û wî dibin ber sêdarê û darve dikin. Tevgera Şêx Seîd wisa bidawî dibe. Di 29’ê Hezîranê de Şêx Seîd tevî hevalên wî û kurê wî bi giştî 49 kesan darve dikin. Wekî din jî pir kes darve kirin û kuştin. Bi hezaran kes qetil kirin. Ev kiryar heya niha bi temamî derbasî belgeyan nebûye. Hemû derên Kurdistanê xira kirin. Kurd ji cih û warên wan surgûn kirin.

Mijareke din a surgûnê heye, ez ê dûvre wê jî rave bikim. Ji bo şerê Kurdistanê baş bê fêmkirin û heqîqeta Kurdistanê bê zanîn van mînakan girîng in. Mesela serhildana Şêx Seîd, ji bo amadekariyê dema wan hebûya dibe ku xwe baş birêxistir bikiran. Serhildan bêyî ku amadekarî bikin dest pê dibe, tê provokekirin, dîsa jî Şêx Seîd kesekî tê nas kirine. Şêx Seîd bazirgan e, çûye Heleb û hatiye, pezê xwe pir e, pir dewlemend e, her carê çend kerî pez dibir Helebê û difiroşt. Ji Amedê heta Helebê yên li ser rê hemû nas dikirin. Kurdistan nas dikir, cih û warê xwe li Xinisa girêdayî Erziromê û li Pîranê heye. Ango şêxekî maldar e û derdora xwe fireh e. Şêx Seîd kesekî wisa ye. Pozîsyona wî heye ku derketineke netewî çêbike. Berî her tiştî dijmin xelkê me yê Elewî sor dikirin û digotin, “Şêx Seîd şêx e, dixwaze xelîfetiyê bîne”, bi vî awayî dixwestin Elewiyan bikişînin aliyê xwe. Werga cudakarî dikirin. Xelkê Dêrsimê jî di pozîsyoneke berxwedanê de bû, lê beşdarî serhildana Şêx Seîd nabe.

Li Ruhayê mîrê Beraziyan Bozan Beg heye, ew wê çaxê Şêx Seîd nas dike. Feqet ji ber Enqerê berî wê bangî wî kiribû û ew jî çûbû parlamentoya 1920’an, Ataturk ew nas dikir û bang li wî kiribû. Piştî ku Ataturk xwe ba dide Bozan Beg ji Ataturk qut dibe. Gundê wî bi xwe li Kobanê bû, li aliyê Sûrî dima. Di 1921’an de ji ber sînorên nû xêz dikin Kobanê jî li aliyê Sûrî dimîne. Lê bes eşîra Beraziyan hinek ji wan li milê Tirkiyê, hinek ji wan jî li milê Sûrî dimînin. Lê piraniya wan li aliyê Bakur in. Welhasil ew soz didin ku bi Şêx Seîd re rabin. Çi dikin? Wê xeta trênê rakin. Bi rastî jî rakirana wê pir feyda xwe hebûya. Hemû serokên eşîran li Kobanî kom dikin, sê rojan civînê çêdikin. Di encamê de biryar nadin ango dibêjin, “ev teger wê bikeve, em tevlî bibin jî em nikarin tiştekî bikin. A çê ango a baş em tevlî nebin.” Yanî konfederasyona Beraziyan wisa tevlî serhildanê nabe. Ew dûr in, tam ne di nav de ne û hinek ji eşîra wan jî di nav de hene, lê tevlî serhildanê nabin.

Em beşên tevlî serhildanê nebûne jî bêjin. Di komîteya Mîr Xalid Beg de ji Serhedê Kor Hisên Paşa jî heye, reîsê eşîra Heyderiyan e û Mûsa Beg jî di nava wan de ye. Feqet vana çawa dikin? Wexta ku Tirk dikin Xalid Cibranî bînin li Bidlîsê dadgeh bikin, wê di nav herêma eşîra Cibraniyan re derbas bibe. Xalid Beg ku ji Mûşê bînin Bidlîsê di nava eşîra Cibaraniyan re derbas bikin, leşker jî ditirsin û dibêjin, “Cibranî wê pêşiya me bigirin.” Heqet jî Cibranî û Kurd hemû jî amadekarî dikin ku Xalid Beg birevînin. Li ser vê yekê leşkerên Tirk dibêjin, “em ji cihê Cibraniyan re derbas nebin. Em Xalid Beg di rêya Agiriyê re bibin.” Dixwazin bibin Eleşgirtê û di Ercîşê re bibin Bidlîsê. Wisa biryar digirin, lê Kurd jî pê dihesin. Dema ev tê bihîstin endamên Komîteya Îstiklal a Kurdistanê amadekarî dikin û ji Kor Hisên Paşa û Mûsa Beg re dibêjin, “Wê Mîralay Xalid Beg di cem we re derbas bikin, lazim e hûn derkevin pêşiyê, leşkerên Tirkan bêbandor bikin û Xalid Beg rizgar bikin.” Lê Kor Hisên û Mûsa Beg vê daxwaza wan qebûl nakin. Xalid Beg di wir re dibin û dûvre li wir ango li Bidlîsê hema bi lez Xalid Beg û hevalên wî îdam dikin. Ew Kor Hisên Paşa beşdarî serhildana Şêx Seîd jî nabe.

Cardin eşîrên Zîlan, Celalî, Sîpkan rexmê her kes çavê xwe li wana ye jî, beşdarî serhildana Kurd nabin. Ger beşdarî serhildana Şêx Seîd bibûna belkî serhildan bi ser biketa û derketineke netewî çêbibûya. Jixwe Dêrsim tevlî nebû. Ruha tevlî bibûya, milê Serhedê beşdarî serhildanê bibûya wê çaxê Mêrdîn musaîd e beşdarî serhildanê bibe. Ger wê demê Mala Haco û yên hwd. li wir beşdarî serhildanê bibûna -jixwe wana ne pir dûrî serhildanê ne-, mumkûn e rewş cuda bûya. Lê Serhed wisa dûrî serhildanê disekine û derve dimîne.

Di sala 1926'an de gava serhildan dest pê dibe û Şêx Seîd tesfiye dibe, li Kurdistanê surgûn dest pê dibe. Surgûn çawa bi pêş dikeve? Yên beşdarî serhildanê bûne jixwe tesfiye dikin, hemû mîr û mezinên Kurdan ên beşdar nebûne jî tesfiye dikin. Biryara surgûnê derdixin. Diçin Agiriyê, wê çaxê biryarê teblîxî wan dikin û dibêjin, "hûn surgûn bûne, hûnê biçin!" Kê surgûn dikin? Hemû mezinên Kurdan surgûn dikin. Kor Hisên e, Mûsa Beg e, Biroyê Heskiyê Têlî ye, hemû mezinên Celaliyan, Sîpkiyan, Heyderiyan û mezinên hemû eşîran dixwazin surgûn bikin.

Wê çaxê Biroyê Heskiyê Têlî jî dev ji kar û barê eşîrê berdaye, ji xwe re dikanek li Bazîdê vekiriye. Ango êdî dixwaze jiyaneke normal bijî. Xeber ji wî re tê ku surgûn bûye. Ew dibêje, "em tevlî serhildanê nebûne, me alîkarî da dewletê û li hemberî Rûsan şer kir. Hûn çima me surgûn dikin?" Ew kesên surgûn dikin, ji ber ku berê tevlî şer bûne hemû şerker in. Dewlet dibêje: "Na. Talîmat e. Tê herî!" Biroyê Heskiyê Têlî bi xwe re dide û dîstine, nikare vê neheqiyê qebûl bike. Ji her mirovekî xwe re dibêje, "ez însan im" û nikare vê neheqiya dewleta Tirk qebûl bike. Biroyê Heskiyê Têlî ji ber xurûra xwe qebûl nake û wekî şexsekî welatparêz dibêje: "Ez qet naçim surgûnê!"

Biroyê Heskiyê Têlî piştî dibîne ku vana cidî ne, wê wî bibin surgûnê, bi şev ji Bazîdê diçe mala xwe ya gund. Dema diçe gund, dibîne ku leşker li gund in û li wî digerin. Welhasil ji mirovekî xwe re dibêje, "çeka min li hundirê malê ye, here ji min re bîne." Ew kes jê re çekê tîne. Çeka xwe li xwe dipêçe û Serhildana Agirî dest pê dibe.

Xelk dibihîse ku Biroyê Heskiyê Têlî naçe surgûnê û serî radike (isyan) pir kes tên cem wî. Eşîrên Celalî wisa beşdarî Serhildana Agirî dibin. Îhsan Nûrî Paşa jî derbasî Rojavayê Kurdistan bibû. Li wir ji ber rêxistina Xoybûn hatibû damezrandin Îhsan Nûrî jî li wir beşdarî xebata Xoybûnê bûye. Dema Xoybûn dibihîse li Agiriyê Biroyê Heskiyê Têlî serhildan daye destpêkirin û wekî din gelek kes beşdarî serhildanê bûne, Xoybûn Îhsan Nûrî bi rûtbeya Paşa tayînî serfermandariya Serhildana Agiriyê dike. Îhsan Nûrî derbasî Rojhilat dibe, hinek li wir dimîne, ji bajarê Xoy derdorê 20 ciwanan jî bi xwe re radike û diçe beşdarî serhildana çiyayê Agiriyê dibe. Îhsan Nûrî Paşa Serhildana Agiriyê dimeşîne û Biroyê Heskiyê pê re ye û tim bi hev re ne. Ango wana Serhildana Agirî îdare dikin. Her dû jî kesên pir bi cesaret û bi hev ve girêdayî ne. Ji bo vê di meşandina şoreşê de pirsgirêkeke cidî najîn.

Kor Hisên Paşa çawa dibe? Dewlet, Kor Hisên û zarokên wî hemûyan surgûn dikin. Kor Hisên dibêje, "me îxanet li Kurdan kir. Dewletê dîsa jî me efû nekir. Em nikarin vê îxanetê qebûl bikin!" Kor Hisên, tevî kurê xwe, biraziyê xwe û bi hevalê xwe Mûsa Beg re 9-10 kes bi hev re diaxivin. Vana gişt xwe birêxistin dikin. Ji Aydinê kampa surgûnê direvin. Ji ber ku li surgûnê ne, divê her roj îmze bavêjin. Li wir xwe birêxistin dikin û direvin, derbasî Rojavayê Kurdistanê dibin û tên Tirbespiyê Mala Haco. Wê çaxê Mala Haco wekî navenda Xoybûnê bû.

Kor Hisen û Mûsa Beg ji Xoybûnê re dibêjin, "Me îxanet kiriye, me efû bikin. Vaye li Agirî serhildan heye. Derfet bidin me, em dixwazin herin beşdarî serhildanê bibin û zirara me daye em telafî bikin. Eşîra me jî li wê derê ye. Em dixwazin tevlî serhildana Agiriyê bibin." Kor Hisên tenê beşdarî serhildana Şêx Seîd nebû û îxanet kir. Heman demê piştî şikestina serhildanê, birayê Şêx Seîd û hinek ji eşîrên Cibraniyan û eşîra Zorkanan (vana li herêma Serhedê ne) dixwazin bi rêya wan derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibin. Wê çaxê Kor Hisên derdikeve pêşiya rêya wan û bi wan re şer dike. Ango wisa tam îxanet kiriye. Bi qefleya birayê Şêx Seîd re şer dike û ji wana pir kesan dikuje. Hem jî bi rojan bi wana re şer dike ji bo ku ji Serhedê derbasî Îranê nebin. Rexmê vê jî dewlet piştî serhildanê Kor Hisên surgûn dike. Dewleta Tirkiyê wisa ye; yên îxanet kirine jî ceza dike. Jixwe usûlekî dewleta Tirk a wisa heye. Piştî ewqas îxanetên giran, Kor Hisên tê cem tevgera Xoybûn û Xoybûn wî efû dike. Xoybûn dibêje, "temam, hûn herin beşdarî Serhildana Agiriyê bibin. Eşîra we û nasên we hene, beşdar bibin û wisa zirara we daye telafî bikin." Ew jî qebûl dikin. Hema li wê derê

kurê xwe û 5 kesan di xeta Cizîrê û Beşîrî re dişîne Agirî û bi xwe jî, tevî kurên xwe û biraziyên xwe diçe Behdînanê.

Li Behdînanê diçe gel Şêx Ehmed Barzanî ango birayê Mele Mustafa Barzanî. Li wê derê dinêre ku Nûh Beg jî hatiye wir. Nûh Beg, birayê Mûsa Beg e û heman demê kurê Mûsa Beg Medenî jî li wir e. Ew jî li cem Şêx Ehmed in ango xwe avêtine bextê Şêx. Ji ber ku tevlî berxwedana Şêx Seîd nebûne û ji bo surgûn nebin çûne wir. Kor Hisên Paşa dibêje, "temam. Em çûn me xwe da efûkirin. Em dikin biçin Serhildana Agirî, li wir şer bikin, hûn jî werin." Nexwe ji berê de Şêx Ehmed nas dike, hatiye serdana wî. Welhasil wana dibêjin, temam. Nûh Beg li cem Şêx Ehmed Barzanî dimîne, Medenî û zilamên xwe bi Kor Hisên re diçin. Ew derbas dibin, dikin biçin Serhedê. Kor Hisên Paşa, du kurên wî, sê-çar biraziyên wî û wekî din hin kesên ji eşîra wî ango wekî 9–10 kesên parêzwanên wî ne di rê de dema razanê hemû kes di xwe de ne. Ew Medeniyê bi wana re gava ew şev radizin, radibe gule li ser wan direşîne û hemûyan dikuje. Tu nabêjî ew Medenî jî xayîn e û bi dewleta Tirkiyê re ye. Qedera Kor Hisên Paşa wisa ye. Dûvre Şêx Ehmed dibihîse û fêm dike ku ew ê li cem wî ev kar birêxistin kiriye. Şêx Ehmed Barzanî, Nûh Beg mahkeme dike û îdam dike. Ji ber ku Medenî biraziyê Nûh Beg e. Ango bûyerên Kurdan wisa ne.

Serhildana Agiriyê jî erê dest pê dibe, lê Kurdistan di bin zextê de ye. Piştî Serhildana Şêx Seîd dewleta Tirk Kurdistanê wêran dike, piraniya Kurdan surgûn dikin, gelek kesan dikujin û îxanetên di nav Kurdan de çêdibin rê dide ku eşîr parçe bibin. Rexmê ku Serhildana Agiriyê derfetên xwe nîn e, ji ber Îhsan Nûrî Paşa tê de ye û însanekî leşker e, Serhildan bi bandor e. Îhsan Nûrî Paşa di warê leşkertiyê de bi pêş ketiye, bi Ataturk re xwendiye. Ango Ataturk wî nas dike, bi hev re dibistana herbê xwendine. Jixwe di wexta Serhildana Agiriyê de dewlet jê re xeberê dişîne û dibêje, "em dixwazin te bibînin." Îhsan Nûrî diçe cihê randevûyê, hevdû dibînin. Dinêre ku 5–6 subay hatine, hemû jî hevalên wî ne. Ataturk bi wana re axiviye. Ew subay jê re dibêjin, "Ger tu were û dest ji vê Serhildanê berdî, em ê wekî berê heman terfiyên te bidin te. Tenê dest ji vê Serhildanê û Kurdewariyê berde." Îhsan Nûrî Paşa wan red dike û dibêje: "Hûn îxanetê teklîfî min dikin." Yek ji wan subayan pir pê ve girêdayî bû. Ew hevalê wî jê re dibêje: "Tiştekî tu ji me dixwazî heye?" Hevsera Îhsan Nûrî Paşa heye, navê wê Yaşar Xanim e û li Stenbolê ye. Nurî Paşa dibêje: "Ger hûn karibin Yaşar Xanim derbasî Sûriyê bikin baş dibe." Yaşar Xanim jî bi eslê xwe Tirk e. Piştre ew jî ji Sûriyê tê Agiriyê, di berxwedana Agiriyê de bi Îhsan Nûrî Paşa re ye. Ango ew jî jineke wilo pir xwedan ked û xwedî daw û doz e. Yaşar Xanim hemû zor û zahmetiyan radike, bi salan bi Îhsan Nûrî re li çiyan dimîne.

Ango Îhsan Nûrî yekî wisa ye. Esas subay e, lê yekî xwedî biryar e. Di warê taktîk de jî hinek qabiliyeta xwe heye, lê pir ne kûr e, sîstem û tenzîmê pir bi pêş naxe. Mesela, di şerê gerîla de israr bikira wê berxwedana Agirî cuda bibûya. Lê perwerdeya wî ya artêşa nizamî ye, ne ya gerîla ye. Jixwe wê çaxê hîn zanebûna gerîla nedihat zanîn. Ango stratejî û taktîka tevgera gerîla çênebibû. Pir tesadûfeke dîrokî ye ku di heman salan de li Çînê Mao Zedûng jî dikeve gelek tengasiyan û di lêgerînê de ye. Di vê lêgerîna xwe de şêwazê gerîla dike wekî stratejî û taktîkeke nû. Bêguman agahiya Îhsan Nûrî Paşa jê tune ye; ger agahiya xwe hebûya û bi şêwazê gerîla li Bakurê Kurdistanê şer bi rê ve bibira, encam wê wisa nebûya û bi ser bikefta. Mixabin hê jî ew zanebûn tune ye. Ji bo vê Îhsan Nûrî tenê hinek baskan ji Çiyayê Agirî dişîne heya Mûş û Bidlîsê. Ango hinek grûban wekî taxim dişîne, lê taxim tên wir, diçin pez talan dikin û dibin Agiriyê.

Wextekê me jî pez talan kir. Di sala 1997'an de li Botanê bilançoya me ya talankirina pez 27 hezar pez bû. Ev hejmar di bîra min de ye, ji ber ku di rapora sala '97'an de jî me nivîsandibû. Me pezê kê dibir? Pezê ku dewletê bi rêya bankaya Zîraatê bi çeteyan re kirî me dibir. Xelkê me kêfxweş dibû gava me ji çeteyan pez dibir. Lê vana ne yê çeteyan e, pezê xelkê xwe talan dikin. Di rastiyê de ew baskên hatine heya Mûşê hinek çalakî dikin, heya Bidlîs û Garzanê tên. Lê belê tevgera wan mezin nabe, tevlîbûn zêde nabe, tevgera wan tê tengkirin. Serhildan di Agiriyê de dimîne.

Rûsya li kêleka wana ye, hinek Ermenî-Taşnak li Agiriyê hene, ew jî li cem Îhsan Nûrî Paşa ne. Îhsan Nûrî Paşa dixwaze bi rêya wan bi Sovyetê re têkilî çêbike û wana dişîne gundê Ermenîstan. Herhal ew Taşnak ji bo alîkariyê li wir in û çend kes in. Îhsan Nûrî dibêje, "em dixwazin bi Rûsan re têkilî çêbikin, bila Rûsya destekê bide me." Taşnak di navberê de diçin û tên, dûvre jî li gundekî nêzî sînor randevû didin Îhsan Nûrî. Îhsan Nûrî Paşa tenê yek kesî digire gel xwe û diçe randevûyê. Bes gava sed metreyan nêzî gund dibe, avekê dibîne. Gava li ber avê disekine ji hesp peya dibe, ew kesê li gel wî jî bê hesp e. Îhsan Nûrî ji yê gel xwe re dibêje, "tu di pêşiyê de biçe gund, hela bê çi heye, çi tune ye? Ez ê li dûv te werim." Îhsan Nûrî li wir bi avê re mijûl dibe. Tu nabê Sovyet gund tijî leşker kirine û xwe di nava malan de vedişêrin. Dibînin ku yek di pêşiyê de tê û yekî jî serê hespê girtiye û tê. Di dil xwe de dibêjin, ew ê li pêşiyê tê Îhsan Nûrî Paşa ye, yê serê hespê jî girtiye xizmetkarê wî ye. Çawa dikevin gund hema xwe davên û yê pêşiyê digirin. Îhsan Nûrî dibîne ku hevalê wî girtin, hema li hespê suwar dibe û direve. Gava Îhsan Nûrî li hespê suwar tê, fêm dikin kesê şaş girtine, fişek li Îhsan Nûrî direşînin, lê Îhsan Nûrî xwe xilas dike. Ango Sovyet jî wisa li dijî Kurdan sekiniye. Sovyetê, leşkerên Stalîn wisa kirine. Îhsan Nûrî Paşa bi xwe ev bûyer wisa nivîsandiye. Ji ber van hemû bûyer û serpêhatiyan Serhildana Agirî nikare xwe fireh bike.

Bi Îranê re eleqeyên xwe hene. Îran wana li dijî Tirkiyê bi kar tîne. Dûmahîkê Îran jî ji piştê ve wana dorpêç dike. Ango Îhsan Nûrî Paşa kesekî pir bi cesaret e. Bi cesareta xwe teslîm nabe, lê dixin, dorpêçê dişkînin û ji çemberê derdikevin. Jin, zarok 300 kes pê re ne. Wan dixin navbera xwe, wekî çarqorziyê çêdikin. Quweta leşkerî jî dide wî alî û vî alî, pêşî û paşiya wan digirin, jin û zarokan û kesên nikarin şer bikin dixin navbera xwe. Wisa lê dixin û wê çemberê diçirînin û derdikevin. Wisa nekirana yan wê hemû bimiran, an jî wê teslîm bibûna. Lê teslîm nabin. Dûvre diçe Îranê, ji ber ku berê bi Îranê re têkiliya xwe hebû. Dûvre bi rêya eşîra Celaliyan dîsa bi Îranê re eleqe çêdike. Welhasil Îhsan Nûrî wekî surgûn dikin û dibin Tehranê. Jixwe dûvre dibêjin bi qezaya trafîkê li Tehranê mir. Ya rastî guman e ku bi zanebûn lê xistibin û kuştibin. Îhsan Nûrî di sala 1976'an de tê kuştin. Wê çaxê extiyar e, lê li Tehranê bi erebeyê lê dixin û wisa jiyana xwe ji dest dide. Heta roja jiyana xwe ji dest dayî jî, li Tehranê jiyan kir.

Îhsan Nûrî însanekî pir bi cesaret e, ji bo Kurdistanê bi rastî jî bi awayekî fedaî şer dike. Îhsan Nûrî Paşa ala Kurdistanê ya sê rengî cara yekemîn li ser Çiyayê Agirî bilind dike. Niha dibêjin destpêkê ala Kurdistanê li Mehabadê hatiye libakirin; na, ala Kurdistanê destpêkê li Agirî tê libakirin. Jixwe Îhsan Nûrî Paşa bi xwe ji wan subayên bi wî re hevdîtin kirî re wisa dibêje, "Ala Îstiklala Kurdistanê serxwebûna Kurdistanê ye. Sê reng wê her bilind bibe." Lê ew berxwedan wisa teng ma û bi ser neket.

Serhildana Agirî ji sala 1931'an şûn ve tam dişkê. Dewleta Tirkiyê piştî wê li ser Dêrsimê disekine. Ango gav bi gav Bakurê Kurdistanê bi leşkerî zeft dikin. Dema Agirî zeft dikin, tirbekî beton çêdikin û dibêjin: "**Kurdistana xeyalî li vê derê binaxkirî ye!**" (Hayali Kurdistan burada metfundur!) Di sala 1935'an de Îsmet Înonu tê, li Kurdistanê digere. Îsmet Înonu, di wê rapora ku nivîsandî de dibêje, "Dêrsim serê kunêrê ye (çıban başıdır), divê ev kunêr ji kokê ve bê kolandin û avêtin." Îsmet Înonu wisa dibêje. Mesela, li hemû Kurdistanê geriya ye, ji bo her bajarekî tespîteke xwe heye. Di tespîta xwe ya ji bo Bidlîsê de dibêje: "Bajarekî Tirkan a mukemel e." Ango ji bo her derê tiştekî dibêje û li ser esasê rapora wî dewleta Tirkiyê tevgera Dêrsimê amade kir, di sala 1937'an û '38'an de çû ser Dêrsimê. Niha di Serhildana Dêrsimê de ne ku Dêrsimê serî rakir. Dêrsim, wekî xwe li cihê xwe bû. Heya sala 1937'an û beriya wê artêşa Tirk qet neketibû Dêrsimê. Artêşa Tirk cara yekemîn di sala 1937'an de ket Dêrsimê; ew jî bi şer ket Dêrsimê.

Hinek nîqaş hene ku dibêjin, Dêrsimê serî rakiriye. Na, Dêrsimê serî nerakiriye. Dêrsimê bi awayek asayî di xweseriya xwe de jiyan dikir, dewlet çû ser Dêrsimê, Dêrsimê jî li ber xwe daye, lê ne ku serî rakiriye. Li hemberî êrîş û zilma dagirkeriya Tirkan stû xwar nekiriye, li ber xwe daye. Ev bi awayekî xwezayî dibe rewşa îsyanê. Di destpêkê de wisa ye. Dêrsimî ango Kurdên di halê xwe de dibêjin, ne hewce ye dewlet têkeve nav me. Em nahêlin Tirk

têkeve nav me. Wê çaxê gotinên wan wisa ne. Berê hemû Kurdistan wisa bû. Ne ku rewşeke cuda ye, yan jî Seyît Riza îsyaneke nû îcad kiriye. Na. Seyît Riza, ne kesekî ji rêzê ye ku heta dewletê nas neke. Seyît Riza tevî dewleta Osmanî heta sînorê Rûsya diçe û bi Rûsyayê re şer dike. Berê hemû mîrên Kurdan wekî eşîr şer dikin, Seyît Riza bi xwe jî diçe şer dike. Dêrsimî dibêjin, "Divê em wekî berê bin. Wekî dema Osmaniyan bin, divê dewlet nekeve nav me." Daxwaza wan ev e ku, xweseriya xwe biparêzin, keramet û rûmeta xwe biparêzin.

Piştî Serhildana Agirî jî ket êdî dewletê Dêrsim xist dorpêçê, hawirdora wê girt û çûn ser Dêrsimê. Di wir de jî cardin îxanet hat bikaranîn. Mesela Rêber biraziyê Seyît Riza ye. Dewlet tim tê hevdîtinê û di hevdîtinê de Seyît Riza tim bersivên polîtîk dide rayedarên Tirk. Lewma ev heyet ji bo Seyît Riza dibêje, "Yaw ev Seyîd çawa ewqas tiştan dizane?" Li gel Seyît Riza Alîşêr heye. Alîşêr yekî wekî rewşenbîrekî Kurd e, tecrûbeya Serhildana Koçgirî pê re heye. Alîşêr, piştî Serhildana Koçgirî derbasî Dêrsimê dibe. Dewlet di dil xwe de ji bo Seyît Riza bê aqil bihêlin pêwîstî dibînin ku Alîşêr bikujin. Wê Alîşêr çawa bikujin? Mala Alîşêr û Seyît Riza li kêleka hev e û kes nikare têkeve mala Seyît Riza. Ji bo kesek têkeve malê divê ji wê malê be, ji ber ku nobedar nahêle kes têkeve wê malê. Ew jî hewl didin yekî ji nav malê birêxistin bikin. Li ser vê yekê biraziyê Seyît Riza, Rêber birêxistin dikin ku ew here Alîşêr şehîd bixe û wisa jî dikin. Rêber jî li ser baskekî ye ango zilamên girêdayî xwe hene. Bi awayekî serbest dikevin malê û werga Alîşêr şehîd dikin. Di vir de ya girîng, dewletê tim îxaneta navxweyî bi kar aniye.

Pir eşkere ye ku di berxwedana Kurd de qehremanî û cesaret zehf zêde ye, lê şêwazê şerê Kurdan nîn e, taktîk nîn e. Tiştê di vir de em vebêjin ev e. Ewqasî jin û mêr li ber xwe didin. Ger stratejî û taktîka wan a rast a şer hebûya tu hêz û quwetê bi wan nikarîbû û teqez wê bi ser biketan. Ger stratejî hebûya wisa herêmî nedima, wê derketineke netewî bi pêş biketa. Lewre rexmê ku ewqas qehremanî tê de heye, egîd tê de pir in, lê bi bin dikevin. Li parçeyên din jî wisa ye. Şerê beşên din ê Kurdistanê jî ne cuda ye. Bi giştî şerê Kurdan wekî hev in, dişibin hev.

Tevgera Simko ya li Rojhilatê Kurdistanê bilind dibe, heye. Simko serokê eşîra Şikakiyan e. Yanî terzê wan ê şer jî wekî hev e. Usûlê şerê mîr û eşîrên Kurd ên taybet bi xwe nîn e. Mirov dikare bibêje ku, di vê xisûsê de usûlê şer winda kirine. Şerê wan şerê eniyê ye yan jî talan e. Ji bo vê min bi xwe wextekê wisa digot: "*Di dîroka Kurdistanê de şer nîn e; pevçûn heye. Di warê zanistî de mirov nikare ji vê re bibêje şer. Ev pevçûn e, ango li hev dixin. Taktîsyenî û teoriya şer tê de nîn e û lê peyda nebûye.*" Bi rastî jî li Kurdistanê şerkerî heye, însanên Kurdistanê şerker in. Dibin zilamên xelkê, lê nikarin bibin leşkerên xwe. Ji bo bibe leşkerê xwe divê taktîsyen be û stratejîst be, lê ev çênabe. Mesela Kurd di kîjan artêşê de bin, di pêş de ne, her xelat digirin. Herî dawî li Bakur sefera Qibrisê çêbû, piraniya leşkerên Kurd ên tevlî wê seferê bûn, xelat girtin. Hevalê Bedranê Gundikremo jî di sala 1974'an de tevlî şerê Qibrisê dibe û xelat digire. Li gorî ez dizanim heta demekê mûçe jî ji dewletê digirt. Ji ber ku di sefera Qibrisê de di pêşiya artêşê de ketiye Qibrisê. Wisa em wî jî deşîfre dikin. Dîroka Kurd wisa ye. Belkî heval bibêjin hevalê Bedran di şerê me de jî ne xirab bû; rast e, Kurd here kî derê di şerkeriya xwe de ne xirab in. Lê tiştê kêm, stratejî û taktîka şer e, ango aqilê şer e, şêwazê şer e.

Di dîrokê de Komara Mehabad (1946) heye. Pêşengê wê Qazî Muhemed însanekî rewşenbîr e, dilpak û gelêrî ye, lê ji malbateke çîna navîn û rewşenbîr e. Malbata wan piranî qazî ne û dewlemend in. Lê tevgera Qazî Muhemed nabe tevgereke netewî. Komara Mehabad ava dibe, lê hemû Kurdistanê nake hundirê xwe. Wezaretê çêdike, reîsê filan eşîrê dibe filan wezîr, filan axa dibe filan wezîr. Ango wisa ye. Îcarê yekî ji aliyê Ûrmiyê çi wezîfeyê nadin wî, eşîra wî jî biçûk e. Ew tê û dibêje, "we tiştek nedaye min, ez ê vî karî xira bikim." Jê re dibêjin, "Temam, em te jî bikin tiştek." Ew kes dibêje, "na, divê wezîfeya min li ser ê hemûyan be." Wê çaxê Barzanî jî çûye Mehabadê. Barzanî û yekî din kirine general. Dibînin ku ev kes bi rastî jî dike xira bike ji wî re jî dibêjin, "em te jî bikin general." Dîsa qebûl nake û dibêje, "îleh ez ê li ser wan bim!" Ji bo wî aş bikin sîstema mareşaltiyê tînin. Tenê ji bo wî

razî bikin sîstema mareşaltiyê tînin. Ango mecbûr dimînin ewqas nerm nêz bibin. Her kesê tê, ya xwe li ser ferz dike.

Dema Sovyetê piştgiriya xwe ji wan kişand, leşkerên Îranê bi alîkariya Îngiltere xwe komî ser hev kirin û çûn ser Tebrîzê, hîn nehatine ser Kurdistanê yên xwe wisa ferz dikirin pirek ji wan reviyan. Ji bo xwe bidin efûkirin çûn cem rejîma Şah. Hîn leşker nehatiye Kurdistanê wisa kirin. Ên mane jî enî girtine, di rê de enî rêz kirine. Artêş tê, topê xwe heye, çekên xwe heye. Tê çawa li hemberî wî eniyê bigirî? Hinek sirt û gir girtine. Leşker jî tên li wan dixin, wan sirtan û giran radikin. Nikarin şerekî pir berfireh bikin û berxwedan dişkê. Li hemberî van hemûyan Qazî Muhemed belkî ji bertekê ye, yan jî ji pir hestyariyê ye dibêje, “Ez ji Mehabadê naçim.” Wê çaxê Barzanî jê re dibêje: “Bimeş, em herin Iraqê.” Qazî dibêje: “Ez naçim. Ez gel tenê nahêlim.” Qazî Muhemed dimîne û wî jî werga îdam dikin. Ango Komara Mehabadê diparêze. Dibêje, me tiştek şaş nekiriye, ev mafê me ye û hwd. Di encamê de wî û hevalên wî îdam dikin. Hemû serhildanên Kurdan wisa bi êş û trajediyan bi dawî dibin.

Serhildana herî dawî serhildana Mele Mustafa Barzanî ye. Piştî derketina derve, çûyîna Sovyetê û vegerê, di sala 1961’an de dest bi serhildanê dike. Ji sala 1961’an heta ‘70’î asteke xwe ya diyar heye. Ne şerê gerîla ye, lê ne îsyankariya klasîk a Kurd e jî. Mirov dikare wisa bibêje: Ew şerê klasîk ê Kurd, îsyankariya Kurd ku li ser çiyayan asê û tenê dimîne, yan jî di kelehê de dimîne bi kar nayîne; Barzanî şer gavekê pêşdetir dibe. Cardin ji bo pêşmerge karibin şer bikin divê pişta xwe bidin dewletekê û cih û warekî xwe hebin. Bê pişt nikare. Şêwazê gerîla cuda ye. Ev ne şerê gerîla ye. Pêşmerge û gerîla ji hevdû cuda ne. Şêwazê gerîla di Rojhilata Navîn de nehatiye bikaranîn. Gava em hatin ser vê mijarê em ê berfireh vekin. Yanî pêşmerge berdewamiya şerê Kurd ê klasîk e. Lê ji wê gavekê pêşdetir de ye. Ango hinek xefk tê de heye, xwe veşartin û ji piştê ve li dijmin xistin heye. Hinek taktîk tê de hene, lê ew jî lazim e parastî be. Mesela ne parastî be nikarin tê de şer bikin. Ji ber ku mal û zarokên wan, hemû tiştên wan bi wana re ne. Ango wisa şêwazekî li gorî xwe ye. Ne şêwazê gerîlatiya li Çîn û Vîetnamê ye. Ya rastî heta salên ‘70’î gerîla li Rojhilata Navîn nîn e. Filistînî hewl didin gerîla bînin Rojhilata Navîn, ji ber hinek sedeman ev nabe. Şêwazê gerîlatiya rast bi şîroveya Rêber Apo di sala 1984’an de dikeve Rojhilata Navîn.

## E) Di Serhildanên Kurdistanê De Rola Jinên Kurd

Lazim e mirov vê yekê destnîşan bike; di berxwedana Kurdan de cihê jinan her tim heye. Çawa ku di berxwedana Koçgirî û Dêrsimê de li kêleka Alîşêr Zarîfe hebû, di hemû berxwedanan de jî her tim cihê jinên Kurd heye. Dîsa çawa ku li Dêrsim, Sason û gelek deverên din ji bo teslîmî dijmin nebe jinên Kurd xwe ji zinaran avêtine; bi wî awayî sekna qehremanî di aliyê jinên Kurd de pir zêde heye. Ji bo helwesta jin di aliyê şerkerî û sekna netewî de bê fêmkirin ez nimûneyekê bidim.

Di dîroka Kurdan de destana Derwêşê Evdî heye. Destana Derwêşê Evdî li herêma Qoser, Wêranşar, Serêkaniyê û wan deran tê jiyîn. Mîrê eşîra (konfederasyon) Millî, Temir Paşayê Millî heye. Eşîrên Tirkmen û Gês (Ereb) tên beriya Kurdan digirin. Berî, di navbera Reqa û Serêkaniyê de ye. Heya pişta Kobanî diçe, heya ber bi Mûsilê ve tê. Ew der berî ye û xelkê Kurd pezên xwe li wir xwedî dikin ango cihê Kurda ye, lê di sînorê Ereban de ye. Eşîrên Tirkmen û Gês bi 1700 suwariyên şer tên, beriya Kurdan digirin û nahêlin Kurd werin wir koçeriyê. Kurd dinêrin ku quwetek zêde û bijare ye. Çavê Kurdan jê nabire yekser lê bixin.

Li ser vê yekê zilamên eşîra Millan li hev kom dibin, li ser rê ango li pêşiya gund cihekî giya heye û ev koma zilaman li ser wî giyayî rûniştiye û nîqaş dikin ku çi bikin. Wexta zilam nîqaş dikin, ji ber ku cihê zilam lê rûniştîn li ser rêya avê bû, jin di wê derê re diçin avê û di vegerê de di ber cihê zilam lê rûniştine re derbas dibin. Wexta jin avê di ber wana re dibin, hemû kirasên xwe heya noqê radikin jor, ango jêra xwe tazî ne. Ji wan zilaman yek diçe

pêşiya jinan û ji wana re dibêje: “Hûn çi dikin, ma hûn dîn bûne?” Jin wekî bersiv dibêjin: “Çima?” Ew jî dibêje: “Ma ne li ser rêya we zilam hene, çima hûn tazî ne?” Jin ji wî re dibêjin: “Ka zilam li ku derê ne? Em tu zilaman nabînin!” Ew zilamê bi wana re diaxive dibêje: “Va ye li pêş we ne. Ma hûn nabînin?” Jin jî dibêjin: “Na, ew ne zilam in.” û bi wî şêwazî di ber wana re derbas dibin. Ango li vir jin dixwazin bibêjin ku heya hûn dijmin ji welatê me dernexin em we zilam nahesibînin. Jin vê peyamê didin wan. Tê gotin ku wê çaxê defa şer lê dixin û werga Derwêşê Evdî dikeve dewrê. Destana Derwêşê Evdî wisa dest pê dibe.

Cihê jinên Kurd di şer de parastina welat e. Ji ber ku zilam nikarin biryara şer bidin, jin dibêjin, ger hûn dijmin ji welat dernexin em we wekî zilam nabînin. Ev sekneke pir bi wate ye, welatparêziya kûr tîne ziman. Mirov ku ji vî alî ve lê binêre, ev tê wê wateyê ku jin bi sekna xwe ya di nava civakê de her tim parêzgera rûmetê ye, parêzgera welat e. Cihê sekna jina Kurd jî di şer de bi vî awayî ye. Mirov dikare pir nimûneyên vê bide.

Nimûne, Rindexan heye, ji malbata Eliyê Ûnis e û keçeke gelek bedew e. Ew jî werga ye. Ji ber keça Eliyê Ûnis e, leşker destpêkê wê digirin. Fermandarê wir ji Rindexan re dibêje: “Tu keçeke pir çeleng î. Ka were, ez te nakujim, ez ê te ji xwe re bibim.” Ango dixwaze têkilî pê re çêbike. Jixwe Rindexan şer dike û bi birîndarî dikeve destê dijmin. Rindexan wekî bersiv ji fermandar re dibêje: “Ez di axa bavê xwe de wekî hezkirî nêzîkî kesekî nabim, wî wekî mêr nahesibînim. Kerameta me heye, rûmeta me heye. Jixwe hûn min dibin. Eger ez ji axa bavê xwe derbikevim, wê çaxê ez dikarim daxwaziya te qebûl bikim.” Fermandarê wir dibêje qey wisa ye; lewre kes dest nade Rindexanê û wê bi xwe re dibin. Dema digihin ser pirê, Rindexan xwe ji ser pira Malabadî tavêje û dawî li jiyana xwe tîne. Ango ji bo heya pirê biçe û dest lê nedin werga ji fermandar re dibêje. Ev serpêhatî jî nimûneyeke ku di demên nêz de hatiye jiyîn. Jina Kurd, di şer de cihekî xwe yê wisa heye.

Komkujiya Zîlanê di wexta Serhildana Agiriyê de tê jiyîn. Zîlan di xeta Ercîş de doleke pir mezin e. Di komkujiya Zîlanê de gelek eşîr hene, lê di serî de eşîra Sîpkan heye. Eşîra Sîpkan dikin hedef û hemû eşîran didin ber xwe. Hemûyan bi mîtralyozan şehîd dikin. Di wir de berxwedana jinê bi heybet e. Yek ji wan jî teslîm nabe, tim berwedanê diparêzin ango şer dikin. Di Serhildana Agiriyê de Biroyê Heskiyê Têlî hem qehremanek e, hem jî sembolek e û nimûneyek pir balkêş e. Di dîroka Kurdistanê de zêde cih jê re nehatiye dayîn. Lê bi biryardarî û cesareta xwe bi rastî cihekî xwe yê cuda heye. Wexta li Çiyayê Agirî serhildan tengav dibe û dijmin Çiyayê Agirî dorpêç dike, Biroyê Heskiyê Têlî dibêje, “yên nikarin şer bikin wekî jin û zarok hene. Divê her kes jin û zarokên xwe bikuje û em hemû heta nefesa xwe ya dawiyê şer bikin.” Destpêkê ew bi xwe ehlê malbata xwe kom dike û hemûyan dixe dorê û dest pê dike, dikuje. Lê kesên hevalên wî yên serkêşiya serhildanê dikirin hemû rica dikin ku ew dest jê berde û zarokan nekuje. Lê ew nasekine 7-8 kesan dikuje, dûvre zor bela wî qaneh dikin û kuştinê disekinînin. Di vir de çiqas kesekî bi biryar e û mêrê Kurd çiqasî qehreman e wê eşkere dike. Di vê mijarê de tiştekî din a girîng heye. Dibêjin, Biroyê Heskiyê Têlî dema bi rêzê li zarokên xwe dixe, piştî çendekan di rêzê de bûka wî heye. Li bûka xwe naxe, jê derbas dibe. Bûka wî dibêje, “mamo, tu çima li min nadî, ma ne ez jî qîza te me?” Ev jî cardin qehremaniya jina Kurd eşkere dike.

Bi giştî jina Kurd welatparêziya xwe li pêş e û dema hatiye xwestin şer jî kiriye û bi xurtî beşdarî şer bûye. Lê ya herî girîng, jina Kurd teslîmbûn û stûxwarî qebûl nekiriye. Jixwe taybetmendiya gelê Kurd a herî li pêş, li hemberî dijmin teslîm nebûne û stûyê xwe xwar nekirine. Mirov dikare bibêje di vê helwestê de ji zilam bêhtir rola jina Kurd heye. Ruhê teslîmnebûnê yê li Dêrsim û gelek deveran xwe ji zinaran diavêt jêr, di serdema nû de di nav tevgera me de rêheval Berîtan temsîl kir û berdewam kir. Jinên Kurd ên bi îdeolojiya Rêber Apo re naskirina xwe çêbûn û bi îdeolojiya rizgariya jinê ya Rêber Apo re xwe av dan hemû bûn fedaiyên demê. Ev ruhê fedaî di şexsê rêheval Zîlan, Gulan, Sema û Şîlanan de pir baş eşkere dibe.

Di xeta Rêber Apo de bi vî ruhê teslîm nabe jina Kurd di asta fermandariyê de jî ev heqîqet temsîl kiriye. Di pratîka gerîlayê Kurdistanê de, di şexsê sekna rêhevala Azîme, Bêrîvan, Zelal, Nûda, Sorxwîn, Gulbahar û Çîçekan de fermandariya jinê û artêşbûna jinê xwe îspat kiriye.

## F) Sedemên Binkeftina Serhildanên Kurd

Sedemên cuda yên binketina serhildanên Kurdistanê hene. Di şêwazê şer de tenê tengbûn û dûzbûn nebûye sedema binkeftinê. Hemû mijar bi hev ve girêdayî ne. Lê sedema esasî ev e; civaka Kurd nikarîbû di nava xwe de serokatiya stratejîk ava bikira. Ango li Kurdistanê bêseroktî hebû. Bala xwe bidinê, me behsa mîran kir û bi piranî dewleta mêtinger mîr li hemberî hev bi kar anîne. Ango wekî Bedirxan Beg yek-du hinek derketine, xwestine di çarçoveya Kurdistanê de performansekê raber bikin, ew jî ketine hinek şaşiyan û nikarîbûn ji vê rolê re tam bibûna bersiv. Di cavaka Kurd de serok derneketiye. Heta Ehmedê Xanî vê di destana xwe de tîne ziman û dibêje:

"**Ger dê hebûya me padîşahek** *(Eger padîşahekî me hebûya)*

**Laiq bidiya Xwidê kulahek** *(Xweda kulahek jê re layiq bidîta)*

**Teyîn bibûya ji bo wî textek** *(Ji bo wî textek bihata teyînkirin)*

**Zahir vedibû ji bo me bextek** *(Elbet ji bo me jî wê şansek vebûya)"*

Ehmedê Xanî, di civaka Kurd de êşa tunebûna serokatiya stratejîk di van ristên helbesta xwe de tîne ziman. Her wisa di pir gotinên Xanî de lêgera serokatiya stratejîk heye. Her tim li wê digere. Ji ber ku dema neteweyek serokatiya stratejîk ji nav xwe dernexe, ew netewe nikare yekîtiya xwe jî çêbike û rêya xwe diyar bike. Kêmaniya esasî ev e. Lewma serhildanên Kurdan bi bin ketine. Helbet ku serok tune be bername û stratejî çênabe. Ji ber ku serok bernameya wî welatî saz dike û stratejiya wê diyar dike.

Xala din a ku pir girîng ev e; Kurdistan li Mezopotamyayê erê wekî neteweyekê ye, lê tê de cudatî pir in. Mesela ciyawaziyên zaravayê hene û zêde ne. Ciyawaziyên mezheb û ol zêde ne. Di vê dawiyê de bû çar parçe û parçebûna erdnîgarî jî ket ser. Ango serokekî bikaribe hemû Kurdistanê hembêz bike derneket. Ger netewebûnek çêbibûya, Dêrsim, Şêx Seîd û Agirî bi hev re bimeşiyan, wê bi ser biketan. Wisa bûna bi bin nediketin, lê ne yekgirtî bûn, parçeyî bûn. Dewletê ew pir rihet xapandine. Yek sekinandiye, ya din pelixandiye û dûvre çûye ya din, dûvre jî diçin ser a din û her wisa berdewam kiriye.

Heman rewş li Başûrê Kurdistanê jî hatiye jiyîn. Dijmin di Başûr de cudahiya di navbera Behdînan û Soran de pir bi kar anî û heya niha jî bi kar tîne. Heman tişt li Rojhilatê Kurdistanê jî heye. Heta li Rojhilat hîn zêdetir e. Mesela cudahiya mezheb û zaravayê heye. Li Rojhilat soranî, kurmancî, kelhorî, hewremanî û lorî heye. Jê şûn de li Rojhilat di warê baweriyê de Sûnî, Şîa û Yarsan, El-Heq hene. Ango di Rojhilat de cudahiyên mezheb û zaravayan hene.

Di vî welatî de ji bo tu bikaribî hemû bawerî, zarava û taybetmendiyan temsîl bikî divê serokekî neteweyî derketiba, lê derneket. Kêmaniya esasî ev e. Lewma serhildanên Kurd bi bin ketine. Her wiha nikarîbû ji bo xwe îdeolojî ava bikira. Dema Kurd hemû Zerdeştî bûn, Zerdeştî heman demê roleke wekî îdeolojiya neteweyî dileyîst û asteke xwe hebû. Cardin jî

kêmanî hebûn. Ji ber Pers jî Zerdeştî bûn mirov nikare bibêje tam roleke neteweyî dileyîst. Wekî tê zanîn Zerdeştî ola yekemîn e ku dibêje “xwedê yek e.” Û baweriya yek xwedayetiyê diparêze. Hinek tiştên di ola Zerdeştî de hene civakbûnê xwedî dikin. Ev wekî paqijiya însan, axê, exlaq û xwezayiyê esas digire. Ji bo vê di nava Kurdan û herêmê de asteke pêşketinê çêdike. Di Zerdeştî de girêdana bi axê re, paqijî, exlaq û başî derdikeve pêş. Dema di nava civaka Kurd de bîr û baweriya Zerdeştî lawaz dibe û cur bi cur ol û bawerî di Kurdistanê de bi pêş dikevin, ev yekîtiya baweriyê ango îdeolojiyê belav dibe. Piştî wê bi hatina Îslamiyetê re derfeta ku yek baweriyê bi pêş bixin ava dibe, lê cardin ev jî di aliyê oldarên Kurdan de rast nayê bikaranîn. Di bîr û baweriyê de yek destî û netewegerî çênabe. Bêhtirî xwe di nav serekên Kurdan de bingehê hevkariya serdestan bi pêş dikeve.

Ya din jî netewebûn kêm e. Netewe çi ye? Gel e. Gel ji bo bibe netewe divê tiştên xwe yên berbihev hebin. Yanî netewebûn di Kurdan de zeîf e. Di van salên dawî de bi Tevgera me re netewebûn bi pêş dikeve. Em ê dûvre vê mijarê vekin. Bi ruhê 15’ê Tebaxê re netewebûn bi pêş ket. Em netewebûnê nû ava dikin. Netewebûn di Kurdistanê de kêm e. Hesta neteweyî heye, lê hesta xwe parastin û eşîra xwe parastinê li pêş e. Lewre însan zû ji netewebûnê derdikeve. Lewma netewebûn ne xurt e. Mesela, gelek Kurd mezhebê dixin pêşiya netewebûnê. Halbûkî destpêkê netewebûn, dûvre mezheb û ol tê. Divê wisa be. Berevajî, nêzîkatiya “Destpêkê mezheb û ol, dûvre netewebûn” heye. Netewebûn zeîf e. Netewebûn hatiye zeîfkirin.

Me behsa bişaftin (asimilasyon) û qirkirinê nekir. Vana hemû netewebûnê zeîf dikin. Lê bi awayekî bingehîn netewebûn bi pêş de neçûye. Ango di sedemên windakirina serhildanan de ev bandor hene. Ji bo vê yekdestiya neteweyî çênebûye. Serhildanên Kurd hemû herêmî mane. Tu serhildan negiha asta tevahî neteweyê. Di taktîk û şêwazê şer de jî lawaz mane. Kurd pir şerker in, şer dikin. Feqet şerkerî û di şer de hostabûn cuda ye. Kurd nabin stratejîst û taktîsyenên şer. Ji aliyê din ve tu lê dinêrî, civaka Kurd civaka herî şerker e, lê belê di şer de qet zafera xwe nîn e. Ev nakokî ye.

Bi derketina Rêber Apo re gelê Kurdistanê êdî dixwaze van valatiyên me anîn ziman dagire. Derketina Rêber Apo ji vê rewşa bêserokbûnê, bêbernamebûnê, bêîdeolojîbûnê re û ji bê yekîtiya neteweyî re dibe bersiv. Dema baweriyek, ruhek û bernameyek wisa bi pêş ket, êdî Kurd dikare biaxive û perspektîfa Kurdan heye. Gundiyek dikare biaxive. Zarokek Kurd jî êdî di cemaetan de dikare biaxive. Çima? Ji ber ku dizane perspektîf û mafê xwe heye. Berê Kurd ne wisa bû. Mesela, pirtûkek jî li ser Kurdan nebû. Kesî der barê Kurdîtiyê de ne nivîsandibû, tune bû. Ji bo ku em pirtûkeke kurdî bibînin em digeriyan. Mesela, wexta ez di lêgerê de bûm pirtûka bi navê “Kurd” (Kürtler) ya nivîskarê Alman Bazil Nîkîtîn nivîsandî, hebû. Hatiye li Kurdistanê geriyaye, adet û kevneşopiyên Kurdan nivîsandiye. Di pirtûkê de behsa dawet, şîn û şahiyên Kurdan dike. Me ew pirtûk xwend, vana dinivîsand. Çima me ewqas xwend? Ji ber ku navê wê “Kürtler” bû û wê çaxê pirtûkek wisa li ser Kurdan hatibe nivîsandin, nebû.

Bi derketina Serokê me re tevgera me li ser Kurdan gelek nivîsandin û pirtûk bi pêş xistin. Bi rêzaniya me di nava Kurdan de gelek kes û tevgerên Kurd ên din jî êdî der heqê Kurdistanê de dest bi nivîsandinê kirin. Ango vê zanistê Serokatî û tevgera me xist Kurdistanê. Berî vê li Kurdistanê tiştekî wisa nebû. Belkî temenê hevalan negihe, lê di salên ‘70’î de tiştên li ser Kurdîtiyê û pirtûkên li ser Kurdan hatibû nivîsandin nebûn. Ji ber ku di aliyekî de hem serhildanên xwe şikestin, baweriya xwe kêm bibû, hem jî li aliyekî bişaftin û qirkirin hebû, bêhêvîtî hebû û her diçû Kurdîtî jibîrkirin bi pêş diket.

Em tevgereke enternasyonal in; em ne li dijî tu netewan an jî zimanan in. PKK qet ne wisa ye, lê niha em hinekî li ser zimanê kurdî disekinin. Çima? Ya rastî berê em ewqasî li ser ziman nedisekinîn. Lê niha em pir li ser disekinin. Ji ber ku dagirkeriyê xwestiye zimanê me tune bike û wisa biçe encamê. Me li jor behsa rapora Îsmet Înonu kir. Di sala 1925’an de, wexta ku tevgera Şêx Seîd radibe û serhildanê dipelixînin Plana Îslaheta Şerqê amade dikin. Li dijî

Kurdan dibêjin, lazim e em çi bikin? Destpêkê dibêjin, “em bi Kurdan re îtifaq bikin.” Dûvre înkar dikin û dibêjin, “divê em wan ji Kurdîtiyê derbixin. Berî her tiştî lazim e Kurdîtiyê jibîr bikin; ji bo vê divê em Kurdan surgûn bikin. Divê em Kurd, Ereb, Tatar û her kesî li nav hev bixin. Em ji van neteweyeke Tirk ava bikin.” Ango bi bişaftinê -ev bi xwe tê wateya qirkirina çandî- dixwazin hemû kesî bikin Tirk. Van çandan hemû bihelînin û neteweya Tirk ava bikin. Ji bo vê dibêjin: “ Em çawa Kurdan fêrî tirkî bikin û kurdî bidin jibîrkirin?” Ji sala 1925’an heta niha her li ser vê mijarê difikirin. Ango ev 88 sal in zêdeyî 10 rapor û planên veşartî çêkirine. Jixwe hinek ji van raporan di van salên dawî de derketine holê. Ango heta niha raporên dewletê yên bi dizî û veşartî hene. Di van raporan de wê Kurdan çawa bikin Tirk, hebûn û çanda gelê Kurd çawa tune bikin, li ser vê mijarê nêrîn, pêşniyar û plan hene.

Pir balkêş e; hîn di sala 1925’an de dibêjin, “Destpêkê jinan fêrî tirkî bikin.” Heman tişt sala 1980’yan bi Cuntaya 12’ê Îlonê re jî dubare kirin. Generalê Cuntayê li Perwariya girêdayî Sêrtê ji gel re digot: “Divê em xwişkên xwe fêrî tirkî bikin.” Di wexta Cuntayê de bi şev jin û zilam diçûn dibistanê û dihatin perwerdekirin. Bi roj zarok diçûn dibistanê, bi şev jî jin û zilam diçûn dibistanê. Ji bo hemû Kurdan fêrî tirkî bikin, hemûyan bikin Tirk û kes bi kurdî neaxive û kurdî rabe Cuntayê ew plana qirkirinê dîsa da destpêkirin. Dixwestin Kurd û Kurdîtiyê ji kokê ve rakin. Kurd ku neteweya herî qedîm, herî dewlemend, herî xwedî dîrok û paşeroj e, dixwazin koka wê biqelînin. Ma ji vê bêwijdanîtir, ji vê zalimtir, tiştekî ji vê hîn xirabtir heye? Xwestin vê yekê li Kurdan bikin. Lewma lazim e em jî di Kurdîtiyê de israr bikin. Lazim e êdî kes neçe dibistanê Tirkiyê û her kes dibistanên tirkî protesto bike. Va ye dibistanên me bi xwe hene. Em ji bo çi biçin dibistanên Tirkiyê? Divê em êdî di vê yekê de israr bikin. Ev pêwîst e.

Sedemên binkeftinê ev in: Ji ber netewebûn kêm e û yekîtî nîn e; ji ber serokatiya stratejîk nîn e; ji ber stratejî û taktîka şer tune ye. Di vir de taktîka şer girîng e û roleke bingehîn dileyîze. Di şerê Kurdan de bêtaktîkî heye. Di Kurdan de şerkerî pir e, lê serkeftina xwe nîn e. Ji ber ku sîstema xwe ya şer a li gorî taybetmendiya Kurdistanê û ya xwe bi xwe ava bike, nîn e. Bêhtir serhildêriya (isyancılık) gundîtî heye. Ango bertek raber dike, derdikeve serî radike, lê stratejiya biçe serkeftinê nîn e.

# Beşa Şeşemîn:

# LI KURDISTANÊ DERKETINA PKK'Ê Û REWŞA ŞER

Kurdan ger di wexta xwe de li ser bingehê zanebûnekê stratejî û taktîkên gerîla nas kiriban û bimeşandan, bi îhtimaleke mezin wê berxwedana gelê Kurd bigihîşta encamê. Mao Zedûng dibêje: "Şêwazê gerîlatiya di Çînê de derketî holê, berê li Hebeşîstanê bihata meşandin wê bi ser biketa. Hebeşîstanê her li ber xwe da, lê bi bin ket. Bi şêwazê gerîla wê bi ser biketa." Mao ev nêrîna xwe ji bo Hebeşîstanê gotiye, mirov dikare ji bo Kurdistanê jî vê bibêje. Ango di dema Şêx Seîd û Dêrsimê de stratejiya gerîla bihata pêkanîn dibe ku bi ser biketa. Lê wê çaxê tam teoriya gerîla tune bû. Bêguman şêwazekî wisa bihatan meşandin encam wê cuda bûya. Jixwe şoreşa Kubayê li ser teoriya Şerê Gel ê Demdirêj pir ne xurt e. Bi hewldana dest û pî şoreş pêk anîn. Ev pirtûka Mao ya 10 prensîbên gerîla vedike, di hundirê şer de dikeve destê Kubayiyan û ji bo vê dibêjin, "Ev pirtûk ji bo me bû firsendek." Ango pir sûd jê girtine. Yek jî dibêjin, "di şert û mercên Kubayê de me berê jî hinek tiştên wisa bi kar anîbûn. Jixwe ji neçariyê em çûbûn ser wê xalê." Gihîştina wê pirtûkê ji bo xwe wekî nîmetekê dibînin.

Zanebûna der heqê gerîla de nehatiye Kurdistanê. Gelê Kurd tiştekî wisa nemeşandiye. Şêwazê ku gelê Kurd berê meşandiye hinekî dişibe terzê gerîla. Pirtûka Ksenophon a bi navê "**VEGERA DEH HEZARAN**" heye. Li gorî di wê pirtûkê de hatiye nivîsîn; şehzadeyekî Pers ango yek ji zarokên qral ji Yûnanistanê tê Kurdistanê ji xwe re leşkeran kom dike. Ji ber ku wê biçe ji qralê Persan mafê desthilata xwe bigire. Tê û di rê de di neqeba Kurdistanê û Îranê de ji nexweşiyê dimire. Dema dimire ew leşkerên pê re hatine Yûnan in, dixwazin vegerin Yûnanistanê. Esas bi kurê qral re hatibûn ku mafê wî yê desthilatê wê bi dest bixistan û wê wana jî ji vê yekê sûd bigirta. Ji ber ku şehzade ji leşkerên Yûnan re dibêje, "Em biçin mafê min bigirin, ez desthilatê bi dest bixim ez ê paye û pere bidim we." Lê kurê qral di rê de dimire. Dema dimire neçar dimînin vegerin Yûnanistanê. Lê fermandarê wan tune ye. Dûvre li hev kom dibin, yek di nav wana de xwendevan heye, ew jî Ksenophon e. Biryar digirin û wî dikin fermandar. Ew hem wekî katib serpêhatiya rêwîtiya xwe dinivîse, hem jî leşkeran îdare dike. Fermandar heye, lê hemû wekî hev in. Tim tên wî esas digirin. Ev leşkerên Yûnan li Kurdistanê bi paş de vedigerin.

Ksenophon serpêhatiye rêwîtiya xwe nivîsandiye, kiriye pirtûk. Di wê pirtûkê de tê gotin: "Gava em ketin rê li me xistin, em vedigerin ji bo em kesên li me xistine bibînin, lê me kes nedidît." Li Kurdistanê nexwe şêwazê gerîla heye. Di pirtûkê de tê gotin ku wekî xeyaletan in. Her ku leşkerên Yûnan xwe komî hev dikin û dikevin rê, ji kêlekê ve li wan dixin. Leşkerên Yûnan ji bo li wan vegerin dikevin rê û li wan digerin, lê kesî nabînin. Hejmara leşkerên Yûnan 10 hezar e, ewqasî derbe dixwin, lê yek kesê ku derbe li wan dixîne nabînin. Ango li Kurdistanê perîşan û şerpeze dibin. Kurd li wan leşkeran dixin û xwe vedişêrin. Ji cihekî bilind kevir gêr dikin dolê, ew kevir li kevirên din dikevin û bi dehan kevir bi hev re bi ser leşkerên Yûnan de dibarin. Ew jî bi suwarî ne û hespê xwe hene û karwan in, lewre ji ber keviran perîşan dibin. Ev şêwaz berê di nava Kurdan de hebûn. Lê di van sedsalên dawiyê de bikaranîna terzê gerîla tune ye. Di şerê Kurdan de şerê mewzî û eniyê ketiye pêş.

Ya rastî gerîla bi giştî di Rojhilata Navîn de nîn e. Mesela, li şerê Omer Muxtar ê ku di Lîbya de li dijî Îtalya meşandî binêrin. Di wir de jî şerekî bêhempa hatiye meşandin. Di şerê Omer Muxtar de jî gerîla nîn e. Li ser hespan şer dikin. Wê demê Îtalî bi wesayîtên zirxî tên ser wan, ew jî singê xwe dixin erdê û bi mawzeran şer dikin. Heta ji bo kes nereve destpêkê her kes lingê xwe girê dide. Lingê xwe girê didin û singê xwe dixin erdê, lê tang tê pêl wan dike, dipelixîne û bi ser wan re derbas dibe. Min berê carekê van mijaran nivîsandibû. Hinek hevalan gotibûn, "wekî biçûk dîtin û nizm kirin tê de heye", ne wisa ye. Rêzdariya me heta

dawî ji berxwedana Omer Muxtar re heye. Omer Muxtar însanekî welatparêz e û ji bo welatê xwe biparêze di wî temenê xwe de şer dide destpêkirin. Lê terzê gerîla nizanîbû. Ger wî terzê gerîla zanîbûya wê bi ser biketa. Lê wê çaxê li ser pişta hespan şer dike û hesp jî hîn zêde dibin hedef. Wekî şerê Çermesoran (Kızılderili) e. Li ser pişta hespan şer kirine. Çermesor êrîşî qereqolan dikin û dora qereqolan difetilin, leşker jî wan yek bi yek dikujin. Ger hespan bisekinînin û bi dizî biçin ser qereqolan û xwe bigihînin qereqolê û di hundir de lê bixin, wê encam bigirin. Nexwe wê çaxê ewqas bîr nebirine. Niha van hemû tiştan hene. Dibe ku îro ev ji bo me asayî be. Lê binêrin; berê însanan nizanîbûn wisa bikin. Heman tişt Kurdan jî nizanîbû. Bedirxan Beg li şûna ku diçe Korqendîl digire, hêza xwe li Çiyayê Botanê belav bikira û çiya bigirtan baştir dibû. Di nava çiya û geliyên Kurdistanê de xwe winda bikiran û wekî xeyaletan hereket bikiran û car caran êrîş bibirana ser dijmin wê encam cuda bûya. Lê wisa nakin, cihê diyar digirin. Wê demê van tiştan nedihat bîra wan. Ango şêwazekî wisa nedizanîn. Mirov fêrî çi dibe, wê dike.

Di tevahî Rojhilata Navîn de mantiqê gerîla nîn e. Dibe ku ji bandora feodalîteyê tê; ev cihê lêkolînê ye. Di Rojhilata Navîn de di pir kevin de şêwazekî wekî gerîla hebû. Wekî li Kurdistanê jî heye, di pirtûka bi navê “Vegera Deh Hezaran” de heye. Nexwe li Kurdistanê şêwazê wisa hene, lê di van demên dawî de şêwazê gerîla di Rojhilata Navîn de nîn e.

Li Filistînê dixwazin wekî gerîla şer bikin, lê erdê Filistînê pir biçûk e û çiya jî nîn e. Ji bo terzê gerîla ne ferz e îleh li çiyê be; terzê gerîla li deştê jî dibe. Mesela, Polîsaryo çol û qum e, li wir jî şerê gerîla meşiyaye. Şoreşgerê Elsalvador digot: “Çiyayê me gelê me ye.” Li Elsalvador zêde çiya nîn in, lê şerê gerîla meşandine. Ji van mînakan jî tê fêmkirin ku, şerê gerîla ne ferz e îleh li çiyê be. Lê ji bo gerîla cihê herî mukemel çiya ye. Cihê ku gerîla lê bi pêş ketiye, Çîn û Vîetnam in. Erdnîgariya Çîn û Vîetnamê di warê çiyê de mukemel e. Lê şerê gerîla li deşt û bajaran jî dimeşe. Ango gerîla şêwazek e. Welhasil şerê gerîla li Filistînê bi pêş neketiye, ji ber hem erdê wê biçûk e, hem jî jixwe Îsraîl wana ji welatê wan derdixe. Îsraîlê derdora xwe û sînorê xwe pir qayîm kiriye. Zehmet e kesek di wî sînorî re derbas bibe. Gava hinek derbas bibin xuya dibe, projektorên wan hene. Ango Filistîniyan derfet nedîtin şerê gerîla bimeşînin. Lewre navê gerîlayê Filistînê, “fedaî” ye. Ji gerîlayên xwe re dibêjin, “fedaî.” Di gerîlayê Filistînê de terzê fedaî bi pêş dikeve. Ne wekî gerîlayê klasîk, lê ji şêwazê gerîla bêhtir, şêwazê fedaî li wir bi pêş dikeve. Ji bo vê yekê di Rojhilata Navîn de terz û şerê gerîla zêde nîn e.

Terzê gerîla yekem car di nava şoreşgerên Tirkiyê de bi pêş dikeve. Li Tirkiyê û li tevahî cîhanê di sala 1968’an de tevgera ciwanan bi pêş ket. Di wan salan de çepîtiya Tirkiyê xurt bû. Ciwanan serkêşî kir û li gel Filistîniyan perwerde dîtin. Ciwanên şoreşger, ji bo şerê gerîla bikin li Lubnanê perwerde dîtin û vegeriyan Tirkiyê. Ji ber ku biryara Mahîr Çayan Şerê Gel ê Demdirêj e. Mahîr Çayan dixwaze terzê gerîla bimeşîne. Denîz Gezmîş jî perwerde dibîne, ji Lubnanê derdikeve û vedigere Tirkiyê. Lê yên şopdariya wî kirin hinek şolî kirin. Jixwe Denîz Gezmîş jî dixwaze şerê gel ê demdirêj û terzê gerîla bingeh bigire. Îbrahîm Kaypakkaya jî derdikeve çiyê û dixwazin li Dêrsimê gerîlatiyê bimeşînin. Lê ji ber tecrûbeya wan tune bû hîn di gava yekemîn de şikestin, nekarîn xwe biparêzin. Jixwe di rê de Denîz Gezmîş hat girtin.

12 kes li Kizildereyê, li gundekî di mala muxtar de sekinîne. Çend teknîsyenên Îngilîz û Kanadî girtine, ew êsîr jî li cem wan e. Herhal muxtar bi xwe wan îxbar dike. Leşker tên dora wan digirin, ew jî derdikevin ser ban û li ser ban şer dikin. Leşkeran jî dora wan girtiye. Şerekî wisa pêşiya xwe nîn e û îmha ye. Ango tecrûbe kêm e. Di wir de şer dikin, dewlet li wan dixe û şehîd dikevin. Ertugrul Kurkçu jî di heman grûbê de ye. Ji wê grûbê tenê ew sax difilite. Carina ew bi xwe jî behsa vê mijarê dike. Wê çaxê ew serokê Dev-Genç’ê yê fermî ye. Dibe ku hevalên wî jî dixwazin ew xilas bibe. Ger tecrûbeya wan hebûya bêguman wisa nedibû. Hemû di yek malê de nedicivîn û dema dijmin hat jî bi wî awayî na, wê bi şêwazên cuda cuda şer bikirana. Sînan Cem û hevalên xwe derdikevin Nûrhaqê, ew jî werga li wir şehîd dikevin. Hinek kesên bi wana re sax mane, niha jî carina behsa wan dikin. Mirov dibîne

ku pir ecemîtî heye. Bi kurtahî di gava yekemîn de Çepê Tirk nikarîbû şêwazê gerîla bi cih bikira û tesfiye bû.

## A) Li Kurdistanê Hewldana Gerîlatiyê ya Destpêkê

Wexta Rêber Apo nû dest pê kir, di perspektîfa tevgera me de gerîlatî hebû. Her çendî Serokatî çarçoveya wê ya teorîk di salên dûvre de bi pêş xistibe jî, di destpêkê de armanc pêşxistina Şerê Gel ê Demdirêj bû. Di civakan de şer tiştekî ruhî ye. Tiştê herî zêde heqîqeta mirov a cewherî dide der, şer e. Her civak li gorî civakbûna xwe, çawa ku sekneke xwe ya ruhî heye, her wisa sekneke xwe ya şer jî heye. Hem di civaka Kurd de û hem jî di civakên Rojhilata Navîn de sekneke ruhî û sekneke şer heye; ev jî piranî şerê mewzî û kelehan e. Ne şerê bi şêwazê gerîla ye. Lewre li Kurdistanê di pêşxistina şerê gerîla de gelek zehmetî derketin holê. Bi hewldanên Rêber Apo yên bi pir awayî re encex li Kurdistanê şêwazê şerê gerîla hinekî bi cih bû. Ev, heman demê ji bo tevahî Rojhilata Navîn jî nû ye. Ji ber ku di Rojhilata Navîn de şêwazê gerîla nîn e. Ev şêwaz yekem car li Kurdistanê hat bipêşxistin.

Di salên 1970'î de li Kurdistanê hinekî kapîtalîzm ji aliyê mêtingeriyê ve hatibû bipêşxistin, sîstema feodalî hinekî hatibû şikandin. Di Kurdistanê de nîv feodalî û nîv kapîtalîzm hebû. Zanebûn û nûbûn hêdî hêdî li Kurdistanê bi pêş diket. Li aliyê din, dagirkeriyê ji bo bişaftinê dibistan xistine Kurdistanê, lê ew ciwanên ji bo bihelin (asimile) çûbûn dibistanê, dûvre li Enqerê di zanîngehan de şiyar dibin. Di pêşengtiya Serokatiyê de bûn grûb û wisa fikra şoreşgerî nas kirin û fikra neteweyî bi pêş xistin. Mirov dikare li ser vê çarçoveyê dirêj jî bisekine. Lê hewce nake em di vir de zêde vekin. Tevgera me, dema xebata grûba îdeolojîk dikir jî, fikir û ramana xwe ev bû. Diviya gelê Kurd li ser îdeolojiyek nû, hemdem û bi şêwazê gerîla dest bi têkoşîna xwe bike û wisa azad bibe. Ji bo vê hîn di sala '77'an de hevalê Hakî Karer li Dîlokê hinek ceribandinên leşkerî bi pêş xist. Wekî tê zanîn, piştî wê hevalê Hakî ji aliyê kontr-gerîla ve hat şehîdkirin. Ji bo tolhildana hevalê Hakî Karer yekem car hewceyî bi yekîneyên çekdarî çêbû. Bi vî şêwazî ew kesên ku hevalê Hakî şehîd kirin ên wekî Alaadîn Kapan û hevalên wî hatin cezakirin. Dûvre li hemberî êrîşên faşîst û polîsan berxwedan hebû. Ferz bû ku em di Kurdistanê de bibin hebûnek. Lewre diviyabû me xwe li hemberî êrîşan biparasta.

Berê me bi kulman xwe diparast. Di dibistanan de me bi kêran xwe diparast, dûvre hêdî hêdî demançeyên biçûk ên 7 numare hatin peydakirin. Bi demê re demançeyên 14 xwur jî ket destê me. Me dît ku ne bi çek be em nikarin xwe biparêzîn. Ji ber ku li Hîlwanê şer çêbû. Ev şer çawa bi pêş ket? Di salvegera şehadeta hevalê Hakî Karer de hevalên me bi dest resmê hevalê Hakî çêkiribûn û teksîr kiribûn (zêde kiribûn) û li her derê bi dîwaran ve xistibûn. Li Hîlwanê eşîra Suleymaniyan hebû. Ew hakimê bajêr bûn, şarederî di destê wana de bû û bi MHP'ê re têkiliyên wan hebûn. Polîs, MHP û Suleymanî hemû bi hev re tevdigeriyan. Sibê radibin, dibînin ku li Hîlwanê li her derê resim hatine darvekirin. Bi şêwazekî heqaret bikin pîsî li wêneyê hevalê Hakî didin û diqetînin.

Wê çaxê li Hîlwanê hevalê me yê berpirsyar hevalê Xelîl Çavgûn hebû. Ji ber vê sedemê hevalê Xelîl hevalên li Hîlwanê kom dike. Jixwe heval piranî ciwan in, ango ciwanên diçin dibistana amadeyî ne. Hevalê Xelîl di dibistaneke taxê de hevalan kom dike. Nêzî 20 hevalên ciwan in. Ji wana re dibêje, "Suleymaniyan heqaret li resmê hevalê me kiriye, em li hemberî vê çi bikin? Xeterî li ser me heye." Li ser wê çi bikin, diaxivin. Dijmin çawa xeber digire ku di wê dibistanê de civîn çêdibe, bi ser dibistanê de digirin. Dema bi ser dibistanê de digirin hevalê Xelîl Çavgûn hemû ciwanan di pencereya dibistanê re dide revandin û wan dişîne. Ew bi xwe jî diçe deriyê pêşiyê vedike û derdikeve. Bi hevalê Xelîl re demançeyek kevin heye. Wê çaxê zêde çek li gel me nebû. Hevalê Xelîl çeka xwe dikişîne ku li wan bide, lê çeka hevalê Xelîl naxebite. Wana jî hema li hevalê Xelîl direşînin û şehîd dikin.

Di salvegera şehadeta hevalê Hakî de hevalê Xelîl şehîd kirin. Jê şûn de şopandin û gotin zarokê kî Apocî ye û li wan geriyan. Hevalên me jî neçar man ji Hîlwanê derketin û li gundan xwe veşartin. Ji ber ku bi ser malan de girtin. Zext li malbatan kirin ku zarokên wan Apocî ne. Hevalên me ciwanên xwendekar bûn, diçûn dibistanan. Van hemû tiştan raber dikin ku ger tu xwe neparêzî, tu nikarî bi hebûn bî. Ango rakirina çek wisa xwe li ser me ferz kir.

Berxwedana Hîlwanê destpêkê di pêşengtiya hevalê Kemal Pîr de, piştre jî di pêşengtiya hevalê Mehmet Karasungur de dest pê bû. Çalakiyên li wê derê ku bi şêwazê lê bide, bireve û xwe veşêre çêbû, eşîra Suleymaniyan felç kir û neçar man teslîm bibin. Ji ber ku yê li hemberî xwe nedidîtin û nizanîbûn kî li wan dide û wê xwe li hemberî kî biparêzin. Ji bo vê jî şaş bûn û neçar man teslîm bibin. Di vir de şêwazek nû heye û wekî destpêka şerê gerîla ye. Bêhtir bi şêwazê çalakiyên ferdî yan jî du kesan pêk dihat û encam girt.

Heman demê ku partiya me PKK hat damezrandin, êdî biryara berxwedan û şerkirinê misoger bû. Dewletê hema pê re Komkujiya Mereşê pêk anî. Ev kirin hincet ku sîstema rêveberiya awarte (sıkı yönetim) bi pêş xistin û li ser tevgera me êrîş zêde bûn. Ji ber ku tenê ne di Hîlwanê de, li gelek deveran êdî tevgera me çalakiyên ferdî bi pêş dixist û dijmin ji vê tirsiya bû. Xisûsa din a ku eşkere bûyî, heta mirov li Kurdistanê kompradorên feodal ên hevkarên dijmin neşkîne, mirov gel ji bin bandora wan dernexe, mirov nikare şoreşê jî bimeşîne. Ji bo vê, şerê me yê li dijî kompradorên feodal û îxanetkaran ket pêş. Ji ber ku axayên zordest hebûn, hinek ji wan xwedan eşqiya û zîndan bûn, li xelkê zilm dikirin, kesî nedikarî li hemberî wan biaxive.

Bi taybetî li Siwêregê Mehmet Celal Bucak hebû. Bi xwe hem parlamenter bû, hem reîsê eşîrê bû, hem jî reîsê eşqiyayan bû. Ango hemû tişt bû. Ger mirov li hemberî yên wisa têkoşînekê bi pêş nexe, tesfiye neke û li hemberî feodalîteyê şer neke, nabe. Ango wana civak zeft kiribûn. Li hêlekê hinek ji wana bi faşîstên MHP'yî re hevkarî dikirin, qismê mezin jî bi dewletê re bûn. Ji wana pir kêm hene ku welatparêz in. Di vê sîstemê de yê herî li pêş, M. Celal Bucak bû. Hat fikirîn ku mirov li hemberî M. Celal Bucak şer bike û wî ceza bike, wisa şer wê li Siwêregê belav bibe û Hîlwan bi şêwazekî gelêrî wê bi pêş bikeve. Jixwe li Hîlwanê piştî serkeftinê hemû gel bi me re bûn yek. Destpêkê gel tirsiya, her kes çû mala xwe û gotin, "kî dikare van axayan?" Gava dîtin ku Apocî bi ser ketin, tevgera me li Hîlwanê bi girseyî bû. Heman tişt li Siwêregê jî bibe wê çaxê ev girse wê bibe çi? Wê ev girse bifetile bingehê şerê gerîla. Ango Serokatî hesab kiriye ku di 1979'an de tevgera li Siwêregê bifetile gerîla. Hedef, avakirina gerîla bû. Lê pêvajoya Siwêregê ji ber kêmaniyên peyda bûyîn wekî hatî hedefkirin bi pêk nehat.

Beriya ku şerê Siwêregê dest pê bike, li Hîlwanê yekîneyeke çekdar a kamil hatibû sazkirin. Mirov dikare bibêje ev yekîneya me ya leşkerî ya destpêkê ye. Mahîr Çayan beriya ku şehîd bikeve, gotiye: "Xwezî taximeke me ya leşkerî ya kamil hebûya!" Belkî jî bi vê bibîrxistinê hevalê Mehmet Karasungur li Hîlwanê yekîneya gerîla ya destpêkê bi çek kiriye. Ew taxim bêhtir li gundan disekinîn. Wê çaxê em li bajaran bûn, lê ew taxima me ya bi çek li gundan bû. Çekên wan tam bi teşkilat bû. Qlêş û G-3'yê wan hebûn û di destê wana de çeka G-1 hebû. Wê çaxê çeka G-1 teleb didît. Halbûkî G-1 ne çekeke ewqasî baş bû, lê di nava Kurdan de şerê dûr, mewzî bi mewzî heye. Bi hewesa ku di şer de fîşek dûr biçe G-1 dişixulandin. Ji ber ku G-1 dûr diçû, G-1 teleb didît. Di wê yekîneyê de çeka G-1 jî hebû. Dûvre ew G-1 bû sedema hinek rewşan. Hevalan dixwest li M. Celal Bucak bixin. Mala xezûrê M. Celal Bucak li Hîlwanê, li ser rê bû. M. Celal Bucak carina diçû mala xezûrê xwe. Xeber hat ku Celal Bucak hatiye mala xezûrê xwe. Parêzvanên wî bi wî re ne. Jixwe tenê nedimeşî, lê gava li hundir rûdinin li derve nobedar nîn e. Ger mirov here ji derî ve çekê li wana bikişîne, mirov dikare hemûyan teslîm bigire. Ji ber ku heta ew xwe komî ser hev bikin, çekên xwe derxin mirov dikare wan teslîm jî bigire. Ango ev tiştekî mumkûn bû.

Di vê rewşê de gava xeber tê ku Celal Bucak li mala xezûrê xwe ye, hevalê Mehmet Karasungur van 9 hevalan ango yekîneya çekdar digire gel xwe û suwarî du erebeyan dibin.

Bes tiştek heye; gava heval behsa çalakiyê dikin, kesek ji nav wana dikeve teredûtê û hevalê Mehmet Karasungur dibêje, “ev heval hinekî bi teredût e.” Wê çaxê çeka wî jê digire û wî dişîne karekî din. Lê beriya wê, gava grûb di rê de diçe, li ser rê fîşekeke G-1’ê ya zingarî dibînin. Ew kes wê fîşeka zingarî dixe çeka xwe û dibêje, “ez ê bavêjim.” Hevalên din destûr nadin, ji ber ku gund nêz e, wê deng biçe gund. Li wir di nava xwe de nîqaş dikin, ji bîr dikin û fîşeka zingarî di çekê de dimîne. Li ser şarjorê fîşeka destpêkê ew fîşeka zingarî ye. Lazim bû wî kesî ew fîşek derxista, yan jî ji hevalê Mehmet re bigota. Hevalê Mehmet jî çek û rextê wî girtibû. Gava diçin ber deriyê mala M. Celal Bucak, destpêkê hevalê Mehmet di pêşiyê de diçe, yekser dikeve hundir û dibêje, “teslîm bibin!” Dema dibêje, “teslîm bibin”, yek ji parêzvanên Bucak dikeve hewldanê. Hevalê Mehmet dixwaze lê bide, mekanîzmaya çeka xwe dikişîne, lê çek nateqe. Ew fîşeka zingarî pê ve dizeliqe û nateqe. Dema dixwaze jê derxe, vê carê asê dibe û mekanîzma nayê kişandin. Hevalê Mehmet neçar dimîne cardin di derî re bi paş de vedigere. Malbata Bucak jî şaş dibe, tavilê çekên xwe dikişînin û guleyan li hevalan dibarînin. Wisa ew firsenda destpêkê ji dest diçe.

Dûvre hevalê Salîh Kandal dikeve hundir û derbe dixwe. Mecbûr wî dikşînin jixwe dûvre heval Salîh şehîd ket. Ew çalakî destpêkê bi sedema wê fîşekî sabote bû. Ew yekemîn çalakiya taxima gerîlayê me ne. Hevalê Mehmet Karasungur dibêje ku, ‘ezê îleh wî sax bigirim.” Ji ber ku bi kuştin bûya hevalek dikarîbû biçûya bikuşta. Ew dibêje: “Na ezê wî sax bigirim. Ezê ji dewletê re bêjim; ‘heta hûn îlana belavoka PKK’ê di radyoyê de nexwînin ez vî parlementerî bernadim.” Wê çaxê dikin bi wê çalakiyê PKK’ê îlan bikin. Belavok hatiye nivîsandin pêwîst e rêxistin bê îlan kirin. Dibêje, “ ji ber ku Bucak parlementer e mecbûr wê dewlet vê daxwazê qebûl bike.” Wê çaxê serokê Partiya Adaletê Demîrel bû. Welhasil israr dike ku Buçak sax bigire. Ji ber israrê çend saetan şer dajo. Jixwe Bucak’î hemû bi çek in, yek- didu ji wan dimire û çend kes ji wan birîndar dibe. Celal Bucak bi xwe jî birîndar dibe. Lê belê hevalan nikarîbûn tam encam bigirtana û paşvekişiyan. Ew çalakî wisa bû. Jê şûnde şerê me û yê Siwêregê destpêbû.

Eşîra Bucakan got, “we xwestiye axayê me bikujin” û di Siwêregê de li ser xaniyan çeka MG-3 danîn û malên welatparêzan dan ber guleyan. Wisa lê hat ku hewcehiya parastina mal û gundên welatparêzan ket pêş. Halbûkî diviyabû ev şer bifetiliya şerê gerîla, lê wisa nebû. Wer lê hat ku li şûna em bibin gerîla, em ketin şerê mewziyan. Me ji vî terzê şer re digot “şerê kozikan.” Her kesî li ser xaniyan mewzî çêkiribû, ji wan mewziyan re digotin “kozik”. Taxa Bucakan hebû û hinek taxên hevalbendên me hebûn. Wisa her kesî li ser xaniyên xwe kozik çêkiribûn. Di navbera wan de çend sed metre mesafe hebû. Piranî tu kesî bi roj dengê xwe nedikir, lê bi şev şer dikirin. Destpêkê ji hev re dijûn didan, dûvre jî bi guleyan bera hev didan. Şev û roj her kes di cihê xwe de dima û em bi şev derdiketin. Mesela taxa me heye, taxa wan heye, wilo bajar bibû du beş. Di wî şerî de diviyabû me şerê gerîla bimeşanda, lê em ketin şerê kozikan.

Bi vî awayî şerê me fetilî şerê gundiyan, nebû şerê gerîla. Ango wek em mecbûr in filan û filan gundî biparêzin nêzîkatiyek bi pêş ket. Ji ber ku welatparêz bûn. Wê çaxê ji neçarî hemû hêzên me sabît di mewziyan de diman. Xelk tevlî me bû, lê ji bo gundê xwe biparêzin tevlî me bûn, wekî gerîla tevlî me nebûn. Welhasil ew şerê Siwêregê destpêkê ne fetilî gerîla, sabît ma, bû şerê kozikan. Wê çaxê bi giştî 16 hevalên me şehîd ketin. Ji ber ku hejmara me hindik bû 16 hevalên wê çaxê li gorî hejmara niha berdêla 500 hevalan bûn. Jixwe li derdora Siwêregê û Hîlwanê gelek hevalên me hatin girtin. Dewlet li ser sekinî. Jixwe li her derê şer hebû, li gund û bajaran şer hebû. Carina bi dewletê re jî şer dibû, lê bi esasî dewletê temaşe dikir. Dema Bucakan tengav dibûn mudaxele dikirin, wekî din şer di navbera me û eşîra Bucakan de dihat jiyîn. Bi cewherî, wî şerî pir tiştên me xwar. Ango pere, çek û cebilxaneya me hemû di wir de çû, hemû rêxistin ji bo wir şixulî. Wisa bû û ne fetilî gerîla, bû şerekî herêmî. Şerê me yê destpêkê wisa bû.

Di vir de çi heye? Bala xwe bidin vê yekê; ruhê Kurdîtiyê xwe da pêş. Ruhê Kurdîtiyê çi ye? Şerê mewziyê û şerê meydanê ye, şerê ku dûrî hev disekinin û di kozikan de şer dikine.

Ev şerê Kurd ê klasîk e û bi gundîtî ye. Di vir de em nebûn gerîla. Mebesta (niyet) Serokatiyê şerê gerîla bû, lê ne fetilî gerîla. Şerê me heta dema Cuntaya 12'ê Îlonê ajot. Beriya wê, partiyê şer ji navendîtiyê derxist, kir herêmî. Hinekî sist bû, lê dîsa dewam kir.

Di şerê Hîlwanê de û bi giştî beriya sala 1980'î taktîka me çibû? Taktîka me suîqest bû. Wî terzî bi rastî heybetek çêkir. Ji ber ku me tenê li Siwêreg û Hîlwanê şer nekir. Şerê me yê herî mezin li Dîlok, Ruha, Amed, Mêrdîn, Qers, Agirî, Dêrsim, Mereş, Semsûr û li hemû deran çêbû. Hema hema li hemû bajarên Kurdistanê şer çêbû.

Em yekem car li Mêrdînê bi artêşa Tirkiyê re ketin şer. Di dîroka PKK'ê de Şerê Şikestûnê heye. Li ser wê stran jî hatiye çêkirin. Di bihara '79'an de hevalê Cemal, Kemal û Selman di şerê Şikestûnê de şehîd dikevin. Qodê min girtî qodê şehîd Cemal e. Navê rast ê şehîd Cemal, Mehmet Kurt e. Ew şerê me yê destpêkê li hemberî artêşa Tirk bû. Di wî şerî de serleşkerek mir. Helbet leşker jî mirin, lê dewletê îlan nekir. Wê çaxê tenê mirina serleşker îlan kirin. Lê her sê hevalên me şehîd ketin. Heman demê Şikestûnê gundê malbata Ahmet Turk e. Jixwe hevalê Selman jî ji heman malbatê ye. Ew her sê heval endamên komîteya me ya jor a Mêrdînê bûn.

Ango li her derê me şer kir. Ya girîng, em li Hîlwan û Siwêregê bi wan feodalan re ketin şer û jê şûn de ev şer li gelek deveran belav bû. Li her derê feodalên Kurdistanê li dijî me rakirin, hemû kesên faşîst li dijî me rakirin. Dewlet bi wê nema, çepgir jî li dijî me derxistin. Hinek çepên şovenîst li hevalê me dixistin û digotin, "hûn ê neyin li vir neşixulin." Piranî li Dîlok, Mereş, Qers û wan deran bi me re şer kirin. Li aliyê Amed, Mêrdîn û vê xeta din hinek komên Kurd li hemberî me kirin şer. Bi taybetî di vê der heqê de pir zêde rêxistina bi navê KUK bi kar anîn. Wê çaxê bi vî awayî nehiştin em derbasî Botanê bibin. Sînorê me heya Cizîrê bû, nehiştin em ji wê şûn de biçin. Li hemberî me îtifaq çêkirin. Vana hemû bi esasî di çarçoveya plana Gladyoyê ya Tirkiyê de hatin birêxistinkirin. Heman demê bi vî awayî bingeha hatina Cuntaya leşkerî jî saz kirin. Şerê beriya 12'ê Îlonê di vê çarçoveyê de meşiya.

## B) Di Kurdistanê De Ji 1980'yî Şûn De Rewşa Şer

Di pêşdîtina Serokatiyê de hatina Cuntaya 12'ê Îlonê hebû. Ango Serokatî di şîroveyên xwe de tespîta ku "guman e cuntaya leşkerî were" kiribû û rewşa me li holê bû. Ji ber ku di me de amatorî hebû, tengasî hebû, pratîka teng hebû, girtin û şehadet pir çêbûn. Me nikarîbû em tam heq jê derkevin, xitimandinek çêbû. Serokatî ji bo vê xitimandinê biborîne grûba yekemîn a destpêkê ji bo perwerdeyê kişand Lubnanê. Ew grûb çû Lubnanê, perwerde dît û hat. Di grûbê de hevalên wekî hevalê Kemal Pîr, Egîd û Delîl Dogan hebûn. Hevalê Kemal Pîr di vegera welat de êsîr ket. Jixwe dîroka partiyê tê zanîn. A girîng partiyê xwest mudaxeleyî vê rewşê bike û sererast bike. Dijmin jî ferq kir ku partî li ser radiweste, wê sererast bike, jixwe Cuntaya 12'ê Îlonê amade kiribûn û bi lezgînî pêk anîn. Bi wî awayî ew pêvajoya berxwedanê ya me dixwest em veguherînin şêwazê gerîla, sekinî. Ji ber ku di şert û mercên heyî de li hemberî 12'ê Îlonê derfetên domandina şer kêm bû. Hewcehî bi amadekariyê hebû. Serokatî ev dît û biryar hat girtin ku ji bo amadekariyê em bi paş ve bikişin. Ji bo em derbasî şerê gerîla bibin li saha Filistînê, Lubnanê amadekarî hatin destpêkirin.

Di mijara şer de me hinekî behsa nêzîkatiya Serokatiyê ya ji bo şêwazê şerê nû û xeta leşkerî ya li Kurdistanê kir. Şerê me li Hîlwan û Siwêregê çawa dest pê bû, me anî ziman. Bi taybetî li hemberî faşîstan bi taktîka suîqestê bersiv dihat dayîn. Cardin li hemberî êrîşên neyaran, êrîşên kompradorên feodal û îxanetkaran, êrîşên şovenîstên Tirkan, rêxistinên wekî KUK û hwd. berxwedana bi pêş ketî, me anî ziman. Me destpêkirina şerê me heya salên 1980'yî anî ziman. Pêwîst nake em qonaxên şer ên ji vir û pê de fireh vekin. Ji ber ku di dîroka partiyê de li ser tê sekinîn. Şerê ku di salên 1980 û 1990'an de çêbûyî, wekî referans tê dayîn. Mirov dikare bibêje van mijaran tên zanîn. Em naxwazin têkevin mijara Dîroka

Partiyê. Lê di hêla şer û taktîk de, em ê li ser mijarên ku ji bo me pir girîng û balkêş in, rawestin.

Ji bo me amadekariya li Lubnanê pir girîng bû. Me li wir yekem car wekî kadro li ser şer bi awayek sîstematîk ders dît. Heya wê çaxê me hinek şer kiribû, lê me amûrên şer ên wekî çek, bombe û hwd. bi temamî nizanîbû bişixulînin. Di çalakiya li dijî M. Celal Bucak de bombe hat bikaranîn. Di wê çalakiyê de jî hevalan ji ber nizanin bi kar bînin, pîm baş nekişandine û bombe nateqe. Em wê çaxê di aliyê şer de pir bêtecrûbe bûn. Niha kîjan heval tê, yekser her tiştî zû fêr dibe. Wisa lê meyze nekin, ev hêsan nîn e. Berê li Kurdistanê kesî çekên cuda nizanîbû. Em li gundan fêrî qlêşê bibûn. Hinek ji me dikarîbû demançeyê bi kar bînin. Me tiştên xwezayî dizanî. Kesî ji me teknîka çekan nizanîbû. Perwerdeya ku me li Lubnanê dît, ji bo me bû bingeh. Bi rastî jî wê perwerdeyê em anîn heya niha. Ev pir girîng e. Dûvre konferansa yekemîn pêk hat. Her wiha hinek xebatên derveyî welat çêbûn.

Di dawiya sala 1981'an de em 22 heval li kampeke Filistîniyan kom bûn, Serokatî hat wir. Me li wê kampê perwerdeya sabotajê dît. Di nav Filistîniyan de hinek mamosteyên sabotajê yên bi nav û deng hebûn. Yek ji wan Celal Xoca bû. Celal Xoca li akademiya sabotajê ders da me. Dûvre Serokatî hat, tam hefteyekê rojê 8 saetan bi me re axivî. Hinek tiştên me di vir de vekirin Serokatî wê çaxê anî ziman. Ezmûnên wekî Vîetnam û Çînê anî ziman. Tiştên Serokatî wê çaxê ji me re gotî, bi giştî hatin qeydkirin, dûvre wekî pirtûk bi navê "Siyaseta Me Ya Rizgariya Netewî û Li Kurdistanê Rola Zorê" (Ulusal Kurtuluş Siyasetimiz ve Kurdistan'da Zorun Rolü) hat çapkirin û weşandin. Xeta me ya leşkerî yekem car di wê pirtûkê de bi awayekî fermî hat ziman. Piştî wê Serokatî vesaziya hevalan çêkir.

Hevalê Mehmet Karasungur û hevalê Egîd ji bo vegerin welat û amadekarî bikin derbasî Rojhilatê Kurdistanê bûn, ez jî derbasî Rojavayê Kurdistanê bûm. Her grûbek derbasî cihekî bû, ji bo vegera welat amadekarî bikin. Em hatin ser sînor ji bo ku em amadekariyan dest pê bikin. Serokatî wê çaxê xeta me ya leşkerî diyar kir. Xeta me ya leşkerî li ser çi diyar kiribû? Li ser gerîlatiyê diyar kiribû. Diviyabû em li Kurdistanê gerîla tetbîq bikin. Ji bo me modela herî nêz, modela Vîetnamê bû. Herî dawî Vîetnama Başûr di 1975'an de gihîşt zaferê. Me ji ezmûna Vîetnamê sûd wergirt. Wê demê me pir dixwend, lê niha heval pir naxwînin. Mesela, ji ber me pir dixwend, min dikarî li ser şoreşa Vîetnamê 5 rojan biaxivim. Me pirtûkên li ser Vîetnamê, şoreşa Kubayê, Rûsya û hwd. pir dixwendin û bi vî rengî lêhûrbûn dikir. Ji ber mîrasa me ya gerîla jî nebû, em pir li ser nimûneyên derve mijûl dibûn, me lêkolîn û lêhûrbûn dikir. Bi taybetî ezmûna me zêde li ser şerê gerîla nebû, lewma me pir dixwend, bala me jî pir li ser vî karî bû. Amadekariyên me ji bo şer bi vî rengî li Lubnanê bi pêş ket.

Berxwedana li zîndanan ji bo me wekî bangekê bû. Bi taybetî şehadeta hevalê Mazlûm Dogan, Ferhat Kurtay û her sê hevalên pê re, piştre jî şehadeta Berxwedêrên 14'ê Tîrmehê pir zêde bandora xwe li ser me çêkir. Heçku ji bo me hemûyan mirin erzan kir û rêya şehadetê vekir. Her yekî durist û bi namûs diviyabû vegera welat çêbikira û tol hildaba. Hewldana Rêbertiyê jixwe ev bû ku, em vegerin welat û ji bo bîranîna hevalan hemleyeke nû ya dîrokî bi rê bixin, li Kurdistanê şerê gerîla bidin destpêkirin. Tirs zêde hebû, ji ber ku beriya me pir kes bi armanca vegerê çûbûn, lê nevegeriyabûn. Hem nimûyên derve hene, hem jî nimûneyên welatê me bi xwe hene. Mesela, di wexta Serhildana Şêx Seîd û Serhildana Agirî de Kurdên çûne derve bi armanca vegerê diçin, lê nikarin vegerin. Di nav me de jî ji bo veger çênebe tesfiyekariya Semîr derket û ji hêzên derve gelek derdoran piştevaniya wî dikir. Pişta xwe dan Ewropa û li hemberî vegera welat dijberiyek mezin meşandin. Rexmê van hewldanên dijmin û provokasyonan, leyîstokan vegera welat pêk hat.

Wê demê hinek hêzên me yekser derbasî Mêrdîn, Amed û herêma Tolhildan (Güneybatı) bûn. Lê Serokatî Botan esas digirt. Serokatî digot: "*Botan dilê Kurdistanê ye.*" Lê wê çaxê tu kesê ji Botanê di nav me de tune bû, tenê 2 heval ji Cizîrê hebûn, wana jî arazî nas nedikir. Jixwe ji me tu kesî Botan nas nedikir, ji ber ku em neketibûn Botanê. Serokatî digot: "*Botan dilê Kurdistanê ye. Botan her çar beşên Kurdistanê bi hevdû ve girê dide. Kî li Botanê hakim*

*bibe, wê li giştî Kurdistanê hakim bibe. Erdnîgarî û civaka xwe pir guncaw e. Bandora Kemalîzmê li ser pir kêm e. Ji bo wê jî divê em Botanê esas bigirin.*" Me berê dixwest em Siwêregê bikin pêngavek, lê dûvre me Botan esas girt. Diviyabû me gerîla li Botanê bi cih bikira, pêngav ji wir bida destpêkirin û li hemû Kurdistanê belav bikira. Ji ber wê jî Rêbertî li ser Botanê pir diaxivî. Ji ber ku me Botan nas nedikir destpêkê hevalan pir zehmetî kişand. Em bi giştî xwendekar bûn. Tu kesên ji me berê li çiyê jiyan kirî tune bû. Jiyana çiyê wê çawa be, li ser vê yekê zêde tecrûbeya me jî tune bû. Lê belê wê demê biryardariyek hebû. Heman demê li gel biryardariyê, di hinek kesan de reşbînî, dudilî û di bin bandora tesfiyekariyê de mayîn jî hebû. Helbet ên nexweş jî hebûn. Lê hevalên ji bo vegera welat bi biryar, li dora xeta Serokatiyê civiyayîn jî hebûn.

Serokatî dixwest veger pir zû çêbibe. Vegerê di 1982'an de dest pê kir, heya sala 1983'yan beşek mezin ji hêzên me derbasî welat bûn. Bi rastî hevalên ku diviyabû vegerin welat, heya sala '83'an hemû vegeriyan. Piranî heval hatin xeta Başûr, Lolan û Heftenînê. Wê demê Lolan bû biryargeh, lê li vir hinek giranî jî çêbû. Serokatî got: "*Lolan teqlîda Bekaa kir.*" Mîna ku Bekaa (Bekaa saha Lubnanê ya perwerde lê hatî dîtin bû) nîn e, tevgeriyane. Ne tam wekî redkirina Bekaa ye, lê di liv û tevgerîna Lolanê de giranî û teredût çêbû. Çima li Lolanê teredût çêbû? Ji ber ku ji bilî me, her kesî digot, kes nikare li dijî dewleta Tirkiyê bisekine. Hin rêxistinên Kurdî hebûn, digotin, "di dema Şêx Seîd de 2 leşker hatin kuştin nîvê Kurdan qetil kirin. Eger hûn niha herin qereqolekê bixin, Kurdistana heyî jî wê biçe. Ev gotina PKK'ê ya dibêje em ê li dijî Tirkiyê şer bikin, xeter e." Li ber çavê mirovan artêşa Tirkiyê pir mezin kiribûn. Heçku tiştekî ne mumkûn e raber kiribûn. Mînak, beriya me Dr. Şivan heye. Di salên 1971'an de xwestiye hinek tiştan bike, ew jî hatiye Başûr. Dûvre hinek leyîstok çêkirin, kuştin çêbû û Dr. Şivan û hevalên wî yên berxwedêr hatin tesfiyekirin. Ango heya niha kî dest avêtiye vî karî û xwestiye Kurdan azad bike, wana derbe xwarine û nekarîbûn bi ser biketana. Ji ber hem îstixbarata Tirkiyê pir dixebite, hem jî propagandaya wê pir tê kirin.

Cardin bi rêya tesfiyekariya Semîr xwestin vegera tevgera me ya welat vala derbixin. Semîr, endamê Komîteya Navendî ya Partiyê bû, li Ewropa berpirsyarê me bû, lê îxanet kir û got, "Vegera welat şaş e. Kî here Hekkarî, wê tabûta wî were." Her wiha digot, "Serok Apo Mazlûm Dogan dike Qu'ran-i Kerîm û dibêje madem ew şehîd ketiye, divê em hemû şehîd bikevin. Ev ne rast e." Di rojnameyên Dev-Yol'ê de gotar (makale) dinivîsand. Ji ber ku ew jî li dijî me bûn ev gotar hemû diweşandin. Wê çaxê televîzyon û tiştên wisa jixwe tune bûn. Hin rêxistinên Kurd û çepên Tirk hemû nivîsên wî yên li dijî me diweşandin. Bandora van propagandayan li ser me jî çêbû. Lewma giranî çêbû. Serokatî di sala 1984'an de dibêje: "*Ger hûn gav navêjin hûn bi dîrokê dileyîzin. Gav neavêtin bi dîrokê leyîstine. Divê gav bê avêtin*." Ev talîmat di meha Hezîranê ya sala 1984'ê de digihe biryargeha Lolanê, heval li biryargehê kom dibin û biryara gavavêtinê tê plankirin. Pêngava 15'ê Tebaxê bi vî rengî hat pêşxistin.

Pêngava 15'ê Tebaxê bi giştî peyama pêwîst da. Bi taybetî çalakiya Erûhê bi serkeftî bû û ruhê êrîşê tê de hebû, lê piştre berdewam nebû. Diviya gerîla mezin bibûya. Lê her kî xwest beşdar bibe, gotin, "bisekine, em ê we bişînin Başûr." Dûvre jî dijmin ew kesên dixwestin beşdar bibin girtin. Wisa mezinbûn û pêşveçûn çênebû. Ruhê 15'ê Tebaxê zêde nehat berdewamkirin.

Bi vî rengî me hinekî Botan nas kir. Destpêkê me Besta, Perwarî, Bêşebab û Qilaban nas kir. Gel li vir guncaw bû ku em hin gavên bi lez bavêjin. Tiştê ku Serokatî pê difikirî; destpêkê gavek bê avêtin, dûvre raperînên herêmî çêbibin û her biçe gerîla mezin bibe. Lê di rêveberiya me de di vê çarçovê de nêzîkbûn bi pêş neket. Li gorî vê çarçoveyê nêzîkbûnên wekî rastgir çêbûn û pir bi hesab tevgerîn çêbû. Bi taybetî pratîka sala 1985'an wisa ye.

Di pratîka sala 1985'an de bi rastî hevalê Egîd baweriya xwe hebû ku gerîla li Kurdistanê rûne, lê di hinekan de dudilî hebû. Hevalê Egîd ji gerîla tam bawer dikir. Rexmê ku fizîka hevalê Egîd pir xurt jî nebû, xwe dabû vî karî. Ji bo hevalê Egîd ev kar meseleya hebûn û tunebûnê bû. Hevalê Egîd kesekî wisa bû. Piştî ku Pêngava 15'ê Tebaxê hat avêtin, li

biryargehê civîn çêdibe û tê de dibêjin, "Em hevalekî ji bo encamê bigihîne Serokatiyê, bişînin gel Serok." Wê çaxê ji ber hevalê herî serkeftî ye wekî xelat hevalê Egîd rêdikin gel Serokatiyê. Hevalê Egîd hat gel Serokatiyê û heya meha Nîsanê ya 1985'an li gel Serokatiyê bû. Wê demê ez jî li wir bûm. Em 3 mehan bi hev re li gel Serokatiyê man. Heya hevalê Egîd vegeriya welat, nîvê salê derbas bû.

Sala 1985'an ji bo me pir wasat derbas bû. Me hemle nekir, dijmin hemle kir. Di sala '85'an de pir windahiyên me çêbûn. Bi ser de ku di sala 1986'an de hevalê Egîd jî şehîd ket, hejandinek mezin di me de çêkir. Gumana ku, gelo wê gerîla cih bigire yan na, ango wê taktîka gerîla bi ser bikeve yan na, bi pêş xist. Lewma neqebek krîtîk bi pêş ket. Ji ber ku gelek kesan digot, "gerîla li Kurdistanê rûnane; gerîla wê li Kurdistanê bi bin bikeve û encam nagire."

Me jî gav avêt, bi serkeftî bû, lê berdewam nekir û windahî hatin dayîn. Serokatiyê li hemberî vê, Kongreya PKK'ê ya 3. amade kir. Di vê Kongreyê de pir lêhûrbûn û dahûrandin çêbûn ku, ka bê şer wê çawa bimeşe, gerîla wê çawa xwe bi cih bike? Der heqê van mijaran de gelek dahûrandin hatin bipêşxistin û biryar hatin girtin. Heta Kongre hat lidarxistin sala '86'an qediya. Sala 1986'ê hem ji bo me, hem jî ji bo dewletê wekî sala amadekariyê bû. Bi vî rengî di wê salê de rewşeke navîn hebû. Dewletê jî piştî şehadeta hevalê Egîd zêde êrîş nekir. Sala 1987'an pêngava kongreyê bi rê ket, lê bi hêsanî bi rê neket, pir tesfiyekarî jî hatin jiyîn. Hîn di destpêkê de tesfiyekariya Kor Cemal û Terzî Cemal derket holê. Vana xwestin biryarên Kongreyê sabote bikin. Rexmê wan jî pêngav hat destpêkirin. Di navbera salên 1987, 1988, 1989 û 1990'an de gelek bûyer qewimîn. Di navbera van her çar salan de çi çêbû? Bi taybetî şehadeta hevalê Egîd, Erdal (Mustafa Yöndem) û Bedran (Mehmet Sevgat) ku hevalên li pêş bûn, di gerîla de hin valatî çêkir. Pir kesên berjewendîperest ji vê valahiyê sûd girtin, hin kesên ji rêzê ji nişka ve derketin pêş. Kesên wekî Şahîn Balîç, Şemdîn Sakîk û Hogir ku nû tevlî rêxistinê bibûn, derketin pêş.

Meydan vebû ku her cure feraset xwe bide axaftin û di vê rewşê de xeta çete ya çaran derket holê. Her çar çete kî ne? Kor Cemal (Halîl Kaya), Hogir (Cemîl Işik), Metîn (Şahîn Balîç) û Zekî (Şemdîn Sakik) ne. Ji ber van çar kesan jê re tê gotin "çeteya çaran." Vana xeta şer bi paş de ragirtin. Pir balkêş e, di şer de rastgirî jiyan kirin, li ser leşkeran çalakiyan nakin, lê di bin navê cerdevanan de li ser çeteyan û eşîretan çalakî çêbûn. Vê nêzîkbûnê çi kir? Vê nêzîkbûnê di şer de feraseta parêzgeriya rastgir (sağ savunmacı anlayış) derxist holê. Yanî di wê demê de êrîş nîn e. Tenê hevalê Egîd êrîş kiriye, çek rakiriye, piştî wê, zêde çek rakirin nîn e, naçe ser dijmin, ji dûr ve li dijimin dixe, derbê lê dide, zêdetir jî diçûn ser gundan. Ev bibû şeweyek û terzek wisa derket holê. Dema dijmin dihat arazî, gir dihat girtin û li gir şer dibû. Mînak, li herêma Besta Girê Sêvê, Girê Xanê û Girê Dêm, vana hemû girên ku her dijmin hatiye û rojekê pêde lê şer bûye. Dijmin jî wê çaxê ne hosta bû, teknîka xwe xurt nebû. Dema dihat arazî, hevalan ji wan giran yek digirtin, ji sibê heya êvarî şer dikirin û sibê bi paş ve dikişiyan. Wê demê dijmin jî pir lawaz bû û şêwazê me jî bi piranî pevçûn (çatişma) bû. Ji ber ku mewzî digirtin. Dîqat bikin, li Siwêregê jî kozik û mewzî hatin girtin û şer di wir de ma. Vê carê jî heman tişt li Botanê pêk hat. Dema dijmin dihat, hevalan gir digirt, wisa şer dibû. Ango li vê derê derbe li dijmin xistin, xistina xefkê û çûyîna ser nîn e. Lewre feraseteke ku wext vala derbas dike û şêwazekî parêzgeriya rastgir tê de heye.

Ji bo em nekevin şerê mewziyan Serokatî pirsiyar kir, *"her yek ji we çiqas gule pê re heye?"* Gotin, "li ser her kesî 150 gule hene, di çente de jî 100 guleyên yêdek hene." Serokatî got, *"Ew 150 guleyên li ser we û 100 guleyên yêdek jî zêde ne."* Serokatî talîmat derxist ku ji wir û pê ve her kes tenê 4 şarjorên dagirtî rake. Ji bo ku çog û zikê xwe daneyne erdê, ji sibê heya êvarî di mewzî de şer neke. Ji bo mecbûr bimîne bireve. Di wê demê de terzekî wekî şerê mewziyê derket. Ji ber ku di wê demê de şerê kozikan derket pêş. Em nediketin terzê şerê gerîla.

Ji hêla din ve terzê çeteya çaran bi xetê dileyîst. Cihê ku biçe bi artêşê re şer bike, diçe bi cerdevanan re şer dike, diçin ser gundan û bi şêwazên nerast bi çeteyan û eşîretan re şer dikin. Bi vî rengî gelek eşîrên wekî Jîrkiyan, Batûyan, Alan û Yezdînan kirin dijminê tevgera me PKK'ê. Bi neheqî li wana dan. Ev yek ne pêwîst bû. Ne tenê yên bi çek, pir cuda cezakirin bi pêş xistin. Ev feraset zêdetir Hogir pêk anî. Lê ev bi giranî karê çeteya çaran bû. Her çendî em bi awayekî dibêjin çeteya çaran, lê di heqîqetê de mirov lê binêre, ne tenê çar in, zêdetir in. Wê demê yên di pratîka çeteya çaran de hatine dîtin û heta wê demê ji erk hatine girtin di kiryarên wê demê para xwe zêde ne. Bi esasî li pişt vê pratîkê berpirsyariya Botan û Ebûbekir heye. Lewre mirov tenê bibêje çeteya çaran têrê nake. Van her du kesan jî di wê demê de roleke xwe ya xirab heye. Ev bû wekî ferasetekê. Pir gundan ji ber Hogir bar kirin, koçber bûn. Ango terzekî wisa dimeşandin. Û van kesan hem xeta Serokatiyê ya civakê berevajî kirin, ji ber ku me dixwest em civakê qezenc bikin, lê vana civak dida hemberî xwe. Hem jî xeta Serokatî ya şer berevajî kirin. Xeta Serokatiyê ya şer, gerîla bû û şerekî aktîf bû. Wana jî şerê mewziyê û pasîfbûn esas digirt.

## C) Li Kurdistanê Salên 1990'î û Şoreşa Vejînê

Rexmê van şaşîtî û nêzîkatiyên rastgir jî, xeta şerê gerîla hat meşandin. Serokatî dixwest gerîla bi pêş ve biçe û ji bo vê gelek mînak ji zarokatiya xwe dida û kî çawa êrîşî wî kiriye, di firsendek baş de bi beran lê daye û reviyaye, mînakên wê dida. Ango Serokatî dixwest li Kurdistanê terzê gerîla rûne. Ji bo şerê cephe û serhildêriya Kurd nebe û şêwazê asî-aware bi pêş nekeve. Ji bo terzê gerîla bi pêş bikeve û nêzîkbûna ji gel re rast be, gel qezenc bike û rake raperînê. Armanc ev bû. Lê milîtanê/a vê tevgerê li gel zextê bike û di mewziyê de şer bike, nabe. Ew kesên serkêşiya çetetiyê kirin wisa ji xetê derketin. Ger gel bigire hemberî xwe û di şer de jî rastgiriyê bimeşîne, ev tenê ne xet vala derxistine, heman demê li dijî xeta Serokatiyê rawestîne.

Rexmê gelek kiryarên çeteyan ên sûc jî, ber bi salên 1990'î ve kombûnek di nav gerîla de çêbû. Li Botanê hin pêşketin çêbûn; hem qanûna leşkerî pêk hat û li gelek cihan bi ser ket û hem jî tevlîbûn hebû. Di dawiya sala 1989'an de hejmara gerîla gihîşt 925 kesan. Ango gerîla roj bi roj mezin bû, ji ber ku berê hejmara gerîla pir hindik bû. Di serî de ji Botanê û li hin cihên din gelek tevlîbûn bi pêş ketin.

Ji sala 1989'an û şûn de êdî gel li tevgerê xweyî derket. Rexmê wan şaşîtî û kêmasiyên di şer de, gel dît ku ev ne wekî serhildana Kurd a dema berê ye. Gel dît ku ev ne tiştekî bi 2- 3 mehan e û tevger her ku diçe mezin dibe û xurt dibe. Lewma gel baweriya xwe li gerîla anî. Her gerîlayek şehîd diket, gel dixwest bi merasîman cenaze rake û lê xweyî derkeve. Serhildanê wisa dest pê kir. Serhildana destpêkê li Nisêbînê bi vî awayî dest pê kir. Di dawiya sala 1989'an de li Nisêbînê serhildan dest pê bû, bi vî awayî di salên '90'î de serhildan ketin dewrê. Bi vî rengî hêviya gel bi gerîla çêbû. Gelê ku berê bêhêvî bû, hêvî girt û ji nû ve baweriya xwe xurt bû. Helbet li cihekî bawerî çêbibe, li kêleka wê îradebûn, xîret û cesaret jî çêdibe. Jixwe di gelê Kurd de êdî di sala '90'î de nîşana vê tiştê bi pêş ket. Vejîn wisa çêbû.

Di vir de mirov ji bo şer dikare çi bibêje? Rexmê hemû kêmaniyan û rexmê xeterî hebû, gerîla wê demê li Kurdistanê rûnişt ango bi ser ket. Hebûna gerîla hêvî bi gel re çekir, gel jî lê xweyî derket. Wê çaxê tevlîbûn zêde bûn. Destpêkê hêdî hêdî tevlîbûn çêbû, lê dûvre bi salên '90'î re bi girseyî beşdarbûn çêbûn.

Di vir de divê mirov behsa jinê jî bike. Heya sala 1990'an hevalên jin di nava me de hindik bûn. Milîtanên jin ên dema destpêkê bûn. Dema em li Lubnanê bûn 13 hevalên jin hebûn û wê çaxê nû nû hinek tevlîbûn çêbûn. Gelek kes ji Ewropa tevlî dibûn. Kesên wê çaxê tevlî partiyê dibûn bi giranî xwendekar û rewşenbîr bûn. Xaleke din jî, yên tevlî dibûn bi neçarî

ji malbatê diqetiyan û eleqeyên xwe qut dikirin. Wê çaxê malbat û civakê wate nedidan ku keçek ji mal derbikeve û beşdarî tevgerê bibe. Der heqê jiyana PKK'ê ya azad de zanebûna civakê tune bû. Jinek ji malê derketiba, êdî malbatê ew ji ewladiyê davêt. Wisa bû. Hevalên tevlî dibûn ev didan ber çavan û wisa dihatin. Piştre civakê fêm kir ku ne wisa ye. Wê çaxê hinek zehmetî hebû. Yek jî, di civaka Botanê de zêde wate dayîna tevlîbûna jinê ya nav rêxistinê tune bû. Gelek caran hevalên jin di taximan de hebûn. Lê gava heval diçûn gundan, qet raber nedikirin ku jin in. Ango hevalên jin xwe diyar nedikirin ku ew jin in, ser û rûyê xwe digirtin. Ji ber ku gundiyan zêde wate nedidan. Li cihê wisa pratîka gelek hevalên jin heye.

Mînaka hevala Bêrîvan (Binevş Agal) heye. Di sala 1988'an de hevala Bêrîvan û hevalekî din ê navê xwe Yasîn (Adîl Aslan) hebû. Ew her du wekî berpirsyarên Cizîrê hatin erkdarkirin û çûn Cizîrê. Me ew şandin Cizîrê, li wir xebat kirin. Ew her du li Cizîrê xebatek wisa kirin û performanseke wisa raber kirin ku her kes bû heyranê wan. Li Cizîrê bûn komîte. Li wir gelek xayîn ceza kirin, tevgerî çêkirin, gelek daxuyanî bi xwe nivîsandin û belav kirin. Dûvre qada wan a xebatê berfireh bû. Heya bi Hezex, Êlih, Beşîrî û Kurtalan li temamê wê xetê xebat maşandin. Dûvre hevalê Adil derket û di Kongreya PKK'ê ya 4. de wekî endamê komîteya navendî ya PKK'ê hat hilbijartin. Hevalê Adil piştî hilbijartinê bi du mehan şehîd ket. Hevala Bêrîvan jî li Cizîrê şehîd ket.

Dijmin hevala Bêrîvan xist xefkê. Dijmin baş dizanî ku, ger hevala Bêrîvan di malekê de bê girtin, wê bi rojan li ber xwe bide, şer biqewime. Ji ber li malên hinek dostan ji bo rewşên pêwîst ên parastinê depoyên cebilxaneyan bi cih kiribû. Lewma di malê de neçûn ser. Dema li kolanê ye ku wê biçe mala dostekî, dijmin kemînê tavêje pêşiya wê û ji bo gel lê xweyî dernekeve wê rojê li tevahî Cizîrê qedexeya derketina derve îlan kir û kî ji malê derketa wê bihata kuştin. Hevala Bêrîvan bi vî awayî kirin xefkê, şehîd kirin û piştî şehadetê jî çûyîna ser gora wê hat qedexekirin û tim di bin çavdêriyê de bû ku, kî biçûya ser gora wê yekser ji aliyê polîsan ve dihat girtin. Heya niha jî di nav gelê Cizîrê de ew weke ewliya tê dîtin. Ji ber hîna gelek însan axa li ser gora wê wekî tiştek pîroz dibînin û di hinek rewşan de wek axek mûqedes bi kar tînin. Şehadeta hevala Bêrîvan ku bandoreke pir mezin li ser gelê Cizîrê kir, ji bo gel biçe ser gora wê û ziyaret bike, serhildana sala 1990'ê bi pêş xist. Gel wek erkekê xwest di roja Newrozê de gora hevala Bêrîvan ziyaret bike. Jixwe heya gel neçûya ser gora wê, ew Newroz nedihat qebûlkirin. Dewletê jî li hemberî wan astengî çêkir û şer qewimî. Rexmê qedexeya derketina derve hatibû îlankirin jî, sê rojan li ser hev di navbera gel û dewletê de şer berdewam kir, dijmin jî her li gel xist. Di wan sê rojan de 21 kes şehîd ketin û gelek birîndar çêbûn. Lê gel bi biryareke mezin israr kir û di encama wê berxwedanê de gel çû ser gora hevala Bêrîvan û Newroza xwe pîroz kirin. Bi rastî berxwedana Cizîrê berxwedaneke mezin e û îradeyek e.

Serhildana Cizîrê wisa bi pêş ket. Ango bandora hevala Bêrîvan pir zêde bû. Piştî vê êdî ew feodalîteya li Botanê hat şikandin. Tevlîbûna jinan zêdetir bû. Destpêkê ji Botan û Mêrdînê tevlîbûn zehf bû. Jixwe ji berê de tevlîbûna jinên xwende hebû. Êdî ne tenê jinên xwende, di her kesî de tevlîbûn bi pêş ket. Bi vî awayî tevlîbûn bû tevlîbûna Kurdistanê. Heman demê şoreşa vejînê wekî şoreşa jinê ket pratîkê. Mirov dikare wisa bibêje: Bi vî awayî gelê Kurdistanê wekî ji nû ve hat ser xwe û ruh girt. Ji bo vê tê gotin, Şoreşa Vejînê. Bi rastî gelê Kurdistanê ji nû ve bi vejîn bû. Ruhê têkoşîn û azadiyê pê re bi pêş ket, şoreşa jinê pêk hat û êdî desthilatdariya zilam û zîhniyeta feodalîzmê ket serdema xwe ya paşveçûnê.

Salên 1991 û 1992'an salên şoreşê ne. Wekî firsendekê ye. Êdî gerîla li Kurdistanê bi cih bûye, peyama pêwîst daye û gihîştiye armanca xwe. Gel hêviya xwe mezin kiribû û ji nû ve jîn dibû. Eger pêşengên taktîkî xurt bûna, ji wê tevlîbûna ciwanan a mezin birêxistinkirinek baş pêk bianîna, dikarîn artêşbûneke mezin pêk bînin. Cardin ger rêbertiya taktîkî bi rastî rol bileyîsta dikarîbû raperînên mezin çêbibûna. Lê tê zanîn wê çaxê çawa çêbû. Gerîla zêdetir xwe bi biserdegirtinên qereqolan re xapand. Berî wê çaxê zêde serdegirtinên qereqolan tune bû. Heya wê demê tenê derbe lê dan hebû. Mesela, heya sala 1991'an wilo

bû, lê hevalan li dijmin dan û qereqol girtin. Ev tiştekî baş û nû bû û pêşveçûnek bû. Lê bes ji demê re ne bersiv bû û wê çaxê hat fêmkirin ku ev taktîk wekî ji demê re bersivek e. Wisa hat fêmkirin ku erka demê ev e. Ango wisa dihat fêmkirin ku va ye gerîla dikeve qereqolê, qereqolê xira dike, 9-10 çekan ji ser wan radike, bes e. Hîn kî çi dixwaze? Va ye gerîla mezin bûye. Dijmin jî ji bo leşkerên xwe biparêze gelek qereqol vala kirine. Gelek cih ketine bin kontrola gerîla. Ango rewşek wisa çêbûye. Gerîla di vê rewşê de serxweşî jiyan kir û nexweşiya desthilatdariya zû bi pêş ket. Ango hinek fermandar wekî bêjin, "ev tişt min ava kir, her tişt çêbûye." Êdî sîstema xwe çêkirin û jiyana li gor xwe bi pêş xistin û ji xwe hezkirin bi pêş ket. Halbûkî dem dema şoreşê bû.

Li hêlekê gerîla û fermandarî wisa bi nexweşiya zû desthilatdarbûnê ketiye û dema xwe xerc dike, li hêla din ew derfetên şoreşê yên pir zêde çêbibûn, wekî çiyayeke ji qeşayê diheliyan. Ewqas derfet nehatin bikaranîn. Di dîroka şerê me de salên ku herî zêde nehatine bikaranîn salên 1991 û 1992'yê ne. Ji ber ku ew dem demên şoreşê bûn û derfeta pêkanîna şoreşê hebû. Derfeta ku tu rabî û dest bidî ser hebû. Lê ev çênebû. Dijmin ev xeterî dît. Ji ber ku di sala 1991 û '92'yan de raperîn li Başûrê Kurdistanê bi pêş ket. Başûrê Kurdistanê wekî defakto azad bû. Wê çaxê hinek ji me li Başûr bûn. Heya di rizgarkirina Zaxo, Batûfa û Begova de hevalên me cih girtin. Wê demê pêşmerge tune bûn, dûvre pêşmerge hatin. Me dikarîbû pişta xwe bidin Başûr. Ango mirov dikarîbû jê sûd bigirta û li Bakur jî şoreşekê li dar bixe.

Kongreya PKK'ê ya 4. avakirina hikûmeta Botan-Behdînan xist bin biryarê. Hikûmeta Botan-Behdînan wê îlan bikirana. Ev biryar û perspektîfa Kongreyê hebû, lê fermandariya taktîkî ev nekir û nikarîbû ji vê yekê re bûba bersiv. Wekî min berî niha jî diyar kir, xwe bi serdegirtinên qereqolan re xapand. Halbûkî biserdegirtinên qereqolan têrê nedikir. Girtina bajaran pêwîst bû. Azadkirin û rizgarkirin pêwîst bû. Rexmê derfet jî hebûn, bi ser qereqolan girtin û qereqol şewitandin. Qereqolek xistin û gotin, "me bi ser xistiye." Di sala '92'an de dijmin biryar da ku serfermandariya artêşa Tirk bi xwe dest bavêje pirsgirêkê û meseleya Kurd bigire ser xwe. Ji ber ku heya wê demê di destê cendirme de bû. Her wiha biryar dan ku di navnetewî de li ser vê mijarê rawestin. Ji ber vê jî Amerîka û NATO ketin dewrê. Lewma em destpêka Komploya Navnetewî wekî sala 1992'an dihesibînin. Ango di sala '92'an de biryar hat girtin ku PKK bê tesfiyekirin. Halbûkî di salên '91 û '92'yan de firsend hebû. Ev biryara hatî girtin, ber bi dawiya sala '92'an hat girtin.

Di sala '92'yan de akademiya me ya leşkerî ya bi navê Akademiya Mahsum Korkmaz li Lubnanê girtin. Zexteke mezin ji aliyê NATO û Amerîkayê ve li ser Sûriyê û Lubnanê çêbû. Bi vî avayî Akademiya Mahsum Korkmaz girtin. Beriya wê demê firsend hebû, lê nehat bikaranîn. Hevalên di perwerdeyê de dixwestin bên Heftenînê. Koma destpêkê hat, a duyemîn gihîşt Çiyayê Spî û ya sêyemîn gihîşt Çiyayê Bêxêr. Grûp wilo li ser hev dihatin û şer dest pê kir. Di heman demê de partiyên Başûr hatin û gotin ku, "divê hûn ji vir derkevin." Me got, "Hûn kî ji ku derê derdixin! Ev der Kurdistan e, em jî ji Kurdistanê ne. Hûn nikarin me derxînin." Dîtin ku em dernakevin, xwe komî ser hev kirin. Amerîka û Tirkiyê ji wana re gotiye, "ger hûn PKK'ê ji axa Başûr derxin û li dijî PKK'ê şer bikin, em ê we bi fermî nas bikin û hûn ê li vir sîstema xwe ava bikin. Û em ê rê bidin ku, hûn parlamentoyê ava bikin." Wê çaxê dixwestin parlamentoya Kurdî ava bikin. Ev parlamentoya niha heyî di sala '92'yan de saz kirin. Yekemîn biryara parlamentoyê çi bû? Li dijî me şer îlan kirin. Biryara wan a yekemîn ev e ku, hemû hêzan ji Kurdistanê derbixin. Bi vî rengî şerê sala 1992'yan dest pê kir. Serokatî li ser vî şerî pir nivîsandiye. Dibe ku gelek hevalan jî nîqaş kiribe.

Ev şer çawa bi pêş ket? Em heya wê demê bi pêş ve diçûn, lê bi vî şerî em sekinandin. Ez li Heftenînê bûm, her hefteyê 100 kesên nû beşdarî rêxistinê dibûn. Tê bibêjî qey otomatîk bû, teqez her hefte derdora sed kesan beşdar dibû. Hefteyê carekê ez diçûm, bi şervanên nû hatî re diaxivîm. Li Pîrbula biryargeha me hebû, li wir kom dibûn, her carê derdorê sed kesan bûn, min xêrhatina wan dikir û me civîn çêdikir. Me wan li ser kampan belav dikir. Tenê ne Heftenîn wisa bû, her der wisa bû, lê vî şerî ev tevlîbûn sekinand. Eger ev nebûya dibe ku em pir mezin jî bibûna. Hinek dibêjin, wê çaxê hejmar gihîştiye nizanim çend hezaran! Ne

wisa ye. Hejmar li derdora 10 hezarî hebû. Ez bawer nakim hejmarê tu carî 10 hezar derbas kiribe.

Ev şerê sala '92'yan her der kir şer. Di vî şerî de em ne tam ketin, ne jî ew ketin. Mirov dikare bibêje encama vî şerî pata (beraber mayîn) bû. Ji ber ku di şer de îxanet çêbû. Em di şer de ne, di eniyeke me de fermandar bêy agahiya me derbasî Hewlêrê bûye; Ferhat efendî çûye Hewlêrê! Me jê pirsî ku, tu li wir çi digerî? Got: "Ez hatime hevdîtinan." Wê demê ez û hevalê Cuma em li Heftenînê bûn. Ne agahiya me, ne jî agahiya Serokatiyê ji vê yekê hebû. Şer li Xakûrkê sekiniye, ew jî bi kamyonan pêşmergeyên wê eniyê tînin ser me. Di yek şevê de 7 hezar pêşmergeyan bi hev re êrîşî me kirin. Me 10 rojan bi wana re şer kir û Ferhat li Hewlêrê bû. Pêşmergeyan nekarîbûn me. Vê carê tangên Tirkan jî ketin dewrê. Pêşmerge û tang bûn yek, bi hev re hatin ser me û şerekî dijwar qewimî. Di encamê de nekarîn me tune bikin, an jî bi zorê derbixin. Mesela, ez bi xwe heya 1993'yan jî li Heftenînê mam û min qet gavek jî bi paş ve neavêt. Bi wî awayî hinekî jî bû înad.

Rêxistinên Başûrî bi Ferhat re peyman çêkirine ku bi giştî hêzên me biçin Zelê. Dûvre heyet hat, bi me re axivî. Destpêkê navbera me nebaş bû. Gotin, "hûn hevpeymaniyê qebûl nakin." Welhasil dûvre hatin, me ji wana re got ku, "em naçin Zelê, em li vir in. Ev hêzên gel min ne hêzên Başûr in. Van hêzan hinek ên Cûdî ne, hinek jî yên Bêşebabê ne û ewlekariya min in." Yekî ji min pirs kir û got, "ewlekariya te çend kes in?" Min got, "150 heval in. Li gel me, ewlekariya me wisa ye. Ez niha li vir im, ewlekariya min jî li vir e." Dûvre erzaq li ser me qut kirin û li derdora me çûn û hatin. Ji bo vê xeber dan Ferhat. Diçin bi Ferhat re rûdinin, ji Ferhat re dibêjin, bila hevalê Cemal ji vir derkeve. Ew jî şikayetê Serokatî dike. Wê çaxê Serokatî talîmat da û got, *"Derkeve, biçe Botanê."* Ji ber ku Serokatî dizanîbû ez naçim Zelê. Me got, temam.

Bi rastî jî hejmara me 150 kes bû. Tevî 150 hevalan em çûn gundê Heftenînê. Li wir Deriyê Dawetiyan heye. Em heta wir çûn, lê ji ber akuya cîhazê xilas bûye em nikarin bi kesî re biaxivin. Gava aku demekê dimîne xwe bi xwe şarj dibe. Gava çend roj bi ser akuya vala re derbas dibe xwe bi xwe hinek enerjî tê de çêdibe. Me cîhaz vekir, min dît ku Serokatî di dewrê de ye û hemû derya ketine dewrê, li me digerin. Wê çaxê kodê me Dîcle bû. Ji ber ku çend roj e me cîhaz venekiriye hemû derya di dewrê de ne, her bang li Dîcle dikin. Me bersiv da banga Dîcle. Wê çaxê ez bi Serokatiyê re axivîm, Serokatî got: *"Biçe Botanê baştir e. Dibêjin, eger neçe peyman çênabe. Ev xeter e."* Min jî ji Serokatî re got: "Eger em vir vala bikin, wê çaxê xeterî wê hîn zêde bibe. Ger em ji Heftenîn biçin û vir vala bikin, dikarin hemû hevalên Zelê bêxin hepsê. Wê çawa be? Herî kêm em li vir bin, wekî ewlekarî û tehdît li ser serê wan bin. Belkî ew dixwazin, lê em israr bikin û li vir bimînin. Ger em bimînin ew di bin tehdîta me de ne. Ger em berdin çi zexta me li ser wan çênabe." Ferhat ji ber ev xisûs şaş digihand, Serokatî ev pêşniyara me qebûl kir û em li wir man. Çi bi me kirin jî em li Heftenînê man. Dûvre di Adara '93'yan de ez derketim Botanê.

Bi kurtahî şerê sala 1992'yan wisa bû. Destpêkê bi wî awayî di şoreşa me de bilindbûn hebû, wî şerî pêşî li vê bilindbûna tevgera me girt. Sala '93'yan normal bû. Erê dîsa tevlîbûn û mezinbûn hebû, ne ku sekinî, lê ew girseya mezin sekinî, wekî hat gotin ku rêveberiya jor a PKK'ê çû û hwd. Di vî şerî de pir propaganda kirin û gotin ku, "me PKK bi giştî tesfiye kiriye, êdî cih ji PKK'ê re nemaye." Wê çaxê min grûbek heval rêkir Roboskî. Gava diçin Roboskî gel hevalan dibînin, diçin hevalan hembêz dikin û digirîn. Dibêjin ku "ma hûn hîn sax in!" Ji wan we ye em hemû îmha bûne. Ji ber ku daîm çek li ser me dişixulandin û leşkeran her em dorpêç dikirin. Bi rêka çapemeniyê êrîşî ser me dikirin, wisa diyar dikirin ku kes ji me nemaye. Ji ber ku wê çaxê televîzyona me jî nebû. Tenê çapemeniya dijmin hebû û hemû çapemenî di destê wana de bû. Wisa nîşan didan ku em nema ne û bi vî rengî tevlîbûn sekinî. Pêşveçûna roj bi roj bilind dibû, sekinî. Dûvre Talabanî di navbera Serokatî û Turgut Ozal de navbeynkarî kir, Serokatî ew gava agirbestê avêt. Di Newroza sala 1993'yan de ev bû qonaxek nû. Hewceyî nîn e ez vê gavê bi giştî vekim. Jixwe tê zanîn çawa sabote bû. Turgut Ozal kuştin û ew qonax sabote bû. Piştî ku agirbest xira bû, cardin di '93'yan de şer bilind

bû. Her çendî tam wekî salên 1991 û 1992'yan nebe jî, di sala 1993'yan de jî dîsa derfet hebû. Cardin ew derfet baş nehat bikaranîn û wisa bihurî. Di sala 1994'an de vê carê dijmin li dijî me ket êrîşê. Ango di sala 93'yan de em li pêş bûn, di '94'an de ew ketin êrîşê.

Bi şerê gerîla re li Kurdistanê gerîlatî rûnişt. Yekîneyên gerîla belavî gelek dever û eyaletên Kurdistanê bûn. Ji ber ku berê li hin deveran yekîneyên gerîla tune bûn, êdî li her cihî yekîneyên gerîla ava bûn. Di sala '93'yan de wekî êdî dengeyek çêbû. Di sala '93'yan de me dixwest em şerê bi liv û tevger bimeşînin.

Di şerê gerîla de hinek qonax hene, divê mirov li ser wan qonaxan bisekine. Di şerê gerîla de ango di stratejiya şerê gel ê demdirêj de 3 qonax hene:

**Qonaxa yekem;** parastina stratejîk e. Parastina stratejîk çi ye? Taximên gerîla biçûk in û wekî taxim tevdigerin. Belkî wekî yekîne jî tevdigerin, lê cih û warê xwe nediyar e, pir veşartî ye. Gerîla li dijmin dide û direve.

**Qonaxa duyemîn;** hevsengiya stratejîk e. Di qonaxa hevsengiyê de gerîla xwe diparêze û mezin dike, her wisa civakê jî amade dike. Ango serdema dengeya strarejîk e, denge ye. Hevsengiya stratejîk çi ye? Êdî gerîla hinek mezin dibe, hinek cihên asê digire û di wan cihên asê de jî xwe perwerde dike. Ango wekî niha derfeta perwerdeyê zêde dibe. Wargehên xwe yên sor çêdibin, ango çiya di destê gerîla de ye, bajar, deşt û hin çiya jî di destê dewletê de ne. Ne gerîla dikare bajêr bigire, ne jî dewlet dikare bê û çiyê bigire. Bi vî awayî hevsengî saz dibe. Lewma ji vê re dibêjin serdema hevsengiya stratejîk. Di vê qonaxa duyemîn de gerîla divê hejmara xwe hîn zêde bike, pişta xwe xurt bike û derfetên xwe hîn zêde bike. Her wiha divê pişta gerîla hebe ango ji dewletekê piştgiriyê bigire. Mesela li dijî tang, top û firokeyên dijmin alîkariyên wekî çekên giran bigire. Gerîla ji bo çi vê dike? Ne ji bo di hevsengiyê de bimîne. Na. Ji bo ku derbasî qonaxa sêyemîn bibe van tiştan dike.

**Qonaxa sêyemîn jî;** êrîşa stratejîk e. Gerîla xwe li çiyê amade dike û quweta xwe mezin dike. Gerîla çekan temîn dike, ji bo vê jî ji derekê alîkariyê digire. Her wiha di deşt û bajaran de jî gelê xwe û zemîna xwe amade dike. Di qonaxa sêyemîn de gel li deştê radibe serhildanê, gerîla jî li çiyê êrîş dike. Bi vî rengî bi raperînekê diçe serkeftinê û azadî bi pêk tê. Ev model li Çîn û Vîetnamê jî wisa bûye, ango di van sê qonaxan re derbas bûne.

Serokatî, di pirtûka "**Li Kurdistanê Rola Zorê**" de dibêje: "Eger çepê Tirkan bi me re rabin, ew jî têkoşînê bikin, mumkûn e di qonaxa duyemîn de pirsgirêk çareser bibe." Ger wisa bibûya pêwîstî bi qonaxa êrîşa stratejîk nedima. Lê çepê Tirkiyê wisa derneketin. Me di sala 1983'yan de bi hinek çepan re îtifaq kir. Lê di nava wan de jî tesfiyekarî bi pêş ket. Kes ji wan nema ku bi me re were, tevî gerîla şer bike. Lewma em bi tena xwe man. Me ji hemleya salên 1992 û 1993'yan baş sûd wernegirt. Tirkiye beşdarî şerê '92'yan ê Başûr bû. Fêm bû ku êdî NATO mudaxele dike. Lewma Serokatî gava agibestê avêt. Ev agirbest jî vala derxistin. Çima? Ji ber ku Ergenekonê agirbest qebûl nekir. Ergenekona di nava dewletê de mudaxele kir û Turgut Ozal kuşt. Bi vî awayî ev gav jî vala derxistin. Êdî hedef bû çi? Hedef bû ku em hevsengiyê misoger bikin û têkevin serdema hevsengiya stratejîk û em xwe bi hêz bikin. Bi îhtimala ku di dema pêş de derfeta çareseriya siyasî pêk bê, me qet negot ku em ê bi tena xwe giştî dewletê bişkînin.

Bi rastî jî me tu caran wisa negotiye. Mesela di pirtûka Serokatî ya "Li Kurdistanê Rola Zorê" de jî ne wisa ye. Serokatî dibêje, "kedkar û proleterên Tirkiyê wê bi giştî rabin, em ê jî gerîla bi pêş bixin. Di qonaxa hevsengiyê de ger li Tirkiyê jî rabûn çêbibe, wê biçe encamê." Ango îtifaqa stratejîk wekî çepê Tirkiyê dibîne; alîgirê stratejîk wekî gelên Tirkiyê dibîne. Dema mutefîk û îtifaqeke alîgirê stratejîk nebû, fêm bû ku zehmet e em tenê hemû artêşa Tirk ji binî ve tesfiye bikin û rakin, an jî ji Kurdistanê bavêjin. Ji ber ku ev zehmet bû, lewma Serokatî agirbest îlan kir. Lê dijmin agirbest vala derxist. Êdî hedef ne ku em derbasî êrîşa stratejîk bibin û bi qonaxa sêyemîn re dewleta Tirkiyê ji vir bavêjin. Me hedefek werga neda

ber xwe. Me xwest em di hevsengiyê de bin, di hevsengiyê de xwe biparêzin. Ango çiyê di destê me de be, bajêr jî di destê wana de be xem nîn e. Lê em têkevin nava hevsengiyê û em zext li ser wan çêbikin ku ji bo werin ser masê. Hedefa me ev bû. Di sala 1993'yan de, piştî ku wan agirbest sabote kirin, armanca me ev bû.

Di vê xisûsê de, di sala '94'an de li ser me hemleyek çêkirin. Lê di sala 1993'yan de em gihîştin wê qonaxê û pozîsyonek me çêbû. Mesela, di sala '93'yan de ez li Botanê bûm, dijmin çiqas hewl da têkeve araziyên stratejîk ên Botanê, lê nikarîbû tiştekî bike. Wekî mînak, nekarî bikeve Besta û Cûdî, lê ketin Gabarê. Ji ber ku riyên Gabarê zêde ne hinekî ketinê, lê nikarîbûn têketan gelek cihan. Wekî din jî deverên Kurdistanê hene, lê nikarîbûn têketanê. Wekî Gilîdax, Agirî û Tendûrek. Li wan deran şer çêbû û nikarîbûn têketana. Ango di giştî Kurdistanê de hevsengî hat ferzkirin, lê dijmin jî lez kir, ev hevsengî tam nerûnişt. Lewma em nikarin bibêjin hevsengî rûnişt. Jixwe çawa ku em gihîştin vê pozîsyonê, hemleya li dijî wê bi pêş ket. Di sala 1994'an de hemleya dijmin rê neda ku hevsengiya stratejîk rûne û êrîş kir.

Şerê sala '94'an şerekî mezin bû. Şerekî ewqas mezin bû ku, tenê di wê salê de me nêzî 3 hezar şehîd dan. Di nav wan 9 salên dawî yên beriya wê de me şer kir, hezar û 500 şehîdên me hene, lê di '94'an de tenê di salekê de nêzî 3 hezar şehîdên me çêbûn. Ji ber ku şerên pir dijwar qewimîn. Ev hejmar ne fermî ye. Şerekî pir mezin bû û piştî wî şerê mezin dijmin li ser bingeha hakimiyeta araziyê taktîk meşand. Çawa? Wekî ku Kurdistanê ji nû ve dagir bikin dijmin bi operasyonê kî dera girtî ket wir û ji wir derneket. Ev yek salekê berdewam kir. Nimûne, li Botanê çawa taktîk kir? Her 15 rojan carekê diket cihekî. Mesela destpêkê têketan Gabarê, 15 rojên din diketin Çiravê. Wisa her 15 rojan carekê encex cihek digirtin. Lê operasyona Besta dirêj ajot, 45 rojan ajot. Ango wisa bi qedeme û hemle hemle heya dawiya salê ajot. Li derên din jî wisa kirin. Ango ji nû ve dagir kirin. Artêşa Tirk biketa kî derê, li wir dima. Ji bo vê gelek leşker ji wan re pêwîst bû, ji her derê leşker anîbûn. Bi vî awayî topyekun seferber bibûn. Şerê 94'an wisa bû.

Di dîroka tekoşîna gerîla de salên 1993 û 1994'an salên girîng in. Salên ku herî zêde şer lê bilind bûne. Şerê sala 1994'an jî mirov nikare bibêje terefek bi ser ket, terefê din bi bin ket. Rast e, dijmin gelek dever girtin, lê berxwedanek mezin çêbû û dijmin jî gelek derbe xwar. Rexmê wê jî dijmin gelek gundên Kurdistanê rakir an jî şewitand. Ji derveyî cerdevanan kes nehiştin. Ev yek ji bo dijmin bû avantaj. Vê jî derfet çêkir ku ji sala '94'an şûn de bikaribin li ser me ambargo çêbikin. Gel ji gelek qadên gerîla yên wekî Amed, Dêrsim, Botan û Garzanê vala kirin. Li van cihan gerîla dimîne, lê gerîla têkiliya xwe bi gel re zeîf bû. Ji ber ku gel hemû koçber kirin. Di vî warî de dijmin mesafeyek girt. Aliyê xwe yê xurt bû ev. Ev rastiyek e û heqîqetek e. Ango derfetên '92 û '94'an rabûn. Di hêla leşkerî de qiyamet ranebû. Ji ber ku hinek dixwazin wisa raber bikin. Ev rast nîn e. Ew kesên ku îro îxanet kirin sala '94'an ev rewş wekî hilweşînekê didan xuyakirin, lê ne wisa bû. Di heqîqetê de ew bi xwe şikestibûn. Di sala 1994'an de li her deverê şer hebû û berxwedan hebû.

Di dawiya sala 1994'an de Kongreya PKK'ê ya 5. li Heftenînê hat lidarxistin. Eger şîroveyên Kongreyê bi giştî objektîv bûna û li gorî wê pratîk jî hebûna, derfet hebû mirov di sala '95'an de bilindbûnê bijî, berdawamiya pêşveçûnê bianiya. Bi rastî di rapora polîtîk a ku Serokatiyê ji Kongreyê re pêşkêş kirî de nûbûn û lêgerîn hebû. Serokatî, di rapora polîtîk de terzê şer rexne dike û guhertinê esas digire. Me gelek tiştên wekî bername, amblem û hwd. ên partiyê guhertin. Partiyê xwe li gorî serdemek nû amade dikir û di terzê şer de jî guhertin esas digirt. Serokatî çarçoveya wê danîbû. Lê ger em hevalên li Kongreyê amade, me li ser bingehê perspektîfên Serokatiyê Kongre kûr bikira, hin biryarên objektîf û li gorî realîteya heyî bigirtan, îhtimal hebû di sala 1995'an de pêşveçûn çêbibûya. Lê me wisa nekir. Me bi qalibî û dogmatîk girt dest, me got tiştên ku me nekarî em di sala 1994'an de bikin, em di 1995'an de bikin û me li ser vê yekê biryar girt.

Di sala 1994'an de derfetên me hebûn, lê di 1995'an de gelek cih vala bûne, gund vala bûne, pirsgirêkên lojîstîkê hebûn. Me valatiya gel û temînkirina erzaq hesab nekir. Me valakirina dijmin a gundan negirt dîqatê. Wekî ku tiştek nebûye, tiştê me sala '94'an nekiriye, em ê di sala '95'an de bikin, nêzîkatiyek hat raberkirin. Mesela em ê hevsengiyê çêbikin û dîsa hin deverên dijmin girtîn em ê di '95'an de bigirin. Plansaziya me pir qeba û çors bû; ne li gorî rastiya heyî bû. Halbûkî ji giştî eyaletan heval hatibûn Kongreyê. Yekemîn car bi qasî 270 delege û guhdarvanan hatibûn Kongreyê. Bi giştî hejmar digihîşt 310 kesan. Ji her deverê heval hebûn. Mirov dikarîbû li gorî şert û mercên eyaletan hîn baştir plansaziyekê bi pêş bixe. Lê plansazî pir dogmatîk, qeba û çors bû. Tiştên ku me beriya wê nekiriye, me xwest em bikin biryara Kongreyê. Di dawiyê de bi vî rengî jî nebû. Halbûkî di '94'an de ketin nîn e; di hin cihan de ji hêz ketin heye, paşveçûn heye û tengahî çêbûye, westandin heye û li hinek cihan jî guhertin heye. Lê ev rastî li ber çavan nehat girtin. Piştî wê, vesazkirin û rotasyon çêbûn. Serokatî, bi taybetî vesaziyên Botanê di cih de nedît. Ji ber ku wekî berê ma. Encama em gihîştibûnê, Serokatî pir di cih de nedît û rexne kir. Di encamê de em wisa ketin pratîkê û pratîka '95'an bû destpêka dubarekirina me.

Beriya wê biryargeha me li welat tune bû. Berê çend caran biryargeh hatibûn avakirin. Di sala 1983'an de biryargeh li Lolanê çêbû. Ji sala 1985'an şûn de ev biryargeh neket dewrê. Di sala 1987'an de Serokatî bi xwe tevahî eyalet bi rê ve dibirin. Wê demê komîteyek wekî berpirsyarê Bakur saz bû. Di Kongreya PKK'ê ya 4. de biryara biryargehbûnê derket û 2 biryargeh ava bûn. Biryargeha yekemîn li Heftenînê, biryargeha duyemîn jî li Xakûrkê hat avakirin. Piştî '92'yan yek ji van biryargehan ji qadên Bakur berpirsyar bû, ya din jî ji qadên Başûr û hinek eyaletên Bakur ên wekî Serhed û Erzorimê berpirsyar bû. Serokatî, beriya şerê 1992'yan dixwest biryargeha navendî jî saz bike, ango wê du biryargehên wekî yek biryargeha jêrîn, a din jî biryargeha jorîn hebûya. Lê şer rê neda ev bê pêkanîn. Helbet şerê '92'an her du biryargeh jî tesfiye kir.

Di salên 1993 û 1994'an de li welat biryargeheke me nebû. Biryargeh bibû saha Serokatiyê. Dûrbûna sahê û hakim nebûna li ser detayan rê neda ku di terzê şer de yekbûn çêbibe. Nimûne, me li Botanê biryar dabû ku dijmin nekeve araziyê me; eger dijmin bikeve araziyê me, divê fatûreya wê bê dayîn. Îleh bikeve jî divê şerên dijwar bibin û herî kêm dijmin windahî bide. Ji bo dijmin nekeve arazî me heya dawî şer dikir. Fermandarê ku dijmin biketa herêma wî û şer nekira, me ew ji wezîfeyê digirt. Şemdîn Sakik jî di '93'yan de çû saha Serokatiyê.

Di bihara 1994'an de li saha Serokatiyê Konferansa PKK'ê ya 3. hat lidarxistin. Şemdîn bi xwe jî di dîwana Konferansê de bû. Di Konferansê de biryar hat girtin ku, em derbasî qonaxa hevsengiya stratejîk bibin û em herêman biparêzin, ango em dijmin bernedin araziyê xwe. Lê Şemdîn bi xwe pê bawer nake û di civînê de jî nabêje. Şemdîn ji wir çû Îranê, dûvre çû Serhedê û derbasî Dêrsimê bû. Heman demê di Botanê de jî, li herêma Rûsor a Bestayê ku fermandarê wir hevalê Cahîd bû, dijmin ket araziyê wan û dûvre ew heval şehîd ket. Dema me bihîst ku dijmin ketiye araziyê wan û yekînaya wî dijmin nedîtiye, me ew ji erkê girt. Wekî din jî, tiştên wisa dibûn, lê Şemo jî berevajiyê vê nêzîkatiyê, li eyaletên tê de berpirsyar, kî bi dijmin re biketa şer ew ji wezîfeyê digirt. Me heval ji wezîfeyê digirt û hesab dipirsî ku, dijmin çima ketiye araziyê we, we çima şer nekir? Şemo jî ji wezîfeyê digirt û hesap dipirsî ku, "hûn çima wekî gerîla bi dizî tevnegeriyane, we xwe eşkere kiriye û hûn bi dijmin re ketine temasê. Ev sûcek e." Ango nêzîkatî û feraset tam berevajî hev bûn. Di dawiya sala 1995'an de di civîna me ya navendê de min ev gotin kir, Şemo jî di wê civînê de amade bû, rabû got: "Tiştê hevalê Cemal dibêje rast e û wisa bû." Ango hevdû valaderxistin hebû. Ez nabêjim ez rast bûm, an jî ew rast bû. Lê newekhevbûn hebû. Ji ber sedemên wisa Kongreya 5. biryar da ku biryargeha navendî di saha şer de saz bibe. Min heya dawiyê destek dikir ku biryargeh saz bibe ji bo yek destî û yek koordîneyî pêk were û yek terz bi pêş bikeve. Bi biryara Kongreya 5. li Zapê biryargeha navendî hat avakirin. Lê bes biryargehê ev rol tam neleyîst. Li dewsa ku ekîba biryargehê eyaletan bimeşîne, zêdetir bi eyaletan re ket nav

nakokiyan. Têkiliyek di cih de di navbera biryargeha navendî û eyaletan de çênebû. Vê carê pir bar ket ser biryargeha navendî û bi vî awayî biryargeh jî di bin de ma.

Ji ber van hemû sedeman sala '95'an di têkoşînê de pêşveçûn çênebû, xwe dubare kirin çêbû. Eyalet bi giranî bi xwe re mijûl bûn. Ji bo pêşveçûn çêbibe neketin hewldanê. Eyaletan tiştê ku ji wan dihat xwestin pêk neanîn. Biryargehê xwest bi ser Zagrosê re hin çalakiyan lidar bixe, lê wê jî encamên berbiçav dernexist holê.

Di sala 1995'an de piştî meha tebaxê dîsa şerê Başûr heye. Di vî şerî de jî ew performansa dihat xwestin derneket holê. Serokatî, ji bo vê di meha mijdarê de dîsa agirbest îlan kir. Hinek ketin dewrê, agirbest hem li Başûr çêbû, hem jî li Bakur. Di wê salê de ji hêla taktîk ve pir zelalî tune ye. Kî bi ser bixista, ew dihat xelatkirin. Tu bi bin bikevî jî tu diketî lêpirsînê. Kesî li şêwaz nedinêrî, her kesî li encamê dinêrî. Halbûkî şêwaz pir girîng e. Mînak, hêzekê li qereqolê dida; ger windahî bida diket lêpirsînê, li cihek din li qereqolê dixist û bi ser diket, vê carê dihat xelatkirin. Ango di çarçoveya taktîkê de zelaliyek tune bû.

Di bihara 1996'an de Serokatiyê taktîkeke nû pêşkêşî me kir. Serokatî xwest em çend kes biçin biryargeha navendî. Ez û çend kesên din em çûn. Em bi hev re axivîn û me çarçoveya taktîkê jî diyar kir. Li gorî wê çarçoveya taktîkî ya nû; diviya gerîla şerê li ser arazî bikira, ango diviya şerê xwe dispêre arazî bi pêş bixista. Ji ber ku dijmin pir tedbîr girtiye, derdora giran mayîn kiriye, têlên resayî daniye û termal jî heye. Di vê rewşê de êrîş birina ser qereqolê pir zor e. Wê demê ya baş, tu dijmin bînî ser xwe, arazî bikolî, mewzî çêbikî û dijmin bikişînî xefkê. Mesela, wê demê her roj li Ertûşê çalakî dihatin lidarxistin, lê windahî dihatin dayîn. Serokatî mîna ku digot, ger hûn dixwazin biçin ser Ertûşê, divê hûn li ser arazî kar bikin, wisa biçin. Xendekan bikolin, dewlemendiya arazî bi kar bînin û kanalan çêkin. Ango kûrahiya arazî bixebitîne û dijmin bikişîne ser xwe û derbeyê lê bide. Serokatî ev wekî taktîka nû bi pêş xist û dûvre Konseya Leşkerî kom bû. Serokatî got: *"Hûn ê pirtûka Sun Tzu bixwînin û dûvre belav bibin."* Ev di gerîla de tiştekî nû bû.

Di sala 1995'an de gelek fermandarên eyaletan çûbûn gel Serokatiyê û hatibûn perwerdekirin. Li gorî vê, her yek ji wana ji bo ku vê taktîkê tetbîq bike derbasî ser eyaletekê bû. Vana kî bûn? Botan çû eyaleta Zagrosê, Dr. Silêman çû eyaleta Amedê, Zekiyê Biçûk derbasî eyaleta Erzorimê bû û Bexwedan çû eyaleta Serhedê. Bi vî rengî vesazî çêbû. Dihat xwestin ku vê taktîkê li eyaletan tetbîq bikin. Di sala 1996'an de wê derbasî herêmê bibin û di sala 1997'an de dest bi demek nû bikin. Ango wê di '96'an de biçin eyaletan amadekarî bikin û di '97'an de jî hemleyê bidin destpêkirin. Lewre Serokatî ev sal wekî sala fînalê şîrove kir. Ji ber ku amadekarî bi vî rengî bû. Lê ev kesên ku min navê wana dayî, Serokatî li saheyê bi roj bi wana re diaxive, ev jî bi şev di nav xwe de diaxivîn. Li gel wan Hêlîn û Peyman jî hene, jixwe vana niha ne di nav me de ne, îxanet kirine. Serokatî bi samîmiyet û duristiyeke mezin roj û şev bi wana re mijûl dibe û dixwaze wana wekî fermandar bigihîne. Ew kesên ku min navê wan rêz kirî, Serokatî derfetê dide wan û wana li cihên dîrokî digerîne, bi dilsoziyek mezin nêzî wan dibe û rol dide wan, ew li sahê kirine rêveberî. Ew jî her şev kom dibin, pistepist dikin û henekên xwe bi gotinên Serokatiyê dikin. Tabî em paşê bi van kiryarên wan hesiyan. Ev tesfiyekariya dûvre derketî holê, hîn li wir dest pê dike. Ev tesfiyekariya destpêkê sala 2000'î di bin serkêşiya Dr. Silêman û Zekiyê Biçûk de hat jiyîn, dûvre jî ya 2003'yan di bin serkêşiya Botan û Ferhat de hat jiyîn, bingehê wê hîn li wir hatibû danîn.

## D) Di Pêşveçûna Şer De Artêşbûna Jinê

Di sala 1996'an de sûîqesta li ser Serokatiyê heye. Li hemberî vê komployê çalakiya hevala Zîlan bi pêş ket. Bi vê çalakiyê re eşkere bû ku, li ku derê xeta teslîmkariyê hebe, li

rex wê xeta berxwedanê jî heye. Nimûne, hevala Zîlan li Dêrsimê derketinek kir. Xayînê Zekî salekê pê de li Dêrsimê mabû û li wir roleke xirab leyîstibû.

Di dema teqîna bombeya li Şamê de em di civîna konseya leşkerî de bûn. Di wê civînê de me telefon anîbû, Serokatî yek bi yek bi me hemûyan re diaxivî. Zekî xwe bi zanebûn kir rojevê û digot: "Ev civîn li ser min tê çêkirin. Ez wekî hedef hatime raberkirin. We min xistiye rojevê." Qesta wî ez bûm. Ji ber ku min wî hinek rexne kiribû. Wisa xwe xist rojevê. Serokatî bi telefonê hinek tişt jê re gotin. Serokatî li ser malbata Şemo axivî û jê re got: "Tu dixwazî çi bikî?' Serokatî ev pirs jê kir. Me hew dît ku Serokatî got, "deqîqeyekê rawestin!"

Em dor 80 kesan di wê civînê de amade bûn û me guhdar dikir. Di wê kêliyê de bombe nêzî dibistana Serokatiyê diteqe. Di navbera mala ku Serokatî lê dimîne û dibistanê de 4 km. hebû. Deng tê Serokatî, lewma radiweste. Serokatî dema got, "deqeyekê" û navber da telefonê, diçe hevalan rêdike dibistanê ku bizane encam çi ye. Gava Serokatî bi me re diaxive, dijmin jî wî dişopîne û texmîn dike ku Serokatî li dibistanê ye, lewma bombeyê diteqînin. Serokatî jî ne li dibistanê ye, 4 km. ji wir dûr li malê dimîne. Di dil xwe de gava Serokatî bi me re telefonê diaxive, ew ê Serokatiyê tune bikin. Ev suîqest di 6'ê Gulanê de pêk hat. Li hemberî vê komployê jî hevala Zîlan di 30'ê Hezîrana 1996'ê de çalakiya xwe ya fedaî û bi wate pêk anî û nameya wê heye. Her ku derketineke îxanet, xirab û teslîmkariyê çêbûye, li rex wê berxwedan jî çêbûye.

Di sala 1992'yan de dema Ferhat teslîmî hêzên YNK'ê bû, hevala Bêrîtan jî wê rojê heya dawiyê li ber xwe dide. Li wir bi fedaîtî li hemberî teslîmiyetê şer kir. Ango li hêlekê teslîmiyeta Ferhat, li hêlekê jî berxwedana hevala Berîtan heye. Di wir de bi awayekî fedaî şer kirin û teslîmiyet qebûl nekirin heye. Ev diyalektîk li zîndanê li hemberî teslîmiyeta Şahîn Donmez û Yildirim Merkît jî heye. Ji ber ku Şahîn Donmez teslîmî dijmin dibe û tenê bi teslîmbûnê jî namîne, dixwaze berxwedana zîndanê lawaz bike, ji bo vê hewl dida. Li aliyê din berxwedana rêheval Mazlûm Dogan, Xeyrî Durmuş, Kemal Pîr, Ferhat Kurtay û hevalên li gel wan heye. Di PKK'ê de ev diyalektîk heye. Her dem li hemberî xeta teslîmkarî û tesfiyekariyê xeta berxwedanê û ruhê Apociyê derketiyê pêş. Di '92'yan de li Xakûrkê çalakiya hevala Bêrîtan û di '96'an de çalakiya hevala Zîlan ji vê yekê re mînak in. Heman demê derketina van her du rêhevalan sembol e. Di pratîka gerîlayê Kurdistanê de di aliyê ruh de wekî lûtkeya herî bilind e. Li pişt vê pratîkê keda milîtan û fermandarên jin zêde ye.

Di sala 1980'yî de li Pazarcikê şehadeta hevala Besê Anûş heye. Her wiha şehadetên hevala Seadet (Rahîme Kahraman), Hewa (Hanim Yaverkaya), Leyla (Sultan Yavuz), Rûken (Çîçek Selcan), Dîcle (Eyno Eto) û Bêrîvan (Binevş Agal) heye. Heman demê di zîndanê de berxwedana jina Kurd di bi pêşengiya rêheval Sara (Sakîne Cansiz) de heye. Vana hemû bingehê ruhê di jina Kurd de veşartî, derxist holê. Wekî ku cewherek di çi astê de dikare bilind bibe, nîşanî me da. Şerên ku jinan meşandine hene. Di şerê '92'yan de di eniya Heftenînê de taxima destpêkê li ber xwe daye, ya hevalên jin e. Wê çaxê yekemîn taxim di bin berpirsyariya Dîlan Dêrik de çêbibû. Taxim bi giştî ji 25 kesan pêk dihat. Ew taxim li derbenda (boğaz) Bûselê bû. Dijmin keşif dike, di dil xwe de li gorî aqilê xwe dibêje, "ev taxima jina ye. Em destpêkê ji wan dest pê bikin, ji bo moralê wan bişkê." Li wir hevala Çîdem şehîd dikeve. Bexwedana Heftenînê bi jinan dest pê kir. Dûvre li wê eniyê şerên pir mezin qewimîn. Ew enî pir dirêj bû, li aliyekî hevala Azîme fermandar bû, li aliyê din hevalê Serbest Goyî fermandar bû. Hevala Azîme li Banîkê li ser girekî ye û ew der wekî kelhekê ye.

Di wê eniyê de kî li ku derê biketa tengasiyê, me digot xwe bide milê hevala Azîme. Ji ber ku cihê hevala Azîme girtibû, wekî kelhekê bû. Hevala Azîme di şer de ewqas hakim bû û xwedî cesaretek mezin bû. Di artêşbûna jinê de keda hevalên wisa û di serî de keda hevala Azîme pir zêde ye. Hevalên wisa di gerîla de pijiyayîn kêm ked nedan. Hevala Azîme, hevala me ya jin a destpêkê ye. Hîn di dema Filistînê de hevala Azîme bi me re bû. Me berê jî got, dema em li Filistînê bûn 13 hevalên jin hebûn, hevala Azîme jî yek ji wana bû. Wê çaxê tê bîra min, me bi hev re perwerde didît. Pişeya hevala Azîme beriya tevlî PKK'ê bibe,

mamosteyî bû, di dibistanên seretayî de mamostetî dikir. Lê hevala Azîme mamostetî berdabû û tevlî partiyê bibû. Hevala Azîme keseke sportîf bû, di perwerdeyê de gelek ji hevalên jin hinek hereketên sporê yên giran nedikirin, lê hevala Azîme yek jî bernedida. Xortan çi spor û hereketên giran bikiran, wê jî dikir. Di sporê de her yekemîn derdiket.

Hevala Azîme di Kongreya PKK'ê ya 3. de bû endama Komîteya Navendî ya PKK'ê. Hevala Azîme di demên herî giran ên şerên salên 1986'an heya 1990'an de her di eniyên pêş de bû. Di şerê 1992'yan de jî hevala Azîme rol girt. Hevala Azîme, herî dawî sala 1994'an di parastina Herekolê de şehîd ket. Artêşbûna jinê li ser bingeha keda hevalên wekî hevala Bêrîtan, Azîme û Zîlanan şer kirine, hat avakirin.

Nimûne, di sala '93'yan de hevala Besê Dêrsim hebû. Her wiha hevala Zinarîn heye. Beriya wê, pratîka ku hevala Edalet li Heftenînê meşand, pir mezin bû. Ango gelek hevalên jin ên wisa di eniyên şer de fedakarî kirine û bi cesareteke mezin şer kirine, hene. Beriya artêşbûna jinê, min bi xwe jî ji bo jinek bikaribe biçe pêl singa leşker bike û çeka G-3 ji ser rabike pir hewl da. Wê çaxê me di tabûra bi tevger de taxima hevalên jin ava kiribû. Di wê taximê de di şer de hevala Besê (Suna Çîçek) roleke mezin leyîst û ji bo min ew sekina wê bibû serkeftineke mezin. Bi wî awayî terzeke êrîşkar hat bipêşxistin; êrîş bike û bigire. Bi taybetî ev pratîkên salên '92'yan bi ked û qehremaniya şehîdên wekî Berîtanan, Edaletan, Zinarînan û Azîmeyan meşiya. Dûvre jî hevala Zelal, Agirî, Cîhan û Çîçek hene. Hevala Zelal jî fermandarek bû. Ev yek bi saya keda van hevalan bû. Artêşa me bi keda hevalên wekî rêheval Zinarîn, Edalet, Çîçek û Zelalan gihîştiye vê astê.

Di Kongreya PKK'ê ya 5. de tê pirsîn ku, kîjan hevala jin dikare yekîneyên hevalên xort bimeşîne. Hevala Çîçek û Zelal derdikevin pêş û dibêjin: "Ji bo me ferq nake. Xort be jî, jin be jî em dikarin hemû quwetan bimeşînin. Em amade ne." Ji ber ku heqîqet jî ev bû. Van hevalan di nava şer û pratîkê de xwe îspat kiribûn. Di şer de otorîter bûn. Kî dikarîbû ji wana re bibêje ev jin e, xwe vir de wê de bide. Na. Kesî nikarîbû wana vala derbixe. Ev ne gengaz bû. Ji ber ku di şer de xwe bi hêz û cesareta xwe îspat kiribûn. Li ser ked û qehremaniya van hevalan di meha Mijdara sala 1993'yan de Artêşbûna Jinê ket rojevê.

Beriya wê, di salên 1992 û '93'yan de nîqaşek hebû. Ev nîqaş ku, "Jin dikarin bibin leşker, an na?" bû. Zekî û hinek kesan digotin, "jin nikarin bibin leşker." Eşkere ev nêrîna xwe diparastin û di saheyên wana de jî dema hevalên jin beşdar dibûn, tenê çend kes ji bo çapemeniyê digirtin, ên din jî nedigirtin, dişandin bajaran, ji bo xebatên siyasî bimeşînin. Lê me li Botanê ev red dikir û me digot, "jin dikare şer bike, ferqa jin û zilam nîn e." Ji bo vê kîjan hevala jin tevlî bibûya, me digirt. Di sala '93'yan de tenê li Botanê 600 hevalên jin hebûn û li Zagrosê jî hejmara hevalên jin wisa zêde hebû. Lê di eyaletên din de wisa zêde hevalên jin tune bûn. Ji bo vê, artêşbûna jinê li Botanê ket rojevê. Serokatî çend caran bi rêya bêtêlê ji me dipirsî û fikrê min û yê hevalan digirt. Me jî li ser artêşbûna jinê nêrînên erênî pêşkêş dikirin. Dûvre Serokatî di Mijdara '93'yan de cardin bi rêya bêtêlê wekî fermandariya Botan û Behdînanê (Zagros) bi min re axivî û perspektîfa artêşbûna jinê da. Hevalên jin (hevala Sozdar Avesta jî li wir bû) hatin û axivîn. Li Botanê jixwe sîstema taximên hevalên jin hebû û biryar hat girtin ku yekîneyên jin jî bên damezrandin. Bi vî awayî artêşbûna jinê ket rojeva me û artêşbûna jinê pêk hat. Helbet di vê pêşketinê de li ser bingehê xeta Serokatiyê keda şehîdên jin û îspata wan bi pêş xistî, bû bingeh.

Li ser vî esasî di sala 1993'yan de di pratîkê de Artêşbûna Jinê pêk hat. Sala 1994'an ji bo artêşbûna jinê li hemû eyaletan bi pêş bikeve, ji Botanê taxim bi taxim heval hatin birêxistinkirin û ji tevahî eyaletên Bakur re hatin şandin. Wisa li her derê belav bûn.

Di aliyê artêşbûna jinê de ez bi cewherî dikarim vê diyar bikim: Di Tevgera me de dîroka jinê hîn firehtir e. Piştî Kongreya PKK'ê ya 5., di destpêka Adara 1995'an de yekem car Kongreya Jinê li çiyê hat lidarxistin. Di wê Kongreyê de rêxistina jin a bi navê YAJK'ê hat damezrandin. YAJK'ê di aliyê tevgera jinê de sîstemek bi pêş xist. Li ser vê mijarê em ê hinek

din jî biaxivin û li ser nîqaş bikin. Ji ber ku di fermandarbûnê de têkilî û rol leyîstina jin û zilam û di vê mijarê de zelalbûn pir girîng e. Lewre em ê li ser vê mijarê jî bisekinin.

Yek jî, beşdarbûna hevalên jin a di artêşê de, tenê beşdarbûna kesane ya bi fizîkî nîn e. Na, ev temambûneke civakî ye. Jin, di aliyê ruh dayîn, temam kirin û bipêşxistinê de xwediyê mîsyonekê ye. Jixwe pir heval bi awayê şexsî weke yek kesê nêzîk dibin. Heqîqet ne wisa ye. Jin, mîsyoneke xwe heye. Rastiya zilamê Kurd jî tê zanîn; li cihekî ku hevaleke jin a jîr û bi cesaret di taximekê de hebe, ew jin ji bo zilamê Kurd dibe nimûne û cihê teşwîq û cesaretê. Di vî alî de jî roleke hevalên jin heye. Mesela, hevala Çîçek hebû. Wekî heval dizanin, bi salan bi me re ma. Keda wê dayî, cesareta wê raber kirî di pêşxistina artêşbûna jinê de, di pêşxistina pir çalakiyan de, di serkeftina çalakiyan de xwediyê roleke mezin e. Hîn di sala 1993'yan de hevalekî îşaret bi hevala Çîçek kir û ji min re got: "Tu vê hevalê dibînî?" Min got, "erê"; wî got, "Ev hevalek pir bicesaret e. Mirov jê hêz digire. Ger ew li kêleka mirov be mirov qet natirse." Ango hevalên wisa bi pratîka xwe, bi cesareta xwe, bi jiyana xwe ya pak zemîn ava kirin û bingehê artêşbûna jinê danîn.

Di vê wateyê de artêşbûna jinê ya di nava PKK'ê de bi ked û xwînê bi pêş ket. Berî her tiştî keda jinê bi xwe tê de heye. Helbet destpêkê ked û xeta Serokatiyê, her wiha ked û serkêşiya van hevalên wisa qehreman tê de heye. Ger di salên '92 û '93'yan de fedakarî û keda van hevalan nebûya, bingeha artêşbûna jinê jî bi vî awayî bi pêş nediket. Di xeta Serokatiyê de artêşbûna jinê li ser bingehê ked û fedakariya van hevalan ava bûye.

## E) Di Pêvajoya Pêşketina Komploya Navnetewî De Rewşa Şer

Di sala 1996'an de Serokatî dixwest hemleyek nû bi rê bixe. Serokatî ji bo vê taktîkê ruh û fedaîtiya hevala Zîlan mînak digirt. Serokatî, fedaîbûna Zîlan mînak nîşan da, li dibistanê bi xwe nameya hevala Zîlan dixwîne. Li rex berxwedaniya hevala Zîlan, hin kesan bi rengê xayînî û nemerdî tesfiyekariyê tenzîm dikin. Ji ber vê jî pratîka 1997'an vala hate derxistin. Serokatî sala '97'an wekî fînalê diyar kiribû. Bi rastî jî dikarîbû bibûya fînal. Eger terzê gerîlatiya xwe dispêre arazî bibûya û li Bakur, Başûr û li hemû deran biketa pratîkê, her wiha perspektîfa ku Serokatiyê di dîroka 27'ê Nîsana 1996'an de dabû, baş bihata fêmkirin û di sala '96 û '97'an de bihata tetbîqkirin, rewşa me wê niha cuda bûya. Lê di serokatiya taktîkê de duristbûn nebû. Beriya sala '97'an ji ber tesfiyekariya ku Botan li Zagrosê kirî, Serokatî ew ji wezîfeyê girtibû. Serokatî, Botan û Merwanê Tirk ji artêşê derxistin û rêkir herêma Soran-Silêmaniyê, da ku ev her du ji artêşê derbikevin û di nava gel de xebat bikin. Ew her du di artêşê de wekî jehrê bûn û xirab dikirin. Di sala '97'an de zemîn hat avakirin. Di wê salê de Operasyona 14'ê Gulanê ya li Zapê derket, lê di Zapê de amadekarî pir nebûn û Zap ket. Di heman demê de PDK jî tevlî şer bû. Dijmin bi amadekarî bû û PDK jî bi xwe re kiribû yek. Di sala '97'an de dijmin bi PDK'ê re êrîşî me kir.

Di wê navberê de kesên ku hatine surgûnkirin ên wekî Ferhat, Botan, Dogan, Bîlge û Merwan li Kampa Botî digihin hev. Wî Ferhatî carina bi henekî yan jî bi rastî digot: "Me li Botî civîn çêkir, em yek rêveberî bûn. Me li hev nêrî û em keniyan. Dûvre me got, em bi çi dikenin? Me dît ku em giştî Abbaszade ne." Çawa? Di Kongreya PKK'ê ya 5. de hevalê Abbas ji saha Serokatiyê hat. Hevalê Abbas hem berpirsyar bû, hem jî di komîsyona lêpirsînê de bû. Me hevalê Abbas pêşniyar kiribû, ji ber em bibûna komîsyona lêpirsînê wê bigotan, "teref girtine." Me ji hevalê Abbas re got, "Hûn nû hatine, hûn bibin komîsyon." Me hevalê Abbas û Karasû kir komîsyon. Komîsyonê ev kes hemû di lêpirsînê re derbas kiribû. Ji ber vê yekê digotin, "em Abbaszade ne." Ev kesên ku min navê wan rêz kir, ji wê rewşa xwe dixwestin hevalê Abbas tawanbar bikin. Halbûkî ew kes ji ber pratîka xwe ya tesfiye bi biryara Kongreyê hatibûn girtin û hevalê Abbas lêpirsîna wana meşand. Ji ber ku wana beriya Kongreyê sûc kiribûn û pratîkeke tesfiyeyê meşandibûn. Gava girtî bûn jî, li gel hev bûn. Wê çaxê vana hemû hatibûn girtin. Piştre li Kampa Botî jî bibûn yek komîte. Ji ber ku

Serokatî kesên artêş xira dikirin, rêdikir xebata nav gel. Wekî saha gel jî tenê saheya Soran hebû, ji bo vê vana hemû li wir hatibûn gel hevdû.

Tê fêmkirin ku vana wê demê hinek tişt bi pêş xistine, têkiliyên xwe bi derve re çêkirine. Guman e wê demê bi rêya YNK'ê bi derve re têkilî çêkirine, komploya li ser Serokatiyê û tesfiyekariya ku pêk hatî, di wê demê de hatiye amadekirin. Destpêka wê di wir de dest pê dibe. Wan kesan dûvre bi YNK'ê re îtifaq çêkirin. Divê mirov fêm bike, gelo ev îtifaq, îtifaqa PKK'ê û YNK'ê ye, yan jî ya YNK'ê û vê grûbê ye? Ji ber wê îtifaqê ev grûb di nava me de xurt bû. Halbûkî van kesan ne endamê partiyê bûn û Kongreyê ew dadgeh kiribûn, hatibûn cezakirin û surgûnkirin. Desteka YNK'ê ya ji wana re vana di hundirê rêxistinê de jî xurt kir. Li dijî PDK'ê bi YNK'ê re îtifaq kirin. Ev yek jî bû sedem ku, PDK hîn bêhtir xwe nêzî Tirkiyê bike û bangî leşkerên Tirkiyê bike. PDK'ê bi Tirkiyê re îtifaq kir ku, leşkerên Tirkiyê 10 salan li Başûrê Kurdistanê bimînin. Heta niha jî ew leşker ji Kurdistanê derneketine. Wê çawa bê derxistin jî ne xuya ye. Guman e ku qet dernekevin. Yek, ev zemîn vekir. Ya din jî, YNK'ê pêşmergeyên xwe jî kir bin fermana vê grûbê. Ango hem hêzên me bi rê ve dibin, hem jî yên YNK'ê.

Bi vî awayî eniya li Soran hatî vekirin, xurt bû. Dema mirov li pratîkê temaşe dike; Zap û eyaletên din bi giştî bi bin ketin, lê eyaletên Botan û Soran hîn li pêş bûn. Heta carekê bi telefonê bi min re jî axivîn û wekî bibêjin, ev eyaletên din û pratîka Zapê hemû tesfiye ne, tenê Soran û Botan baş e. Heta wisa gotin: "Li Botanê hinek ked heye. Hûn ked didin." Ji ber ku wê çaxê li Botanê şerê xwe dispêre arazî hinek hat tetbîqkirin, bi wê taktîkê hinek encam hatin girtin. Li Botanê gelek firehî çêbû, xwe spartina arazî û û şer kirin hat tetbîqkirin. Dijmin nikarîbû bikeve araziyê me. Ji ber ku ambargoya li ser Botanê bi alternatîfan hinekî hatibû rakirin. Êdî li Botanê pez dihat xwedîkirin, baxçe dihatin çandin û nedihat hiştin ku dijmin were texrîb bike. Botanê bi vî rengî xwe xwedî kir. Bi esasî ev raber dike ku tevahî eyaletan heman şêwaz bimeşanda, wê sala '97'an bibûya sala fînalê. Lê em ê bînin ziman ku eyaletên din çawa bi pêvajoyê leyîstin û ev qonax vala derxistin.

Di sala 1997'an de bi rastî tenê li Botanê û li Soran pêşveçûn hebû. Vana bi min re bi telefonê diketin têkiliyê. Wê çaxê min ferq kir ku niyeta wan xirab e. Ji ber ku carekê ji min re gotin, "em biryargeha Zapê esas nagirin, keda kî hebe em dixwazin wî esas bigirin." Ango dixwestin bibêjin, em naxwazin Zapê (wê çaxê hevalê Cuma li Zapê bû) esas bigirin, em dixwazin te esas bigirin. Ger min jî erênî bersiv bida, wana jî wê bixwesta xwe bi vî awayî di rêxistinê de bikin hêzeke bingehîn. Min ew red kirin û ji wana re got, "tiştên wisa neynin bîra xwe." Piştî wê êdî têkiliyên xwe bi min re qut kirin. Jixwe ji wê çaxê û şûn de wê grûbê fêm kir ku, ez li hemberî wan astengiyeke cidî me. Êdî di kar û barê xwe de ji bo min û yên wekî min bêbandor bikin dijberiyek bi pêş dixistin. Ew grûb ewqasî durû bû ku, piştî vê helwesta min êdî xwe nêzî hevalê Cuma kirin. Van hemû helwest û nêzîkatiyên wan raber dike ku, îxaneta sala 2003'an eşkere bûyî, bi esasî di salên 1996-97'an de xebata xwe daye destpêkirin.

Di sala 1997'an de ew kesên ku ji saha Serokatiyê hatibûn û pêwîst bû rol bileyîstan, wana rol neleyîstin. Nasir salên dirêj li Zagrosê mabû, fêrî terzê pişta xwe bide sînor bibû. Lê rêxistinê, di '96'an de ew ji bo Garzanê vesaz kir. Bi vî awayî ji bo amadekariya sala '97'an û ji bo bi rastî sal bibe sala fînalê tevahî fermandarên Bakur ji nû ve hatin vesazkirin. Lê belê ji vana yekî jî rola xwe neleyîst. Botan, jixwe hîn di destpêka '97'an de ji ber tesfiyekariya xwe ya li Zagrosê meşandî ji erkê hat girtin. Berxwedan çû Serhedê, lê neket hundirê eyaletê. Nasir, Dr. Silêman û Zekiyê Biçûk çûn cihê xwe, lê yekî ji wana jî rol neleyîst, berevajî eyaletên di bin berpirsyariya wana de, bûn cihê şer bi paş de ragirtin û tesfiyekariyê. Mirov dikare bibêje, bi esasî bingehê Komploya Navnetewî di wê demê de bi van pratîkên tesfiyekar hat danîn. Eger wekî hatî plankirin di '97'an de em bi ser biketan û '97 bibûya sala fînalê, gengaz bû bi şêwazekî cidî çareseriya siyasî têketa rojevê. Ji ber ku dewleta Tirk jî pir di tengasiyê de bû. Bi rastî jî di sala '97'an de ji derveyî eyaletên Botan û Soran, tu eyaletê rola xwe neleyîst, Zap ket û dewleta Tirk jî leşkerên xwe di Başûrê Kurdistanê de bi cih kir.

Di şerê navbera me û PDK'ê de her du aliyan jî pir windahî dan. Dema eyaletan jî rol neleyîst, destê dagirkeriya Tirkiyê xurt bû. Bi taybetî ketina Zapê û piştî wê valatiya di biryargeha navendî de çêbûyî, bi xwe re qelsiyek bi pêş xist û cardin ARGK bêbiryargeh ma. Rêveberiya biryargehê ku ji wezîfeyê hat girtin, çend kes li biryargehê mabûn. Lê vana ne kesên ku bikarin biryargehê bimeşînin bûn û valatî hebû. Demekê jixwe biryargeh bê berpirsyar bû. Di wê demê de Serokatî bi min re axivî ji bo ez derbasî biryargehê bibim. Wê çaxê meha Hezîranê bû. Me li aliyê Wanê hemleyek dabû destpêkirin û me dixwest em li Botanê hemleyê berfireh bikin. Dema Serokatî ji min re got, "divê tu derbasî Zapê bibî", min ji Serokatiyê re plana me pêşkêş kir û min got, "ger em li Botanê vê hemleyê bi pêş bixin û Zagros rola xwe bileyîze, Başûr û Zap wê xwe komî ser hev bikin. Ger Zagros rol neleyîze, em ê li Başûr tengav bibin." Serokatî ev nêrîn di cih de dît û got: "Ger wisa be, tu li Botanê berdewam bike." Lê biryargeha navendî jî bê rêveberî ma. Bi esasî berpirsyarê wê em in; ango rêveberiya taktîkî rola xwe neleyîst, vê rewşê Serokatî jî xist tengasiyê.

Lewre Serokatî mecbûr ma wan kesên li biryargehê erkdar bike. Vana jî; Dûrsûn Alî û Merwanê Tirk bûn. Ekrem û Hêlîn jî hatin gel wana. Tiştê wan li wir kir, tesfiyekariya heyî hîn kûr kir. Erk girtina wan a li Biryargeha Navendî zirarek mezin da tevgerê. Bi taybetî di pîvanên şer de exlaq esas negirtin. Ev jî bû sedem ku di xelkê Başûr de li hemberî tevgera me bertek bi pêş bikeve. Bi kurtahî ev dem bi texrîbat û bi zirar bihurî. Mijar ne ev e ez rewşa tesfiyekaran rave bikim; mijar ev e ku, perspektîfa Serokatiyê nehat tetbîqkirin. Li hin cihan hat pêkanîn û encam hat girtin. Lê li her derê nehat tetbîqkirin. Bi vî rengî di vê pêvajoyê de amadekariyên sala 1997'an hatin valaderxistin. Li şûna wê, ew grûba Soran derket pêş, lewre tu bixwazî nexwazî Botan û Ferhat derketin pêş.

Di sala 1996'an de tesfiyekariya Şemo jî eşkere bû û Şemo hat girtin. Beriya wê, bi qasî 3 mehan li eyaleta Botanê ma. Wê çaxê Şemo hatibû şûna min Botanê, ez jî çûbûm şûna wî Zapê. Me nihêrî ku li Zapê zivistana salên 1995-96'an karê kirî tam tesfiye ye û dijberiya partiyê ye, lewre li Botanê ji erkê hat girtin û ket lêpirsînê. Me ew ji Botanê kişand û girt. Lê Serokatî ew kişand gel xwe, li saha xwe lêpirsîn dewam kir. Dûvre Serokatî şansek da wî û rêkir Amanosê. Şemo li wir jî nema, hema vegeriya. Ji ber ku êdî di wî de ruh nemabû. Serokatî, vê carê jî Şemo rêkir Garê. Eger Şemo durist bûya, yan wê bima û xwe bida qebûlkirin, an jî wê bireviya. Welhasil Şemo reviya.

Di destpêka 1998'an de Şemo ji dijmin re hin tiştan îtiraf dike û dibêje: "Ne hewce ye hûn operasyonên giştî bikin. Eger hûn dixwazin PKK'ê bi siyasî tesfiye bikin, destpêkê biçin ser Amedê. Eger hûn dixwazin PKK'ê bi leşkerî tesfiye bikin, divê hûn biçin ser Botanê. Eger hûn Botanê tesfiye bikin, navbera Bakur û Başûr wê qut bibe, wê demê Bakur jî bikeve. Eger hûn dixwazin PKK'ê ji binî ve tesfiye bikin, divê hûn biçin ser Şamê." Şemo dibêje, "heya Rêber Apo hebe, hûn çiqas hundir tesfiye bikin, ew ê dîsa dagirin." Dijmin ew plan di wê salê de kir pratîkê. Di sala 1998'an de li ser eyaletên din operasyonên taktîkî hene. Operasyona bingehîn li ser eyaletên Botan û Amedê pêk anîn. Di dawiya salê de berê operasyona navnetewî dan Şamê. Ev plan Şemo pêşkêşî dewletê kir û xistin meriyetê. Ji bo dewletê, aliyên vê planê yên mantiqî hebûn, lewre ev plan pêk anîn. Dûvre jî dewletê Şemo efû nekir û Şemo got, "mafê min hatiye xwarin. Min pir xizmeta dewletê kiriye. Çima ez nehatim efûkirin?" Û li ser vê doz vekir. Ji ber ku xizmeta xwe ji dewletê re zêde bû. Bi rastî jî vî kesî pir zêde zirar da me.

Rêveberiya Biryargeha Navendî di dawiya '97'an de cardin hat guhertin. Serokatî, di meha Tebaxa '98'an de cardin rêveberiya biryargehê ji erkê girt û got: "Êdî biryargeh nîn e." Berî wê jî hema hema wekî ku biryargeh nemabû. Ango di '98'an de hîn zêde sistayî çêbû, li Başûr dijmin ket gelek deveran.

Li Botanê taktîka şerkirina li ser arazî bi temamî pêk nehat, lê hinekî pêk hat. Cardin jî vê dijmin tengav kir û dijmin li hemberî vê taktîkê xitimî. Çawa? Dijmin dihat û diket xefkê. Hevalan xwe nîşa dijmin didan, dûvre dijmin dihat û diket xefkê. Îcarê dijmin nikarîbû

bihata arazî, ji bo vê jî kontrola gerîla li ser arazî bi pêş ket. Cardin wekî '93'an kontrola gerîla li ser arazî xurt bû. Heta cihên wekî Katoyê Jîrka û hin deverên din her çendî dijmin xwest têkeve jî, nikarîbû têketayê. Ala ku hevalan li ser Katoyê Jîrka li hemberî Bêşebabê danî, dijmin nikarîbû bihata û wê alê daxista. Li hemberî vê, rexmê hemû gelê herêmê cerdevantî jî qebûl kiribû, dijmin li ser wan ambargo çêkir û nehişt pêwîstiyên wan ên zivistanê yên wekî erzaq û hwd. biçe gundan. Dijmin ji wana re got, "yan hûn ê biçin ala li ser Kato daxînin, an jî em erzaq nadin we!" Di dawiyê de ji bo gel perîşan nebe meha mijdarê me bi xwe al danî. Ango di wê demê de hakimiyeta gerîla li ser erdnîgariyê xurt bû. Dijmin li hemberî vê taktîkê bêçare ma.

Ji bo ku vê taktîka me vala derxînin di zivistana 1998'an de mesrefeke mezin kirin û di artêşa Tirkiyê de sîstema Yekîneyên Firoke (Uçar Birlik) hatin avakirin. Ango di nava 2 saetan de dikare 10 hezar leşkeran ji cihekî bibin cihekî din. Dijmin fîloyên helîkopteran ava kirin. Dewleta Tirkiyê ji bo vê nêzî 100 helîkopterên skorsky kirîn. Dibe ku hejmara helîkopteran zêdetir be jî û sîstemeke wisa bi pêş xistin. Vê yekê hinekî taktîka me vala derxist. Çawa? Me di arazî de li ser rêya dijmin xefk datanî, lê dijmin bi helîkopteran di hewa re leşker dianî, li pişt xefkê li ser giran datanî. Dijmin jî, ji bo taktîka xwe dispêre arazî vala derbixe, hemleyeke wisa kir. Di wê salê de eyaleta Botanê hinekî tengav kirin, li pir deverên Botanê şer qewimî.

Operasyona yekemîn di 11'ê Adara 1998'ê de li Besta çêbû. Me hin tedbîr girtin. Dûvre me Katoyê Jîrka girt, rexmê ku berf zêde bû li Kato şer çêbû, lê dijmin nikarîbû biketa Kato. Me dît ku dest ji me bernadin. Leşker danîbûn Deriyê Qaçê. Hevalan dora wan girt, çawa bû şev, wana xwe ji dorpêça hevalan xilas kirin. Me got, dibe ku reviyabin. Ji ber ku leşkerek û 2 çete di rê de êsîr ketibûn û haya wan jî ji vê tune bû. Tu nabêjî leşkerên ji dorpêçê reviyane nikarin biçin, derdora 30 leşkeran xwe di herêma me de veşartine û xwe dane bin kevirekî. Ji ber ku wê derê sar e, nikarîbûn pir zêde tevbigeriyana. Me dît ku wisa nabe. Ji bo ku dest ji me berdin, me beşek arazî ji wana re berda. Me aliyekî Deriyê Qaçê ji wan re berda. Milekî Deriyê Qaçê me girtibû, milê din jî dijmin hat û ketê. Piştî ku dijmin ket şûna me, ew leşkerên ku xwe li wan derdoran veşartibûn rastî wan hatin. Wana li wir cemîdibûn, hemû bi darbestan rakirin, birin û çûn.

Di vê operasyona wan a destpêkê de me bi giştî 7 şehîd dan, lê ji bo dijmin ne serkeftî bû û derbên cidî xwarin. Dûvre me fêm kir ku, dijmin seranserê salê her 11'ê mehê operasyon plan kiriye. Jixwe ev operasyon di 11'ê Adarê de bû. Dûvre ya 11'ê Nîsanê dest pê kir û wisa dom kir. Herî dawî 11'ê Îlonê operasyona Katoyê Marînos pêk hat. Di vê operasyonê de di navbera me û hêzên dijmin de şerekî cidî hat jiyîn. Piştî wê êdî dijmin berê xwe da Şamê. Dijmin di sala 1998'an de li gorî planekê û bi zanebûn şer kir, lê ne karîbû Botanê, ne jî Amedê tesfiye bikira. Cardin jî berê xwe da Serokatî û Komploya Navnetewî dest pê kir. 16'ê Îlonê Atîla Ateş li Hatayê axivî û Sûriye tehdît kir. Dûvre di 9'ê Cotmehê de pêvajoya Komploya Navnetewî ya li ser Serokatiyê dest pê kir.

Wekî encam tiştê mirov bibêje ev e: Ji pêngava 15'ê Tebaxê heya sala 1998'an, rexmê hemû kêmaniyan Şoreşa Vejînê bi ser ket. Bi vê pêvajoyê re, di salên 1991, 1992, 1993'yan de derfeta şoreşê pêk tê, lê di rêveberiyê de jî serxweşî û nexweşiya desthilatbûna zû bi pêş dikeve û derfeta heyî nayê bikaranîn. Dewleta Tirk dikeve tengasiyeke mezin û rewş cidî dibe. Ji bo ku tengasiya dewleta Tirk bê bihurandin û Tevgera Azadiya Kurdistanê bê tesfiyekirin Amerîka, NATO û hin hêzên Kurd di sala 1992'yan de ketin dewrê. Piraniya şer li Başûrê Kurdistanê meşiya. Heya sala 1997'an jî rewşa me ya taktîkî di van salan de dîsa li pêş bû. Bi awayek giştî taktîka me çawa bû? Di salên 1993–94 de şer bilind bû, '95-96'ê pêşveçûn nebû, xwe dubare kirin hebû. Mirov dikare bibêje, ev paşveçûn bû. Di sala '97'an de hemû amadekariyên salê pêk nehatin, lê cardin jî hevsengiyek hebû. Di '98'an de şer li Botan û Amedê zêde bû, pêşveçûn çênebû, lê asteke xwe parastinê bi pêş ket.

Eger mirov bi awayek giştî lê binêre; di têkoşîna me her dem du xet hene: Yek, xeta Serokatiyê ye, ku dixwaze gerîla bi pêş de here. Ya din jî, xeta serhildêriya klasîk a gundî û asî-aware ye. Di taktîkê de jî ev xet her dem xwe dide pêş. Çawa ku di sala 1988'an de em ji şerê mewziyan tam derneketin, di sala 1992'yan de jî heman tişt hat jiyîn, salên piştî wê jî wisa bû. Ango tim bandora şerê mewziyan, dûz şerkirin, di taktîkê de ne dewlemend, wekî şerê Kurd ê klasîk ji Siwêregê heta dawiya '98'an hebûna xwe berdewam kiriye. Têkoşîna me pir zêde di bin bandora vî şêwazî de maye. Bi esasî Serokatî ji bo ev terz bê guherandin zehf hewldan bi pêş xistin. Lê li kêleka wê, kesayetên ne durist û durûtiya heyî rê neda ku bi temamî zelaliyek çêbibe, ku serokatiya taktîkî bikaribe rol bileyîze. Helbet em van kêmaniyan nikarin bixin stûyê hinek kesên niha ne di nav me de ne û îxanet kirine. Berpirsyarê vê, em bi xwe ne. Kesên îxanet kirine jixwe îxanetkar in, lê yên xwedan sekna durist jî berpirsyarê vê encamê ne.

*Mirov dikare bibêje, li vir 3 xet eşkere bûne:*

**Xeta yekemîn;** xeta Serokatiyê ye ku, hewl da gerîlayê modern li Kurdistanê bi pêş keve. Bi rastî jî Serokatî her dem ev daye pêş û ji bo vê hewldan û têkoşîneke mezin raber kir.

**Xeta duyemîn;** xeta me ya terzê şerê Kurd ê klasîk e. Ev xeta klasîk a Kurd carina derketiye pêş, carina jî bi paş de çûye. Rewşa vê xetê hinekî bi kesayetiyê ve jî girêdayî ye. Yên vê xetê temsîl dikin bi esasî durist in, lê di kesayeta wan de wekî tê xwestin nûbûn û pêşveçûn çênabe. Ji bo vê, li gel wan dewlemendiya taktîkê bi pêş nakeve.

**Xeta sêyemîn;** mirov wekî xetekê şîrove bike yan neke mijara nîqaşê ye. Lê divê mirov hem li hemberî me, hem jî piştî tevgera me wekî xetekê bigire dest; ev jî xeta îxanetê ye. Di dîroka Kurdistanê de hemû rabûnên gelê Kurd bi îxaneta hinek Kurdên din ji piştê ve hatine xencerkirin û hatine xistin. Li dijî şoreşa me jî kesên wisa îxanetkar ên li kêleka dijmin cih girtine, hene. Lê bandora wana zêde nîn e. Ji ber ku me hesabê wan kiriye û em wisa derketine rê. Bi şêwazekî cuda, di nav me de yên ku bi durûtiyeke mezin em ji piştê ve xencer kirine, pir derketine. Jixwe ne ji têkoşîna Serokatiyê bûya, dibe ku vana rê nedana em nefesê bigirin. Rexmê terzê Serokatiyê yê mezin encam digire û zelaliyê bi pêş dixe, cardin van îxanetkaran zirarên mezin dan pêvajoya taktîka şer.

Bi rastî ez dikarim vê rihet bibêjim: Ne ku em sûcê xwe davêjin ser kesekî. Ez bi xwe tiştekî wisa exlaqî nabînim ku em kêmaniyan bikin stûyê wan kesên reviyane. Lê rastiyek heye ku mirov dikare bibêje, bi taybetî hinek ji wan kesan şerê me ji piştê ve xencer dikirin. Di vê der heqê de lêkolîn û şîroveyeke cuda pêwîst e. Ango kî rolek xirab leyîst, ev bi serê xwe mijarek e. Yê ku serdemên hemleyên mezin vala derxistin û wekî ji piştê ve xencer kirin, ne yek kes e. Ji bo nimûne be, mirov dikare behsa Şemdîn Sakik bike. Jixwe yê bi taybetî der barê şer ji piştê ve xencerkirinê de herî zêde rol leyîstî, ew e.

Wekî me berê anî ziman, di sala 1994'an de rexmê ku di dîwana Konferansa PKK'ê ya 3. de bû, çû di pratîkê de tam berevajiyê biryara Konferansê tevgeriya. Van nêzîkatiyên wî ji bo berxwedana sala '94'an wekî ji piştê ve xencerkirin bû. Ji ber ku wî yekser li eyaleta Dêrsimê, Serhedê û Erziromê dinêrî û wekî din jî bandora xwe hebû. Serokatî di sala 1995'an de xwest Şemdîn Sakik ji pratîkê bikişîne. Ji Dêrsimê hat Besta. Me bi qasî yek hefteyê bi hev re li ser sala '94'ê û şer nîqaş kir. Terzê wî, wekî xeteke tesfiyekirina şer bû. Ya rastî baweriya xwe bi şer nemabû, lê ev îtiraf nedikir û li xwe mikur nedihat. Ji min re got: "Ya rastî ez ji bo bi te re nîqaş bikim hatime." Lê ev gotina wî ne rast bû. Wî dixwest di hinek tiştan de min qaneh bike. Dûmahîkê me li hev nekir, min nêzîkatiya wî wekî tesfiyekariyê destnîşan kir û li hemberî wî helwesta pêwîst bi pêş xist.

Wê demê şehîd Piling bi wî re bû. Şehîd Piling, berê fermandarê Garzanê bû. Gava bi hev re ji Garzanê hatin, wekî şêwirmend û fermandarê ewlekariya Şemo bû. Jixwe beriya salên '90'î jî hev nas dikirin, wekî têkiliyeke wan a hevaltiyê hebû. Lê şehîd Piling bi min re cuda

axivî û got: “Vî kesî li her derê civîn çêkir, lê qet carekê jî behsa Serokatiyê nekir.” Niyeta vî kesî ne paqij bû, li hemberî Serokatiyê durist nebû. Gava Serokatî ew perwerde dikirin, wana jî xeta xwe birêxistin dikirin. Dijmin jî li ser kesên wisa hesab dikir ji bo Serokatiyê vala derbixe û bê encam bihêle.

Dijmin gelek hewldanên xwe hebûn ku bi destê kesên wisa xeta Serokatiyê berevajî bikin û şoreşê bi bin bixin. Dixwestin bi vî awayî bandorê li taktîkên şer bikin. Serokatî taktîka rast dida pêş, lê wana di pratîkê de vala derdixistin. Ji Serok re digotin, “baş e, ser serê me”, lê di pratîkê de jî vala derdixistin. Eşkere ev durûtiyeke mezin bû. Ji bo vê mirov dikare bibêje fermandarên sexte, durû û îxanetkar li pêşiya xeta Serokatiyê astengiyeke cidî bûn. Kesên durist ji ber rola xwe nedileyîstin, wekî xeta Serokatiyê bêxwedî dima. Vana jî wisa meydan ji xwe re vala didîtin û jehra hundirê xwe berdidan nav paqijiya tevgera me. Pratîka bihurî van heqîqetan piştrast dike. Jixwe Komploya Navnetewî li ser vê bingehê hat bipêşxistin. Fermandarên sexte û çavên xwe li îxanetê, li kêleka wan fermandariya rola xwe neleyîstî rêya Komployê vekirî hiştin. Komplo li ser vê bingehê hat bipêşxistin. Ango ne tenê yên rola xwe nedileyîstin hebûn, ên bi zanebûn xirabî dikirin jî hebûn.

Niha di femandariya me de astek heye. Bawer bikin, eger ji salên ‘90’î û şûn de di şer de wekî niha hevdû guhdarkirin, sadebûn û duristbûn hebûya, şoreşa me wê bi ser biketa. Niha kêmahî hene, lê di astekê de ekîp jî heye. Herî kêm em dizanin ku, yên bi zanebûn xirab dikin, tune ne. Li gorî berê, niha di tevgera me de zelaliyek heye. Cardin kêmanî hene, yên rola xwe naleyîzin û vala derdixin jî hene, lê vana hemû di astekê de ne. Ango vana mijara perwerde û bihurandina nêzîkbûnên kêm in. Ger di salên ‘90’î de bi vî awayî zelaliyek hebûya, wê rewşa me cuda bûya. Pêwîst e mirov vê bizanibe.

Li Kurdistanê rewşa şerê gerîla ya heta salên ‘98’an me îzah kir. Eger heqê şer tam bihata dayîn, xetên teng, rastgir û çors xwe nedana pêş û her tim xeta îxanetê ji piştê ve xencer nekira, fermandariyê rol bileyîsta û fermandariyê taktîkê şer rast bi pêş bixista, wê pêşî li texrîb û tesfiyekariyê bihata girtin. Eger rol bihata leyîstin, dibe ku pêşî li Komploya Navnetewî bihata girtin. Wekî tê xwestin rol nehat leyîstin, lê partî jî tesfiye nebû, pozîsyona xwe parast. Bi vî rengî Serok bû hedef û di şexsê Serokatiya me de bi giştî tevgera me bû hedef. Komploya Navnetewî li ser vê zemînê hat bipêşxistin.

## F) Komploya Navnetewî û Pêngava 1’ê Hezîranê

Wexta ku Komploya Navnetewî çêbû, rêveberiya tevgerê bi giştî ji bo Kongreya PKK’ê ya 6. li Xinêrê kom bibû. Wê demê biryara me ya şer hebû. Me got: “Em wisa dijwar şer bikin ku, dijmin mecbûr bimîne û biçe ber lingê Serokatiyê. Bila dijmin ji Serokatî re bibêje, aman ka vana bisekinîne! Heya niha me bi çi pîvanê şer dikir, ji niha û şûn ve divê em çar qatên wê şer bikin.”

Bi komployê re bi rastî di hevalan de pir zêde ruhekî fedaî bi pêş ket. Li saha Kongreyê û dewrûbera Kongreyê bi qasî 200–300 hevalan raporên çalakiya fedaî nivîsandin. Helbet wê demê rapor pir bûn, ez tenê hejmara raporên gihîştin Kongreyê dibêjim. Ruhekî fedaî bi pêş ket. Bi dirûşmeya “**HÛN NIKARIN ROJA ME TARÎ BIKIN!**” li zîndanan, li welat û derveyî welat pir kesan wekî çalakiya fedaî xwe şewitandin û gihîştin şehadetê. Di wê demê de tevî welatparêz û dostan, bi giştî 90 hevalan gihîştin şehadetê û pir heval jî birîndar bûn. Piştî vê, ruhê fedaî hîn xurtir bû. Gelek çalakiyên wê demê yên fedaî bi ser neketin. Di çalakiya Edenê de me dît ku hevalan bombe bi xwe de teqandin û ev yek encam nade me jî.

Wekî Biryargeha ARGK’ê me biryar da ku hevalên biçin çalakiyên fedaî, bi qasî mehekê perwerdeyê bibînin, dûvre biçin çalakiyê. Me hevalên rapor nivîsandin kom kirin û koma yekem 34 kes bûn. Hinek hevalên dikarîn perwerdeya sabotajê bidin, hatin û perwerde dan.

Berpirsyara wan jî hevala şehîd Gulan bû. Di encamê de ew dewre bi dawî bû û ji bo biçin me ew belav kirin. Li dû wan komek hevalên din hatin. Me paşê dît ev tiştekî mayînde ye, êdî me nav lê kir û ji bo wekî Hêzên Taybet bên birêxistinkirin biryar hat girtin. Bi vî awayî di 13'ê Adara 1999'an saziya Hêzên Taybet hat damezrandin.

Di Kongreya PKK'ê ya 6. de meclîsek hat hilbijartin. Piştî Kongreyê meclîs li hev civiya. Di wê civînê de biryar hat girtin ku, rêxistineke zextê bê avakirin ku bikaribe bi çalakiyên fedayî zextê li dijmin bike û bikaribe encam bigire. Li Filistînê rêxistinek bi navê Ebû Nîdal hebû, her wiha Ebû Cîhad hebû û pir çalakiyên fedaî lidar xistin. Li Îsraîlê balafir direvandin, diqulibandin û dişewitandin. Me jî pêwîstî dît ku, rêxistinek ji derveyî PKK'ê, bi xwe navê xwe hilbijêre û bêfikar çalakiyan bike, bê sazkirin. Ji bo ev rêxistina nû bikaribe zextê bi awayekî bêsînor bi kar bîne. Kesên vê rêxistinê bi rê ve bibin diviya wekî ji PKK'ê cuda bûne xwe raber bikiran. Ji bo ku çalakiyên wan li ser PKK'ê neyê hesibandin. Ango di îdeolojiyê de na, lê di rêxistinê de divê cuda bibe û ji bo azadkirina Rêber Apo şerekî dijwar bimeşîne. Di civîna Meclîsa Partiyê de ji bo vê rêxistinê min xwe pêşniyar kir. Ev pêşniyar di meclîsê de hat nîqaşkirin û ji ber nêrîna "dibe ku bi rastî jî bê fêmkirin rêxistin parçe bûye" pêşniyara min nehat qebûl kirin. Li gorî nîqaşan, ev rêxistina nû bê avakirin diviya bibêje, "Terzê PKK'ê nerm e. Serokatî hatiye girtin, em ê çalakiyên tund û bi zext bikin. Ez ji PKK'ê qut bûme û rêxistineke cuda me. Her wiha PKK'ê rexne dikim."

Min ji bo vê rêxistinbûna nû xwe pêşniyar kiribû, lê hevalan qebûl nekirin û gotin: "Ger tu bî wê civaka me fêm bike ku bi rastî jî PKK parçe bûye." Lewre qebûl nebû. Wê demê Nasir xwe bi israr pêşniyar kir û got, "Hevalê Cemal nabe, ez dibim." Di encamê de ew hat qebûlkirin.

Nasir, Fayîq û hinek hevalên din bûn rêveberiya vê rêxistina nû. Lîsteya hevalên ku raporên wan ên çalakiyên fedaî hebûn, me da wana û me got, "kesên hûn diecibînin ji nav hevalan hilbijêrin. Wekî ku hûn ji me cuda dibin şev derkevin û biçin. Herin li Xakûrkê ji xwe re kampekê ava bikin. Em li dûv we nakevin." Her me got biçin. Alîkarê Nasir, Fayiq hebû. Her sibê em radibûn, me didît ku neçûne. Me digot, "hûn çima neçûne?" Digot, "em neçûn." Di dawiyê de dor 100 kesan bi roj derketin û çûn. Fayîq jî bi wana re çû. Li nêzî biryargeha me bi cih bûn. Nasir jî tevî grûbekê çû Ermenîstanê ku li wî alî çalakiyan bi pêş bixin. Lê tiştek nekirin û vegeriyan. Ez jî ji bo karekî çûbûm Ûrmiyê û me li wir hev dît. Ez pê re axivîm, min dît ku ne ji dil e, nabe û nikare vî karî bike. Ji bo wê min bi xwe re bir Qendîlê, li wir vesaziya wî ji bo Garê çêbû. Bi wî awayî ew sazî wekî hatî plankirin bi pêş neket. Piştre bi rengekî din, wekî îstixbaratê hat birêxistinkirin. Di vê mijarê de me encam negirt. Biryara me ev bû ku em şerek cidî bikin. Jixwe dema me ferq kir ev sazî nikare çi karî bike, me biryara birêxistinkirina Hêzên Taybet da.

Nasir dûvre got: "Komplo li min kirine û ez xistime vê saziyê. Eger ez çalakî bikim, dibe ku ez werim hemberî Serokatiyê." Lê heqîqet ew bû ku wî bi xwe li pêş hemû hevalan israr kir. Li holê wekî ku ew dibêje tiştek tune bû. Dixu ye ku esas ne jidil bû û xwe pêşniyar kiribû. Di wî de jî şikestin çêbibû. Mixabin însanên me wisa ne. Bi dev dibêjin, lê dilê xwe de cuda ne. Rexmê ji bo wî karî amade nebû jî, xwe pêşniyar kiriye. Heqîqet ev e.

Me biryar girt ku em şerekî cidî bi rê bixin, em biryargehê ji Xinêrê derbasî Behdînanê bikin. Jixwe şer dihat meşandin, lê ne li gorî dilê me bû. Ango di '99'an de me dixwest em şer mezin bikin.

Di Hezîrana 1999'an de Serokatî derxistin dadgehê. Dûvre Serokatî ev şaş dît û di 29–30'ê Nîsanê de parêzerekî xwe rêkir gel me. Parêzer peyama Serokatiyê wisa gihand me: "Di vê demê de ger em şer bikin, wê me bipelixînin, li ser me komplo heye. Ji ber girtina min moralê quwet ketiye. Em şer bisekinîn wê baş be." Me tam bi vê yekê bawer nekir. Di belavoka 1'ê Gulanê de me biryara sekinandina çalakiyên fedaî da, lê ji ber biryara îdamê ji bo Serokatiyê dabûn, me jî dixwest em şer bidomînin. Biryara me ev bû ku, em şer bilind

bikin, lê Serokatî ev şaş dît. Ango di wê demê de Serokatî nedixwest bi şer, dixwest bi awayekî din bersivê bi pêş bixe. Her çendî destpêkê me zehmetî kişandibe, me tam wekî tê xwestin wate nediyayê jî, me nêzîkbûna ku Serokatî daxwaz kirî esas girt. Têkiliya me bi Serokatiyê re çêbû, lê hin fikarên me hebûn û dîsa me got, "Serokatî çawa dibêje, wê wisa be." Wê çaxê ez li Behdînanê bûm. Hevalê Abbas bi min re axivî û got, "Em ê civînê çêbikin. Hûn çi dibêjin?" Min got, "Serokatî çawa difikire, em wisa tevbigerin." Hemû hevalan jî wisa digot.

Di destpêka meha Tîrmehê de li Qendîlê civînek pêk hat û li ser esasê pêşniyara Serokatî ya bi temamî şer bê rawestandin û bidawîkirin, nîqaş çêbû. Di encamê de wekî Serokatî anî ziman, biryar hat girtin. Piştî ku biryar ji Serokatî re çû, Serokatiyê di 2'ê Tebaxê de daxuniya sekinandina şer da. Ango şerê me yê 15 salan ku ji 15'ê Tebaxa 1984'ê dest pê kirî, di sala 1999'an de bi dawî bû.

Ya rastî şer rol leyîst. Şer, pirsgirêka Kurd da naskirin. Şer pêvajoya înkarkirin, tunekirin û bişaftina li ser Kurdan bi dawî kir, çareserî û azadî xist rojevê. Ango gerîlayên Kurdistanê her çiqas kêmaniyên xwe hebin jî, rola xwe leyîstin. Pêşî li tunebûna gelê Kurd girtin. Ruhê netewî li her çar beşên Kurdistanê bi pêş ket. Li Rojhilatê Kurdistanê piştî girtina Serokatiyê serhildanek mezin bi pêş ket. Ango ruhekî netewî ava bû. Kurdistan çar beş e, gelek zarava û olên cuda hene, pir reng hene, di encama xebata di xeta Serokatiyê de hatî meşandin de ruhekî netewî bi pêş ket. Mijara herî girîng ev bû. Êdî dor hatibû rizgariyê. Serokatî jî hewl da dewlet fêm bike ku Kurd êdî dixwaze pirsgirêkê bi riyên demokratîk û aştiyê çareser bike. Di vê çarçoveyê de Serokatî gelek deklerasyon weşandin, gelek name nivîsandin.

Di wê demê de Kongreya PKK'ê ya 7. hat lidarxistin. Bername û rêzikname li gorî perspektîfa nû hat qebûlkirin. Lê di hêz de bêmoralî û nezelalî hebû. Li gorî piştre di platforman de (nîqaşa Kanîcengê ya sala 2004'ê) grûba tesfiyekar îtiraf kirî, ji wê demê şûn de şikestina wan kûr dibe û dûvre bi awayekî dizî dest bi xebata grûba xwe dikin.

Li Ewropa tevlîhevî û tesfiye bi pêş ket, tirsa me ji vê hebû. Ji ber ku Ewropa ji bo me her dem girîng bû. Hevalan wê demê biryar dan ez biçim Ewropa. Her çiqas ne bi dilê min be jî, lê biryar bû û di demek wisa de min red bikira, nedibû. Di çûyînê de pirsgirêka rê hebû û xeterî jî hebû, cardin ez çûm Ewropa. Li wir di rêxistinê de tevlîhevî hebû. Me dest bi kar kir û me hinek zelalî çêkir. Piştre me li wir Kongreya Ewropa ya Yekemîn li dar xist. Wê çaxê min hevalê Erdal xwest, ew jî hat. Min erk dewrî wî kir. Ez bi giştî 6 mehan li wir mam û tavilê vegeriyam welat. Çima? Agahî hat ku Dr. Silêman û Zekiyê Biçûk reviyane. Hat fêm kirin ku tevlîhevî heye. Ji bo wê jî min xwest ez zû vegerim.

Di warê leşkerî de em çi bikin, ne diyar e. Wexta ez hatim welat, biryargeha leşkerî nebû. Erê heye, lê tu tiştekî xwe yê leşkerî nemaye. Biryargeha leşkerî li Xinêrê ye, li ser xebatên sporê disekine, pêşbirkan lidar dixe û elaqeya xwe bi leşkeriyê re nemaye. Min ji hêzên leşkerî yên Qendîlê pirsyar kir ku, spor dikin an jî perwerdeyê dibînin? Gotin, "na". Wê çaxê Serhed berpirsê Qendîlê bû. Min ji wî pir pirsî ku heval spor dikin an jî perwerdeya leşkerî dibînin? Got, "na." Me got, "çima heval perwerdeya leşkerî nabînin?" Got, "kes naxwaze." Di nava çend mehan de heval çawa ewqas guherîne, ez şaş mam. Ez baş dizanim ku hevalên me her tim ji perwerdeya leşkerî pir hez dikin. Kesî nedixwest tevlî perwerdeya siyasî bibe, lê ji perwerdeya leşkerî pir hez dikirin. Ev çawa bû?

Wê çaxê hevalê Karasû li wir bû, min ji ewlakariya wî pirsî ku kîjan tabûr nêz e? Gotin, "tabûra hevalê Sebrî nêz e." Jixwe em li Qendîlê bûn. Du-sê heval bi min re hatin, em çûn tabûra hevalê Sebrî. Wê demê nedigotin tabûr jî, digotin "kamp". Ango saziyên leşkerî rakiribûn. Em çûn kampa hevalê Sebrî Başkale û hevala Nûcan û nêzî 250 hevalan li wir bûn. Min pirs kir, "kî naxwaze perwerdeya leşkerî bibîne?" Kesî dest ranekir û ya rast jî ev bû. Ne ku heval naxwazin perwerdeya leşkerî bibînin, rêveberiya jor naxwaze perwerdeya leşkerî bê dayîn. Ji bo vê perwerdeya leşkerî hatibû sekinandin. Dixwestin me ji leşkertiyê dûr bixin.

Kamp e, hinek perwerdeya siyasî dibînin, dûvre li ser hevdû diaxivin. Em hinek din geriyan, me ji hevalan re civîn çêkir ku “em PKK ne û dijminê me heye. Divê em xwe di leşkertiyê de xurt bikin. Divê tedbîrên me hebin û perwerde hebe.” Wê demê çend heval rabûn axivîn - niha hinek ji wan şehîd ketine- û gotin ku, “wisa nîn e. Hûn dixwazin qiyametê rakin, kes êrîşî me nake, her tişt di cihê xwe de ye.”

Di encamê de me Civîna Meclîsa PKK’ê bi beşdariya 45 kesan çêkir. Ango ew bû wekî civîna temamkirina Kongreya PKK’ê ya 7’an. Wê çaxê kesî behsa leşkeriyê nedikir. Min ji hevalê Sebrî pirs kir ku, hûn çima perwerdeya leşkerî nabînin? Hevalê Sebrî got: “Ji me re dibêjin hûn li ser şer rant dikin. Ji bo ku navê me dernekeve, em newêrin behsa leşkertiyê bikin.” Di wê civînê de me hin biryar girtin û hin vesazî jî çêbûn. Hin hêz ji cihê xwe hatin kişandin, perwerde hat dayîn û hin tedbîr hatin girtin. Me tabûra hevalê şehîd Kerîm şand pişt cephe, ango derbasî Kanîcengê bû. Tabûra hevalê Dijwar Erkendî jî çû Asosê. Me ew der baş nas nedikirin jî. Tenê çend heval çûne keşif kirine, dûvre hatine û yekîne bi xwe re birine. Heta wê çaxê me wan deran negirtibû. Cara yekemîn wê çaxê heval çûn wir. Gava şerê Qendîlê dest pê kir, van tabûran pir zêde rola xwe çêbû. Vî şerî dîsa nîşan da ku hebûna me bi hêzên leşkerî dibe. Ev şer hinek bû alîkar ku em xwe komî ser hev bikin. Heval ji nav xeyalan derketin û komî ser hev bûn. Her kesî ev fêm kir. Beriya wê 155 heval ji bo edebiyatê hatibûn veqetandin. Li ser rêya Şehîd Ayhan 50 heval hebûn, me ji wana pirs kir ku, hûn çi karî dikin? Gotin, “em karê tiyatroyê dikin.” Ango li her deverê saziyek ava kirine. Vana jî girîng in, lê gerîla esas e. Di encamê de şerê sala 2000’î di vê mijarê de sererastkirin çêkir.

Di meha Hezîrana 2001’an de Konferansa HPG’ê ya I. hat lidarxistin. Ji ber ku Kongreya PKK’ê ya 7. navê ARGK’ê guhertibû û kiribû HPG. Lewre Konferansa HPG’ê ya I. çêbû. Di wê Konferansê de biryara HPG xwe ji nû ve ava bike, hat girtin. Wê demê hat gotin ku, a niha şer nîn e, lê bi vî şêwazî jî şerê parastinê nabe. Berê dema yek tevlî bibûya bi giştî 15 rojan perwerde didît. Çima 15 roj? Berê me Vîetnam zêde dişopand. Li Vîetnamê her şervanê ku nû tevlî dibû 5 rojan perwerde didît. Perwerdeya Vîetnamê 5 roj bûn, ew jî li ser çek û welatparêziyê bû. Me jî got, ger perwerdeya Vîetnamê 5 roj in, bila yê me 3 qatê wê be. Bila perwerdeya şervanên me 15 roj bin. Me bi vê biryarê wekî gotinek kevin heye ku dibêje, “me mala xwe şewitand.” Hêzên me yên nû tevlî dibûn 15 roj perwerde dibînin û dikevin nava şer. Bi vî revgî di nava gerîla de, di hundirê pratîkê de tecrûbe qezenc dikirin û dibûn pratîsyen, lê bingeha zanebûna leşkerî zêde tune bû.

Akademiya leşkerî ya Mahsûm Korkmaz heya sala 1992’an perwerdeya leşkerî dida û vê bingehek ji bo hêzên me çêkiribû. Wekî din perwerdeyên me yên leşkerî nebûn. Lewma li çiyê zanebûna leşkerî kûr nebû, di pratîkê de tecrûbe çêbû, lê kûrahî çênebû. Şer zanistek e, dema tu di vê zanistê de kûr nebî, tu nikarî di esasên şer de jî kûr bibî. Lewre em di warê leşkerî de pir kûr nebûn, şer wekî zanistê nedihat bidestgirtin. Teoriya me ya şer bi qismî hebû, lê li ser teknîkê zanebûna hêzên me çênedibû. Mesela çekên wekî qlêş, BKC û B-7 dihatin bikaranîn, lê li ser giştî çekan perwerdeyên kûr nedihatin dayîn.

Perwerdeya heyî jî tenê ji bo bikaranînê bû û serveyî (yüzeysel) bû. Nimûne, perwerdeya li ser çeka B-7 têrê nedikir ku heval bi dûrbînê û bi esasî bavêjin. Heval tenê di pratîkê de fêr dibûn. Hevalekî me yê çeka B-7 bi îsabet diavêt hebû. Min pirs kir ku çawa B-7’ê davêje; got, “weleh ez wisa lê dixim. Hesinê cihê dûrbînê, roket û hedefê dikim yek û davêjim.” Ango li gorî xwe nîşanek din îcat kiriye. Her kesî li gorî xwe nîşan digirt, li gorî zanista çekê bikaranîn nebû. Ya din jî, hevalan bi salan kîjan roket antî-tang e, kîjan roket antî-personel e tevlîhev dikirin. Hevalan roketên antî-personel an jî antî-wesayît davêtin tangê û helbet tu bandor li tangê nedikir. Piştre belav dibû ku “guleya B-7 li van tangan naçe.” Halbûkî roketa B-7’ê ya antî-tang di 30 cm’yan de pola (çelik) kûn dike. Li gor vê dikare hedefê texrîb bike yan jî tune bike. Lê hevalan nizanîbûn, roket tevlîhev kiribûn, lewre hevalan bi hinceta bandor nake roket li hemberî tangan bi kar nedianîn.

Osman Pamukoglu di salên 1994–95'an de fermandarê tûgaya Colemêrgê bû, niha jî li Tirkiyê partî ava kiriye. Di şer de hinek çavreşiya xwe hebû. Bi esasî yekî nîv-dîn bû. Feqet aqilê xwe li ser şer diêşand û gelekî bi me re mijûl dibû. Wî ji bo perwerdeya leşkerên xwe nivîsandineke ji 10 rûpelan pêk dihat, nivîsandibû. Hevalan di êrîşekê de bi dest xistin û min xwend. Di wê nivîsê de dibêje: "PKK'yî di BKC'yê de pir xurt in, lê di bikaranîna qlêşê de karavana ne. Di mesafeya 300 metreyan de ez bi rihetî dikarim di ber wana re debas bibim. Ji ber ku avêtina wan a qlêşê karavana ye." Ango nikarin lê bidin.

Mijara nîşan girtinê û lêdanê her tim ji bo me cihê pirsê bû. Quwetê me di pratîkên berê de, bi taybetî di salên 1990'î de şer bi giranî bi bombeyên destan kirine. Bi rastî jî hêzên me ji dûr ve nedikarîn li hedefê bidana. Ango hêza lêdanê kêm bû, hevalan jî bi bombeyan êrîş dikirin. Heya niha me çiqas dijmin kuştibe ji sedî 80'yê xwe bi bombeyên destan hatine kuştin. Bi îhtimaleke mezin wisa ye. Qabiliyeta lêdanê di nav hêza me de pir kêm bû. Di şerê Qendîlê yê di sala 2000'î de bi rastî me nedixwest pir kes bimire, lê di wir de jî me dît ku, hêzên me nikarin ji dûr ve li hedefê bidin. Dijmin êrîşî ser hêzên me dike, hêzên me bi saetan li ber xwe didin û cihê xwe bernadin. Lê dema dijmin 400-500 metreyan di bin wana re derbas dibe, bi sedan guleyan berdidin, lê nikarin lê bidin. Dema min ev dît, min xwe bi xwe re li ser ruhê şehîdan soz da ku, divê leşkerên Apocî ji vê rewşê derkevin. Ango hevalên me pir bi cesaret in û bi fedaîtî şer dikin, hedefê bernadin, lê di bikaranîna teknîkê de ne hakim bûn. Ji bo vê yekê, ji sala 2000'î û şûn de hinek firsend jî çêbû, me hêzên xwe li ser vê mijarê pir kûr kirin û perwerde kirin. Bi rastî me jî dixwest em hêzên xwe ji nû ve ava bikin.

Di sala 2001'an de di Konferansa HPG'ê ya I. de me biryara ji nû ve avakirinê da. Lewma perwerde hat destpêkirin ku heval nîşan bigirin û li hedefê bidin. Ev proje bi qasî du salan berdewam kir û mesrefek zêde ji bo perwerdeyê hat kirin. Gava şer sekinî, me hinek derfet bi dest xist û me jî ji bo perwerdeyê mesref kir. Lê carekê me dît, di perwerdeyê de jî heval pir zêde cebilxane xerc dikin û me sînor danî. Welhasil projeya ji nû ve avakirinê ya HPG'ê du salan ajot. Ango sala 2001, 2002 û bi qismî 2003'an jî pêvajoya ji nû ve avakirinê bû. Hêzên Taybet hatin zêdekirin, hin pêşketin çêbûn. Hêzên Taybet ku destpêkê di hêla teknîk û perwerdeya branşan de li pêş bûn, bi rêya wana me ev sîstema perwerdeyê hîn kûr kir. Di hêzên me de hem heta astekê teknîk bi kar anîn û di nîşanê de pêşketin çêbûn, hem jî çarçoveya taktîkê jî hat zelalkirin. Bi sabotajê ji dûr ve derbe li hedefê dayîn çêbû. Şêwazê hevalê Erdal ket dewrê. Hevalê Erdal, li Gabarê pir çalakî bi pêş xistin, 27 çekên G-3 ji ser dijmin rakirin û qet windahî nedan. Di sala 1997'an de şehîd Erdal ji dûr ve bi rêya kabloyê teqîn çêdikir, heval diçûn ser dijmin û çek radikirin. Ev yek bi rêya aqil bi pêş dixist. Wê demê me ev rêbaz baş bi kar nedianî. Bi piranî hedefên wisa asê hebûn, me êrîşî ser wan dikir, di wana de jî windahî zêde çêdibûn. Jixwe Serokatî rexne dikir û behsa terzê ku ji dûr ve derbeyê li hedefê bixe û bêyî windahî encam bigire, dikir. Ev şêwazek baş e. Di wê demê de heta astekê lêhûrbûnek çêbû.

Di dema paşvekişîna sala 1999'an de diviyabû li her eyaletekê dor 100-200 kesan bimana. Wisa hatibû plankirin. Lê piştî ez çûm derveyî welat, ên wekî fermandarî hatibûn ser biryargehê, bi hewayeke panîkê tevdigerin û vê planê pêk naynin. Li her eyaletekê kêmek heval mabûn, jixwe hinek jî belav bibûn, pirsgirêk hatibûn jiyîn. Lewre me di sala 2001'an de hêzên li hundir mayîn hemû kişandin. Me li şûna wana, hevalên nû yên perwerde dîtîn şandin û me gav bi gav bi şêwazekî pir veşartî hêzên xwe di eyaletên Bakur de bi cih kirin. Me gerîla di çiyê de bi cih dikir, Hêzên Taybet jî li bajaran wekî yekîneyên biçûk bi cih dikir. Wekî HPG armanca me, xwe ji bo şer amadekirin bû. Lê belê di rêveberiya me ya siyasî de tevlîhevî hebû. Bi taybetî ew grûba tesfiyekar tu niyeta wan a şer tune bû. Ji bo vê, dema me hêz dişand Bakur, me hemû agahî nedidan wana, ji bo ku hinek pê nehesin. Bi taybetî di bihara 2003'yan de me hemleyeke berfireh ji bo Bakur bi pêş xist û hêzên xwe di Bakur de hîn zêde xurt kir.

Di wê pêvajoyê de her çendî me mehê carekê civîna rêveberiya KADEK'ê lidar dixist jî, her ku civîn bi dawî dibû, te didît 9-10 kes jî di bin navê sohbetê de cuda diciviyan û di nav

xwe de diaxivîn. Ya rastî wekî civîn di hundirê civînê de çêdikirin. Em li hemberî tiştên wisa pir saf bûn. Dûvre, di sala 2002'yan de hevalê Fuat di civînekê de ev anî rojevê û got, "hinek heval hene ku pir nêzî hev in, wekî grûp tevdigerin." Navê Botan, Ekrem, Merwan, hevalê Riza û hinek kesên din da. Lê ji van kesên navê wan hatî dayîn ên amade, ev înkar kirin û gotin, "em hev nas dikin, tu ferqa me û hevalên din tune ye." Dûvre ew di nav xwe de diaxivin û dibêjin ku "vana bi me hesiyan, wê werin ser me. Yan divê em vî karî berdin, an jî divê em bi awayek cidî karê grûbê bimeşînin." Biryar didin ku karê grûbê bi awayek cidî bimeşînin. Ji sala 2002'yan şûn de pir xirab tevgeriyan, di nav me de tiştên herî cidî sist dikirin û digotin, "Hêzên Taybet vala vala xwe diwestînin." Ji bo me digotin, "Vana xwe dixapînin. Êdî dewra leşkerî hatiye girtin." Henekên xwe dikirin. Di aliyê jiyanê de û di hemû aliyan de tiştên PKK'ê yên cidî dikirin mijara henekan û wisa sist dikirin. Ango bêcidiyetî ferz dikirin. Bi vî awayî jiyana partîbûnê vala derdixistin û ev karê wan heta demekê veşartî berdewam kir.

Di Newroza 2003'yan de Amerîka ket Iraqê. Vn kesan ji vê yekê jî cesaret girtin û gotin, "êdî tiştek wekî berê nabe" û hîn zêde xwe dan axaftin. Wê demê em hevalên li derveyî wan diman û hevalên niha rêveberiya tevgera me, bi giştî me qet rola xwe neleyîst. Ya rastî, wana ji vê jî cesaret girtin. A din jî, vesazî li gorî xwe çêdikirin. Ez li HPG'ê bûm, qet bi me re mijûl nedibûn, lê qada siyasî li gorî xwe birêxistin dikirin.

Rojava, Başûr, Rojhilat, Bakur û Ewropa, rêveberiya van hemû parçeyan di destê wana de bû. Ferhat çi bixwesta, dikarîbû bikira. Ji nav rêveberiya me kesek li dijî wan nedisekinî. Esas qada siyasî ji wana re hatibû berdan. Ev tê vê wateyê ku, em jî ne cidî bûn. Me di wan kêliyên dîrokî de li hemberî Serokatiyê berpirsyariyên xwe bi cih neanîn. Li ber çavê her kesî texrîbat çêkirin. Heval li Dola Kokê bûn. Li Dola Kokê ferdek nema. Piştî zemîn ava kirin û şûn de di Tîrmeha 2003'yan de civînek hat lidarxistin û di wê civînê de xwe eşkere kirin. Nêrînên xwe eşkere wekî "legalbûn"ê anîn ziman. Serokatî wê demê parêznameya Atînayê rêkiribû. Wana jî hinek nêrînên di wir de hatibûn destnîşankirin, wekî ku rêveberiya kevin divê xwe ji erkê bi paş ve bikişîne û bi navê Komîteya Zanist û Ronakbîrî rol bileyîze, divê hemû tişt nû bibin û sivîl têkevin nav rêxistinê û hwd. kirin bingeha derketinê. Xwe bi wê re veşartin. Wekî ku perspektîfên Serokatiyê pêk tînin digotin, "Divê KADEK xwe fes bike û Kongra Gel bê avakirin û divê sivîl bibin." Ferhat wê demê got: "Ez ji niha ve îstîfa dikim. Ez êdî ne endamê Konseyê me." Piştre jî nexwestin jê derkevin. Serokatî wê demê helwesta dewleta Tirkiyê ya nedihat çareseriyê protesto kir û got: *"Ez êdî dernakevim hevdîtina parêzer û malbatê."* Wê grûbê jî ev ji bo xwe wekî fersend dît û hîn bi rihetî tevgeriyan.

Di wê civîna meha Tîrmehê ya 2003'yan de me behsa pêngava duyemîn a 15'ê Tebaxê kir, lê hewayê grûbê cuda bû. Digotin, "ji bo moralê tiştên wisa baş in, lê heqîqet cuda ye." Di wê demê de partî bêxwedî ma û komîteya zanîst û ronakbîrî bû hincet ku pêşî li wan hat vekirin. Ango me bi xwe, xwe bê erk kir. Em wekî HPG di wê hewayê de nebûn, lê me rola xwe jî neleyîst. Me digot, "em xwe ji bo şer amade dikin, jixwe hemû tişt ev e. Kî çi dibêje bila bibêje!" Me pêvajo wisa cidî negirt. Me ji bo vê biryar girt ku em xwe ji şer re amade bikin. Gava em ji civîna Tîrmeha 2003'an hatin, me hevalê Xebat tevî 120 hevalan rêkir Botanê. Hêzên eyaletên Bakur hatin temamkirin, me hêzên perwerde dîtibûn, rêkirin. Di sala 2003'yan de me bi giştî 500 heval rêkirin Bakur. Me biryar girt em biryargehê cardin bibin Behdînanê û xwe tam ji şer re amade bikin.

Di dawiyê de hat plankirin ku li Qedîlê salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê bi şahiyeke mezin, bi pêşbirk û bernameyên sportîf bê pîrozkirin û hejmarek mezin beşdarvan jî tevlî bibin. Bi vî awayî salvegera 15'ê Tebaxê bi moraleke mezin bê pêşwazîkirin û peyama pêwîst ji dijmin û van kesên ku bi xetê dileyîzin re bê dayîn. Bi vê yekê re hem peyam bê dayîn, hem jî destpêka qonaxa nû bê birêxistinkirin. Jixwe me digot, êdî ji vir û wê de em nikarin civînên wisa mezin çêbikin. Hevalê Erdal erka birêxistinkirina merasîm û şahiyê girt ser xwe û ew bi xwe jî alîkarê Fermandariya Giştî ya HPG'ê bû. Li gorî agahiyên niha ku mirov vê wekî bûyereke qezayê bihesibîne; hevalê Erdal di dema meşandina vê cejnê de şehîd ket. Ev yek

ji bo me pir giran hat. Birayekî wî tim bi israr digot, “van kesên tesfiyekar hevalê Erdal şehîd kirin.” Lê me tiştek wisa tespît nekir.

Li ser şehadeta şoreşgerekî wekî hevalê Erdal mirov pir polemîkê çêbike jî ne rast e. Di lêpirsînê de tu tespît derneket, lê vê şehadetê tesfiyekar kêfxweş kirin. Hevalê Erdal hevalekî li hemberî wana xwedî helwest bû. Ji ber ku wana dixwestin biçin Ewropa û Mûsilê, lê hevalê Erdal bi israr ji Ewropa hat û dixwest di HPG’ê de bimîne û biçe Gabarê. Di civîna Tîrmehê de bi helwesta raber kirî hevalekî xwedî prensîb û biryar bû. Helwest li hemberî tesfiyekeran nîşan da û ew rexne kirin. Hevalê Erdal fermandarekî ku hêviyên mezin dida bû. Şehadeta wî ji bo HPG’ê bû derbeyek mezin. HPG’ê di Konferansa xwe ya Duyemîn de tabûta hevalê Erdal danî ser maseya dîwanê, her kesî li ser tabûtê sond xwar, dûvre me tabûta wî rêkir welat û Konferansa HPG’ê ya 2. dest pê kir. Diviya bû em li ser şopa Erdalan û di xeta Serokatiyê de pêngava leşkerî bi rê bixin û ew koma tesfiyekar hîn jî li hêviyê bûn ku tu biryar di Konferansê de dernekeve.

Em hîn di Konferansê de bûn Ekrem qaxizek da min û got, “ji biryargehê hatiye.” Min dît ku li ser reforma sosyal e. Ew qaxiz ji her deverekê re rêkiribûn û ji me re jî rêkirin ku em li ser nîqaş bikin, nêrînên xwe ji komîsyonê re bişînin. Min jê re got, “kom bike, ne hewce ye kes vê bixwîne!” Dixwestin em wê belgeya wana di Konferansê de bixwînin, li ser nîqaş bikin û dûvre bişînin tabûran. Me got, “nabe.” Me ne li wir xwend, ne jî şand tabûran. Hêvî dikirin ku Konferans hinek biryarên li gorî wan bigire, ji bo vê du kes wekî nûner şandibûn û ew jî beşdarî Konferansê bûn. Dûvre vedigerin, ji wan pirsiyar dikin ku, “encam çi bû?” Bi yek peyvê dibêjin, “vala bû.” Ango biryara reforma sosyalbûnê nehatiye girtin. Bi yek peyvê Konferansê rave dike. Halbûkî Konferansê biryara şer û hemleyê girtiye, dema hemleyê jî divê rêxistina giştî diyar bike. Di wan şertan de HPG biryara hemleyê bi pêş xist, lê HPG’ê xwe tam nekir îrade. Ev biryara xwe wekî tê xwestin ferz nekir. Diviyabû ev nêzîkbûn ji hemû rêxistinê re bikira mal, lê HPG tenê di hundirê xwe de ma.

Mesela, me nexwest em herin Kongra Gel a Yekemîn. Ev jî eşkere dike ku, di wê demê de em çiqas teng difikirin. Em di wê demê de pir aktîf nebûn û em ne şiyar bûn. Heta min û hevalê Karasû nîqaş kir ku em herin an jî nerin Kongreyê. Min ji hevalê Karasû re got, “ger hûn neçin Kongreyê, em jî wekî HPG’ê naçin.” Lê belê diviyabû me bigota, em bi xurtî herin, em partiyê û Kongra Gel ji van xayînan re bernedin. Lê helwesta me ne wisa bû, em bi dudilî çûn Kongreyê. Em di wê dema dîrokî de li berpirsyariyên xwe xwedî derneketin. Vê nêzîkbûna me rê vekir ku, tesfiyekar hîn zêdetir xwe li ser Kongreyê ferz bikin û li gorî xwe biryar girtin. Di vê yekê de berpirsyariya me hemûyan heye; bi taybetî jî hevalên di nav wan de û li Dola Kokê diman, bi rastî zêde li erk û berpirsyariya xwe xwedî derneketibûn. Heta dema Kongre hat lidarxistin, axaftina vekirinê hevalê Cuma kir û vê bandora xwe li ser gelek delegeyan çêkir. Di destpêka Kongreyê de di navbera me û wê grûba tesfiyekar de hinek nîqaş çêbûn. Hevalê Cuma di aliyê wan de nêrîn da û di dengdayînê de nêrîna wan bi ser ket. Ango şaşiyên wisa jî çêbûn. Wana jî ji van tiştan sûd girtin û xeta xwe ya tesfiyekar kirin malê Kongreyê.

Encex roja dawî ya Kongreyê dema vê grûba tesfiyekar xwe bi paş de nedan û xwestin di rêveberiyê de cih bigirin, fêm bû ku ew dixwazin tevgerê bixin destê xwe, wê çaxê hevalan helwestên dijber nîşan dan. Bi vî awayî em hevalên li dijî kiryarên vê grûbê, bi hev re bûn yek. Ev jî kêmaniya me eşkere destnîşan dike. Partî bêxwedî hat hiştin û van tesfiyekaran jî wisa zemînê xwe bidin axaftin dîtin.

Piştî Kongreyê em hatin Zapê, meclîsa HPG’ê kom bû û ev biryar girt: “Divê em li ser bingehê xeta parastina rewa şer destpê bikin. Kongra Gel qebûl bike neke, ger Serokatî erê bike, em ê wekî HPG vê di 1’ê Hezîranê de vê wekî pêngav bi pêş ve bibin.” Ev biryar hîn zivistanê, di meha Sibatê de hat girtin: “HPG’ê ji nû ve avakirin û xwe ji şer re amadekirin jiyan kiriye û ji bo pêngavê amade ye. Lê belê di giştî rêxistinê de, li ser bingeha xeta Serokatiyê rastiya diparêze, ferz nekiriye û kêm maye.” Biryareke din a me di meha mijdarê

de girtibû û veşartî hebû ku, em di bajaran de ne bi navê HPG'ê, bi navê Fedaiyên Kurdistanê hemleya çalakiyên bajaran bi pêş bixin. Ev biryara veşartî beriya Kongreya Gel hatibû girtin. Wê çaxê hinek derfet hebûn û di bajaran de zêde girtin jî çênedibûn. Li her bajarekî yekîneyek an jî du yekîneyên Hêzên Taybet hatibûn bicihkirin. Gava Kongra Gel jî çêbû, me nikarîbû vê biryarê ji kesî re bigota. Jixwe me bigota, hemû wê deşîfre bikirana. Ev tiştên wisa me tenê ji hevalê Cuma re digotin. Lê hevalê Cuma jî di Kongreyê de xwe wekî namzet diyar nekiribû. Piştî Kongreyê me ji hevalê Cuma re got, "em dikin di vê pêvajoyê de dest bi hemleyê bikin. Em çi bikin?" Wî jî got, "em ji hevalê Zubeyîr re bibêjin." Ji ber ku Kongreyê hevalê Zubeyîr wekî serokê Kongreyê hilbijartibû. Muxatabê fermî hevalê Zubeyîr bû. Hevalê Zubeyîr got: "Em rica dikin hûn tiştekî wisa nekin. Jixwe em dixwazin ji Serokatiyê şansekê teleb bikin, ji ber ku me Kongre nû ava kiriye û em dixwazin parêzeran bişînin cem Serokatiyê, ji bo ku Serokatî vê grêva ku hevdîtinê nake, berde. Em dixwazin vê pêşniyar bikin." Eşkere ye ku, di wan şertan de me hemle bi pêş bixista, wê vana bigotana, "ev dixwazin Serokatiyê bikin hedef." Ji ber ku dema hinek tiştên wisa bihîstibûn, dest bi propagandayên wisa kirin.

Piştî em bi hevalê Zubeyîr re axivîn, em hatin biryargehê, me talîmat da û amadekariya pêngavê sekinand. Jixwe wê çaxê me sîstemeke têkiliyê di navbera xwe de ava kiribû. Bi rêya wê sîstemê em gihîştin hemû yekîneyan. Hevalan xwe amade kiribûn. Gava me talîmat da, 10 roj ji hemleyê re mabûn. Me hemû heval xeberdar kirin û me hemle sekinand. Wekî me li jor anî ziman, piştî wê meclîsa HPG'ê cardin biryar girt ku di 1'ê Hezîrana 2004'ê de biryarê bi pêş bixe.

Di 17'ê Adarê de talîmata Serokatiyê ya mudaxeleyê gihîşt destê me. Wê çaxê em ji Behdînan çûn Qendîlê. Me pêvajoya ji nû ve avakirina PKK'ê û çareserkirina pirsgirêkên navxweyî dest pê kir. Serokatî, ji bo avakirina Komîteya Jinûve Avakirina PKK'ê navê min û wekî berpirsyara tevgera jin navê hevala Pelşîn dabû. Lê hevala Pelşîn di lêpirsînê de bû. Ji bo vê min tenê dest bi kar kir û di demeke kurt de me navê endamên Komîteya Jinûve Avakirina PKK'ê tespît kir û pêşkêşî Serokatiyê kir. Heman Komîteyê erka çareserkirina pirsgirêka navxweyî jî hilda ser xwe. Di vê çarçoveyê de banga Serokatiyê hebû. Grûba çûbû Mûsil û Bexdayê, vegeriyan hatin. Me temînat da wan ku em ê di nîqaşan de teref negirin û zemîn vekin ku ew nêrînên xwe biparêzin. Di vê çarçoveyê de bi beşdarbûna 200 hevalan, li Kanîcengê (Qendîl) 13 rojan nîqaş çêbû û piştî wê jî Kongreya Gel a 2. bi şêwazekî awarte li hev civiya. Me ji bo ku li ser nîqaş nebe, di delegeyan de guhertin nekir, bi heman delegeyên Kongreya Gel a I. re Kongreya Gel a 2. lidar xist. Di heman rojê de hatina perspektîfa Serokatiyê jixwe hemû tişt zelal kirin. Serokatî, hem nêzîkbûnên rastgir, hem jî yên çepgir ên di Partiya me de bi tundî rexne kir û heqîqet eşkere kir. Li ser vê bingehê Kongreya Gel a 2. bû mudaxeleyeke cidî. Ji ber ku Kongreyê heqîqeta wan tesfiyekaran eşkere kir, yekser piştî Kongreyê reviyan û teslîmî YNK'ê bûn.

Pir balkêş e; Serokatî jî di perspetîfên xwe de destnîşan kir ku, divê mirov di destpêka meha Hezîranê de hemleyê bide destpêkirin. Jixwe biryara HPG'ê ya 1'ê Hezîrana 2004'ê hemleyê dest pê bike heman tişt bû. Me pêşnûmeya destpêkirina hemleyê nivîsand û pêşkêşî Kongreyê kir û ev pêşnûme ji aliyê Kongreya Gel ve hat pejirandin. Lê tiştê balkêş, dema pêşnûmeya 1'ê Hezîranê hat pêşkêşkirin, ev kesên îxanetkar beşdarî nîqaşan nebûn û derketin derve. Rexmê wê jî, biryar bi piraniya dengan hat erêkirin û misoger bû.

# Beşa Heftemîn:

# STRATEJIYA PARASTINA REWA

Me rola şîdetê ya di dîrokê de anî ziman. Şîdet bi demê re fetilî xwînrijandinê û bû wesîleya mijokdariyê, koledariyê û serdestiyê. Her wisa, şer di dîrokê de çawa bi pêş ketiye û tê çi wateyê, me anî ziman. Di dîroka Kurdistanê de şer çawa rû daye, civaka Kurd di dîrokê çawa nêzîkî şer bûye, li ser wê jî hat rawestandin. Gelên bindest li hemberî zordestan çawa li ber xwe dane, di vê çarçoveyê de şerê parastinê yê mafdar û ne mafdar kîjan in, me ev rave kirin. Lêgerînên li Ewropayê çêbûne, dûvre çawa şoreşên Sovyetê, Vîetnam û Çînê pêk hatine, me anî ziman. Me, stratejiya raperînê û şerê gel ê demdirêj ê Kubayê rave kir. Şerê gel ê demdirêj li Rojhilata Navîn heye yan nîn e, em li ser rawestiyan. Dûvre jî şerê gel ê demdirêj çawa derbasî Kurdistanê bû û derketina Rêber Apo, her wiha tetbîqkirina şerê gerîla û nêzîkatiyên heyî, me anî ziman. Şoreşa Vejînê çawa pêk hat û heya Komploya Navnetewî çi hat jiyîn û em heya sala 2004'ê çawa hatin, em li ser vana rawestiyan. Em di bin van serenavan de li ser mijara şer sekinîn. Niha jî Stratejiya Parastina Rewa çi ye, Şerê Gel ê Şoreşgerî çi ye, em ê li ser vê mijarê rawestin. Di hundirê vê mijarê de em ê salên nêz ên ji Hemleya 1'ê Hezîrana 2004'an heya roja îro şîrove bikin.

Her ku di teknîka şer de pêşketin çêdibe, di taktîk û statejiya şer de jî guhertin çêdibe. Stratejiya ku beriya 50 salan li welatekî bi pêş ketiye, mirov dikare bi xetên wê yên stûr jê sûd bigire, lê ev bi qalibî nabe, wekî wê bi xwe jî nabe. Divê tê de pir guhertin çêbibe. Ya rastî zanist wisa ye. Di zanist û jiyanê de statîkbûn û dogmatîzm nîn e. Her tişt bi pêş de diçe, dihereke, dimeşe û tê guhertin. Qanûna diyaletîka guhertinê di hemû tiştan de esas e. Diyalektîka cîhana me wisa ye. Ev ji bo hemû tiştî derbasdar e. Tiştê ku 10-50 sal berê rast bû, dibe ku niha bi temamî nerast be. Dibe ku cewher rast be, lê tê de guhertin heye. Divê em binê vê xet bikin û bizanibin. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn û vir de, di sala 1945'an de teknolojî bi pêş ket, şoreşa zanist û teknîkê çêbû. Kompîtur, înternet û telekomunîkasyon bi pêş ket. Vê pêşketinê di jiyana mirov û civakê de guhertinên mezin çêkir.

Bi taybetî di van 15-20 salên dawî de pir tişt guherîn. Tê bîra min, em zarok bûn, li dibistanê mamosteyekî me hebû. Pir balkêş e, dibe ku ew însanekî difikirî bû. Wê çaxê hesinek biçûk ji berîka xwe derxist û ji me re got, "wê rojek were, mirov wê bi tiştekî bi qasî vê ji tevahî cîhanê re biaxive." Ango wê çaxê gotinek wisa, wekî tiştekî xeyalî bû. Wê demê ji bo telefonekê, mirov bi saetan li postaxaneyê di rêzê de dima, heya dor dihat te û tu bi telefonê diaxivî. Ji bo mirov biaxive santral diket dewrê, carina jî mirov ji hevdû fêm nedikir. Tê bîra min, carekê em bi Enqerê re axivîn, me tiştek ji hev fêm nekir. Ji ber ku xet nebaş bû. Mamosteyê me wê demê wisa got. Bi rastî mirov niha dikare bi telefoneke biçûk bi tevahî dinyayê re biaxive. Her wiha niha înternet jî heye û hîn zêde derfetên pêşketî hene.

Ev guhertineke bingehîn e, pêşketineke mezin e. Vê yekê bi xwe re her tişt guhert, her wisa bi xwe re şer jî guhert. Di çand û terzê jiyana civakê de, di aboriya civakê de guhertinên mezin çêkirin. Di civakê de zanebûn bi pêş xist. Jixwe tê gotin ku, ev serdem serdema zanist û enformasyonê ye. Lewre ev stratejiyên me ji bo demên berê îzah kirin, hemû bihurîn. Ji bo îro bi temamî derbas nabin. Stratejiyên bihurîne ji her alî ve nayin bikaranîn, lê hin tiştên xwe yên nayin guhertin jî hene. Pirtûka Sun Tzu 2200 sal berê hatiye nivîsîn, lê îro jî derbasdar e. Ango naveroka wê îro jî derbas dibe. Ji bo tîr-kevan, rim û şûran taktîk bi pêş xistiye. Lê naverok û formul rexmê çekên îro jî, cardin derbasdar e, lê bi giştî na. Di vê çarçoveyê de taktîka serhildanê jî wisa ye. Serhildan jî wekî berê nabe. Berê taktîka barîkatê esas bû, lê îro li hemberî wê greyderan datînin pêşiya tangan. Ev jî pêşiya xwe radike û diçe. Ango êdî tenê barîkat têrê nake ku tu rê bigirî.

Bi awayekî bingehîn, serhildan jî wekî berê nabe, şerê gel ê demdirêj jî wekî berê nabe. Di şerê gel ê demdirêj de mijarek heye. Gava em li ser vê mijarê rawestiyan, dibe ku bala we jî kişandibe. Di qonaxa hevsengiyê ango dengeyê de divê dewletek li pişt te hebe. Çekên giran pêwîst in, divê tu ji cihekî alîkariyê bigirî. Di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de derfet hebû ku tu ji dewletekê alîkariyê bigirî, ji ber ku cîhan du blok bûn, ango du teref hebûn. Sosyalîzma Pêkhatî û emperyalîzm hebû. Te li dijî emperyalîzmê şer bikira, Sovyetê bi te re alîkarî dikir, lê niha şertên wisa tune ne. Berê dinya du teref bû, niha ne wisa ye. Divê tu bi hêza xwe ya cewherî şer bikî; kes tune ye ku topan û tangan bide te. Tê bi xwe her tiştê xwe bikî. Bala xwe bidinê; em hewl didin bi xwe her tiştê xwe çêbikin. Mejiyê me jî heye, em jî dikarin çêbikin. Mejiyê her kesî 250 gram in, ê me jî 250 gram in. Eger em jî li ser rawestin, em dikarin çêbikin. Ma ji bo mirov tiştan biafirîne divê mirov îleh dewlet be? Ma dewlet ji jor bi zembîlê daketiye! Ger dewlet çêdikin, em jî dikarin çêbikin. Bila aqilmendên me, hostayên me hebin, derfetên me jî hene û em jî dikarin her tiştî çêbikin.

Em her roj di sabotajê de şêwazên nû bi pêş dixin. Ji ber ku dijmin tedbîr digire. Her ku dijmin tedbîr digire, heval jî bi mecbûrî şêwazek nû peyda dikin. Em wisa dikarin çalakiyên sabotajê bi pêş bixin. Ango di vê demê de tu kes li pişta me nîn e. Ev ne tenê ji bo me wisa ye, ji bo pir kesan wisa ye. Mesela, şoreşgerên Kolombiya FARC'ê jî wekî me ne. Gerîlayên wana jî hene û modela wan mîna ya me ye. Tu kes li pişta wana jî tune ye, ew bi xwe ava dikin. Em jî bi xwe ava bikin. Mesela, dagirkeran welatê me Kurdistan kirine çar parçe, em jî di vê rewşê de derfetan diafirînin. Derfetên me yên madî ji her çar beşên Kurdistanê û ji Kurdên li Ewropayê temîn dibe. Em jî hewl didin ji wana derfetan bigirin. Dijmin her dem dibêje, "qaçaxiyê dikin". Bi rastî tevgera Kolombiya qaçaxiyê dike, lê em wisa nakin. Di warê îdeolojîkî û prensîbî de em li dijî vê ne. Em bi alîkariya gel tevdigerin.

Welatê me çar beş e. Dema li beşekê şer dibe, ji beşê din alîkarî tê, ji derve alîkarî tê. Dijmin li Ewropa û Tirkiyê pir hewl da alîkariya gel a ji bo me qut bike, lê kir û nekir nikarîbû alîkariyê qut bike. Nikare li ser berîka her kesî polîsekî dane. Însanên Kurd bi dizî be jî alîkariya me dikin. Me bi xwe ev xebat kir û em li ser piya man. Hêza ku têra xwe neke, nikare xwe li ser piyan bigire. Ji bo vê pêşmerge bi tena serê xwe nikare li ser piya bimîne. Pêşmerge, ji dengeyên heyî sûd digire. Her carê xwe dide milekî û wisa bi rê ve diçe. Heya niha jî wisa ye. Bi vî rengî tu serbixwe nabî, tu nikarî bi serê xwe biryar bidî, tu tê girêdan. Ji bo ku tu serbixwe bî, divê tu bi xwe alîkariya xwe peyda bikî. PKK'ê ev yek kiriye.

Di salên 2005 û 2006'an de em pir tengav bûn. Butçeya me nebû, em deyndarbûn. Dahateya (gelir) me bêhtir ji Ewropa dihat, lê li Ewropa jî bandora tesfiyekariyê pir kûr çêbibû. Rêxistina me hat lawazkirin û dahateya me kêm bû. Dahateya me ya ji Ewropa encex têra televîzyonan dikir. Li ser vê yekê me du tabûr xistin xeta Kelareşê ji bo ku gumrukê bigirin, lê wê jî têra me nedikir û me zehmetî kişand. Dûvre me gelek zehmetiyan û bi hewldana xwe cardin xwe komî ser hev kir. Wekî gundiyên me dibêjin, elhamdulîllah a niha aboriya me baş e.

Di vê serdema em tê de ger tevgerek têra xwe neke, nikare li ser piyan bimîne û siyaseteke serbixwe bimeşîne. Tim behsa Tamîlan dikin. Sirîlanka ew tesfiye kirin. Du nêzîkatiyan li ser vê bandor kir. Ya yekê; wekî dejenerebûnê jiyana xwecihî û rizîna navxweyî ew lawaz kirin. Ji xwe re gund ava kirin û dest bi bazirganiyê kirin. Ya duyemîn; bi derve ve girêdayî bûn. Berê Hindistanê destek dida Tamîlan, bi vî rengî xwe li ser piyan digirtin. Hevalên me jî çûne Hindistanê. Wezîrê Hindistanê ji Tamîlan re digot, "birayên me." Lê dûvre Hindistan li Tamîlan xwedî derneket û bi erdê re kirin yek û tesfiye bûn. Niha tu nikarî pişta xwe bidî tu kesî.

Di serdema Modernîteya Kapîtalîst de berjewendî pir hakim e û heya dawiyê heye. Kes li rondikê çavê kesî nanêre û ji bo berjewendiyên xwe dikare te bifiroşe. Ji bo vê jî divê em bi xwe bikaribin têra xwe bikin. Berê ne wiha bû, mutefîkên te yên stratejîk hebûn. Wekî proleterya ango sosyalîst û tevgerên rizgarîxwaz hebûn. Dibe ku niha jî hebin, lê tenê dikarin

piştgiriya manewî bikin. Ev mutefîkên stratejîk in, lê manewî ne. Lewre pêwîst e tu bi xwe li ser piyên xwe bisekinî. Di vê serdema nû de di karakterê şoreşan de guhertinek bi vî rengî heye. Ya yekê, guhertina teknolojiyê ev çêkir. Ji ber van guhertinên ku di teknîkê de bi pêş ketine, şer jî guherî. Her wiha nebûna blokên cîhanê, şerê gel ê demdirêj dixe xeteriyê. Ji ber ku guhertin heye. Ji ber van pêşveçûnên wekî teknîk, siyasî û bihurîna sîstema cîhanê ya du blokan ev dikeve xeteriyê. Lewre stratejiya şerê gel ê demdirêj nikare wekî berê encam bigire. Ev yek sedem e. Sedemên din jî hene.

Di vê demê de ya herî girîng, şert û mercên zanebûna civakê pir xurt bûne. Ger mirov civakê birêxistin bike, civak bi xwe hêzeke stratejîk e û dikare lingê şoreşê be; ne ku hemû tişt tenê hêzên çekdarî be. Teknolojiya roja îro bi pêş ketî, derfet dide ku mirov civakê zane bike, bi pêş bixe û kûr bike. Berê wisa nebû. Ji bo tu civakê zane bikî, diviyabû te belavok belav bikiran, an jî mal bi mal bigeriya, civîn çêbikira. Lê niha ne wisa ye. Di mala her kesî de televîzyon heye, înternet heye, dikare hemû tiştî bi xwe bişopîne û zanebûna xwe bi pêş bixe. Ango şert û mercên îro cuda ne. Êdî ger welatek nîv kapîtalîst û nîv feodal be jî, civak dikare xwe birêxistin bike. Ji ber ku teknolojiya heyî dest dide vê. Ji bo vê yekê di wan şîroveyên dema Mao Zedûng de hinek guhertin pêwîst in. Mao Zedûng digot: “Li welatê ku nîv kapîtalîst û nîv feodal be, xelkê wê jî piranî li gundan jiyan bibe, taktîka raperînê nagihe encamê.” Wê çaxê ev nêrîn rast bû. Lê roja îro hemû gundî di demeke kurt de bi rêya înternet, telefon û hwd. dikarin bi hev re têkiliyê çêbikin û wekî ku hemû di bajarekî de jiyan dibin rêxistinê bi pêş bixin. Ango dinya biçûk bûye, hemû bûye wekî gundekî. Lewre di van şert û mercan de hewcehî bi stratejiyên nûjen heye.

Xisûseke din jî, welatê me di aliyê dijmin de hatiye dagirkirin. Şerê me ne şerê êrîşê ye. Dijmin bi ser me de tê û êrîş dike, em jî hewl didin xwe û axa xwe biparêzin. Ev şer şerê parastinê ye. Divê em rast nav lê bikin. Welatê me hatiye dagirkirin û êrîş li ser welatê me heye. Em çima şer îlan bikin! Em di parastinê de ne. Wê çaxê divê em şerê xwe têxin qalibê şerê parastina rewa. Mafê parastina rewa di zagonên navnetewî de jî heye.

Serokatî, di parêznameya xwe ya DMME’yê (AÎHM) û Parastina Gelekî de vê yekê dide xuyakirin û li ser Stratejiya Parastina Rewa disekine. Piştî Konferansa HPG’ê ya 2., me jî wekî biryargeha HPG’ê pirtûkek li ser Stratejiya Parastina Rewa amade kir. Em Stratejiya Parastina Rewa wekî stratejiyeke nû û ya serdemê digirin dest. Nêrînên ku Marks der barê şîdetê de anîbûn ziman Sosyalîzma Pêkhatî hinekî li gorî xwe şîrove kir, her tiştî xist qalibê şîdetê. Ji ber ku şêwazê Marks anî ziman jî hinekî ji şîroveyê re vekiriye. Marks dibêje: “Şîdet, ji bo civaka ji şoreşê re avis, pîrik e.” Serokatiyê di vê der heqê de şîroveyên nû bi pêş xist û ev şîroveya Marks sererast kir. Serokatiyê, şîdeta mafdar ji bo parastinê destnîşan kir. Ji derveyî vê, ji bo veguhertina civakê, di hinek qonaxên krîtîk de şoreş dikare rola temamkirina guhertinê bileyîze. Lê divê şoreş ne li ser esasê şîdetê be, li ser esasê hêza civakê be. Wê çaxê stratejiya parastina rewa divê li ser du lingan be, ne ku li ser lingekî be. Wekî di stratejiya şerê gel ê demdirêj de hemû tişt ji bo gerîla bin, ango her kes ji bo gerîla bixebite, nabe. Her tişt ji bo artêş bi ser bikeve û mezin bibe, tê kirin.

Dema her tişt ji bo gerîla be, neyar jî bi her tiştê xwe berê xwe dide gerîla. Di vê demê de ev nabe û ev stratejî nagihe serî. Dema me got Stratejiya Şerê Gel ê Demdirêj nagihe emcamê, ji ber vê sedemê ye. Berê hemû tiştan tenê xizmeta gerîla dikirin. Berê Artêşa Sor hebû. Di wir de gel di pozîsyona alîkariyê de ye. Serokatî, di Stratejiya Parastina Rewa de gel kir lingek. Ango gel tenê ne alîkar e, bîzat lingekî şoreşê ye. Em ji vê re dibêjin “serhildan.” Ango tevgera serhildanê. Du lingên Stratejiya Parastina Rewa hene; yek gerîla ye. Gerîla pêşeng e. Gerîla ruh û cesaretê dide, hevsengiyê çêdike û pêşengiyê dike. Eger gerîla nebe nabe. Ew hevsengiya ku gerîla çêdike zemîn ava dike ku, serhildan jî bibe quwetek û di şoreşê de bibe lingek. Wê çaxê şoreş li ser du lingan e. Ango şoreş li ser gerîla û serhildanê bi pêk tê.

Ji sala 2004’an û vir ve tekoşîna bingehîn a em dikin, li ser du lingan e. Lingek jê gerîla ye, lingê duyemîn jî serhildan e. Ne wekî berê ye. Dibe ku her hevalekî/ê ev fêm nekiribe.

Jixwe piranî hevalan ev fêm nekirine, lewma nizanin taktîkê kûr bikin. Eger îro pirsgirêka me ya pêkneanîna taktîkê heye, ji ber fêmnekirina hevalan e. Yan jî hevalên fêm kirine, wekî tê xwestin nikarin bidin fêmkirin. Me taktîk kûr nekiriye, lewre me stratejî fêm nekiriye. Ango terzê me yê şer ne wekî berê ye. Şîdet ne hemû tişt e. Gerîla, ji bo ku pêşiya siyasetê veke, ji bo qezencên siyasî bi dest bixe, heye. Her guleya ku gerîla diavêje, karekterê xwe yê polîtîk heye. Gerîla, ji bo armanca polîtîk, ji bo civakê birêxistin bike û pêşî li siyasetê veke, heye. Gerîla bi tena xwe naçe şoreşê, bi gel re diçe şoreşê. Ev berê jî hatiye gotin. Lenîn dibêje, "şoreş berhema gelan e." Lê Sosyalîzma Pêkhatî û Artêşa Sor ji vê rastiyê derketin. Digot, "ez ê biçim Almanya, Yugoslavya û hwd. rizgar bikim û şoreşê bikim." Herî dawî jî Artêşa Sor xwest li Afganîstanê şoreş bike. Encam çi bû, li ber çavan e. Şoreş, ne tiştek e ku tenê bi şîdetê pêk were. Şoreş, meseleyeke zîhniyetê ye. Bi guhertina zîhniyetê ve û li ser vî esasî bi kûrkirina civakê ve girêdayî ye. Ji ber ku Sosyalîzma Pêkhatî bi wî awayî şîdet kirin her tişt, lewma ketin van şaşîtiyan.

Serokatî ji vê re got, "hebandina (tapma) şîdetê". Ango şîdet kirin her tişt. Em jî berê di bin bandora vê nêzîkatiyê de bûn, wisa nêzîk dibûn. Ji ber ku em di bin bandora Sosyalîzma Pêkhatî de bûn. Bi paradîgmaya nû ya Rêber Apo bi pêş xistî re em ji bin bandora Sosyalîzma Pêkhatî derketin. Em niha ne di bin bandora sosyalîzma pêkhatî de ne. Eger aqilê hin hevalên me hîna di bin bandora Sosyalîzma Pêkhatî de be, divê aqilê xwe zû ji bin vê bandorê derbixin û xwe rizgar bikin. Ji ber ku paradîgmaya Rêber Apo heye û paradîgmaya Rêber Apo bihurandina Sosyalîzma Pêkhatî ye. Em ji bin dogmatîzma Sosyalîzma Pêkhatî derketine.

Di Sosyalîzma Pêkhatî de dogmatîzm heye, şîdet û desthilat şaş bi kar anîn heye û demokrasî bi awayekî şaş girtina dest heye. Di wir de dewletbûn heye, lê em dewletê esas nagirin. Di wê de avakirina dewletê heye û cihê ku dewlet lê hebe, wekhevî, azadî û demokrasî nîn e. Çîna herî destpêkê bindest bûyî, jin e û divê jin azad bibe. Heta jin azad nebe, civak azad nabe. Lê di nêrîna Sosyalîzma Pêkhatî de ev jî pir kêm bû. Em li şûna dewletê, sîstemeke nû pêşniyar dikin. Em wekî sîstem, avakirina Konfederalîzma Demokratîk dikin hedef. Em dixwazin sîstem, civak û siyaseta demokratîk hebe; ne ku sîstema dewlet û civakê hebe. Na. Em tiştekî nû dibêjin, felsefeya me felsefeya Apocî ye; ne felsefeya di bin bandora Sosyalîzma Pêkhatî de ye.

Pir kes felsefeya Apocî dixin bin siya Sosyalîzma Pêkhatî. Hin hevalên me jî şîroveyên wisa dikin. Rastî ne wisa ye. Îro felsefeya herî hemdem, felsefeya Apocî ye. Em Apocî ne, me tiştên nû bi pêş xistine û Marksîzm bihurandiye. Me nêzîkatiya Marksîzmê ya ji jinê, şîdetê, dewletê, demokrasiyê û şer re îzah kir. Me dît ku Sosyalîzma Pêkhatî vana çawa dike teneke û davêje. Em nêrînên nû dibêjin û em di mijara şîdetê de jî nêrînên nû dibêjin. Nêzîkatiya me ya ji şer, jin û dewletê re cuda ye. Ji bo me şîdet ne her tişt e. Şîdeta ku parastinê hedef dike di cih de ye. Şîdeta ku nirxên civakê biparêze û pêşiya siyasetê veke di cih de ye û pîroz e. Her cure nêzîkatiyên şîdetê yên ji derveyî vê ne rast in. Di mantiqê me yê nû de, em siyasetê didin pêş. Gerîla pêşengtiyê dike ji bo ku serhildan xurt bibe. Gerîla xwe xurt bike, serhildan jî xurt dibe. Em bi vî awayî şoreşê li ser du lingan dimeşînin.

Şerê berê çawa ye? Li ser yek lingî ye û pişta xwe dide derve. Di şerê berê yê klasîk de, ango di Stratejiya Şerê Gel ê Demdirêj de her tişt ji bo gerîla ye. Gel jî ji bo gerîla xizmet dike. Artêşê mezin dike û artêşê saz dike. Ji derve jî top û tangên xwe digire, artêşa xwe mezin dike û dikeve bajaran. Dûvre gel beşdar dibe. Di xala dawî de gel jî raperîn dike. Di wir de jî gel heye, ne ku qet nîn e. Lê di ya me de ne wisa ye. Di Stratejiya Parastina Rewa de guhertineke bingehîn heye. Ya yekê; bi hêza xwe ya cewherî dimeşe. Ji derve jî alîkariyek were baş e, lê ger neyê jî, ew bi xwe diafirîne. Jixwe pêwîst e şoreş wisa be. Tê bi xwe têra xwe bikî û bi xwe bawer bikî. Tê xwe ji dewletan mezintir bikî, da ku tu dewletê bixî. Bi çi? Bi quweta gel. Ji bîr nekin ku hêza herî mezin, hêza gel e. Pratîka PKK'ê îspata vê ye. PKK'ê nîşan daye ku hêza herî mezin, hêza gel e.

Eger gel ne li pişta me bûya, 10 dewletan jî alîkarî bidana me, heya niha ji sedî sed em ê biketana. Dibe ku carina gel jî sar dibe. Wekî min got, li Ewropa salên 2004, 2005 û 2006'an ji ber tasfiyegeriyê em tengav bûn. Mesela, piştgiriya ji gel a wê çaxê ji bo me dihat, pir daket. Dûvre me hewl da, di dawiyê de me dîsa xwe komî ser hev kir. Niha desteka gel heta dawî heye. Li Ewropa piştgirî ji bo me di asta herî jor de ye. Gel carina ji te sar bibe jî, tu cardin dikarî xwe komî ser hev bikî û xwe xurt bikî, dema carina zext li ser dewletan çêdibe, dewlet nikare piştgiriyê bide.

Dewlet ku te bifiroşe, tê çawa bikî? Dewlet carina tengav dibe, desteka xwe disekinîne. Heta mirov difiroşin. Nimûneya herî mezin Tamîl in. Û heya niha gelek caran Kurd jî ji aliyê dewletan ve hatine firotin. Mesela Îranê, destpêkê ji hêzên wekî Hizbûlah û yê din re alîkarî dikir. Çawa hinekî tengav bû, niha newêre bibêje, têkiliya me bi Hizbûlaha Lubnanê re heye. Tenê yê bi awayekî vekirî qebûl kiriye Sûrî ye. Tenê Sûrî bi fermî piştgiriyê dide Hizbûlaha Lubnanê. Kes bi awayekî vekirî alîkariyê bi wana re nake û xwe guhertin. Lê berê ev pir vekirî dikirin û digotin, em piştgiriyê didin Şoreşa Îslamî. Şert û mercên cîhanê niha ji vê yekê re dest nade. Dema tiştek wisa eşkere bibe, dewletên Neteweyên Yekbûyî wê li ser te bicivin û te tengav bikin. Lewre piştgiriya dewletan qut dibe.

Eger li pişt me dewlet hebûna û em bi alîkariya dewletan gihîştibûna vê astê, heya niha em ê biketana. Ji ber ku dijminên me ji bo me tesfiye bikin, wê tenezûlî wan hemû dewletan bikirana û alîkariya wan dewletan a ji me re bisekinandina. Lê em bi alîkariya dewletan na, bi alîkariya gelê xwe gihîştine vê astê. Lewma em nakevin û nayên xistin. Ango şertê şoreşê wisa ye. Niha em ji bo wê dibêjin, Stratejiya Parastina Rewa. Ango ev stratejî li ser hêza xwe ya cewherî ye, gel û gerîla esas digire. Carina gerîla dikeve pêş, carina jî siyaset dikeve pêş. Ev di ya me de jî wisa ye. Mesela, dem heye gerîla li pêş e û gerîla her tişt e. Sala 2012'ê wisa bû, lê salên 2013-2014'ê ne wisa bû. Sala 2014'ê çawa ye? Siyaset li pêş e. Her roj siyaset û axaftine. Gotin û xebatên siyasetê û serhildanên gel li pêş in. Çima? Ji ber ku Serokatî pêngaveke siyasî bi rê xist. Serokatî hemleya Rizgariya Demokratîk û Avakirina Jiyana Azad bi pêş xist. Niha wê wisa pêşve biçe, lê gerîla xwe betal nake. Gerîla wê xwe mezin bike, ji ber ku wê dor were gerîla. Siyaset wê bimeşe, ger siyaset xitimî, wê gerîla bikeve dewrê. Bala xwe bidinê, ev 9 salên bihurî bi vî rengî ye. Dem bi dem gerîla li pêş e, dem bi dem jî siyaset li pêş e.

Hevalên me vê baş fêm nakin. Lewre dema agirbest dest pê dike, dibêje, "her tişt temam e" û dev ji xwe berdide, leşkertiya xwe lawaz dike û dikeve nav xeyalan. Ev pir şaş e. Eger tu li gorî stratejiya parastina rewa nêzîk bibî, tê tu carî xwe lawaz nekî. Divê tu bizanibî ku ev şoreş li ser du lingan dimeşe; carina lingek dikeve pêşiya lingê din. Wan lingan di dewrê de nebin, ew şoreş wê bişkê. Ne wekî berê ye. Niha şoreş li ser yek lingî nameşe, tenê bi gerîla yan jî tenê bi gel jî naçe serkeftinê. Bi alîkariya derve, tu pişta xwe bidî derve qet nabe. Tevgerên ku vê îradeyê nîşan bidin dikarin bi ser bikevin, lê yên ne wisa tesfiye dibin. Eger tenê li ser lingê gerîla be, şoreş çênabe. Gel jî bi tenê be, dijmin wê biçe ser û girtin çêbibe, yan jî ger bi cihekî ve girêdayî be, dema alîkarî ji ser qut bibe, wê birçî bimîne û bi ser nekeve. Ji bo serkeftina şoreşê divê van derfetan pê re hebe. Şoreşgerên Amerîkaya Latîn îro têra xwe dikin. Me bi wana re hinekî hevkarî kir. Wana jî dîmenên berhemên teknîkî yên ku wan ava kirine, ji me re şandin. Min lê nihêrî, atolyeya wan pir di pêş de ye. Atolyeyên xwe pir xurt in. Ne tenê em li ser tiştên wisa disekinin, ew ji me jî zêdetir li ser vê mijarê disekinin. Ji ber ku di vê serdemê de tevgereke ku gelê xwe û girseya xwe nebe, bi xwe têra xwe neke, nikare xwe bi hebûn bike. Mesela, yê wana jî gelê wan heye û bi xwe têra xwe dikin. Lewma hene.

Eger em hene, ji ber gel bi me re ye. Gel quweta herî mezin e. Ji bo ku ev her sê tişt ava bibin, xet û îdeolojiyek rast pêwîst e. Serok û stratejiyeke ku bikaribe van nirxan biafirîne û bibe xwediyê hişmendiyeke wisa pêwîst e. Eger serok nebûna, wisa nedibû. Hema 4 kes werin gel hev, nikarin van tiştan biafirînin. Ji bo wê îdeolojiyeke ku îlham bide însanan pêwîst e. Her yek ji me ji cihekî hatiye. Bi sedan, bi milyonan însan hemû ji yek îdeolojiyê

îlham û heyecan digirin, dikarin xwe û hemû tiştên xwe ji bo vê feda bikin. Niha bi milyonan însan wisa difikirin. Ev nirxek e. Jixwe ev nebe, ew her du lingên stratejiya parastina rewa ava nabin. Wisa nebe, gel û leşkerên fedayî ava nabin. Îro li wî aliyê dinyayê li Amerîka, Kanada yan jî li Ewropa Kurdek dibe ku ji min û ji te zêdetir ji bo vê tevgerê fedaî ye. Em li vir her cure fedakariyê dikin, ew jî li wir roj û şev dişixulin û fedakariya madî dikin. Em wisa hene. Ji kombûna van hemû nirx û berheman sîstemek derdikeve holê; wekî din nabe.

Bi kurtahî Serokatî di mijara şer de guhertineke stratejîk çêkir. Em wekî berê, bi rêbazên klasîk şerê gel ê demdirêj nakin. Em dixwazin bi zîhniyeteke nû, bi Stratejiya Parastina Rewa, bi perspektîfa Şerê Gel ê Şoreşgerî şoreşê pêk bînin. Di vê de jî qonax hene û Serokatî van qonaxan îzah kir. Em jî li ser lêkolîn dikin û radiwestin.

***Di Şerê Parastina Rewa de 3 qonaxên şer hene:***

**Qonaxa Yekemîn:** Rewşa agirbestê ye. Mirov dikare ji vê re bibêje, parastina pasîf. Bi wateyeke din, parastina pasîf agirbest e. Nimûne, ji Newroza 2013'an heya 24'ê Tîrmeha 2015'an pêvajoyeke agirbestê ya wisa hebû. Ew dem, dema parastina pasîf bû. Dema agirbest hebe, her roj bi şêwazekî aktîf şer nabe. Eger dijmin erîş bike, wê bersiv bê dayîn. Di dema agirbestê de ger terefek êrîşî terefê din bike, terefê êrîş hatiye ser mafê xwe yê bersivdanê heye. Dikare mafê xwe yê bersivdanê bi kar bîne. Di qonaxa yekemîn de hêza gerîla ji siyasetê re mecalê vedike û siyaset li pêş e. Gerîla dikeve dema amadekariyê, lêhûrbûnê bi pêş dixe, xebata perwerdeyê dike û xwe diparêze. Dema dijmin hat, bersiv dide. Gava dijmin hat û derbeyek lêxist, ew jî mafê xwe yê bersivdanê bi kar tîne. Ev qonax, qonaxa parastina pasîf e. Dema qonaxa parastina pasîf wê çi qasî bajo, ne diyar e. Li gorî rewşa terefan ev tê guhertin. Bêşerî ne mayînde ye. Her tim mumkûn e şer dest pê bibe. Ji bo vê, divê gerîla her tim ji êrîşan re amade be. Şer, li gorî rewşa siyasî û hevsengiyên siyasî dibe. Li gorî hevsengiya siyasî dikare rewş biguhere û mumkûn e her gavekê pozîsyona agirbestê ji holê rabe.

Di vê pêvajoyê de heval carina wekî trêna bi komirê dixebitin û tevdigerin. Trêna komirê dema dikê bixebite, heya trên germ dibe û bi rê dikeve, çend saet derbas dibe, wisa dixebite. Ango pir giran e. Niha hevalên me jî wekî wan trênên giran in. Mesela agirbest e, lê tu dibêjî, "rabe wext hatiye. De heval ka rabe!" Heya radibe, xwe amade dike û bi rê dikeve, demek dirêj pê ve diçe. Wekî trênên komirê ne. Çawa agirbest çêdibe hema çeka xwe datîne, dev ji xwe berdide, refleksên xwe cuda dike. Dema şer dest pê dike, vê carê wekî ew trêna bi komirê zû nasekine. Gava dest pê dike jî, vê carê nasekine. Yan xwe tam vedimirîne, yan jî di rê de ye, nasekine. Divê bi vî rengî nebe. Divê wekî ya benzînê yan jî mazotê be, hema pê xist biçe, yan jî dema bixwaze bisekinîne, divê bisekine. Yanî pêwîst e gerîla bi wî awayî her kêliyekê ji her tiştî re amade be. Divê em her tim ji şer re amade bin. Agirbest hebe jî, nabe em di bin firokeyên keşfê de tevbigerin. Ger em di bin keşfê de bigerin, niha li me nedin jî, cih deşîfre dibe. Ger îro tu di parastina pasîf de yî, mumkûn e sibe tu derbasî parastina aktîf bibî.

Li ser vê bingehê divê refleksa gerîla pir xurt be. Ne giran be, ne wekî trêna bi komirê be. Sîstema xwe divê giran nebe, lezgîn be û bikaribe aktîf bibe. Niha tu ji hevalan re bibêjî, çalakiyekê bikin, 2 mehan encex amadekarî dikin. Ji ber ku di pir tiştan de tetîl kirine, ango betlane kirine. Lê divê her kes her dem ji çalakiyan re amade be. Ji ber ku ev qonax ne ji sedî sed e, mumkûn e sibe tu derbasî qonaxa aktîf bibî. Bi kurtahî gerîla divê her tim li ser tetîkê be û amade be. Tefkîra xwe divê lezgîn be. Tefkîr çi ye? Ango bi aqil û mejî hemû tiştên xwe li gorî wê saz bike. Terzê xwe divê lezgîn be, ne giran be. Di qonaxa parastina pasîf de nabe ku mirov dev ji xwe berde. Divê mirov bi tedbîr be. Divê em dest ji xwe bernedin, xwe lawaz nekin. Divê amadekarî hebin. Li gorî wê tê karê parastina pasîf bikî. Di dema parastina pasîf

de divê mirov perwerdeyê jî bimeşîne. Her tişt divê di dewrê de be. Nêzîkbûneke di vê çarçoveyê de pêwîst e.

Siyaset jî wisa ye. Carina gerîla disekîne, siyaset jî dest ji xwe ber dide û sist dibe. Mînak, sala 2013'an di nav me de wisa bû. Me ev rexne kir. Serokatî hewayek çêkir, agirbest îlan bû. 2 milyon însan li Amedê gihîştin hev û em ketin rojeva hemû cîhanê. Mirov dikare bi awayekî aktîf her kesî têxe tevgerê, lê kesên di xebatên siyasî de dest ji xwe berdan. Serokatî pêvajo îlan kir, agirbest çêbû, ew jî ketin rehawetê. Divê ne wisa be. Rehawet di serhildanê de jî çêbû. Ango di gerîla de jî, di serhildanê de jî rehawet çêdibe. Di sala 2013'an de tiştê hat jiyîn, ev bû.

Rehawet heye. Ev şaş e. Halbûkî wisa nabe. Di qonaxên agirbestê de gerîla pêwîst e ne di rehawetê de be, divê amadekariyên xwe bide destpêkirin, lêhûrbûna xwe ya li ser şer kûrtir bike. Eşkere em bibêjin; divê gerîla û siyaset her tim xwe ji bo şer amade bikin. Divê terzê xwe yê liv û tevgerê li gorî vê amade bikin. Ango divê ji bo derbasbûna qonaxa aktîf, ji bo şer xwe amade bike û divê terzê tevgerîna xwe jî wisa be. Serokatî jî got, "we şaş fêm kiriye." Şaş fêmkirin di vir de ye. Eger kesek li gorî parastina rewa bifikire, wisa nake; wê bi tedbîr tevbigere û bibêje, "erkên me hene" û wê bi vî rengî nêzîk bibe. Lê heval piranî wisa nakin. Bi kurtahî, di Stratejiya Şerê Parastina Rewa de qonaxa yekemîn qonaxa berî şer e, ango qonaxa parastina pasîf e.

**Qonaxa Duyemîn:** Parastina aktîf e. Parastina aktîf tê wateya gerîla, ji bo pêşî li xitimandina siyasî vebike, ji bo dijmin tengav bike ku gavên siyasî bavêje, ji bo hesab bipirse û bersivdana aktîf bi pêş bixe, ji bo raber bike ku dijmin bi zextê nikare biçe encamê û kes nikare îradeya gel bişkîne, çalakiyan bi pêş dixe. Me kengî dest pê kir? Me di sala 2004'an de dest bi parastina aktîf kir. Îlana 1'ê Hezîranê çi ye? Îlana 1'ê Hezîranê ne tenê îlana şer e, îlana şerê parastina aktîf e. Hewce nîn e em bibêjin rewşeke cuda ye. Em di parastinê de ne. Dijmin hatiye, welatê me zeft kiriye. Dijmin hatiye, welatê me talan dike. Dijmin li ser ziman, çand û siyaseta me di êrîşê de ye. Em di parastinê de ne û em parastina aktîf dikin. Ev qonax, qonaxa parastina aktîf e.

Em dem bi dem qonaxa parastina aktîf dimeşînin. Ji ber ku ev bi awayekî demkî tê meşandin. Pêwîst e em vê bizanibin. Ev qonax bi demkî ye. Ne ku carekê dest pê dike û heta dawiyê nasekine. Ev stratejî ne wisa ye. Tê herî, lê cih heye tu disekinî, siyaset dikeve dewrê. Her gavekê dibe ku rewş bê guhertin. Me ji 1'ê Hezîranê heta niha 5 caran agirbest îlan kiriye. Di sala 2005'an de ji bo mehekê agirbest hat îlankirin. Agirbestên din jî, di salên 2006, 2009 û 2010'an de hatin îlankirin. Herî dawî di Newroza 2013'an de cardin agirbest hat îlankirin. Dibe ku me ji bo van hemû pêvajoyan nedigot "agirbest"; ji bo hinekan dihat gotin "rewşa bêçalakîtiyê", lê ev jî heman tişt e. Ango rawestandina şer e.

Ev tenê ne ji bo me wisa ye. Tevgerên wekî FARC, IRA û EZLN jî pir caran wisa kirine. Wê çaxê ne ku tenê em wisa dikin. Fêm dibe ku di vê dema em tê de şer wisa bi pêş dikeve. Dem dema şerê parastinê ye. Dem bi dem tu disekinî, rê didî siyasetê. Karakterê serdemê wisa ye. Hewce nîn e em pir bi dogmayan nêzîk bibin û heya dawiyê şer bikin. Tu heta cihekê diçî û disekinî. Wê çaxê her ku agirbestek bû, nabe mirov aqilê xwe tevlîhev bike. Hinek hevalên me wisa ne. Gava agirbest dibe, heçku şer qediya, aştî çêbû. Ne wisa ye. Ev tekoşîneke ku hemle bi hemle pêşve diçe. Karakterê şerê vê demê wisa ye. Ango heta dawiyê naajo. Heya dawiyê ev nabe. Tu hemleyekê dikî, paşê ji bo ku encama wê di warê siyasî de komî ser hev bikî, tu disekinî. Ji bo ku tiştê derdikeve holê tu ji xwe re bikî quwet, avabûna xwe bi pêş bixî, xwe bidî naskirin û rewabûna xwe bi pêş bixî.

Di şerê parastina rewa de 3 hêzên şoreşê yên bingehîn hene. Em di xetên stûr de dibêjin, şoreş li ser du lingan e. Ev rast e. Lê hêzeke din jî heye ku, di navbera her du lingan de girêdanê çêdike û her du lingan dike yek. Ev hêz jî hêzeke girîng e. Eger ev hêz rol neleyîze, her du ling nabin û şoreş pêk nayê. Ango xeleka hêzên şoreşê dike yek e. Van hêzan kî ne?

Lingekî bingehîn gerîla ye, lingê duyemîn serhildan e û hêza van her du lingan dike yek jî, Hêza Parastina Cewherî ye. Gelek caran kes ne di ferqa girîngiya vê hêzê de ye. Halbûkî hêzên parastina cewherî tune bin, gerîla û gel nikarin bibin yek û şoreş nafetile şoreşa gel û şerê parastinê nabe şerê gel.

Xisûseke din, divê tu xwe bi her kesî bidî qebûlkirin. Ango niha em li hemberî dewleta Tirkiyê şer dikin, pêwîst e em mafdariya xwe bi gel û karkerên Tirkiyê bidin naskirin û qebûlkirin. Divê em rewabûna tekoşîna xwe bi gelên Tirkiyê, Faris û Ereb bidin naskirin û qebûlkirin. Mesela, peyama herî dawî ya YPG'ê (Yekîneyên Parastina Gel) wisa ye. YPG tenê ne hêza parastina gelê Kurd e. YPG, hêza parastina hemû gelên li Sûriyê yên demokrasîxwaz, alîgirên biratiya gelan û kedkaran e. Û YPG wê wan hemûyan biparêze. Divê Kurd, Ereb, Asûrî, Suryan, Ermen, Tirkmen û her kesî biparêze. YPG, tenê ne li ser navê gelê Kurd e. Navê wê Yekîneyên Parastina Gel e, ango hêza parastina hemû gelên li Rojava ye. Ma tenê gelê Kurd gel e? Ma yên din ne gel in? Ew jî gel in. HPG jî wisa ye. HPG, her kesî diparêze. Ne tenê gelê Kurd, divê hemû gelan biparêze. Ereb, Asûrî, Suryan, Ermen û Tirkmen jî gel in, wê vana jî biparêze. Li Sûriyê YPG helbet wê hemû gelan biparêze. Erka xwe ya bingehîn ev e. YPG, hêza demokrasî û azadiya gelan e. Nexwe meseleyeke me ya em xwe bi gelan bidin qebûl kirin jî heye. Wê çaxê divê pratîka gerîla jî wisa be. Her gaveke ku em bavêjin, divê em hesabê raya giştî bikin. Gelên Asûrî, Ermen, Ereb û hwd. wê çi bibêjin, raya giştî wê çi bibêje? Divê em vê li ber çavan bigirin.

Her guleya gerîla bavêje divê polîtîk be. Çalakî divê polîtîk bin. Mesela, wisa yekser biçe li dijmin bide û însanên sivîl bimirin, nabe. Gerîlayê niha wisa nabe. Belkî şerê berê qeba û çors bû, lê ew di dema kevin de ma. Gerîlayê niha divê bi pîvan be, divê sivîl û zarok ji şer zirar nebînin. Ne ku bibêje, "min li dijmin xist, lê bes çend kesên din jî pê re mirin." Gerîla divê wisa nebe. Ji ber ku berê hinek kesan di nav me de wisa digotin. Karakterê gerîla niha cuda ye. Ji bo ku em xwe bidin qebûlkirin, divê di çalakiyan de sivîl zirarê nebînin. Gerîla bi çalakiyên xwe ji her kesî re peyaman dide û divê demokratan, xelkên ji rêzê û gundiyên Tirk qezenc bike. Gerîla divê her çalakiya xwe, her kiryara xwe bi pîvan be. Divê bikaribe rewabûna çalakiya xwe biparêze. Lê pir çalakiyên hevalan hene, em mecbûr mane lê xweyî dernekevin. Ji ber ku çalakiyên ne di cih de ne. Çalakiyên wisa yan me rexne kirine, yan jî me qebûl nekirine. Heqîqet wisa ye ku yekîneyên gerîla bi însiyatîf in. Jixwe her tişt bi navendî nabe. Ango Biryargeha Navendî ya HPG'ê nabêje, "Ey gerîlayê li Dêrsimê, filan çalakiyê bike!" Şêwazek wisa di gerîla de nameşe. Her yekîne bi însiyatîf tevdigere. Ji bo vê divê di her fermandariyê de feraseta parastina rewa hebe û bikaribe li gorî xeta tevgera me çalakiyan plan bike.

Gerîlayê serdema nû divê bi pîvan be, her tiştê xwe bi plan be, şaşîtî tê de pir kêm bin. Ji ber ku ew gerîlayê polîtîk e. Şoreşê wisa bi pêş ve dibe. Gerîla, tenê bi awayek qeba û bi şîdetê şoreşê nake, bi qezenckirina civakê û bi qezenckirina raya giştî dike. Mesela El–Qaîde jî heye, bi YPG'ê re şer dike. Şêwazê El–Qaîde cuda ye. Şêwazê xwe çi ye? Bi tirsandinê tevdigere. Civakê ditirsîne, heybeta xwe nîşan dide û bi wî awayî alîgirên xwe çêdike. Bi vî awayî jî xwe dike otorîte. Şêwazê El–Qaîde wisa ye, lê şêwazê me berevajiyê wana ye. Em dixwazin mirovan qezenc bikin û bibin hêz, lê ew bi tirsê xwe dikin hêz. Dixwazin xof û tirsê çêbikin, gel bêdeng bibe û ew jî bibin desthilatdar. Li Iraqê û Sûriyê binêrin çawa dikin? Her roj teqemeniyan diteqînîn. Terzê çalakiyên wan pir erzan e. Zirarê didin gel. Helbet erebe dikare bikeve her deverê, yan jî bazarê û tu dikarî biteqînî. Ev çalakî pir erzan e. Ya girîng ew e ku, tu dijmin tespît bikî, li dijmin bixî û tu kesê sivîl jê zirar nebîne. Çalakiya bingehîn ev e.

Çalakiyên El–Qaîdê erzan in. Hema suwarî erebeyê dibe, diçe li bazarê diteqîne. Bi her erebeyeke diteqe re 40–50 kes dimirin. Di wan çalakiyan de jin, zarok û extiyar, kesên ku têkiliyan wan bi şer re tune ye, tên kuştin. Li gorî wan, tenê bila ev tax a Şiîyan be temam e, bila ne taxa Sûniyan be, wê demê çalakî serbest e. Ya rastî, Sûnî jî di wan çalakiyan de dimirin. Terzê wan wisa wehş e. Ji bo çalakiyan terzek pir hov e. Mirovên bêewle û

bêparastin dikujin. Hem jî dibêje, “ez Îslam im, Xwedê bi min re ye.” Ma Xwedê gotiye wisa bike? Ne wisa ye. Ew jî li gorî xwe şîrove dikin. Ango şêwazê wan û şêwazê me berevajiyê hev e. Nabe em mîna wan çalakiyan bikin. Em naxwazin bêvila kesî xwîn bibe.

Hedefa me, dijmin e. Noker û xayîn hene. Hêzên dijmin ên qetlîamê dikin, hene. Leşker, hêzên taybet, polîs û sîxurên wan ji bo me hedef in. Ji bo vê pîvan, hesasiyet û dîsiplîn pêwîst e. Helbet çalakiyên me wekî yên El–Qaîde hêsan nîn in. Di şêwazê me de pir zehmetî heye, lê ev terzê me ye. Em dixwazin gelê Tirk qezenc bikin, ne bitirsînin.

Bi kurtahî qonaxa duyemîn qonaxa parastina aktîf e. Ev qonax, ev 9 sal in dem bi dem hatiye meşandin. Hemû heval dizanin û beşdar bûne. Di qonaxe duyemîn de astên cuda yên şer hene. Ew jî wekî qonaxan e. Em ê hinekî li ser wê rawestin. Mesela, salên wekî 2004, 2005’an bi piranî çalakiyên normal hatin kirin. Bi taybetî wê demê sabotaja bi kumandayan ango ji dûr ve li hedefa dijmin xistin hat kirin. Bi çalakiyên bi vî rengî dijmin zêde derbe naxwe, lê dijmin tê tacîzkirin û tengavkirin. Çalakiyên wisa heya sala 2006’ê dibû. Ji wê şûn de, bi taybetî di sala 2007’ê de me xwest em şerê di asta navîn (orta yoğunluklu savaş) de bi pêş bixin. Nexwe di parastina aktîf de şerê bi asta navîn heye. Serokatî jî behsa şerê bi asta navîn dike. Bi rastî ev qonax amadekariya derbasbûna qonaxa sêyemîn e. Şerê bi asta navîn ne qonaxa sêyemîn e, em wisa nahesibînin. Em wekî qonaxa duyemîn dihesibînin, lê wekî bingeha derbasbûna qonaxa sêyemîn e.

Şerê bi asta navîn çi ye? Bipêşxistina çalakiyên îmhakirinê û mezin e, her wiha bidestxistina hinek cih û qadan e. Nimûne, di sala 2007’ê de çalakiya Oremarê hat lidarxistin. Her wiha bi çalakiya ku hevalê Huseyîn û Reşît li Oremarê kirin û çalakiya hevalê Adil li Gabarê kirî me xwest em derbasî vê qonaxê bibin. Em ketin wê qonaxê, lê berdewamiya wê nehat. Ango bi sîstematîk nebû. Me şerê bi asta navîn tam li gorî dilê xwe nemeşand, an jî nikarîbû bimeşanda. Di sala 2012’ê de em ketin şerê bi asta navîn, lê ev ji wê cudatir e. Di şerê sala 2012’ê de asta navîn hat bihurandin. Me got, 9 salên dawî dem bi dem em ketin şerê bi asta navîn, lê divê mirov sala 2012’ê ji wê derbixe. Divê mirov bibêje, me di nava 8 salên dawî de dem bi dem şerê bi asta navîn kiriye. Sala 2012’ê wekî saleke navber e. Tam heqê wê nehat dayîn. Em ê dûvre li ser rawestin. Eger heqê wê bihata dayîn, şerê sala 2012’ê derbasbûna serdema sêyemîn bû. Lê heqê wê tam nehat dayîn, lewre di navberê de ma. Mirov dikare bibêje wekî derbasbûna serdema sêyemîn e. Mirov dikare wisa şîrove bike. Bi taybetî mirov nikare tiştên dîrokî wekî kêrê qut bikeû bibêje, ev wisa ye, ew wisa ye. Wekî serdema derbasbûnê ye.

**Qonaxa Sêyemîn:** Şerê topyekun e. Di stratejiya parastina rewa de qonaxa sêyemîn, qonaxa giştî (topyekun) şer e. Ango ev qonaxa serdema dawî ye, ya fînalê ye, ya şoreşê ye. Di vê demê de her du lingên şoreşê serhildan û gerîla hîn zêde nêzî hev dibin û rola hêza sêyemîn yanî parastina cewherî derdikeve pêş. Bi wî awayî gel û gerîla dibin yek û şoreşê pêk tînin. Ji bo vê, qonaxa sêyemîn qonaxa giştî şer e û êdî qonaxa dawî ye. Divê pêkanîna şoreşê bike hedef. Ango hêzên şoreşê di asteke stratejîk de hemû hêza xwe dixin meriyetê, ji bo ku encam bigirin û biçin serkeftinê. Mirov bi giştî dikare vê qonaxê wisa şîrove bike. Stratejiya parastina rewa bi giştî wisa ji 3 qonaxan pêk tê.

Rêber Apo di sala 2010’ê de ev qonaxa sêyemîn a parastina rewa, wekî qonaxa dawiyê şîrove kir û formulasyona wê hîn fireh kir û li ser vê bingehê perspektîfa Şerê Gel ê Şoreşgerî da. Vê yekê stratejiya parastina rewa hîn zelal kir û tê de xurtbûnek çêkir. Bi vê stratejiyê mirov wê çawa biçe şoreşê, di vê tiştê de hîn zêde zelalî çêkir. Rêber Apo bi giştî serdemeke nû vekir. Ji ber ku di hevdîtinên Oslo de xitimandinek jiyan dibû û xuya bû ku dewlet naxwaze biçe çareseriyê, wê demê Serokatî got: *“An çareseriya destûra bingehîn, an jî çareseriya Şerê Gel ê Şoreşgerî.”* Di sala 2010’ê de Serokatî ev xist rojevê.

Serokatî qonaxên stratejîk wekî çar qonaxan destnîşan kir. Ango dîroka têkoşînê wekî çar merheleyan girt dest. Serokatî ji derketinê heya sala 1984’an wekî merheleya partîbûnê,

ji sala 1984'ê heya 1993'yan wekî merheleya berxwedan û şoreşa vejînê, ji sala 1993'yan heya 2010'an jî wekî merheleya çareseriya demokratîk pênase kir. Eger dewlet di hevdîtinan de bihata çareseriyê ev qonax dikarîbû bibûya qonaxa dawî û çareseriyê. Ji ber eşkere bû ku dagirkeriya Tirk nayê çareseriyê; naxwaze nasname û mafê gelê Kurd qebûl bike; hevdîtinên çêdike di çarçoveya şerê taybet de çêdike; ji bo Serokatiya me û partiya me mijûl bike, dem qezenc bike û wisa tevgera azadiya Kurdistanê tesfiye bike, bi pêş dixe; Serokatî jî li hemberî vê, merheleya çaremîn xist rojevê. Merheleya çaremîn tê vê wateyê ku, ger dewlet neyê çareseriyê, divê em bi xwe çareseriya xwe ava bikin û bi pêş bixin.

Ev tişt li gorî perspektîfa stratejiya parastina rewa, wekî qonaxa topyekun a dawiyê ye. Serokatî perspektîfa qonaxa topyekun hîn zelal kir û wekî qonaxa çaremîn a stratejîk û serdema şerê gel ê şoreşgerî destnîşan kir. Dema mirov dibêje "parastin", hinekî şaş fêmkirin jî tê de çêdibe. Ji ber ku em di qonaxa dawiyê de ne. Qonaxa dawiyê di stratejiyê de parastin e, lê di taktîk de êrîş e. Dema dijmin dixwaze şert û mercên şoreşê û çareseriyê ji holê rabike, divê şoreş here ser û rê nede ku ew şert û mercên şoreşê ji holê rabike. Di vê wateyê de hêza şoreşê êrîşên taktîkî bi pêş dixe û wisa destkeftiyên stratejiya parastina rewa pêk tîne. Ango divê êdî şoreş bi hemû hêza xwe ya gerîla, parastina cewherî û gel biçe ser dijmin, sîstema dijmin red bike û ji bo sîstema dijmin ji holê rabike, têkeve pozîsyoneke aktîf, ango têkeve êrîşê. Lê dema mirov peyva "parastin"ê bi kar tîne, hinek kes vê şaş fêm dikin û difetilînin mîna pasîfîzmê. Ya rast ne wisa ye. Parastina rast, parastina aktîf e. Parastina rast, di cewherê xwe de êrîşên taktîkî ne. Ji bo ku di vê der heqê de şaş nêzîkbûn çênebe û ji bo rê nede şaşiyan Serok Apo rasterast got, "Şerê Gel ê Şoreşgerî".

Em şerê gel ê şoreşgerî di stratejiya parastina rewa de wekî qonaxa dawî dibînin. Ango qonaxa fînalê ye. Ev qonax di şoreşa me de wekî serdema stratejîk a çaremîn dest pê bûye û ji sala 2010'ê ve di rojeva me de ye. Me di vê çarçoveyê de xwe hinekî ji bo vê amade kir û di 1'ê Hezîrana 2010'ê de me bi perspektîfa Qonaxa Stratejîk a Çaremîn hemleyeke nû da destpêkirin. Wekî tê zanîn, di 2010'ê de li ser vê bingehê du mehan şer çêbû, lê pratîkeke pir zêde serkeftî bi pêş neket. Xuya bû ku heval jê re amade nebûn. Amadekariyên HPG'ê ne xurt bûn. Di şer de taktîkeke nû nehat bipêşxistin, tenê şerê ser giran çêbû. Ev, hem di meha duyemîn de xitimî, hem jî dewlet cardin çû cem Serokatî û xwest em şer rawestînin. Serokatî ev biryar ji me re hêla. Me nîqaş kir û dûmahîkê biryara agirbestê hat girtin, cardin di meha Tebaxê de agirbest hat îlankirin. Di van şert û mercên agirbestê de diviyabû me amadekarî bi pêş bixista. Biryar wisa bû. Di Tîrmeha sala 2011'ê de bi esasî dijmin hinek tişt kirin hincet û şer da destpêkirin û em wisa hatin sala 2012'an.

Berê ji bo dema sêyemîn me digot, gel û gerîla wê bigihin hev û wê raperîn çêbibe. Ango şerê gerîla bilind dibe û gel dikeve dewrê. Perspektîfa nû ya şerê gel ê şoreşgerî jî wisa ye. Lê me hinekî li gorî xwe girt dest. Mesela, di sala 2012'ê de erê me di çaroveya şerê gel ê şoreşgerî de şer kir, lê me ew perspektîf tam nexist pratîkê. Pratîka wê tam bi pêk nehat. Serokatî behsa şerekî pir mezin dikir ku, gel jî beşdar bibe û digot, "mumkûn e rojê 5000 mirov jî şehîd bikevin." Ango gel jî beşdar dibe, lê di 2012'ê de gerîla şer dimeşand. Ango wê çaxê lingekî wê lawaz bû. Di encamê de mirov nikare bibêje şerê gel ê şoreşgerî tam kamil bû. Di 2012'ê de hewldana şerê gel ê şoreşgerî hebû. Gerîla bi perspektîfeke nû hemleyek nû bi rê xist. Dixwest xwe bigihîne stratejiya şerê gel ê şoreşgerî, lê ev çênebû. Pêwîst e niha bigihe. Di pêşiya me de ger cardin pêvajoya şer dest pê bike, divê xwe bigihîne vê perspektîfê û têxe jiyanê.

Di stratejiya parastina rewa de mirov dikare qonaxa sêyemîn jî wekî şerê gel ê şoreşgerî pênase bike. Hewldanên me çima encam negirtin? Divê mirov vê pirsê bipirse û em li bersiva wê bigerin. Me xwest em şerê gel ê şoreşgerî tetbîq bikin û me di sala 2010'ê de dest pê kir. Me du mehan şer kir, lê nebû, tam pêk nehat. Dûvre di sala 2011'ê de dijmin Pêvajoya Osloyê bi dawî kir, bi awayekî fermî li dijî me şer îlan kir. Şer dijwar derbas bû û dijmin bi ser me de hat, heya Adara 2012'ê gelek yekîneyên me tune kirin. Encex di sala 2012'ê de me xwe komî ser hev kir. Ji aliyê me ve jî di 19'ê Hezîranê de bi çalakiya Şitazin û berî wê jî bi çalakiya

fedaî ya hevalê Êrîş û Andok a li Kayseriyê pêvajo hat destpêkirin. Sedema nîvçe mayîna vê qonaxê çi ye? Divê em li ser vê pirsê rawestin.

## Şerê Gel ê Şoreşgerî

Şerê gel ê şoreşgerî astekê dixwaze. Berî her tiştî divê gel di asta ku tê xwestin de, bi rengê xwe beşdarî vê pêvajoyê bibe. Ango ne wekî gerîla; herî kêm bi şêwazê xwe yê gelêrî bikaribe beşdar bibe. Ji bo beşdar bibe divê gel were birêxistinkirin. Divê tevgera serhildanê wekî lingekî şoreşê yê bingehîn xwe di nava civakê de birêxistin bike û sîstema Xweseriya Demoratîk di nava xwe de ava bike. Rêber Apo hîmê sîstema xweseriya demokratîk wekî 9 xalan digire dest. Divê mirov li ser esasê van 9 xalan di nava civakê de avakirinê bi pêş bixe û wisa civak bikaribe xwe bi rê ve bibe, bi xwe têra xwe bike û êdî pêwîstiya xwe bi dewleta dagirker nemîne. Bi vî awayî di nava xwe de sîstema demokratîk a xweser ava bike. Eger sîstem wisa bê avakirin, jixwe wê tevgera gel bibe wekî kelheke nekeftî. Yek ji van 9 xalan jî, xala sîstema parastinê ye. Xala din jî, ji bo civak di warê, aborî, îdarî, dadwerî, civakî, tenduristî, jiyana azad û hwd. de bikaribe xwe bi rê ve bibe û xwe biparêze bingeheke esasî ye. Avakirina sîstema xweseriya demokratîk, heman demê di aliyê civakê de avakirina bingehê şerê gel ê şoreşgerî ye. Ango dijmin êrîş neke, sîstema gel qebûl bike, jixwe ev çareserî ye. Lê berevajî, ger dijmin êrîş bike, wê li hemberî êrîşa dijmin gel û hêzên parastinê sîstema xwe biparêzin û sîstema xwe bikin perspektîfa çareseriyê. Ango wê ew bi xwe çareseriya xwe bi vî awayî ava bikin.

Li gorî vê, mirov dikare bibêje, aliyekî meşandina şerê gel ê şoreşgerî birêxistinkirina gel e, aliyê din jî amadekirina gerîla ye. Ya herî girîng, xeleka di navbera gerîla û gel de parastina cewherî ye. Ango ya herî girîng, bipêşxistina sîstema parastina cewherî ye. Perspektîfa Serokatiya me û tevgera me di vê çarçoveyê de bû.

Em ji sala 2003'an û vir ve dixwazin sîstema hêzên parastina cewherî ava bikin. Dûvre me navê wê kir Yekîneyên Herêmî. Me xwest em bi pêş bixin. Ev yek wekî tê xwestin bi pêş neket. HPG'ê di vê der heqê de zêde nikarîbû pêşveçûnê çêbike. Dîroka vê kevin e. Di sala 2003'an de gava me Bakur xist rojeva xwe, heman demê me şîroveyek wisa jî bi pêş xist û got: "Li Kurdistanê artêşeke duyemîn bê birêxistinkirin." Ango artêşa me yek HPG heye û xuya ye; ya din jî, divê artêşeke veşartî hebe. Me şêwazê birêxistinbûna IRA ya di nav gel de wekî nimûne girt. Ango Artêşa Rizgariya Îrlandayê çawa xwe di nava gel de birêxistin kiriye û veşartî maye, di Kurdistanê de jî divê hêzeke parastinê ya wisa di nava gel de birêxistinkirî û veşartî dimîne, bê avakirin. Li Îrlandayê wekî Kurdistanê çiya jî tune ne. Gerîlayê wan heye, lê ne xuya ye. Di nav bajêr û gundan de ye. Cihekî xwe yê diyar tune ye. Di nava gel de ye veşartî ye û xwe birêxistin kiriye. IRA'yê bi salan bi Îngiltêre re şer kir. Şerê wan demdirêj e, lê şerê wan ê germ 30 salan ajotiye. Îstixbarat û polîsên Îngilîz jî ne lawaz in. Bêguman ji yê Tirkiyê xurtir in. Rexmê wê, IRA'yê dikarîbû di nava gel de xwe birêxistin bikira û biparasta.

Me jî xwest em wekî IRA'yê artêşeke duyemîn di nava gel de, bi navê hêzên cewherî yan jî herêmî birêxistin bikin. Bila veşartî be, wekî gerîla profesyonel be û di leşkeriyê de pispor be. Di çarçoveya parastina cewherî de wekî gerîla perwerdeya xwe hebe û bi sîstem be, lê veşartî be. Eger rojekê me artêşa fermî HPG ji dewrê derxist, bila ew di dewrê de be. Me di sala 2003'an de xwest vê bikin û me ev kir broşûr. Me ev broşûr da giştî rêveberên eyaletan. Wê çaxê me ew broşûr bi awayekî dizî li ser fermandarên eyaletan belav kir. Di arşîvan de heye. Me got, "bila tenê rêveberî bixwîne û veşartî be." Da ku dijmin nizanibe em artêşeke duyemîn di nava gel de birêxistin dikin. Ev ket rojevê, lê heval di pratîkê de li ser nesekinîn, serveyî nêzîk bûn û bi ser neket. Hevalan carekê ji min pirsiyar kirin ku çima bi ser neket. Min mînaka pênûsê ji wana re got. Eger tu serê pênûsê bidî ser qaxizê, tê bikaribî binivîsî, lê ger tu dawiya pênûsê danî ser qaxizê, tu nikarî binivîsî. HPG'ê jî wisa xwest parastina

cewherî binivîse. Lewre nikarîbû hêza parastina cewherî bi pêş de bibe. Ji ber ku dixwaze bi dawiya pênûsê li ser qaxizê binivîse.

Pratîka HPG'ê der heqê parastina cewherî de vala ye. Ji ber ku berevajî girt destê xwe. Gerîla nikarîbû di gund û bajarên nêzî xwe de van yekîneyan ava bike. Mixabin wisa ye. Di sala 2009'an de hevalan li Metîna konferans lidar xist. Ez jî beşdarî wê konferansê bûm. Hevalan şehîd Îbrahîm dabûn ser vî karî, lê hevalê Îbrahîm şehîd ket, piştî şehadeta wî ev konferans hat lidarxistin. Wê çaxê ez tenê gihîştim beşê girtina konferansê. Ji serî heta dawiya konferansê hevalê Abbas, Sofî, Bahoz hemû beşdarî konferansê bibûn. Ango hemû rêveberiya me tevlî bibû. Me li ser nîqaş kir. Welhasil hinekî xet sererast bû, çarçoveyek derket holê.

Beriya wê heval dixwazin bi telefonê xebata parastina cewherî birêxistin bikin. Bi vî rengî nabe, yên heyî jî dide dest. Di encamê de derket ku têkiliya HPG'ê bi gel re lawaz e, ango ne bi rêxistinî ye. Têkiliya heyî jî li gorî xwe ye, ne birêxistinkiriye. Baskeke HPG'ê di nava gel de tune ye. Ji gel agahiyên berfireh nîn in, tenê bi hinek milîsan re têkilî heye û di çarçoveyeke teng de maye. Wekî din kesên birêxistinkirî, hatî biçekkirin û bi raporan agahî bişîne, nîn e. Botan, Garzan û Dêrsim çar dora xwe gerîla ye, lê têkiliyeke gerîla û gel û agahiyên berfireh pir zêde nîn e. Gerîla xwe di nava gel de bi cih nekir. Heval vana nakin, diçin ji bo Serokê şaredariyê name dişînin û dibêjin, "ji bo me tiştan bişîne." Ev nabe. Ew rêxistineke din e. Tu ji bo çi pê re mijûl dibî! Bi xwe here têkiliyên xwe çêbike, bi xwe derfetên xwe biafirîne. Niha hinek birêxistinbûn heye, lê kêm e.

Navê xwe li ser e; Şerê Gel ê Şoreşgerî. Ji bo ku tu vî şerî bikî, divê organîzasyona te ya di nava gel de xurt be. Erê organîzasyonên tevgera giştî yên gel hene, lê ew rêxistina legal e. Tiştê ku tu ji wî re bibêjî, wê polîs pê bihese. Ew dikare tenê xebata legal bike. Em behsa ya îlegal dikin. Tê bi xwe birêxistin bikî. Lê ev xebat wekî tê xwestin nehat meşandin û nehat kirin, lewre valatî hebû. Ji bo ku em vê valahiyê dagirin, Komîta Serhildanê berê li hundir bû, me anî Herêmên Parastina Medya, lê wê jî rol neleyîst. Ne serhildanê rola xwe leyîst, ne jî HPG'ê wê qonaxê ava kir. Me ew sîstem jî guhert. Me niha biryar girtiye ku HPG bi xwe vî karî bike. Ne bi Komîteya Serhildanê bike, divê ew bi xwe bike. Divê bi xwe komîteya xwe ya serhildanê birêxistin bike. Ji ber ku komîteya serhildanê nîv legal, nîv îlegal e. Komîteya Serhildanê divê karê xwe îlegal bike. Di vir de tengasî hebû. Ango çima em derbasî şerê gel ê şoreşgerî nebûn? Yek sedema wê ev bû. Divê em vê meseleyê bi bingehîn çareser bikin. Niha me kiriye hedef ku HPG bi xwe vî karî bike. Divê em hêviya xwe nedin ser Komîteya Serhildanê, yan jî rêxistineke din a legal. Divê em bi xwe birêxistin bikin. Halbûkî kadroyên HPG'ê hene. Di her astê de kadroyên me hene. HPG'ê bi hezaran kadro û însanên xwe hene, divê bi xwe bike. Ya pêwîst, divê sîstema xwe hebe. Yek sedem ev bû. Diviyabû lingê gel xurt bûya.

Sedema din a em derbasî şerê gel ê şoreşgerî nebûn, çi bû? Ji bo ku HPG bikaribe şerê gel ê şoreşgerî bike, divê HPG guhertineke bingehîn di xwe de çêbike. Şêwazê HPG'ê niha qeba, çors, dûz û seresere ye, dizîbûn, veşartîbûn û dîsiplîna wê lawaz e. Di şêwazê niha de kûrahî tune ye, ne li gor demê ye. Pir li paş e. Bi vî şêwazî HPG nikare şerê gel ê şoreşgerî bike. Şêwazê HPG'ê ne li gorî sala 2013'an e. HPG nikare wisa şerekî ji niha pêşdetir bide. Me got; şer bi teknîk ve pir girêdayî ye. Her ku diçe teknîk pêşde diçe, li gorî wê di amûr, taktîk û stratejiyê de jî guhertin çêdibe. Îcadên nû bandora xwe li ser şer dikin. Serdema em tê de, serdema telekomunîkasyonê ye. Dayîn û standin pir lez bûye. Cîhan pir biçûk bûye û her tişt destpêkê ji bo şer tê bikaranîn. Çi gerîla dibe, çi artêşên nîzamî, pirsgirêka van a guhertina li gorî vê pêşveçûnê heye. Ji bo her kesî pirsgirêka klasîkbûnê heye. Klasîk dimînin. Guhertina diyalektîkî pêwîst e. Divê her dem xwe biguherînin û nû bikin. Artêşa ku herî zêde di van mijaran de xwe bi pêş ve biriye hêzên taybet û hêzên deryayî yên Amerîkayê ne. Lê me di şerê Iraq û Afganîstanê de dît ku, di deşta Mûsilê de şikestin. Artêşa Îsraîlê jî xwe pir serkeftî dibîne, me di şerê 2006'an de dît ku li hemberî Hizbûlahê di Lubnanê de şikestin. Hizbûlahê kûrahiya arazî bi kar anî, mewziyên bin erd pir bi pêş xist; Îsraîl jî pir teknîk bi

kar anî û bajarên Lubnanê yên wekî Sûr, Sedya û Nebatiyê hemû bi erdê re kirin yek, dîsa jî şikestin. Artêşa herî di pêş de Îsraîl bû, wana jî nikarîbûn li gorî pêşveçûnan xwe nû bikirana.

Di giştî artêşan de pirsgirêkên guhertin û veguhertinê heye. Amûrên ku bi kar tînin di wana de pêşketinê çêdike, lê divê ew hêza xwe li gorî van nûbûnan bi pêş bixin. Ji bo vê jî her tim perwerde û nûbûn pêwîst e. Artêşên ku vê nekin, klasîk dimînin.

Artêşa Tirkiyê di vê mijarê de pir klasîk maye û pirsgirêkan jiyan dike. Di dema Îlker Başbûg de pirsgirêkên klasîkbûnê hatin nîqaşkirin. Nejdet Ozer jî kesekî ne ewqas bi aqil e. Ew bi erzanî hatiye ser erkê. Nikare pir gavên mezin bavêje. Ji ber li riyên erzan digere, got ku, “wê artêşekê bi peran û profesonel ava bikin.” Wisa kir ku valahiya ne modernbûne dagire, lê ew jî di sala 2012’an de di şerê Şemzînan, Zagros û Botanê de şikest û rezîl bû. Dîqat bikin, niha nema behsa wan dikin. Berê di çapemeniyê de wan wekî şêran nîşan didan. Bi artêşên kirêgirtî, bi peran artêşa profesyonel çênabe. Ev artêşa ku hejmara xwe 700 hezar kes be û wisa giran be, ji bo ku biçe cihekî 3 meh pê de biçe, bi vê giraniyê nikare nû û modern bibe. Wê her klasîk bimîne. Ew jî cesaret nakin ku vê biguherînin. Beriya her tiştî ji bo nûbûnê divê hejmara xwe biçûk bikin. Ji bo kalîteya xwe bilind bikin divê perwerdeyê kûr bikin. Vê hêzê di xwe de nabînin. Ev pirsgirêk di piraniya artêşan de heye.

Pirsgirêka artêşa Îranê hîn zêdetir kûr e. Li gorî pirsgirêka Îranê ya klasîkbûnê, Tirkiyê ji wê li pêştir e. Hevalên ku diçin Rojhilatê Kurdistanê her dixwazin şer bikin. Çima? Ji ber ku li gorî artêşa Tirkiyê xwe amade û perwerde kirine. Li hemberî artêşa Tirkiyê, leşkerên Îranê performansa xwe pir lawaz in. Lewre heval hez dikin bi leşkerên Îranê re şer bikin. Ji ber ku Îran nikare operasyonên îmhakirinê yên misoger bi pêş bixe. Erê dorpêç dike, lê hêzên ketine dorpêçê dikarin li wana bidin û jê derbikevin. Di vê çarçoveyê de her bi ser hevalan de çûne, piranî hevalan li wan daye û bê encam mane. Di şerê Qendîlê de Îranê hêzên xwe yên herî taybet anîbûn. Ew ên dibêjin “em bimrin, em ê yekser biçin cinetê” wekî quweteke taybet in û li Tehranê amade dikin. Ew hêzên xwe anîn Qendîlê, hevalan ew kuştin û çek ji ser wan rakirin. Wana quwetê Îranê yê herî jîr bûn. Pir teknîka xwe jî hebûn, hevalan çek û termal ji ser wan rakir. Ya rastî bi cesaret bûn û dihatin. Dema hatin, ji hevala jî derbas bûn, lê ketin xefkê û nikarîbûn vegeriyana. Dîsa jî şikestin ango yê hatibûn nikarîbûn vegeriyana. Pirsgirêkên klasîkbûna artêşa Îranê hîn kûrtir e. Artêşa Tirkiyê jî klasîkbûna xwe heye. Lê li gorî hêzên Îranê hinek asta xwe heye. Wana jî bi me re şer kirine, lewre fêrî hin tiştan bûne. Ev pirsgirêka guhertina artêşê îro ji bo her kesî di rojevê de ye; ji bo artêşa gerîla hîn zêde di rojevê de ye.

Gerîla, wekî artêşên dewletan ên nîzamî teknolojiyê bi kar nayîne. Gerîla zafera xwe li ser teknolojiya nû nake. Gerîla zafera xwe bi 3 tiştan dike. **Yek;** bawerî ye. Gerîla bawermend e. Gerîla ji bo dozekî şer dike. Gerîla bi îdeolojî û baweriya xwe heye. Gerîla doza xwe heye, ji bo vê jî ruhekî fedaî pê re heye. Ne wekî leşkerên din ên hatine leşkeriyê bikin û dûvre jî herin malên xwe. Na. Gerîla bi her tiştê xwe fedaî ye. Bi taybetî gerîlayên me wisa ne. Gerîlayên deverên din jî piranî wisa ne. Ango ji bo doza xwe, ji her cure fedakariyê re amade ne. Gerîla hêzeke wisa ye. Çavkaniyeke zafera gerîla, ev e. Ji ber ku heman taybetmendî di dijmin de nîn e.

**Ya duyemîn;** terzê hereketa gerîla ye. Zafera gerîla, bi terzê wê yê hereketê û bi taktîka wê çêdibe. Ev çi ye? Ne sabît e, herikbar e, cih heye xwe vedişêre, cih heye derdikeve, wekî xeyaletan e, bi dizî, esnek û bi dîsiplîn e. Ango çawa pêwîst be, wisa tevdigere. Dijmin lê digere nabîne, lê ew kengî bixwaze dikare li dijmin bide. Bi lez û sivik tevdigere. Dikare bi her şêwazî xebatên leşkerî raber bike. Dizane wê kengî û li kî derê esnek be, nerm be yan jî hişk be. Performansa xwe ya ku dikare bi her şêwazî tevbigere, heye. Terzê xwe yê hereketê wisa ye. Bi vî terzî û bi taktîkên xwe artêş pê nikare. Artêş li hemberî terzekî wisa yê hereketê nikare bi ser bikeve. Gava artêş diçe ser, ew winda dibe; gava dijmin dikişe û diçe, li dijmin dixe. Piranî bi însiyatîfa xwe şer dike. Gerîlayê xeta rast wisa ye. Gava xetê winda dike, dikeve bin însiyatifa dijmin. Lê esas gerîla bi însiyatîf e. Terzê tevgerîna gerîla bingeha

zafera gerîla ye. Bi taybetî di taktîkê de kûr e û dewlemend e. Gerîlayê di pêşxistina taktîkê de aqil nede pêş, dil û mejî neke yek û her tim dijmin bi derketinên surprîz li hev şaş neke, nikare bibe gerîlayê profesyonel û nikare bi ser bikeve. Dîsiplîna gerîla divê dîsiplîneke cewherî be, ne dîsiplîneke bi qalîbî be. Dizîbûna gerîla divê dizîbûneke kûr û ji dil be. Dema li ser vî esasî gerîla plan û tevgerînê bi pêş bixe misoger gerîla wê bi ser bikeve. Kaniya zafera duyemîn jî ev e. Artêşek çiqas xurt be jî, nikare li hemberî terzekî wisa bi ser bikeve.

**Ya sêyemîn;** afirînerî û qabiliyeta gerîla ye. Ango gerîla qabiliyet û afirîneriya xwe heye. Hîn zêde aqil bi kar tîne, dikare taktîk dewlemend bike û teknîkê bixe bin xizmeta taktîkê. Li ser teknîkê divê hakim be. Gerîla divê li ser giştî çekên ferdî hakim be. Divê çekên navîn û çekên giran bizanibe. Ango her cure teknîkê bizanibe, bixe bin xizmeta taktîkê û di taktîkê de afirîner be. Gerîla, bi taybetî di şert û mercên zehmet de bi fedakariya xwe, bi afirîneriya xwe û bi aqilê xwe dikare hêzên herî mezin jî pûç bike. Ji ber ku di gerîla de fedakarî kûr e. Di quwetekê de fedakarî tune be, nikare dîsiplîneke saxlem bi pêş bixe, nikare dizîbûnê bi pêş bixe. Heman demê di yekî de aqil û afirînerî tune be, nikare di taktîk de dewlemendiyê çêbike û di teknîk de hakimiyetê çêbike. Ji ber ev hemû di taybetmendiyên gerîla de hene, însiyatîf û fedakariya gerîla dibe bingeh ku, van tiştan bi afirîneriyeke balkêş bixe jiyanê. Afirîneriya gerîla li hemberî her pirsgirêkê çareyê ava dike û di tu şert û mercan de bêçaretiyê jiyan nake. Her pirsgirêka peyda bûye û zehmetiya çêbûye fedakarî û afirîneriya gerîla teqez jê re bersivek ava kiriye û bi pêş xistiye.

Gerîla bi van her sê tiştan ango bi bawerî, terzê tevgerînê û bi performans û afirîneriya xwe diçe zaferê. Quwetê li hember gerîla çi qasî mezin be bila mezin be, di vir de rexmê vana divê teknîka dijminê xwe bizanibe, da ku li hemberî wê tedbîr bigire. û xwe ji teknîka dijmin re neke hedef. Rast e, gerîla teknîka dijmin bi kar nayîne, lê divê li hemberî wê teknîkê tedbîr bigire. Ango doçkaya dijmin bi kar tîne çiqas bandora xwe heye? Doçkaya heval bi kar tînin bandora xwe çiqas e. Keşîf çi qasî dibîne, li hemberî wê mirov dikare kîjan tedbîran bigire? Di vê der heqê de ji ber nêzîkbûnên kêm, gelek caran li hemberî teknîka ku dijmin nû bi kar dianî di wextê de tedbîr nedihat bipêşxistin. Ji bo vê jî windahiyên me zêde çêdibûn. Bi taybetî der heqê termalê de mirov dikare vê pir zêde bibêje. Dema termal li ser tangan bû, di wextê de me fêm nekir û tedbîrê wê negirt. Ev ji bo me bû sedema windahiyan. Çima? Ji ber ku em teknîka dijmin naşopînin. Ji ber ku yekîneyeke me ya wisa pispor nîn e.

Herî dawî dijmin termal danî ser firokeyên keşfê. Me ev zû ferq nekir. Li Bakurê Kurdistanê hevalan di cihên bin erd de agir kir. Hevalan çarber çêkirin. Firokeya keşfê germahiyê digire. Ji ber çarberan me pir windahî da. Dûvre cihên me yên herî veşartî ku hevalên me tê de sobe û agir pê xistin, hat deşîfrekirin. HPG pir zû bi vê nehesiya. Dûvre hinek hevalan di pratîkê de ev fêmkirin. Mesela, di pratîkê de fêm kirine ku keşif çarberan dibîne. Gava şev mirov hereket bike, keşif mirov ferq dike. Hevalên me di pratîkê de ev ferq kiribûn, lê nebibû malê giştî. Me di encama vê de çiqas windahî dan.

Rast e, gerîla teknolojiya di destê dijmin de bi kar nayîne, lê divê lêkolîn bike, nas bike û vala derbixe. Em dibînin ku teknîk bi pêş dikeve, li ser gerîla bandor dike. Lazim e gerîla vê teknolojiyê bizanibe û li ser lêkolînên xwe hebe. Di HPG'ê de divê beşa lêkolîna teknîka dijmin hebe. Beriya ew li hemberî me bi kar bîne, divê ew heval quwetên me agahdar bikin da ku tedbîr bêne girtin. Lê di van xisûsan de kêmaniyên me hebûn. Em niha dizanin di sala 2011'an de piraniya windahiyên me bi termalê çêbûn. Li Geliyê Tiyarê heval wisa şehîd dikevin. Destpêkê birîndar hene, heval her diçin ser birîndaran, lê dijmin li wan dide. Ji ber ku termal li ser keşfê ye. Heval di bin zinarê de ne, zinar bi ser wan de dikeve û her ku heval dixwazin hevalên di bin zinar de mayî derbixin, dîsa balafir tê û li wan dide. Lê hevalan ev bizaniya wê belav bibûna. Beriya her tiştî wê di bin keşfê de hereket nekirana. Di bin keşfê de nabe tabûrek têkeve tevgerê. Bi hestyarî diçin birîndaran rabikin. Heval li wir dinalin, helbet wê birîndaran rabikin, lê wê bi kontrol û bi tedbîr biçûna. Ji ber hevalan nizanîbûn ku di şeva tarî de dijmin bi termalê wana dibîne.

Windahiyên li Bakur jî hemû wisa bi êş in, lê em nikarin hemûyan vekin. Hevalê Rûbar ji Besta tê Cûdî. Grûbek heval jî ji Gabarê tê û li hev dicivin. Li Girê Hêrmo 40 heval tên gel hev. Dûvre firoke tê ser wan, 11 heval şehîd dikevin. Li Bakur 11 heval bi firokeyê tên şehîdkirin. Yekemîn car ez li tiştekî wisa dibim şahîd. Ev cara yekemîne li Bakur evqas zêde windahî bi firokeyan çêdibe. Berê li Bakur em 300 heval bi hev re tevdigerîn. Bi piranî di biharê de ji bo hemleyan em 300 kes dihatin gel hev. Heta carekê tam 48 saetan firok û kobrayan bi hev re li me dan. 2 rojan ji sibê heya êvarê firokan li me daye, me 7 şehîd dane. Hejmara me li wir herî kêm 250 kes bû. Hem jî li zozanên Fereşînê. Li Bakur tu caran 10–11 heval bi êrîşa hewayî bi hev re şehîd neketine. Lê ev jî bû. Ji ber ku dîmen dane keşfê û îstixbarat berbiçav bûye.

Li Bakur rewşên wisa dibin. Ji ber ku tespît bûye û şênber e. Dûvre li Cûdî operason derdikeve. Berê me bi sedan heval li Cûdî vedişart, diparast û kesî nedidît. Li Cûdî cihên wisa hene ku kesî nikarîbû têketayê. Lê balafira keşfê li Cûdî hevalan dibîne û agahî tê ku dike operasyon derbikeve. Ji bo tedbîrê heval xwe dikin 3 beş û her beşek diçe xwe li cihekî vedişêre. Roja din operasyon tê, kîjan grûb çûye kî derê, dijmin wekî bi destê xwe bi cih bike diçe ser grûbê. Wisa roja din her sê grûb jî dikevin temasê û windahî didin. Hem jî li cihekî wekî Cûdî ku araziyê xwe pir guncaw e, ev pêk tê. Ev ji bo min cihê pirsê ye. Li cihekî wekî Cûdî çawa wisa dibe. Ez bi xwe dikim dîn bibim. Çawa wisa dibe. Ev heval li noqteyekê bûna, minê bigota sîxuran ew dîtine. Belkî di bin keşfê de çûbûn, lê cardin jî cihê her sê grûban jî bi şêwazekî deqîq tespît dikin. Rojek beriya wê êrîşa hewayî çêdibe, belav dibin. Roja din operasyon tê û dijmin diçe ser her sê cihan. Li her sê noqteyan de jî şer diqewime. Di cihekî de hevalê Rûbar, li cihê din hevalê Serbest şehîd dibe. Ev çawa dibe? Heval nizanin, zivistan e, heval diçin kîjan şikeftê agir dikin. Her sê beş jî li cihê ku tê de ne, şevê agir dadidin. Germahî ji devê şikeftê derdikeve û termal keşif dike. Hevalan ev nizanîbûn; ger hevalan bizanîbûna di keşfê de termal heye, hevalan agir danedidan. Hemû hevalên xwedî tecrûbe bûn, hevalê Serbest û Rûbar hevalên kevn in. Ma vana ne ew kes in ku nikaribin xwe li Cûdî veşêrin! Erê xwe vedişêrin, lê şev agir dadidin. Agir cihê wana deşîfre dike. Agir li şikeftê dadidin, lê xem nîn e. Mesela, deriyê şikeftê çep û rast be, belkî germahî nede, lê şikefta lê dimînin yek deriyê xwe heye, ji derî germahî derdikeve û dijmin jî cihê wana tespît dike.

Eger me ev teknîka dijmin fêm nekira, heta niha wê gelek windahiyên me çêbibûna. Nezanîna teknîka dijmin bû sedema ewqas windahî. Dijmin agahiyên ku ji balafirên keşfê digire, bi rêya îstixbaratê jî misoger dike. Li gorî tê raporkirin; hevalê Rûbar gava çûye Cûdî, pir kes dibihîsin. Dibe ku îstixbarat ji dijmin re çûye. Jixwe îstixbarat wisa ye. Dijmin tenê ne bi yek kanalê kar dike, na. Bi çend kanalan hedefê zelal dike.

Di vê mijarê de yek xam agahî heye, ya din jî saf agahî heye. Xam îstixbarat hebe, çi ye? Ango ji yek kanalê îstixbarat girtiye. Bi çend kanalan ango sîxur, heron-predatorê agahî digire, tîne gel hevdû û zelal dike. Bi vî rengî agahî ji sedî sed dibe û diçe ser. Îstixbarata bi yek kanalê agahiyek xam e, dûvre ku bi çend cihê din agahî digire, ji sedî sed rast dibe. Niha derfetên îstixbaratê pir zêde bûne. Dijmin berê tenê dikarî muxtar û bekçiyan bike sîxur. Li gundan tenê muxtar dikare biçe qereqolê, yê din biçin wê gel qebûl neke. Ji ber ku wê deşîfre bibe. Lê muxtar têkiliya xwe bi dewletê re heye û diçe qereqolê. Dûvre jî wê agahiyan bigirin. Cerdevan, cehş vana dikarîn biçin qereqolê, lê her kesî nikarîbû biçûya qereqolê. Berê sîxurtî pir zor bû. Mirov dikarîbû xwe ji wana biparêze.

Di vê demê de her kes dikare bibe sîxur. Telefonek di berîka kî de be, dikare her kêliyê agahî bide dijmin. Ango sîxurtî pir hêsan bûye. Dijmin mirovan dişemitîne û bi pereyan ji wan agahî digire. Niha şerê psîkolojîk pir zêde ye. Li ser malbatên şehîdan, xwişk û birayê hevalên me disekinin ji bo ku wana bikin sîxur. Me dîtiye, dijmin birayê hevalê me yê şehîd kiriye sîxur. Dijmin ne tenê bi yek alî, ji her alî ve dixebite. JÎTEM, cemaet û cur bi cur sazî û dezgehên wan dixebitin. Kredî û kooperatîfên xwe didin civakê û wan bi xwe ve girê didin. Di demek wiha de derfetên dijmin ên îstixbarat girtinê zêde bûne. Hem bi rêya hewayî (ANKA, Predator, Heron û hwd.) hem jî bi rêya bejayî yanî sîxur û keşfan agahî digire. Bi

rêya guhdarkirina bêtêlan îstixbaratê digire. Jixwe telefon sîxur e ku bi telefonê tam cih jî tespît dikin. Divê gerîla û telefon pir ji hev dûr bin. Telefon bi xwe sîxur e. Bêtêl jî tê guhdarkirin, lê herî kêm bi bêtêlê cih bi milîmetrîk nayê tespîtkirin û nayê qeydkirin.

Di vê demê de teknolojî ewqasî bi pêş ketiye ku li bajaran jî tevahî jiyan xistine bin kontrolê. Niha yekî îlegal biçe bajêr û çalakî bike, di demek kurt de ji bajêr dernekeve, wê were girtin. Ji ber ku di bajaran de jiyan bi kamerayan di bin kontrolê de ye. Cardin teknîka şopa tiliyan (parmak izi) pir bi pêş ketiye. Pir zû dikarin nasnameyê tespît bikin. Dîsa şêwazê sîstema şopandina dijwar (keskin takip) heye. Ango ji dûr ve ger pencere hebe, dijmin dikare lazerê bavêje hundir. Bi vî awayî dikare hem axaftina hundir guhdar bike, hem jî wêneyê yê hundir bikêşe. Ango teknolojî ewqas bi pêş ketiye. Lewre di vê dema em tê de, ji bo tu nekevî bin kontrolê divê tu di muxabereyê de qet teknîkê bi kar neynî û teknîka dijmin vala derbixî. Dizîbûna ji rêzê nabe. Eger tu bi dizîbûna kûr, bi rêxistin û dîsiplîna saxlem tevbigerî, encex tu bikaribî xwe biparêzî.

Dijmin niha dixwaze çiya jî bi rêya firokeyên keşfê û bi guhdarkirina teknîkê bixe bin kontrola xwe. Eger di çiyê de gerîla dizîbûna xwe kûr neke, dikeve bin kontrolê. Divê gerîla terz û hereketa xwe biguhere, bi ya klasîk nabe. Divê di hemû milan da guhertin bi pêş bikeve. Gerîlayê ku teknîka serdemê û îstixbarata dijmin dikare vala derbixe û bi vî şêwazî jî hêza xwe ji teknîka dijmin re neke hedef pêwîst e. Gerîlayê nû û modern ev e. Ango divê gerîla xwe nû bike, modernbûnê di xwe de bi pêş bixe. Ev jî tê wateya ku, hem di îdeolojiyê de xwe saxlem bike û di xwe de zelaliyê çêbike, hem jî di şêwazê tevgerîn û têkiliyan de bi temamî nûbûnê ava bike. Eger wisa bibe, dikare gerîlayê nû û modern bi pêş bixe. Ger wisa nebe, gerîla wê bikeve bin kontrolê û her roj derbe bixwe.

Bi hemleya ji nû ve avakirinê em heya sala 2007’an hatin. Di sala 2006’an de me xwest em şer bigihînin heya asta şerê aktîf. Dûvre agirbest çêbû, fetilî sala 2007’an, lê li hemberî vê, dijmin hemle kir. Dijmin di sala 2007’an de çû gel Amerîka û ji wan destek xwest. Got ku, “PKK bi şêwazek nû bi min re şer dike. Li Oremar û Gabarê gelek leşkerên me kuştin. Bi alîkariya we em dixwazin li ser Başûr operasyonê bikin. Ji ber ku heya em biryargeha PKK’ê ji wir ranekin, nabe.” Di 5’ê Mijdara 2007’an de Bûsh û Erdogan hevdû dîtin. Beriya wê, me leşkerên di destê xwe de li ser daxwaza Amerîkayê berdan, ji bo ku nekaribin biryarên xurt bigirin. Lê wana gotin ku “PKK dijminê me yê hevbeş e.” Amerîka ji wana re got ku “em ê teknolojiyê bidin we. Ev ji ketina we ya Başûr çêtir e. Ji ber ku hûn berê 24 caran çûne Başûr, lê we nekarîbû PKK’ê tesfiye bikin. Qendîl cihekî asê ye, bi deh hezaran leşker nikare li her deverê hakim be.” Lewre Bûsh di çapemeniyê de wisa got: “Bi teknolojiya bilind, îstixbarata di cih de û bi mudaxeleya di demê de em dikarin PKK’ê tesfiye bikin. Hewceyî bi operasyonên klasîk nîn e.” Yaşar Buyukanit serfermandarê artêşê yê wê demê digot ku, “cih û warên PKK’ê ji bo me wekî BBG’ê ye.” Ango ew bernameya “Yek Min Dişopîne” hebû, dişiband wê bernameyê. Pir kêfxweş bû û digot ku “êdî PKK wê tesfiye bibe.” Dijmin bi wî awayî derfeteke teknolojîk bi dest xwe xistibû.

Ew teknolojî piştî bi dest wan ket û şûn de, divê li hemberî wê hinek tedbîrên me hebin. Ev teknolojî ji bo artêşa Tirkiyê bû derfetek. Ev teknolojî li gel her kesî nîn e. Heta niha li herêmê tenê li gel Îsraîl û Tirkiyê heye. Divê em jî xwe biguherin. Di cîhanê de li gel 6 dewletan tenê heye. Firokên şer bi şev û roj li ser bingeha agahiyê di destê wan de ye. Dikare were û li hedefê bide. Ev tiştekî nû ye. Hem şev û hem jî roj ferq nake. Niha ev li Îranê, Iraqê û Sûriyê heye? Na. Tirkiyê ji ku anî? Amerîka da Tirkiyê, ji bo ku me tune bikin.

Di civîna Konseya Leşkerî ya HPG’ê ya zivistana 2008’an de min nivîsek ji bo civînê rêkir. Di wê nivîsê de şîroveyeke berfireh hebû û nêzî 25 rûpelan bû. Ji ber ku min bi xwe nekarî biçûm, min nêrînên xwe bi nivîskî ji wana re şand. Di wê nivîsê de hatiye ziman ku, divê HPG xwe biguhere, projeya ji nû ve avakirinê hebe. Dizîbûna heyî têrê nake, divê dizîbûna kûr û kamûflaja zirav hebe. Vana di wê nivîsê de hatine destnîşankirin. Civînê jî ew perspektîf bi temamî qebûl kiribû. Biryara ji nû ve avakirina HPG’ê hat girtin. Lê ev wekî projeyeke

bingehîn û cidî nehat plankirin. Lewre pir zêde neket jiyanê. Li aliyê din şer jî hebû. Li hêlekê şer hebû, li hêla din ji nû ve avakirin. Tam encam nehat girtin. Heya pêvajoyekê berdewam kir. Di sala 2010'an de ez hatim HPG'ê, me dît ku nerûniştiye. Me li Garê civîn çêkir. Di wir de jî hat diyarkirin ku ji nû ve avakirin wisa nabe û em nikarin wisa şer bikin. Bi vî avayî em nikarin bi ser bikevin. Lewre me di sala 2010'an de jî projeya jinûve avakirinê berdewam kir. Di encama wê de akademiya Şehîd Mahîr hat damezrandin. Hinek encam hebû, lê pir kêm bû. Ji ber ku li hêlekê şer hebû, li hêlekê projeya ji nû ve avakirinê hebû. Lewre temam nebû. Ya din jî bi girîngiya tê xwestin nehat destgirtin.

Ji bo vê yekê di civîna Biryargeha Navendî de ev ket rojevê û rêveberiyê qebûl kir. Ez ji sala 2012'an û vir ve hîn zêde li ser HPG'ê radiwestim. Ne ku tenê me di çarçoveya rêxistinî de dişopand, em bi xwe tê de bûn. Em gihîştin dawiya sala 2012'an, qenaet bi min re çêbû ku, HPG xwe neguhere nikare şer bike û bi ser bikeve. Bila şaş neyê fêmkirin, beriya sala 2012'ê jî em di nava vî karî de bûn. Gava min wezîfeya Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê dikir jî karê min dîsa piranî mijûlbûna li ser HPG'ê bû. Em ne durî wê bûn. Noqteya ku em gihîştinê, wekî kêr hat li hestî sekinî. Ji bo vê HPG divê ji nû ve bê avakirin. Li ser vê yekê biryara kûrkirina projeya ji nû ve avakirinê hat dayîn.

Di sala 2008'an de pir windahiyên me çêbûn. Di dawiya 2008'an de bêyî ku em agirbestê îlan bikin, me çalakî hinekî rawestandin. Hem hevdîtinên Osloyê, hem jî hilbijartinên herêmî hebûn. Me got, ger dewlet êrîş neke, em jî naxwazin çalakiyan bikin. Ji ber ku jixwe zivistan bû û hilbijartin jî hebû. Me dixwest beriya hilbijartinên herêmî em şer nekin. Piştî ku heyeta Osloyê ji gel me çû, balafirên şer ên dewleta Tirk hatin û bi îsabet li cihê me dan, windahî çêbûn. Di deriyê şikeftê de çardaxek hebû. Li deriyê şikeftê dan. Ji bo Konferansa Gaziyan ez di kasetê de diaxivîm. Min kaset da hevalan. Mêhvanek me hebû, min nexwest şikeftê bibîne. Li cihekî sekinî bû, ez û hevala Sozdar em ê biçûna gel wî mêhvanî, di wê demê de balafirên şer hatin. Tam cihê ku ez lê rûniştibûm dan. Em ne li wir bûn, lê hevalên gel me li wir bûn. Bi vê lêdanê re 4 heval şehîd ketin. Heta hevalek ji wana cenazeyê wî jî nehat dîtin. Dûvre me greyder anî, ev heval ku li şûna ez rûniştibûm sekinîbû, me cenazeyê wî 4 metreyan di binê erdê de derxist. Lê wê çaxê me ev ji kesî re negot. Jixwe hevalê Karasû, hevalê Bozan li wir bûn. Ango xwestin me tune bikin. Pir cidî û bi dijwarî lê dan. Me wê çaxê tenê 4 windahî dan, hevalên din di şikeftê de parastî man. Me lêpirsîn kir. Bi rastî ew heyeta hatî cem me, li ser wan şik û fikara me tune bû. Lê dibe ku bêyî wan cîp an jî cîhaz bi wan re rêkiribin. Welhasil cihê me tespît kiribûn, lewre li cihê me xistin.

Rexmê vê lêdanê jî me hevdîtinên Osloyê berdewam kirin. Bi awayekî ne fermî be jî, wekî agirbest hebû. Piştî hilbijartinên herêmî di 13'ê Nîsanê de me bi awayekî fermî agirbest îlan kir. Ji bo ku destkeftiyên çêbûne kom bikin. Di 14'ê Nîsanê de dijmin bi navê Operasyona KCK'ê êrîş bir ser qada legal û Operasyona Qirkirina Siyasî dest pê kir. Ev pêvajo heya sala 2010'an ajot. Eger me wê çaxê baş bi kar bianiya, diviyabû HPG'ê xwe ji nû ve ava bikira. Lê nehat bikaranîn. Dûvre me vê rexne kir. Di Sibata 2010'an de Serokatî perspektîfa şerê gel ê şoreşgerî da. Ango Serdema Stratejîk a Sêyemîn bi dawî bû, wê Serdema Stratejîk a Çaremîn dest pê bike. Me jî li gorî wê amadekarî kir. Li gorî amadekariyan me di 1'ê Hezîrana 2010'an de hemleya li ser esasê şerê gel ê şoreşgerî îlan kir. Hemle bi giştî 2 meh û 13 rojan ajot. Wê çaxê çalakiya hevalê Derwîş çêbû û ew çalakiyeke bi qehremanî û fedaî bû.

Heyeta dewletê cardin çû cem Serokatiyê û daxwaz kir ku, em şer û çalakiyan rawestînin. Ji Serokatî re dibêjin, "sozên ku me li Osloyê dane, em ê pêk bînin. Tenê bila bisekinin." Serokatî jî got: *"Hatine ji min re wisa gotine. Mirov dikare şîrove bike. Divê hûn li ser nîqaş bikin û biryar bidin."* Me jî nîqaş kir û me biryara agirbestê da. Ya rastî, sedema vê biryarê rewşa me bû. Ji ber ku rewşa me xitimî bû. Hevalan di meha Hezîranê de li dijmin xistin. Ji ber dijmin tam amade nebû, çalakiyên destpêkê bi ser ketin. Lê di meha Tîrmehê de windahiyên me çêbûn. Heval diçin çalakiyê bikin, 10-12 heval şehîd dikevin. Ji mecbûrî êrîşên ser gir û qereqolan hatin rexnekirin û sekinîn. Ango me di xwe de xitimandinek çêkir. Derket holê ku amadekarî ne temam e. Amadekarî qalibî bû. Ev di pratîkê de fêm bû. Ew

agirbest heya Tîrmeha 2011'an berdewam kir. Di 14'ê Tîrmehê de ji bo li ser dewletê zext bibe, me biryar girt ku li Bakur KCD (Kongreya Civaka Demokratîk) Xweseriya Demokratîk îlan bike. Wekî siyaseta Kurd a legal xweserî îlan kir. Jixwe di platforma Osloyê de jî Serokatî protokola çareseriyê pêşkêş kiribû. Dewlet ji vê yekê pir aciz bû. Di heman rojê de çalakiya Farqînê çêbû. Di wê çalakiyê de 13 leşker hatin kuştin. Ev çalakî jî wekî hincet raber kirin.

Di rastiyê de hincet ne ev bû. Hincet xweseriya demokratîk bû. Lê ji ber ev siyasî bû, ew wekî hincet raber nekirin, çalakiya Amedê kirin hincet û şer îlan kirin. Hema piştî wê, di 16'ê Tîrmehê de Îranê êrîşî Qendîlê kir. Bi vî rengî pêvajoyeke nû dest pê kir. Li dûv wê re, di êrîşên hewayî de li Xakûrkê di rojekê de 11 heval şehîd ketin. Tevî hevalê Rûstem, Alîşêr û hevala Çîçek bi giştî 11 heval şehîd ketin. Me şehadeta wan di yek carê de îlan nekir. Dûvre jî şehadetên Geliyê Tiyarê û yên Bakur jî hatin jiyîn. Ji derveyî Serhed û Mêrdînê, li hemû eyaletan windahî çêbûn. Hemû eyaletan wê çaxê windahî dan. Erzirom tesfiye bû. Her wiha li Botanê pir şehadet çêbûn.

Ji bo vê têketina sala 2012'an ji bo me qonaxeke pir krîtîk û girîng bû. Hemû rêveberiya me ji bo windahiyên sala 2011'an raporên rexnedanê pêşkêş kirin. Biryar wisa hat girtin. Me xwest em xwe nû bikin. Me dît ku bi parçeyî ye. Wekî tê xwestin em ne nikarin di qada civakî de, ne jî di ya leşkerî de kûrahiyê çêbikin. Heman demê bihara 2012'an di qada parastinê de, di nav rêveberiya me de hem di Biryargeha Navendî ya HPG'ê de, hem jî di Komîteya Parastina Rewa de pirsgirêk peyda bûn. Hevalan wê çaxê ji bo Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê nameyek wisa nivîsandin: "Pêwîst e rêxistin mudaxeleyî me bike. Êdî em nikarin bi hev re kar bikin." Wê çaxê wekî Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê me biryar girt ku, bi şêwazekî ne eşkere, bi dizî êdî em derbasî qada parastinê bibin, bizat pêşxistina şer hildin ser xwe û hevalên din ên konseyê jî qada civakî bimeşînin. Ji ber ku rewş pir cidî bû. Eger me di wê qonaxê de bilindbûnek çênekira guman hebû ku di tevgera me de şikestin çêbibûya. Ji bo vê pir zêde pêwîstiya me bi bilindkirina hemleyekê hebû. Li ser vî esasî wekî mudaxeleyekê çêbû, lê kes ji erkê nehat girtin. Di berpirsyariya Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê de û bi beşdarbûna hevalên Komîteya Parastina Rewa û Fermandariya HPG'ê, di bin navê Fermandariya Biryargeha Navendî de biryargeheke nû ya ji 7 kesan pêk tê, hat avakirin. Şer di bin berpirsyariya vê fermandariyê de hat birêvebirin.

Di vê çarçoveyê de hat plankirin ku hem di şer de, hem jî di civakê de serdemeke nû bê pêşxistin. Li ser wî esasî em hatin Behdînan. Bi rastî divê mirov bibêje, meha Nîsanê bû, hîn vesazkirin çênebibû û hêz tam ne amade bû. Bi lezgînî vesazkirin çêbû, hêzên akademiyan ji bo welat hatin şandin. Ji bo vê hemle bi derengî encex di 19'ê Hezîranê de dest pê bû. Dema hemle bi rê ket, hatibû plankirin ku em şerekî dijwar bimeşînin, beramberî wê qada civakî jî hewldanên xwe yên serhildanê xurt bikin. Wisa hat plankirin. Dema şer bi rê ket, qada civakî wekî dihat hêvîkirin gav neavêt. Ango sînorê qanûnî zêde nebihurand. Lewre di qada civakî de mezinbûn çênebû. Heta di bin zexta Operasyonên KCK'ê de lawazî bi pêş ket. Bi taybetî di bin pêşengiya rêheval Reşît Serdar de pêngava Şemzînan di şer de gavek nû avêt. Li beramberî wê bi kêmayî be jî, li eyaletên din hewldan bi pêş ketin û wisa hemleya me hinekî bilind bû.

Pratîka sala 2012'an di bin berpirsyariya Fermandariya Biryargeha Navendî de meşiya. Perspaktîfa me Şerê Gel ê Şoreşgerî bû ku, em hem lingê serhildanê xurt bikin, hem jî hin taxan bixin destê xwe. Li Amed, Gever, Nisêbîn û Cizîrê wê serhildan bibe, hem jî li çiyê li ser bingeha şerê xwe dispêre arazî şer bikin. Bi bikaranîna terzê şerê xwe dispêre arazî bi rastî me perspektîfa Serokatiyê ya sala 1996'an hinekî nû kir. Mesela, rê ji bo sîstemê wekî damaran e. Me got, "em rêyan bigirin û dijmin bikişînin arazî. Li şûna ku em biçin ser qereqolan, bila dijmin were arazî û em lê bidin. Em bi çeteyan re şer nekin. Em biçin Şemzînan, heta bajêr biçin û bi dijmin re şer bikin. Tûgay li wir e, milê din Rûbarok heye, lê di nava çeteyan de ye. Em biçin Şemzînan, li Şemzînan çete nîn in, tûgay heye. Ev çarçoveya taktîka nû bû. Tirsa me zêdetir ji termalê bû ku, noqteyan tespît bike. Qet wisa jî derneket. Eger arazî bê bikaranîn wê vala derkeve. Di parastina arazî de windahiyên me 77 heval bûn.

Nîvê van windahiyan di êrîşê de bûn, an jî di pozîsyonên cuda de bûn. Tevgera Şemzînan a di bin berpirsyariya Reşît Serdar de bi pêş ketî, di hemleya me ya 2012'an de serkêşî kir û bi rastî sîstema dagirkeriyê hejand. Helbet di vir de bi cewherî tevlîbûn, bi cesaret û afirîneriya pêşengtiya taktîkî ango ya hevalê Reşît rola xwe zêde ye.

Tiştek din jî derket holê ku dijmin bi rêya termalê suîqest dike. Dijmin di Komkujiya Geliyê Tiyarê û Roboskî de wisa kir. Di Komkujiya Roboskî de gava balafirên şer tên, ciwanên Roboskî belav dibin, her yek xwe dide ber kevirekî. Ji ber ku zivistan e, hewa sar e, bedena mirov germ e. Termal pir hêsan wana dibîne. Firoka keşfê her li wir e û wan dibîne. Di encamê de 34 kes şehîd ketin. Lê havîn bûya, hewa germ e û kevir jî wekî mirov dixuye. Lewre firokên keşfê pir zêde havînê nabînin. Zivistanê hewa sar e, pir hêsan dikare mirov bibîne. Her wiha berf hebe û germahî di bin sifrê de be, zêdetir dibîne. Ji ber ku germahiya bedena mirov 36-37 derece ye. Lewre tavilê dixuye. Her ku dibîne suîqest dike. Di êrîşeke li Şemzînan û Xapûşkê de dîsa heval bi vî şêwazî şehîd ketin. Di êrîşeke Şemzînê de bi termalê suîqest kirin, 9 hevalên me şehîd ketin. Dûvre 6 hevalên me li Xapûşkê şehîd ketin. Ew jî bi heman sîstemê şehîd ketin. Heron li jor e, şexs dibîne û firoke di heman kêliyê de lê dide. Ev sîstema firoka keşfê, koordînata yek kesî di kêliyê de dide navendê, navend jî koordînatan dide pîlot û lê dide.

Ev terzê suîqestê ye. Li gorî lêkolîna me, ev bi hêsanî nabe, lewre nikarin li hemû derê vî terzî bişixulînin. Ev terz tenê li Roboskî bi kar anîne. Belkî yê Amerîka xwe nadin ber. Ji ber ku yê Başûr girêdayî Amerîkayê ne. Piştî wê Amerîka li Başûr vî terzî zêde nake. Lê li Bakur mumkûn e Tirk xwe bi xwe bikin. Ev şêwazê ku dijmin bi kar tîne, zehmetiyên xwe yên teknîkî hene. Ango nikarin her tim bikin. Çareya wê, me wekî sîwanê (şemsiye) dît. Rêbazek pir ji rêzê ye, mirov dikare tedbîr bigire.

Plansaziya me, milê xwe yê serhildanê û milê xwe yê gerîla hebû. Me dixwest em tiştên dijmin hêvî nake û mezin bikin û hin qadan bigirin. Hin plan hebûn, lê eşkere bûn. Di çalakiya Rindikê de dijmin di xafletê de hat girtin û bi ser ket. Ji ber ku yêdek çalakî bû, bi ser ket. Eger esas çalakî bûya wê deşîfre bibûna. Çalakiya Ştaza dijmin wer dizanî ku, li ser Oremarê wê çalakî bibe, lewre bê tedbîr bû. Ew jî wisa pêk hat. Wekî din jî çalakiyên ku hevalan plan kirin, dijmin ji hemûyan agahdar bûye û zanîbû. Çima? Ji ber ku di terzê hevalan de dizîbûn nîn e, pir rihet tevgerîn heye. Jixwe ev terzê ku tê de dizîbûn nîn e û dikeve bin konrolê, bû sedema windahiyên 2011'an. Her çendî ev hat rexnekirin jî û li ser sekinîn çêbû jî, cardin bandora vî terzî di 2012'an de pir zêde hebû.

Cardin di guhertina zîhniyetê û fêmkirina meseleyan de jî pirsgirêk jiyan bû. Ango hevalên me tam neketine zîhniyeta paradîgmaya nû. Wisa di navberê de li cihekî sekinîne. Ji bo vê jî ruhê taktîk û stratejiya demê tam nayê girtin. Li kêleka wê, pirsgirêka fêmkirinê jî pêk tê. Ji bo vê jî sala 2012'an her çendî bi rêya bêtêlan bi hemû qadan re hat axaftin û talîmat hat şandin jî, gelek eyaletan dem hat û gihîşt dawiya salê, nû gotin, "me fêm kiriye." Ev şerê me, bi esasî heya sala 2010'an parastina aktîf e. Parastina aktîf di naverokê de û bi cewherî tacîz e. Ango tu dijmin tengav dikî ku, mecbûr be were hevdîtinê û ser masê. Me ev kir, dijmin hat hevdîtinê, lê dijmin ji bo çareseriyê nehat hevdîtinê; ji bo ku me tesfiye bike hat hevdîtinê. Lewre ne tacîz, pêwîst bû şerekî dijwar û encam bigire bê meşandin. Ji bo wê Serokatî behsa şerê gel ê şoreşgerî kir. Me şerê gel ê şoreşgerî xist rojevê.

Şerê ji sala 2004'an heta 2010'an hatî kirin, bi piranî şerê tacîzê bû. Ji dawiya sala 2006'an û şûn de hewldan bi pêş ketin ku, şer êdî li ser bingehê perspektîfa parastina aktîf bê bilindkirin û bigihe asta şerê navîn.

Di vê çarçoveyê de sala 2007'an çalakiya Oremarê, çalakiya Gabarê bi rastî gavên girîng bûn. Piştî wê operasyona dijmin a di meha Sibata 2008'an a li ser Zapê, berxwedana tê de çêbûyî û şikestina dijmin li wir xwarî, bi esasî raber kir ku asteke şer çêbûye. Lê mirov dîsa nikare bibêje gihîşt asta şerê navîn. Ango wisa berdewam nekir. Hewldanên dijmin jî hinek

windahî dan me. Dîsa salên 2007 û 2008'ê şer di astekê de bû. Vê yekê di civakê de bandorek çêkir. Heman demê xebata civakî ya serhildanê jî bi pêş ket. Tevgerê bi giştî xwe komî ser hev kir û ket qonaxa bilindbûnê. Encama vê di hilbijartina herêmî ya Adara 2009'an de eşkere bû. Piştî encam eşkere bû ku tevgera me bandoreke xurt çêkiriye, rêveberiyê guncaw dît ku qonaxeke nû ya agirbestê îlan bike. Lê me ev biryar di 13'ê Nîsana 2009'an de îlan kir û roja piştî wê jî dewleta AKP'ê operasyonên li hemberî KCK'yiyan da destpêkirin.

Bi kurtahî car caran çalakiyên mezin çêbûn, lê bi giştî di çarçoveya tacizkirinê de şer hat meşandin, ne ku tunekirina dijmin. Ango di asta stratejiyê de wisa ye. Piştî ku Serokatî perspektîfa şerê gel ê şoreşgerî da, diviya êdî şerekî ku dijmin îmha dike bihata meşandin, sîstema dijmin bihata şikandin. Şerekî wisa pêwîst bû. Lê me nikarîbû bi hevalan bidan fêmkirin. Piranî wekî berê bi awayekî tacîzwarî şer kirin. Divê êdî tu hîn xurt li dijmin bidî. Mehê carekî çalakiyek nabe. Ew quweta li wir çi dike? Li herêman tîm belav kirin. Yaw, wê tîm çi bike! Divê quwetê şer were komkirin. Divê bi sîstema taximan xwe organîze bike û şer bi pêş ve bibe. Lê hêz tîm bi tîm belav kirin. Ev şaş bû. Heya me got, "tîman kom bikin, vê biguherin, wekî berê nabe." Heta em çend caran bi cîhazê axivîn û me ji bo wan nivîsand. Em bi xwe çûn eniya pêş. Talîmat jî derketin, nîqaş jî çêbûn, lê bi piranî em vala derketin. Di vê xisûsê de em jî dikarin rexneyên xwe bidin. Lê bêhtir hevalan em vala derxistin. Hemû liv û tevgerên wan deşîfre dibûn. Mînak, me xwest em bi hevalan bidin fêmkirin ku, ev dem demeke nû ye û şêwazê şerê cidî dixwaze. Ev hewldana me çêbû, lê herêmên wekî Dêrsim, Botan û Amanosê dereng fêmkirin.

Hemû eyaletan bi hev re gav neavêt. Pirsgirêkên wekî nefêmkirinê derketin holê. Yanî wekî biryargeh me dixwest em şerekî dijwar ku hedefên dijmin tune dike, bimeşînin. Lê hevalan bi çend çalakiyan dem derbas kirin, nêzîkbûneke wisa esas girtin. Bi taybetî eyaletên Bakur wisa nêzîk bûn. Heta eyaletên Bakur fêmkirin ku ev dem demeke nû ye, şêwazê tacîzwarî na, divê mirov bi şêwazê tunekirinê şer dijwar bike, êdî sal hema hema bi dawî bû. Ji meha Tebaxê şûn de hinek eyaleta gotin, "me nû pêwîstiyên demê fêm kirin".

Bi giştî tevgera hevalan deşîfre dibû, dûvre me fêm kir ku esas pirsgirêk ne fêmkirin e. Heval ev çend sal in fêrî terzê tacîzwarî bûne û nikarin jê derkevin. Meseleya fêmkirinê em wekî xalekê bigirin dest. Pêwîst e em şerekî encamgir bikin û ji terzê tacîzwarî derbikevin. Mirov dikare vê wekî xalekê bihesibîne. Terzê bi lez û dijwar derneket holê. Bi vî rengî heval ketine nava bendewariya ku em ê du mehan şer bikin û vegerin. Lê me dixwest em bigihin encamê. Ew jî wekî xala duyem bû. Xala herî girîng û sêyemîn; terz vala derxistin bû. Terzê tevgerê ne di cih de bû. Piranî ne veşartî bû. Li Dêrsimê planên çalakiyan bi giranî sabote bûn. Di giştî eyaletan de ji %70'yê çalakiyên hevalan sabote bûn. Ev, ji ber terzê qeba, rasterast, seresere, ne bi dizî û ne kûr bû. Dûvre me fêm kir ku tenê ne li çend cihan wisa bûye, li giştî eyaletan wisa bûye. Di dema amadekariya çalakiyan de derfetên dijmin ên agahîgirtinê jî hene. Bi awayekî hay jê çêdibe û tedbîr digire. Encama ku me derxistî; ger HPG terzê xwe neguherîne, nikare çalakiyên mezin bike, nikare şerê gel ê şoreşgerî bike. Divê hêlên xwe yên gel xurt bike, komîteyên gel û baskên parastina cewherî rast birêxistin bike. Divê terzê xwe yê tevgerînê biguherîne, rê û rêbazê gerîlayê serdemê bi pêş bixe. Eger ev nebe, gerîla nikare bi pêş ve biçe. Di şeran de dizîbûn pir girîng e, divê sir biparêzê. Ev mutleq pêwîst e.

Mînakên ku me anîn ziman nîşan didin ku, çi artêşên nîzamî dibin, çi gerîla dibe îro ji bo hemû hêzên leşkerî pirsgirêka guhertinê heye. Hêza ku xwe neguherîne, klasîk dimîne. Eger ev nebe, nikarin bi pêş ve biçin. HPG, YJA-Star, HRK û bi giştî hêza gerîla pirsgirêka xwe ya modernbûn û profesyonelbûnê heye. Pêşmerge bi xwe klasîk e, hem jî pirsgirêka xwe ya bingehîn heye. Gerîla, divê modern û profesyonel bibe. Berê digotin, gerîla ji gel tê û bi giranî jî gundî ne. Ev berê bû. Di dema Çîn û Vîetnamê de wisa bûye. Di nava me de jî heya sala 1990'î bi vî rengî bû. Lê ev dema em tê de, divê gerîla hêzek profesyonel be. Eger gerîla profesyonel nebe, nikare li hemberî teknîka îro şerê gerîlatiyê bimeşîne. Ango tenê bi terzê

xwe yê hereketê dibe ku bikare xwe biparêze û li ber xwe bide, lê nikare bi ser bikeve. Gerîla ji bo serkeftinê heye.

Kesên berendamê fermandariyê, divê vê yekê di mejiyê xwe de binivîsin. Di gerîla de ji sedî sed pêwîstî bi guhertineke bingehîn heye. Gerîlayê hîn zêde bi dîzî tevbigere pêwîst e. Di şehadetên Geliyê Tiyarê de, piştî lêpirsînê ev yek îspat bûye. Jiyana xwe dispêre gundan (köye dayalı yaşam) heye. Heval ji gund nan digirin, bi gundiyan re di têkiliyê de ne. Heval bi erebeyan digerin û teknîkê bi kar tînin. Bi vî rengî agahî diçe destê dijmin. Ev nêzîkatî hatin rexnekirin.

Di sala 2012'an ev nêzîkbûna xwe dispêre gundan nebû, lê tedbîrên pêwîst nehatin girtin. Diviyabû hevalan têkiliya xwe bi gundiyan re qut bikiran. Nanê xwe û pêwîstiyên xwe bi xwe çêbikin, ji bo ku dijmin agahdar nebe ku çiqas hêz li wir heye. Hevalan li ser vê yekê talîmat hinekî pêk anîbûn û amadekarî kiribûn. Lê dîsa pêk nehat. Çawa bibû? Berê heval diçûn nan ji gundan digirtin, vê carê jî ard kirîne, lê di malan de danîne, ango depoyên xwe li malan e. Her ku pêwîstî çêdibe, diçin ji gund ard tînin û tên. Tu ferq di navberê de tune ye. Di her du rewşan de jî dijmin dîsa agahî digire ku çiqas hêz li wir disekine. Berê heval eşkere bi erebeyê digeriyan. Niha heval bi dizî û bi meş diçin, lê rê û gund dîsa yê berê ye. Halbûkî riyên dizî hene, lê dûr in. Heval riyên dizî nadin ber çavên xwe. Ango heval riyên rojek an jî du rojan e nadin ber çavê xwe. Tedbîrek bingehîn nîn e. Dîsa dijmin pê dihese. Divê gerîla riyên dirêj bide ber çavan û erzaqê xwe di destpêka biharê de amade bike û depo bike; ji bo ku rojane yan jî kengî erzaq bi dawî bû, biçin erzaq derxin. Eger ji berê ve amadekarî hebûna, dikarîbûn hêzek pir mezin jî bêyî ku kes bizanibe derbasî cihê din bikirana. Heval çawa derketin, dijmin jî li Çelê li ser hevalan civînan çêdike û nîqaş dikin ku, "gelo wê îro çi bikin û divê tedbîrên me çi bin?" Ji ber ku dijmin dizanîbû 200 heval derbasî navbera Çelê û Colemêrgê bûne, ji bo em kar nekin her roj operasyonên biçûk derdixistin. Di encamê de şer anî wir. Wekî vê li deverê din jî hinek rewş hatin jiyîn.

Dizîbûneke hîn kûrtir pêwîst dike. Dîsiplîn, terzê hereketê, ziravî, pîvan û kamûflaja kûr pir pêwîst dike. Divê birêxistinbûn û plansazî hebe. Di saziyeke leşkerî de her tişt bi dîsiplînê dest pê dike û bi dîsiplînê jî diqede. Sîstema akademiyan pir normal e. Em rexne dikin. Eger li akademiyan terz neyê girtin, artêş rast nabe. Kêmaniyên li vir hene, divê hûn bi mercekê lê binêrin. Ji ber ku mercek mezin dike. Yê ku 5 deqîqeyan dereng were perwerdê, dikare dereng biçe çalakiyan jî. Ango ev terz wê di çalakiyan de jî derbikeve holê. Eger wisa be, wê çalakî bi bin bikeve. Fermandarî; ziravî, hesasiyet, şiyarbûn û birêxistinbûn e. Plansazî çawa ye? Divê her tişt diyar be. Yek dereng an jî zû biçe, çalakî bi ser nakeve. Yek saetekê zû diçe çalakiyê, yek du saetan dereng diçe çalakiyê. Gundî jî nikarin tiştekî wisa bikin. Ev ne leşkertî ye. Divê bizanibe cihê çalakiyê çend metre dûr e û di çend saetan de dikare bigihe cihê çalakiyê. Fermandar, divê bikaribe vê eyar bike. Lê fermandar diçe û dibêje, "em negihîştin cihê xwe." Yaw, beriya wextê biçe ser hedefê! An jî zû diçe, beriya her kesî dikeve şer, lê grûbên din hîn negiştine cihê çalakiyê jî. Ev çi nîzam e? Nîzameke wisa ne mumkûn e hebe. Ev bi leşkertiyê leyîstine. Vê leyîstokê berdin. Min ev hemû bi çavê xwe dîtine. Bi vê leyîstokê hûn xwe dişewitînin û dozê jî bi bin dixin. Leşkerbûn pîvan e.

Eger tu nizanibî ji bo çûyîna cihekî çiqas dema te wê biçe, wê çaxê tu çawa fermandarî? Heval wisa fêm dikin ku ji bo bibin fermandar divê çend salên wan di nava partiyê de bibore, hinek tecrûbe bigirin û bibin fermandar. Fermandarî ne tenê talîmat dayîne. Fermandarî plan e, sazkirina dîsiplînê ye, bi pêşxistina aqil e. Di çalakiya Karataşê de her kes bi hevalan dihese. Grûbek zû diçe cihê çalakiyê, yek jî dereng diçe. Grûbek dûrî cihê çalakiyê ye, yek jî nêz e. Yê nêz diçe pêşiya qereqolê, ji xwe re li wir sekiniye. Jixwe leşker jî û kûçik jî bi hevalan dihesin, şer dest pê dike. Grûba din jî wê hin nîv saetên din bigihe wan. Ewqasî belavbûn nabe. Ev tesfiyekarî ye. Ev çawa fermandarî ye? Ev ne fermandarî ye, lê biborin, ev di bin navê leşkertiyê de bêterbiyetî ye. Wisa leşker nabe. Artêşê xira dikin û nîzamê xira dikin. Di wê çalakiyê de me 14 şehîd dan. Ev ne fermandarî ye; ev artêş xirakirine. Ma me ev heval li erdê dîtine! Heqê kî heye zarokên vî welatî bi şaşîtiyên xwe winda bike! Çawa wisa dibe?

Bila haya we ji we hebe, hûn ne di nîzamê de ne ku. Di hevalan de li gorî xwe tevgerîn û kêfiyet heye. Leşkerbûn ne wisa ye. Divê tu li gorî sîstema leşkerî bî. Tê xwe bi sîstema leşkerî re bikî yek. Li gorî xwe dibêje, “cihê min nêz e, ez ê zû herim.” Eger cihê te nêz be, tê dereng derkevî û wisa biçî cihê çalakiyê. Divê tu hesas bî. Divê tu bibêjî, “ger ez zû biçim, wê dijmin ferq bike, ne baş e, wê heval zirar bibînin, mumkûn e şehîd bikevin. Ez ê hesas û deqîq bim. Ez ê di wextê de herim. Ez ê tam di cih û demê de kar bikim.” Divê tu wisa bibêjî. Ne ku yê zû biçe wê zû biçe, yê dereng biçe wê dereng biçe.

Çalakiya herî serkeftî çalakiya Rindikê ye. Heval ketin hundirê qereqolê, dijmin di weziyeteke bêexlaqî de girtin. Ango xafil bûn. Lê dîsa koma destpêkê beriya 15 deqeyan dest pê dike. Di wir de jî 3 heval şehîd dikevin. Beriya hevalên din bigihin wan, çalakiyê dest pê dike. Nexwe hemû quwet bi hev re dest pê bikin, ji sedî sed wê bi ser bikeve. Çalakî pîvan, sîstem, koordînekirin û dîsiplîn e. Çalakî te got, divê 200 kes di dem û di cih de karê xwe bikin, tu kes zû yan jî dereng tevnegere. Madem kî ev der cihê fermandaran e, divê dîsiplîn, dîsiplîn û dîsiplîna xwe hebe. Yên bêdîsiplîn di nava we de hebin, wana qebûl nekin. Ger xwe rast nekir, ji nav xwe bavêjin. Fermandar divê bikaribe dîsiplînê bimeşîne. Bila di wextê xwe de li erkê xwedî derbikeve. Kes nikare bi kêfiyeta xwe, bi dûz nêzîkbûna xwe û bi qebabûna xwe nîzama me xira bike. Dibe ku hevalên di rêveberiyê de çav jê re bigirin û bibêjin, “cesaret pê re heye”. Lê tenê cesaret têra vî karî nake. Roja îro her tişt êdî zirav bûye, her tişt bi mîkrometreyê tê pîvandin û ne milîmetre yan jî bi santîmetre, bi mîkrometreyê ku ji hezarî yekê milîmetreyê ye, dikin. Ango xelk êdî pîvana xwe wisa ye. Teknolojî wisa bi pêş dikeve. Dewsa ku tu di saet 8‘an de amade bibî, tu nikarî 8 deqeyan derbas bikî û nû amade bibî. Yek deqîqeyê jî şaşîtî nayê qebûlkirin. Tu yek deqîqeyê dereng bimînî û dijmin firsendê bibîne, wê hemû baskên din tesfiye bike. Şer di detayan de ye. Carina yek deqîqe qedera şer diguherîne.

Bi kurtahî di HPG’ê de guhertinek bingehîn şert e. Em dixwazin vê guhertinê bi akademiyên navendî kûr bikin. Tevahî hêzên me wê bi rengê du dewreyan di perwerdeyê re derbas bibin. Li her eyaletê akademî hatine damezrandin. Wê 4 mehan perwerde were dayîn. Di nava 9 mehan de divê giştî hêz perwerdeyê bibînin. Ev wê deriyê guhertinê veke. Ev akademî bingeha nûbûna artêşê ye. Her ku biçe wê quwet profesonel bibin. Hunera şer bi perwerde û bi lêhûrbûnê bi pêş dikeve.

Niha Tirka jî ev bihîstiye, carina di çapemeniya xwe de diaxivin. Yekî wisa got: “Artêşa Tirk modern nebû. Gerîla wê çawa modern bibe?” Şaş agahî girtine. Di dil xwe de me ji niha ve gotiye gerîlayê me modern bûye. Me modernbûn wekî hedef daniye pêşiya xwe. Em ê gerîlayê nû, profesyonel û modern ava bikin. Ev jî bi perwerde û têgihandinê dibe. Hunera leşkerî bi xwezayî nayê; mirov vê hunerê digire. Hûn dikarin bibin leşkerên zaferê û serkeftî. Eger hûn bi israr bin, roj û şev li ser rawestin, hûn dikarin bibin fermandarên pir jîr û serkeftî. Beriya her tiştî divê em bibin leşker. Rutbe ne girîng e, esas destpêkê divê em bibin leşker. Ji bo vê îdîa, aqil û israr pêwîst e. Ji bîr nekin, ev kar karê aqil e. Rast e, cesaret pêwîst e, lê tenê bi cesaretê nabe. Bi hevalên me re û bi PKK’ê re cesaret heye, fedaîbûn heye. Lê tiştê kêm, fermandarbûn e. Em vê jî li kêleka fedaîbûna PKK’ê deynin, ji sedî sed wê hêzên me di bin her şert û mercî de bi ser bikevin.

Ji bo ji nû ve avakirina HPG’ê akademî wê rola sereke bigire ser xwe. Di hemû eyaletan de akademiyên Şehîd Mehmed Goyî û Rojîn Gewda hene. Bi giştî hêzên me wê di perwerdeyê re derbas bibin. Bi van akademiyan re em dixwazin bingehê guherînê ava bikin. Em wisa bibin ku teknîka dijmin vala derbixin û teknîka wan pûç bikin. Ji bo me terzê hereketê yê dijmin bêencam dihêle, pêwîst e. Divê êdî gerîla bi gel re nekeve temasê. Belkî carina wekî bandorkirin û peyam dayînê dibe. Ji wê pê ve, pêwîst e beşekî HPG’ê cuda be û tenê ew karê gel bimeşîne. Wekî komîteya têkilî û gel bê birêxistinkirin. Divê gerîla bi dizî be, neyê zanîn û tenê komîte û hevalên pêwendîdar (ilgili) bi gel re mijûl bibin. Ha wê çaxê, em li Geliyê Tiyarê ne 200 heval, 500 hevalan jî kom bikin, kes pê nahese. Wê çaxê em ê bikaribin çalakiyên surprîz û serkeftî bikin. Ji ber ku taktîka herî baş ew taktîk e ku, dijmin hêvî nake.

Taktîka herî serkeftî, taktîka surprîz e. Divê dijmin ji te îstixbarat negire. Ji bo vê jî divê dizîbûn û kûrahî hebe. Ji bo ev terz bibe parçeyeke jiyanê divê mirov xwe bi xwe pê re mijûl bibe. Bi yek carê gotinê nabe. Eger bi rastî jî mirov li ser lêhûrbûn bike, xwe îqna bike, dikare xwe biguherîne. Hevalên ne îqna bila ne xwe, ne jî me nexapînin. Kesên ne îqna nikarin xwe biguherin. Encex hevalên xwe îqna kirine dikarin xwe biguherin.

Perwerde dibe du beş. Beşek îdeolojîk e û beşek jî leşkerî ye. Beşa leşkerî, pratîk û teknîk e. Fermandar divê giştî çekan bizanibe. Ji bo ku rola wan bizane, da ku di plansaziyê de nekeve şaşiyan. Fermandarê/a ku hêza doçkayê nezane, nikare di plansaziya çalakiyan de cihê wê diyar bike. Her wiha divê teknîka di destê dijmin de jî bizane, ji bo ku bikaribe li hemberî wan xwe biparêze û tedbîran bigire. Mînak, fermandarê/a li Gabarê divê bizane ku li wir di destê dijmin de kîjan çek hene, ji bo ku bikare tedbîr bigire û hêza xwe birêxistin bike û mewziyê bigire. Di vê çarçovê de guhertina ku di rojeva me de ye, bi we ve girêdayî ye û ji bo me mijarek jiyanî ye. Rola ku dikeve ser milê van hevalên namzetên fermandariyê, ev e. Biçin ku derê, divê guhertinê esas bigirin. Çi pêwîst be divê ew bê kirin. Eger heval wisa nêzîk bibin û vana pêk bînin, em ê bikarin şerê gel ê şoreşgerî tetbîq bikin û nûbûnê bi pêş bixin.

Em jî bi biryar in ku vî şerî bi ser bixin. Hem em ê gel amade bikin, hem jî gerîla kî derê bixwaze bikare bi awayek surprîz çalakî bike. Heya niha dijmin bi çalakiyan dihesiya û çalakî sabote dibûn. Di vê mijarê de, êdî pêwîst e di şerê gel ê şoreşgerî de şer di asta şerê navîn de kûr bibe, çalakiyên berfireh bibin, hakimiyeta li ser arazî çêbibe û di bajaran de gel bibe îrade. Divê dijmin nikaribe bikeve taxan. Divê bi tevger bibe, komîte û meclîs ava bibin, gel û gerîla bigihin hev û bi hev re tevbigerin. Ev dibe şerê gel ê şoreşgerî. Bi vê asta niha em encam nagirin. Ji ber ku hîn me birêxistin nekiriye. Hîn em neçûne ber hedefê, dijmin ku bizane û tedbîr bigire, bi vî rengî em ê xwe vala derxin. Mînak, sala 2012'an em hatin valaderxistin. Hem jî ev sala ku herî zêde çalakî çêbûne, me hemle kiriye û gelek destkeftiyên xwe yên siyasî hebûn. Di serî de tevgera li Şemzînan ku bû sedem dijmin biheje û pir tengav bibe, dijmin ji vana derbe xwariye.

Ev rast e. Em bi xwe dizanin ku, bi piranî em hatin vala derxistin. Plana tevgera me pir mezin bû. Lê ji terzê qeba, ji dîsiplîn û dizîbûna kêm, ew plana pir mezin vala derket. Bi vî rengî dijmin pê hesiya û sabote bû. Amadekarî hat kirin, 4 mehan ked hat dayîn, lê bi giştî vala derket. Şer wekî ticaret û bazirganiyê ye. Eger zêde windahî çêbibe, tu nakî. Beriya her tiştî ev heqîqet derket holê. Em bi vî rengî nikarin şerê gel ê şoreşgerî bikin. Ev encamek e.

Divê em vî terzê xwe biguherin, artêşa modern û profesyonel ava bikin. Eger asta şervan û fermandarên me li ser vê bingehê bilind bibe, wê bikarin erkê bikin, Kurdistanê azad bikin û Rêber Apo azad bikin. Tiştên we bi paş ve dikişîne, hûn ê bi xwe li ser bisekinin. Serkeftina we, serkeftina tevgera me ye. Eger em di xeta şehîdan de bimeşin, HPG wê bi ser bikeve, bikaribe erka xwe bi serkeftî pêk bîne.

✪✪✪